ABDULAH OCALAN

# LI KURDISTANÊ JIN Û MALBAT



***ABDULAH OCALAN***

# *LI KURDISTANÊ JIN Û MALBAT*

**Werger:** *Sozdar Serbilind*
**Redekte:** *Sozdar Serbilind û Ayten Amed*

**Cihê Çapê:** *Çapxana AZADÎ*
**Dîroka Çapê:** *Nîsan 2019*

*NAVEROK*

***Mafên Jinê Û Pirsgirêka Wê Ya Azadiyê,***
***Bêçaretiya Nêzîkbûnên Kevnar Ên Heyî***
***Û Ji Çareseriya Pirsgirêkê Re Nêzîkbûnek Şoreşgerî***

***Mijara Pirsgirêkê Ya Giştî***

***Li Kurdistanê Pirsgirêka Jinê***
***Û Encama Di Nava Partiya Me De Derdikevin***

***Li Ser Stargeha Malbatê***

***Şoreşa Me Li Dijî Malbata Kevin,***
***Avakirina Malbata Nû, Jina Nû Û Zilamê Nû Ye***

***Li Dijî Malbata Kevin Malbata Nû***

***Li Dijî Tîpên Kevin Jin Û Zilamê Nû***

***Heta Ji bin Bandora Giran a Kevnare Dernekev e Wê,***
***Azadî Û Wekhevî Jî Pêk Neyê***

***Di Nêvenga Partî De Rêgeza Azadiyê Esase***

***Hemû Hewldana Me Ji Bo Welatê Azade Û***
***Li Vî Welatî Avakirina Mirovê Azade***

***Azadbûna Jina Kurdistanî, Wê Kurdistana Azad Be***

***Em ê Di Pirsgirêka Jinê De Çareseriya Azadîxwaz***
***Ji Xwe Destpê Bikin,***
***Wisa Di Civakê De Berfireh Û Serwer Bikin!***

***Em ê Bi Zanebûna Cîhana Mezin Ku Em Dixwazin Ava Bikin***
***Şer Bikin Û Teqez Encamê Bigirin!***

***Dê Şoreşa Kurdistanê Girêdayî Serweriya Hevbeş***
***A Jin Û Zilam Pêş Bikev e***

***Partî, Banga Pêwendiya Azad dike***

***Yên Di Cîhana Sermayê De Çi Bi Şêwazek Serdest Çi Jî Kole Dijîn,***
***Nikarin Di Mijara Rizgariya Jinê De***
***Rê Ji Fikrek Afirîner Û Reftarên Azad Re Vekin***

***Jin, Malbat Û Hezkirin***

***Em ê Rastiya Jinê Ji Her Hêlê Ve Rast Binirxînin***
***Û Xwe Bigihînin Şêwaza Çareseriya Rast A Partî!***

***Bi Jina Kole Re Şoreş Nayê Kirin***

***Mafên Jinê û Pirsgirêka Wê Ya Azadiyê Bêçaretiya Nêzîkbûnên Kevnar Ên Heyî û Ji Çareseriya Pirsgirêkê Re Nêzîkbûnek Şoreşgerî***

Di 8'ê Adara ku weke roja jinên cîhanê hatiye pejirandin de, em dixwazin pirsgirêkên jinê û rêyên çareseriyê nîqaş bikin, wisa pêşveçûnekê saz bikin. Lewma divê yên weke me ku pêvajoya têkoşîna rizgariya gel a topyekûn dijîn, hîn kûrtir nêzî pirsgirêkê bibin. Pirsgirêk ji bo me ji du aliyan ve girînge. Ya yekemîn, di serkeftina pêvajoya rizgariya netewî de û bi vê ve girêdayî weke xala duyem jî ji bo taybet jin, lê esasî jî civak ji wê rewşa paşketî rizgar bibe hêmana sereke ya herî girînge. Ji ber vê sedemê bi mebesta îro jî be nêzîkbûnek di asta ceribandin û pêşnûmeyê de kirin em sûdmend dibînin.

Elbet sedem ne tenê tiştên hatine diyarkirin ve sînordarin. Ji ber pêwîstî tê dîtin divê pirsgirêk bi kûranî bê destgirtin, xwe dispêre gelek sedeman. Her wiha ev sedem zêdetirîn ji bo me derbasdarin. Çi di asta cîhanî çi jî di nava me de ger nêzîkbûnak teorîk û pratîk ji pirsgirêkê re tê kirin, misoger pêdivî heye ku dûrbûnek ji seresertî bê jiyîn û nêzîkbûnek bingehîn bê raberkirin. Ev pirsgirêk, di hemû qonaxên girîng ên dîrokî de –di pêvajoyên civakî yên veguhertinê de- yên bajarvan bi şêweyekê daye bihîstin, di pêşketina civaka mirov de vekirî yan jî girtî, ji hêla pêşverû yan jî paşverû ve bandora xwe diyarker ferz kiriye. Hêjî di têkoşîna her cure wekheviya ku mirovatî di navê de cîh digire de cihek herî girîng dakir kiriye û hebûna xwe berdewam dike. Bi gelemperî dîroka têkoşînan bi şêweyên çînayetî, netawan, têkoşînên civakî yên nû û kevin, şerên artêşan, şerên siyasî û

dîplomasî, xwe gihandiye vegotinekê, lê ev pirsgirêk weke bûyerek xweser, nexasim tevî ku di roja me de tê destgirtin, hêj ne gihaye çareseriyek bingehîn. An jî zehmete ku mirov bêje, di vê qadê de şoreşek bingehîn pêk hatiye. Nêzîkbûna partiya me ji vê pirsgirêkê re, qetiyen nêzîkbûnên ku heta niha hatine fêrbûn napejirîne, ji bo çareseriya pirsgirêkê nêzîkbûnek derbaskirina van esas digire. Em dikarin yekser bêjin ku, ji ber girîngiya partiya me ya di nava rizgariya netewî û têkoşîna azadiyê de dihewîne, hêj ji roja destpêkê ve girîngiyek mezin daye vê pirsgirêkê, ji bo civak di şoreşê de bê dahûrandin, li vê qadê jî têkoşînek bêhempa meşandiye.

Dikare di navbera asta ku dagirkeriyên li Kurdistanê xwe gihandiyê û nexasim rewşa asta ku jin di navê de dijî girêdanek bê dîtin. Dagirkeriya ku li Kurdistanê mezin bûye, dişibe rewşa rastiya jinê ya ne tenê di roja me de, ji nêz ve dişibe pêvajoya ku sedî salan jiya ye. Îro li gelek welatên çi kapîtalîst, çi sosyalîst, çi jî paşketî hatine hiştin û gelek qadan ev pirsgirêk ji gelek hêlan ve derketiye pêş û tê bîhîstin. Şoreşên heyî hinekê serê pirsgirêkê vekirine, lê mixabin ne di wê astê de ne ku naveroka wê bigirin dest.

Li nav civakên qaşo pêşketî yên kapîtalîst-emperyal saziya malbatê, di nava bêçaretiyek mezin de ye. Saziya esasî ya ku kapîtalîzmê herî zêde pêş xistiye malbat jî, pir vekirî tê dîtin bi xeteriyek belavbûn û bêwatebûnê re rûbirû ye. Heman pirsgirêk li welatên sosyalîst jî xwe dide der. Nexasim di pêwendiyên malbatê de pirsgirêkên pir hûrûkûr tên jiyîn. Mînak di zewacên çêdibin de, rêjeya têkçûnê jorî ji sedî pêncî ye. Ango zehmete ku mirov bêje li welatên sosyalîst jî têkîliyên baş çêdibin. Jixwe welatên ku paşketî hatine hiştin ev pirsgirêk di rewşek herî tengav de ye.

Di serdema me ya weke serdema azadiyan tê pênasekirin de jî, tê dîtin ku tenê pêşiya pirsgirêkê hatiye vekirin û dest bi

nîqaşê kiriye. Wêrekiya vê derketiye holê, lê belê di vê qadê de bi wateyek gelemperî şoreşek veguhertinê pêk nehatiye. Çare, amûr, ceribandin û têkoşînên ji bo çareseriyê derketine holê jî, asta cewhera reformîst derbas nekirine. Jixwe rewşa îro pêşketina tevgera Femînîst a dixwazin di civaka Rojava -Ewrûpa- de pêş bixin û çi bi xwe re ava kiriye jî mijara niqaşê ye. Tevgera Femînîst pirsgirêkê tenê weke pirsgirêkek wurşedar digire dest û nikare xwe ji vê nêzîkbûnê rizgar bike. Ji bo rizgariya zayenda jinê jî têkoşînek cidî nade, tevgerek xwe nêzî rastiya xwe nake pir seresere, derdorek burjuva ku wextên xwe yên vala dinirxînin wêdetir nebûne tiştek. Ji bo ev tevgera Femînîst li nav civakên Rojava –Ewrûpa- weke çareseriya herî pêşketiye lewma em vedibêjin.

Îro rewşa azadbûna jinên ku li welatên sosyalîst derdikevin li hemberî me, tenê di asta tevlîbûna xebatên aborî, di civakê de bûna xwedî axaftin û ji hêla fîzîkî û tenduristî ve pêşketinê zêdetir tiştek din nîne. Ango weke şoreşê dayî hemû civakê di vê qadê de jî tevkariyek sînordar heye. Mînak para jinê ya di qada siyasî de hêjî pir sînordare. Heman weke dijberî feraseta rewşa wekheviya giştî nekeve tê jiyîn. Weke temamkara wekheviya giştî bi biryarên fermî di rêjeyekê de beşdarî rêxistinên partiyan, rêxistinên dewletan û xebatên civakî yên din dibe. Lê belê ev beşdarbûn dîsa jî kême. Bi kurtasî em wisa dizanin ku li welatên sosyalîst jî, ev pirsgirêk yekser di naveroka têkoşînê de tê destgirtin, lê dev jê berde çi tê hedefkirin, di vê mijarê de li şûna rêxistinbûnek xweser û bersivek çawa bide têkoşînê, tenê bi pêşketina şoreşê ya giştî ve sînordar maye û mafên hatine bidestxistin jî ne mafên ku di pêvajoya têkoşîna xweser de hatine bidestxistin, bûne mafên ku şoreşa giştî behs kirine. Bêguman ev jî ne tiştek xirabe. Destkeftî di hêla pêşveçûnê de ne. Lê belê dîsa jî destnîşankirina otorîteya siyasî ya jinê de di dahûrandina pirsgirêkên nav-netewî de û heta di nava civakê de dahûrandina

newekheviyên kûr de tevkariya wê pir sînordare. Lewma statûya jinê ya hatiye diyarkirin di radeyek mezin de statûya ku zilam ava kirî derbas nekiriye. Statûya ku ji bo jinê hatiye diyarkirin di civaka feodal de bi şêweyek diyarker mohra zilamê serdest nîşan dide, di civaka kapîtalîst de jî ev misoger dîsa wisa ye. Di civaka sosyalîst de jî beşdarbûna jinê ya sînordar çêbûye, lê belê statûya zilamê serdest a ber bi wekheviyê ve veguheriye ji hêla erênî ve diyarkirinê de dîsa dewsa zilam nîşan dide. Ev pêşketinên erênî, di bin bandora ferasetên tund ên serdestiya zilam a ji sedî salan ve kom bûyî de ne.

Ma di têkoşîna şoreşê de başiya zilam a di vê mijarê de çiqas dikare di xeta wekheviyê de pêş bikeve? Gelo dikare edaleta misoger di kîjan pîvanê de saz bike? Bi şêweyek "bandorên serdestiya zilam ên sedî salane didomin ne astengiyên wisa ne neyên derbaskirin, divê mirov pê bawer be û erê bike, ti wateya wê nîne ku pirsgirêk bi şêweyek cuda bê vegotin" nêzîkbûn raberkirin, nêzîkbûnek ku divê mirov biguman û şik nêz bibê ye. Di her qonaxên jorîn ên şoreşgerî de mirov fikir û reftarên pêşveçûyî dikin bingeha zagonan, pir û pir nêzî sînorên wekhevî yên giştî dibin, lê belê weke di derbarê her qadê de dibe, nexasim di derbarê vê qadê de jî bandora bermahiyan pir dijwar xwe didin der. Wê demê nêzîkbûna herî rast mirov hîn zêdetir di çarçoveyek şoreşî de xweser li pirsgirêkê binêre, qet nebe mirov bipejirîne ku pirsên xwe gelekin, mirov lêkolîna yên nehatine dahûrandin bike û çorsiya hişk a heyî bi rexneyek şoreşgerî ya dijwar ve derbixe hole. Girînge ku mirov qalibên reftarên ku bi cîh bûne û ne diyarin çine bişkîne, li vir nîqaşek reftarên xweser ên alternatîf, bi rêxistin û çalekiyê ve derbixe holê. Weke ku ev ji sedê salan ve hatiye kirin, di nava statûya serdestiya zilam de, ne li ser bingeha girêdana bext û ferasetên wan, lê ne ku li hember vê bi meşandina şerek razber ve jî, ger veguhertinek tê xwestin divê hebûna ku di rewşa heyber de ye xwe ber çavan re derbas bike û nirxandinek

xweseriyan a di nava pirsgirêkê bi xwe de berfireh bê kirin. Her wiha ev hewce ye. Lê dîsa jî hêj di mijarên weke tişta tê xwestin, pêwîste bê bidestxistin çiye û çawa tê bidestxistin, li gorî vê rêxistinbûnek guncav çawa dibe de, ji dîmenên berbiçav ên seresere wêdetir pêşve neçûne. Bêguman di vê mijarê de pirsgirêkên me jî yên mezin hene. Di pêvajoyek civakbûnê de ku mêtîngerî di asta herî jor de bi şêweyek çors gef li gelê me dixwe û tê jiyîn de, di rastiya gel'ê ku ji pêşketina çandî û siyasîbûnê hatiye dûrxistin de, em îro pirsgirêka li welatên pêşketî yên kapîtalîst û heta civakên sosyalîst de jî nehatiye dahûrandin digirin pêş an jî weke parçeyek rizgarî ya jêneveger dibînin û mijûl dibin. Dibe ku ev weke wextê xwe valaderxistinê jî bê hizirîn. Dibe li ber çavan hinek aliyên vê nêrînê yên mafdar hebin. Ger mêtîngeriya hovane ya ku mînaka wê nîne taybet li ser me tê jiyîn û çima evqasî bihêz dimeşe bê dahûrandin, pirsgirêka ku em ê her tim li vir vebêjin jî, dibe ku weke "pirsa jinê" be. Ji ber ku pêvajoya mêtîngehbûna me, pir ji nêz ve girêdayî pêvajoya jinwarbûna jinê ya ji sedî salan ve ye. Binêrin, serîtawandina jinê ya di nava civakê de pir bi hêze. Çawa ku serdestiyê dewsa xwe li gelek qadên weke aborî, çand, exlaq, felsefe hwd daye, statûya jinê jî bi serweriyek mezin saz kiriye, mêtîngehbûna me jî wisa hatiye sazkirin. Pir baş tê zanîn ku li Kurdistanê cewhera siyasetê, asta aborî, civakî û çandî çiqas hatiye herişandin. Lewma newekhevî û çewsîneriyek mîna hev derdikeve holê. Ger mirov zêdetir binirxîne, li Kurdistanê mijara dahûrandina kesayet, girêdayî xirabûna têkîliyên jin û zilame. Asta ku ev têkîlî dijîn, bûye çavkaniyên nexweşiyek mezin, nerêxistinbûn, bêtêkoşînê, berovajîkirina pirsgirêkan, her cure muhafezekarî û tevgera paşve kêşanê. Kesayet jî ji van çavkaniyên têkîliyan pir dijwar bandor dibin. Lewma em nikarin bi ti şêweya pirsgirêkê paşguh bikin. Lê pirsgirêk weke hatiye fêrkirin jî girtina dest me têr nake. Elbet em behsa nêzîkbûnek feylesofî nakin. Elbet em nabêjin divê di

pêwendiyên rojane yên aborî, civakî û siyasî de beşdarbûnek yekser ser esasê wekhevî çêbe. Ji ber ku em dizanin divê em di vê mijarê de zêde ne xeyalparêz bin wisa tevdigerin. Lê belê, ger ku em dikevin nava pêvajoyek şoreşê ya girîng de, di vê mijarê de bi rastî jî em bi çareseriyek bingehîn re rûbirû ne. Ji ber vê qet nebe em di derbarê pirsgirêkê de nêzîkbûnek teorîk pêş bixin û ger kesayet jî ji xwe bawerin di vê di nava pêwendiyên rojane de jî bidin der. Nêzîkbûna hewce jî ev e. Ger şêweyên muhafezekar û ferdperest esas bên girtin, şoreşgerî jî bi vî şêweyî bê berdewamkirin, dê xwediyên van nêzîkbûnan jî di radeyek mezin de xwe birîndar bikin, dê paşketina kesayetî û çavkaniya pirsgirêkên xwe bi destê xwe amade bikin. Ev jî wê pêşerojê, li pêş pêngavên girîng bibe yek ji astengiyên herî cidî. Lewra pêşniyara me yên di vê mijarê de ev in, divê mirov di çareseriya bingehîn a pirsgirêkên netewî û civakî de bê çek nebe, qet nebe bingehek teorîk hebe û pratîkek sînordar esas bigire. Nexwe berovajî vê dê xetimandin, bêçaretî, jirêderketinên di têkîliyan de bi şêweyek herî xirab di rêxistinbûn, bîrdozî û siyasetê de diyar dibin bê ku di ferqê de bin wê gelek tiştan bide windakirin. Em di rêbazên şerê taybet ên îro li dijî têkoşîna me tên meşandin de jî dibînin ku, di xebatên polîsbûnê de dijmin herî zêde destê xwe dirêjî vê mijarê dike, di vê rêyê de xwe dirêjî pêşketina me ya şoreşgerî dike û hewl dide jehir bike. Lewazî û kêmasiya di vê qadê de tê jiyîn weke şoreşek dijber li ser me ferz dike. Dikare bê gotin îro rewşa herî mezin tengav a li pêş me yek jê jî, girêdayî malbat, jinê û seriyek wê ya din zilamtiyê –ne zilam- bi provakasyonekê ve hewl dide ferz bike, ji rê derbixe û tasfiye bike. Jixwe ev jî derket holê. Tevî ku bi gelemperî jî wisa ye, ev pirsgirêk di nava me de hinek din bi şêwazek ecêb derdikeve holê û zêdetir dikeve rewşek ku dijmin jî pala xwe didiyê. Di vê mijarê de pirsgirêk bi şêweyek kevnare girtina dest zêdetir, pêdiviya me heye ku em hîn zêdetir li ser bingehek xweser bigirin dest.

Bêguman em ne di wê îdîayê de ne ku, em ê rêyên herî rast ên dest nayê dayîn bibînin. Tişta em dixwazin bikin amajeyî hebûna pirsgirêkê kirin, di vê mijarê de hizirîn û di pratîkê de jî kesên ku dixwazin hinek gavan bavêjin nêzîkbûnek fêrkirine. Ger dixwazin pêşve biçin, em dixwazin amaje bikin dê çawa pêşve biçin. Qet nebe em dixwazin platformek nîqaşê ya pêşve dibe bidin wan.

### *a) Mijara Pirsgirêkê Ya Giştî*

Heta ku nêzîkbûnên kevnar ên heyî neyên derbaskirin nîqaşên li ser maf û azadiya jinê fantaziyê derbas nakin. Dema pirsgirêkên girêdayî xweseriya civaka mirov derdikevin holê, rêyên çareserî destpêkê di bin bandora fikrek paşketî û nêzîkbûna civakek paşketî ya giran de çêdibin. Ango mirov destpêkê her tiştî pir aqilmendî çênake. Ji ber hêj aqilê wan di wê astê de pêş neketiye. Di wê demê de hêj têkoşîna wan a bi xwezayê û pêwendiyên wan ên bi hevdu re pir lewazin. Cureya mirov a ji cîhana lawiran nû derketî di qonaxa pêşîn a pêşketina xwe de ye. Lewra di wê demê de mirovahî, weke di pirtûkên olî de hatiye şîrovekirin û nivîsandin xwedî rêgezên bêhempa û rêyên çareseriyê dest nehatine dayînin pejirandin redkirina zanistiyê ye.

Lê baş tê zanîn mirov di kêliyên herî lewaz de bi dogmayên pir mezin ve, xwe sipartine rêgezên qesîdeyên pîroz. Îro jî bingeha gelek tiştên ku ji bo me tabû ne, bi rastî jî bê zanebûn hatine danîn. Dema mirovahî hêza xwe ya zêde bûyî veguherandiye jêhatiyê tişta yekem vedîtiye, di ceribandinên xwe de dîtine ku li hember hêza xwezayê çiqasî nebesin. Wê demê ne teknîkek pêşketî, ne felsefeyek ku bi hawara wan ve were û heta ne jî hîndekariya oldarî ya pêşketî hebûye. Bandora rakêşweriya tava rojê, xeteriya robaran, erdhej û birûskên asîmanan ava kirine, her wiha dema derfetên jiyanê yên xwezayê dane wan dîtine, ji vir

ketine rê û xwe gihandine xwedayan. Zayîna xwedayên rojê, xwedayên berhemdarî û xwedawend ji vir çêdibe. Ev piranî jî ji agir tên afirandin. Tê dîtin ku, diyardeyên herî zêde jiyana mirovan bandor dike, kirine xweda. Ji ber vê sedemê olên destpêkê, olên xwezayî ne. Mirov ji pir an jî kêmbûna van hêzan ditirsin, ji bo derfet bidin wan an jî di qonaxên tinebûna derfetan de jiyana wan bikeve xeteriyê wan di radeyek pîroz de digirin dest. Rêzdar nêz dibin û weke xwedaperestên destlê nayê dayîn dibînin. Ji bo mirov lewaziyên xwe veşêrin neçare ku xwe bixapîne. Îro jî em gelek caran behsa xwe nexapandinê dikin. Lê mixabin wisa tê dîtin di peresanên pêşketina mirov ên destpêkê de stargeha herî mezin yek jê jî xwe xapandina mirove. Di derbarê vê peresanê de jî ol û huner bi şêweyên cur be cur hatine berovajîkirin. Mirov, qudreta herî pîroz kiriye putek. Li gorî xwe qinyata xwe bi van putên ku qudreta her tiştî dibîne tîne. Bawer dike ku dê ew wî ji her tiştî rizgar bike. Dema dikeve rewşên tengav de jî ger mirov bîne bîra xwe mirovên me îro jî xwe dispêrin çi, mirovên di gavên pêşketinê yên destpêkê de jî ne zehmete ku mirov bizane dê van rêyan hilbijêrin. Ev diyardeya ku hewl didin bi lêkolînên zanistî biselmînin, di rastiyê de jiyana me wê diselmîne.

Lewma divê mirov zêde baweriya xwe bi têkîliyên mirovan ên destpêkê lewaz, nezan û di nava valahiyên mezin de neyîne. Fikra ku dibêje bingeha xwe dispêre kokên pir kevin û mîrateyên pêşiya ne û wisa nirxek mezin dayîna wan, ji hêla pratîka mirovê ku bihêz dibe ve ti aliyek wê ya cidî bê girtin tine ye. Dikare pirsa ma mirov neçare xwe wisa bixapîne bike. Dîsa dibe ku bê hizirîn heta ku mirov xwe nespêre hêzên wisa giyanwerî nikare bijî. Di serdema me ya ku pêşketinên zanistê di lutkeya xwe ya herî jorîn de ye, ji kokê ve derbaskirina pirsgirêkên mirov de ger pêşketina hovîtiya nûkleer berçavan bê girtin, her wiha heta em bibîr bînin Yekîtiya Sowyetê jî li dijî

polîtîkayên nûkleerî alîkarî ji dêrê xwest, mirov dikare bêje ku hêj mirov xwe sipartina hêzên giyanwerî derbas nekiriye. Ango tenê pêşketinên zanistî têra derbaskirina pirsgirêkên mirov ên bingehî nake. Em nikarin ji niha ve bêjin ku dê pêşketinên zanistî yên pêşerojê jî tam têra derbaskirinê bike. Baweriya me bi zanistê heye û me jî zanist hilbijartiye. Lê dîsa jî em dikarin bêjin curê mirov dikare li ser her tiştî serwer be, xwe bike xweda. Nexwe, zanist ji aliyekê ve ji bo derbaskirina lewaziyên me amûrek bingehîne, ji aliyek din ve jî amûrek selmandina lewaziyên me ye.

Hemû rêgezên mezin ên di avabûna mirovahî de, îro em bixwazin nexwazin jî dev ji me bernadin. Emperyalîzma Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê çekên nûkleer weke xwedayekî derdixe pêşberî mirovahî, nexasim Yekîtiya Sowyetê bi gefan dike bin bandora xwe û wan jî di nava nîqaşên xêra "aştî" tên meşandin de neçarî gelek tawîzan dike. Ev jî mirov dide fikirandin. Ev polîtîka raste yan na weke xalek girîng li Sowyetê jî tê nîqaşkirin. Palpişta Reagent (hêza karlêkirinê) hemû xweda û dogmayên sedî salan heye. Reagent tenê nûnertiya emperyalîzma Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê nake. Hemû hêzên xeyalî û dogmayên civaka rabirdo jî girtiye pişt xwe wisa tevdigere û ji dêrê heta mizgeftan dikev e nava hemû îbadetxaneyan hêvî ji wan dike, hewl dide wan ji nû ve jîndar bike. Ji ber vê sedem ê hêza nûnervanê sosyalîzmê xwe di tengaviyê de dibîne û rêyên lihevkirinê digere. Tişta ku li vir derdikeve holê ev e; têkoşîna sosyalîzmê bê ku hesabên van hêzan bike, dê nekare bi têkoşînek tenê li gorî pêdiviyên zanistê ve bigihe encama ku dixwaze. Ango bi vegotinek din, sosyalîzma zanistî, pêdiviya hîn zêdetir berfireh û xweser destgirtina vê derdixe holê. Bi kurtasî lewaziya mirovan a destpêkê û ji bo derbaskirina vê lewaziyê divê dogmayên heyî cidî bên girtin, lê dema ev jî tê kirin divê mirov nekeve bin serdestiya wê, berovajî vê mirov bikare bi têkoşînek watedar ve

pêşveçûnekê saz bike. Niha jî pirsgirêka herî cidî ya ku mirov rûbirû ev e. Em jî hewl didin li ser vî bingehî nêz bibin.

Me ev tev ji bo destpêkirina mijarê vegot. Dema saziya malbatê derdikeve holê, destpêkê alî wisa bi rêgezên pîroz ên destnedayî nêzî hev nebûne. Ketober, jixweber û ji ber neçarkirina xwezayê bi xerîzeyên xwe ve saziyek wisa ava kirine. Jixwe destpêkê ne gengaze ku mirov behsa saziyek malbatê jî bike. Zêdebûna mirovan, weke nêzî ya lawiran ku dişibe hev bi xerîzeyan tê meşandin. Em dizanin ku hinek xisletên vê saziyê paşê derketine holê.

Di vê qonaxa pêşketina destpêkê ya cureya mirov de jin bi hêze. Sedema vê jî, jin di xebatên hilberînê de xwedî seknek bihêz bûye. Nexasim di komkirina berhem ên weke giya û nebatan, zêdebûna kiflet û xwedîkirina zarokan û çêkirina stargehên destpêkê de jin çalake. Mirov dikare di vir de vê bêje; hêj jêhatîbûna zilam pêş neketiye, nexasim di qonaxên ku pêdivî bi hêza wî ya fîzîkî tine de, xwediya zarokan, berhemên komkirinê û karbidestiyê jine, ev jî mohra xwe li pêvajoyê dide. Ev qonaxek girînge. Weke di dogmayên olî de jî tê gotin, îdîa ku serdestiya zilam a bêsînor hêj di destpêkê ve heye û pêşketin jî girêdayî serdestiya zilam teşe girtiye ne raste û dikare yekser bê redkirin. Di olên pêşketî de pir zelale ku bendewariya jinê ya ji zilam girêdayî civaka çînayetî pêş ketiye. Ol'ên pêşketî statûya jinê pir dijwar li gorî berjew endiyên zilam erê dike. Bes ji rewşa xwedawendên ol'ên destpêkê jî fêm dibe ku, jin pêvajoyek pir bihêz jiya ye. Di olên destpêkê yên xwezayê de nirxê ku ji jinê re tê dayîn zêdetire. Di rawestgeha civaka çînayetî de dema bûyera serdestiya kesîmek pir teng li ser kesimek mirovan pêş ketiye, tê dîtin ku jin jî bi vê re di nava hev de ketiye bin bandora serdestiyê. Sedema bingehîn a di vir de rol lîstiye ji bo berheman desteser bikin, derketina dervî malê, nêçîrvanî û ji bo van tevan jî pêdiviya xebatên quwetê ye. Lê dema zilam li ser jinê serdestiya

xwe ava kir, tenê desthilatiya xwe bi hinek xisletên wî yên fîzîkî bikar ne aniye. Li gel vê çav berdaye berhema zêde ya li ser keda jinê hatiye bidestxistin. Li ser van nirxan serdestiya xwe ava kiriye. Her çendî hinek hêza fîzîkî derfet ji zilam re saz kiribe jî, wî destpêkê ev derfet qet bikar ne aniye. Ev serdestiya xwe ya fîzîkî veguherandiye quwetê, di civakek ku jin serdest de li ser nirxên ava kiriye ji bo pêkanîna mêtîngeriyê ye. Nexwe serdestiya zilam ji nêz ve girêdayî mêtîngeriyê ye. Ger zilam ji destpêkê ve, derfetên ku ji hêza fîzîkî bidest xistiye bikar baniya, diviya di serî de serdest bûya û dewsa xwe li hilberîna nirxên civakî daba. Lê wisa nake. Berovajî vê daneyên di asta civaka komînal a pêşî de ku jin lê serwer de çav dibiriqînin. Di vê pêvajoya ku pêdiviyên civatan zêde tên hilberandin de, çawa ku di nava civatan de hinek çavbirçî û fêlbazên ku bi yên rêzdarbûn bidestxistine re piranî çav diberdin hilberînên zêde, li ser keda hinek din xwe dana jiyîn û ger bi vê rêyê jî li ser civatan otorîteya xwe ser xistibin jî, lê taybet zilam, bi hêza xwe ya fîzîkî ve li ser keda jinê bûye serdest. Wer xwiya dike zilam di destpêka pêşketina civakî de ya veşartiye, derfetên ne diyarin, lê rewşên fîzîkî ne esasin derbasî meriyetê dike, hinek zilaman di bin serweriya xwe de kom dike û dest bi şerek serdestiyê dike. Ji aliyekê ve kole derdikevin holê, bi vê re jî li ser jinan serweriya xwe ya mezin saz dike. Wê demê, divê mirov bipejirîne ku bi zayîna koletiyê re serweriya wî ya li ser jinê têkilhev pêş dikeve.

Ev serdestiya ku zilam li ser jinê saz kiriye, paşê bi şêweyên cur be cur derdikeve holê. Tişta ku zilam di vê mijarê de dike bûna asta hêza otoriteyek mezine. Hêza siyasî ya bidest xistî, tîne asta rêgeza xwedayî ya ku destlênayê dayîn. Êdî şabaniyên xwedayî pir kêmin. Ên heyî jî weke mîrateyên olên xwezayî ne. Şahên xwedayî jî nûnerên otorîteya bê nîqaşin. Mirov di radeyek mezin de dixin kole, jin jî di astek girîng de otorîte û rêzdarbûna xwe ya berê winda dike. Jin jî, di qonaxa destpêka pêşketina

mirovahiyê de hêj kesayeta xwe nedîtî rewşek ketina bin serweriyê dijî. Çawa ku gel’ên paşve mayî hêza pêşketina azad ne jiyayîn dikevin bin koletiyek pir giran û dikevin rewşek pir xirab û bê kesayet, ev hîn zêdetir ji bo jinê derbasdar dibe. Jina ku hêj di destpêka pêşketina kesayetî de bi serdestiyek mezin re rûbirû dimîne, xwe winda dike. Ev jî tê wateya windakirina azadiya xwe. Elbet di pêvajoyên pey wê re jî jin pêş ketiye, di her qonaxên girîng ên dîrokê de jin bi şêweyên cur be cur ên weke kesayet, têkoşîn, rol û statûya xwe ve derketiye holê, lê dîsa jî rastiyek heye ku, jin di vir de hatiye windakirin.

Jina hatî windakirin, gelo dê ji vir û şûn de çawa bê pênasekirin? Pênaseya jina ji vir û şûn derdikeve holê, di xebatên weke ol’an, huner, helbest, klam û siyasî de pêş dikevin. Lê di hemûyan de jî yek xislet heye, jin di yek ji wan de jî ne kesayetek bi istîkrar a teşe girtiye. Zêdetir xala xemilandinê li pêşe. Ger mirov hinek din bi teşe bike, jin di xistina civakê de weke fêlbazî, dek û dolap çiqas xal hebin di pêşxistina wan de bi dîmenek pir sexte ve derdikeve holê. Jin êdî di pêşketina mijarên erênî de pir lewaze û beşdarbûna wê sînordare. Divê mirov sedema vê jî di serdestiya ku zilam ava kirî de bigere. Dema zilam serdestiya xwe saz kir û ev gihand statûyek çînayetî, serdestiya wî ya bêsînor li ser jinê meşandî bûye diyardeyek ku hêza wî ya mêtîngerî hîn zêde bibe. Ango ji mêtîngerî û çewsîneriya zêdetir, jin heyberek başe.

Jin û zilam di nava xwezayê de yekbûnê ava dikin. Ev li hember hêzên xwezayî û di pêvajoyên pêşketinên civakî de du kesên ku dixwazin her tiştî bi hevbeş ava bikin. Lewma yeqîn dikim nêrîna ku dibêje nikarin mêtîngerî û çewsîneriyek wisa li ser hev ava bikin, dê nêrînek nezantî be. Ferdê mirovê ku bi giştî ji civaka îlkel nû derketiye, taybet jî hovbûna zilam pêwîstiya gera wijdan ji holê radike. Di vê qonaxa ku zêdetir sehek li pêşin, de qanûna diyarker mirov pir hêsan dikare bêje ku qanuna zorê

ye. Yên ku bask û rêxistinbûna wan bihêze serdestiya wan a li ser çi çînayetî dibe çi jî li ser zayendan dibe bêsînore. Vebûna têkîliyên beramberî hev ên wekhevî tenê di roja me de pêş ketiye. Lê di vê qonaxa pêşî de neçare ku zext bêsînor be. Dema mirov zext û mêtîngeriya li ser koleyan dinêre, dibîne ku divê zexta li ser jinê zêdetir be. Bes divê mirov vê jî bi serve bike, bê ku di nava cewaziya çînayetî bê destgirtin, bi gelemperî gotina jin zayendek bindeste jî ne raste. Dema çîna serdest derket holê, tê zanîn ku jinên began û zarokên wan di statûyek pêşdetir de ne. Li hember jinên jêr de ku ji her mafî mehrûmin, li jor jî jinên ku her tiştê wan pir erzan tên pêşwazîkirin hene. Lê belê ger wisa jî be, ji ber statûya serdestî di destê zilam de ye dixwazî bila jin di qesran de be, yan jî di govan de be, zayendek ku her tim tê xistine. Ji ber vê sedemê ye ku em pirsgirêkê tenê weke bûyerek çînayetî nagirin dest.

Çawa ku nêzîkbûna herî rast serdestiya li ser zayendekî bi serdestiya li ser çînekî hatiye sazkirin ve têkilhev girtina deste, bi heman şêweyî divê mirov van bi mantiqek mekanîk ve jî têkilhev neke. Divê mirov bi qasî ku di astek pir dijwar de windakirina zayendekê re çînek di bin mêtîngeriyê de çawa têkilheve bibîne, divê ewqas jî cewaziya wan jî dane holê. Ber bi civaka feodal ve ev cewazî hîn zêdetir zelal dibin. Qonaxa ku jin di olî, siyasî, çandî û her astê de xwe digihîne di vê mijarê de ecêbtire. Her çendî hinek dîmenên çors hebin jî, encamên bindestkirina jinê hîn diyarkere. Dema mirov li dîroka Îslamiyetê dinêre, ev zelaltir diyar dibe. Îslamiyet li dijî çalekiya qabîleyên çolê yên di astek herî pêş de zarokên keç zindî binax dikin derdikeve, ji bo pêşketina mirovahî gavek pêşveçûyî davêje. Şoreşa Hz. Muhemmed lenetkirina zindî binaxkirina zarokên keçe, sînordarkirina mafê zewacên pir jinî –lê hejmara cariyan ne diyare- ye. Dibe ku ev statû îro pir şaş bê dîtin, bes li gorî wan deman pêşveçûnek pir girînge. Elbet ev di şoreşên din de jî wisa

ye. Ya rastî di bin zextê de girtin gihaye astek wisa, heta ku otorîteya kesekî –zilam- evqasî bêsînor dibe, weke heyberekî yên di bin serdestiya xwe de –jinê – dikare wisa zindî binax bike xwedî exlaqêkê ye.

Ev rewş çawa derket holê?

Yeqîn dikim ji ber mezinbûna mêtîngerî û zexta bêsînore. Nexwe weke ku windakirina jinê ne tenê gotineke, ji gelek hêmanan ve ye. Jixwe harem ên –odeya pir jinên şahan- di qesran de hatine sazkirin tê zanîn. Heta duh jî haremên qesrên Osmaniyan bi hezaran jinan dihatin dagirtin. Jin di serdema navîn de "tine" ye. Ew tenê heyberek tê revandin û di qesran de tê girtine. Dibe mirov dek û dolabên ku jin di nava qesran de dimeşînin bibîr bixe û pirsa ma qey girîngiya vê tine ye bike. Ji bo vê mînaka diyarker, dek û dolabên ku şahbanoyan di qesrên Bîzans'a de meşandine. Wan di vê mijarê de bi vê jêhatiya xwe ve hêzek mezin bidest xistine. Dîsa Haremên Îslamê jî mînakên wisa ne. Siltanên di qesrên Osmaniyan de dek û dolabên baş kirine. Bes ev hemû jî ji bo xemlek çavgirtinê wêdetir ne titişt bû. Wan ev tenê di saziyên ku pir giran di bin bandora zilam de mane ji bo dek û dolaban bikar aniye. Nexwe ne ji bo kesayet û hêza xwe diyar bike, ev weke sazî pêşxistine. Jinên ku ev jêhatî di qesran de bidest xistine, zêdetir ji bo zarokên xort bikar anine. Bûyerên di qesrên Selçûk'î û Osmanî'yan de ji bo zaroka jinê hêj di temenek biçûk de bibe şah, gelek zewacên sexte dike. Piraniya van zewacan heta mezinbûna zarok didome. Di vir de jî jin rola dayîktiyê dilîze. Ango rola xwe ya dayîktî di qada siyasî de dide der. Xisletek berbiçav a serdema navîn jî, zewacên wisa yên bi dek û dolabên cur be cur hatine meşandin. Gelek bûyerên zewacên wisa hene.

Di serdema navîn de zewac, misoger ji bo serweriya siyasî ya zilam xurt bibe hatiye bikaranîn. Zilam jî weke amûra bihêzkirina zext û mêtîngeriya çînî li zewacê nêriye. Divê mirov

di avakirina malbatan de vê bibîne. Malbat, di nava dijwariya zext û mêtîngeriyê de ava bûye. Pêvajoya ji malbata dayîksalarî derbasî malbata baviksalarî dibe, xala ku berçav tê girtin hilberîna zêde û zilam gihandina desthilatiyek berfirehtire. Ango malbat, bi rêgezên pîroz, ol'î yan jî evînî nehatiye sazkirin, misoger di nava sînorên hatî destnîşankirin de teşe girtiye. Ne ku ji ber fermana xweda ye û ne jî pêwîstiyek rêgeza evînê ya berze, malbat weke hatiye diyarkirin, misoger di çarçoveyek berjew endiyên serdestiya zilam ên çors û hovane de pêş ketiye.

Jin destpêkê dikariya hejmarek zêde zilaman re bijî, lê niha zilam bi hejmarek zêde jin re dijîn. Ev jî pir vekiriye ku rastiyek bi pêvajoyên pêşketina civakî ve girêdayî ye. Weke tê dîtin, malbat ji destpêkê ve ne pêwendiyek bi rêgezên pîroz ve gihayî ye ku dest lê neyê dayîn. Dikare weke mijarek ku li gorî rewşa di nava pêşketinên çînayetî de hatiye diyarkirin bê nirxandin. Dema di destpêka vê de diyarkera vê jin bûye, paşê bûye zilam. Ecêba herî girîng a di serdema navîn de jî, di şerên xanedanî yan jî împaratorî de gelek caran ji vê saziyê sûd hatiye wergirtin. Xanedan tên pevgihandin, dema şahbûn tê mezinkirin hevpeyman jî li ser bingeha dayîn û sitandina jinê tên sazkirin. Hevpeymanên li ser bingeha dayîn û sitandina keçan hatine sazkirin, ji ber mêtîngerî û hêzdarbûn xurt kiriye, ev bi vê rewşê ve hêj zêdetir tê pêşxistin. Weke tê zanîn şêwaza têkîliya ku îro herî zêde ji aliyê qabîle û eşîretên li Kurdistanê ve esas tê girtin ev e.

Çi di nava serdema koletî çi jî ya feodalî de dibe mirov nikare behsa çalekiyek ji bo jinê bike. Berovajî vê rewşek windakirin, kûrbûna bêteşebûnê û tinebûna hinek serfiraziyên ku di pêşî de heyî jî tê jiyîn. Jina ku ji hêla çîna serdest ve ketiye haremê di nava pêwendiyên her du civakan de jî di nava dîlbûnek hejar de tê girtin, ji kesayeta wê pir tê dûrxistin, terkî karên herî hêsan hatiye kirin, çawa di nava civaka çînayetî de bindest ji

sermayê hatibin dûrxistin, jin jî bi heman şêweyî ji sermaye, otorîta siyasî û karbidestiyê hatiye dûrxistin. Elbet ev dûrxistin ji her cure saziyên xebatên civakî pêk hatiye. Jina ku di nava qesr û malê de zêdetir hatiye girtin, piranî bi karên ne karbidest ve hatiye girêdan, pîvana qîmeta wê jî bi zarokên welidandî û mezinkirî ve diyar bûye. Çiqas kariye di nava malê de weke xemleke baş be û baş xwarinê çêke, karên wisa ve mijûl bibe, hingê behsa hebûna wê tê kirin. Cîhanek mezin a siyasî, sermaye û serdestiya li ser nirxan bi temamî rengê zilam teşe digire. Jin jî, bi destwerdana zilam a bi zanebûn ve di nava pêşketinên têkilhev ên xweber de zêdetir ji van tê dûrxistin. Her ku ji destê wan tê ber bi sînorên jêrîn ên civakê ve tê dehfdan. Bi dehfdanek bêsînor ve bi qasî dikarin ji zanistî, siyaset, hilberîn û heta xebatên ol'î tê dûrxistin. Windakirina jinê yan jî lewazbûna wê ya di nava pêşketina civakî de, dûrkirina wê ya ji mafan, wisa teşe girtiye. Elbet zagonek vê nîne. Zagona vê rehma zilam an jî qanûnên mêtîngeriyê ye. Bi heman şêweyî di nava zagonên civaka çînayetî yên pey wê de jî tine ye. Tişta pêş dikeve sînor, mêtîngeriya zêdetirîn, otorîteya zêdetirîn, heta dema hewce kir ji bo vê bê ku ti sedem bên destnîşankirin dawî li jiyana mirovan anîn û fêrkirina karê herî zehmete. Mirov bê ku hevjîn û xizman berçav bigirin li ser bingeha girêdana vî armancî giştî dikevin nava statûyekê. Bi rastî jî divê dîroka vê pir baş bê lêkolînkirin.

Îro li Kurdistanê jin hêza xwe ya axaftinê bikar bîne, di diyarkirina otorîteya mezin a weke otorîteya siyasî de li gel vê dev jê berde hewldana wê bi şêweyek zanebûn pêş bikeve, ne gengaze ku wêrektiya van jî diyar bike. Her çendî ne di heman giraniyê de be, di rastiyê de li hemû qadên ku ev têkîliyên mêtîngerî lê tên jiyîn derbasdare. Di roja me ya niha de her çendî jin di nava xebatên siyasî de cîh digire, heta dikarin bibin serokwezîr jî, di rastiyê de kirasek ji bowê hatiye dirûtin derbas nake. Mînak serokwezîra Îngilîz Margaret Thatcher bi navê

"Demir Leydi" ji zilamên bê esil zêdetir gelo ji polîtîkayek zilamtî xirabtir sepandinê wêdetir çi dike? Ew amûrek dewletê ya ji sedî salan ve hatiye rûniştin û îro emperyalîzm jî dixwaze bi şêweyek herî xeter bikar bîne bi rêbazek dijberî xisletên jinê bikaranînê zêdetir tiştekê nake. Her çendî Şahbanoya Îngilîz weke piştevana jinê bê dîtin jî, rola wê ya bêteşebûna jinê de pir vekiriye. Ziraviya Îngilîz a ku ji ya tê dîtin zêdetir bêhna jinwariyê jê tê, îro zêde tiştekê pêşkêşî jinê nake. Zanebûna di bin nêzîkbûna Îngilîz de bi Thatcher re xwe gihandiye lutkeyê. Li vir şêweya herî pêşketî ya dek û dolabên qesrê xwe gihandiyê û jina ku derketî holê jî ji bilî jina nehîmdar a burjuva wêdetir ne tişteke. Li qesra Amman'ê jî şahbanoyek eslê wê Îngilîz heye. Yeqîn dikim hinekê jî Şah Huseyîn fêrî xweşmêriya Îngilîz kirine. Heta qesrên Ereban bi vî rengî pêşxistina çanda Şah û Şahbanoyan, rastiya ku jina Îngilîz çiqas pêşve çûye dide diyarkirin! Li vir xirabûna jinê tê rapêçan û diyar dibe ku kirasek çiqas sexte hatiye berkirin.

Wê demê, ber bi berbanga şoreşên burjuva ve jin ji bilî bûna dek û dolabên xirab wêdetir pêşve neçûye. Di jêr de tam bûye sermayek kirîn û firotinê, di jor de jî tam Şahbano ye! Jinên ku weke otorîte mînak tên nîşandan, belê ev jinên qesran ên bibin mijarên komediyê ne. Jixwe hewce nake ku di vê mijarê de Ewrûpa mînak bê dayîn. Entrîkayên di qesrên Osmaniyan de mînakên herî nêz û zindî ne. Dema ku em bi serdema me ve tên ya girîng mirov di zanebûna vê rastiyê de be. Dema nêrîn tên kûrkirin, divê bi van pêşketinên dîrokî ve bêne destgirtin.

Gelo şoreşên burjuva di vê mijarê de çi pêşve birine? Ji ber ku her şoreşa civakî eslê mirov gavek din pêşve dibe, li gorî feodalîzmê kapîtalîzm, li gorî malbata feodalî jî malbata burjuva pêşketîtire. Lewra li gorî jina di civaka feodal de jina burjuva pêşketîtire. Girêdayî vê rêgeza giştî di wexta berbanga kapîtalîzmê de temaya hatî bikaranîn jî jine. Burjuvajî hewl dide jina ku dixwaze di teorî û pratîkê de bi teşe bike, jin dibe mijara

wêneyan, eserên hunerî û jiyana rojane. Di destê wî zilamê ku ji şêwaza têkîliyên feodalî têr bûyî de, ji cil û ber, por, heta şêwaza axaftina wê jinek nû tê avakirin. Elbet tişta di vir de rol dilîze ne tenê bêzarî ye. Ji ber ku têkîliyên malbat û xanedanên feodalî li hember pêşketina burjuva astegiyê çêdikin. Lewra burjuvazî jî, neçare ku li dijî têkîliyên feodalî yên pêşiya pêşketina civaka nû de şerekê bide destpêkirin. Destpêkê de ev şer bi rastî jî di qada wêje û hunerê de pir xurt tê meşandin. Bi gelemperî ev şer bi teoriyên mafên mirovan û wekheviya di navbera kesan de hat meşandin, xalek vê jî veguherî maf û wekheviya jinê. Bes ne wekheviyek jinê ya giştî bû, azadiya malbata burjuva ya zêde destûra jiyana wê tine bû. Lewma divê çewtiyên di vê xalê de hatine kirin neyên paşguhkirin. Di berbanga civaka burjuva ya pêngavên xurt ên wêje û hunerê de mijara herî diyarker jine. Tîpa ku di van romanan de tê diyarkirin, hinekê jî tîpa ku li ser vîna xwe serwere û weke ku di asta pêkanîna daxwazên xwe de ye. Li ber çavan jin, ji heyberek hêsan zêdetir bûye hebûnek ku vîna wê heye, dikare li gor daxwazên xwe malbat saz bike û nêz bibe. Civaka Rojavayî (Ewrûpa) hinekê jî li ser van hatiye damezirandin. Lê divê mirov bal bidiyê, tevlîbûna jinê ya ji vê pêvajoyê re, nekariye ji tevlîbûnek helbestvanî derbas bike. Misoger serdestiya zilam dide jiyîn, di bin statûya ku bi dewsa wî hatiye diyarkirin ve tevlîbûnek li gorî romantîzma zilam guncav çêdibe. Di nava şoreşên burjuva de xebatên jinê yên berfireh nayên dîtin. Her çendî di van pêvajoyan de hinek tîpên jin derketibin holê jî, tenê remz bûn. Tevlîbûna jinê ya ji şoreşên burjuva re, di çarçoveya xeta ku zilam di civaka nû de ji bo jinê dayî diyarkirin çêbûye.

Mijarek ku hêjî di gelemperiya cîhanê de tê nîqaşkirin yek jê mafê jinê ye. Ev mijar pir hûrûkûr li Tirkiyê jî tê nîqaşkirin. Lê di rastiyê de jî têkîliyên girêdayî vînên yek alî hene. Di civaka burjuva de yê ku “bi navê jinê” ala têkoşînê

hildayî zilame. Sedema vê jî, ji ber ku li pêş malbata eslî ya ku dixwaze nêz bibê têkîlî û kevneşopiyên feodalî dibin astengî ne. Jixwe li Tirkiyê jî Kemalîzmê bi navê hemû jinan al hildaye û behsa mafê hemûyan kiriye. Elbet di kapîtalîzmê de jin hinekê pêşve çûye û rêzdarî bidest xistiye. Bes bi qasî mirov bêje qet tine ye di nava xebatên civakî û siyasî de kême. Ew ne bi serê xwe ye, ancex dikare bi zilamê xwe re hebe. Jixwe jina ku tenê dikare bi zilamê xwe re hebe jî çiqas xwedî vîne divê bê nîqaşkirin. Di nava civakên herî pêşketî de jî hêjî xwe dispêre saziyekê yan jî serdestiya zilam, an jî ancex dikare di bin serdestiyê de bimeşe. Sedema vê jî hêj hêza wê ya jiyanê tine ye. Ev di civaka me de bi şêweyek hêj girantir tê jiyîn. Di civaka me de derketina jinê ya derve hêjî bi destûrê dibe. Heta ku serdestiya zilam nebe, nikare beşdarî ti xebatî bibe, plan û pêşnûmeyan pêş bixe, ji ber ku pir ecêbe.

Îro di civaka burjuva de jin, dervî hilberîna cidî û pêwendiyên siyasî weke amûrek reklamê di pir karan de cîh digire. Di nava xebatên moda, pêwendiyên lîstokan û fantaziyan de serwera vê qadê teqez jine. Burjuvaziyê cîhanek jinê ya berfireh saz kiriye û her kes jî li gorî vê hatiye amadekirin. Mijara ku ev cîhan çiqas a jinê ye di rastiyê de qet ne diyare. Ya rastî jin bi şêweyek pir ecêb tê bikaranîn. Statûyek nû ji jinê re hatiye dayîn. Ev xal di çanda Holywood a Emerîka de di lutkeya herî jorîn de tê jiyîn. Li Emerîka û bi gelemperî Rojava bi şêweyek herî xirabker dijî û di şêwazek herî xeternak de tê bikaranîn.

Bêguman, pêşveçûnek jixweber ji civaka feodal ber bi civaka burjuva de saz kirî heye. Lê ev, pêşketinek girêdayî şêweya civaka burjuva ya hegemonya zilame. Di van pêşketinên ku di çarçoveya şertên ku malbata burjuva li dijî malbata feodal hatine diyarkirin de, jinê asta heyberbûnê pir kêm derbas kiriye. Proleterya di dawiya sedsala 19. de li şûna çînek jixweber ji boxwe bûye çînek, lê mixabin ji bo jinê ev pêşketin nehatiye

jiyîn. Dema gihiştina qonaxa Kapîtalîst-emperyalîzmê de guhertina ku jinê jiyan kiriye jî pir ecêbe.

Ji ber ku em di binyata civakbûna ku di bin mêtîngeriyek giran de zêde bê şêwe, parçebûyî, feodal û heta ji wê jî wêdetir mîrateyên civakî hebûna xwe didomînin de di bin zext û mêtîngeriyek giran a kapîtalîstbûnê de dijîn, dibe ku em van mijaran zêde girîng nebînin an jî fêm nekin. Lê divê ev baş bê zanîn, di civakên pêşketî yên kapîtalîzmê de rola ku îro jin dilîze pir xetere. Derdorên emperyal jî li dora vê mijarê di çand û polîtîkayê de bûyerek nû pêş dixin.

Jin ji sedî salan ve mehkumê tarîtî û dîlbûnê kirine, tenê di qesran de nehatiye dîlgirtin û ji çalekgeriyên civakî nehatiye dûrxistin, di heman demê de ji hêla ruhî ve jî di tarîtiyê de hatiye hiştin û hebûnek hatiye windakirine. Îdeolog, derdorên hunerkar û polîtîkvanên roja me yên kapîtalîzmê, vê baş dizanin. Ev vê carê jî jina ku ji sedî salan ve di bin serdestiya zilam de ji civakê hatiye dûrxistin berovajî dikin, bê esil derdixin pêş, ji wê jî wêdetir bi şêweya ku xizmeta çerxa mêtîngeriya emperyalîzmê bike, nexasim ji bo veşartina têkoşîna çînayetî sûd ji jinê werdigire. Di serdema azadiyên burjuva de ew nirxa biçûk a ji jinê re hatiye dayîn çil qetî zêdetir berdêla wê jê tê girtin, jina ku dixwaze hinekê vîna xwe jî diyar bike li dijî sosyalîzmê dikişînin nava lîstokek mezin. Îro li Ewrûpa jin di nava lîstokên muzîk, wêne, çand û polîtîkayê de heta gelek lîstokên din de di her tiştî de bi şêweyek pir zirav tê bikaranîn. Jina ku ji sedî salan ve xwe veşartiye, êdî li wir jina herî vekirî û tazî tê veguhertin. Ev vebûn ne tenê ji hêla fîzîkî ve ye. Xerîze û ruhê ku pêşî hatiye dîlgirtin tê vekirin û li meydanan pêşkêş dikin. Em baş nizanin tevgera femînîst van rewşan tevan çawa dinirxîne. Lê yeqîn dikim derdorên Rojavayî Ewrûpa jî di ferqa vê de ne. Vê nêzîkbûnê malbata biçûk parçe kiriye, bêwatebûna malbatê derxistiye holê.

Ev malbata ku di guman û dudiliyê de fetisî bi temamî belavbûnê re rûbirû ye.

Dema ev tê nirxandin, ew di nava bûhrana giştî ya emperyalîzmê de weke bûyerek asayî girtina dest dê nêzîkbûnek ne rast be. Ji ber bûhrana di vê qadê de tê jiyîn zêdetire. Berhemên ku pergala kapîtalîst-emperyalîst derdixin holê ne tenê civaka wan, bi şêweyek pir xirab li ferdên welatên weke me jî dikeve. Her wiha ne pejirandin, ne jî berteka li dijî vê tîpa ku derdikeve holê çareserî ye. Jin weke ku tolê ji sedî salan bigire hem pir baş dilîze, hem jî didin lîstin. Jin bi vê rewşa xwe ve, bi rastî jî weke ku tola xwe radike. Jixwe ne diyare ku zilam vê rewşa jinê ya li sûkê çiqasî parve dikin.

Di roja me ya niha de sektorek mezin a jinê derketiye holê. Jina ku berê mijara mal û milkê bû, îro bûye amûrek mezin a reklamê û nebatek xemlê. Vînek wê bi xwe tine ye. Ne gengaze ku mohra xwe li hemû meseleyên bingehîn ên civakê bixe û bibe xwedî mafê axaftinê. Mînak di lîstokên mijarên şer û aştiyê de çiqas nirxa jinê heye? Gelo di planên nav-netewî yan jî netewî de di kîjan çareseriyên girîng de jin weke hebûn tê diyarkirin? Dikare bê gotin, jin jî bi malbata xwe re beşdar dibe. Vêca ya girîng ew e ku dema em li malbata eslî dinêrin gelo jin di wir de çiqas diyarkere? Ma mirov dikare bêje ji destpêkê ve wisa ye, dê îro jî wisa be, lewma divê ecêb neyê dîtin? Na, ev nêzîkbûnek pir şaşe.

Em nikarin bûyerên zext û mêtîngeriyên li ser zayenda jinê ji pêşketinên din ên cîhana me cuda bihizirin. Rewşa jinê ya di nava pergala kapîtalîst-emperyalîst de û nêzîkbûnên serwer, gelo dibe ku çavkaniya gelek şeran be yan jî qet nebê sedema pêşketina zext û mêtîngeriya bêsînore? Tê zanîn ku, zext û mêtîngerî sedema şerane. Lewra dibe ku ev rewş di pêşketina şeran de rolek diyarker bilîze. Nexwe li vir rewşek gef li civakê dixwe heye. Çavkaniyek bingehîn ên behsa van hebûna tê kirin jî

ev e. Ango ev statûya giştî ya ku weke destlê nayê dayîn ji sedî salan ve bi fêrbûnên kevneşopiyan ve dimeşe, îro ji bo civak ji her hêlê ve bigihe xweşiyê dibe ku astengiyek cidî be. Berê dihat gotin ku çavkaniya mîrateyên feodalî, her cure paşverûtî, zext û mêtîngerî, her wiha şerane. Lê mixabin niha statûya jinan a îro nebê çavkaniya bingehîn a bûhran, ji rê derketina qadên exlaqî, siyasî û çandî be. Ger bixwazin hinek din zêdegavî bikin, li gorî me rewşa jin dijî yek jê çavkaniya bingehîn a gelek xirabûna ne. Elbet şaristaniyek ku aliyek wê lewaz hatiye sazkirin dê seqet be. Ne gengaze ku şaristaniyek wisa bê parastin.

Ev pirsgirêk ji vê hêle ve zêde nayê şîrovekirin. Her zilam, aliyek ji halê xwe razî ye. Li gorî otorîte ya wî ye, malbatê jî hinekê li gorî xwe teşe dike, elbet nayê payîn ku dest li bingeha xwe bide û binê xwe bikole. Elbet wê ew bi çavkaniyên xwe yên hêzê nelîze. Wê demê, qet hewce nake ku bûyerên din bîne serê zilam! Li gorî ku jin vê statûyê xwezayî dibîne, tişta para wê jî dikeve bi ser vê de meşîne.

Ji hêla din ve bûyerek girîng heye. Talana mêtîngerî û emperyalîst rê ji şerê cîhanê yên yekemîn û duyem re vekir. Niha jî talankirinek jinê li holê heye. Dibe ku ev ji şerek cîhanê ya nû re rê veneke, bes di roja me de mirov dikare bi rehetî bêje ku çavkaniya şerên li gelek eniyan tê meşandine. Ev bûhrana di nav malbatê de, rezaleta li kolanan, kûrbûna bê exlaqî, dijwarbûna mêtîngerî û her cure şerê kesî yên roja ne ye... Mirov nikare bêje ku ev rewş ji şerên cîhanê kêmtir mirovan bandor dike. Hinekê jî divê çavkaniya acizbûn, hişkbûn an jî nerimbûnê, bûhrana bi her cureyî tê jiyîn di vir de bê gerîn.

Em ê pirsgirêkê di nava çarçoveyên heyî de negirin dest. Ji ber ku em di vir de çareserî nabînin. Mînak li Tirkiyê jî bi mafên jinê re eleqeder dibin, hewl didin xwe bigihînin şêweya di civakên burjuva de. Gelo em jî dikarin heman rêbazî bişopînin, di wir de çareseriyê bigerin? Li gorî me ev jî rêya ku qet neyê

hilbijartine. Ji ber ku ew bûhrana herî mezin vê rewşê di nava xwe de dijîn. Bi heman şêweyî li hemû qadên Rojavayê Ewrûpa di nava bûhranekê de ne. Saziya malbatê bûye belaya serê wan. Tevî ku xwedî derfetên aborî yên mezinin û jin jî zêde pêşve çûye, nekarîne xwe ji bêçaretiyê rizgar bikin. Cihên ku herî zêde xwekuştin tê jiyîn, di serî de Siwêd û ev welatin. Ji ber heman sedeman di civakên sosyalîst de jî gengeşeyên mezin tên jiyîn. Nexwe pirsgirêk xwe dide berdewamkirin.

Gelo civaka sosyalîst di kîjan astê de çareserî ava kiriye?

Tê zanîn, civakên sosyalîst û şoreşên sosyalîst weke berdewamiya şoreşên burjuva derketine holê. Şoreşên proleterya, bi navê çînên mêtîngerî û bi beşdarbûna wan a xurt ve li gorî şoreşên pêkhatî ne, neçare kesîma ku herî zêde bindeste jinê jî di berfirehiyek asta pêş de bigire dest. Ji ber ku kesîma herî zêde ji van şoreşan sûdwerdigirin jinin. Çi ji xweber çi jî bi zanebûn jî be ev wisa ye. Rastiya jina ku tişta hêvî kirî di civaka burjuva de ne dîtî, ji bobikaribe ji bin zexta kûr derbikeve bi çalek tevlî vê xebatê dibe. Tevlîbûna jinê ya ji şoreşa Bolşewîk a Sowyetê re pir diyarkere. Di nava gelek tevgerên şoreşê yên roja me de, tevlîbûna jinê ya bi zanebûn û rêxistinkirî tê dîtin. Lê em yekser bêjin, ev tevlîbûn cardin weke parçeyek stratejîk a giştî pêş dikeve. Ango ne tevlîbûnek lêkolînkirina pirsgirêkên xweser ên jinê û gihandina bernameyek xwesere. Elbet ev tevlîbûn li gorî berjiwendiya giştî ye, lê têrê nake.

Ji mamosteyên sosyalîzmê Marx, diyarkirina radeya azadiya civakê bi gelemperî bi radeya azadiya jinê ve girê daye. Lenîn jî gotiye ku xebatên şoreşgerî yên jin tevlî nebin ser nakevin. Dahûrandina windabûna jinê jî Engels pênase kiriye. Lê tevî van şîroveyên di asta rêgez de hatine kirin, mirov dikare bêje ku di derbarê pirsgirêka wekhevî û azadiya jinê de bername nehatiye sazkirin, di nava xweseriya xwe de negihaye rêxistinbûn û têkoşînek tam. Tişta di nava tevgera jinê de ya herî zêde hatiye

dîtin ji xweberbûne. Hinek rêxistinbûnên jin tên sazkirin, hinek rêberên jin jî derdikevin, lê ev ne parçeyek nêzîkbûnek stratejîk ên çareseriyek bingehîn a pirsgirêkê ji xwe re dikin hedef, ev weke pêvekek stratejiya giştî tên pêşxistin. Lewra di civaka sosyalîst de jinên di roja me de her çendî gavek pêşveçûyî bavêjin jî, weke di destkeftiyên ji xweber de diyar dibe hêj bingeha bûhrana heyî nehatiye kolan. Bêguman di serî de Yekîtiya Sowyetan, di civakên sosyalîst de jin, bi derbaskirina rewşa pûçbûna fîzîkî ya ku ji sedî salan ve tê jiyîn ve rûbirû ye, ber bi fîzîkek pêşketî ve diçe. Beşdarî xebatên hilberîn, siyaset, civak û çandî dibe. Civaka sosyalîst ji boji wê re kar bibîne heta dawî çarçoveyek azad ava kiriye. Lê ji ber ku jin weke zayend, hinde paşketî û di civakê de ji hêla zilam ve pir xurt tê reşkirin, bikaranîna mafên hatine bidestxistin jî pir kême û mirov nikare bêje beşdarbûn tam ber bi encamek şoreşî ve dibe.

Tê îdîakirin ku, bi qasî ku şoreş veguhertina civakî pêk bîne, dê veguhertina jinê jî pêk were. Ev her tim wisa hatiye nivîsandin û wisa hatiye nirxandin. Lê mixabin ji ber vê mohra ji xweberbûnê girtiye, encama ku dixwaze jî nade. Mînak, li Sowyetan û welatên sosyalîst ên din ji pirsa çend serokên dewletê, çend serokwezîr, çend wezîr jinin re bê dayîn dê çibe? Rêjeya jinên ku di qonaxên girîng ên polîtîkaya derve û hundur de cîh digirin ji sedî pênc derbas nakin. Ev jî dide diyarkirin ku bandora newekheviyek pir mezin a tê jiyîne. Dikare bê gotin di sosyalîzmê de peywir girtin bi dilxwazî dibe, kesên jêhatî ne çi jin çi jî zilam dibe dikarin van peywiran bigirin û ger di van peywiran de zilam zêde bin jî ji ber ku hîn zêdetir karbidestin lewma wisa ye. Rastî jî ev e. Ancex di vir de zilamên ku ji ber jêhatiyên xwe cihên girîng di dest de digirin, divê neyê ji bîrkirin ji ber zilamê ku ji sedî salan ve jêhatiya zilam serdest kiriye. Vêca ne gengaze ku mirov bêje; “Kesê di sosyalîzmê de pir kar bike dê pir ser bixe, yê pir bihizire dê pir kar bike” û xwe ji nav vê mijarê

derbixe. Ev encama mîrateyên new ekheviyek berfirehe. Her çendî ji xweber jî be rola ku ji jinê re hatiye dayîn, zêdetir hinek qadin. Di xebatên wêje û hunerê de hinek din zêdetir pêşve çûye. Lê di karên weke siyaset û plansaziyên cidî de hêj lewaze. Ev jî rastiyeke. Ev jî herî zêdetir xwe di mijara malbatê de derdixe holê. Wê demê ger mirov bêje pirsgirêk di nava civakên sosyalîst ên heyî de ji bingeh ve çareser bûye, yan jî çareserî bi pêvajoya pêşketina giştî a civaka sosyalîst ve girêdan, em ê çavê xwe ji yek çavkaniyên xirabiyên di civakên heyî re bigirin. Lewma wê di çareseriyên giştî yên pirsgirêkên civakî de xetimandinekê re rûbirû mayîn çêbe.

Dê îro mafên jinê li gelek welatên sosyalîst û gelek welatên cîhanê bê nîqaşkirin. Bes wê ev çiqasî bikarin şêweyên nîqaşên kevnar ên fêr bûne derbas bikin û bikarin nêzî rastiya cewhera wê bibin? Heta niha ji bilî şêweya fantazî ti nîqaş li ser mafên jinê çênebûne. Em nikarin bi temamî înkar bikin, lê ne gengaze ku mirov kevneşopiyên di nêzîkbûnan de nebîne. Di nava 365 rojên salê de rojek taybet wisa û cuda di bin vî navî de diyarkirin, derdixe holê ku ev jî berhemek fantazî ye. Em jî yeqîn dikin ku divê li şûna vê di xêra maf û pêşketina jinê de têkoşînek domdar esas bê girtin. Gelek rojên di demên dawî de Netewên Yekbûyî îlana wan kirî heye. Dîsa navê hinek salan diyarkirin. Lê sala ku bi navê sala Aştî hatiye destnîşankirin jî, bûye sala herî zêde şer meşandin, sala ciwanan hatî destnîşankirin jî, bûye sala tenê nixwumandina pirsgirêkên ciwanan. An jî ti ferqa van salan ji salên din cuda çênebûye. Lê ji ber ku rojek wisa hatiye destnîşankirin, divê mirov rojaneya wê jî berçav bigire.

Şoreşên ku li dijî emperyalîzmê têne pêşxistin, bi şerên ku di roja me de hemwext li gelek qadan tên meşandin ve pêş dikeve. Şerên leşkerî yên kombûna raveya siyasî ne, weke polîtîkayên aştiyê, şerên çandî, şerên ku di nava malbatê de tên meşandin jî parçeyek girîng ên vî şerê giştî ne. Ger em ê şeran

tenê weke şerê beramberî hev ên artêş hev dikujin fêm nekin, em ê bizanin şerê herî mezin a di nava civaka mirovan de yek jê jî şerê hişmendî ye. Her wiha divê şerê di nava malbatan de jî neyê paşguhkirin. Ji her cure saziyên civakî û siyasetê derkirina jinê, di pirsgirêkên herî girîng de tinebûna mafê gotinê, ger ne encama xwepêşandanek vîna xwedayî be, encama şerê civakî ya pir dijware. Nexwe divê bê ku ser bê girtin, çep û rast bikeve li xwe mikurbûnek hebe, ku di vir de jî şerek heye. Lê ji ber ku di vî şerî de aliyê xurt zilame, pîvan, qural û şêweya meşandina vî şerî jî zilam diyar dike. Bal bidinê aliyê ku di feraseta jina tê pejirandin de dilîze jî her tim zilame, ya bikartînin jî jine. Jina ku aliyek şere, weke zayendek ku divê di bin kontrolê de bê girtin, kêr nayê, bê vîne, zilamê ku li aliyê din jî cîh digire, xwe dispêre serweriya sedî salan û kevneşopiya ku vê ewle dike, qanûn û zagonan, lewra di vê mijarê de şerek new ekhev a li ber govantiya dîroka mirovahiyê berdewam dike heye. Weke ku qet nayê gotin pêwîste di vê mijarê de şoreşek bêhempa pêk were, divê bê gotin ku wisa seresere destgirtina mijarê jî nayê pejirandin. Pir vekiriye ku zilam xisletên xwe yên heyî ne ji dayîkbûna xwe ve girtine. Jinê jî bi heman şêweyî xisletên xwe di kêliya zayînê de ne girtine. Divê mirov vê rewşê weke berhema kevneşopiya ku çînayetî hiştiye bibîne. Xisletên ku nifşan weke mîras ji hev re hiştine, ji hêla civakê ve ji jinê re jî ji zilam re jî hatiye dayîn. Otorîte, ol û çandên mezin vê teşebûnê ferz dikin. Wê demê divê mirov bi nêzîkbûnek ku pêşketina dîrokê baş dibîne ve li vê mijarê binêre, têkîliya jin û zilam a di nava pergala emperyalîst de ber bi rûxandinê ve diçe û di malbatê de jî raveya belavbûnê ye rast bigire dest.

Li jorê pirsa di bûyerên şer û aştiyê de zilam çiqas zêde kirine zilamtî, jin jî kirine jinwarî, di pêşketina pêwendiyên rojane de cihê wan çiye hatibû kirin. Dema mirov vê ji hêla rastiya xwe ya mirovî ve bigire dest jî, tişta tê dîtin ew e, kes bi hev re jî

pêwendiyek bi tenduristî pêş naxin. Gelek kes nexasim di vê mijarê de bûhranek mezin dijîn. Bêteşebûna di kesayetan de pir zêde ye. Ji ber ku zilam ber bi lutkeya serdestiyek bêsînor ve diçe û jin jî dikeve nava ketinek bêsînor de, têkîliyên pir çewt derdikevin holê. Bûhrana ku tê jiyîn jî çavkaniya xwe ji vê digire. Hinek têkîlî tên xwestin, lê nikarin pêk bînin. Ji ber kesayet girêdayî têkîliyên sedî salane. Di vir de ferasetek exlaq, kevneşopî û jin û zilamtiya sedî salan bi teşe kirine derdikeve pêşberî wan. Lewma kesayeta ji ber vê nayê nasîn ditirse, bûhranê dijî, dîn û har dibe û heta dibe kujer. Ev rewş nexasim li welatê me pir zelal tê jiyîn. Mînak pêwendiyek li Ewrûpa pir asayî tê dîtin, misoger li cem me rê ji mirinê re vedike. Gelo rastî li kure? Di dîrokê de zilam her tim kesê ku rehmê belav dike, diparêzê ye, jin jî her tim parsekiyê dike, begê xwe ve girêdayî ye, lê mixabin bi vê girêdanê ve jî her tim kesayetek bêbext ava kiriye. Di vê mijarê de bêbextî û girêdan têkilhev pêş dikeve. Nêzîkbûn şikbar û dudilî ne. Di nêzîkbûnên beramber hev de her du alî jî metirsiya xapandinê dijîn. Bes, mijarek bi navê namûsê û tê gotin ez dikarim her tiştê xwe di xêra wê de bidim heye. Tevî vê her kes li pey lîstok û hîleyane. Jin jî, zilam jî di pêwendiyên xwe de ne rehetin. Nexwe rewşek ne bi tenduristî ve rûbirû mayînek heye. Çi zewicî, çi jî ne zewicî be nerehetiya di vê mijarê de tê jiyîn bi serê xwe selmandina bûhranê ye.

Tê zanîn ku ev bûhran di nava dîrokê de hatiye hunandin. Nifşên beriya me ev bûhran kurtir jiyan û dewr kirin. Ji ber me weke şoreşgeran vîna azad zêdetir derxist holê, xwezayî ya bi me re tê jiyîn sînordare. Lê tevî vê, weke berhema vê çandê entrîka, hîle, neduristbûn, beramber hev nenîqaşkirin, ne axaftin di radeyek mezin de didome. Çavkaniya hêza van di kur de ye, zêde nayê dîtin. Ger em van pirsan ji dayîk û bavên xwe bikin, pir vekiriye ku wê bê wate lê binêrin û tiştekê fêm nekin. Ji ber ku ew di nava binyatên pir hişk ên pêşketî de ne. Êşa lîstoka hevdu

beramber hev dixapînin dijîn, lewma zehmete ku xwe bigihînin wateya wê.

Engels girîngiyek pir mezin daye jiyana zayendan a ku hevdu di bin navê girêdanê de dixapînin û lêkolîn kiriye. Em ê niha tenê vê bibîr bînin. Divê mirov di nava malbat, civak û siyasetê de hebûna şerek pir zirav bibîne. Mirov di hemû xwepêşandinên girêdan, eşq, zewac û ji hev cudabûnan de şopa vê têkoşînê bibîne. Li şûna ku ev qad û têkîlî weke tabu, têkîliyên ku divê dest lê neyê dayîn bibîne, divê di vir de weke her zayendekê çi ji hev desteser kirine û di vê mijarê de şerek çawa meşandine rast bê nirxandin. Ol'an û siyasetên serwer ev bi şêweyên cur be cur diyar kirine. Li gorî wan jin hatiye parastin, burjuvazî jî li gorî xwe mafên mezin dane jinê. Di vir de helwesta jinê jî diyare. Mînak li Tirkiyê jinek burjuvaziya biçûk, dema dibe xwedî malekê, hevserekî, tiştekê, vê jixwe re nîmeta herî mezin dibîne, dipejirîne ku hemû daxwazên wê hatine pêşwazîkirin. Lê mixabin piştî çend salan jî bûhranek ku her tişt serûbin dibe tê jiyîn.

Ev rastî tev didin diyarkirin ku, pêşketina dîrokî ne weke gotinên ketîbûna girêdan û namûsê rave dikê ye. Di vê qadê de her kêlî pevçûnek, şerek tê jiyîn. Em yeqîn dikin kesek nîne ku bêje di vê mijarê de her tişt bêhempa ye. Divê mirov vê bibîne; rewşa ku ji sedî salan ve tê jiyîn, rê ji şêwezek şerê jinê ya ecêb re vekiriye. Ev şer jî bi şêweyek jinwar hatiye meşandin. Bi kurtasî weke biwêja bigire li serê xwe bide, tam li gorî zilamê ku di nava dîrokê de pêş ketiye jinek hatiye xemilandin. Jina ku her tim di bin zext û zorê de hatiye girtin, li ser jêhatiyên wê yên cînseltî û vîna wê gotinên pêşiyan hatine derxistin, tam bi şêweyek jirêderketinê bersiva ferzkirinên newekheviya bêsînor a zilam daye. Weke "Jin bi fenin, ber serê wan tije ta û benin!" Bi rastî jî tişta li qada zilamê serdest çêbûyî jî ev bûye. Ango fenbûna jinê serdestiya zilam kiriye rewşek tengav. Nexwe begbûna mêr, ne serdestiyek wisa hêsan û serfirazî bê destnîşankirine. Jin çiqas

hatibe xistin, zilam jî ewqas ketiye. Wê demê di vê wateyê de pirsgirêka jinê, pirsgirêka zilame. Li gorî ku radeya ketîbûna zilam yek jê çavkaniya xirabiyên bingehîn ên zilame, rewşek weke zilamtî bûye bela serê zilam heye. Ev carina digihe qonaxa herî bilind jî. Bûhrana ku zilam di vê mijarê de dijî ne kême. Heta dûrbûna ji jina ku jê re "Şatir" tê gotin, di hilbijartinên tenê jiyînê de kêm nayên dîtin. Em yeqîn dikin saziya di keşetî û derwêştiya ol'an jî wisa pêş ketiye. Elbet di vir de ji hêla neyêniya pirsgirêkê ve, çareseriyek tebatî heye. Ev encama ku wêjeya jina gunehbar bi zilam re daye avakirin mantiqê "ji gunehbar bireve" pêş xistiye. Ev herî zêde di rastiya Îranê de tê dîtin. Destê xwe jî dirêjî jinê nekirin, perdeyek sitûr ji madî û manevî di navberê de avakirin encama vê nêzîkbûnê ye. Lê dema ev tên kirin jî, pirsgirêk di radeya herî giran de dîsa tê jiyîn. Hebûna pirsgirêkê bi rêyên ne rast ve derbaskirin, parçe parçe çareserî dîtin, ango nêzîkbûnek reformîstî jî rêbaza sereke ya Ewrûpa û heta welatên sosyalîst jî ji bo çareseriya pirsgirêkê dîtine. Di vir de tişta derdikeve holê, rêya rizgariyê bi rêbazên têkoşîna bi bername û bingehîn ve nehatiye girêdan. Jixwe, nayê gotin ku divê dijberî vê tevgerek aksiyon bê pêşxistin. Di çareseriya pirsgirêkê de dibe ku rola reforman hinekê hebe, bes her dayîm heta dawî veguhertinekê saz nake. Ji bo vê pêwîstî bi şoreşan heye. Her çendî ji bopêşxistina şoreşê bi tena xwe têrê neke jî, reformên ku me ber bi pêvajoyên şoreşa giştî ve bibin sûdmendin.

Dikare di vir de pirsa pêwîstî bi şoreşê heye yan ne bê kirin. Ger yek jê pirsgirêka herî bingehîn a civakî di vê mijarê de tê jiyîne, wê demê pêwîstî bi şoreşê heye. Pir vekiriye şoreşa di vê qadê de, dê weke têkoşîna di navbera her du çînan de pêş nekeve. Dê ev şoreş, di qadên hişmendî, sazî, kevneşopî û taybet jî di malbatê de çêbe. Dê têkoşînek bi pênûs, şerên di xêra pêwendiyên rojane de, bi tevgerên pratîka rojane ve bê meşandin. Ango dê jin li derdora bernameyekê bi artêş bin, hemû hêza xwe

bi yek bikin, lê ne artêşek ku li dijî artêşa zilam a heyî şer bikine. Ne artêşên wisa hene, ne jî rêya şerê di xêra wekhevî û azadiyê de wisa dibe. Mirov çiqas bikare ji feraseta şoreşek wisa çors dûr bisekine, divê ewqas jî dijberiyek li hember rêxistinbûna heman şêweya ku li ser hemû saziyan zilam serwere, di vê mijarê de têkoşîna ku bername û rêxistinbûnek xweser ecêb dibîne derbikeve. Tiştek jixweber nameşe. Lewazî û pirsgirêkên di vê mijarê de tên jiyîn, bi qasî ku çareseriyên kevneşop ve neyên çareserkirin kûre. Rêbazên înkar an jî reformîst jî çareser nake. Lê di heman demê ev rê jî, rêyên ku herî zêde jin û zilam dihilbijêrine. Sondên girêdana bi hevdu re, hinekê jî ewleya aborî û nêzîkbûnên kevnare, ji hêla her du zayendan ve jî bêçaretiyê kûr dike, lê dîsa jî rêya ku hêsan tê hilbijartin, ya rastî li ser tê israrkirin jî ev rê ye. Lê mixabin di vê mijarê de pêwîstî bi şerek ferasetê ya bingehîn heye. Heta ku jin bi jinwariya xwe û zilam jî bi zilamtiya xwe re şer neke û hevsengiyek neyê dîtin dê çareserî jî pêş nekeve. Mijara ku şoreş jê re tê gotin jî di vir de ye. Şoreş xebatekî hilberînê ya hevsenge ku ji civaka ku di bin bandora giran a zilam û jiyana jinwariya giran a jinê de ava bûyî dûrketine. Di jiyana çandî, civakî û siyasî de xwe gihandina xebatek hevbeş û hevsenge. Heta ku nêzîkbûnek wisa pêş nekeve, ne gengaze ku taybet ji pirsgirêka jinê re, giştî jî ya civakê re çareseriyek bê dîtin. Di bin çareseriya van pirsgirêkan de rêbazên reformîst esasgirtin, li welatên mêtînger de dişibe teoriya ku “zor’ê” cinawirekî dana nîşandane. Çawa ku reformîst dibêjin li dijî van welatên mêtînger zor’a bê ferzkirin dê bibe kareset, di vir de jî vî karî bi axaftinên zêde, nîqaş û heta fesadiyan ve dixwazin derbas bikin. Hewl didin çareseriya pirsgirêkê bi propagandeyê bi encam bikin. Mixabin ev jî erêkirina mirin û rizandinek bêdawî ye.

Dema em li vir nêzîkbûna giştî ya ji pirsgirêkê re bi dawî dikin, em dibêjin divê di çareseriya pirsgirêkê de ne rêbazên

reformîst, ji bopêşxistina şoreşek bingehîn pêwîste têkoşîn esas bê girtin.

### *b) Li Kurdistanê Pirsgirêka Jinê û Encamên Di Nava Partiya Me De Derdikevin*

Beriya em derbasî mijara xwe ya esasî bibin, hewce dike em hinekê li ser pirsgirêka jinê ya li Tirkiyê heyî rawestin. Mirov dikare bandorên giran ên pirsgirêkê jinê ku di roja me de li nav civakên emperyalîst-kapîtalîst tên jiyîn li Tirkiyê jî bibîne. Weke ku Tirkiye ji her hêlê ve civakek bûhranê ye, bûhrana gelemperî zêdetir dijî. Di pêvajoya ku bi 12’ê Îlonê re destpêkirî de bi lez rojevbûna pirsgirêka jinê, giraniya xwe hîn zêdetir dide hesandin.

Ji ber sedema bûhrana ku îro dewleta Tirk dijî, dendika civakê saziya malbatê jî bê aramî, rakêşî û her ku diçe parçebûnek kûr dijî. Pirsgirêk ji çareseriya xwe dîtinê dûre. Rastiyek jinê ya ku di qadên çandî, exlaqî, aborî û siyasî de tengav bûyî heye. Lê tevî vê mêtîngerî her roj gelek çareyên qelp dide pêş, hewl dide rêyên çareseriya rast bixetimîne. Mijara jinê ya ku emperyalîzm weke amûra ji rizgarbûna bûhranê dibîne, di roja me de Tirkiye jî weke cilê rihê xwe xilaskirinê dibîne. Cunta faşîst bikaranîna jinê weke saziya pîşesazî ya kêlekê digire dest û vê jî bi rê û rêbazên cur be cur, amûrên rêxistin û têkoşînê ve pêk tîne. Nexasim di nixwumandina zext û zorê de, ji bo bê pejirandin jinê weke sermiyanek bêhempa û nirxekê bikar tîne. Ji bo ev rewşa kirine parçeyek jiyana rojane, herî zêde jî ji aliyên lewaz ên mirovan sûd tê wergirtin. Mirovan ji rê derdixin, vîna wan dişkînin, xebatên wan ên fikir û pêkanên asayî û tenduristî asteng dikin. Her tişta ku ferz dikin, pêşketinek ji çanda qesrên serdema navîn û çanda hareman xirabtir û neyênîtire.

Cunta faşîst, bi destavêtina rastiya jinê ya li Tirkî tê jiyîn ve, polîtîkayek sazûmantir da meşandin. Bingeha vê polîtîkayê ji

aliyekê ve bi feqîrtiyek kûr, paşê jî jin di sûkê de pêşkêşkirinê ve da avakirin. Berî her tiştî ji bojin bikev e rewşa kirînê feqîr kirin. Herî zêde jî kesîma karker û kedkar hat feqîrkirin, ev jî pêvajoya kirîna jinê da destpêkirin. Piştî pêvajoya kirînê, dest xebatên pêşkêşkirina sûkê kirin. Ev rewşa ku ji sê qonaxan pêk tê, weke xelekê li pey hev pêş ket. Bi vê xebata sê qonaxî ve jin, bi qasî ku di dîroka Tirkiyê de nîne weke sermiyanek kirîn û firotinê ya baş hat veguhertin. Ew civaka Tirkiyê ya ji sedî salan ve hişt û di nava xwe de girtî bû, di radeyek mezin de parçe dibe. Îro li şûna tevgera zext û zorê ya mezin, tevgera jirêderxistin û esilxirabkirinê pêş ketiye. Hem jî wisa hatiye pêşxistin, êdî tinazê xwe li civakê, adet û teqalîdên wê dike. Faşîzma 12'ê Îlonê, gelek rewşên ku civakê rast ne didîtin, niha weke polîtîkayekê di nava civakê de pêş dixe. Bi rastî jî dema mirov li pêşketinên salên dawî dinêre, herî zêde jî ketîbûn û bêesilbûn serwere. Her ku diçe weke sermiyanê pêşkêşkirina jinê û berfirehkirina qadên sûkan jî, zêde dibin. Holywood'a li Emerîka li Tirkiyê weke Yeşîlçam'ê derdikeve holê. Qadên weke Filîm, vîdeo, sînema û hwd her yek jê weke navenda sûkê derdikevin pêşiya me. Dewleta Tirk, di civakê de baldariya di derbarê vê sûkê de pir pêş xistiye. Tişta ku îro di bin rûpoşa lîberalîzmê de li ser civakê tê ferzkirin ev e. Elbet Komara Tirk ji bo zanebûna şoreşgerî ya heyî berovajî bike, bê esil bike, nehêle civak berjew endiya xwe bihizire vê dike. Jor heta jêr vê polîtîkayê belav dike. Yek jê lîstoka herî mezin ku cunta faşîst vê weke tevgera parçekirina civakê dibîne û disepîne jî ev polîtîka ye. Ji ber ku jin jî li Tirkiyê li dijî vê polîtîkayê hêza dijberî raber nake, nikare xwe bûna amûrek herî ketî jî rizgar bike. Ji hêla fikir ve ya li ser jinê serdeste "çawa dikarim xwe baştir pêşkêş bikim û bihayê min dikare çiqas be?" Tevî ku yek ji xala girêka bêçaretiya vê mijarê ye, rolek dahûrîner nalîze. Mijara azadiya jinê û kesayeta jinê, îro bi şêweya herî xirab li Tirkiyê tê dahûrandin. Jixwe xeternakiya vê dahûrîna ku kopya

emperyalîzmê ye û jor ve civakê ji rê derdixe pir vekiriye. Rewşa ku îro binyata malbatê û rastiya jinê li Tirkiyê dijî, nûvedan û makêta dawî ya mantiqê kedxwariya bêsînore. Îro ev nûvedan jî li ser esasê malbatê belav bike gefan dixwe. Lewra hemû civak jî di bin gefek wisa de ye. Her çendî îro hêzek ku bikare civakê ji vê rewşê rizgar bike tine be jî, diyare yekane rêya çareseriyê jî şoreşe. Şoreşa ku ji bo pêşketina civakî hewce ye; pêwîstiya xwe herî zêde jî di pêwendiyên malbat û jin û zilam de dide hesandin. Piştî ku me rewşa li Tirkî tê jiyîn wisa kurtasî şîrove kir, divê mirov mijara me ya esasî rewşa li Kurdistanê bigire dest.

Dema em nêzîkbûnek giştî ji pirsgirêka jinê re dikin, em ê bibînin ku dema em dixwazin di rastiya Kurdistanê, binyata wê ya civakî, malbat û pêwendiyên jin û zilam de bisepînin, em ê bibînin ku rastiyek li gorî xweseriya wê ve rûbirû ne. Qiblegeha civaka me, hemû hisek û fikir bi xwe ve daye girêdan, binyata malbatê ku navenda wê ya giştî ye, ji ber tevlîheviya wê, divê mirov avabûna wê bi paşeroj û rojaneya wê ve bigire dest.

Weke yek îrade, yek otorîte; serdestiya zilam a ku di asta vîn û fikir de mohra xwe li kûraniya civakê daye şîrovekirin, dê mijarê zêdetir xurt bike. Tevî ku lêkolînek me ya berfireh tine ye, em ê dîsa jî hewl bidin bal bikişînin ser bandorên vê yên li ser pêşketina civakî. Pir vekiriye ku gelek bandorên serdestiya zilam ên xirab li ser pirsgirêkên şer û aştî, pêşketina pêwendiyên nav malbatî û di navbera mirovan ên rojane de hene. Zanist jî hêj gelo neçariya evqasî serweriya vê îradeyê heye yan na, ger hebe jî ev ji bokîjan qonaxa dîrokê derbasdare ne selmandiye. Mijarên weke piştî kîjan qonaxê pêwîstî heye ku vîna yek alî veguhere yekîtiyek vînan, bi serê xwe mijarên lêkolînê ne. Em dizanin ku ev vîna yek alî di radeyek mezin de zext û zorê pêş dixe. Her çendî rêjeyek mezin a zayenda beramber jî weke pêvekekê pişgiriya vê îradeyê dike, zext û zor girêdayî vîna yek alî ye. Sedema ku civaka çînî û amûrên şer evqasî pêş dikevin, çavkaniya pêşketina sînordar a

çalekî û afirîneriya mirov, di pêşketina vê vîna yek alî ya jor de veşartiye. Heta girêdana hînkerên ol'î, felsefe û exlaqê jî bi vê re heye. Em dibînin ku xweda zêdetir dişibin zilaman, hemû qonaxên pêşketina exlaq jinê biçûk û kêm dibînin. Di navenda gelek hînkerên felsefî de mohra zilam heye. Ev hemû jî ne tenê di navbera zayendan de, di zêdebûna newekheviya çînayetî û nav-neteweyî de pêş ketine. Herî zêde jî ev newekhevî ji zanebûnê zêdetir weke encamek jixweber derketiye holê. Ev jî me dibe encama ku ev çavkaniyek girîng a pirsgirêkên pergala serdestiya zilam ên di roja me de kûr dibine.

Ji hêla jinê ve bi şêweya vînek pêvek temamkirina vê pêvajoyê, di xisletek teslîmbûyî de pêşketina wê, dema hewce dibîne li dijî vê derbikeve jî bi rêbazên herî zêde bêesil dana meşandin, xirabûnên heyî hîn pirtir kûr dike. Ango beşdarbûnek neyênî, bi şêweyek teslîmkar vîna xwe dide diyarkirin. Dema bertek tê xwestin jî ev bê fikir û bêesil pêkana wê, zêde rûyê xwe dibîne, ji wê jî wêdetir di saziyên weke exlaq, ol, felsefe yên binesaziyên civakî de zêdegaviyan dike tev dibin çavkaniya kûrkirina pirsgirêkê. Navdengbûna navtêdana jinê û her ku jin navtê dide tê zanîn ku çiqas dibe sedema xwînrijandina zilam. Ev jî tenê pêşbaziyek bi xirabûnê re ye. Divê mirov vê bibîne û îzaha serdestiya heyî bike. Bal bidinê di nêzîkbûna vê pirsgirêka cidî de rêbaza têkoşîna jinê hilbijartî pir neyênî ye. Rêbazên weke vêdedan, rakêşî û fesadî pir sivikin. Gelo dema di civakê de behsa vêdedan û fesadî tê kirin kî tê bîra mirov? Rêbazên ku jinê jî di pêvajoyên dîrokê de pêş xistine giranî ev rêbazin. Divê ev rewş neyê pejirandin. Di civakên kapîtalîst-emperyalîst ên roja me de jin ev veguhertiye vêdedana li ser dik û reklaman. Rola jinê ya di reklaman de tenê navtêdane. Dîmenên wê yên li ser dikê jî heta dawî pêşbaziyek newekhev û kûrkirina pêşbaziyek ketîbûn û kedxwariyê ye. Li ser bingeha hedefên nayên gihiştin de

vêdedana mirove. Ev jî encama asta çanda îdeolog an jî polîtîkvanên emperyalîzmê ne.

Belê, ji rewşek wisa îrade serwerin û girêdanê derketin, tiştên ku her kes li ser bingeha wekhevî, hevbeş an jî bigihe vîna xwe ya azad bike, weke xebatên zemîna civakî, di qadên çalekgerî, aborî, siyasî, çand û exlaqî de dema li ser her malbat û saziyê ferz dikin, dê çi derbikeve holê? Ji ber ku ev mijar pir kêm hatiye nirxandin, em nikarin di vê mijarê de behsa hinek daneyan bikin. Bes çalekgeriyên ku pêş ketine jî, çalekgeriyên ku me li jor destnîşan kirine. Mînak ti jin ji bozarok û zilamê xwe –her çendî karên pir xeter bikin jî- wisa hêsan nabêje xirabin. Ango reîsê malbatê çi bêje yekser wê pêk tîne û quralê ku vê li tevahî qadên civakî jî pêk bîne derbasdare. Niha vînek mirî û xeniqî ji nû ve rastkirin, ji rastkirinê jî wêdetir ev ber bi veguhertinek şoreşgerî ve birin hewce ye yan na? Divê bersiva vê pirsê bê dayîn. Li ber çavan her kes pêwîstiya veguhertina şoreşgerî ya pirsgirêkê diparêze. Lê tevî vê, di serî de jin, ên dibin xwedî çalekiyên xirab jî ew bi xwe ne. Em di derbarê vê mijarê de nêzîkbûnek wêrek jî nabînin. Nêzîkbûnên reformîst ên teng pir zelal diyar dibin. Ma we li derdora malbata xwe, di nav kesimên civaka hûn jê hatine kesek ku bikare vê pirsgirêkê wêrekî danê holê, di heman demê de nêzîkbûnek çareser ku mirov li hember rêz bigire danî holê we dîtiye? Rêjeyek mezin jin û zilamên ku nêzîkbûnên şaş dikin hene. Çavkaniya pirsgirêka di vê mijarê de ya mezin jî, nêzîkbûnên şaş ên me destnîşan kirine. Dibe ku hûn dixwazin carinan têkîliyên azad pêş bixin. Bes ev têkîliyên azad hinde ji sedî salan heta hezarî salan ve ji hêla statûyên serdest ve hatine diyarkirin, dema em nû dest davêjinê, yekser vîna azad perçe perçe dibe. Nexwe divê em bipejirînin ku em di vê mijarê de bi pirsgirêkek cidî re rûbirû ne. Ma çima yekser kar li gorî têkîliyên azad pêş nakevin? Divê em bi şêwaza "ez wisa xweşikim, min ev xwest lewma ev ji min re derket" xwe nexapînin. Têkîliyên ku di

nêvenga mêtîngerî û zexta mezin a çînayetî de bi hezarî hîle, entrîka û fesadiyan ve hatiye hûnandin, ji hêla vînek ciwan û cahil ve çawa dikare pêşî lê bê girtin. Vekiriye ku wê çiqasî vînek xam û biçûk çiqas dikare li hember daneheva sedî salan li ber xwe bide. Vêca ger kesek di vê mijarê de ji xwe bawer hebe û dixwaze bi şoreşê xwe tevlî vê pêvajoyê bike hebe, wê demê divê weke her mijarî di vê mijarê de jî li dijî paşverûtiyê li ber xwe bide. Gotinên weke "zilam wisa dike, evqasî diçewsîne, nizanim çi dide kirin, jin jî wisa ji rê derdixe, nizanim fêlbaze, lîstokan dike û wisa bin dixe" hene. Divê mirov ne li hember wê zextê serî bitewîne, ne jî qinyata xwe bi van bîne. Divê mirov li gorî pêdiviyên veguhertina şoreşgerî pêwendiya wekhevî û azad ferz bike.

Qonax û daneyên me yên di vê mijarê de sînordarin. Lê divê mirov ên heyî têbigihije. Ger dê ev destpêkên biçûk pêşve biçin, divê werin pêşvebirin. Me got ev pêdiviya şoreşê ye. Ango li vir li şûna behsa vînên di vê mijarê de saxlem bicîh bûne, wekhev û azad kirin zêdetir, divê vîn û kesayetên ku bi têkoşînê bêne bidestxistin û wekhev bibin derbikevin holê. Li şûna ku mînakên heyî esas bigirin û bi sipartina wê ve xwe têrkirinê yan jî şûna gotinên weke "pêşketin başin, di asta pêşde ne", divê mirov behsa têkîliyên ku bi têkoşînek mezin bêne bidestxistin bike. Gelo ev pêk werin dê çi bibe? Ger vînên wekhev û azad derbikevin dê çi bibe? Çawa ku em dibêjin dema zexta çînayetî ji holê rabe dê şer jî ji holê rabin û bereket çêbe, bihuşta mirovahî ji nû ve dayîk bibe, girêdayî vê ger rizgariya çînayetî û newekheviya nav-netewî û mêtîngerî jî ji holê rabe, dê di pêşketina tevgera azadiya jinê ya bi van re têkilhev pêş dikevê de jî, pêşveçûnek saz bibe dê bi giştî di nav civakê de û nav-netewî de jî wekhevî saz bibe. Ger dîsa jî giştî ev wekhevî sînordar be, ne gengaze ku bi jinê re wekhevî bê dîtin. Di navbera wekheviya rizgariya çînayetî, civakî û rizgariya jinê de girêdanek kûr heye. Wekheviya civakî çiqasî saz bibe,

wekheviya di navbera civakên gelan de jî çiqas saz bibe, dê wekheviya di navbera zayendan de jî ewqasî pêk were. Bes ev ne tevger û çalekiyên wisa jixweber hevdu dimeşînine. Demekê ji me re jî digotin; “Ger rastiya çînayetî pêk were, dê wekheviya nav-netewî jî pêk were, ma hûn çima têkoşînek Kurdistanê ya cuda pêş dixin?” û ev jî li ser me ferz dikirin. Niha jî tê gotin; “Ger em şoreşê pêk bînin, dê wekheviya civakî yan jî netewî ya di vê mijarê de jixweber çêbe.” Na, me diyar kir ku çîçikek jî nikare jixweber ji qalikê xwe yê hêkê derbikeve. Koletiyek ku dîrokê evqasî daye pejirandin, ancex bi hêza fikir û reftarek mezin a têkoşînê ve dikare bê şikandin û wekhevî pêk were. Her ku têkoşîna çînan, ji holê rabûna çînan ve encam dibe, dîsa têkoşînên nav-netewî her ku netawan ji holê radikin –ev di pêvajoyek dîrokî ya pir dirêj de pêk tê- dê hingê newekheviya di navbera jin û zilam de jî di astek girîng de ji holê rabe. Elbet zayendên jin û zilam ji holê ranabin. Her tim hebûna van her du zayendan xisletek xwezayî ye. Lê em bawerin di mijara evê çawa pêk bê de em ê di pêvajoya têkoşînê ya demdirêj de gelekî li ser rawestin. Êdî tîpa jinek çawa dikare derbikeve holê? Heta ku tîpa jina tê xwestin dernekeve holê, weke me gotî dê her tim çavkaniya mêtîngerî, zext û şeran be. Wê demê her ku vîna azad a jinê û tevgera azadiya jinê pêş bikeve, hewce dike li dijî her cure zextan pêş bikeve. Pêwîste li dijî her cure mêtîngerî û zilam ku ew jî serdestiyek dine; saziyên zext û zorê yên çavkaniya xwe ji zilam digire û zêdetir jî xizmetê ji mêtîngerî re dike pêş bikeve. Her wiha pêwîste di vê navberê de xisletên ku ji sedî salan ve girtiye, di gelek hînkerên irf û adetên roja me, exlaq û Ol’an de tê ravekirin, xwe bi xwe biçûk dike, vîna wê tine dike, vê jî hêjayî xwe dibîne, wer dizane ku çavkaniya xwe ji xwezayî û tebîeta wê digire re şer bike. Berî her tiştî neçare ku li dijî sivikbûnên xwe yên rojane şer bike. Her çendî em behsa xisletên zilamên neyênî, êrîşkar û otorîter dikin, divê jin jî ji wan xisletên ku ji yên zilam

ne kêmtirin, bi rastî jî bêsîborin, weke binyat tê dîtin lê ne wisa ne, xisletên ji derve de hîn bûne û mohra civaka çînayetî dide berde û derbas bike. Em ji kîjan alî ve binêrin, biçûkbûna jinê, kêmdîtina wê –çi li nav civakên emperyalîst-kapîtalîst dibe, çi jî di bermahiyên welatên sosyalîst de dibe- pir bihêze.

Gelo li Kurdistanê rewş çawa ye? Pir vekiriye ev rewşa neyênî li cem me xurtire. Li cem me jin yekser dibêje “ez wisa kêmim, nizanim çawa kêmim” û fêr bûye xwe bispêre sivikbûnên xwe. Jixwe em jî yekser dibêjin raste wisa ye, hema wisa dibînin û didin nîşan. Ev ne rastin û nêzîkbûn û pêwendiyên ku şoreşgerek napejirînin. Têkoşîna aliyan a beramberî hev hewce dike. Îro em jî weke şoreşgerekî hewl didin di astek girîng de vê rêgezê bisepînin. Ne ku em neçarê vê ne û bê hêzin, an jî qurbanê lewaziyên xwe ne, ji bomêtîngeriya di navbera netew û çînan de ji holê rabe girêdayî fikra em dinasin, em weke berdewamiyek wê ya xwezayî digirin dest. Ne raste ku otorîte bi şêweyek bêmafî bê bikaranîn. Pêwîstî heye ku otorîte bê azadkirin û pêşî li nexweşiyên sedsalê derbasî nav refên me dibin bigirin, pêwîstî heye ku bê bikaranîn. Lewra em jidil tevgera azadkirinê ya di refên me de digirin dest. Nexwe erka herî girîng jî vîna azad a giştî derxistina holê ye. Di vê mijarê de destpêkirinek sînordar çêbûye. Di vê qonaxa dîroka mirovahî de jin, hêj di qonaxa lêgerîn û xwe dîtinê de ye. Di qonaxa çi çiqas winda kiriye, ceribandin û ezmûna çi çiqas dikare bidest bixe û têgihiştinê de ye. An jî divê mijûlbûna xebata jina şoreşger wisa pêş bikeve. Ji ber vê, ger em dixwazin di mijara mafên jinê de hinek gavan bavêjin, divê em jî xisletên vê qonaxa pêşketinê baş têbigihijin. Ango weke di qonaxên destpêkê yên têkoşîna me de bûyî, di vê mijarê de hêj lêkolîn, lêgerîn, hinek ceribandin û ezmûnên rêxistin û têkoşîna wan di rojevê de ye. Lewra hewce dike em hesas bin û baldar nêzî vê mijarê bibin. Wisa bi têkîliyên amade hatine bidestxistin ve meydan nayên dagirtin. Ango di pêvajoyek

ku pêwîste bi lêkolîn, lêgerîn û ceribandin bê meşandin de, nabe ku nêzîkbûnek weke "belê tîpa ku hûn ji sedî salan ve lê digerin ez im, ez weke îlahekê li holê me" bê raberkirin. Her kî vê bêje, derdixe holê ku tîpek herî tengijî yan jî tarî ye. Dibe ku di wateya awarte de jinek wisa derbikev e. Lê belê ji hêla qonaxa pêşketina giştî ya zayendekê ve ne gengaze ku ev bê gotin.

Nêzîkbûnek wisa heman weke piştî windakirina şerê li meydanekê leşkerek radibe ser xwe bi tena xwe derdikev e pêş dibêje; "Fermandarê ku têk neçûye ez im" raberkirine. Na, leşkerek ku artêşa wî bi erdê re yeksan bûye, nikare li hember alayek ku her cure tedbîr girtine pirsgirêkê danê holê. Ger bê gotin; "Tîpa hûn lê digerin ez im, têkîliyên saxlem hûn dixwazin pêş bixin bi min re heye", wê demê ti wateya pêşxistina şoreşê, di vê mijarê de kûrkirina tevgera azadî namîne. Di vê mijarê de nêrînên hinek netawan ên weke "li cem me jina azad wisa pêş ketiye, nizanim di paşeroja me de tiştên wisa hene" tenê xwedî naverokek propagandeyê ne.

Divê zêde ev tîp –çi zilam çi jî jin dibe- cidî neyên girtin. Pêwîste hewcedariya şoreşgerbûna pêwendiyan û ev jî di qada destpêkê de ye neyê ji bîrkirin. Me tim û tim behsa xwesertiya pirsgirêkê kir. Ne raste ku bê gotin dê jixweber bê, pêvajoya şoreşê ya xwezayî cîh bide her kesî. Na, ger şoreş bi xwe jî her tim, her wextî, her kêliyê û her xisletê bi zanebûn pêş nexe, jixweberbûn her dem ê şansê pêşketina pergala kevin ji nû ve zêde kiriye.

Gelo pêvajoya pêşketina tevgera jina şoreşger dikare çi derbixe holê? Çiqas dikare jina azad û elbet di heman demê de zilamê azad ava bike? Dê hinekê jî têkoşîn vê diyar bike. Gelo îro têkîliyek têkoşîna wisa bihêz a yek ji me heye? Mînak zilamek an jî hevalek jin di vê mijarê de dikare ceribandinekê yan jî di wateya azadî de çi bike? Gelo di nîqaş û fikir de jî gavek hatiye avêtin? Ma pergalek pêşniyaran heye? Bi qasî em bêjin tine ye

kême. Her tim têkîliyên fesadî, rûberî, bi fêmkirinên şaş ve şêwazek nêzîkbûnan hatî hunandin, hevdu bikaranîn û weke îdarekirinê hene. Pir vekiriye ku dê ev têkîlî kêrî xebatên şoreşgerî neyên. Ger hewce bike mirov dikare van zêdetir veke. Madem pergala sermiyana giştî her ku çûye jin hîn zêdetir kiriye mijara sermiyanê –jixwe di roja me de wisa ye û heta di roja me de ev bihêztire-, ne gengaze ku mirov di bin pêşkêşkirina jinê de mohra sermiyanê nebîne. Li her qada jiyanê xebatên jinê yên hatine pêşkêşkirin, xebatek sermiyana ku tê barkirine. Ne weke zeviyekê ye, lê weke dewrê sermiyana bi dest tê barkirine. Pir vekiriye ku jin jî li hember vê çi dike. Ji bobihayê xwe hîn zêdetir bike hêz bi ser hêza xwe ve kiriye, bi ser jêhatiyên xwe ve jêhatî, bi ser fêlbaziyên xwe ve fêlbazî zêde kiriye û lê rêyên firotina baştir geriyaye. Hatiye gotin ku; "Madem sermiyan evqasî pêş ketiye û ez jî bûme mijara vê ya herî girîng, tişta para min jî dikeve bihayê xwe baş bidim diyarkirine." Belê dema mirov li bazaran dinêre her roj em bi gelek rewşên weke "bihayê min evqase, derketina min a li ser dikê bi 1 milyonî ve destpê dike" ve rûbirû dimînin. Dema mirov li rewşa zewacê jî dinêre, her çendî bê gotin îro qelen ji holê hatine rakirin jî, têkîliya yekem lê digerin, çiqas dewlemende, mala ku biçiyê xala bingehîn û diyarker rewşa sermiyanê ye. Ev jî dewirkirina sermiyana hevbeşe û encama wê ye. Bi rastî jî li ser têkîliyan ev serwere. Wê demê li gorî ku têkîliya sermiyanê jî ne têkîliyek raste –jixwe hosta ji vê re dibêjin têkîliya diziyê- ev têkîliyên diziyê ne. Jixwe di têkîliya diziyê de ti caran rêzdarî û têkîliyek xweser dernakeve holê. Wateya vê têkîliya ku navê wê li sere, belaş desteserkirina sermiyana ne yê xwe ye û diziya hinek tiştên ji wî ye. Di wan deman de jî zilam ji aliyek cuda, jin jî ji aliyek cuda ve hewl dide sûd werbigire. Navê her du dizên ku bi hev dikevin jî dibe têkîlî. Bi rastî jî wisa yeqîn dikim ku diziya di nava têkîliyan de pir kûre. Gelek ji me dema ji malbata xwe re pere û tiştekê nayîne,

baş tê zanîn ku em dikevin çi rewşan. Hûn jî dizanin dema hûn pere qezenc nakin nirxa we çiqase. Ango divê mirov bipejirîne ku di nava malbatê de di astek girîng de encama pergala sermiyanê serdeste. Ger eslê mirov dixwaze bihêz be, pêwîste di vê mijarê de jî tevkariyek girîng bike.

Dema xweseriya vê mijarê hat ferzkirin dê jin û zilamê bihêz pêş bikeve. Pêvajoya avakirina jin û zilamê şoreşger di heman demê de avakirina yek ji pêvajoyên girîng ên wekheviyê ye. Hewce dike mirov bibîne ku civaka kapîtalîst û emperyalîst ev aniye heta astekê. Di mantiqê burjuva de azadî û wekheviya jinê gihaye sînora fêmkirinê. Welatên sosyalîst jî pêşketinek girîng çêkirine û hewl didin pêş bixin. Lê mixabin hêj cem me pirsgirêk bi xwe nehatiye vekirin û hêj lêkolîna tam nehatiye kirin. Wê demê divê em jî hebûna rastî ya vê pirsgirêka vê mijarê bibînin. Me dabû diyarkirin encama ku Rojavayî gihiştibûnê belavkirina malbata biçûk a eslî ye. Lêkolîn dikin, lê hêj nikarin tiştekê bixin dewsa wê. Gelek cureyên vê hene. Em ji kêmkirina hejmara zarokan bigirin heta, razana odeyên cuda, yekîtiyên ku bi lez xirab dibin, bihevrebûnên dervî zewacê her tim bûne “çare.” Nîqaş dikin gelo dibe ku xeteriya saziya malbatê êdî mîrateyek dîrokê be. Rewşek malbata eslî ya li ber hejandinê ye derketiye holê. Dema kapîtalîzm ji holê rabû, dê ev feraset jî jixweber ji holê rabe. Divê mirov hinek pêşketinên li welatên sosyalîst biçûk nebîne. Lê li wan deran jî yekbûnên ku xirab bûyîn hene. Dibe ku nîv bi nîv zêdetir jî be. Nexwe bermahiyên civaka kevin ên girîng dihewîne. Jixwe di sosyalîzme îro pêk tê de, em dibêjin hêjî bermahiyên civaka kevin û bandorên bûrokrasiyê yên girîng hene. Elbet dê ev di mijarên ku me behs kirî de jî diyar bibin. Me vegotibû ku berê di xebatên siyasî û aborî de serweriyek mezin di destê zilam de bû. Teqez dê ev bûna çavkaniya mêtîngerî û newekheviyê jî bidomîne.

Elbet aliyên pirsgirêkê yên zêde li pêş jî hene. Ango bi qasî aliyên girêdayî pêşketina hemû pergalê, aliyên di nava xweseriya wê de jî hene. Ev jî dide diyarkirin ku em çiqas paşketî ne. Nexasim em di nava partî de çiqas girîng digirin dest û dixwazin jidil li ser rawestin ku binirxînin. Yek jê şaşiya herî mezin û nêzîkbûna herî şaş ku di vê mijarê de bê kirin jî, esasgirtina têkîliyên heyî, bawerî bi avakirina têkîliyên nû nayîne û ferasetên kevneşop ên berê ne. Ango di serê kes de sazûmaniyek têkîliyên kevnar, kevneşop a teşe girtî ya feraseta jin û malbatê heye. Ger tu dest li vê bidî dê bêje; “tu bi namûsa min lîstî” û bertek li hember we raber bike. Yek jê ev ferasete. Ya din jî, qaşo hinek ferasetên nû yên bi navê moderniteya kapîtalîst pêş ketine. Ev jî, bi taybet li herêmên ku kapîtalîzm lê pêş ketî tên jiyîn. Li Tirkiyê berfirehtir pêş ketiye. Ev jî nêzîkbûnek wekheviyek teng, di wateyek kevinbûyî de digire dest, yekser dixwaze bisepîne, lê encamên ji ferasetên kevnar ên berê xetertir ava dike wêdetir nîne.

Ji bilî van nêzîkbûnek şoreşgerî heye. Pêwîst nake mirov li ser encamên nêzîkbûna şoreşgerî zêde tiştekê bêje, lê qinyata me divê bê pêşxistin. Bi lêkolîn û lêgerîn, encamên wê nîqaşkirinê, ceribandin û ezmûnan, têkoşînên rêxistinî û têkîliyan ve ne şêweyên ku civak nikare rake bên ferzkirin, ne jî bi şêweya ku bibe dûvika civakê bêne pêşxistin; divê asta giştî ya xebatên me yên şoreşgerî berçav bên girtin, çavkaniya pirsgirêkê bi vê re yeksan bibe, girêdayî jêhatî û kêrhatina şoreşgerî afirînerî di vê mijarê de pêkanîn û encam girtin hewce dike. Her çendî hinek şaşî derbikevin holê jî, ger duristbûn hebe, ji rê dernekeve, mijarê şêlo neke, em dikarin bêjin ku ti şaşiyên em nikarin derbas nekin nînin. Bes bila, cewher aresteyî ya bihêz û bitenduristî destxistinê be û bila bê fêmkirin ku qet revek ji vê nebe. Bila xwe neke qurbaniyên sivikbûn û hêsanbûnan. Bila di vê mijarê de partî jî, civakê jî nexwe nava rewşên ku neyên pejirandin. Wê demê divê

qadek ku pêwîste bi şoreşgerane be, em ê bizanin bi afirînerî û berzbûnek hêjayî şoreşgeriyê pêş bixin. Em yeqîn dikin dê xebata şoreşgerî ya ku vîna azad pêş bikeve, dê pir dewlemend û cur be cur pêş bikeve. Dikare dewlemendî û têrbûna di çalekiyan, rêxistinbûn û her cure pêwendiyan de bê sazkirin. Dîsa dikare nexasim di nava civaka giştî de pêşketinek bi tenduristî bide destpêkirin. Nexasim ji bermahiyên serdema navîn ên di civaka dijî de rizgarbûn, ji tarîtiyan xilasbûn, dê gengaztir be. Ji ber azadiya jinê bi gelemperî bi azadiya civakê ve tê pîvan, her ku azadiya jinê pêş bikeve, dê azadiya civakê jî pêş bikeve. Lewra dê ev jî civakê dewlemend bike, hîn zêdetir bîne rewşek ku bê jiyîn û em cardin dubare dikin yek ji armancên me yên sereke ev in. Em nikarin bêjin ku dê li ser vê jin an jî zilamên wisa bi hêz derbikevin holê. Ev ancex dikare bibe mijara romanan û pêşnûmeyên çavkaniya xwe ji hêza xeyalan digire. Em ê bes vê bêjin. Me da diyarkirin ku xisletên Kurdistanê yên xweser hene. Diyardeya biyanî ya mêtîngeriya li nav me tê jiyîn, em dikarin bibînin ku her cure sazîbûna civaka me, nexasim xweseriya wê, çiqas saziyên ku civak bikare xwe biparêze hemû belav dike. Ev rastî pir vekiriye. Ji sedî salan ve ye mêtîngeriyê siyasîbûna civakê texrîp kiriye. Xebatê aborî yên azad an jî ji bo berjewendiya xwe xebatên aboriya li ser axên xwe yên çînên civakê yên cur be cur xirab kirine. Zêde derfetê pêşketinê ne daye wê. Di xebatên komelebûna siyasî de cardin sînordarkirin heye. Gelo saziyên ku hiştine çine? Saziyên ku ji serdema navîn mane û muhafezekarî zindî hiştiye, civakbûn, siyasîbûna di derbarê pêşerojê de, serwerxtbûn û helwestên herî paşve dikişînin tên zanîn. Ev saziyên ku xizmetê ji netewbûnê re nakin, ber bi cewhera xwe ve nabin, biyanîbûnê, hem bangî hewarê dike yan jî rewa dike, berz dike, xwe sipartina wê weke ferasetek dev jênayê berdan disepînin. Her tim nêzîkbûnek ji xwe bê xeber, xerîbê ax,

kedê, yekbûna civakî û netewî ferz kiriye. Her wiha ev hatiye rewakirin û pejirandin.

Bi kurtasî hemû sazî û quralên civak berjewendiyên xwe yên cewherî biparêze, makanîzmayên binesaziya jêr û jor tev hatine texrîpkirin. Ji bo mêtîngerî bijî, baş dizane ku pêdivî bi hebûna ferdên civakê heye. Mêtîngerî jî vê hebûnê, di sînora ku sûd bidiyê de digire. Belê perestina malbatê sînorek hatî diyarkirine. Di vir de bi qasî ku mirov bêje qet tine ye berjewendiya civakî, netewî, heta eşîretî hatiye tengkirin. Heta ger mirov bêje saziyek li derdora berjewendiyên hevkarên di nav malbatê de hatiye teşekirin, em ê bibînin ku ev hem artêşa betalan ava dike, hem jî ji bo leşker û karkeran bigire di sînora herî dawî ya bê hêzan de ye. Lewma saziya herî lewaz a berxwedanê ye. Hem bîrîmek bê parastine ku her cure zext û mêtîngerî bi rehetî dikare daqurtîne, hem jî ji ber têkîliyên xwe yên qabîle û eşîretên sedî salî ve dijî û vê jî li hember civakbûn û netewbûnê diparêze, yek jê saziyek bihêz a mêtîngerî xwe dispêriyê ye. Ji ber wisa ye zindî dihêlin û weke saziyek destûrê didinê derdikeve beramberî me. Wê demê malbata li Kurdistanê, li gorî statûya mêtîngeriya heyî hatiye sazkirin û berjewendiya tîpê ji bo malbata xwe qabîleya xwe jiyanek hevkar a ji sedî salan ve esas digire astek heye. Di mijara em tev dibêjin; “Di malbata te de, di malbata min de”, tenê saziyek mêtîngeriyê û hevkariyek wî destnîşan kiriye, di nava reîstiya eşîretê, sînorên reîstiya malbatê de saziyek pêveke. Bi rastî jî ev saziya pêvek, di rewşa çavkaniya pêşketinên herî xeter de ye. Neçare ku ev bê derbaskirin. Divê em vê saziyê li ser mêzeya emeliyatê bidin razandin, teşhîsek baş bikin, derbixin holê ku çiqasî xizmeta mêtîngerî û hevkariyê kiriye û neyêniyên wê danin holê. Ne valaye ku îro dijmin malbata dide pey me û li hember vê saziyê hêviyek mezin dijî.

Reîsê malbata me jî di nêvenga betalî de ji bo zarokên xwe ne dibistan, ne jî kar û perwerde yan jî pêşerojek bi tenduristî

nebe, her tim bêpersiyariyê kûr dike û komek mirov pêşkêşî bazarê dike. Her cure neyêniyê dipejirîne, vê jî weke çanda baviktî yan jî malbatperestî dide hemû endaman û tîpên herî sosret derdixe pêşberî me. Bal bidinê Ewrûpa saziya herî xeter yek jê jî malbata esasî xeter dibîne. Têkîliyên di nav vê malbata esasî de di astek girîng de azadin. Ne zilam zêde li ser jinê bare, ne jî jin li ser zilam. Ew jî perwerdekirî, bi çand, xwedî kare û ya din jî wisa ye. Lê tevî vê xeter dibînin. Nîqaş dikin dibe ku gef li azadiyê dixwe, hewl didin şêweyên nû pêş bixin. Li cem me jî ti nirxên netewî naparêze, ji hêla civakbûnê ve ber bi sazîbûnê ve naçe. Reîsê malbatê ji xwe re çend jin û zarok dîtiye, qaşo her roj kar dike. Gelo tiştа di bin navê kar de tê kirin çiye? Qaşo ji bo debara malbatê bike li gund çend karan dike, paşê ber bi bajêr ve baz dide, hinekê jî li wan deran kar dike. Bi rastî jî dihizirim gelo xwedîkirina malbatê çiye? Qaşo xwedîkirina pênc-deh zarokan çiqas pratîkek eslî ye? Dema hinekê zikê xwe têr dike wer dizane ku wezîfeya xwe pêk aniye, bi serbilindî ji bin her karî derketiye. Dibêje; “Min zarokên xwe hewceyî parîk nan nekir, ez zilamek bi namûsim.” Yên din jî dibêjin; “Bavê me em têr kirin, her hebî bavo.”

Divê mirov van jî di çarçoveya pîvanên hemdem de binirxîne. Ev têkîliyên ku gelek ji me dijîn, nayên pejirandin. Di wateya netewî, civakî û takekesî de jî nayê pejirandin. Têkîliyên ku mirov dikin kole û mirov bi tena serê xwe ber bi tinebûnê ve dibin. Baş dizanim ku gelek ji we ji vê malbatê qut bûne û bazdanê hatine. Em jî wisa bûn. Dema em ji bo çend hefteyan vedigeriyan hêlîna ku weke malbata pîroz binav dikirin tenê vizîniya bîranînan deng vedida. Ji ber ev şêwaza têkîliyek ku me ne dipejirand bû. Vê çavkaniya xwe ji biçûkdîtina malbatê yan jî ne ecibandinê ne digirt. Zêdetir me li hember têkîliyên heyî û pîvanên jiyanê îsyan dikir. Pirsgirêkên malbatê yek ji hêmana sereke em ber bi şoreşê ve birine. Îro em têkîliyên malbatê yên li

gund û bajarên Kurdistanê bêhn pê ketî napejirînin û metirsiya me heye. Pêşeroja kîjan zarokên ku bi tona li her deverî belav bûne heye? Ne kar, ne perwerde, ne tenduristî, ne jî welat û azadî, tiştek tine ye. Divê mirov vê qaşo ji berpirsên vê dê û bavan bipirse. Ev çiye? Dema lawirek jî li cem miroveké tî û birçî bimîne tevgav dibe. Lê ne di xema yên me de ye. Heta dema pariyek nan dibîne, weke yên welat rizgar kirine, dibêjin; “Me malbata xwe wisa kir, nizanim çawa kir.” Tevî ku ne di wê hêzê de ne ji bo me pêşerojek azad ava bikin, ji ber bê berpirsyar tevdigerin, me hêj di temenê biçûk de malbata xwe rexne dikir. Me dipirsî madem hêza te ya avakirina pêşerojek azad nîne, tu çima evqas bêberpisyarî dijî? Welatên sosyalîst zarokên xwe baş mezin dikin û baş perwerde dikin. Bi rastî jî ev rewş li welatên Ewrûpa jî erênî ye. Lê belê li cem me di vê mijarê de sînor nîne, bêberpirsyariyek mezin heye. Qaşo zarokên xwe pir hez dikin, lê di rastiyê de ya ku xirabûna herî mezin li zarok dike malbate. Em nabêjin dê û bav bi zanebûn dijminatiya zarokên xwe dikin. Ev jixweber çêdibe. Îro Komara Tirk jî vî tîpê sosret napejirîne. Komara Tirk bi konrola zayînê û hwd ve tevdîran digire, avakirina malbatek li gorî aborî guncav girîng dibîne. Weke meseleyek girîng hewl dide çareser bike. Bes pirsgirêkek ku wî bi xwe ava kiriye û ji nêz ve girêdayî mêtîngeriyê ye elbet Komara Tirk nikare ji holê rake. Her ku mêtîngerî hewl dide civakekê di şêweyek herî paşketî dest de bigire, van jî ji hêla aborî ve xizan dike û saziyên wê yên civakî û netewî ji holê radike, saziya malbat an jî malbatperestiyê jî ewqasî weke pêvek mezin dibe. Ev jî rê ji teqandina şêniyan re vedike. Ev rastiyek zanistî ye. Di welatên ku di bin statûya mêtîngeriyê de pêş dikevin de teqîna şêniyan tê zanîn ku ji nêz ve bi pergala emperyalîst û mêtîngeriyê ve girêdayî ye. Ji ber ku li ser me jî mêtîngeriyek pir dijwar heye, qelp mezinkirina malbatê, heman weke kolangerê qebran a pir cidî ya mêtîngeriyê pêş dikev e. Elbet ev ji bo şoreşê jî

pirsgirêkên mezin derdixe holê. Jixwe ji bovê em evqasî li ser şoreşgerbûna malbatê radiwestin.

Tevlîheviya di nava malbatê de, rewşa herî giran a pirsgirêkan bi awayek objektîf dîtinê de feyde heye. Saziya malbatê ya ku ne diyardeyeke ji sedî salan ve jixweber pêş dikev e re, hewce dike nêzîkbûnek siyasî bê kirin. Saziya malbatê ji aliyê hinek hêzan ve darek kirine bin milê wê yê çep û rastê wisa hewl didin bihêz bikin, lewma saziyek pir xeternak a paşverûtiya bîrdozî, polîtîk, exlaqî, çandî û aborî dide jiyîne. Serdestiya malbatê bi zilam ve girêdayî ye. Zilamê ku di nava malbatê de xwedî axaftine, di kesayeta xwe de ketîbûna giştî, ango hemû xirabûnên otorîteya mêtîngeriya serdest di nav malbatê de dide der. Ango zilamê ku ji otorîta siyasî, her cure sazîbûn, gotin gotinê, heta zimanê xwe axaftinê hatiye dûrxistin, ji hêla aborî ve hatiye tengavkirin, hêrsa ji pirsgirêkên heyî derdikevin di nava malbatê de bi ser jinê û zarokan de diçe û wisa bêhna xwe fireh dike. Sedema ku li nav civaka me şerên nav malbatê pir tundin çavkaniya xwe ji vê digire. Ango ger tu rêjeyek zêde mêşên hingivîn bixî nav kewarek ku têrê nake helbet dê nekare bide jiyîn. Her ku zexta li ser malbatê tund dibe, belavî nava hemû malbatê dibe û di encama vê de jî şer û gengeşe bi rewşek ku neyê jiyîn derdikeve holê. Ev jî di du xalan de tê çareserkirin. Yek, an dê dev ji malbatê berde, bireve û bêje; “Bêzar bûm.” Ya du jî, malbatek hinekê kifletê xwe hebin û mêtîngeriyê jî hinek derfet dabin, dê bi lezgînî ber bi mêtîngeriyê ve baz bide û hevkariyê kûr bike. Di van her du çareseriyan de jî encamek neyênî heye. Pêwendiyên xwe bi mêtîngeriyê re pêşxistin, pirsgirêkê giran dike, ji malbatê rev jî, malbatê ber bi hilweşandinê ve dibe û ev jî bûhranê her ku diçe kûr dike. Ji ber di malbatê de şoreşgerbûn, wekhevîparêz û azadî tine ye, otorîteyek qelp û xeter ji zilam re tê dayîn. Zilam jî otorîteya ku di civakê de dibîne û li ser wî tê ferzkirin di nav malbatê disepîne. Heman ew dibe şahê malbatê,

weke hêza despot û otorîteyê xwe têr dike. Di vê rewşê de weke; “Her çendî hinek min didin meşandin, ez jî 5-10 zarokan û çend jinan xwedî dikim, ez jî şahek biçûkim” derdikev e holê. Heta bi nêzîkbûna “ez camêrek wisa me” her tim li jinê û zarokan dixe. Ev jî mêrxasiyek qelp bi wî re pêş dixe. Bi lêdana jin û zarokan ve hestên mêrxasiyê dijî. Ev tîpê zilam, şêweza ketîbûnê ya herî xetere. Hestên “begtiyê” ya malbatî hinekê rehetî û mezinbûnê dide zilam û wî têr dike. Li Ewrûpa û welatên sosyalîst tiştên wisa tine ne. Gelek saziyên civakî ev rewş derbas kirine. Elbet ev pirsgirêk li cem me kûrtire. Me da diyarkirin ku dema zilam pir hewce dibe ber bi çi ve dibeze. Weke di zagona “cerdevaniya gundan” de jî tê dîtin, ber bi çek û pereyan ve dibeze. Paşê jî trajediyên tên zanîn derdikevin holê. Hemû malbata xwe tine dike. Îro ev pirsgirêk bi hemû xofbûna xwe ve wisa derdiketiye holê. Tovên ku mêtîngeriyê çandine, jehir kirine û paşê jî li dijî xwe bikar aniye berhema wisa dide.

Pêwîstî heye ku hinek aliyên din ên saziya malbatê di roja me de dijmin pir pê bawere û hewl dide encam jê bigire bên şîrovekirin. Tê zanîn ku feraseta namûsê ya li cem me tê avakirin çiye. Ger tu bi jinê bilîzî, dê zilam bimire. Jin û zilam, ji bilî armancên netewî û civakî ewqas bi hevdu ve hatine girêdan, ger hinekê baldariya zilam li hember van armancan hebe, ji bo ji van bê qutkirin dikare çi bê kirin? Dema polîs ger hebe destdirêjî li keç, hevjîn an jî xoşewîsta wî dike, yekser zilam teslîm digire. Betale, bêhêze, birçiye, hinekê kar didiyê û zikê wî têr dike. Me di encama vê de sedan mirov winda kirin. Ango têkîliyek ku ew bi pê ve hatiye girêdan, îro veguheriye pêwendiyek dij-şoreşek bêhempa. Heman weke xefka nêçîrê zerar pey zerarê dide. Her ku destdirêjî malbatê dike cerdevan derdixe, şoreşgerî ji çiyê dadixe, her ku malbatê feqîr dike dikire. Hem bêhêz dixe, bê parastin dihêle, hem jî dema roja wê tê weke amûrek herî xeter bikar tîne. Saziya herî zêde me tengav dike malbate. Nexasim ji ber ku

nûnertiya nifşê kevin dikin, bavên ku nakevin pêvajoya şoreşgerî, dixwazin bi hemû hêza xwe ve malbata kevneşop biparêzin. Lewra destpêkê serî ditewînin, paşê jî di nava malbatê de her cure neyêniyê didin jiyîn. Ev jî rê ji şerek mezin re vedike. Ger wê neparêze, dê zilamtî ji dest biçe. Ji ber ku ew namûs, jiyan, felsefe û her tiştê wî ye. Mao jî dibêje ku li Çîn'ê saziya malbatê, yek ji xelekên herî xeter ên civakê girê dide ye. Lê belê li cem me xeleka yekemîne. Tevî ku mêtîngerî, axa û hwd her yek xelekekin, ev zêde me asteng nakin. Îro ya ku herî zêde gef li me dixwe û dibe sedema windakirina hêza me ev têkîlî ye. Me gelek qadro ji ber sedemên pirsgirêkên malbatî winda kirin. Heta gelek qadro ji ber vê pirsgirêkê nikare hemû hêza xwe tevlî şoreşê bike. Pirsgirêka di nav me de jî wisa ye. Li şûna ku malbat weke destlênayê dayîn, weke saziyek divê her tim li hember rêzdariyek hebe, bi mêtîngeriyê ve pir girêdayî ye û pişgiriya wî ya bîrdozî û polîtîk a li nav welate. Dîsa ji ber ku mirovê me bêçare dihêle, ji pêşeroja wan dûr dixe, bêberpirsyariyê pir dijî û teqez divê bi rexneyeke şoreşgerî ve, di nava pêvajoya şoreşgerî de bê destgirtin. Divê mirov di vê mijarê de ne dilê mirov ne dê û bav, ne jî heval û hogiran ne êşe. Ew mirovên pêvek ên rebenin. Ne hêza jina di nav malbatê de heye, ne jî hêza mêtînger an jî reîsê girêdayî axayê ku rêz li hember bê girtin heye. Şoreşger jî tenê dikarin van rebenan hişyar bikin, têkîliyên wan ên heyî parçe bikin, hewce bike otorîteya şoreşgerî ferz bike û li cihê hewce dike bide rawestandin. Divê em di pêvajoya Rizgariya Netewî de ji her hêlê ve astengiya malbatê bibînin. Astengiyek ku li pêş vê tûj dikin û dixwazin weke Çiyayê Agirî bilind bikin. Îro malbatan derdixin li hemberî berxwedanvanên me yên herî hêja. Gelo encama polîtîkayên dijmin bi rêya malbatê ferz dike çibû? Cezayê darvekirinê dan bi sedan hevalan, hinekan jî xayîntî kir û ketin nava xiyanetê û hinek hêjî pirsgirêkan derdixin. Di berdêla vê de jî mêtîngerî sonda "mirina herî xirab sonda Osmaniyane" rave

dike dide wan. Pey vê re jî reben an îxanetê dike, yan jî tê darvekirin. Her wiha mêtîngerî jî dest bi gotina “kuçik bi kuçik dide kuştin” dike.

Ma dê û bavê bûne dîlê fikra dij-serdemê dikarin çi bikin? Pêwîstiya şiyarbûnê heye. Hinek peywirên qelp ên siyasî jî bi serve dikin, nasnameya malbat û qabîleyê dikin amûra siyasetek hevkar. Binesaziyên li Başûrê Kurdistanê, rêberên malbat û qabîle yên di nava rizgariya netewî de hatine kûrkirin û encamên di nava me de derdikevin, destkariyên xwe ancex li ser vî bingehî saz dikin. Vê jî qaşo di bin navê rizgarîxwaziya netewî, Kurdewarî de dikin. Di rastiyê de malbata fosîl a hevkara herî xeter raber dikin, saziyên reîstiya eşîretê weke amûra kedxwariya kapîtalîstê wêdetir (elbet ên bi maskeya netewî) ne ti hewldane. Îro ev hewldan ancex dema bi rizgarîxwaziya netewî dilîzin bersivekê ji mêtîngeriyê digire. Weke saziyek malbatperest a rûpoşî, çavxayîn jî zêdetir fêlbaz û pir xeter pêş dikeve û derdikeve holê. Ev ne siyaset, her yekê saziyên malbatperestiyê ne. Mêtîngeriya ku nekarîne bi rêbazên kapîtalîzmê saz bikin, di bin rûpoşiya rizgariya netewî de xwîna mirovan difiroşin, feydeya zêde û nirx desteser dikin. Em ê jî herî zêde van nêzîkbûnan rexne bikin. Em ê gelek caran xeternakiya ferasetên ku saziya malbatê dixe rewşa amûra siyaseta hevkar jî danin holê. Ji ber ku malbatperestî, qabîleperestiya ku xwe bi rûpoşiya çavxayîntiyê veşartiye, ji êrîşên dijmin ên vekirî xetertirin. Her wiha ger mirov bal bidiyê cîh û rola van di rastiya me ya rizgariya netewî de zêde ye. Vêca, divê em jî çeka xwe ya rexneyan berfireh û dewlemend bikin.

Li gel her du hêmanên hatine destnîşankirin, me behsa hebûnên din ên pêwîste bên vekirin jî kir. Ferdê malbatê yê di van mercan de mezin dibe, di serî de jin, di rewşek pir xirab de ye. Di nava malbatek wisa ku li qiraxê kendalan dijî de, jin di rewşa herî xeternak de dijî. Li gorî rewşa jinê ya di nav civakê de deh qetî zêdetir di nava me de neyênî tê jiyîn. Dev jê berde ku jin bikare di

nava malbatê de xwedî gotin be, xwedî fikrek azad be, zimanê xwe vekirinê, gelekî dûrî azadiya xwe ye. Dîsa bihêle ku bibe xwedî hêza biryarê, nikare baş-xirab erka xwe ya pêvektiyê jî pêk bîne. Ango radeya ketîbûna di giştî de tê jiyîn baştir radeya ketîbûna jinê rol dilîze. Dikare bê gotin, qonaxa herî serî ya her cure zext û kedxwariyê jin dijî. Ji ber zilamê ku li derve lêdanê dixwe, erza wî tê şikandin, zextê dibîne, êşa vê bi serê jinê de dibarîne. Lewra rewşa jinê ya di nava me de jî tê jiyîn pir dijwar bêkesayetî, pirsgirêkên herî bi êş jiyîn, ne tenê ji ber jinbûna wê ye derdikevin, di heman demê de encamên ku ji mêtîngerî û hevkariyê derdikevin xala herî dawî ya xirabûnê ye. Bêhêzî û bêzimaniya jinê jixweber çênebûye. Qonaxek ku di nava sazûmankirina têkîliyên heyî de hatî pêşxistine. Dema hejmarek zêde zarok anîna ku êdî nikare rabike, feqîriya aborî û zexta civakî û siyasî jî serve dibe, ma ji jinê re tiştek bi navê mirovahî çi dimîne?

Niha li cem me behsa mafên jinê kirin wêdetir, divê em pirsgirêkê weke rizgariya jinê yan jî dê çawa ji nû ve beşdarî refên mirovahî bibe şîrove bikin. Mane tiştek bi navê kesayet nîne ku, behsa azadî bê kirin. Di bin zextek pir mezin de hilberîna fikir, bûna îrade, axaftin û beşdarbûna biryarek ji rêzê pir lewaze. Ev jî guhertina ku di nava me de jinê xwe pê nixwumandiye derdixe holê. Di nava mercên Tirkiyê de mafên jinê yan jî azadiya wê her çendî di wateyek burjuva de jî be, heta sînorekê pêş ketiye. Daxive, dimeşe, digere, dixwîne, dinêre û fêr dibe. Ev jî bi me re nîne. Bes ev, bi jinê re encama zelalbûna xisletên xwecihî û mehelî jî derdixe holê. Ev zemîna ku mêtîngerî xwe pir neyênî li ser disepîne, di heman demê de zemîna ku nirxên mehelî herî zêde xwe li ser didin jiyîne. Lewra zemîna ku têkoşîna rizgariya netewî jî xwe bispêriyê ye. Nexwe rastiyek derdikeve holê ku potansiyela şoreşgerî ya bi jinê re çi kesim dibe ji ya wan bihêztire. Ger zayendaku herî zêde ji statûya heyî xirab bandor

dibe di rewşekê de ye, wê demê zemîna ku dema têkoşîna rizgariya netewî herî zêde xwe bispêriyê yan jî bikarger be û bê birêxistinkirin dê potansiyela herî zêde pêşketî be.

Em dikarin ji bo malbatê jî çavderiyên berfirehtir bikin. Li cem me mirov dikare gelek aliyên malbatê rexne bike. Ji malbatê zêdetir, tişta li Kurdistanê tê jiyîn drame. Malbata ku li cem me gengeşe ye, sêkuça fêlbaziya ku fikir tê binaxkirin, vîn dibe texteya çêkirin û xirabkirinê, mirovên me tên perçekirin û belavkirinê ye. Lewra saziya ku divê pêşî bi şoreşger be malbatê em digirin dest. Divê şoreşgerek peywira xwe ya di vê mijarê de jidil bigire dest. Em nikarin vê têkîliya malbata paşverû ya mirov tenezil nake weke pirsgirêkek şahnaziyek hêsan bigirin û binirxînin. Em ne berpirsê vê têkîliyê ne, lê belê berpirsyariya me ya şoreşgerkirinê heye. Mirov dikare behsa gelek xalên din ên malbatperestiyê bike. Camêrê malbata xwe ava kirî dibêje; “Min cîhan rizgar kiriye” û xwe ji nav vedikişîne. Lewma em dibêjin ev têkîliyek pir xeternake û sazîbûna netewî û civakî asteng dike. Gelo xwe sipartina malbata biçûk ve dikare çi bê rizgarkirin? Tê zanîn ku keç û xortên mêrxas ên ciwan pênc-deh salan bi xeyalê dê malê saz bikin kar dikin û dijîn. Bi hêviya ku me saz kir, em ê saz bikin, tê sazkirin û paşê jî dê çawa debara wê bikin dikeve rojevê. Deriyên koçberiya ber bi Ewrûpa ve vedibin. Ev jî pênc-deh sal bi çêkirina malê û dîtina kar ve derbas dibe. Peyre jiyanek bi pîrbûn û mirinê ve xilas dibe tê jiyîn. Ango ji zayînê heta mirinê roja ku li derdora wê tê zivirandin, weke mohrek tarîtiyê bi ecnam dibe. Elbet ev şêwaza felsefe û nêzîkbûnek şaşe. Jin û zilamê her tiştî jixweberbûnê re dihêle û tiştek wan ne ewle ye, li cem me helwestên pir şaş raber dikin. Tevî ku evqas rewşên ku gef li pêwendiyan dixwin hene, tiştek ku ev zilam rizgar bike tine ye. Ger hûn hinekê pratîka xwe berçav bigirin, hûn ê bibînin ku rewşa we wisa ye. Ji bo hilberandinê amûrên hilberînê tine ne. Dê perwerde û çandê li kur peyda bike? Ev hemû hatine

desteserkirin. Li pey tenê xurbet dimîne. Jixwe li cem me sedema pêşketina xurbetiyê jî ji ber vê sedemê ye.

Em di bin navê rizgarkirina malbatê de her cure fedekariyê dikin. Ger fedekariyên ji bo malbatê hatine kirin, ji boşoreşê hatiban kirin, dê hem sed qetî malbat bilind bibûya, hem jî welatê me ji mêjve rizgar bibû. Xapandin ewqasî dijwar û hewldan ewqas vala diçin ku, qaşo ji bo rizgarkirina namûs û malbatê temenek tê tinekirin. Li cem me ne tenê rizgarkirina malbatê, ji bo rizgarkirina binemalê her tişt berçav tê girtin, heta mirinê jî diçe. Em ji gengeşe û şerê herî hêsan ê li Kurdistanê bigirin, heta pirsgirêka xerîbiyê û komek bûhranên derûnî, hema hema hemû jî weke berdewamiya pirsgirêka malbatê derdikeve beramberî me. Dibe ku gelek heval nexwazin nêzî vê pirsgirêka evqasî hevlîhevbûyî û di nava bêçaretiyê de tê girtin bibe yan jî ji vê biterse. Lê tişta herî zêde me tengav dike, çareserkirina vê pirsgirêka ku zerarên cidî dide pêşketinên civakî û netewî, yek ji erkên me yên şoreşgerî ye. Em ê ji hewldana evqasî temenê mirov diqedîne û vala bikar tîne rawestînin. Mêtîngeriyê piştî 12'ê Îlonê nîşaneya "xwedî li zarokên xwe derbikevin" bikar anî. Amûr, alav, dezgeh, qurs û hw pêşkêşî her malbatê kirin û hewl dan ji nû ve ava bikin. Tişta ku mêtîngeriyê jî xwest bi vê bike, astengkirina şoreşê bû. Bi koman ciwanên me bendewariyên wan ên "dê pêşeroja me çibe" heye. Di bingeha vê siberojê de zewacek çawa yan jî mijara sazkirina saziyek malbatê heye. Ji ciwanên li qehwexaneyan kom dibin heta keçên ciwan ên li malê, bendewariya hemûyan heye. Ger em bipejirînin ev bendewarî pêk jî hatine, bingeha malbatê ya madî tine ye. Rewşa li Rojava û Welatên Sowyetê ev rewş bi zagonan ewle kirine. Zagonên li welatê me jî, di asta ku li ser alema lawiran bê sepandine. Wê demê ev bendewariyên ku 20 salên ciwantiyê yên herî berhemdar dorpêç dike pir xeternakin. Enerjî û hewldan vala diçe. Ji borizgarkirina salekê 6 mehan dikevin li ser rêya Edenê, paşê

Stenbolê û niha jî Almanya. Wisa jî rihê mirovan derdikeve. Paşê di carekê de dibîne ku malbat çiqas paşketî ye û red dike. Encama ku derdikeve holê jî, her cure pirsgirêkên civakî digihin asta herî jor.

Weke tê fêmkirin çavkaniyek girîng a pirsgirêkên netewî û civakî paşverûtiya malbatê ye. Ev ne tenê rewşek objektîfe. Îro dijmin vê birêxistin dike, hewl dide malbata her hevalekê bi şêweyekê birêxistin bike. Ger endamek malbatê li cem me be, dijmin jî hewl dide endamê din bigire. Di roja me de malbat bûye çemka şoreş û dij-şoreşê ya xeternak. Divê em jî hemû hêmanên siyasî û civakî yên di vê zemîna têkoşînê de bibînin. Nexasim divê zêde bawerî bi nêvenga malbatê ya xwedî têkîliyên dij-şoreşa xeter nebe. Nêzîkbûnek rexneger û têkoşerî hewce dike. Bi cewherî mijara pirsgirêkê ev e. Encama ku em jî di vir de dixwazin bidest bixin, girêdana vê bi azadiya jinê ve çêkirine. Bes dema jin tê gotin, tişta tê bîra me malbate. Gelo jinek dervî malê û ji malbatê cuda tê hizirîn? Li cem me jina dervî malê tê wateya tawanbarî. Bi çavek jirêderkî li jinên wisa tê nêrîn. Jinek ji malê derxistin û anîna refên partî ji bo her hêmanekî bûyerek mezine. Wê demê li Kurdistanê tevgera jinê ya azad qet tine ye. Ev rewşa li mala dê û bav, li mala mêr hîn xirabtire. Tevgera jinê ya di refên civakî de, bi qasî em bêjin tine ye kême. Nexwe dê çareseriya vê çibe? Tişta ku herî zêde divê şoreş xwe bispêriyê, lê giranî û girîngiya vê pirsgirêka ji ber neyêniyan diherike li holê ye.

Divê mirov li vir rewşa pirsgirêkê ya di refên partî de bigire dest. Weke em çareseriya her pirsgirêka netewî û civakî ferz dikin, çeka herî bihêz a em li ser çareseriya pirsgirêka malbat û jinê ferz bikin jî, çeka partî ye. Di heman demê de di sererastkirina têkîliyên ku gefan li kesayetê dixwe, encamên xeternak ava dikin û nayên pejirandin jî bi çeka partî dibe. Giraniya pirsgirêkê neçar dike ku hûn vê çekê ji her hêlê ve bi

destkarî û rast bigirin dest. Çeka azadiyek mezin a evqas zehmetiyan ji holê rake û têkîliyên nayên pejirandin bin bixe partî ye. Dema em bi ser van pirsgirêkan de beziyan, çeka yekem hatî bîra me çeka partî bû. Me ber bi ku ve baz dida? Dema me dît damezrandinek burjuva ku kesayetek wisa esasgirtin me naparêze, em yekser aresteyî rêxistinbûnekê ve bûn. Encama ku divê ji vir bê derxistin ev e; di nêvenga bêrêxistiniya heyî de barê malbatê yê nayê rakirin, tenê dikariya bi tevgerek partî ve bihata rakirin. Wê demê yek jê sedema herî bingehîn a em ber bi rêxistinbûna partî ve birin, li dijî saziya malbatê ya xwedî erkên paşverû ye û pêveke, fikra sazûmankirina malbata partî ya bijare bû.

Divê hema mirov nebêje malbata partî û derbas nebe. Partî, malbata bijare ya me ji nû ve ber bi hemû damezirandinên civakî û netewî ve dibe. Ji hêla objektîf ve partî malbata bi pirsgirêk bin dixe, ji nû ve sazûmankirina malbatê teşe dike, ango destpêka avakirina malbata azad a şoreşgerî çeka me ya herî mezin, biryargeha me ya stargeh û baregeha me ya êrîşê ye. Ji bo rewşa li vir bi girîngî bê fêmkirin, divê mirov kûraniya pirsgirêkan bihese. Em hêjî di vê mijarê de wate nadin hewldanên nebes ên hinek hevalan. Weke kesek ku ji bin pirsgirêkên pir giran hatî, wê tu bibî camêrê hewldanên mezin. Kesek ku pirsgirêkan evqasî dibîhîse, nabe ku seresere û nebes nêzî pirsgirêkan bibe. Partiya ku evqasî girîng derketiye holê, divê em baş pênase bikin. Hewce dike em pêwendiyên li vir û ji nû ve damezirandinê baş pênase bikin. Heta niha di mijara girîngiya azadiyê de gelek tişt hatin vegotin. Tişta para me dikeve jî qîmeta vê zanîne. Ketîbûn, ketina kolanan û bi temamî tinebûn pir xirabe. Piştî ku ev rewş hat jiyîn jî ti qîmeta wê nîne mirov ji nû ve fêm bike xirabûn tê çi wateyê. Jixwe armanca partî jî, rizgarkirina kesên ketine vê rewşê ye. Her çendî hinek ji bo bi aqil bibin ji nû ve ketinê weke çare ferz dikin, ev ji ketîbûna xirabtir zêdetir ne tiştek dine.

Pirsgirêka me ev têkîlî di nava partî de rast girtina dest û nexasim erka hevalên di nava partî de yên li hember vê pirsgirêkê baş danîna holê ye. Pirsgirêkên gelek ji we hene. Pirsgirêkên me jî hene, lê çavkaniya van ne emin. Tevî ku em ne çavkaniya pirsgirêkane, berpirsyariya me ya çareserkirina vê, sazkirina pêşketina şoreşgerî heye. Divê hûn jî bên xwedîkirin, hûn jî nifşekê xwedî bikin, perwerde bikin û birêxistin bikin. Bes divê ev bi şêweyek herî azad bê kirin. Nexwe hûn ê ti mafê jiyanê nebînin.

Tevgera PKK'ê radeya bêberpirsyariya ku civak di navê de dijî dizane û tevgerek wisa derketiye holê, lewra dê qet kûrkirina bêberpirsyariyê nepejirîne. Rêzdariya li hember zarokan, jinan û wekhevî, bi binpêkirina pergala têkîliyên heyî ve pêk tê. Bi şêweyek qelp li malbatê nêrîn, mûçe û pere bidestxistin, em ti caran têr nekirin. Jixwe hêviya malbatan a li hemberî we jî ev tişte. Li hember vê rewşê jî, weke ku em ji malbatan, dost û hevalan bistînin, me hewl da ciwanan di refên partî de bigihînin hev. Bes ev sitandin di wateya ku em ciwanan ji çirava paşverûtî, bêberpirsyatiya giran rizgar bikin de ye. Ji bo ciwanan asteng bikin beşdarî refên me nebin, tenê dijmin kar nekir, bi rêbazên qet nehatine dîtin ve hêzên hevkar jî yên ku ji pakbûna ciwanan sûdwergirtin gelekî hewl dan. Hêjî gelek hêz di bin navê "ev û ew li cem me hene, lê di nava PKK'ê de tiştek tine ye" me tawanbar dikin. Baş tê zanîn ku karê sereke yê rêbazên burjuvaziya biçûk kevçiyek şirînî dana devê girseya gele. Ev sepandina polîtîkayên tawîzên biçûke. Ji endamên partî re dibêjin; "Ha ji te re ji xwe re mal ava bike, ji te re evqas pere, hinekê jî rehet bijî." Jixwe qadro jî ji rêbazek wisa re amade ye. Bes tişta li vir winda jî dibe doza şoreşê ya bingehîne. Gelo dema malbata burjuvaziya biçûk ava bû dê çi rizgar bikin? Dibe ku hinekê xwe têr bikin, lê azadî nayê rizgarkirin. Bi vê partî nayê rizgarkirin û rizgariya netewî jî saz nabe. Em jî bi israr partî ji ketina vê rewşê

rizgar dikin. Ji bo partî nekeve vê rewşê me hewldanek taybet da. Me ev jî weke tedbîrekê destgirt. Nexwe ne şêweya sezakirin an jî ji mafên kesî mehrum hiştine. Hinek ketî bi îdîaya “mafê me yê avakirina malbatê tê astengkirin” ve li ser me van ferasetan ferz kirin. Jixwe ne diyare xwedî feraseta malbatek çawanin. Ji ber ku em dizanin saziya malbatê veguhertine saziyek çawa ya xeter, me jî ev îdîa tên çi wateyê baş fêm kirin û rastiya wan danî holê.

Ji ber ku tevgera ku rexneyên herî rast li saziya malbata heyî dike em in, dijmin hêjî bi lêkolînkirina nêzîkbûnên me ve mijûle. Em jî ji wî re diselmînin ku ev malbatok û malbatên burjuvaziya biçûk ên wî ava kirine çawa kêrî tiştekê nayên û nikarin me asteng bikin. Em bi hesaba ku mirovên me yên dijmin xistine û di nava zexta malbatê de tengav bûye veguherînin şoreşgerek bihêz ve mijûl dibin. Ger îro hûn tev di refên malbatê de bûna, ji bilî jin û zilamek şeht ne dibûn tiştek din. Niha em dikarin pir hêsan bêjin ku, ger tiştek we jî nebe, qet nebê mejî û dilek we heye. Ger ev jî nebûya, dê gelek ji we di bin pirsgirêkan de biçewsiya û pişta we qov bima. Mirov nikare bîne ber çavên xwe dê rewşa we çawabûya. Beriya her tiştî dê hûn ê bibûna tîpên pişta wan tewiyayî, di bin pirsgirêkan de çewisî, ji hêza fikir dûr û pir dûrî azadiyê bûna. Qonaxa em îro gihiştinê destkeftiyek mezine. Niha hûn dikarin gelek tiştan li ser bingehek nû û azad saz bikin. Lê ger ev têkîliya şoreşgerî nebûya, dê we şansê vê di hemû jiyana xwe de winda kiriba. Jiyîna xeyalek hêsan her çendî mirov rojane rehet bike jî, rehetiya ku hedefên mezin pêk bîne û mezinbûna wê qet nedibû. Jixwe ji ber em di heman demê de berzbûnê, esîlbûnê û her tim kûrbûnê ferz dikin, em pêş dikevin û mezin dibin. Pir baş tê zanîn ku, dema berê kesî li we guhdar nedikir, îro her cihê hûn diçinê bi hezaran mirov li ber we radibin. Kesên ku nedizaniyan baxivin, îro propagande dike û dibe îdeologek. Kesên nedizaniyan bimeşin jî, îro tevgerê birêve dibin. Ev pêşketin jî xêra partî çêbûn. Ev berzbûn û mezinbûne. Bes,

gelo ev bi xêra çi pêk hatin? Hinekê jî tevî rika we, rika azweriyên burjuvaziya biçûk ev hatine sazkirin. Pey vê re gelek ji we ne paşve, dikare pêşve gav bavêje. Ev jî pêşketinek mezine. Ev jî dide diyarkirin ku pratîka me bi cewhera me re pêş dikeve. Îro rewşa we jî weke siyasetmedarên hevkar ên lewaz wêdetir, ji hêla madî û manewî, exlaqî, siyasî, bîrdozî û gelek aliyan ve li pêş gelek rêberên wane. Her yek ji we carina weke ku dê cîhanê ji nû ve ava bike, xwe bihêz dibînin. Ev îdîayên mezinin û ger ev nebe ti hewldanên cidî û serkeftî dernakeve holê. Belê feraset û amûra me ji bo rizgariyê derxistine holê ev in. Bi rêbazek ji bilî van girtina we, ji bandora têkîliyên malbata paşverû û têkîliyên paşverû xilaskirin pirsgirêkek mezine. Niha ev hatiye sazkirin. Li Kurdistanê yekîneyek pêşeng û têkîliyek pêşeng sazkirin, bûyerek mezine. Ger em berçav bigirin ev pêşketin bi astengiyên çawa re rûbirû maye, dê mezinbûna vê nirxê jî ewqas bê dîtin. Bûna otorîteyek ku li ser çarenûsa Gelê Kurdistanê serwere û bûna qurmayek ku her cure têkîliyê ji nû ve ava dike, vînek ku mirovê me ji her cure ketîbûnê û seqetiyê rizgar dike raberkirin, destkeftiyek mezine.

Lewma niha dijmin qiyametê radike. Nexasim di roja me de her ku diçe karbidestiya pêşengiya PKK'ê dijmin har dike. Nexwe sedema dînûharbûna dijmin ne tarûmarkirina mala çend xayîna ne. Dijmin pişgiriya mezin û hêza vîna mezin a li pey çalekiyên me dibîne û har dibe. Weke pehlîwanek qelp êrîşî çep û rastê xwe dike. Bes di rastiyê de jî em hêj sînordar û lewaz pêş dikevin. Lê her ku cewher û encamên vê têkîliya ku hatiye sazkirin difikire, nikare rehet raze. Wê demê em ê rastiya xwe ji vê hêlê ve jî bi kûranî fêm bikin. Ger hûn bal bidinê me heta niha di refên partiyê de pêwendiyek jin û zilam a cuda, di mijara pêwîste xebatên azadiya jinê çawa pêş bikevin de xebatek cuda ne daye meşandin. Lê ev nayê wê wateyê ku me di derbarê pirsgirêka jinê de têkoşînek bêhempa ne meşandiye. Yek jê

têkoşîna herî dijwar partiya me meşandiye bi giştî di derbarê malbat taybet jî yê jinê de mijara gelo dê di refên partî de pirsgirêka bijîn an jî neyên jiyîn de bû. Girêdanek pir dijwar di navbera mînakek herî biçûk di refên partî de girtin, jîndarkirina wê û di nava civakê de pêşxistina tevgera azadiya jinê ya berfireh de heye. Tişta di mînakek biçûk de hatiye dîtin, tişta ku dê siberojê de li nav civakê pêş bikeve rave dike. Diviya me ev jî bi girêdayî fêrbûnên xwe kiriba. Weke em di beşa yekemîn de berfirehî li ser rawestiyan, weke parçeyek tevgera wekhevî ya giştî, ger em tevgera wekhevî û azadî ya jinê evqasî bi kûranî datînin holê, ev pêdiviyek girêdana me ya bi bîrdoziya me ve ye. Ger em refên xwe jî niha wisa perwerde dikin û digirin dest pêwendiya xwe bi vê ve heye. Ev jî dide diyarkirin ku em mijarê paşguh nakin û jidil amade dikin. Dibe ku gelek ji we dihizire “gelo partî pirsgirêka min dibîne? Rewşa min fêm dike? Em jî dikarin bêjin ku em pir kûr dibînin û têdigihijin. Lê ji ber ku em di rewşa çareserkirina vê de ne, em dahûrînên takekesî esas nagirin. Nexasim hewldanên provakator hewl dan ji çareseriyên sexte yên di vê mijarê de xwe bidin jiyîn. Têkîliyên yek rengî, rehet û fêr bûne ferz kirin, mirov wisa rehet kirin û li çareseriyê gerîn. Na, jixwe em dizanin ku ev tiştekê rizgar nakin. Nêzîkbûnek rêgezî, bi vî şêwazî partî girtina dest, piştre di nava partî de erkên di derbarê vê mijarê de bi ceribandin û ezmûnan kirin û ger danehevek jî hebe, qadroyên me yên bi rêgez û têkîliyên me çêbûne, em ê bibin hêza ku bikarin gava duyem a bingehîn bavêjin.

Pirsgirêka rêxistinkirina hêza jinê weke peywirekê li pêş me ye. Rêjeya beşdarbûna jin a ji têkoşîna me re, nexasim dema mercên destdanê hebin, ji hêza zilam mezintire. Lê ev jî bi serê xwe karê rêxistin û têkoşînê ye. Ev aliyek mijarê ya yekemîne. Ya duyem jî pirsgirêka pêwendiyên di nava partiyê de ne. Di nava refên partî ya ku refên azadiyê de çi jin çi jî zilam nikare gavên

xwe rast bavêje. Mînak jina ku heta duh dîlgirtî bû, hêj hêmanek me ya nû hatî, li hember azadiyek evqasî berfireh şaşwaz dimîne. Nizane dê çi û çawa bikar bîne. Di vê mijarê de bê perwerde û dinyanedîtî ye. Elbet rewşek ku divê jidil li ser bê sekinandine. Ango dibê ku yên wisa hîn zêdetir bin.

Zilamên di nava me de jî di vê mijarê de dibin mîrateyên barên têkîliyên kevin. Bi gelemperî perwerdeya partî jî dibe bingeha perwerdeya di vê mijarê de. Lê mixabin hêjî rewşek ku darezînên feodalî zêdetirin derdikeve holê. Lewma di nava partî de di asta têkîliyên jin û zilam de hêj quralên azadiyê pêş neketine. Amajeyên biyanîbûna ku hûn beramberî hev dijîn hene.

Seqetiyên di nêzîkbûnan de diyarkerin. Nêzîkbûn bi gelemperî hestewarin, mîrateyên feodalî û sînorên têkîliyên burjuvaziya biçûk derbas nakin. Ger ev rewş her tim bê jiyîn dê mirov birizîne. Em şoreşger mirovên ji xwe bawerin. Her wiha armanc û xisleta ku pêwendiyan şoreşger dike heye. Ango ji nêzîkbûnên weke refên partî ye, derfet û firsend hene, em ê li gorî xwe binirxînin wêdetir, erka me ya mezinkirina vê pêwendiya azad heye. Çiyê we dibe bila be, bila nasê we be, bê ku bike mijara heval û hogiriyê, ger dixwazin di nava refên partî de pêwendiyek jin û zilam a rast ava bikin, em ê beriya her tiştî rêya di vir de ber bi azadiyê ve diçe û vîna kesayetan a beramberî hev derbixin holê. Hêza zilam dikare nêzîkbûnek weke; “Jixwe vîna jinê lewaze, dikare ji nav refên partî bê derkirin. Lewaz bê hiştin” raber bike. Her wiha hêza jin jî dibe ku bêje; “Di nava refên partî de azadiyek berfireh û pakbûn heye. Ger em fêlbaziya xwe ya dîrokî jî bikar bînin, em dikarin serûbin bikin.” Lê belê, ev nêzîkbûnên xeterin. Refên partî yên azadiyê bi xwîn û ezmûnên mezin ve hatiye avakirin. Di nava van refan de ne pêşdarez ên feodal û burjuvaziya biçûk dikare xwe bide axaftin, ne fêlbazî û ne jî ziraviyên kesan ên xwe ferz dikin, dikarin encamê bigirin. Her kes li vir ancex dikare nirxan hinek din mezin bike û hevalên

xwe jî pêş bixe wisa nêz bibe. Ger jin jî dixwaze tiştên baş bide, divê pêşveçûna xwe ya jinbûna wê dikare tevkariyek baş ji civakê re bike bibîne. Ev çiye? Ev jî bi mezinkirin, dilxweşî, hezkirin û rêzdarbûnê dibe. Di nava refên rêxistinek ku xwe ji çewsîneriya sedî salan rizgar kirî de, têkoşîna azadiyê baştir tê meşandin. Wê tu jî li wir vîna xwe bidî pêş. Firsendên ku te li nav civakê peyda nekirine, li vir binirxîne. Refên partî jî ji bo vê ne. Nexwe nêzîkbûnên xwe li vir dana ecibandin, jixwe li vir hejmarek kêm jin hene, ger em bikarin hinek din pêşbaziyek baştir bikin, em ê xwe başdir derbixin pêş qet ne rastin. Jin dikare bêje; "Li vir firsendek mezin heye, li dijî statûyek ku di civakê de ez diçewsandim, mehkum dikir û tine dikir, heta dawî statûyek wekhevî û azad heye. Lewma divê ez jî qîmeta vê bizanim. Divê tevkariyek min ji vê refa ku bi xwîna şehîdan û hewldanên berxwedêran hatiye avakirin re dewlemendiyek min be." Belê, tişta ku divê hêza jin a di nava partî de bike ev e. Rabirdoya me ya nêz di vê mijarê de mînakek mezin da me. Li kêleka gelek mînakên me dîtin jî, xwe ji mîrateyên jinê yên rabirdo û bermahiyên nêzîkbûnên jinwarî ne rizgarkirin, hebûn. Weke tê zanîn di vê mijarê de gelek reftarên ku rê ji provakasyonan re vekirîn derketin pêş. Dîsa dijmin van lewaziyan dibîne wisa êrîş dike. Ji ber ku dijmin baş dizane nexasim qadroyên PKK'ê têkîliyên paşverû, hestewar, sivik, dîsa di navbera zayendan de, zewacên paşverû dûr bên girtin tedbîrên taybet tên pêşxistin, li ser vî bingehî ew jî jinê weke çekekê bikar tîne, hewl dide qadroyên me berevajî bike. Elbet ev hewldanek bê dawî bû.

Em ji destpêkê ve bi tedbîr nêzî vê pirsgirêkê bûn. Çi ji hevjîn û dayîk dibin, çi jî jinên ku tevlî nava refên me dibin re, me ti caran hezkirin û rêzdariyên xwe kêm nekir. Me her tim diyar kir ku evder refên azadiyê ne û weke ewleya jiyîna azad pêşkêşî wan kir. Bes di heman demê de ya em li bendê jî jinek azad û her ku pêşve biçe bigihe tevgerek jina azade. Di vê mijarê

de hewldana ku bê kirin jî dê heta dawî pişgiriyek wê hebe. Her çendî di vê mijarê de serkeftinên pir mezin hatibin destxistin jî, ev feraset bi me re serwere. Me îro rêya ber bi tevgera jina azad ve diçe pir baş hilbijartiye. Di vê xalê de jî partîbûna me ewleya herî saxleme. Hinek rewşên xirab ên derdikevin ti caran nikarin xisleta partiya me ya ewlebûnê xirab bikin û bihejînin. Dê pêşketinên ku ji vir û şûn de jî rû bidin, girêdayî rast bikaranîna vê bin. Hûn jî êdî dikarin di van mijaran de baştir bihizirin, pêşniyarên baştir bikin û xwe bigihînin pergaleke pêwendiyan. Derfetên vê hene. Dixwazin çi camêrî çi jî xanimî nêz bibin, dîsa jî hûn dikarin bersiva rast bidin pirsa dê pirsgirêka jinê çawa bi şoreşgerane çareser bibe. Têkîliya şaş çiye? Têkîliya rast çiye? Hûn dikarin bersiva van bidin. Hûn di van mijaran de radeyekê ji hinek astengiyan, dilketinan rizgar bûne, divê ev jî rast bê bikaranîn. Ev peywirin. Nebikaranîna van jî peywira xwe nepêkanîne. Em bawer nakin ku kesê peywira xwe pêk neyîne jî bikare bibe pêşengek baş. Pêşeng, pêşengek yekpare ye. Pêşeng tê wateya kesê xwedî li peywirên xwe yên li hemû qadan derdikeve, pêşketinan saz dike ye. Tevî vê nabe ku hûn bêjin; "Em di vê mijarê de pir lewazin, jixwe qadek hestiyariya wê zêde ye, ez di vê mijarê de xwe nagirim, hinekê jî sistim." Divê em cidiyet, berxwedêrî û xweseriyek hêjayî cewhera rêxistinê raber bikin.

Civaka me bermahiyên giran ên feodalî, têkîliyên burjuvaziya biçûk û ferzkirinên mêtîngerî yên nehatine dîtin heta sînora dawî dijî. Her wiha ev ne bi zanebûn jî be, di rêjeyek mezin de ber bi refên partî ve diherikin. Ev feraset têkil fikir û ruhê qadroyên me jî dibin. Lewra gelek nexweşiyên çavkaniya xwe ji van digirin vî zemînî jî şêlo dikin. Entrîka, fesadî û fêlbazî carina di nava partî de jî derdikevin holê. Ev nexweşiyên wisa xeternakin ku xwediyên xwe jî tengav dikin. Em li gorî ked û têkoşînê di nava partî de cîh didin her kesî yan jî hewl didin di nava partî de bikin têkoşer. Weke di giştî de esase, divê taybet jî

wisa li ser milan bilindbûn çênebe. Divê ked pîvana herî berz û diyarker be. Ya ku li vir mijara gotinê ye, ne kedaku li pey entrika dibeze, keda şoreşgerî ye. Mezinbûna peywiran bigirin berçavan û wisa divê em wextê xwe baş bikar bînin. Bi nêzîkbûnên israr dibêje; "Bextreşî ye, paşeroja me wisa ye, em naxwazin dîrokî bin" ve nebin evîndarê tinebûn û hejarvaniyê. Em nirx nedin dûrbûna ji afirandinê. Ya dimîne jî jîndarkirina jêhatiyên ku pêşketinan ava bikin. Bi rastî jî lewaziyên hevalan ên di vê mijarê de jî bi mirov re fikaran çêdike. Na. Mirovê mezin divê di her mijarê de mezin be. Her yek ji we dikare bi sedan jinê kole bigihîne azadiyê. Ango gelek hevalên xort dikarin wan serwext bikin, perwerde bikin, birêxistin bikin û têkoşînê pê bidin kirin. Ma nêzîkbûna ji jinê re neçare ku di çarçoveya mebestdariya cînseltî de be? Yan jî divê di derbarê sazkirina malbatê de be? Na. Berovajî divê em rêbazên wan ên encamgir ên tevgera azadî ya mezin bibînin û bi ferzkirinê wan beşdarî têkoşînê bikin. Em ê bizanin ku ev çavkaniyek me ya hêza girînge. Divê neyê gotin têkîliya jin û zilam a em di vê mijarê de dizanin li nav civak, dibistan û kargehan jî dibe. Divê li cem me ne wisa be û em vê kevneşopiyê bişkînin. Divê ji pîrka 70'î salî heta keça 15 salî van rêbazên xwe pêş bixin û van weke peywirên xwe yên şoreşgerkirinê ser bixin. Pêwîste li vir têkîliyên cînseltî, hestewarî, malbata taybet û hwd qadek kêm dorpêç bike. Em gelek caran destnîşan dikin ku divê nêzîkbûnên wisa di nava qadroyan de ne serwer bin. Ango ne em dikarin nêzîkbûnên zêde hestiyar tenê xisletên xwezayî dikarin raber bikin –jixwe ev jî ji rêderketine-, ne jî em dikarin nêzîkbûnek weke gunehe, li gorî baweriya me wisa ne welê ye, dûr bisekine raber bikin. Na, mirov qadek çalekiyê ya divê bi çalekiyên şoreşgerî bê destgirtin, bikaranîn, mezinkirin û bilindkirine. Gelo dê pêşengên wisa derbikevin? Jixwe ev yekane rêya mezinbûna me ye. Jin û zilamê ku vê bike mezinbûna xwe selmandiye. Jin û zilamên din jî,

kesayetên ku sînorên pergalê neşikandine, derbas nekirine û lewma nekarîne bibin pêşeng. Namûsbûn û bûna xwediyê rolek mezin bi pêşengbûnê ve gengaze. Divê em ji bo vê rolê wêrek bin.

Her çendî ev pirsgirêkên civakên Rojavayî nebin jî, yên me jî evqasî pirsgirêkên me hene. Weke ku em sînorên van evqasî berfireh digirin dest, tevgera me ne li ser bingehek azadiya burjuva ye. Tevgerek ku di nava xwe de xweseriya hatî diyarkirin dihewîne. Ger qadroyek xort qadaku diçiyê, ji sedan jinên heyî re rêxistinbûnek baş nabîne, wê demê wî peywira xwe ya di mijara tevgera azadiya jinê de qet fêm nekiriye û bicîh ne aniye. Dîsa qadroyek jin a di refên me de, ger bêrêxistiniya pir mezin a jinê dibîne, di vê mijarê de serwextbûn û rêxistinbûnê saz nake û nikare derûdora xwe ya nêz jî birêxistin bike, wê demê ew di nava kêmasiyek mezin de ye. Beramber hev girîngiya peywirên di mijara pirsgirêkên jinê de dîtin û karkirin hewce dike. Bes di nava me de dev jê berdin peywira xwe şoreşgerî wisa di nava civakê de pêkanînê, dema di nava bîrîmekê de çend jin hebin ewder vediguhere bîra viran. Carina jî dibe navenda fesadiyan. Li beramberî hev çavnebarin, dest bi şer dikin, piştî şer jî dibin belaya serê me. Lewra niha pirsgirêkek herî zêde em li ser dihizirin û disekinine. Gelo em qadroyên jin bidin yekîneyek gerîla, yan jî nedin? Gelo dikarin pêwendiyên beramber hev baş bidin meşandin? Gelo dê nebin zemîna gelek xirabiyên cur be cur? Gelo bila jin cuda, zilam cuda şer bikin? Ma em çima van pirsan dikin? Ji ber sedema wê çi dibe bila be, mînakên baş dernakevin holê lewra. Carina yekser têkîliyên kevin derdikevin pêş.

Piranî binyata me ya gundî lewaze. Hevalên xort ên bingeha wan gundî di vê mijarê de yekser helwestên hestiyar raber dikin. Jin jî di vê mijarê de peywirên xwe yên perwerdekar û rêxistinkariyê zêde pêk nayînin. Ew jî dibêjin jixwe nêvenga

azadiyê ye, vê şaş fêm dikin û wisa disepînin. Her wiha jî zerar ji vê dibînin. Îro ev têkîlî bi şoreşgerkirin, anîna rewşek têkîliyên herî sûdmend û potansiyela jinê ya ku li Kurdistanê pir bi hêze têkil vê pêvajoyê kirin, yek ji peywirên herî girînge. Di meşa ber bi wekheviya hem çînayetî hem jî di navbera zayendan de yek ji erkên herî cidî ye. Dê jin rizgariya xwe ya li vir bihêz û birêxistinkirî beşdarbûna xwe ya ji pêvajoyê re bidest bixe. Nexasim di roja me de çiqas bikare serwext, rêxistinkirî û bi xweseriya xwe ve xwedî bernameyek yekîneya ku hedefên wê datîne holê û bi avakirina pêşengên xwe ve tevlî pêvajoyê bibe, dê ji niha ve ewleya wekheviya di navbera netawan, çînayetiyan û zayendan de ava bike. Dê tevgera me ya partî jî hewldanên xwe yên di vê mijarê de tacîdar bike.

Li gorî ku em tevgerek evqasî xwedî fedekarî û wêrekin, em dikarin di vê mijarê de jî afirîneriyê derbixin pêş. Ber bi sazkirina eniyan ve, damezirandinek me ya din jî tevgera yekîneya jinê ye. Dema em vê pirsgirêkê digirin dest, mirov dikare perspektîfa teorîk a em esas bigirin wisa be. Bername û rêxistinbûna girêdayî perspektîfa teorîk ne zehmete. Di vê mijarê de yên hedefên xwe yên siyasî û civakî zêde bikar tînin, dikarin pey wê re bername û rêxistinbûnê, li her qadên ku xebat lê heye - li nav welat, dervî welat, bi çek an jî bê çek- berfirehkirin. Divê mirov derfetên di vê mijarê de heyî baş bikar bîne. Weke her mijarê, ji bo vê jî hewldanek hûrûkûr dayîn, cidî girtina dest û tevkariyek hewce dike. Divê para hewce jî ji xweseriya tevgera yekîneya ku dikare pêş bikeve re bê dayîn. Divê yên van dimeşînin cidiyeta vê fêm bikin û wisa bimeşînin. Ango divê her şoreşvanek qadaku lê ye, bi nêzîkbûnek rast ve bikare ji bo şoreşê çend qadroyên jin perwerde bike. Pêwîste dema jin rêdikeve ne weke quralên hatine fêrbûn li ser bingeha girêdayî be, divê di hedefa wê de pêwendiyên azad hebe. Beriya herî tiştî li vir pêwendiyên azad û pêwendiyên rêxistinê hene. Divê vînên azad

derbikevin holê. Têkîlî û zewacên nikarin li hember vê li ber xwe bidin, nabin têkîliyên şoreşgerî.

Pişgiriya herî girîng ku em bidin tevgera jinê, ev nêzîkbûne. Em yeqîn dikin dê nêzîkbûnên me serwextbûna hevalan rast û dewlemend bike. Qet nebe ger ji vir û şûn de li ser vî bingehî nêzîkbûn ji nîqaş û pêkanînê re bê kirin, dê hinek xalên ecêb dernekevin holê û di heman demê de sînordar jî hinek pêşketin rû bidin. Ji ber ku mijarek hinek hevalan ji kûranî dixe nava fikaran û heta hemû şaneyên me tên destgirtin. Gelo em ê çawa nêzî peywirên li hember malbat, hevjînan û jinê bibin? Raste, ev pirsgirêkên cidî ne. Bes em jî dikarin nêzîkbûna herî rast û di asta pêşveçûyî de wisa danin holê. Pey wê re jî ya pêş bikeve çêbûn û pêşketina azadiyê ye. Em ne dikarin bi fêlbazî nêzî vê meseleyê bibin, ne jî em dikarin bêjin bila çavên me weke burjuvaziya biçûk nebîne, bila her tişt bibe. Em nikarin vê qadê weke qada têkîliyên herî xirab û li bazaran bi şêweyek herî sexte tê pêşkêşkirin bibînin. Nêzîkbûnek wisa bêrêziya herî mezine.

Hinek hevalan dem bi dem pirsgirêkên xwe yên kesayetî ji me re vegotin. Me got dikarin nîqaş bikin. Li ser bingeha nêzîkbûna me raber kirî, dikarin vê bi dewlemendî bigirin dest, rewşa xwe berçav bigirin û bigihijin encamên ku dikarin rabikin. Em dikarin vê jidil bêjin, ti tengaviyên di vê mijarê de nikarin me ji nêzîkbûnên berz û peywirên şoreşgerî dûr bixin. Em pir baş dizanin ku, dema provakasyonan xwe da der, hewl da vê qadê bikar bîne, bi nêrînên bêhn pê ketî yên weke “ciwantiya me vala diçe, em nizanin dê dawî çibe” ve xwestin bimeşînin. Elbet tiştek wisa tine ye. Di nava yekîne û xebatên me yên azadiyê de cihê van fikrên bêhnpêketî -jixwe ev nêzîkbûnên mirov jê şerim dike, di heman demê de nêzîkbûnên ku dijmin didan pêş bûn- nîne. Hewldanên me û hemû nirxên me yên berxwedêr raber kirine, ne di xêra berjewendiyên erzan de ye, nizanim weke fikrên “wisa li ciwantiya me hat, mala me bi serê me de xirab bû” bûn. Ev

nêzîkbûn bi ti şêwazî qet nehatin bîra nirxên me yên berxwedêr. Wê demê weke şopdarên wan, em ê bizanin bi şêwazek hêjayî wan bijîn. Ji bo vê jî, hinek hevalên ku pirsgirêkên wan ên takekesî hene bila qinyata xwe bi partî û nêzîkbûna partî ya di vê mijarê de bînin, dê wisa xwe pak bikin, çareseriya ku şoreş ava dike, bibe çareseriya wan jî. Bila pirsgirêkên bi qasî qesran di nava xwe de ava kirine hilweşînin, ji vê netirsin. Em weke şoreşgeran, her tiştê girêdayî duh û kevnare ne serûbin dikin û pêşengên wisa ne wêrekin ku yên nû ava bikin. Lewra ti gumanên me di derbarê rabirdoyek pir xeternak a ku ferasetên me tarî dike de nîne. Em ewqasî bi pêşerojê ve dagirtîne, li vir her tişt dikare ji nû ve bê avakirin. Her wiha hinde paşerojek ku pêwîste bê hilweşandin heye, her tişta ku li vir bê hilweşandin dê bibe zemîna herî saxlem a damezirandina pêşerojê.

Wê demê divê em pir xurt li dijî astengiyên cur be cur ên ku li pêş tevkariyek dewlemend a tevgera azadiya jinê di nava refên partiya me de ji tevgera azadiyê ya giştî re bike derbikevin. Em ê lewazî û pirsgirêkên giran ên ev têkîlî bi gelemperî ava dikin berovajî bikin. Em ê her cure nêzîkbûnên ku di vê mijarê de pêşketina partiya me giran dike, hemû enerjî, vîn û zanebûna me ji pêşxistina xebatên partî dûr dixe, tengavî, rexne û nêzîkbûnên xerîze yên çavkaniya xwe ji vê digirin û her cure çewtbûnan berteraf bikin. Em ê li şûna van weke xwediyên nêzîkbûn û pêkanînên ku hêzek mezin didin partiya me, têkoşîna me dewlemend dikin, heta dawî rola wê ya azadkirinê bilîzin. Bi hêza ku dê ji vir û şûn de ji nîqaş û pêşniyarên heyî bên girtin ve, dê partiya me sepanên xwe yên di vê mijarê de hîn bihêztir pêş bixe.

***8 Adar 1987***

### *Li Ser Dergeha Malbatê*

Li Kurdistanê malbat, qadaku fikir û pratîka civakî herî zêde lê kom dibe ye. Kabeya hebûna me ya civakî û heta piştî pêvajoya belavbûn û parçebûna gelek saziyan, xala ku herî dawî xwe dispêriyê, saziya ku mirov dikare bêje atoma wê ye. Li welatê me malbatperestî, siyasetperestî û partîperestî heye. Heta ev ketine rewşên baweriyan. Malbatperestî, hema hema bûye navenda jiyanê. Qaşo malbat saziyek civakî ye, bûye qadek kombûna darez ên her cure nirxên çandî û civakî yên paşverû. Bi vê rewşê ve jî pêşketina mijara rizgariya netewî ya civakî pûç dike, wê asteng dike û rola navenda paşverûtiya bingehîn a girêdanê dilîze. Saziya ku dijmin herî zêde lîstok li ser dilîze malbatperestî ye.

Tevî ku endamên di nav de -jin, zilam û zarok- ji bilî kaosê tiştek din nadin jiyîn, malbat dîsa jî dibe saziyek ku herî zêde mejiyê endaman mijûl dike. Wisa ye, ev ne tenê ji hêla civakî ve, ji hêla endamê di refên partiya me ve jî rastiyeke. Ji bo navenda bingehîn a fikra gelek hevalên me malbatperestiyê dagir kiriye, sererast nabin. Dema em bal didin li ser van tevan, têkoşîna bi malbatperestiyê re û dahûrandina wê, bi qasî dahûrandina mêtîngeriyê di heman astê de ye. Herî kêm nakokiyên mêtîngeriyê derxistina holê û bi wê re têkoşîn dayîn, ev sazî jî derxistina holê, li ser fikir pêşxistin û têkoşîna bi wê re tê xwestin.

Malbat, qada herî zêde kombûna bandorên ol'î ye jî. Sedema ku em ol weke saziyek cuda nagirin dest jî ji vê ye. Ev hemû darez ên nirxên muhafezekar ên bingehînin û di nava me de jî pir bihêzin. Saziyên weke axatî, eşîretparêzî û qabîleparêzî jî, heman weke şêweya malbatî zêde bûne. Dema eşîret û qebîle tê gotin, yekser malbatek bihêz tê hişê mirov. Ev di heman demê de

nûnertiya malbatên din ên biçûk jî dike. Lê mixabin hemû jî tenê malbatên xwe difikirin. Derdê reîsên eşîretan û reîsên malbatan a mezin pêşxistina saziya malbatê, di nava vê saziyê de bûna xwediyê zêdekirina kifleta zarokan, jin, pere û serwetê ye. Bi kurtasî derdê wan komkirina sermiyanek zêde ye. Kargeh û holdînga, her tiştê wî ev e. Şêwaza li cem me, saziya herî paşverû ya ku çanda malbatparêzî xwe gihandiyê rave dike.

Sedema ku em van tevan rêz dikin, me pêşî rexneyên wisa hewce di derbarê vê saziyê de nekiribûn. Em bi rexneyê re hesaba ku malbatê çawa ji bo şoreşê bikin feydeyek baş û wê bi dîroka wê re digirin dest. Mebesta me ya li vir ne dûjîn ji dê û bavê xwe re kirine, ne jî pesindana wane. Mebesta me ev saziya ku xwedî rastiyek objektîfe bi rexneyên şoreşê sererastkirine.

Li şûna nirxandinek malbat jêneveger kirin, divê rola wê ya di nava pêşketina civakî û netewî de bê ronîkirin. Sosyalîzmê jî bi gelemperî ev sazî rexne kiriye. Malbata feodal û burjuva rexne kiriye. Nirxandinên Engels ên di derbarê bingeh û binesaziya malbatê de binavûdenge. Ev ji bome jî çarçoveyek pênase û teorî ya divê em pir girîngî bigirin deste. Li cem me rastiyeke ku çavkaniya nexweşiyên bingehîn ên pirsgirêkan giran dike ye. Lê dîsa jî mesele ne pesindan ne jî dûjîn li malbatê kirine. Divê em weke heyî bibînin rewşa wê ya di nava pêşketin û nirxên me de bidin diyarkirin. Xisletek şoreşgerî yek jê ya herî girîng jî, divê di nêzîkbûnên xwe yên di derbarê vê mijarê de şoreşgerî be. Lê belê, wer texmîn dikim, em hemû jî ji vê saziyê bandor bûne. Em hemû jî di nava vê saziyê de mezin bûne, hêjî gelek bandorên wê dijîn. Lewra divê em vê saziyê ji gelek hêlan ve bigirin dest. Ango divê pêşketina wê ya dîrokî, girêdana wê ya bi mêtîngeriyê re, girêdana wê bi binesaziyên eşîretî û feodalî re, weke saziyek hêjî derbasdar cihê wê ya di nava binyata welat û netawan de û fonksiyona wê ya di nava pêşketina civakî de bê lêkolînkirin. Weke din jî divê binyata vê saziyê ya navxweyî, di nava vê de

têkîliyên dayîk-bav û zarokan ên di navbera xwe de, ferasetên di nava saziyê de serwerin, gelo ev feodalî yan jî burjuvayî ne, gelo demokrasî heye yan na û hwd gelek têgeh bên lêkolînkirin. Gelo rewşa têkîliya di navbera jin û zilam de çiye, koletî yan jî wekhevî serwere? Ferasetên li ser zarokan serwer çine, pêwendiyên wan çawa ne? Nirxandina van girînge. Weke din jî divê di pêşveçûn û muhafezekariyê de rola girîng a vê saziyê jî bê vegotin. Divê nêzîkbûna ji pirsgirêkê re, girêdayî vê saziyê, ku saziyek wisa armanc dike, yan jî di encamê de weke têkîliyên jin û zilam ên vê saziyê ava dikin bê kirin. Weke din ji bo em rexneyek rast li vê saziyê bikin, divê em pêwendiya di navbera vê saziyê û partiya me de, em rexneyek çawa lê bikin, di nava me de bandorên vê saziyê çawa diyar dibin, li hember vê jî hewce dike erkên me yên şoreşgerî çibin, berfirehî bêne destgirtin. Ji ber di qonaxa nifşê me de, ev saziya ku dê û bavê me nûnertiya wê dikir, bi rastî jî xala herî serwer a ku pergal xwe dispêrê ye. Hêjî em hewl didin gelek ji we ne ji mêtîngeriyê, ji bandorên vê saziyê rizgar bikin. Bi heman şêweyî miletek di wateya rasteqînî de ku ji saziyên çavkaniya zext û zora mêtîngeriyê ne, em hewl didin ji bandorên vê saziya ku dibe palpişta herî xeternak a zext û zorê rizgar bikin. Aliyê vê saziyê ya herî xirab, ev sazî ji hêla dê, bav û zarokan ve weke diyardeyek ku divê pêve girêdayî bin, bê parastin, bê hilberîn û di şoreşê de jî bê berdewamkirin destgirtine. Dema ev sazî nayê domandin weke ku asoyên mirovên me tarî dibin, xwe kesek ji cîhanê yê herî binkeftî dibîne. Ger malbatek rûniştî nebe, kes pirsgirêkên malbata xwe çareser nekiribin, ew kes xwe bênamûs, ketî û binkeftî dibîne. Jixwe di civakê de jî kesên wisa kêrî tiştekê nayên, di mijara kêrî tiştekê nayê de qinyata wî xurt kiriye. Kesê ku li hember malbatê serkeftî nebe, wî naxin dewsa zilam de. Bi nêzîkbûnên herî xirab dinirxînin. Lewra di vir de encamek wisa derdikeve holê, her çendî bi paşketî, nekêrhatî û heta radeya dawî xeternak encam

bibe jî, her kes neçare ku di asta perestin de xizmetê jê re bike! Xizmet jî “pereyan bîne, malbatê biparêze, di xêra malbatê de bimire ye!” Jixwe bersiva pirsa dê çima ji bo malbatê bimire jî ne diyare. Em ê bê watedariya vê ji mînakek jiyana xwe ve bidim. Dema ez di navbera 7-10 salî de diviya ku li gorî kevneşopiya malbatê ya tund bimiriyam. Me hêj di vê demê de pirsên weke “gelo malbat saziyek hêjaye ku mirov di xêra wê de şer bike û bimire. Çima hewce dike em her tim ji bo wê şer bikin” ji xwe dikir. Di vê mijarê de rewşa we ji ya min girantire. Weke ku ji ber feraseta malbatperestiyê gelek xwîn hatiye rijandin, gelekan jiyana xwe jî feda kirine. Bûna keç û lawê dayîk û bavê xwe yên baş, bûna benda malbatê ya dilsoz û ji bo vê her tiştê xwe fedakirinê de ji nav we jî ne kêmin. Yeqîn dikim yek ji sedemên herî girîng em ber bi şoreşgeriyê ve birîn jî di serî de me ev bê watedariya ku girîngiya ji saziya malbatê re tê dayîn zû dît. Ne ku em zarokê malbatê yê xerab bûn, ji ber meseleyên vê saziyê yên dendika hêjîrê jî danagrin, ciwan didan şerkirin. Ji ber me jî dizaniya ev pir sosret û xeternake me her tim navbera xwe vekir û em bi rexne nêz bûn. Pir vekirî dikarim bêjim ku ji ber rexneyên me yên li hember vê saziya paşverû em hinek din nêzî şoreşê bûn. Ger di şoreşgeriya gelek ji we de hêjî kêmasiyên cidî hene, ji zaroktî ve perestina we ya ji vê saziyê re û hêjî hûn ji wê sar nebûne. Ev perestin û pejirandin hûn kirine malbatperestek çavkor. Weke me beriya niha jî gotî, malbatperestiya di nava me de, partîparêzî ye. Weke kabe dîtin û parastine û qonaxa herî pêşketî jî ev nêzîkbûne.

Li Ewrûpaya ku di nav me de gelek hevalan jî dîtiye û nas kiriye malbat di asta herî jor de jihev ketiye. Li welatên sosyalîst jî rewş cudatire. Dema em van rave dikin, ti nêzîkbûna me ya ku em ferdên malbatê ne ecibînin nîne. Em saziyê rexne dikin. Em hewl didin hişmendî, xislet û taybetmendiyên li ser vê saziyê serwerin derbixin holê. Bi rastî jî ev mirov rebenin. Dibe ku di

cîhanê de dê û bavên me mirovên herî reben bin. Hewceyî rizgarkirin û pişgiriyê ne. Bes ev jî ne astenge ku em saziya ku wan ava kiriye rexne nekin, ji bo em ji wan re sûdmend bin neçare ku em têkîlî, kevneşopî û exlaqên wan –ne kesayeta wan- rexne bikin. Em dikarin di vê mijarê de mînakên hîn zêdetir avaker bidin. Gelek malbat di bin navê xwedî li ewladên xwe derbikevin de, endamên me radestî dijmin kirin û gelek ji van jî sezayê darvekirinê girtin. Ev hemû jî di bin navê hezkirina malbatê û girêdanek dîn û har de çêbûn. Li welatê me gelek şerên ku di xêra malbatê de tên jiyîn, tevî ku bi mebesta avakirina malbatê çêbûne, ev şer xwedî xisletên herî zêde malbatê parçe dikin, dibin sedema xwîn û rondikane. Jixwe xwîndariyên ji bo parastina malbatê tên pêşxistin jî wisa ne. Lê mixabin di rastiyê de rê ji hilweşandina malbatê re vedike.

Em li Tirkiyê jî dibînin di civakê de ji bo rizgarkirina malbatê bingehên malbatê çawa tê lîstin. Jixwe malbatê jî xwe kiriye sûka vekirî û difiroşe. Ji bo pereyan keç û lawên xwe heta jin û mêr hevdu difiroşin. Lê belê di pênaseya malbatê de aliyê herî diyarker, qadaku xwedî têkîliyên durist, rêzdar û ne girêdayî pereyane. Bes li vir pere ji hev didizin û ji boli ser pişta hevdu re pereyan bidest bixin derbasdare. Burjuvaziyê malbat bikar aniye, aniye rewşek saziya kirîn û firotinê. Malbat di avabûna xwe ya destpêkê de, li hember hêzên xwezayî, çi jî di bin tevlîheviya pêşketina civakî de ji ber lewaziya nikare bi tena serê xwe li ber xwe bide, têkîliyên jin û zilam jî ji boli ber xwe dayîn hevbeş pêş bikeve hatiye sazkirin. Ev avabûna ku di destpêkê de ne girêdayî berjewendiyên çînayetî ne, çavkaniya xwe ji civaka komînal a destpêkê digire. Nexwe, malbata wekhev û azad gengaze. Tişta hatî serê vê saziya ku pênaseya wê wisa ye, piştre nehatiye serê ti saziyên civakî. Kapîtalîzmê ev sazî di bin navê jîndarkirinê de îro wê bi erdê re dike yek. Li cem me jî ev gihiştiye şêweyek pir kirêt. Jixwe gelek endamên me yên ku nekarîne xwe ji van

bandoran biparêzin di bin giraniya vê de nikarin siyasî, civakî bibin, di nava partiyê de xwe pêk nayîne û di sepandina pratîkî de lewaz dimînin. Di nava partiyê de gelek ji we dibêjin partî malbata me ye, bes malbatparêzî û partîparêzî bi hev re nabe. Nabe ku pêwendiyên malbatparêzî weke pêwendiyên siyasî bêne destgirtin. Ger em malbatek xanêdanî bûna, dibe ku di pêwendiyên vê de hinekê nirxa siyasî hebûya. Jixwe malbatên wisa jî hene. Ev malbatên arîstokrat an jî burjuvayên pêşketî ne. Ji van serok, wezîr û hwd derdikevin, lê malbata me ne wisa ye. Malbatên me tenê dikarin saziyên metîngeriyê baş bisepînin û weke maşika wan dijîn.

Li ser bingeha berjewendiyên malbatê ji jiyînê dûrketin, di nêvenga malbat û derûdor de bese ku weke bêxêr û kêr nayê bê dîtin. Jixwe ez jî hêj di temenê biçûk de bi nirxandinên wisa re rûbirû hatim. Di nava hevalên min ên dibistanê de kesên ku li ser esasê berjewendiyên bavê xwe kar dikirin ne kêm bûn û ev jî weke kesên herî zêde aqilmend dihatin diyarkirin. Lê ew di rastiyê de jî, zilamên ketî yên kêrî pênc quruşan jî nedihatin. Wan zilaman ti tevkariyek ji pêşketina civakî re nekirin. Bi mûçeyek ku bûn dîlê wê ve ne diyare ku çi rizgar dikin. Em nizanin malbat êdî çawa rizgar kirine û jixwe yeqîn nakim ku rizgar jî kirine. Ji ber pirsgirêk di asta herî jor de ye. Ji bo ew tenê xwe bi malbatê bidin xweşkirin hinekê hêza entellektûel pêş xistine û qaşo ji bo malbatê rizgar bikin hemû hêza xwe ya fikrî firotine. Ev ji bo sazkirina malbatê yan jî rizgarkirina malbatê heta dawî bi mûçe dijîn, lê tenê mûçeyek jî jiyîn heta dawî Komara Tirk jiyîne. Ji ber ku mûçe, bi xizmetkirina Komara Tirk ve dibe. Ev jî çavkaniya paşverûtiyek pir mezine. Hêjî di refên me de hinek behsa malbatê dikin, dibêje ez ê çi ji malbatê bikim û li ku derê bicîh bikim. Em jî ji kesên wisa re vê dibêjin; “Ji bo parastin û rizgarkirina malbatê pêşî partiyê esas bigire û xwe bispêre partiye. Tişta ku îro malbatan jî rizgar bike partî ye.” Lê dîsa jî hinek kes dibêjin;

“Deh salin malbatê dihizirim, serê min tevlîhev kir.” Lewma şaşiyên dînîtî dikin, îxanet dikin, direvin, xwe dispêrin dijmin û dibin hemal û evdal. Me hêjî bîlancoya vê dernexistiye, ger em derbixin dê bi rastî jî zerara wê di asta herî bilind de be.

Zilam têkîliya malbatê ji bîr nake, çarçoveya pêwendiya civakî hema bêje bi pêwendiya malbatê ve sînordar kiriye. Dibêje; “Malbata min” û tiştek din nabêje. Felsefeya herî bi bandor a bavên we û malbatên we dibêjin; “Malbata herî baş a gund emin, malbata herî baş a bajêr em in!” Jixwe nirxek ji rêzê jî qetiyen nade cîranê xwe. Çiqas malbatên gundî hebin, ewqas jî malbatek ku xwe diecibîne heye. Mijara em dibêjin şovenîzma malbatê jî ev xale! Her kes bi çavkorî parezgerê malbata xwe ye. Diyare ku di nava şovenîzma malbatî ya wisa kûranî tê jiyîn de çiqas hestewariyê dihewîne û hûn jî çiqas vê kûr dijîn li holê ye. Ger her kes wisa bihizire, gelo em ê bikarin behsa pêşketina fikrek civakî û pêwendiyek wisa civakî bikin? Na! Ev atomên serbixwe ne. Di xwezayê de atom kom dibin û molekûl çêdibin, ew jî dibin yek û organîzma çêdibe. Li cem me jî malbat atome lê, yekbûnê çênakin, ne nêzî yekbûnê ne. Malbatên me dij-civakî ne, dij-siyasî ne û di rewşa hêmana ku dijmin tehrîk dike de ne. Mirov binêre, dijmin jî vê nahelîne, ji holê ranake, bikar tîne, ji bo belavkirina civakê ev saziya ku atomîze kiriye bi zorê di vê rewşê de digire.

Ev encam girîngin. Bal bidinê, malbatê navenda fikra me ya esasî dagir kiriye. Weke kabeyek reftarên we, di asta navenda kêşanê de ye. Dibe ku em hinekê ji vê qut bûne, lê civak hêjî berfirehî vê rewşê dijî. Her tim behsa girêdana dê û bavan a bi zarokan ve tê kirin. Deka em wê jî hinekê vebêjin. Zarok di destê wan de sermiyaneke. Ne ku zarokan hez nakin an jî hesap nakin, weke sermiyanekê dinirxînin lewma. Ti pere û pêwendiya zilam di saziyên civakî de nîne, lê xwe weke reîsekê malbatê, serokekê dibîne û zarok jî di vê rewşê de ji bo wî dibe amûra karbidestî û têrkirinê. Jin çiqasî serî jê re bitewîne, zarok çiqas destê wî

ramûsin, ewqasî daxwaza mezinbûnê dijî. Lê belê di malbata burjuvaya nûjen û sosyalîzmê de ev qet tine ne. Zilam di civaka Kurdistanê de, di nava civakê de ji ber ku nikare bibe xwedî cîh û rayeyekê, jêhatiya ku bikare nûnertiya pêwendiyên civakî yên rêzdarî bike, van tevan bi şêweyek sexte di nava malbatê de dijî. Mînak li Kurdistanê bav di nava malbatê de xwe rehet û kêfxweş dihese, ser hişê xwe diçe. Ji ber malbat serî jê re ditewîne, ev jî xweşiyek manewî dide wî. Weke zilam di civak, siyaset û pêwendiyan de winda kiriye. Ji wî re tenê di nava vê holika wî de derfetê bûna seroktiyê hatiye dayîn. Ev rewş jî, li ser zarokan bandora kolekirinê daye çêkirin. Di nava malbatê de tişta ku bav her tim ji zarokên xwe hêvî dikin mildayîne. Her çendî ev despotîzm û koletî jî be, heta bi şêweya kirîn û firotinê de jî be, mildayîne! Ev mildayîn bi gotinên weke; "Min zarokê xwe radestî te kiriye, min zarokê xwe emanetî te kiriye, tu çi dikî bike, dest û ling ve ji we re ye" rave dike. Lê belê ya li ser jinê tê ferzkirin jî xirabtire. Hemû kar û barê zaroka keç jî baştir bikare serî bitewîne û di rewşek baştir bê kirîn û firotin de jiyîne. Li hember van rastiyan tevan, tişta "bavê herî baş" dijî, rewşek ne ji bilî van rastiyên bingehîne. Ti bav ji endamên malbata xwe re ne gotiye; "Vê pêwendiya civakî ya girîng pêş bixe, xwedî li vê peywira siyasî ya girîng derbikeve, erka te ya sereke ev e, di malbata min de ev terbiye derbasdare." Berovajî her tim reva ji pêwendiyên siyasî û civakî, reva ji rastiyan û zehmetiyan birêxistin kiriye. Elbet ji ber vê her tim xwe sipartiye dewletê. Di vê wateyê de malbat her yek dewletparêzin xirabin. Di nirxandinên faşîzmê û gelek welatan de, tê gotin ku faşîzm xwe dispêre burjuvaziya biçûk. Li cem me jî faşîzm xwe dispêre malbatê. Tevî ku welatên kapîtalîst ji kesimên burjuvaya biçûk û navîn gelek hêz digirin, di pratîka 12'ê Îlonê de jî diyar bû, li cem me ya ku faşîzmê herî zêde bikar anî malbatên xwedî bingehên çîna biçûk û navîn bûn. Ev kesîm, di bin navê; "Bila tiştek neyê serê zarokê me, weke

beriya 12'ê Îlonê nemirin" de tê zanîn ku pişgiriya Ozal kirin. Ji ber vê jî Ozal got; "Divê hûn dengê xwe bidin me, ji ber ku em nûnerê îstîkrarê ne." Bi rastî jî di hilbijartinan de sipartekên bingehîn ên civakî yên wan ev malbat û feraseta malbatperestî ya di nava malbatê de serwer bû. Encamên vê mijarê ne kêm bûn û pir girîngin. Hewce dike ku mirov sepanên 12'ê Îlonê nexasim li ser malbatê meşandîn di bin heman sernivîsê de lêkolînkirin sûdmende.

Ev rejîm pir hostane û plangerî li ser van malbatan lîst û hêjî berfirehî dide meşandin. Ev jî, ji ber li Kurdistanê saziya malbatê pir bihêze bi çavxirabî tê bikaranîn. Rejîm jî, bi partiyên burjuva yên xwe dispêrin malbatên bihêz ve pêşbaziya xwe pêş dixe, ji boşoreşgeran û malbatan bîne beramberî hev, bi pergala cerdevaniya gundan ve berahev dide. Berê zêdetir eşîret û malbatên mezin dihatin bikaranîn, niha jî vî karî heta malbatên biçûk dide meşandin. Wan di nava sefaletek mezin de dihêle, jihevketina wê lezgîn dike. Ji boxwe her tim stargehên civakî pêş dixe, di nava malbatê de jî xirabûnê kûr dike, di fikir û pêwendiyan de jî serûbinbûnê ava dike. Elbet di nava vê avabûnê de kesek nikare fikir û reftarek têkûz raber bike. Binyatek bi pirsgirêk serwer dibe. Heta pirsgirêkên çêkera me jî çavkaniya xwe ji vê digire derdikevin holê. Ev jî bi rastî pirsgirêkên giranin. Şoreşgerên ku dibêjin min xwe di vê mijarê de radîqal dahûrandiye pir kêmin. Bandorên vê binyatê di astek berfireh de tê jiyîn. Dibe bandorên rasterast nebin, lê bandorên neyekser ên weke bi çand û fikarên vê re dijî di asta pêş de ne. Jixwe em çi dikin zilam çareser nabe. Weke ku di serê wî de mêşehingiv hene û kewara mêşan bi serê wî de ketiye, di bin pirsgirêkên ku çavkaniya xwe ji malbatê digirin de her tim dinale. Elbet ev zilam bi vê rewşa xwe ve ne dikare asayî bihizire, ne jî dikare asayî beşdarî xebatên siyasî bibe. Encamên mêtîngeriyê ya herî mezin yek jê jî, ev sazî anîna rewşek wisa ye.

Em behsa rewşa vê saziyê dikin, lê jihevketina civakî tê lezkirin, jihêz xistin di asta bilind de pêş dikeve. Ji hêlekê ve ji bo bihêzbûn, zêdebûn û dewlemendiya madî ya malbatê hewldan tên kirin, aliyek din ve jî pergal binê wê dikole, parçe dike û belav dike. Malbat jî bi vê rewşê ve, dişibe selika binî kun bûyî. Ji ber ku ji binî ve kun bûye, her çiqasî tu jor ve bi kepçê dagrî jî, hemû vale diçe. Mêtîngeriyê jî ev sazî bi van xisletên wê ve aniye rewşek pir xeternak.

Tişta ku dê û bavên we û we jiyan kirine ne siyasete. Qaşo malbatên we her tim we difikirin, lê belê ger hişê xwe bidin siyasetê, dê hem ji bo xwe hem jî ji bo we zêdetir bi sûdmend bin. Hem em ê rehet nefesekê bigrin, dê hem jî ew bihêz bibin. Her yek ji van malbatan, di nava xwe de şoreşê nîqaş bikin û bijîn, dikarin weke malbek esasî, komîteyek û dibistana partî rol bilîzin. Ger her malbat van têkîliyên ku giranin mirov nikare ji bin derbikeve veguherîne pêwendiyên şoreşgerî, dê Komara Tirk nekare du rojan li ber xwe bide û hilweşe. Ger malbat yekbûnê çêbikin û di nava xwe de perwerdeyek wisa serwer bikin, Komara Tirk nikare li ser piyan bimîne. Ji ber ku li cem me malbat li hember derve girtiye, dikare di şoreşê de weke rêxistinek veşartî kar bike. Ma em çima nikarin vê rêxistina veşartî bikar bînin? Jixwe ev jî pirsgirêkek cuda ye.

Lewaziya di qada civakî û siyasî de, her tim ji derveyî vê jiyîn, her ku diçe malbatê ber bi rûxandinê ve dibe. Malbata ku binesaziya wê ji hêla kapîtalîzma pêş dikevê ve tê texrîpkirin, êdî nikare pêwendiyên xwe yên kevin jî biparêze. Berê mal û milk hebû, berê zarokan ji bomezinkirina malbatê ajalvanî dikirin, kerî diçêrandin û li zeviyan kar dikirin. Ev di ber bi roja me ve hemû parçe bûn, hemû zeviyên mezin hatin parsêlkirin, şikeftên ku bi navê malê xwe lê xwedî dikirin teng bûn, lewma bingeha madî ya ku malbatê xwedî bike nema. Kapîtalîzm parçe dibe lê, fikir û erf û adetên wê dimîne. Ev jî, ji muhafezekariyek mezin û kirîna

malbatê re rê vedike. Dibe çavkaniya paşverûtiya li ser zarokan. Zexta li ser zarokan tund dike, lê di heman demê de nikare wan xwedî bike û perwerde bike. Ji ber ku niha malbatek xwedî deh zarokan xwedîkirin, pirsgirêkek mezine. Niha li Rojava jî ji bilî du zarokan nikarin zêdetir mijûl bibin. Li wan deran rewşa malbata mantiqî wisa ye. Ji ber ku pêwîstiya aborî vê neçar dike. Li cem me jî kevneşopiyên bi bandor ên ku neçar dihêlin fireh bin, lê belê ji ber binyata madî hatiye tengkirin, di navbera van herduyan de malbatek çewt teşegirtî derdikeve holê. Her wiha mirov nikare wisa hêsan ji bandorên wê yên xirab rizgar bibe.

Li Kurdistanê malbata xwedî xisletên wisa ya heyî, gelo gengaze veguhere şaneyek şoreşgerî? Em xwe tenê bi bersiva erê ve têr nabînin, em dibêjin ku dê ev bersiva yekem em bidin a pergalê be. Ji ber ku mêtîngeriya kapîtalîst berpirsê vê ye, divê em jî vê çekê li hember wî bikar bînin. Divê em bikarin malbatê li ser rêxistinbûna wê ya hundurîn veguherînin şaneyekê. Rastiyeke her ku em malbatê bigihînin asta şoreşgerî, em ê bigihijin rizgariya netewî ya xwedî bingehek civakî ya hêzdar. Elbet ev jî bi perwerdekirina dê û bavên şoreşgerên me yan jî perwerdekirina malbatê ve dibe. Tê zanîn ku hêjî hinek heval guhên xwe didin malbatê. Lê belê berovajî vê weke me diyar kirî, divê malbat me guhdar bike. Em ne di wê rewşê de ne ku aqil ji malbatê bigirin, mirov siyasetê ji malbatê fêr nabe. Bavên me yên ku şefên saziya hatiye lîstokane, her yek belengazeke. Rewşa dayîkan jî ji vê xirabtire. Mirov dikare wan bi vê rewşê ve bişibîne rêxistinên burjuvaziya biçûk. Ev rêxistinên reformparêz xwe çi dihesibînin, dê û bavên me jî weke wan reformparêzên bêhempa ne. Ji bo têkîliyên pergalê bidomînin, debara malbatê ya aborî saz bikin, ti tawîzên ku nedin û rewşên ku nejîn tine ne. Ji bo li nexweşxaneyekê derfeta xwe tedawîkirinê bidest bixin, rica ji her kesî dikin. Ji bokarekê peyda bikin, rica ji her karsazî dikin. Ti rayedarên dewletê yên ku nekarin tawîzan bidin cendirmeyan

nîne. Dikarin zarokên xwe jî radestî wan bikin. Belê ev jî, serî tawandin û lihevkirine. Hem jî serîtawandinek ku her cure zextê dipejirîne. Weke ku van lihevkirin û asta bîrdoziya di nava malbatê de datînin holê, her wiha li ber çavan radixe ku çima ciwanên me di vê astê de serîtawandî ne. Reîs ji borizgarkirina malbatê neçarin ku her tim serî ji axa, karsaz, dewlet, muxtar, cendirme û polîsan re bitewînin. Zarokan jî fêrî vê dikin. Belê, di vir de bingeha lihevkirina bêhempa derdikeve holê! Ango siyasetmedariya malbatê hebê nebê, pir dijwar ber bi serî tawandinê ve dibe. Ji bilî vê jî ti rola wê nîne.

Nexwe, weke sazî tiştek em ji malbata ku li hember rastiya siyasî û civakî xwedî rewşek wisa ye fêr bibin tine ye. Rewşa objektîf fikir û reftarên malbatê xistiye vê rewşê û ji bilî vê jî tiştek din nahizire. Neku ji boem wan tawanbar bikin van dibêjin.

Kiryarên taybet ên mêtîngeriyê, makanîzmayên zext û zorê, ji bo Tirkiyê malbat kiriye palpiştek xeter a civakî ya faşîzmê. Li Kurdistanê jî kiriye zemîna her cure serîtawandin û lihevkirinê. Ger li Tirkiyê faşîzm hebe, elbet dê li Kurdistanê jî palpişta herî xeter a civakî ya faşîzmê malbat be. Li Kurdistanê malbat ne ji bo berjewendî, di nava girêdanek koletiyê de ye. Mêtîngerî dibêje; “Ger hûn dixwazin lawên xwe biparêzin bi dewletê ve girê bidin, bavê me dewlet bihêze.” Lê baş tê zanîn ku pênaseya “bavê me dewlet bihêze” îmana ewladan tine dike. Hêzdarbûna dewletê, tê wateya ji hêla yekdestdarî û holdîngan ve serûbinkirina hemû civakê. Lê mixabin malbat ji bo pêşketina vê sermiyana ku wan têk dibe, serî pê dane tawandin. Bi amûrên şûştinê yên bîrdozî ve vê rastiyê pir dijwar dijîn.

Bi vî şêweyî nirxandina malbatê, erkên şoreşgerî yên li hember wê pir vekirî û nayên taloqkirin derdixe holê. Helwesta me ya di derbarê malbatê de heta dawî neçar dike ku bigihe sewiyek şoreşgerî. Rexneyek tund di derbarê çand, kevneşopî,

ferasetên pêwendiyan, sekna di nava pergalê de, feraseta zarokan, têkîliyên jin û zilam ên di navbera wan ên malbatê de bê kirin, dev jêberdin serî ji wan re tawandinê, misoger me dibe encama ew ji me re serî bitewînin. Di rastiyê de, pêdiviya wan jî bi vê heye. Gelek ji me bavê xwe dixe dewsa “xweda” de, lê tê fêmkirin ku bavên me ji me cucetirin. Ên di bin fermana wan de jî zarokên rebenin. Tiştek van a di wateya siyasî û civaknasî de bidin me tine ye. Ew weke saziyek rêzdarî ya manewî mezinên me ne, lê ger em dixwazin weke hêmanek nêzîkbûna siyasî û civakî bigirin dest, wisa ye. Wê demê, divê em nirxên rast fêrî zarokan bikin û em terbiye bikin. Ti eleqeya malbatan bi terbiyekirina zarokan re nîne. Îro yek ji peywirên me yên herî mezin jî, terbiyekirina malbatê ye. Hinde rebenin, bendewariyên wan ji me hene û ev bendewarî jî ancex bi şoreşê dibe. Belê ev jî, girîngiya erka me ya şoreşgerkirina malbatê pir vekirî derdixe holê. Jixwe, erka her şoreşgerekê ye ku malbata xwe perwerdeyek şoreşgerî re derbas bike. Her wiha ev erk li cem me di asta jiyanî de watedare. Li welatên cuda malbat perwerdeya demokratbûnê û welatparêzî didin zarokên xwe, lê cem me ne wisa ye. Li Kurdistanê malbat bûne amûrê mêtîngeriyê. Kevneşopiyên feodalîzmê jî bi şêwazek herî xirab dijîn. Pêwendiya wan a bi demokratbûn û welatparêzî re heta dawî çewte û înkar dike. Netewperestiya wan jî di asta hevkariyek rakêşwer de dirêj dibe û nikare vê derbas jî bike. Vêca ev, di mijara saziya malbatê de derdixe holê ku em bi peywirên şoreşgerî re rûbirû ne.

Em ê şoreşgerbûna malbatê di xebatên xwe yên girse de diyar bikin. Di amadekirina tevgera jinê de ji pêşketina şoreşgeriya nav malbatî re erkek girîng bidin. Gelek ji we ber malbata xwe re jî derbas nabe. Weke ku ev ne raste, feydeyekê jî nade wan. Divê mirov rewşa ku malbat dijî bifikire, wan hişyar bike ku baldar bin û ev jî têkûzkirin peywirek siyasî ya girînge. Ev mirovên hatine xistinin û pêwîstiya wan bi hişyariyên we

hene. Em jî vê peywira xwe baldar û radîqal bicîh bînin. Em bikarin vê weke peywirek bihêz danin pêşiya yekîtiyên malbatan. Kampanyayên xwe di derbarê vê mijarê de bihêz bikin, em jî lîstoka mezin a ku dijmin dilîze berovajî bikin û her malbatê veguherînin stargehek welatparêziyê. Ger her malbat bibe şaneya biçûk a partî, tê wateya ku Kurdistan rizgar bûye. Ger ev neyê serxistin, divê em bêjin ku dê rizgarî pir zehmet be yan jî dê rizgarî bi radeya şoreşgerbûna malbatan re pêş bikeve.

Ger em jî weke parçeyek vê ser têkîliyên jin û zilam de biçin, diyar dibe li nav me Kurdan jî di navenda bingehîn a van têkîliyan de “sazkirina malbatê” tê rûniştandin. Her têkîliya jin û zilam li cem me pêş dikeve, piştî nîv seatî teqez vê tîne bîra mirov. Aliyên siyasî û civakî yên van têkîliyan heta dawî lewazin. Di nava gelek ji we de mirov nikare behsa pêwendiyên tu kesan jî bike. Di nêzîkbûnek hêsan de yekser an hestewarî destpê dike, yan jî têkîliyek ne meşrû tê bîra we. Jixwe ev jî mirov yekser dixe û civak jî amadeye ku hema dexmeyekê lê bide. Dema hinekê çav bi çav û dest bi dest dikeve, yekser dibêjin keç û xortê filan malbatê nizanim çi kirine, jiyana wan çû. Bi kurtasî di pêwendiyan de kendalek mezin heye. Lewma bi qasî mirov dikare bêje pêwendî qet tine ne, kême. Nexasim li gundan, ne gengaze ku keçek zewicî êdî nêzî mêrxasekî bibe, heta nîqaşekê bi mezinek gund re bike. Em keç û mêrxasên gund danin aliyekê, hinekê jî li xwe binêrin em ê bibînin ku hêj me bi qasî bejna simbilê ceh jî gav ne avêtiye. Baweriya aliyan zêde li hember hev tine ye. Her tim bi derûniyek tawanbar ve li van pêwendiyan dinêrin. Ji ber ku şoreşgerî hêj nehatiye berfirehkirin û nehatiye rûniştandin. Em ê diyar bikin ku van çi aniye serê partî. Beriya em derbasî vê mijarê bibin hinek xalên ku divê em li ser rawestin hene.

Beriya her tiştî têkîliyên jin û zilam di nava malbatê de di rewşek nayê nasîn de ye. Ev jî navenda siyasetmedariya wî ya

nav malbatî ye. Jixwe çanda serdestî û şanaziya zilamtî ya bi wî re wisa pêş dikeve. Hinekê jî em li ser bûna zilam lêbikolin. Ev ji bûyerek cînseltî wêdetir, têkîliyek serî tewandinê ye. Zilamtî wisa weke li cem me tê zanîn ne aliyek cînseltî ye, zêdetirîn xwedî pênaseya ku serî dide tewandine. Tê gotin ku; “Zilamê camêr, camêrê ku serî dide tawandine, zilamê camêr, camêrê ku di malbatê de reîstiya xwe didomînê ye!” Bes divê em vê jî weke serî tewandinek ji rêzê nebînin. Weke me kêliya beriya niha vegotî, pergalê fêrî wî kiriye ku serî bide tewandin. Dema pergal erka xwe ya serî tewandinê dimeşîne, bandora vê herî zêde jî li ser zilamê malbatê pêş dikeve. Zilamê malbatê jî kefareta serî tewandinê bi ser jinê dide meşandin. Di malbatê de bûna despotek biçûk ji bo zilam marîfeta yekemîne. Em vê jî bêjin; di vê mijarê de têkoşînek mezin heye.

Serî tewandin jixweber çênabe. Hêmanek şer a girîng ku di navbera zayendan de tê meşandine. Gelek ji we ji nav vî şerî hatiye. Ji bo zilam piranî xwediyê pere, kar û malê ye her tim xwe mafdar derdixe. Ev di heman demê de bi şêweyek kevneşop derbasî kesayeta jinê kirine. Serî tewandin wisa pêş dikeve û pêk tê. Lê belê ev pêkhatine xirabe. Zilam her cure êşa zext, betalî, bêhêzî û nekirina dewsa camerekê yên di nava civakê de, li mala xwe jî bi begtî û serdestiya ku dimeşîne ve derbas dike. Her wiha divê mirov ji nêz ve bibîne ku ev zilamtî jî çend quruşe. Ev hesta xwe têrkirin û serweriyê, li pêş serweriya siyasî ya şoreşgerî astenge. Li şûna di pêwendiyên siyasî û civakî yên şoreşgerî de bûna rêber, bûçikiya bûna rêberê malbatê pêşketina kesayeta rêbertiyek civakî û siyasî têk dibe. Sedema ku di nava me Kurdan de hestên rêbertiyek wisa pêş nakeve yekser girêdana xwe bi vê rastiyê ve heye. Camêrê ku di malbatê de resîe, ger xwe weke “Kenan Evren” bibîne, elbet ev camêr nabe rêberê siyasî.

Nexwe, ya girîng hilweşandina hestên zilamtî ye. Sedema ku zilam di nava malbatê de weke hêmanek serweriyê girîngiyê

dide xwe, ji aliyekê ve parazvanê bîrdozî û polîtîk ê pergala zext û zorê ye, ji aliyek din ve jî ji ber xwediyê her cure bandorên kolekirinê ye, encamên vê jî yên xeternak hene. Zilamê ku di nava malbatê de serî ditewîne, zilamê ku her wextî serî ditewînê ye. Lewra rewşa zilam, weke gelek ji we dihizire ne di astek pêşketî de ye. Zilam, jîngehek şûna koletiyek herî xeternak de ye.

Elbet dê ev nêzîkbûn, nexasim ji hêla zilamên ku zêde pêwendiya wan bi şoreşgeriyê re nîne ve bê rexnekirin. Dê van nirxandinan li hember kesayeta xwe weke êrîş fêm bike. Lê belê êrîşa li vir jî ne li hember kesekî, ne jî weke zayend li hember zilame, ji bo di makanîzmaya zext û zorê de rolek xirab ava dike tê kirin. Derdikeve holê ku, divê sextekariya wî ya di vê mijarê de û kekotiya wî bê rûxandin, ti feydeya wê nîne û pêwîste ev xisletên wî bên parçe parçekirin. Belê, bila ev xislet hilweşin, daku bikare di nav civak û malbatê de serî rake. Neçare ew namûsê wisa fêm bike. Dê ji vir di nava malbatê de li şûna kekotî û begtiyê, pêdiviya rêbertiyek têkoşîna siyasî derbikeve holê. Şûna ku malbatê rêxistinek û xwe jî serokê rêxistinê bibîne, dê di nava pêwendiyên civakî û siyasî de lêgerîna rêxistinê bike û hewl bide bibe rêberê wê. Bi rexneyan parçekirina van ferasetan dê xisletên wî bi civakî û siyasî bike. Ev jî ji bo destpêkirina pêşketina şoreşgerî ya pir cidî ye. Ji ber vê ye li Tirkiyê ji bo zilam bibe "reîsê malbatê yê baş", propagandeyek hûrûkûr ya bîrdozî tê meşandin. Ozal jî her roj di sernivîsên çapemeniyê de diyar dike ku reîsek malbatê yê çawa ye û ji malbatek çawa derketiye. Elbet vê jî ji bo feraseta reîsek malbatê yê baş çawa çêdibe serwer bike, ji ber ku baş dizane pergal çawa tê meşandin lewma vê dike.

Niha jî rewşa jina ku li dijî vê çiye? Jixwe wê çi di nava civak çi jî malbatê de hebûna xwe winda kiriye. Malbata di nava pergala civakek ku xwedî merîfetek wisa de, her tiştê jinê ye. Nexasim jin di nava malbatê de tenê xwedî rolek lîstokvaniyê de

ye. Bi temamî dê çawa li derdora reîs bifitile û xizmetê bike hatiye fêrkirin. Ji ber vê hebûna wê tine ye, di destê duyan de ye. Lewma rola wê jî naxwiyê. Heyberek objektîfe, bi giranî ne heyberek sûbjektîfe. Jixwe nikare bi qinyatên civaka me ya ku civakek gundiye de pêwendiyek civakî pêş bixe. Li hember bavê xwe jî nikare pêwendiyek azad pêş bixe. Jixwe piştî zewicî yan jî têkîliya wê bi zilamekî re pêş ket, yekser dibe malê wan. Her wiha pey wê re jî hemû karên malê tenê di asta xeniqandinê de ne.

Hûn jî dizanin li welatên kapîtalîst xwedîkirina du zarokan jî pirsgirêkek mezine. Ev li welatên sosyalîst jî wisa ye. Lê mixabin li cem me tam berovajî ye. Malbata herî xizan û ne ewle, neçar dimîne ku bi xwedîderketinek herî kêm, tenduristî û perwerdeyek herî kêm ve koma zarokan xwedî bike. Ev rewş weke sedem bese ku jinê bi erdê re bike yek. Jixwe em behsa sedem ên din qet nakin. Ango em nêzîkbûnên di civakê de yên kêm dîtin, serî tawandin û mirov nehisibandinê li aliyekê danin, di nava malbatê de sekna wê tenê ya li hember zarokan bê ku henase bigire ji boxistina kesayeta wê û anîna rewşek kêr nayê bese.

Mirov nikare koletiya ku malbat dijî, şert û mercên madî ên malbat dijî rabike. Di vê qonaxê de, feraseta reva ji malbatê û rizgarbûn derdikeve holê. Îro di astek berfireh de tê gotin ku; “Keça me revî, malbat wisa parçe bû, wisa dev ji hev berdan.” Ev rev, revên ji xofdariyê ne. Malbat tiştekê nade ferd, berovajî weke ar di aş de bihêre wan dihêre. Elbet, ti xêr ji kes jî dernakev e. Lê dema direvê jî dikeve rewşa herî xirab de. Hewce nake em vê zêdetir vekin. Ji ber me beriya niha rewşa ku jin di nav de dijî di nirxandinên xwe de diyar kiribû. Me li ser kesayeta jinê dahûrandin pêş xistibûn.

Bûna heyberek wisa ya jiyanê, bi jinê re her cure sivikbûnê pêş dixe. Vêca di kesayeta jinê de her tim sivikbûnek derdikeve holê. Lewra sivikbûn peyvek weke li gorî xweseriya

jinê ye tê bikaranîn. Ev jî ji ber xistina kesayeta jinê ye, kesayeta wê tine ye, ne xwediyê gotin û çalekiyê ye. Li gorî ku di malbatê de xwediya sermiyanê ne jine û pêwendiya wê ya bi derve re qute, elbet dê kesek weke bê ziman, ker û kole bimîne. Li vir, radeya xistina malbatê, radeya xistina jinê rave dike.

Ji van tevan ev encam derdikeve: Weke ku şoreş ji bo malbatê her tişte, ji bo jinê girîngiya wê zêdetire. Ger hinekê jî derdê jinê ya azadiyê hebe, di vê rewşê de ji şoreşgerbûna wê cudatir ti çareyek din nîne. Belê, ji boaxaftin û hinekê jî civakbûnê şoreş! Em azadiya siyasîbûyî danin aliyekê, ji bo hinekê jî bûna xwedî pêwendiyên medenî şoreş hewce dike! Ji bo Kurdistanê ji bilî vê ti çareyek din nîne. Lewra şoreşgertiya jinê û pêşketina tevgera jina şoreşger di nava şer û mercên xwe de girînge. Li gorî vê cewherê rêxistinkirina xebatê girînge û dikare pêş bikeve.

Ger nêzîkbûnek rast ji jina di nava malbat û civakê re bê kirin, mercên objektîf baş bên diyarkirin, baş bê perwerdekirin, dê ji bo şoreşê weke heyberek azadiyê ya pir girîng derbikeve holê. Lê belê ev ne hêsane. Divê em ji bîr nekin şoreşgerbûna jinekê bi serê xwe pirsgirêke. Jina ku kêm jî be nizane di nava civakê de bigere, di nava malbatê de jî ne xwedî mafê axaftinê ye, wisa hêsan nikare li qadên weke şoreşgerî û azadî pir dixwaze de û hewcedariya jiyana milîtanên azad heye de bimeşe. Ji ber vê, divê perwerde û rêxistinbûnê di nava mercên xwe yên şênber de pêk bînin.

Niha jî di vê qonaxê de, her çendî ne parçeyek pirsgirêkê ya girîng jî be, dixwazim li ser hinek sepanên ku di nava partiya me de hene rawestim. Dema em dibêjin ji bo evîna azadiyê di vê mijarê de wekheviyê jî em binasin, tam jî li hember pirsgirêkên pêşketinê yên hinek hevalên jin ên beşdarî refên me bûne, hewldanek şêwaza şoreşgerî ya derbaskirinê zêdetir, em bûn şahidê ketîbûna ku jiyîne.

Partiya me bi giştî saziyek wekheviyê ye. Saziya azadiyê ye. Hemû pêwendiyên civakî digire dest û şoreşgerî nêzî hemûyan dibe. Partiya me ji bo azadiyê nêzî jinê dibe û ji zû ve derxistiye holê ku ev çiqas girînge. Nêrînek giştî ya rast jî şoreşek ku jin beşdar nebe pêk nayê ye. Me jî di xêra van rastiyan tevan dest bi xebatek wisa kir. Bes yekser vê jî bêjim, di vê rewşê de çavkanî tenê ne jine, me rewşa zilaman jî danî holê.

Me diyar kir ku zilamtî bi serê xwe pirsgirêke, di nava partiyê de rêbertiyê pir cuda fêm dike, weke saziyek malbatê bijî endamtiya xwe dijî. Milîtanek sosyalîst, divê xwe ji vê feraseta zilamtiya şaş, zilamtiya ku xwe di nava feraseta serweriya sexte de têr dike rizgar bike. Ne tenê pirsgirêka jinê, her wiha ya zilam jî heye. Divê zilam bi xwe pirsgirêka zilam çareser bike. Ango divê xwe ji rewşa serweriyek sexte rizgar bike. Hewce dike xwe di vê mijarê de ji rewşa bûna reîs derbixe, di pêwendiyan de bigihîne asta şoreşgerî û wekheviyê. Ev di nava partiyê de xisletek jênevegere.

Her çendî biçûk jî be komek hevalên jin ên di nava civata partiya me de cîh digirin, pratîka ku ji destpêkê ve raber kirine, bi yek gotînî temamî jinwarî bûye, hinekê jî weke ku ketî bû, hilweşandiye jî. Dema ez van dibêjim, nabêjim qet aliyên wan ên erênî tine ne. Naxwazim bêjim ku beşdarbûna wan ji xebatên erênî re tine ye. Heye, lê em hewce dibînin ku zêdetir li ser aliyên dijwar rawestin.

Ya rastî ev mijar bi giştî ji ber milîtanbûn pêk nayê, taybet jî di encama serweriya çanda paşverû û çanda netewa serwer de derdikeve holê. Ango ji ber milîtanbûn tam nayê jiyîn, bandora xwe ya herî dijwar li ser vê kesimê derdixe holê. Di bin navê em bigihin qonaxa serweriyê de, van ti qural nedan berçavên xwe. Bi taybet rizgarbûna ji dorpêça paşverû û kevneşopiya malbatê û azadiya di nava partiyê de bi şêweya pir sexte fêm kirin. Di nêzîkbûna ji azadî û serdestiyê re, weke ku tola hezarî

salan a koletiyê ji partî bistîne êrîşek pêk anîn. Li şûna ku di nava bêrêxistiniyê de pêdiviya rêxistinbûnek bi tenduristî bibîne û pêk bîne, berovajî ji borêxistinê veguherînin çala fesadiya bikar anîn. Tevî derfetên li her cihî hatine dayîn, tişta ku pêş dixin xirabûne û em jî dibin şadihê gelek pêwendiyên ku rêz li hember nayê girtin. Lê belê para zilam jî ya di vir de ne kême.

Em her tim dibêjin; şûna weke ku pirsgirêka cewherê heye, pirsgirêka azadiya jinê heye li ser vê pirsgirêkê lêhûr bibin û bi vî şêweyî beşdarî xebatên azadiya giştî ya partî bibin, derfeta azadiyê ya hatiye bidestxistin dikemirînin, li ser vê şer dikin û hewldana veguhertina heyberek fesadiyê kirin. Di nava partiyê de têkîliyên sînornenas pêş xistin. Bi evîndariya bûna serdest de yekser helwest hatin guhertin, rewşek dij-siyasî hat pêşxistin.

Em di vê mijarê de li ser hinek rewşan taybet hizirîn, me çarçoveya rast vekir û hewl da têkîliyan li ser van bingehan vekir. Lê me di carekê de jî dît ku, me jî tiştek nahesibînin. Pêl serê me dikin, kesên ku hewl didin li ser me serwer bin hene û yên wisa jî ne kêm bûn. Me ji ber lewaziya di nav de dijîn, baldarî pişgiriyek da şerên azadiyê, lê wan nêzîkbûnek "firsend ev firsende, ji bo em bijîn rojan baş bikar bînin, çi ji destê me tê em bikin" raber kirin. Ger nêzîkbûna ji Rêbertiya Partiyê re wisa be, nêzîkbûna ji çêkera milîtan re wêrantir bû, di navbera xwe de yek ji wan ê din weke mirov nehesiband. Hevdu ne weke rêheval, teqez an ji bo xwe jorî hev bibînin, an jî kesek ku hewce dike di bin de bimîne dîtin. Lewma pêwendiya di navbera wan de, ne pêwendiyek rêhevaltî û azade. Li gorî kesên xwediyê vî ruhî û mantiqî, dê teqez bêvila yekî ji yê din bilindtir be. Teqez dê di bin re yan jî jor de yek hebe. Naxwaze derfet bide pêwendiyek din. Lê di rastiyê de pêwendiya partiyê, ji bingeh ve pêwendiya wekhevî û azadiyê ye. Hêjî em hewl didin fêm bikin ku me ev çiqas daye pejirandin. Bi taybet piştî ku hinek fikir sepanan re rûbirû dimînin yekser dibêjin; "Me xwest em xwe bispêrin hinekan, an jî me xwest em li

ser milê hinekan re bilind bibin." Ev her du jî ketîbûne. Ne pêl milê hinekan bike û bilind bibe, ne jî xwe bispêre. Jixwe xwe sipartina hinekan koletîye. Çiyê te dibe bila be, kî dibe bila be, xwe sipartin, şêwaza têkîliyek ketiye. Mixabin li şûna pêwendiyek rêhevaltî, ev tên jiyîn.

Dema em di nêvenga PKK'ê de pêwendiyên wekhev û azad ferz dikin, em nabêjin bila bên li ser sitûyê me siwar bibin an jî bila xwe bispêrin me. Ji borêheval bin em ferz dikin û em di vê mijarê de jî pir hişkin. Bes ev jî ne yek alî ye. Di aliyek vê pêwendiyê de zilam cîh digire. An xwe bi jinê dide xweşkirin dike, yan jî serî dide tewandin. Zilam jî di vê mijarê de kêm ne tawanbare. Jixwe nêzî pêwendiyên azad nabe, xwe qure dibîne. Di nava PKK'ê de di vê mijarê de yek ji xirabiyên bê kirin a herî mezin jî, jiyan wisa girtina deste.

Rêbertiyek ku em nûnertiya wê dikin heye. Ji ber şûna ku di pêwendiyên bi jinê re de ev rêbertî esas bê girtin, ev xwe dispêrên rêbertî û hesabên dê çawa bibin otorîte dikin. Em bi têkoşînek wisa bêhempa ve rola azadiyê didin lîstin, ew jî dixwazin di rojekê de desteser bikin. Bes hûn jî nakevin ferqa vê. Di vê mijarê de jî fêlbaziya jinê dikev e meriyetê. Di fêlbaziyê de dahî ne. Hewldanek binvefêhil dimeşînin û di qonaxa dawî de jî em ji nişkê ve dibînin têkil lîstokên pir xeter bûne. Ji bo pêşketinek girêdayî ked û hêza xwe bikin, me di nava rêxistinê de firsed da gelekan. Lê mixabin em bi rewşên weke li qesrên Bîzans û Osmaniyan de rûbirû hatin. Nêzîkbûnên paşverû yên endamên me ewqas zêde ne, ew ketîbûn û şaşwaziya hezarî salî xwestin di rojekê de, bi giştî di nav partî û taybet jî Rêbertiyê de derbixin holê. Tevî ku hinek deh salin di nava me de ne, em dibînin ku çawa bi hunertiya rêxistinê ve hinekan dike palpişta xwe, dibe dijberê hinekan, bi hemû hêza xwe ve di nava hêza me ya rêxistinî de weke stargeha fitne û fesadiyê dijîn. Tişta ku her tim pêş xistîn jî ev bûye. Di nava rêxistinê de derketina pêş jî wisa

fêm dikin! Bes em jî naxwazin encamek weke Ol'an kiriye ku dibêjin "jin îblîse" jê derbixin. Bi qasî nabe nesîbe ti tevgerê, me got şerê jinê ya weke kesayetek azad xwedî girîngiyek mezine. Berdêla wê çi dibe bila be, em ê teqez ferasetek wisa ya azadiyê şênber bikin. Bes weke tê fêmkirin ev wisa hêsan jî çênabe.

Di vê mijarê de erka me ya ku pênaseya wê wisa ye qet hêsan nakeve meriyetê. Dev jê berdin rehet pêk were, her ku em dixwazin di vir de pêngavan bavêjin, em di cihê herî jiyanî de darbe dixwin. Deka em weke mînak hinekê jî behsa qada xwe ya şer bikin: Kesên me gotîn bila xwe di nava gurubekê de biceribînin û xurt bibin, li wê derê tam kirine çala derewan. Hevdu ji rêderxistin weke ferasetekê kûr kirine. Ev hemû jî derbasî belgeyan bûne. Ev ne ji bo bidestxistina hêzê ye, hinekê di bin navê bidestxistina statû de lîstokên xwe pê xweşkirinê hatîn lîstine. Hemû hevaltiyên hatine pêşxistin xizmeta vê kirine. Êdî di encamê de ev rewş wisa ji rê hat derxistin, di qada me ya erkên jiyanî de hemû xanim û camêrên me kar û bar li aliyekê hiştin nîqaşên weke; "Em ê têkîliya civakî ya nû çawa ava bikin û li ser partiyê ferz bikin" kirine. Hem jî bi mehan ev nîqaş kirine. Li ser vî bingehî rewşek sexte, durû û parçe dike hatiye avakirin. Ger bikarin bi hevdu re têkîliyek sexte jî pêş bixin, em tiştekê ji wan re nabêjin, lê mixabin diçin xwe dispêrên rêxistinên îstîxbaratan. Jixwe kesên ku wisa revîn jî çêbûn û di encamê de poşmaniyên xwe jî bilêv kirin. Ji bobi gerîla lîstin û di nava têkoşîna çekdarî de xirabûn pêş xistin, hevalan hinek ji van ceza kirine.

Qaşo dûr û dirêj nîqaş kirine û xwe gihandine ferasetekê! Ev jî rê ji xerckirina kedek mezin re vekiriye. Ev nîqaş weke asîdê ne, pêwendiyan dihelînin. Ger fermandarek rêxistinekê her tim destûrê dide nîqaşên wisa sexte û ev nîqaş di vê astê de dibin feraset, dê di dawiyê de xençerê li rêxistinê bide. Jixwe yên wisa derketin jî. Em dev ji Ewrûpa yan jî qadek dûr berdin, di kêleka serê me de derketin holê. Ji bo em di vê mijarê de kesayetek rast a

şoreşger û avabûna pêwendiyên rêxistinî pêş bikevin û pêşve bibin nirxandinên berfireh kirin. Hûn jî dizanin, belaya anîn serê axaftinên me yên di Adarê de ne kêm bûn. Dilxwede şîrove kirine hewl dane pêk bînin! Ya rastî ev ne ferasetin jî, ji bilî rewşek jin û zilamên ketî yên bi şêweyek dijbertiya şoreşê ne, şoreşgerî û jiyana azad ji xwe re pêşketinek nabînin zêdetir ne tiştek dine. Ango şoreşgertiyek dijbere, muhafezekarî ye û ji vê re jî jiyan nayê gotin. Me di axaftinên Adarê de, pêwîste jiyana rast çawa be û asta ku divê di van pêwendiyan de pêş bikeve di sosyalîzmê de tê çi wateyê şîrove kiribû. Elbet ev ji şîrove û di pêwendiyan de dana der re vekiriye. Jixwe ne xalek ku wisa neyê fêmkirine jî. Lê belê paşê rikek mezin bi vê lîstin. Yekser vê jî bêjim: Ez ji têkîliyên jin û zilam şerim nakim, bes ketîbûna di vê mijarê de pir xirabe.

Îro li Tirkiyê di îdîaya "jin hatiye kifşkirin" de ne. Lê rastiya vê, kapîtalîzma Tirk dixwaze jin pêşkêş bike. Di bin navê nizanim têkîliyek wisa civakî heye, jin jî beşdarî parlemento dibe, girîngiya jinê derketiye holê de, ji bohemû çîrok ji bo kapîtalîzmê feydeyekê ava bikine. Li şûna van têkîliyên kevin ên malbatî, ji bokapîtalîzm keda jinê û kesayeta jinê baştir pêşkêş bike van dibêje. Kapîtalîzma Ewrûpa ev beriya niha sed salî kiriye. Tirkiye jî nû dike û bi şêweyek bal bikişîne kovarên "çepgir jî din av de" her tim vê mijarê bikar tînin. Ya ku di bin navê nêzîkbûna ji pirsgirêka jinê re, tê pêşkêşkirin kesayeta jinê ye. Li ser vê encamek pir girîng derdikeve holê. Binêrin, faşîzm jinê derdixe pêş, li ser pir lîstok dilîze, bikar tîne, dixe rewşek heyber de û dixwaze xwe wisa bi sextekarî rizgar bike. Eleqeya li hember jin û hêza jinê, di radeyek girîng de faşîzmê rehet dike. Lewma vale jinê evqasî di çapemeniyê de pêşkêş nakin. Hemû ji bo kapîtalîzmê ji tengezariyê rizgar bikin tên kirin. Ji ber vê, ti eleqeya vê bi azadiya jinê ve nîne. Di vê mijarê de li Tirkiyê tê

gotin ku, “şoreşa jinê tê jiyîn.” Mixabin mirov dikare bêje faşîzm wê di asta herî ketî de dixe.

Dixwazin rewşek mîna vê hinek din kêmtir di refên me de bidin jiyîn. Hinek kes bi daxwaza ku vê ketîbûna faşîzmê di partiya me de bide jiyîn tekil lîstokekê bûn. Em naxwazin li ser niyeta van nîqaş bikin. Polîs jinan dixe nava girtîgehan û nexasim qadên girseya ku pêwendiyên me lê zêde ne. Dikarin bixin nava me de jî. Lê belê, li şûna ku ez bêjim ev wisa ye, ez dibêjim tîpek ku civakbûn û siyasetmedarî bi xwe re pêş nexistiye, azadiyê pir xirab şîrov dike û disepînê ye. Mijarê tenê weke meseleyek exlaqî jî nagirim dest. Pirsgirêk ne ev e. Pirsgirêk siyasetvantî pir xirab girtina deste. Kesek ku pêwîste milîtan be, ger rêxistin, hiyerarşî û rayeya di nava partiyê de evqasî bi sextekarî derbas bike û jinwartiya xwe bide pêş, hewl bide bikar bîne, ji ber ku ev ne bilindbûnek xwe sipartî kedê ye pir xeternake. Her wiha jinwarbûna xwe bikaranîn, ango ji ber ku dixwaze ji cînseltiya xwe sûd werbigire vê wisa bike hîn xetertire. Ji ber di nava me de di vê mijarê de jî zilam pir ketîye. Lewma em neçarin di vê mijarê de nêzîkbûn û şîroveyek şoreşgerane bikin. Ger heta dawî pêwendiya jin û zilam a hevalbendiyê dipejirînin em jî erê dikin, bes bixwazin vê wisa di nava rêxistinê de bikar bînin em jî dibêjin na! Jixwe ger em nekarin di nava partiya xwe de wekheviyê saz bikin, di nava partiyê de pêwendiyek jin û zilam a rêzdar û azad ava nebe, em ê çawa bikarin vê di nava civakê de ava bikin? Ger di nava partiyê de û hem jî hêmanên me yên di asta herî pêş de di bin navê pêwendiyên civakî de têkîliyên xeternak pêş bixin, çi namîne neyê serê wê rêxistinê! Lewma hewce dike em vî karî pir girîng dijwar bigirin dest û bi rêgez nêz bibin.

Em dikarin xwe ji her hêlê ve kamilbûyî û rêzbar bikin. Ez heta dawî dabeşkirina kar erê dikim, lê ji cihetiya jin û zilam re dibêjim na. Cihetiya ku divê bê kirin, pêwîste li gorî jêhatî û xisletên heyî be. Ger hewce kir jin dikare di têkoşîna çekdarî de

fermandariyê bike, jixwe têkoşîna me di vê mijarê de pir vekiriye. Partiya me ji xwe bawere û derfetan jî dide. Pêngava ku ti rêxistinê nekiriye, partiya me dike. Lê belê li ser van derfetên ku partiya me daye jî, kesên ku dixwazin bi çavkorî li ser bilîzin hene, elbet dê ev jî berdêla vê giran bidin. Mane em azadiyê hêsan bidest naxin ku vê jî ji yek-du kesên ketî re pêşkêş bikin. Me her tim ev got; heta dawî ji pêşketin û azadbûnê re erê, lê di vê mijarê de partî xirab karanînê re na! Mixabin dixwazim bêjim ku hêjî di radeyek girîng de tişta tê jiyîn evin û di pêwendiyan de astek bi tenduristî nehatiye bidestxistin.

Ez li vir tenê behsa pêwendiyên di nava partî de nakim, pêwendiyên bi girseyê re jî di vê mijarê de pir xirabin. Nêzîkbûna giştî ji civakê re, taybet jî ji jinê re pir bi kêmasî ye. Di vê mijarê de hêj ew xerîzeya zilam a sexte nehatiye hilweşandin. Her wiha ew nêrîna jinê ya xwe weke heyberekê jî dibîne hêj nehatiye hilweşandin. Kevneşopiyên di vê mijarê de giran bûne û xerîzeyên zeptûrep nehatine girtin hene. Lê tu, nav li sere şoreşgerî. Mirovê şoreşger, destûrê nade ku li ser fikra wê serweriyek heyberî çêbe. Mirovê şoreşger, kesayetê ku di vê mijarê de terbiye, perwerde û pêwendiyek nû saz dikê ye. Ti cihê macerayên xirabkar di nava partiya me de nîne. Ya rastî xisletên partiya me, ne xisletên wisa ne ku nekare van derbas bike. Hewldanên ku partiya me di vê mijarê de kirine jî, ne kêmin.

Di civatên din de qaşo behsa wekhevî û demokrasiyê tê kirin, lê jinek çi di leşkertiyê de, çi her cure di saziyên dewletê de, çi jî di kargeha karsazekî de nikare rêzdariya li hemberî xwe mehekê jî biparêze. Ji her hêlê ve bi êrîşan re rûbirû dimîne û teqez neçar dimîne ku kesayeta xwe weke heyberekê bifiroşe. Ev di partiya me de nîne. Partiya me, di vê mijarê de saziyek saxleme. Bandorek bêhempa li ser dijmin jî çêkiriye. Di derbarê xala jinên di nava partiyê de çawa wisa saxlem mane de, dijmin jî şaşwaz maye. Ev jî hêza serweriya partiya me li ser xwe dijî rave

dike. Ev mezinbûne. Bi vê lîstin ne marîfet ne jî fêlbazî ye. Pêwîste mirov li hember vê mezinbûnê rêz bigire. Ev mezinbûn ne ji bo çend kesane, ji bo rêzdarbûna hatiye windakirin di pêşerojê de cardin bê bidestxistine. Ger em îro di nava partiya xwe de vê astê bigirin, dê siberojê pêwendiyên ku di bin vê alê de pêş bikevin jî, pêwendiyên azad bin. Lewma em ji vê re dibêjn erê û em vê ji bo xatirê çend kesan jî nakin. Yekser bêjim, ez evqas hewldanê ji boxatirê çend jinan jî nakim. Misoger ji bo nêvengê ji hinek têkîliyên erzan re amade bikim jî nakim. Ji bo xisletek partiya me ya dîrokî zindî bigirim, bihêz bihêlim û mezin bikim em evqasî tehemûl dikin. Hûn ê jî wisa fêm bikin. Jixwe divê hûn fêm bikin, em li vir rastiyên mînak pêş dixin. Ji bo siberojê em bê amadekarî neyên girtin û xwedî ceribandin bin vê dikin. Bes hinek jî vê pir xirab fêm dikin. Ji bo em di vê mijarê de xerîzeyên wan ên hişyar dibin bi zincîrê ve girê bidin, berovajî vê berzbûnekê raber bikin evqasî fedekariyê dikin û dixwazin rêgezekê kêrhatî bikin. Jixwe weke din em ê peywirek hezar salî çawa bikarin pêk bînin? Her kes rêzbendî û azadiyê dixwaze. Nexwe divê mirov hewldana vê ya teorîk, pratîkî û siyasî raber bike. Azadî, weke mirov tirşiyê çêke çênabe. Azadî, wisa jixweber an jî mîna ava esasî ya ji madeya we tê jî nayê bidestxistin. Azadî, di encama şerek siyasî ya bêhempa û xebatek teorîk de pêş dikeve. Hem em ê behsa ketîbûna di vê astê de bikin, em ê bêjin me mirov nahesibînin, hem jî em ê hêza xwe gihandina têkîliyek rêzbend jî raber nekin. Belê, ev nabe. Em derfeta kemirandina azadiya partiyê wisa nadin ti kesî.

Dîsîplîna em ferz dikin, ne ji bo tengavkirina kesane. Berovajî vê ji bo pêşxistina pêwendiyek cewherî ye. Partî di vê mijarê de her tim dibistaneke. Pêwendiyên mînak li vir tên pêşxistin û wisa di civakê de tên raberkirin. Ji bovê elbet hûn ê bizanin ku ji nefsa xwe kêm bikin. Hinek rexneyên weke “di nava PKK’ê de malbat tine ye” dikin. Me kêliya berê rexneyên li ser

malbatê pêş xistin û ev nirxandinên pir girîng bûn. Rexneya li ser malbatê me kirî, ji bo avakirina malbatek bihêz û tenduristî bû. Avakirina malbatê ne tiştek wisa hêsane. Ji bo vê jî wê tu pêşî bi malbata paşverû re şer bikî, faşîzma ku nobedariya vê jî dike hilweşînî. Wê demê em ji rê dernekevin. Provakasyonan jî her tim ev mijar girt dest. Gotin; "Di nava PKK'ê de jiyana civakî tine ye." Me rewşa jiyana civakî danî holê. Jiyana civakî, ne jiyana xwe firotina emperyalîzm û mêtîngeriyê ye. Jiyana civakî piştî ku faşîzm, emperyalîzm û mêtîngeriya ku gef li jiyanê dixwe hat hilweşandin dibe jiyanek ku derfetê bidest dixe. Demokrasî jî li ser vî bingehî gengaze. Ger hêzek evqasî êrîşî demokrasiyê dike li holê ye, ne gengaze ku em jî demokrasiyê bijîn. Heta ku di nava rêxistinê de pêwendiyên rêzbend neyên pêşxistin, li hember maf, huquq û kesayeta hevdu rêzdarbûn nebe, mirov dikare behsa kîjan jiyana civakî bike? têkîliya civakî ya behsê dikin, ji bo xerîzeyên xwe nirxên partî bi hezar kedê amade kirine, pereyên partî, pêwendî û malên partî amade kirine bi şêweyek ketî ji bo xerîzeyên xwe bikaranîne. Ma ev demokrasî ye? Ma ev dibe têkîliya civakî? Jixwe ji revên wan jî diyar dibe ku ne wisa ye.

Paşê em li cihê ku xwe sipartinê dinêrin: Qaşo tiştên dixwazin li Siwêd'ê dijîn! Rola ku Siwêd dilîze, li ser tevgera Kurd wan hestên zilamtiya feodal bi cewherek herî xirab re derbas dikin û wisa bi şêweyek herî xirab tinebûna kesan amade dikin. Ewder qadek emperyalîzmê ya erkê ye. Bi koman zilamê Kurd kêşane wêderê û weke hemûyan bixe gova fêhlan bi ser hev de kom kirine, ji vê re jî dibêjin; "Têkîliyên nû yên nûjen." Hûn wan bikujin jî nikarin yek ji wan vegerînin Kurdistanê. Vêca tişta jê re dibêjin "azadiye" çiye? Ma têkîliya azadiyê li kur dimîne? Niha, qaşo dixwazin bijîn! Belê bi qasî dixwazin bila li wir bijîn, lê ger dê jiyan ji bo welatek azad be û ev jî rêgezek jêneveger be, tu tenê dikarî rêya vê jiyanê bi serma, germa, birçî û tîbûna li serê çiyan bijîn ve vebikî. Weke din bi ti rêyek din welatê azad nayê

avakirin. Hinde çavên van ketiyan reş bûye, hemû jî di vê yan jî wê astê de sekreterê partî ne, bê ku ti hewldanê bikin, misqalekê jî dest bi jiyana xwe bidin, Kurdistana azad dixwazin! Ma welatê azad wisa tê avakirin? Dê kî ji van re welatê azad ava bike? Gelo dê demokrasiya çepgir vê bike?

Bila Kurdistan li aliyekê bimîne, azadiya demokrasiya civakî li wir jî nehatiye fêmkirin. Xiftanê ku demokrasiya civakî li Tirkiyê ber kiriye deka li Ecevît binêrin: Ecevît li Tirkiyê çawa nûnertiya demokrasiya civakî kir? Qaşo hevalê Palme yê herî nêz û dîsa dostê Brand ê herî nêz bû. Bîst sal bû ew ji demokrasiya civakî re amade dikirin. Mixabin paşê, derket holê ku Ecevît tasfiyekar û provakatorek ku li ser çepgirên şoreşger ên li Tirkiyê pêş dikev e dihat ferzkirin bû. Li hember serkeftina faşîzma Evren-Ozal, em ê yek-du dijbertiyên wî yên sexte zêde cidî negirin. Ev dijbertî cardin ji bo xapandina girseyan û ji bo tasfiyekirina hinek ronakbîrên demokrat ên pêş bikevin nêzîkbûnek xwe veşartinê ye. Bi rastî jî weke ku em şahidek vê yê pir başin vî zilamî bi armanca tasfiyekirina muxelefeta şoreşger a pêş bikeve, ji salên 65'an ve zend û bendên xwe badane, piştî ku 20 salan erka xwe bicîh anî, xwe vekişand malpera Oran û niha jî weke ketiyek dewletê bi xeyalên xwe yên helbestvanî ve tenê mayîn hilbijartiye. Dilxwede dijberê dewletê ye, lê dewletperestê herî xeternake. Evdê ber deriyê dewletê ye û kesayetek wisa ye wê evdbûna ber derî jî bi şêweyek pir xeter bicîh tîne. Qetiyen dijbertiya yên bijare yan jî dijbertiya fikra dewletparêziyê nake. Sextekar û demagogek mezine. Tişta îro hatî selmandin jî ev e. Em van tevan ji bo pênaseya rawestgeha kesên ku xwestine vê ferasetê di nava me de jî bidin jiyîn bikin vedibêjin.

Ev rawestgeh, xwedî van têkîlî û qenalên tîpên wisa ye. Ev ne tenê di jiyana çend hezar kesî de, ji bo ji wir jî paşverûtiyê di welat de pêş bixin kar dikin. Her yek ji van endamê eşîrekê ne,

hemû bira û xizmên xwe dikişînin wir û têkil vê nexweşiyê dikin. Dibêjin; “Tişta demokrasî tê behskirin wisa ye, em Kurdistanek wisa dixwazin” û Siwêd’ê nîşan didin. Belê, ev bûyerek xofdare. Bi rastî jî mirov yeqîn nake. Gelo ev li Kurdistanê ji dayîk bûne û mezin bûne, çawa li Kurdistanê jiyane? Bes emperyalîzm dike û dide kirin. Belê, niha qonaxa ku hinek kesên li nav me jî gihiştinê ewdere. Me jî ne demokratbûnê, jiyana civakî cidî negirtinê rexne dikin, ev ne bistehin, tam zilamê ketî ne. Ji boîro zikê xwe têr bikin, her çendî li ser bingeha dijbertiyê jî be, li derdora PKK’ê tevdigerin. Rojname dinivîsin ku; “Van, di derbarê PKK’ê de hinek zanyarî firotine û hinekê jiyane.” Rastî jî wisa ye. Ji bo zikê xwe têr bikin, ji bilî me bifiroşin ti sermiyana wan tine ye. Ango ji bo bibin xwediyê jiyana li wir a kirêt, pêdiviyek xwe pêk bînin, hêjî li ser PKK’ê kar dikin. Niha zanyarî nemane, lewra ew jî li holê mane.

Vêca divê mirov xwe xurt bike, rast nêzî xwe bibe, divê hesaba destpêk û encama mijarên azadî, demokrasî, jiyana civakî û jiyana malbatî tê gotin baş bike. Bi rastî jî kesên wisa hene, ne ku ji bo ev pir mezin lîstine, ne ku ji bo pir zerar dane me û darbe li me dane, ji bo pir ketîne û ji nava me jî kesên wisa derdikevin mirov helak dibe. Em dihizirin ku gelo mirov evqasî ji rêderketî û xurifiyê civakî dibe? Qaşo têkîliyên nû ji PKK’ê re pêşniyar kirine û dixwazin pêşniyar bikin, lê ji partî ditirsin! Ew têkîliya civakî ya behsa wê dikin, tê wateya “em dev ji şoreş û berxwedanê berdine.” Em di nava bê derfetiyên mezin de malekê û derfetê perwerdeyekê dibînin, ew jî ku em nikarin tenê bêjin jiyanek lîberale jî, dixwazin veguherînin qadek ji jiyana herî ketî ya feodal û xirab re guncav. Em li vir di her astê de komkujiyê dijîn. Ji bo em vê rawestînin û henase bi henase derfetên biçûk bidest bixin hewl didin, wan jî çavên xwe berdane vê û dihizirin ku dê li ber serê me çawa vê bikar bînin. Ji bo em li vir êşkenceyê rawestînin, hêviyê hinek din nû bikin û mirovên xwe rizgar bikin

her cure zehmetiyan berçav digirin, lê mixabin hiş û mejiyê wî çavsorî li ser “li vir jiyan heye, nizanim nan li vir evqase.” Bes ti eleqeya xwe jî bi hev nîne. Ev neh salin li vê qadê me, lê nikarim baş xew jî bikim. Nexwe nabe ku hûn bêjin; “Mirov dikare li vir wisa bijî, wisa çayê tê vexwarin û xwarin tê amadekirin.” Li vir xwarin di qirika mirov re derbas nabe. Ger derbas bibe jî, tenê ji bo debara jiyana xwe ya fîzîkî ye. Lê mixabin zilam ketiye û tiştekê ji jiyanê jî fêm nake.

Neçare ku bidestxistina azadiyê û ji her hêlê ve rêveberiya wê bê zanîn. Nêzîkbûnên wisa xwe firotina emperyalîzmê û gotina; “Em ê PKK’ê bi demokrat bikin û nerim bikin” ve rêxistinkirina rûxandinê û hevkariya bi kontr-gerîla re ne azadî ye. Ev xebatên xiyanetê yên çavkorî ne. Dîsa li vir nikare du rojan li ber xwe bide û ber bi jiyana Ewrûpa ve bazdan jî, ne lêgerîna azadiyê ye. Berdêlek azadiyê ya pir cidî heye. Heta ku ev neyê dayîn, tiştek nayê bidestxistin.

Nirxa giranbiha ya partiya me dide azadiyê, pêwendiyên rêhevaltiya şoreşgerî ya rast pêş dixe heta dawî vekirî û bi qasî rê ji ti şîroveyên din re veneke zelale. Ji boxwe gihandina van pîvanan divê pêşî partiya me bê nasîn. Piştre dor tê sazkirina girêdanên li ser bingehên rast ên hevdu fêmkirinê û avakirina rêxistinên nû.

Dema vê dibêjim, nabêjim malbat nayê sazkirin. Bes lê binêrin, mercên jiyanê yên mirov ranake hene. Girtîgeh heye, li çiyan birçîbûn û tîbûn heye. Texrîbata dijmin a dijwar heye. Ma wê tu di van mercan de çima têkîliya jin û zilam pêş bixî? Ne ji bo em dixwazin, ji boşert û mercên heyî me neçarî vê dikin em dibêjin. Ev pêvajo ne tenê di nava me de, di merheleya hemû têkoşînên rizgariya welatên sosyalîst de hatiye jiyîn. Vêca em ê bizanin rêzdar bin. Ev hemû jî ne ku di nava me de rêzdarî, hezkirin û pêwendiyên jin û zilam nabin tên vegotin, berovajî vê ji bo malbat û zarokan hewce ye. Nexwe li şûna vê tiştên din

sepandin, bi partî lîstin, bi otorîteyê lîstin û bi rêbertî lîstine. Ev jî bi qasî tawana ku bi rêxistinê dilîze, tawanek din a girane. Elbet weke her tawanê, ev tawan jî dê bê cezakirin.

Me derxist holê ku hinek di xêra dilketinên xwe yên ketî de şerek çawa dimeşînin, bi navê reîstiya malbatê yan jî fêlbaziya jinê xwestekên xwe yên siyasî çawa didin axaftin. Tişta ku li vir derket holê ne xerîzeyek cînseltî ya hêsane, misoger wateyek wê ya siyasî heye. Diyare kesên ku bixwazin di nava PKK'ê de cînseltiyê bijîn dê zehmetiyên pir giran re rûbirû bên û jixwe ev jî tê zanîn. Lê mixabin tevî vê kesên ku dixwazin bi vî şêweyî bijîn diçin cem Komara Tirk. Hingê dikarin tevlî şêwaza jiyana ku wî di vê mijarê de ava kiriye bibin. Dikarin vê di qada jiyana emperyalîzmê de bibînin. Lê niha tişta ji bo me pêwîste bi pêwendiyên bîrdozî, siyasî û civakî ve avakirina guhertinek mezine. Ya rastî ev jî pêwendiyek şoreşgerî ya herî rast ku me heta dawî bi şêweyek balkêş li cem hev digire û xurt dike ye.

Sedema em evqasî li ser radiwestin ji ber çavên wî hêj di nava azweriyên feodalî de venebûne, ji têkîliyên ketî yên Komara Tirk ferz dike rizgar nebûye û tevî vê ew hewl didin têkîliyên civakî fêrî me bikin. Beriya ev birevin Siwêdê ger bihatan vir, me dikariya bê ku tiştekê bikin pêwendiyên civakî fêrî wan bikira. Lê belê ev ne mirovên ku bi rastî jî ji pêwendiyên civakî fêm dikin, ne jî dizanin silavekê bidine. Ev mirovên nizanin li hember mirovan nêzîkbûnek rêzdar raber bikin, çavkor û bi rastî jî di asta herî ketî de dijîne. PKK hêzek ku pêwendiyên civakî û siyasî bi xisletên herî hêzdar ve dide fêrkirine. Ev xisleta wê jî ji aliyê gelek hêzan ve bi rêzdarî tê pejirandin. Bes zilamê ku hêj çavê xwe ji tarîtiya serdema navîn rizgar nekiriye û têkîliyên heywanî û asayî ji hev dernaxe radibe vê weke helbesta evînê datîne pêşberî me. Zilamê ku di gava pêşî de dest bi têkîliyên ne meşrû dike, li biryargehên dijmin têkîliya civakî weke têkîliya zik têrkirinê dibîne û weke jiyanek rehet fêm dike, ji vê re jî dibêje

têkîliya evînê. Elbet mirovê ku ji pêwendiya civakî vê fêm dike, tiştekê ji pêwendiyên rehevaltiya PKK'ê fêm nake.

Di qada vê pêwendiyê de em heta dawî dixwazin milîtanek bihêz derbikeve holê û heta dawî jî em alîkar dibin. Ti hevalek me ya jin divê bizane ku –zewicî yan jî ne zewicî- dê bi nêzîkbûnek herî biçûk a newekhev û çewsîner re rûbirû neyê. Jixwe wateya azadiyê ya herî mezin jî di vir de ye û ya di nava me tê sepandin jî ev e. Li vir ti kes nikare ji jina bi tenê re yek gotinek biçûk a xirab bêje û nikare zextek weke "wisa bijî, wisa nejî" li ser bike. Ev jî radeya azadiyê dide diyarkirin. Ev azadî ne li Ewrûpa, heta ne jî li welatên sosyalîst heye. Divê mirov azadiyê ne bi şêweya koletiya di azweriyan de, wisa fêm bike. Îhtîmalek mezin li pey têkîliyek cudaku dixwazin li hember pêwendiyên rêhevaltiya şoreşgerî ya azad ku partiya me ferz dike polîs hene. Yan jî dibe ku polîs veşartî vê weke şêwaza çand, nêzîkbûn û jiyanekê ferz bike.

Dixwazin bi vê jî pergalê rehet bikin. Bi qasî diyar dibe dixwazin kesayetek xwedî felsefeya xwe dide jiyîn, serî ditewîne pêş bixin. Pêwendiya vê jî pir dijwar bi malbatê re heye. Malbat, saziyek kevnare ya faşîzmê ye. Li Ewrûpa saziyek wisa nîne. Ewrûpa bi qasî nîskekê nirx dide vê saziyê. Lê li cem me û li Tirkiyê ne wisa ye. Faşîzm di vê mijarê de malbata serdema navîn pir bikar tîne. Ev rexne jî derfetê çêdike ku em bikarin malbata serdema navîn derbas bikin. Dê her hevalek xwe di vê mijarê de hinekê binirxîne, bi nêzîkbûnek rexnegir li çareseriyê bigere. Elbet hewce dike em malbatên xwe ji faşîzmê rizgar bikin. Malbatan jî demek dirêj dixwestin me ji faşîzmê rizgar bikin, niha jî hewce dike em wan rizgar bikin. Em yeqîn dikin ev erkek cidî û girînge.

Em bi malbatperestiya heyî re nêzî 25-30 salî ye têdikoşin û derbas dikin wisa dimeşin. Ev pirsgirêkek pir cidî ye. Hema wisa badilhewa nagirin dest. Mesele ne şere. Jixwe têkoşîna bi

malbatê re ne meseleyek şere, hesapxwestinek hişmendî, kevneşop û exlaqê ye. Mebest ev kesayet li beramber girtin, feraset û reftarên ku serwerin derbaskirine. Li cem me şoreşgerbûna malbatê, şoreşgerbûna civakê qonaxa herî girîng an jî ji bingeh ve serkeftina wê ye. Tenêbûna ku di asta bêhempa de şoreşgerên Tirkiyê dijîn, şoreşgerî weke karê zarokên nehedirî, betal û bêhêz an jî şahiya kesên ji malê qut bûne tê nirxandin. Ger şoreşgerbûna malbatê bi pêşketina kes ve di nava hev de bihata destgirtin, şoreşgeriya li Tirkiyê evqasî zû ne dihilweşiya û têk ne diçû. Divê pêşketina şoreşgerî di nava malbatê de jî bê diyarkirin. Hûn jî ezmûnên partiya me baş dizanin. Divê hûn di jiyana têkoşîna xwe ya ji vir û şûn de di vê mijarê de bê xem nebin, xam nêz nebin û deriyê vekirî nehêlin. Yeqîn dikim mijar bi şêweyek têrkar hat ronîkirin. Encam derxistin û ev encam di pratîkê de rast pêkanîn erka milîtanên partiyê ye. Di derbarê vê mijarê de ji bo ku em ji têkîliyên xwedî nirxên paşverû rizgar bibin, nêzîkbûna ji malbat û jinê re bi şoreşgerane pêş bixin erkên me hene. Divê em vê erka xwe jidil pêk bînin.

***Kanun 1987***

### *Şoreşa Me Li Hember Malbata Kevin Avakirina Malbata Nû, Jina Nû Û Zilamê Nû Ye*

Me pirsgirêka dergeha malbatê ku hewce dike bi girîngiyek çawa bê destgirtin bi pêşketina wê ya dîrokî ve girêdayî nirxand û bersiva pirsa di roja me de cihê wê di nava rastiya civaka Kurdistanê de çiye da. Hewce nake em van mijaran cardin dubare bikin. Bi kurtasî, rastiya malbatê di nava civaka me de ji civakên din çawa zêdetir me eleqeder dike, dike kole û xelekek muhafezekariyê ye.

Di civaka Kurdistanê de girêdana bi malbatê, heta dawî çewt, bi girêdana koletiya kevin ve heman tişte û girêdanek malbatê ber bi tinebûnê ve dibe. Ji ber di nav civaka me de saziya bingehîne hestên namûsê û exlaq di çarçoveya girêdana bi malbatê ve tê destgirtin. Rêgeza sereke aresteya jiyanê dike, rêgeza “min çi daye malbatê” ye. Pîvana bûna camêrê qenç, pîvana xizmeta ji malbatê re kiriye. Hemû nirxên ku her kes li derdorê dizivire û ji xwe re pîvana esasî dibîne, nirxê malbatê ye. Malbata civaka me pêşketina civakî ya bingehîn li aliyekê hiştiye, hêjî bermahiyên êl û binemalên di destpêka pêşketina civakbûnê de dijî. Ger ev rewş neyê jibîrkirin dê bê dîtin ku di cîhanê de rêxistinbûna civakî di astek herî pêş de ye, lê belê em hêjî rewş, fikir û hestên êl û binemalên kevin ve girêdayî ne. Ev jî dibe şêweya muhafezekariya herî xeternak. Mao jî li Çînê vê weke yek ji çar nakokiyên bingehîn diyar dike. Lê belê di civaka me de rewş hinek din cuda ye.

Li Kurdistanê hilweşîna civakî, di sînorên malbatê de rawestiyaye. Elbet ev “rawestîn” ne ji ber rehma dijmin pê hatiye lewma çêbûye. Ji ber ku dijmin vê xelekê weke çavkaniya xwe xapandinek bingehîn dibîne, ev xelek di rewşek dergeha dîlgirtinê û tenê malek ku di nav de bijî hiştiye. Di heman demê de ji ber ku

heta dawî derfetên objektîf ên madî yên rizgarkirina vê malê kêmin, ev mal dibe çavkaniya bûhranê ya bingehîn. Her wiha ji boti bingeha hewldanên ji bo derbaskirina vê bûhranê tine ye, bi têkçûnê encam dibe. Lewra cardin bûhran destpê dike û ji ber erkên nikarin ji bin rabin şerên nav malbatî jî xilas nabin. Di vê mijarê de hestên ezezîtî yên weke “an ez, an tu”, “kurê min, keça min û malbata min ên herî başin” hwd tim xwe didin axaftin. Her tişt li ser bingeha berjewendiyên malbatê girtina dest, dema zaroyek ji dervî malbatê dimîne hemû hêza xwe bikar tîne, hewce bike dewletê bi hewara xwe ve tîne û wisa hewl dide di nava malbatê de bigire. Ev feraset li Kurdistanê pirî caran tê dîtin. Di vê rewşê de xebatek herî xeter ji xebata çewsandinê ya dijmin xeternaktir bi destê vê saziyê li hember me tê meşandin.

Lewma şoreşgerbûna malbatê, gava bingehîn a rizgariya netewî ye. Şoreşgeriya nekare bikeve nava malbatê de, mehkumê tinebûnê ye. Dema me biyanîbûn û xapînokên di vê mijarê de zêdene ji holê rakirin, em ê bibînin ku bingeha hemû pêşketinên erênî jî hatine danîn. Li gorî vê peywira me ya şoreşgerî ya li hember malbatê xwedî girîngiyek mezine. Berdêla wê çi dibe bila be û bi kîjan rêbazî dibe bila be, divê em van malbatan bikişînin nava rewşek şoreşgerî, ew bi şêwazekî şoreşê ve girêdan pir girînge.

### *Li Dijî Malbata Kevin Malbata Nû*

Ji bo rejîma mêtînger a faşîst, saziya malbatê li dijî şoreşê bikar bîne îro ji her demê zêdetir kar dike. Em ji zagona cerdevaniya gundan bigirin, heta nêzîkbûna sîxurên ku ji malbatan re, hewl didin hinek malbatan rehîn bigirin, hinekan bi pereyan li dijî me derbixin, bi rêyên cur be cur ên li ser pispor bûne ve gelek rêbazên weke sîxuran bixin nava me û kesan bidin revandin bikar tînin. Di hemûyan de jî xisletên malbat, malbatparêzî –ev jî xisletên binemalî yên feodalin- esas digire. Dijmin bêrîkirina kesan a li hember malbatê gur dike û rê ji revên gelek kesan re vedike û nahêle beşdar bibin.

Min di vê mijarê de ji pratîkên xwe hinek mînak dane. Me salên dirêj ji ber nakokiyên nav malbatî nekarî serê xwe ji erdê bilind bikin. Rêya rizgarbûna ji van nakokiyan jî em derketin derve û em gihiştin wê encamê ancex dikarin li ser bingeha şoreşê rizgar bibin. Tişta ku me di gelek kesên muhafezekar de dîtî jî, di bin navê xizmeta ji malê re û rizgarkirina malbatê de, paşverûtiyek mezin hat jiyîn. Fikra; “Malbata min ez mezin kirim, dan xwendin, divê teqez ez jî tiştekê bidim wan” xwe xapandinek mezine. Gelek heval û kesên xwedî vê fikrê li derdora min hebûn. Veguhertinek berovajî kirin. Qaşo di bin navê zaroyê malbatê yê herî başin de hemû jêhatiyên wan -jixwe salên dirêj ancex dikare bidest bixe- hesreta ji malbatê re bû. Bi hizra avakirina malbatek nû jî her ku çû têk çûn. Elbet ne sal têra van dike, ne jî şert û mercên madî têrê dikin. Faşîzm malbatê belav dike, derfeta wê ya jiyanek têkûz tine dike. Tevî vê kesên ku dixwazin saziya malbatê ava bikin jî, hem ew bi xwe tine dibin, hem jî malbat têk diçe. Di vê rewşê de jî elbet serkeftin dibe ya şoreşa dijber. Nexwe diyare di vê mijarê de pêngavek me heta dawî ya şoreşgerî heye.

Me ji bo van ciwanên şoreşger ji bandorên neyênî yên malbatê rizgar bikin, hestên namûsa sexte û girêdanên wan bişkînin hewldanên mezin pêş xistin. Di nava têkoşîna me ya şoreşgerî de nirxê van hewldanan pir girînge. Kesên ku di vê mijarê de hewldanên têrkar nadin û natêkoşin, di rastiyê de xwe ji xelekên girêdanên paşerojê rizgar nekirine û divê mirov bêje hêjî wê dijîn. Heta ku malbatek xwe neyîne rewşa xizmetê ji şoreşê re bike, dê her tim ji bandorên dijmin re vekirî be, dê dijmin jî li ser vê malbatê her cure lîstokan bilîze, heta dê di encama hevkariya dijmin û malbatê de zerarên girîng bide şoreşê. Malbatê ku li Kurdistanê xwedî xisletên êl û binemalî dijîn, ji ber ku nekarîne bibin malbatên burjuvaziya biçûk û her tim xelekên eşîrtî ve girêdayî ne, gelekî xeternakin. Mînak, dema em dixwazin endamek ji eşîrek li Colemêrgê bigirin, hemû eşîret yekser dibêjin; “Yan em hemû yan qet nabe.” Ya rastî yan te yek kes girtiye, yan jî te hemû girtiye qet ferq nake. Lewma ev rewş zehmetiyên mezin ava dikin.

Bi gelemperî di rêxistinkirina tevgera me ya şoreşgerî de bi ser sazî û şêwaza vê fikrê de çûyîn û ew bi hostatî şoreşê ve girêdan, tenê girêdayî rast têgihiştina rastiya malbatê ye. Pêwîste di vê mijarê de rastî û nebesiyên madî berçav bên girtin, gav bi gav, hewce bike tawîz bên dayîn û em bizanin nêz bibin. Jixwe dema em endamek ji malbatên fiqîr digirin, ew malbat yekser têk diçe. Her wiha ferasetek namûsê ya heta dawî seqet heye. Dema keçek derdikeve dervî malbatê yekser jiyan bi serê wê malbatê de dirûxe. Dema kurek wan tê cem me, êşek giran dijîn. Dema me mezinbûna şoreşê bi wan da têgihiştin hingê em ê van rewşan jî telafî bikin. Pêwîste misoger di vê mijarê de hestên fedekarî û feraseta namûsa rast bê pêşxistin. Gelek karên ku di vê mijarê de bên kirin hene.

Divê em ji bîr nekin ku nêzîkbûnên erzan xizmetê ji şoreşa dijber re dike. Nexasim şaşiyên mezin di vê mijarê de

hatine kirin. Diçin nava malbatan û têkîliyên ku wan malbatan tine bikin tên pêşxistin. Dema ranake jî, tê gotin ku; "Wisa nêzî milîtanên weke me bûn." Lê mixabin tê zanîn ku em bi saziyek wisa pir hesas re rûbirû ne. Nêzîkbûnên xemsar û jixweber van pêwendiyan li dijî me dide pêşxistin.

Dijmin dema em destpêkê rê ketîn, belav kiribû ku em ê ji her malbatê endamekê bigirin û ber bi yekîneyê ve biçin. Qaşo wî jî dixwest bi vê taktîkê ji her derdorê, her malbatê kesekê bi xwe ve girê bide, wî binepixîne û xwedî bike, paşê jî li dijî me bikar bîne. Dijmin jî binesaziya Kurdistanê ya şênber baş tehlîl dike û ji bo feraseta me ya yekbûnê xirab bike, endamên xirabkar dixist nava her malbatê. Ev jî bi rêbaza yan ji derve de kesek dixist nav malbatê, yan jî endamek ji malbatê digirt cem xwe û wisa dikir. Di encama ev endam bi xwe ve girê didan, li ser malbatê gelek nexweşî ava dikir. Jixwe sazî di nava bûhranê de ye. Derfetên şoreşê jî kêm bûn, derfetên şoreşa dijber zêde bûn. Her wiha jixwe jin jî ketî û xilas bûye. Zilam jî bi zorê debara jiyana xwe dike û kar dike. Encam; rewşek nikare ji bin rabe derdikeve holê.

Nexwe em ê bizanin, ev bûyer ne bûyerek hêsane. Gelek qadroyên me bi hêcetên cur be cur ve gotin; "Ez nikarim rakim, ez çûm min dît, birçî mam lewma çûm, xwedî li malbata xwe derketim" hwd, ji ber çanda malbatê pir bi hêze, di qonaxên herî girîng de radestî nirxên paşverû bûn. Bêguman rizgar nabe yan jî nikare rizgar bike. Berovajî gelek tiştan winda dike. Lê camêr dilsoze, hest heye, girêdan heye û feraseta wî ya namûsê ya di vê mijarê de jî wisa ye. Heta ev rewş li hinek herêman pir xeternak pêş dikeve. Endam heta şaneyên xwe yên biçûk ketiye nava têkîliyên teng û ketî. Dîsa jî ji bo malbat wî ji me qut bike, her cure xeteriyê berçav digire û tişta dibe jî li partiyê dibe. Em bi giştî li ser van mijaran serwextin.

Ev mijara ku me hewl da di nirxandinên beriya niha de vekin, hêjî girînge. Weke gelek caran hatî gotin, di şoreşê de

gundek jî qele ye, kargehek jî qeleyeke. Li cem me hinekê jî malbat wisa ye. Fetihkirina van, bidestxistina gundekê ye. Kargehek weke avakirina baregehekê ye. Nêzîkbûna ji saziyek ku xwedî xisletek wisa ye re, divê rast be, helwestên hem hişk hem jî dîlgirtî nebin. Ger em bizanin hostatî nêz bibin, ti malbatek ku em qezenc nekin nîne. Em dikarên girêdanên malbat, êl û binemalan veguherînin girêdanên xizmeta şoreşê. Em vê şêwaza rêxistinbûnê nahilbijêrin, lê ger em weke destpêk girîngiya vê saziya ku di rewşa rêxistinek xwezayî de ye baldar nêz bibin, bi şoreşê ve girê bidin, dê êdî ev sazî ne ji dijmin re ji te re kar bike. Di hemû binesaziya civakî ya Kurdistanê de bandorên vê saziyê pir zelal û dijwarin. Lewma em çiqasî bikarin vê malbatê bi xwe ve girê bidin, em ê ewqas jî rêxistinê pêş bixin. Ger dema hûn pêwendiyê bi malbatekê re pêş dixin, yekser pey wê re pêwendiya çend malbatên din jî pêş dikevin, wê demê nirx bidinê, polîtîk nêz bibin, hewce kir tawîzan jî bidin. Ji ber ku beşdarbûna yek kesî ji refên partiyê re, dibe ku bê wateya beşdarbûna gundekê jî. Lewma divê em wan endamên ku beşdar bûne pêş bixin, cardin bişînin rêxistinbûna hemû gund û wê qadê saz bikin. Mirov pir hêsan dikare van rêbazan pêş bixe. Dibe ku pêdiviyên malbat, derdor û binemalên wisa karbidest hebin. Elbet tiştên ku ew jî dixwazin bidin partî hene. Erka we jî ev hemû bi rasteqînî nirxandin û derfet ji şoreşê vekirine. Qet nebê beşdarbûna hezar ciwanî ji refên me re, divê gundan ji şoreşê re veke. Jixwe otorîteya partiyê mezine û amadene ku endamên nû bidin partiyê, derdorên malbatê ji partiyê re vekin. Ev rewş hêj niha ve di astek bilind de pêş ketiye. Bingeha girseyek evqasî beşdarî şoreşê bûne, di ti şoreşên din de nehatiye dîtin. Di civaka me de heta dawî rewşek kamil û destdayî hatiye avakirin. Mirov dikare bêje ji her malbatê, her derdorê, endamek beşdarî refên me bûye yan jî şehîdên me hene. Ev destkeftiyên mezinin. Di van mijaran de girêdanên li cem me pêş dikevin demdirêjin. Wisa hêsan nayên

jibîrkirin. Malbatek ku şehîdek xwe heyî, bi salan li pey vê dozê dimeşe. Malbatek ku azweriyek xwe hebe, vê dike meseleyek bingehîn a malbatê. Bes em bikarin van birêxistin bikin. Dema em di van mijaran de erkên xwe baş pêk nayînin, bê polîtîka nêz dibin, nikarin li gelek pêwendiyên amade xwedî derbikevin, dijmin jî vê bikar tîne û tê zanîn çi belayan tîne serê me.

Nexwe em, di xebatên xwe yên şoreşgerî de nêzîkbûna ji malê re anîna rewşa karbidestî, ji şaşiyan paqijkirin, di rêxistinbûnê de bi baldar nêzî xweseriyê bûnê de, hewce bike polîtîkaya tawîzê, hewce bike otorîteya siyasî dana axaftinê de, êdî em di wê qonaxê de ne ku dikarin vê saziya kamilbûyî ji bingeh ve bi partiyê ve girê bidin. Ev rewş qadek wisa ye divê di xebatên me yên eniyê de neyê paşguhkirin. Dema rêxistinbûna girseyê tê paşguhkirin, gerîla nikare rojekê jî li çiyan bijî. Dijmin jî vê baş dizane. Îro gurubên me yên li ser piyane, li cihên pêwendiyên ku girse û malbatê pêş xistine. Lewra di hemû xebatên me de ji hêla girse, veşartina pêşengan û parastina yekîneyên gerîla ve di asta jiyanî de girînge. Lê belê ji bo ev hewce ye, vê carê jî nabe ku mirov nanxurê malbatê be, divê malbat eşkere nebe û ya girîng jî zêde têkil vî karî neke. Di vê mijarê de hesasiyetek zêde tê xwestin.

Partî nêzîkbûnek zanistî ji saziya malbatê re dike. Em dixwazin şaşî û nebesiyên heyî derbas bikin. Me 15 salin di heman demê de ji bo tasfiyekirina bandorên neyênî yên vê malbatê têkoşa. Têkoşîna qadroyên PKK'ê, di heman demê de li dijî xisletên paşverû yên vê saziyê, darezînên nirx û ferzkirinên wê îsyaneke. Qet nebê li hember vê saziya ku bi qasî feodalîzmê, faşîzmê û mêtîngeriyê zerar dike, darezên nirxê wê yên dervî serdemê û feraseta namûsê ya sexte em serhildanekin. Di vê serhildanê de hewldanên mezin hatine raberkirin û ev hewldan jî ber bi serkeftinê ve diçe. Ango têkoşîn hinekê encam dide. Ji ber ku li şûna çanda malbat û pîroziya malbatê, welatparêzî û azadî

pêş dikeve. Her malbat dibêje; "Ger em dixwazin zaroyan xwedî bikin, dê ji bo welat û azadiyê be. Qet nebê bila ji malbata me kesek beşdarî vê xebatê bibe." Ev ne pêşketinek wisa hêsane.

Hûn wer dizanin ku hêsan beşdarî refên têkoşînê bûne. Lê min di pratîka xwe de yek ji têkoşînên herî mezin jî li dijî vê saziyê meşandiye. Hem li dijî malbata xwe, hem jî ji bo hevalan ji bin bandora vê saziyê rizgar bikim min gelek hewl da. Dema em rewşa gelek ji we lêbikolin û derbixin holê, hûn ê bibînin ku, partiyê keda herî mezin di vê mijarê de daye. Lê mixabin hêjî gelek pêwendiyên malbatê yên paşverû we şûnve dikişînin û dixwaze bide aliyekê hene. Hêjî em bi sererastkirina wan û şikandina hinek wan re jî mijûl dibin. Tika dikim em di vê mijarê de jî xwedî li erkên xwe derbikevin. Ev ne tenê erka Rêbertiya Partiyê ye. Bandorek Rêbertiya Partî li ser malbatan heye, malbat pê bawer dikin û ji ber ku jê bawerin destûr didin hûn serbest tevlî xebatan bibin. Rêbertiyek pê bawerî, tê wateya sazîbûna partiyek têkûz. Kesên beşdarî PKK'ê dibin berz dibin, dibin leheng, her çendî şehîd jî bibin, tê gotin ku di xêra nirxên saxlem de ye. Ev feraseta hest û fedekariya di nava malbatên me de pêş dikeve, bi serê xwe bûyerek şoreşî ye. Me ev jî bi hostatî û berxwedaniyek salan ve saz kir. Wê demê em ê vê pêşketina ku partî saz kiriye esas bigirin û weke destkeftiyek hemû xebatên xwe bibînin. Em di wê zanebûnê de bin em îro dikarin pir hêsan malbatan bidest bixin û wisa berheman berhev bikin. Em ê malbatê bikin dergehek saxlem a şoreşê. Ango em ê berhema kedên salan ên tine nabe û xilas nabe, niha kom bikin.

Weke ku gelek heval dizanin, pêşketina di derbarê vê mijarê de jixweber çênebûye. Ji bo em yek pêwendiyê ava bikin gelek hewldan hatine dayîn. Lewma hûn niha dikarin pir hêsan biçin her malê, li ser her mêzeyê rûnin û fermanan didin. Bila kes nehizire ev hemû bi mezinbûn û otorîteya xwe ve saz kiriye. Dê ev bibe xwe xapandinek pir cidî ya polîtîk. Di vê mijarê de

nezanîna nirx, misoger nepîvandina hêza cewherî ye. Ji ber dê ew jî di vê rewşê de pir hêsan bikar bînin, girîngiyê nedin destkeftiyan û gelek nirxan binpê bikin. Bi ti şêwazî ev nayê pejirandin. Lê mixabin di vê mijarê de xwe xapandinên cidî tên jiyîn. Baldarbûnek li hember pêwendiyek ku dikarin pey wê re sed pêwendiyan pêş bixin raber nakin. Tawîzek biçûk, pêşwazîkirina pêdiviyek biçûk -jixwe êdî di roja me de ev jî hêsanin- dema bên kirin dê gelek derfetên rêxistinî ava bike, qet berê xwe jî nadin wan. Heta ji bo ji me dûr bixin çi hewce dike em wê dikin. Ev jî helwestek pir şaşe û divê dev jê bê berdan. Em dikarin gelek tawîzan bidin. Mînak, ger feqîre bila hinek pere bê dayîn, pêdivî bi eleqederî heye, eleqeder bin. Ger di bin barek giran de ye, barê wî hinekê sivik bikin. Ger hûn silavekê bidin, ew jî ji bo wî kêfxweşiyek mezine. Dê ji van tevan re bersivek erênî bê dayîn. Jixwe ji şoreşê re vekirîne. Ji nava wan endamekê bi hostanî bigrin bikişînin, bi pişgiriya endamek din re xebat dana meşandin, dê bi hêsanî hemûyan bide bidestxistin. Ev jî ji bo şoreşê pêwendiyek jiyanî ye. Vêca tişta diyar dibe hûn heta niha di vê mijarê de şiyar nêz nebûne, lê teqez qadek wisa ye divê girîngiyek mezin jê re bê dayîn.

Me pêwendî hinekê vekirin. Me diyar kir ev pêwendî di nava xebatên me de çiqas girîngin. Li cem me ya herî hêsan pêş dikeve, di asta herî jor de jî encam bigire, pêwendiya ku bi malbatan re bê sazkirine. Li cem me pêwendiyek ne bi yek kesî re, bi malbatê re tê sazkirin. Ango pêwendiya ku hûn bi endamek malbatê re pêş bixin, hemû malbatê digire nava xwe. Ji ber girêdanên malbatan jî bi hevdu re heye. Hemû jî li hevdu dinêrin. Dema ji malbatekê endamek tê, yê din jî li wî dinêre û wisa tevdigere. Ev pêşbaziyeke destpê dike. Hew we dît ev pêşbazî li herêmekê sax pêş ketiye û tevlî xwe kiriye. Li holê ye ku ev çiqasî girînge. Wê demê em ê ji yek endamê re jî nebêjin pîre, jine, ciwane, paşverû ye, nabe milîtan. Em ê bi van nirxandinan

nêz nebin. Em nikarin nirx nedin wan. Di nava malbatê de mezin-biçûk an jî baş û xirab tine ye. Bes tu yekê qezenc bike, dê pey wê re hêsan be. Lê mixabin endamên me yên ji her hêlê ve teng, nezan û hişk dijîn, di vê mijarê de dibin sedem ku kedên me vale biçin. Elbet dema paşê jî tecrît bûn, xwe tine kirin. Vê jî gelek zerar da. Encama esasî ya divê em jê derbixin, êdî em vê saziya ku heta dawî kamil bûye, dema nêzîkbûnek rast bê raberkirin dê veguhere çavkaniya hêzek mezin û em dikin saziyek bingehîn a şoreşê. Em di vê mijarê de her cure fedekariyê dikin. Dema hewce kir em otorîteya xwe bikar tînin. Jixwe îro otorîteya partî pir mezine. Em di wê rewşê de ne her malbat nirx dide me. Lewma em di wê qonaxê de ne her kes baldar nêzî me dibe û ji vê hêlê ve jî ti fikara wan tine ye. Em ê vê jî pir baş bikar bînin, kêmasiya di vê mijarê de heyî derbas bikin, heta dawî li pêşiya girsebûna partiyê vekin. Ev jî tê wateya pêkhatina serkeftina şoreşê ya mercên pir girîng.

### *Li Dijî Tîpên kevin Jin û Zilamê Nû*

Gelo divê em di refên partiyê de nêzîkbûnek çawa ji vê pirsgirêkê re bikin? Ango pêwîste rewşa azadiya di pêwendiyên jin û zilam de çawa bên nirxandin? Me dem bi dem ev mijar vekir. Lê hêjî di vê mijarê de bostekê gav nehatiye avêtin. Her çendî di refên me yên partî de di vê mijarê de hinek pîvanên feodal hatibin derbaskirin jî, nebesî, ferdperestî û nêzîkbûnên dervî şoreşê yên di pêwendiyan de zêde ye. Helwestên weke ferdperestî, bêxemiya zêde, kompleks û çavnebarî pîvanên burjuvaziya biçûkin. Dema mirov hinekê lêdikole, dê mirov bibîne ev lewaziya di civakbûnê de ye û hêjî di nava me de xwe dide berdewamkirin. Her cure nêzbûn û dijberiya di vê mijarê de ji ber berdewamiya şanaziya feodalî û bandorek girîng a biyanîbûnê ye.

Dibe ku hinek bêjin hêj li welatê sosyalîst ev pirsgirêk nehatiye çareserkirin, em ê çawa çareser bikin? Elbet gelek pirsgirêkên ku li welatên kapîtalîst û li welatên sosyalîst li benda çareseriyê hene. Lê asta wan pir li pêşe. Me bingeha civakî ya li cem me vekir. Ez di biçûktiya xwe de herî zêde ji vê têkîliyê bizdam. Ji têkîliya heyî her tim reviyam, ew pir kêm dît û nefret weke hestek nekarî xwe jê xilas bikim xwe ferz kir. Me dizaniya ku em nikarin di vê têkîliyê de pêşketina civakî saz bikin. Dîsa min didît ku yên di heman temenê min de herî zêde jî di vê têkîliyê de winda dikin û pir hêsan di bin bandorên kevneşopiyan de diman. Li hember vê rewşa wan, ez jî bi qasî ji destê min dihat ji vê têkîliyê direviyam, weke ku bîreke em ê bikevin binê wê şiyar nêz dibûm, ji bo nekevim rewşa yên jiyîne, min her tim pêdiviya ber bi ya pêşveçûnê ve didît. Her tişt jî ev pir vekirî dida diyarkirin.

Sedema bingehîn a windakirina gelek jin û zilam, ji ber di bin bandora giran a kevneşopiyê de ne. Min pir baş dizaniya ku, ev ciwan bi vîna xwe ya azad ve nêzî vê saziyê nabin. Misoger ji bo her kesî wisa dikir, wan jî wisa dikir. Hêjî wisa ye. Kêmasiya di vir de nelêkolînkirina vê rewşa dijberî azadiyê ye. Berovajî vê bi feraseta; “Xizmên min, cîranên min çi dikin, ez jî neçarim wisa bikim” tevdigerin. Di nava civaka me de ger keçek weke hem temenê xwe nezewice dê bêje; “Ez di malê de mam.” Ger zilam be dê bêje; “Zilamtiya min ji dest çû.” Hest û fikrek wisa fosîl bûye, bûhranê dijî, tê çewsandin, paşê jî kevneşopî bi “hewara” wî ve tê û camêrê me jî diqede! Hêj ciwanê me ciwantiya xwe ne jiyayîn di bin van ferman û fermandariyên kevneşopiyê de tine dibin. Belê paşverûtî jî pey vê re pêş dikeve. Di plansaziya madî de sazkirin û pêşxistina malbatê, bi serê xwe pêdivî bi temenê heye. Jixwe hest serûbin bûne. Ji bo rewşa heyî jî rizgar bike, her tiştê xwe dide. Wê demê jî her ku dikeve tam dikeve. Lewra di vê jiyanê de ti tawîzên ku nede namîne. Pêwîstiya hizirandinek rast nabîne. Jixwe dor nayê avakirina saziyên siyasî. Ji ber rewşa bi temamî lê dinêre rizgarkirina malbatê ye. Zilamê herî ji xwe razî, kesê ku dikare tiştekê bide malbatê ye! Ev rewş ji sedî not û neh bi ciwanên me re tê jiyîn. Ez jî baş ketim ferqa vê ji ber ku baş ferq kir, dema min partî pêş xist, ji bo endamên me ji zerarên rû bidin rizgar bikim heta dawî bi sazûmanî û hostatî tevgeriyam. Belê neçar man gelek fedekariyan bikin. Bes ne gengaz bû bi şêweyek din azadî nedihat rizgarkirin.

Ji ber ku dijmin jî vê dizane rêyên rizgarî yên erzan ferz dike û dibêje; “Keç û xortên xwe zû bizewicînin.” Di dem ên dawî de vê ferasetê zêdetir ferz dike. Ji ber ku dixwaze enerjiya wan wisa biqedîne, di nava saziyek wisa paşverû de bîne rewşek wisa nekare henase bistîne. Wê di encamê de jî endamek şoreşger a saxlem nemîne! Pêngavên di vê mijarê de pêş ketine bi rastî jî ne kêmin. Li herêmên weke Mêrdîn û Amed’ê ku hêj paşketî ne,

ev vekirîtir tê jiyîn. Hêj di temenê 11 salî de –hêj temenê 15 derbas nekirî- hemû keç û xort dergistî yan jî sozdarin. Ev jî bûye rewşek asayî. Hêj ne gihiştî temenê xwe yê 15, li nêvengek ku bingeha sazkirina malbatê jî lê nîne ve wan girê didin, vêca em ê van ciwanan çawa bikin şoreşger? Astengiyek mezine! Me ji ber vê nîvê kesên ku di nava xebatê de ne winda kirin. Nexwe ev mijar, di nava refên partiyê de jî pir girînge. Hûn xwe di gihandina pêwendiya azad de wêrek nêz nabin û afirîner nabin. Lewma tişta serwer jî dibe darezên nirxên feodalî. Dema şoreşgerek di nava partiyê de heta dawî bê pîvanî, hest û reftarên bê teşe hêjayî xwe bibîne, teqez dê winda bike û bi partî jî bide windakirin.

Meseleya azadiya jinê, bi gelemperî pîvana azadiya civakê ye. Dîsa di nava partiyê de pîvana milîtanbûnê ye. Di vê mijarê de hinek pratîkên me hene. Mînak, dema pratîka gurubek jin bê lêkolînkirin, baş tê zanîn ku em çiqasî tengav kirine. Em dibêjin vê qadê bi pêwendiyên saxlem û mînak ve dagirin, pêşengiyek rast bikin, ew jî pey me re tirba me dikolin, ango her yek dibe xwediyê ferasetên partî şûnve dikişîne, partî dikin dîlê kêfkariyên xwe, her yek ji wan bi serê xwe dibin çavkaniya muhafezekariyê. Bi rastî jî rewşên herî xirab derketin holê. Çima? Ev jî ji ber pêwendî bi şoreşgerî pêş nexistine. Ev rewş ne tenê ji bo jinan, her wiha ji bo zilaman jî derbas dibe. Di nêrînên zilaman jî yên di vê mijarê de gelek kêmasî hene. Ji ber nikare hestê zilamtiya serdest a girêdayî zext û zorê pêş dikeve li ser xwe bavêje, bi derfetên ku ew ava dikin ve tevdigere. Hinek lewaziyên jinê jî yên mîna van hene. Di vê mijarê de kompleks, biyanîbûn, her cure bêpîvanî jiyîn, ne civakbûn û ne azadbûn pir zêde derdikeve holê. Di encamê de tiştên derdikevin: Bêçaretî, di pêwendiyan de rehet netevgerkirin, nexweşî, çavnebarî û kêfkarî ye! Ev jî di nava rêxistinê de rê ji xirabûn û bêrêxistiniyê re

vedike. Bi rastî jî rê ji hinek revan re vedike. Dibe sedem ku heta biçe cem dijmin. Her yek bi serê xwe dibe darbeyek mezin.

Me beriya niha hinek ferasetên çewt ên li ser hatîn ferzkirin vekiribûn. Me diyar kir ku ferasetên çewt, ji ber azadî bi şêweyek azadiya burjuvaziya biçûk tê destgirtin çavkaniya xwe digire. Di vê mijarê de nexasim tişta ku divê mirov li ser raweste, feraseta azadiya jinê ya li Tirkiyê tê pêşxistine. Kemalîzmê jin weke hebûnek hêmin û kedîkirî kiriye jînwarek pir baş a koletiyê. 12'ê Îlonê jî ev hîn zêdetir kêrhatî bikar anî. Faşîzm taybet li ser jinê radiweste, dibêje; "Binêrin dê zarokên we ji ber terorê biçin!", "Wê bê îstîkrarî û anarşîzm we tine bike!" û bi vî rengî xîtabî hestên jinê yên jixwe hestiyar dike û wan dike piştawanên faşîzmê. Ji ciwanan re jî dibêjin; "Xwe bidin jiyankirin!" Emperyalîzm çanda xwe ya xirab jî li nav Tirkiyê belav dike û serwer dike. Ciwanên ku di vê mijarê de heta dawî hestiyarin, her ku pêwendiyên şaş pêş dixin, di nav de kûr dibin. Encam jî pir ecêbe: Di radeyek mezin de ciwan ji şoreşê qut dibin! Ger îro jin û ciwan bûne sipartekek ANAP (Anavatan Partîsî) an jî rejîma 12'ê Îlonê rewşek cidî ye û ne jixwebere. Ji ber ku tişta ku rejîm herî zêde li ser radiweste û ji sedî heftî û pênc şênî hatine dagirkirin ev kesimin. Lewma nêzîkbûna ji pirsgirêka jinê re, di heman demê de li hember faşîzmê ev girse tevlî raperînê kirin mijarek pir girînge. Li hember faşîzmê azadiya jinê pêşxistin, yek ji erkên şoreşê yên bingehîne. Dîsa pêşî li xeyalên sexte yên ciwan jî di vê mijarê de dijîn girtin pir girînge.

Her çendî me xisletên 12'ê Îlonê yên pir dijwar têkil nava partî nekiribe jî, diyare dê gelek endamên me -jixwe dê siberojê pir berfireh beşdarî refên me bibin û ji welat jî werin- bi van nexweşiyan ve werin. 12'ê Îlonê bi jinê re xisletên zaroktî pêş xistiye. Ciwan jî zêde hestiyar, hêsan û biçûk kiriye. Hestê egîdî kuştiye. Li şûna vê xwe berdêla pereyan de firotin, bi çalekiyên biçûk têrkirin daye rûniştandin. Tişta ku ciwan îro li pey diçe

xebatên hunerê yên hêsanin. Di qada hunerê de tîpek weke Emrah hatiye avakirin, di werzîşê de dîn û harbûna pêş ketî hemû jî ji rê derxistinên zanebûn hatine pêşxistinin. Ji bo herikbûna ciwanan a ber bi şoreşê ve asteng bikin, bi hostane ev rêbazên dij-şoreş pêş xistin. Diyare ku em jî ji bo van ji nû ve bidest bixin, bi pîvanên şoreşgerî yên têkûz ve tevnagerin. Em ê bizanin ku di civakê de ji bo jinê serfirazî dema li dijî faşîzmê serbilindiyek çêbû pêk tê û ev jî rêgezek jiyanî ye. Ji bo ev rêgez di hemû pratîkan de serwer bibe, ew ber bi têkoşîna şoreşgerî ve kişandin, potansiyela jinê ya mezin li hember faşîzmê derxistin pir girînge. Îro di raperînên Filîstînê de mirov dikare bêje jin, zarok û ciwan bi keviran şoreşê dimeşînin. Hinek dersên ku ji vê bên girtin hene. Dema jin dar û ber radike, nexasim di serhildanan de dikare pir baş serkêşiyê bike. Dîsa dema zarok û ciwan dar û ber radikin, rê ji hêzek bêhempa re vedike. Îro pêdiviya me jî herî zêde bi pêşketinên wisa heye. Ji ber daku gerîlayên li çiyê venêrîne artêş hemû hêza xwe seferber dike. Dikare rêxistinokên veşartî kontrol bike, lê dîsa jî her zarok û ciwanên di serhildanê de dikarin dar an jî kevirekê peyda bikin. Dema jinên ku nîvê civakê zêdetirin dadikevin kolanan, ne gengaze ku polîs wan kontrol bike. Her wiha ne gengaze ku hemûyan tine bikin û ji holê rakin. Qutreta ti hêzî ya hêza girseyekê bi temamî tine bike nîne. Ji ber vê divê em vê girseyê, nexasim ji bo pêşxistina tevgera bajaran teqez di qonaxa pêşiya me de bixin tevgerê. Pêwîste neyê gotin qadro çênabe. Misoger hêrsa hemûyan zêde ye. Hemû jî birçî û xizanin. Gengaze ku mirov wan bi her cure rêbazî beşdarî serhildanan bike. Em ji nirxandinek propagandevanên hêsan bigirin heta xwepêşandanên kolanan, ji bo nan çalekî, bikarin êrîşî xwaringeh û dikanên zad bikin –bila zarok jî wisa bikin-, dema hemû bi hev re bikin ne gengaze ku polîs wan bişopîne û ji bo vê rêxistinbûnek mezin jî hewce nake. Wê demê, em ê bi ser vê qadaku xwe

potansiyelek pêşketinê ya girînge de biçin, vêderê binirxînin û faşîzmê jî ji vê bingehê mehrûm bihêlin.

Diyare em ê di nava xwe de mijara azadiyê hîn zêdetir nêzî çareseriyê bikin. Bi rastî jî hewce dike mirov di pêwendiyên jin û zilam de azad be. Bes di pêwendiyên we de ji hedê xwe zêdetir hestewarî, feodalîzm û burjuvaziya biçûk heye. Di vê mijarê de reftar û fikrek zêde azad tine ye. Pêwendî lewazin. Ne pêwendiyek ji xwe bawer, azadiyê esas digire û birêgeze. Berovajî rêgeza ku pêwîste li ser van pêwendiyan serwer be, her tim tê paşguhkirin. Pêwendî durû û carina jî bi azweriyên ji serdema navîn mane ve dimeşin, ferdperest û ji rêzdarî dûrin. Hestên heyî, ne hestên perwerdekirî ne. Di vê mijarê de pêdivî bi şoreşgerbûna beramberî hev heye û bi rastî jî ev peywirek girîng a şoreşgerî ye. Di vê mijarê de pêşxistina xeyalên taybet zêde xizmetê ji pêşketinan re nake. Dê înkarvanî jî zêde berhemekê nede û ev weke rêya çareseriyê jî nayê dîtin.

Di partiyê de derfeta şoreşgerkirina pêwendiyan bilinde. Elbet em ê di vê mijarê de li dijî têkîliyên bê wate, ne di cîh de, heta dawî ser hişê xwe çûye, zêde bêhna xortanî jê tê û rêgeza partî, hewldana partî ya ji bo azadkirina kes datîne aliyekê derbikevin. Ji ber ku ev deriyan venakin û kesayet pêş naxin. Nexasim divê tevkariya pêwendiyan a ji azadiyê re bê dîtin. Dema di refên me de keçek nêzî zilamekê dibe, yan jî zilamek nêzî keçekê dibe, yeqîn nakim bi armancên şoreşgerî yên bihêz nêz dibe û di vê mijarê de bi rêgez tevbigerin. Ji ber ku ne wisa ye gelek lewazî tên jiyîn. Bes di rastiyê de jî şoreşger, di vê mijarê de şoreşgere. Azadîxwaz, di vê mijarê de azadîxwaze. Divê nêzîkbûna jinê ya ji azadiyê re bihêz be. Divê zilam jî xwe ji pêwendiya wekhev û azad re amade bike. Pêwîste alî di vê mijarê de fedekar û wêrek bin, ti qusurê nejîn. Di heman demê de hewce dike rêgezekê bişopînin. Li şûna rêgeza feodalî û burjuvaziya biçûk, pêwîste rêgeza şoreşgerî wekhev û azad ava bikin. Pêwîste

şûna pêwendiyek teng, ferdperest û hevdu weke mijara sermiyanê dinirxîne zêdetir, hevdu di şoreşê de bihêz dikin, bizanin girêdana ku ava dibe girêdanek şoreşgerî ye û nirxek mezin bidin hev. Weke ku şoreşa bê jin pêş nakeve, heta ku azadiya jinê saz nebe jî, bizanin civak û heta zilam jî azad nabe. Hewce dike bi vê zanebûnê ev pêwendî esas bê girtin.

Di vê mijarê de erkên ku divê di nava partiyê de werin pêkanîn hene. Me dem bi dem ev erk vekirin. Me hinek ferasetên têkîliyên şaş danîn holê, teşîr û tecrît kir. Diyare, em ê dema pêş van zêdetir pêş bixin. Ya girîng di vê mijarê de nêzîkbûnek perwerdekirinê raberkirin, dema hinek nêzîkbûnên şaş derketin holê, bê ku durûtiyê bikin, xwe bispêrin lewaziyan, wêrektiyek ku bikare çareseriya şoreşgeriyek rast raber bikin. Divê bê zanîn ev mijar, mijarek girîng a perwerde û têkoşînê ye. Lewra bê ku aciz bibe û şerim bike, pêwîste çareseriyên şoreşgerî yên rast esas bên girtin û wisa bi ser de biçin. Pêdiviya jinê bi egîdî û şoreşgerbûnê heye. Pêdiviya zilam jî bi qalibek nû û pêşxistinê heye. Bi pêşdarez ên kevin ve pêwendiyên nû nayên pêşxistin û dê nerehetî jî berdewam bike. Ev jî nabe xisleta şoreşgerekî û şêwaza jiyanê.

Nehizirin ku dê yek ji we bikare di refên me de pêwendiyên wisa hêsan pêş bixe. Hûn qet nikarin pêwendiyek jin û zilam a hêsan saz bikin. Ji bo vê hewceyî hewldanek pir mezin heye. Di civakê de jî dema zewacên feodalî yan jî burjuvaziya biçûk tên pêşxistin, li ser bingeha bihêzkirina malbatê tên kirin û ev jî bi mesrefên pir mezin ve tên çêkirin. Di şoreşê de pêwendî, berî her tiştî bi têkoşîna azadiyek pir mezin ve çêdibin. Ji bo milîtan xwe azad bike, bi hewldanek mezin neçare ku xwe xurt bike. Kesê hewldana wî nebe, pêwendiya wî jî çênabe. Pêwendiyên ku di xêra wan de şer neyê meşandin, ne pêwendiyên rêzbar û hêja ne. Bi hêza derfet û rayeya ku partî daye ve xwe li ser pêwendiyên amade dana jiyîn, bi erênî nayê pêşwazîkirin.

Dîsa ger te têkîliyek dervî partî pêş xistibe, elbet dê berdêla vê jî hebe. Ango dê partî hesaba vê jî bipirse. Asta pêwendiya partî, asta pêwendiya şere. Partî hemû pêwendiyan bi zanebûna şer ve pêş dixe. Dê her kes vê bibîne û bi vî şêweyî nêzî vê pêwendiyê bibe. Bi nêzîkbûna; "Jixwe xwedî berpirsyarim, nizanim jêhatî me" ve xemsar nêzî van pêwendiya bûyîn suce. Wê di encamê de kesayet tine bike. Jixwe diyare pêwendî, pêwendiyên têkoşînek mezinin, lewra gelek karên ku divê jin û zilam di vê mijarê de bikin hene.

Gelo hêj we di vê mijarê de gava pêşî ne avêtî hûn dikarin behsa kîjan pêwendiya rast, rêzbar û hezkirinê bikin? Hêj we hevdu nas nekirî, gelek pêşdarezîn heyî û biyanîbûna heyî derbas nekirî kî dikare bêje min pêwendiyek, zewacek û sozdariyek jin û zilam a rast, azad û wekhev pêk aniye? Gelek têkoşînên ku pêwîste bên meşandin hene. Divê ev exlaq esas bê girtin. Zehmete, lê ti rêyek din a avakirina ya nû nîne. Pêwendiyên hêsan, di rejîma 12'ê Îlonê de heye, rêxistinên tasfiyekar de heye û feodal dikarin pêwendiyên hêsan pêş bixin. Gengaze ku jina kole, hem jî bi sedan bê dîtin. Bes dema şoreşgerek tevlî têkîliya koleyekê bû yan jî di vê mijarê de ya hêsan hilbijart, wî di asta herî bilind de nirxên xwe binpê kiriye. Lewma mirov ti caran a hêsan nahilbijêre. Di vê mijarê de pêwîste her pêwendî ji serî heta dawî bi hewldanek mezin ve bê pêşxistin. Ne gengaze ku bi pêşdarez ên kevin, xwe sipartina şêweyan û înkarkirinê ve ev pirsgirêk bê çareserkirin.

Pirsgirêk bi rastî jî pirsgirêka şoreşekê ye. Dema di refên partî de têkîliyên jin û zilam dibin mijara gotinê ne tenê ji bo xwepêşandanê tê kirin, ji bo pêşwazîkirina pêdiviyek pir cidî ya şoreşê tê kirin. Dema ev jin beşdarî refên me bûn, ger bêje; "Ez ji xelekên xwe yên koletiyê qut bûm, li vir çi bixwazim dikarim bikim", wê dawiya xwe bîne. Ger zilamek bêje; "Gelek jinên ku dikarim daxwazên xwe pê bidim kirin li vir hene, jixwe civak jî di

bin emrê me de ye”, xwe ber bi vê ve berda, tê wateya ku ew feodalîzmê disepîne û ev jî suce.

Dê nêzîkbûnek erka azadkirinê ya mezin û rêzdarî ji jinê re bê raberkirin. Ji ber ku lewaze divê bê azadkirin. Nêzîkbûnek ku vê berçav negire, dê bêhna koletiyê jê were û feraseta desteserkirina sermiyanê bêhn bide. Kesek wisa jî nabe parçeyek partî, dê bikeve rewşa kesek pir cuda de. Elbet dê ev jî partî mijûl bike, pirsgirêka derbixe. Rê ji pevçûnan re veke. Mînakên di vê mijarê de ne kêmin. Bi kurtasî xala ku em dixwazin di vê mijarê de diyar bikin, hewce dike nêzîkbûn şoreşgerî bin. Pêwendiyên rêhevaltî bi têkoşînek mezin re derbas dibin, pêwîste nêzîkbûn li ser bingeha rêgezên partî bin, hêjî gavên pêwîste bên avêtin hene, di refên partiyê de avakirina jina azad ne hêsane, di vê mijarê de ji ferasetên zilamê serwer, qudret û hêzdar bigirin heta, gelek nêzîkbûnên hestewar, xav, kamil nebûyî yên rewşa ruhî diyar dikin, hemû jî şoreşgerî bibin. Em nikarin van paşguh bikin. Ev karê têkoşînê ye. Pêwîste di vê mijarê de ne hest, hiş bişixule, her tim li ser pêwendiyan bê rawestîn. Bi gelemperî em dixwazin malbatê çawa bi şoreşger bikin, weke kes jin jî beşdarî şoreşê kirin ewqasî bûyerek mezine. Ev kar tenê bi rastiyên giştî ve nayê çareserkirin. Bi hêrs û ji hêla hêzdaran ve bi çewsandina bindestan jî çareser nabe. Me di ezmûnên xwe de jî di derbarê vê mijarê de gelek xebat derxistin holê. Hewce dike em weke rêxistinek azadiyê xwe binirxînin. Xala em çiqas milîtanek azadin, girêdayî asta pêşxistina vê pêwendiyê ye. Divê em di pîvanên partiyê de israr bikin. Bila kêm be, lê cewherî be. Elbet ev jî girêdayî pakbûna têkoşîna me ya şoreşgerî ye. Dê ev pakbûn jî ber bi çareseriyek radîqal ve bibe, jixwe ya em vebijêrin jî dê ev be.

Di vê mijarê de ya girîng, nêzîkbûna bingehîn bi serkeftî di pirsgirêkên şênber de pêkanîne. Nexasim hewce dike her milîtanek partiya me xwe di vê mijarê de berçavan re derbas bike,

xwe dahûrîne û bizane nêzîkbûnek şoreşgerî di pêwendiyan de raber bike. Di asta rêgez ên giştî de dahûrandin hatine çêkirin. Ev jî bi şêweyek afirîner pêkanîna peywira milîtane. Ez gelek caran li ser rola jin a di şoreşa Kurdistanê de axivîm. Ji boem girêdayî pîvana ji jina kole avakirina jina şoreşger ve bimînin hatin kirin. Divê hema mirov nebêje jine û derbas neke. Jin kesîmek civakê ya civaka çînayetî û mêtîngeriya li ser me tê meşandin xwe hûrûkûr disepîne, herî zêde dimêtîne û li ser mirovan dilîzê ye. Bi rastiya jinê ve eleqederbûn, ji bo wê çareseriyek şoreşgerî derxistin, bi serê xwe dahûrandina civaka çînayetî ye û derbaskirina her cure ketîbûnê ye. Di vê mijarê de dersa bingehîn hatiye dayîn, ez ê ji nû ve venekim. Lê belê, bi qasî ez dibînim, di pêwendiyan de lewazî, bêpîvanî, ji kûrbûn, rêzdarî û heta hezkirinê dûr, nirx nade û di vê mijarê de bi pîvanên kevin jiyîn heye. Ev jî me aciz dikin, kesan mezin nake.

Dema me wêrektiya mijûlbûna vê xebatê raber kir, em dizanin bi çi ve mijûl dibin. Îro komek jin li cihekê civandin bûyerek girînge. Ger nêvengek wisa wan mezin bike nebe, dê yekser êrîşan re rûbirû bimînin. Lewazî û nezantiya jinê, dibe ku bibe sedem yekser ber bi serdestiya serdestekê ve biçe. Zilam jî ji ber feraseta sermayê, yekser li pey serdestiyê baz dide. Em tevgerek wisa ne, me li dijî van jî serî hildaye. Lê mixabin gelek endamên me van meylan di kesayeta xwe de didin jiyîn û dikevin rewşên zehmet de. Ez ê vekirî bêjim, dixwazin çi zewicî bin, çi dergistî bin, çi evîndar bin, çi înkarvan bin, hûn çi dibin bibin, ez li vir rêgezek pir girîng pêk tînim. Hewce bike ez ê hemû zewacan xirab bikim, ji nû ve saz bikim. Hewce bike em ê wan dilketinên we tevan darve bikin, girêdanên berz derbixin holê. Ev li Kurdistanê wisa ye. Em tevgerek wisa ne van hemûyan berçav digirin. Ez rola malbata xwe ya di tinebûna Kurdistanê de hem baş dizanim û hem jî li dijî vê baş têkoşînê didim. Lewra wateya vê saziyê di nava partiya me de, cihê wê di nava rizgariya netewî

de bi cewherî diyar dikin. Em ê ji xirabiyan paqij bikin, ji bo kargeriyek erênî derbixe holê tişta hewceye bikin.

Hûn jî dizanin, dema em feraseta partî ya di vê mijarê de dimeşînin, ez ji hedê xwe zêdetir ferasetên neyênî re rûbirû hatim. Lê dîsa jî têk neçûm, min çareseriyên sexte esas negirtin û hêjî wan napejirînim. Min nêzîkbûnek ku demokrasî û sosyalîzmê veder dike ne anî serê zimanê xwe jî. Ev rêgez tê sepandin. Xirabiyan di vê mijarê de nekarîn me xirab bikin. Berovajî hiştin ku em hîn zêdetir bi ser de biçin. Lewma di vê mijarê de şoreşgerbûna we pir girîng dibînim. Jin kole tê, lewaze, heta dawî negihiştiye û xetere. Li gorî xwe makanîzmayek parastinê pêş xistiye. Ango di xistina civakê de ketîbûna xwe bi hostanî bikar tîne. Dema em dikevin qonaxa rizgariya netewî de divê em baldar nêzî van xalan bibin. Di vir de şerimbûn nîne. Kesên beşdarî şoreşê dibin, ên parçekirina hemû pêwendiyên civakî yên kevin berçav digirine. Kesên nekarin vî dilê mezin raber bikin, nikarin bibin şoreşvanên mezin. Nêvengek nû, sazûmaniya pêwendiyên nû û feraseta namûsek nû hewce dike. Jixwe ev tiştek başe jî. Şoreş di her mijarê de hunera pêşxistina pêwendiyane. Hunera pêşxistina pêwendiyên xwecihî ne. Dibe ku berovajî hestên we jî be. Gelek bûyerên ji bo min jî berovajî hebûn. Ger hûn di şûna min de bûna, dê we hezaran kuştin kiriban. Lê me sebir nîşan da. Me hewlda cewherê bidest bixin, di vê mijarê de ya rast bisepînin ku heta em gihiştin vê qonaxê.

Sedema herî girîng ku gelek ji we hêjî şoreşgerî bi xwe re ava nekiriye, pêwendiyên ku hûn bi rastiya jinê re pêş dixine. Dema hûn hestan pêş dixin, hûn di pêwendiyan de dev ji pîvanên berxwedaniya bingehîn diberdin an jî pîvanên bingehîn ên sosyalîzmê datînin aliyekê. Gelek caran pêwendiyên ku koletiyê ava dikin pêş ketine. Divê hûn bizanin, pêwendiyek jinê ya ku hatiye amadekirin û we bidest xistî xefke. Dijmin jî pir baş bikar tîne. Zext û zora herî girîng û çavkaniya bikaranînê ev dere û xort

jî di vê mijarê de gelekî sivikin. Sedema ku em dixwazin di xebatên xwe yên partiyê de mînaka pêwendiyên wisa bidin jî yek jê ev e. Mijarek wisa ye bi qasî em mêtîngeriyê ve mijûl bûne, ewqas jî em ê bi vê mijarê re mijûl bibin.

Êdî li vir mesele ne meseleyek cînseltî ye. Bûye meseleyek ji ketîbûn û koletiyek mezin rizgarbûnê. Mesele ew e misoger mirovek dikare rabe ser xwe û bimeşe derxistina holê ye. Ev beriya her cure hewldanî ye. Dê çavkaniya hezkirina we jî ev be. Ger hevserê we jî be, ev ê her tim wisa be. Tu nikarî bêjî; "Ya min e, milkê min e." Dema te ev got tu tine bûyî. Êdî ji bote ne sosyalîzm dimîne, ne jî demokrasî. Her kes ji dayîka xwe hez dike, nirx dide xizmên xwe, ez jî didim, mesele ne ev e. Bi rastî jî min rêgezek pêk anî. Min esas girt ku pêwendî zerarê nedin şoreşê. Min li ser dê û bavê xwe jî ev ferz kir. Dema min ferz jî kir ketim nava rakêşanê û min ev rakêşan jî weke şoreş bi encam kir. Dê û bav hebûnên hêja ne. Lê me bi qasî çavên hev derbixin hevdu êşand. Ji ber şoreş hat esasgirtin. Min li ser pêwendiyên din weke vê jî ferz kirin. Hûn ê vê wisa bikin. Bi taybet jî we di van mijarên pêwendiyên girîng de çareserî pêş nexistine. Di vê mijarê de nêzîkbûnên xapînok hene.

Camêrê rêzdar nêzî jinê nebe, sosyalîst nabe. Camêrê nezane li hember jinê rêzdar be, nebe piştawanek wê ya şerê azadiyê, nikare di nava me de rizgariya netewî pêş bixe. Ev jî rêgezek me ya girînge. Zanyar vê dibêjin; "Pîvana azadbûna jinê, pîvana azadbûna civakê ye!" Ger em jî vê şênber di nava partiyê de pênase bikin, di nava partiyê de pîvana azadbûna jinê, pîvana azadbûna partiyê ye. Mirov hêjî şênber bike; pîvana sosyalîstbûna partî, di pêwendiyên jinê de pîvana serwerkirina sosyalîzmê ye. Dibe ku gelek hevalên xort di nêzîkbûnên xwe yên berê de jin tine hesibandine, weke paçekê, amûrek kefxweşiyê nirxandine. Gelo îro di çavên wî de jin çiye? Zilamê hêjî ferasetên kevin bi xwe re dijî, êdî ew tine bûye. Ne demokrasî û sosyalîzm, bi wî re

serfirazî jî nemaye. Ev pir girînge. Ji ber vê mijarê xalek herî girîng a perwerdeya qadro dibînim dibêjim. Divê mirov ruhê xwe li ser vî bingehî paqij bike. Ango ne ji ber ku hûn di vê mijarê de pir tengav bûne û lewazin, ji ber hewcedariya rêgezekê divê hûn vê bikin. Her çendî hûn xwedî jin bin, an jî bê jin, zewicî an jî nezewicî bin divê hûn vê bikin. Camêrê ku xwe li gorî vê rêgezê neguhere, dê hemû rêgez ên din bin pê bike. Pirsgirêk ne lewaziya aliyê berambere, ne jî bihêzbûna we ye. Pirsgirêk nesepandina rêgeza raste. Êdî di encamê de meseleyên dildariyan jî nikare tiştekê rizgar bike. Heta ku ev rêgeza pêşî ya sosyalîzmê û rizgariyê pêk neyê, di nava me de nêzîkbûnek rast ji civak û ji nîvê wê re jî nayê raberkirin.

Berî her tiştî hevalên me yên jin ên di nava partiya me de nikarin di nava xwe de rewşek rêzbar ava bikin. 7-8 salin li vê qadê gurup hene. Lê mixabin hewldanên çavnebarî û hevdu çewsandinê jî qet kêm nabin. Her wiha mirov serê wan jî jê bike dev ji vê bernadin. Wê demê divê mirov ji van bipirsê gelo derdê we çiye û hûn çi dixwazin? Li gorî tê zanîn mirovên ku gav ber bi azadbûnê ve davêjin pêdiviya wan bi hevdu heye û pêwîste li hember hevdu rêzdar bin. Herî dawî hinekan rexnedan da, qaşo ev jî kesên herî aqilmend bûn. Koma jinan li vir axivîn. Wan bi xwe got; “Çavkaniya avakirina nexweşî û çavnebariyê, em ji cira kesan bigirin heta her cure rêbazan sedema lewaziyên pir kûr tên jiyîne.” Elbet mirov nirxa ku hewce dike nade van mirovan. Ger dixwazin li hember xwe rêzdarî ava bikin, divê navenda partî ji xwe re hilbijêrin. Heta ku di nava xwe de rewşek serfiraz, rêzdar û heta dawî mirov li hember wan bi pîvan nêz bibe ava nekin, nikarin ji derve de vê hêvî bikin. Wê demê divê wan pêwendiyên di navbera xwe de bi şoreşgerî bikin. Misoger pêwîste şaşiyên berê derbas bikin, xalên ku di rexnedanan de hatine bilêvkirin serkeftî derbas bikin. Hewce dike hevalên xort jî helwesta rêgeza me ya partî bijîn. Ev mesele ne weke hûn dizanin meseleyek

xortanî yan jî keça ciwane. Ev mesele karek hostatiyê ye, karê pisporiyê ye û karê rêgezê ye. Ev nayê înkarkirin. Dema we pêwendî bi jinê re pêş xist, pêşî hûn ê bizanin hevaltiyê pê re bikin. Hûn nikarin weke mijarek mal û milk nêz bibin, hûn ê pêwendiya nûjen ser bixin. Hûn ê di mezinbûna jinê de xwedî rol bin. Bi qasî sosyalîstek vê bike sosyalîste, hûn ê jî vê bikin. Di vê mijarê de nexweşiyek heye, nerehetiyek heye, hûn ê bizanin vê derbas bikin. Em ê yeqîn bikin ku dê jin bikaribe li ser bingehên rast mezin bibe. Em ê yeqîn bikin ku dê jin egîdiyê pêş bixe û bibe hêmanek jiyana rasteqînî ya jiyanê ku jêveger nabe. Em ê di vê mijarê de jidil, durist û cidî bin. Pêwîste em jinê ji bûna mijara mal û milkê derbixin, bînin rewşa rêhevalek ku dev jênayê berdan. Em ê di vir de jî kamil bin. Em ê helwestek wisa ne evîndarî, di asta misoger de bikarin di jiyana bîrdozî, siyasî û rêxistinê de pê re pêwendiyên rêhevaltî pêş bixin de bin. Me di vê mijarê de pîvan dane, hişyar bin pîvanên girîngin. Di heman demê ev waneyek malbatê ye, mijara dersê ye. Em nikarin kesên ku di vê dersê de refê de mane bikin fermandar. Kesên ku di vê mijarê de di refê de mane, zehmete ku em di nava partiyê de jî bigirin. Ger rewş jî wisa be dibe ku dema pêş bi şêweyên cur be cur hinek ezmûn jî çêbin. Bi qasî hûn dizanin zêdetir pêdiviya me bi kesayetek têkûz heye.

Ez ezmûnên xwe vedibêjim. Xebatên min ên teorîk û pratîkî yên di vê mijarê de ez xurt kirime. Ez zêdetir nêzî rastiya jinê kirime. Niha hîn wêrektir nêz dibim û ev jî zêdetir rê ji rêxistinbûnê re vedike. Ev hewldana me jî hişt ku her tim gurubek jin li cem me bimîne. Dibe ku sibe artêşek be. Ev jî girêdayî têkûzbûna di rêgez û pratîkê de ye.

Pêwîste em di vê mijarê de ferasetên xwe yên pêşdarezîn û xwe mezindîtinê bişkînin. Bila jin jî kompleksa ketîbûnê bişkînin. Kompleksa ketîbûnê jî bi qasî komleksa xwe mezindîtinê xeternake. Ev mirov mezin nakin. Xortên me ji bo

ketîbûna xwe binixumînin -jixwe mêtîngeriyê çiqas xwestiye jinwarî pê re pêş xistiye- êşa vê ji jinê derdixe. Lê ne raste ku hêrsa em li hember mêtîngeriyê dijîn bi serê jinê de derbixin. Ger hinekê bi kûranî lêbikolin, dê derbikeve holê ku rewş wisa ye. Rêyek din a mezinbûnê jî, nêzîkbûnek rast ji vê rewşê re kirine. Hinek kes hene di vê mijarê de bi pêşdarez ên feodal ên cur be cur ve tevdigerin, heta kiryarên kuştinê jî pêk tînin. Hêjî civak ezaba vê dijî. Di nava we de jî kesên ku di vê mijarê de xwedî pêşdarezînên pir xurt hene. Jixwe pênc-deh keç û xortên hevdu dîtin jî revîn. Ev rezalet jî çavkaniya xwe ji vê rewşê digire. Yeqîn dikim hewce dike hûn di vê mijarê de jî nûbûnê bijîn. Divê nirxek bijare ji jinan re bê dayîn. Tevlî refên me bûne. Lewma hewce dike em bizanin ku, nikarin bi qasî me ewle beşdarî nêvengan bibin. Derfetên wan ên di wê mijarê de kêmin. Divê em zêdetir pişgiriyê bikin û rêzdariya xwe winda nekin. Nexasim divê em pratîka teng, pêşdarezîn û bi kompleks derbas bikin. Ev ji bo me hewce ye û dê me mezin bike.

Bi kurtasî, dixwazim bêjim ku pêwîste em li hember vê dersê baldar bin û çareseriya serkeftî li hemû qadên xebatê bisepînin. Em ê xwe ji durûtiya feodal û lîberalîzma burjuva sînornenas rizgar bikin, heta dawî afirînerê pêwendiyên wekhev, xwe bawer, bi hezkirin û rêzdarî barkirî bin û van jî derbasî nav civakê bikin.

***Hezîran 1988***

### *Heta Jin Ji Bin Bandorên Giran Ên Kevnar Rizgar Nebe Wê Azadî Û Wekhevî Jî Pêk Neyê*

Mijara rizgariya jinê, ji rizgariya gel zehmetir û hesastire. Lê rêyên çareseriya şoreşgerî jî ne qediyane.

Dikarim çavdêriya xwe ya di pratîkê de bi sê qonaxan xulase bikim. Hevalên ciwan –keç û xort- hêj kesayetên xwe nenasîn, sekna xwe ya civakî berçav negirtîn, nizanin çi dibe vê têkîliyê di şopa kevneşopiyan de dimeşînin û dixwazin çareser bikin. Ev nêzîkbûn di nava me de berfireh tê jiyîn. Hêj nebûye 15 salî, li ser bingehên paşverû û koletiyê, têkîliyên jin û zilam, hestên dergistî û zewacê tên pêşxistin. Ev xalên ku di pîvanên civaka burjuvaya kapîtalîzmê de ji mêj ve hatine derbaskirin, di civaka me de bi şêweya herî hov tê jiyîn. Elbet di vê rewşê de kesayet jî birîndar dibin, mirovên têkil van têkîliyan dibin gelek tiştan winda dikin.

Ji zaroktiya xwe ve xala ku herî zêde hesas bûm, ev têkîlî bûn. Şêweyên zewacê ji bo min ecêb bûn û min tiştek baş nedidît. Hin hevalên min bi kêfxweşiyek mezin digotin; “Me keç anî, keç da, mal ava kir.” Lê min lome ji wan dikir û dihizirîm ku hêza xwe vale bikar tînin. Dihesiyam ku hêj di temenê biçûk de di nava keftûleftê de bûn. Ya herî rasteqîn nêzîkbûna min bû.

Hêj kesayetan xwe nas nekirîn, zaroktiya xwe derbas nekirîn, diketin nav van têkîliyan. Ya rastî pêwîste em di vê mijarê de yên di civaka me de heftî salî jî weke zarok binirxînin. Ger wêjevanek baş hebûya, yeqîn dikim dê ev zarokên heftî salî baş derbixista holê. Ji ber hinde hêj destpêkê ve xwe bi têkîliyên civakî yên wisa paşverû ve girê dane, piştî heftî salî dixwaze keçek 15 salî re bizewice. Bûyerên wisa didin diyarkirin ku, hemû jî zarok mane, kesayetên pir çewt di kesayeta van de berdewam

dike. Ya rastî ev pirsgirêkek mezine. Jixwe di vê mijarê de sînora ketîbûnê nemaye.

Em herî zêde herêma Mêrdîn'ê rexne dikin. Ji ber li vir hêjî bandorên feodalî li pêşin lewma girînge mirov li ser raweste. Lê li qadên hişmendî û fêrbûnên jiyana kapîtalîst tê jiyîn de, ji vê rewşê ne cudatire. Ev qad, warên ku têkîliyên herî xirab lê tên jiyînin. Ji bo hinek beşdarî xebatên civakî û siyasî bibin ev rewş li van deran astengiyek mezin ava dike. Bandora paşverûtiyê, ango têkîliyên jin û zilam û malbat tenê li derdora malbatê xwe dide nîşan.

Divê hûn wêrek bin ku xwe di vê mijarê de ber çavan re derbas bikin. Beriya her tiştî ne loma ji vê bikin û ne jî weke meseleyek hestiyarî bigirin dest. Mesele, pêşketina kesayetî ye. Di refên partiyê de nêzî têkîliyên ku di bin bandorên giran ên kevneşopiyan de bûyîn, ne nêzîkbûnek bi şeref, serfirazî û baldarî ye. Wêrektiya di vir de tê behskirin, hêza esasgirtina pêwendiyên rast raberkirine. Hûn fêr bûne dibêjin; "Dayîka min ez zewicandim." Meseleyek ku mirov dikare azad çareser bike, kesek sosyalîst nêzîkbûnek wisa paşketî hêjayî xwe nabîne. Kesek sosyalîst bixwaze di bin bandorên giran ên kevneşopiyê de çareser bike, ne dikare xwedî li vîna xwe derbikeve, ne jî dikare di wateya burjuva de jî xwedî li vîna xwe derbikeve, jixwe qet nagihije feraseta azadiyê. Mesele ne tenê meseleyek me ya kesî ye. Em şoreşgerin, her kêlî di nava civakê de di tevgerê de ne, lewma ji derdora me ya herî nêz a di nav civakê de bigirin heta hemû zemînên ku hêza me têrê dike, em neçarin pêwendiyên rast ferz bikin. Dema li kêleka we her cure têkîliyên kole hatin jiyîn, divê hûn rêya çareseriyê ya rast bibînin. Mesele ne tenê ne jiyîna paşverûtiyê ye, ya girîng têkoşîna bi paşverûtiyê re ye. Mixabin di vê mijarê de yan erk nayên fêmkirin, an jî dema tê fêmkirin pêwîstî nayên bicîhanîn. Berovajî vê endamên di nava partiya me de jî, di bin bandora pirsgirêkan de bûhranê dijîn.

Min beriya niha ev mijar vekiribûn. Têkîliya erzan erê nakim. Çi zewicî be, çi jî dergistî be, li dijî têkîliya erzanim. Gelo têkîliya erzan çiye? Têkîliyên ku paşverûtiyê vedixwînin û azadiyê asteng dikine. Kesên ku bi vê têkîliyê ve bûna evd û kole esas digirin, dibêjin; "Ez dev jê bernadim, dayîk, bav, xwîşk, bira û hevjîna min heye." Kesên di bin bandora giran a vê fikrê de bin, ti demî nikarin bibin şoreşgerên azad. Welatparêz nabin, demokrat nabin û sosyalîst nabin. Divê mirov bizane bi ser van têkîliyan de biçe, astengbûna wan a li pêş pêwendiyên wekhev û azad, pêşketina civakî û xebatên siyasî derbas bike û di xizmeta şoreşê de veguherîne pêwendiyên guncav. Hûn ê di van mijaran de xwe berçavan re derbas bikin, pêwendiyên xwe li ser vî bingehî sazûman bikin û nêzîkbûnek rast ji pêwendiyan re bikin.

Vêca hûn ê zaroktiya di derbarê vê mijarê de heyî, feraseta pêwendiya me paşve dixe, rewşên ku em dijîn an jî me neçar dikin em bijîn baş bibînin û serkeftina xwe ji van rizgarkirinê raber bikin. Dibe ku kes di bin bandorên giran ên kevneşopiyê de mabin, dibe ku hinek rewşên dervî îrada we hinek tiştên ku we qet ne xwestine jî jiya bin. Dîsa jî bersiva ku ji van re bê dayîn, têkoşîne. Tişta herî xirab mirov xwe radestî çarenûsê bike. Divê neyê gotin; "Êdî çêbû, nikarim rabim, tiştekê bikim." Ev pejirandina koletiyê ye. Jixwe li cihê ev hatî pejirandin jî şoreşgertî pêş nakeve.

Şoreş bi qasî li dijî pêwendiyên civakî yên paşverû, koletiya siyasî û netewî ye, ewqas jî li dijî koletiya di navbera zayendan de ye. Divê şoreşvan bizane li dijî koletiya saziya malbatî ya pir bihêze serî hilde. Gelek hevalên me heta hemû şaneyên xwe di bin bandora malbatparêziyê de ne. Rewşa malbata xwe di asta jor de diparêze. Digirî, hesteware. Bêguman, ji van kesan jî milîtanek bihêz dernakeve. Bi şêwazek paşverû girêdana bi heval û hogir, xwîşk û birayan re, ji welat û azadiyê zêdetir nirx dayîna wan ne raste. Me qanunek derxist holê. Li gorî vê;

Pêwîste hemû girêdanên me, li ser bingeha girêdana welat be. Ti kesê ku bi vê qanunê ve ne girêdayî be, ne azad û ne jî serbixwe ye. Ev quraleke.

Ma hûn girêdanekê pêş dixin, bi kesekê re pêwendiya we heye, lê binêrin û berçavan re derbas bikin. Dixwazî bila ev serokê dewletê be, dixwaze bila koleyek be, dixwaze bila jinek be, tişta ku hûn ê di pêwendiyan de esas bigirin, pêşketina girêdayî armancên me yên bingehîne. Di roja me de jî wateya vê, welatparêzî ye. Ji bo nirxên girêdanên din ên em pîroz dibînin zêde bibin, girêdana bi vî nirxê bingehîn ve girînge. Ti nirxa girêdana ku bi welat ve nayê girêdan nîne. Ti nirxa pêwendiyek ku xizmeta azadiyê neke nîne. Divê hûn nebêjin; “Nizanim di dilê min de evîndarek min wisa heye, fikrek min wisa heye ez nikarim dev jê berdim, divê hûn pêşî wê bipejirînin.” Ev hemû jî çîrokin û amajeyên nexweşiyên paşverû ne. Weke ku dê ev hest, girêdan û tiştên hûn pîroz dizanin we pêş nexin û ne rastin jî. Berovajî, rêya xapînokek mezin û kolebûnê ye. Ez baldarî vê vedibêjim. Ji ber ku pêşketina nifşek nû û welatparêz girêdayî vê ye. Hemû malbatên me neçarin ku tevahî pêwendiyên xwe li ser bingeha girêdana bi welat ve çareser bikin. Ev jî nêzîkbûnek pir asayî ya netewên cîhanê ji mêj ve çareser kirine, lê em nû nas dikine.

Di demên dawî de tevahî welat tê valakirin. Di bin vê de jî malbatparêzî û qaşo dilxweşiyek rizgarkirina malbatê heye. Lê belê, m abi qutbûna ji welat malbat rizgar dibe? Berovajî vê, ev ketina nava pêvajoya tinebûnê ye. Feraseta malbatê ya li cem me, xwe dispêre rizgarkirina rojaneya xwe. Gelo tişta rizgarkirî tê gotin çiye? Pergalê ew avêtiye metrepolan, avêtiye nava her cure hetîketiyê, dîsa jî li gorî wî ev bese. Ev bêberpirsyariya reîsê malbatê ya herî mezine. Deh zarokan davêje serê cîhanê yê din, paşê jî dibêje; “Min erka xwe ya reîstiyê pêk anî, malbat rizgar kir.” Ev suce. Çima suce? Ji ber ji welat qut bûye, ji rêya rast a têkoşînê qut bûye. Ev zilam rast nabe. Jixwe ji zarokê ku ew

mezin bike jî ti xêr dernakeve. Dê ew zarok jî beredayî û tolaz bin. Jixwe ji nav we yên li Ewrûpa jiyane vê baş dibînin. Li metrepolên Tirkiyê karê herî zêde dikin, dergevanî ye, di karên herî qirêj dekarkirine. Elbet ev jî ji zarokan re pêşerojek baş ava nake. Di vê rastiyê de ji destpêkê ve winda kiriye.

Elbet em ê li dijî vê derbikevin û bêjin ku ne gavek raste. Belê, em ê rast xwedî li malbatê derbikevin û ji bo zarokan wisa pêşerojek rast saz bikin. Ev encamek xwezayî ya xeta partiya me ye. Zêde pêwîstî bi nîqaşê jî nake. Yên aqilmend, dê jixweber vê encamê derbixin. Sedema ku em dubare li ser vê mijarê radiwestin, hûn bi israr van têkîliyên paşverû dijîn û di bin bandorek giran a kevneşopiyan de dimînin. Ecêb nabînim ku li ser we tevan bandora van heye, lê divê mirov bizane bi van re têbikoşe. Mesele ne ciwanbûn ne jî pîrbûne, xwe gihandina fikrek raste. Rewşa we li ser bingeha fikrek rast sererastkirine.

Gelo zaroktî, ketîbûn û xirabiyên têkîliyan ên di vê mijarê de dîtin, ji hêla pratîkî ve tê çi wateyê? Ji bo em ciwanên xwe ji vê nexweşiyê rizgar bikin, şoreş esasgirtin, ew bi şoreşê xwedîkirin, kesayetên xwe bi pêwendiyên şoreşgerî ve bidestxistin, tê wateya ew di nava pêwendiyên azad de bi hev dana nasîn û pêşxistina malbetek girêdayî pêwendiyên azade. Divê em di nava partiyê de di derbarê vê mijarê de perwerdeya navxweyî pêş bixin. Em tenê derbaskirina neyêniyan bes nabînin, divê em di pêwendiyên wekhev û azad de aliyên xwe yên erênî jî pêş bixin. Pêwîste pêwendiyên rêhevaltî serwer bin. Hewce dike em ji vê re wêrek bin. Divê PKK xisleta xwe ya di derbarê vê mijarê de xurt bike.

Nêzîkbûna ji jinê re, di nava me de xwe gihandiye çareseriyek bihêz a şoreşgerî. Pêwîste ev bê sepandin û bi feraseta zilamtiya sexte re têkoşîn bê kirin. Divê em avabûna zilamtiya di nava civaka me de û pêwendiya wî ya bi koletiyê re baş bibînin. Pêwendiya jinwariyê çawa bi koletiyê re hebe, -min beriya niha jî

ev vekiribû- pêwendiya zilamtiyê jî pê re heye. Jinwarî ne tenê cînseltî ye. Tevgerên jinwarî, pêşxistina jinwariyê, jin ji sedî salan ve ji derveyî her cure xebatên weke aborî, civakî û siyasî hiştin, hew encama fêrbûnên girêdayî cînseltî û di xala exlaqî yan jî bê exlaqiyê de xistinê ye. Ne raste ku mirov bêje ev xisletên asayî ne yan jî xisletên ku girêdayî zayendê ne.

Rastiyek jînwarî ji cînseltî wêdetir, aliyek xwe ya çînayetî û civakî heye. Ji ber jin ji sedî salan ve di bin serdestiyê de tên girtin ketine vê rewşê. Hûn jî dizanin, zilamên serjinik jî hene. Nexwe jinwarî, encama serî tawandin, weke mirov nedîtin û her tim xistinê ye.

Pêwîste mirov wisa nêzî rastiya zilam jî bibe. zilamtî jî, tenê ne bûyerek cînseltî ye. Zilamtî bi taybet di nava şert û mercên civaka me de, -li welatên din hinekê hatiye derbaskirin- weke xisletek pir sexte û nejidil derdikeve pêşberî me. Min ev jî ji zû ve ferq kiribû. Di civaka me de yek ji xisletên zilamtiyê ya herî lewaz û sexte jî ev e; Di civakê de têk çûye. Ne xwediyê pêwendiyên siyasî yên têkûze. Bingeha wî ya aborî pir lewaze. Ew dixwaze ketîbûn û bûhrana ku di vir de dijî bi xwepêşandinên sixte ve bide derbaskirin. Zilamtiya rasteqîn, ger aliyên wî yên erênî û bihêz ên girêdayî zayenda wî hebe –ev di jinê de jî dibe, ji ber aliyê wê jî li gorî xwe yên bihêz û erênî hene- pêwîstiyên vê bicîhanîne. Ev jî welatparêziya baş pêkanîn, ji bo vê jî avakirina hêzê û li dijî koletiyê serhildanek başe. Zilamtî hinekê jî ev rastiye.

Jin jî weke zilame. Dema jin tê gotin, yekser tişta tê bîra me mirova ku di karên erênî de pêşve diçe, xwedî wêrektiyê ye, li dijî lewazî û koletiya jinê radiweste û li hember vê şer pêş dixe ye. Ji jinên wisa re “jinên weke zilaman” tê gotin. Mînak, di demên Amazon’an de sekna jinên li ser pişta hespan şer dikir hêjî wisa tê pênasekirin. Dema zilamek tê xistin jî, ji wî re jî dibêjin; “zilamê weke jinan.” Nexwe heta ku di civaka me de seknek

zilam a rasteqînî ya merdinî û zilamê camêr neyê jiyîn, dê her tim seknek sexte bê raberkirin. Ya sexte jî, her tim xwe bi simbêl, bejin û bala xwe, xurtbûna milê xwe bawerin û wisa xwepêşandanên hêzê dikin. Divê zilamtî wisa pêş nekeve. Xurtbûna çors nîşaneya lewaziyê ye. Bi tenê hestên zilamtiya sexte xurt dibin û zilamtiyek rasteqîn û merdinî nayê raberkirin. Divê ji helwestên wisa dûr bê sekinandin. Pêwîste jin ji jinwarî û zilam jî ji xisletên zilamtiya sexte rizgar bibe. Ger wisa be, dê rewşek pêwendiyên hevseng derbikevin holê. Ev jî tenê bi têkoşînek rast ve tê bidestxistin. Di nava têkoşîna rasteqîn tê wateya şerek merd û di pêwendiyên jin û zilam de pêşketinek bi tenduristî. Divê ev weke nêzîkbûnek rêgezî bi we tevan re pêş bikeve. Hûn pêwîstiyên vê rêgezê di jiyana xwe de bisepînin. Weke ku hûn heval û hogirên xwe re weke rêhevaltiyê girêdayî ne, pêwîste li hember hemû mirovên me bi vê ferasetê ve tevbigerin. Nûnertiya şoreşê jî ancex bi vê pêkane. Di vê mijarê de nêzîkbûnên bi kompleks pir bi hêzin û ji hedê xwe zêdetir hestiyar nêz dibin. Divê ev jî bên derbaskirin. Her tim vê dibêjim; em nikarin ti hestên we yên bi rizgariya welat ve neyê girêdan û hezkirinên we yên li hember heval û hogir û zarokan cidî bigirin. Ti têkîliya ku bi rizgariya welat ve ne girêdayî be, ji bo me nayê pejirandin. Ev ji bo hest û dilketinên we jî wisa ye. Zewacên li pêş têkoşîna rizgariya welat weke asteng tên pêşxistin, weke bûyerên herî ketî dinirxînim. Hûn jî dizanin, 12'ê Îlonê ev pir baş pêş xist. Hêj di 15 saliyê de ev li ser civakê ferz kir. Komên mirovan ber bi Ewrûpa ve dan revandin. Li ser bingeha paşverûtî xistin nava gera van têkîliyan. Ev têkîlî bûn rêya şoreşa dijber û şerê taybet. Marîfetek din a 12'ê Îlonê di vê mijarê de pêk anî, pêşxistina têgehek weke teqîna cînseltî bû. Ji vê re jî gotin; "Ji nû ve kifşkirina jinê." Lê di rastiyê de tişta xwestin bi vê bikin, kes ji fikir û reftarên civakî qutkirin û xebatên siyasî dûrxistin bû. Ji bo vê jî xerîze kûr kirin, bi şêweyek qural û exlaq nas nekin ev belav

kirin. Ev rewşek arjenge. Çapemenî jî di vê mijarê de tam ket nava pêşbaziyê. Civak ji rê derxistin. Elbet kesên wisa ji rê derxistin di nava civakê de, nikarin li hember faşîzmê li ber xwe bidin, dê hêsan bên çewsandin û mêtin. Jixwe tişta hatî kirin jî ev bû. Li ser me jî ev hat ferzkirin. Tê zanîn ku me di vê mijarê de li ber xwe da. Xwestin nêzîkbûnên wisa yên 12'ê Îlonê di nava partiyê de jî pêş bixin. Qaşo ji bo ji nav destê me derbixin, hewldana serê zarokên xwe girêdanê jî vê rewşê pênase dike. Me hinekê li hember vê li ber xwe da, niha jî divê hîn zêdetir bê pêşxistin. Ji bo em ciwanên xwe ji bandora van kiryarên faşîzmê yên wisa rizgar bikin, pêwîste em pêşî wan têkil pratîkek şoreşgerî bikin, keç û xortan wisa perwerde bikin. Mirovên hêj ne gihane 15 saliya xwe "serê wan girêdan", ew terkî koletiyê kirine. Nexwe, tişta herî girîng ciwan di nava têkoşîna siyasî de baş perwerdekirine. Pêwîste çavên wan bi siyaset û berxwedanî bê vekirin. Kesên ku çavên wan li keç an jî zilam digere sererast nabin. Divê çavên wan li siyasetê bigere, têkoşîna şoreşgerî bigere, li ser vî bingehî çalek bin, daku hinek jêhatî pêş bikevin. Ev pêkanînek girînge û divê ser bikeve.

Dema em li pratîka Mêrdîn'ê dinêrin, hêj ne gihiştîn temenê 15 salî keç û xortên tên zewicandin pir zêde ne. Her roj jî pirsgirêkên wisa re rûbirû dimînim. Jinek hêj nebûyî sih salî bûye xwedî heft zarokan, elbet dê qiyametek pirsgirêk derbixe, bibe bendê lingan. Ji ber hişê wê ji bilî vê tiştek din nas nake. Vêca dê têkoşîna me ya li hemberî vê çi be? Elbet em ê pêşî têkoşîna siyasî bidin meşandin. Divê ew di nava pratîka şoreşgerî de bên têgihiştin, li dijî kevneşopiyên serdema navîn û dijmin bînin beramberî hev. Divê em ew têkîliya ku behs dikin, feraseta "avakirina malê" lenet bikin. Dema em van bikin dê enerjiya ciwanan jî di astek bêhempa de ber bi şoreşê ve biherike û bêguman dê bi vê re jî şoreşgerbûna civakê ser bikeve. Ev li her herêmê û her qadê derdikevin pêşiya me. Di nava partiya me de

gelek endamên me, di vê mijarê de hêjî negihiştine pêwendiyek erênî. Hûn ê bizanin di vê mijarê de weke mamosteyekê bijîn. Pêwîste bi şêwazek “wê dawiya min û mala min çi bibe” nêzîkbûn neyê kirin. Em malê ji bo neteweKê ava dikin. Em dixwazin ji bo gel malek azad ava bikin. Weke kes bûna xwedî malekê di plana dawî de ye. Mesele ew e ku em bikarin hemû pêwendiyên xwe û heta malbatên xwe jî tevlî vî şerî bikin. Qet şerim nekin û wan bikişînin. Heval û hogir, zarok û hemû pêwendiyên xwe tevlî nava şer bikin û bi pîvana welatparêzî nêzî her pêwendiyê bibin. Vaye exlaqê nû, helwesta nû û civaka nû wisa tê bidestxistin.

PKK’ê ev da destpêkirin. Lê em bi zehmetiyan re rûbirû dimînin. Divê mirov di fedekarî û derbaskirina paşverûtiya heyî de wêrek be. Misoger pêwendiyên xwe yên ehbap-çawîş, pêwendiyên hemşerîparêz, pêwendiyên herêmparêz, pêwendiyên dostanî-yarentî şoreşger bikin. Bila di têkîliyên jin û zilam de ne hest, her tim pîvanên şoreşgerî û siyasetê esas bigirin û li ser hemûyan jî siyasetê ferz bikin. Rêya sereke ya hûn li hember hev rêzdar bin ev e. Ji bilî vê ti pêwendiyê ne ceribînin, pêwendiyên azad pêş bixin. Ji bo pêşxistina pêwendiya azad wêrektî û hewldan tê xwestin. Kurtasî xebatek şoreşgerî dixwaze. Ti nirxa pêwendiyek taybet ên ku çavkaniya xwe ji xebatên şoreşgerî nagire nîne. Rewşek wisa her tim mirov dixe nava rewşên paşketî û zehmet. Evîna ku bi welat ve nayê girêdan û dikeve şûna şoreşê, her çendî evîndariyek hebe jî ferzkirina xerîzeyan û paşverûtiyê ye. Tişta ku hûn ji bingeh ve bidin hezkiriyên xwe, evîna welatparêzî û azadiyê ye. Weke kesek ku heta dawî zanista azadiyê dizanim vê tiştê dibêjim. Heta ku ev pêş nekevin, ti wateya ew hest û girêdana ku hûn behs dikin nîne. Tişta ku ji me re pêwîste jî, di vê mijarê de kûrbûn û serkeftine. Divê wêrekî û fedekariya ji bo vê hewce bê raberkirin. Azadbûna saziya malbatê û têkîliyên jin û zilam, misoger girêdayî vê ne. Em nabêjin hez

nekin, em hezkirinê jî însar nakin an jî naxwazim di vê mijarê de wêjeya keşîştiyê pêş bixim. Bes li ser girêdanên vê yên bi têkoşîna rizgarî ve radiwestim. Dibêjim em ê li hember her tiştê ku li ser bingeha girêdana bi welat re pêş dikeve rêzdar bin û alîkar bin. Hemû provakator li Ewrûpa û welat li şûna xebatên partî, xwestin têkîliyên paşverû pêş bixin. Saziya zewacê bikar anîn û li şûna ala sor a berxwedanê, ala teslîmiyetê ferz kirin. Em jî li dijî vê ala teslîmiyetê derketin. Ger avakirina malbatê bi ala teslîmiyetê re heman tişt be, bila lenet li wê malbatê, têkîliyê û zewacê were! Em li dijî kesên ku xwestin di bin rûyê PKK'ê de xwe bidin jiyîn derketin. Qaşo bi hêceta zewacê keç û xort ji nav refên me reviyan. Kî dizane niha di çi rewşê de ne? Karê yekem ên li hember partiyê têk diçin, pêk tînin zewace. Di vir de tiştek pir ecêb heye. Di rastiyê de tişta dikin, vegera wê binemaliya kole ya bi navûdenge. Şoreşgerê ku di siyasetê de di refê de dimîne, ji bo bêqabîliyeta xwe ya têkoşînê jî biselmîne karê yekem dike, zewace. Dibe ku bi vê jinwarî û zilamtiya xwe biselmînin û bi vê xemrevîn jî bin. Lê em ê loman ji van bikin û guncav jî pêşwazî nekin. Pêwîste mirov xwe di têkoşîna siyasî û di mijarên azadiya bingehîn ên civakî de biselmîne. Tişta hêjayî pêwendiyên jin û zilam jî ev e. Kesên ku xwe di vê mijarê de ne selmandibe, bi ti şêweyî rêzdarbûnek li hember zewac, dergistîbûn an jî têkîliyên wan çênabe. Ji ber ger em nirx bidin kesên ku radestî xerîzeyên xwe bûne, em ê jî têkil paşverûtiyê bibin. Li şûna ku birevin, di metrepolên mêtîngerî û emperyalîst de xwe bixin, bila li lutkeyên çiyan xwe pêş bixin. Me her cure pêwendiyên azad li ser encamên ku çûn welat ferz kir. Ger di vê mijarê de pirsgirêkek we hebe û dixwazin çareser bikin, li welat hejmarek zêde jinên kole yên dixwazin azad bibin û ji bo vê jî her tiştê xwe feda dikin hene. Pêşî wan rakin ser piyan. Ger dîsa jî hûn bêjin; “Tişta dihizirim cuda ye”, lê em dibêjin na, tişta tenê tu bihizirî azadkirina mirovane. Pêşî wan mirovan azad bike, paşê tu dixwazî bizewice,

dixwazî bibe xwedî zarok, tu dizanî. Lê pêşî bilind bike û rake. Partî pêwendiyên li ser bingeha koletî û revê napejirîne. Elbet em nikarin li hember vê rêz bigirin. Ger pîvan wisa ye, divê hûn hêza pêkanînê raber bikin û biselmînin ku şoreşgerin. Her ku hûn biselmînin şoreşgerin, hûn ê di pêwendiyên jin û zilam de çareseriyên rast bibînin. Zewacên rasteqînî jî dikarin li ser vî bingehî pêş bikevin. Nexwe hûn ê bûhranên giran bijîn û di hemû jiyana xwe de di bin bandora vê de bimînin. Carina vê vediguherînin oportonîzma siyasî û wisa jî bi nêzîkbûna; "Pêwîste partî bersivê bide daxwazên min ên taybet" serî radikin. Ev jî paşverûtî ye û herî dawî jî partî zerar dibîne. Lê mixabin beriya her tiştî jî hûn ê rezîl bibin. Di bûyera provakasyona dawî de peyamên weke " pirsgirêka zewacê ya filankes hebû" dan me. Qaşo ji ber me di vê mijarê de hêsantiyek çênekiriye aciz bûne. Hat fêmkirin ku, kompleksa gelek ji wan heye. Ango zilam binkeftina di çareseriya şoreşgerî de jiyayî vê carê jî dixwaze bi komployê tolê ji partî bigire. Ev tîpên ku partiyê li pêş li bajar jiyînê, zewac, bûna xwedî zarok, çûna Ewrûpa û hwd astan dibînin, xwezayî hêrs dibin û arestiyî dijminatiyek dijwar dibin.

Hêjî mînakek Dawut a di bîra min de heye. Ev zilam di asta navendî de erkdar bû. Li welat dixwest keçek 11 salî bike ya xwe. Bi pereyên alîkariyê ku hevalan ji nav gel kom kirî zêr dikire û dibêje; "Ger têrê nekir, dikarim hinek din jî bişînim." Keç jî li hember rewşek wisa şaşwaz dimîne û naxwaze. Lê zilam malbatê têr dike, pereyan dişîne û hêza rêxistinê bikar tîne. Di nameya wî ya min bi xwe xwendî de, di hevokek ku navê keçê jî di nav de bikar tînê de dibêje; "Ya rastî weke mirîşka kore, nizane zadê ku li pêşiya wê tê avêtin jî bixwe!"

Me ev zilam şand Ewrûpa. Li wir jî du caran bavê xwe şandiye gotiye; "Biçe keçê bîne." Qaşo ev zilam sosyalîste û hem jî di refên partiyê de di asta herî jor de erkdare. Lê ev zilam xwedî şanaziyek feodal bû. Ji ber xwestekên wî pêk nedihat, hêrs dibû.

Hemû pêwendiyên partiyê binpê kir û erka partiyê bikar anî wisa hewl dida serî bi keçê bide tawandin. Dîsa ji ber vê sedem ê, weke serkêşê hizbekê li dijî partiyê derdiket, hem jî bi şêweyek pir bisteh û wêrek. Jixwe ji vê rastiyê jî her cure oportonîzm derket. Ji bilî wê wisa nêzî gelek jinan jî bû. Ji ber ku weke feodalan nêz dibû, dema ne li gorî berjewendiyên wî bûya, ne dikarî serî bide tawandin, gotiye; “Lê bidin û wê dêhlê bikujin.” Jixwe herî dawî wî jî cezayê xwe girt. Ger kesek evqasî bê perwerde bimîne, xwe evqasî radestî paşverûtiyê bike, elbet dê kesayetek xeternak ê dij-şoreşger derbikeve.

Hinek mînakên din jî hene. Ji salan ve dihejin û nerehetin. Hêceta wan jî, ji ber ku li gor dilê xwe ne jiyane. De başe, ma li gorî dilê xwe jiyîn dibe? Wê tu evqasî koletiyê bijî û paşê jî bihizirî zewacek azad pêk bînî! Ger dê tu milîtan bî, wê tu şoreşê-rêxistinê bihizirî. Heta ku ev pirsgirêk di hişê wan de bû û li gorî bendewariyên xwe bersivek guncav nedîtin, pirsgirêk derxistin, peywirên xwe yên şoreşgerî pêk ne anîn, xwe li erdê dan. Di encamê de zerar dan partî, lê ew jî sererast nebûn. Nêzîkbûnek evqas oportînîstî ji malbat û têkîliya jin û zilam a ku pêwîste bi şêwazek şoreşgerî bê çareserkirin re raber kirin, evqasî serî ji paşverûtiyê re tawandin, dê mirov heta dawî ber bi hizipkarî û dij-şoreşê ve bibe. Me gelek mînak dan. Em dikarin hêjî bidin. Komek têkîliyên ku em dikarin bi lenet bi bîr bînin hene. Divê ders ji van bigirin. Em bikarin çareseriya di vê mijarê de bi wêrek derbixin pêş û bihêz bin. Ev ji bo civaka me bi qasî tê zanîn zêdetir hewce ye. Ji bo pêwendiyên civaka me bi şoreşgerî bin, tişta herî girîng şoreşgerbûna malbatê ye. Pêwîste em di vê mijarê de ne dîlê hestên xwe bin, berovajî hesas û kamil bin.

Welatparêzên mezin, dizanin ku bi xwe re hestên herî berz pêş bixin. Jin jî dikare di mijarên zewac û malbatê de xwe bigihîne fikir û hestên herî berz. Bi kurtasî divê mirov di vê mijarê de ne koleyê azweriyan be, xwediyê mezinbûnê be. Ji bo

vê jî elbet pêwîstî bi çand û têkoşînek siyasî ya berz heye. Ev tîp têkîliyên ku bi têkoşîna siyasî ya mezin re derbas nebin, elbet dê di refê de bimînin û bibin karîkatûr. Nexwe divê çareserî li ser vê bingehê be.

Yeqîn dikim di derbarê vê mijarê de hin hevalên ku xwe dixapînin hene. Hin kesên ku dixwazin weke meseleyek taybet lê binêrin, nêzîkbûnek ji dervî şoreşê yan jî kêleka şoreşê re derbas bibin raber bikin. Hewce dike ku bêjim, ev xwe dixapînin. Divê mirov bizane heta ku nêzîkbûnek şoreşgerî ji malbatê re neyê kirin, mirov nabe şoreşger. Şoreşgerî bûyerek tevde ye. Ji dergeha malbatê destpê dike, heta bûna xwediyê fikir û hestên netewî diçe. Ger hûn xwe negihînin şoreşgeriyek yekpar, hûn nikarin zêde di van mijaran de gav bavêjin. Çareserî li ser vî bingehî dibe. Divê mirov li ser vî bingehî xwe ji şaşiyên kevin dûr bixe û ev jî gengaze. Kesê ku bikare li hember dijmin gavek evqasî wêrek bavêje, fedekarî bike, dê di van mijaran de jî bibe xwediyê çareseriyên baş. Ger dê nîqaş çêbin, vaye bila li bingeha van mijarên esasî yên hatine destnîşankirin bin. Encamek siyasî ya nîqaşên wisa heye û dê ji têkoşîna me ya şoreşgerî re jî xizmetê bike. Pêwîste em perwerdeya partî û peyre jî civakê li ser vê bingehê pêş bixin. Ev perwerdeyek sosyalîste. Perwerdeyek demokratîk û welatparêzî ye. Hewce ye em cidî bigirin dest. Pêwîste em ji zarokan heta pîrên xwe li ser vî bingehî perwerde bikin. Dibe ku dereng mabe, lê ji borizgarî çareyek din nîne. Her çendî dereng jî be divê em erkên xwe yên di vê derbarê de rast destnîşan bikin. Bi qasî hêza xwe jî beşdarî çareseriyê bibin. Gelek bûyerên ku piraniya we jiyayî hene. Van bûyeran li ser vî bingehî berçav bigirin, hûn ê çareser bikin. Dibe ku hûn zewicî, dergistî yan jî ne zewicî bin, hişê xwe zêde bi wan mijûl nekin. Kesên ku bi dilketinek mezin azadî û welatparêziyê ve ne girêdayî be, nikarin di têkîliya jin û zilam de jî xwe bigihînin astek rêzbar. Pêwîste hûn bizanin mijarên hatine destnîşankirin pêk bînin û

jêhatî bin. Ez ê çîroka wê dûr û dirêj venebêjim û romanê jî nanivîsim, lê min bingeha pirsgirêkê diyar kir. Hûn ê bizanin li her qada jiyanê li ser van esasan pêk bînin. Jixwe qadroyên berpirsyar jî ev e.

***Îlon 1988***

***Di Nêvenga PKK'ê De Rêgeza Azadiyê Esase***

Pirsgirêkek din a girîng ku em di nava civak û tevgera xwe de dijîn, pirsgirêka jin û malbatê ye. Elbet ev ne tenê girêdayî me ye, rewşek ku hemû tevgerên civakî dijîne.

Weke ku ev pirsgirêk tengaviyek girîng ava dikin, pêşketinên ku astê jî dixin xirab derdikevin holê. Em jî di vê mijarê de dixwazin bi temamî şoreşê pêş bixin û şoreşê bidin jiyîn. Hûn jî dizanin, em herî dawî li ser hêmanekî pir rawestiyan, pir rexne kir û bi ser de çûn. Di encamê de derket holê ku hêmanek dijmine. Li vir hêjî hevalek di pêvajoya xwe dahûrandin û pênasekirinê de ye. Dijmin hinekê ew bi bandorên jin û malbatê bikar aniye û xistiye. Ya rastî hejmara kesên ku di vê rewşê de dijîn zêde ye. Me hêj ev venekirine. Lê mirov dikare vê bêje, ti şoreşgerek ku bi rêya bikaranîna paşverûtiya malbatê nehatî destgirtin û xistin nemaye. Têkîliyên malbat, xwînê û mirovtî hatine bikaranîn û li ser bingeha van têkîliyan li dijî tevgera me ya şoreşgerî êrîşek mezin heye.

Ev qad, ji ber malbatê binesaziya me ya civakî dagir kiriye, dijmin jî baş hesabê vê rewşê dike, bi zanebûn xebatên dij-şoreşê ve di rewşa qadek paşverûtiyê de ye. Dijmin bi çar destî ve ev qad desteser kiriye.

Dîsa di gelemperiya cîhanê de vê pirsgirêkê bikar tînin û kapîtalîzmê bi vê didin jiyîn. Jin bi şêwazên cuda kirin meta, di berdewamiya pergala mêtîngerî de heta dawî weke amûrek guncav tê nirxandin. Tevî ku sosyalîzmê xwest hinek çareseriyên berbiçav derbixe holê, lê hêjî li welatên sosyalîst pirsgirêk bi hemû giraniya xwe ve li naverastê ye.

Lê di nava gelên ku di bin serdestiya emperyalîzm, mêtîngerî û faşîzmê de paşketî mane, ev pirsgirêk bi temamî bûye pirsgirêka şoreşê. Ev bûyerek wisa ye di heman demê de şoreşa

dijber jî ji xwe re kiriye palpiştek. Mînak li Tirkiyê têgehek weke “xanedana Ozal” hatiye pêşxistin. Di nava vê de jî têgehên weke Siltan Semra hatine pêşxistin. Qaşo saziyên “Weqfa Piştevaniya Jinê”, “Wezarata Jin û Malbatê” û hwd hatine pêşxistin. Her wiha weke ku nû hatiye kifşkirin vê kifşkirina jinê di rojevê de digire. Di pêvajoya 12’ê Îlonê de qadaku civak herî zêde tê de hatiye xistin mirov dikare baş bibîne, di astek bilind de metakirin û bikaranîna jinê ye. Li şûna asta netewa pir pîroz a azadiyê, di bin navê “azadiya cînseltî” de –bi qasî gefan li civakê bixwe-tevgerên jin ên sexte, feraset, jiyîna pratikan û ferzkirinên van dikeve rojevê. Ev her tim weke rêbazên herî bi bandor ên şoreşa dijber tên pêşxistin. Dema em li Kurdistanê dinêrin, rewşek wisa tê dîtin; ji aliyekê ve binesaziya exlaqî ya civakê dinirxînin, ji aliyek din ve her çendî kevneşop jî be, feraseta “namûsê” berovajî û xirab dike. Ji aliyek din ve jî wê li ser bingehên herî sexte –ev jî şêweya hem êzkirina rewşa malbatparêzî û malbatê- xwe ferz dike.

Weke din bi şêwazek pir xirab xwe di nava partiyê de ferz kirinên van jî hene. Ji ber partiyê jî xwe di vê mijarê de baş biçek nekiriye, dixwazin xirab bikar bînin. Ji bo kesên di pêvajoya partîbûnê de pir ciwan bûn, nû ji malbatê qut bibûn, di têkîliyên jin û zilam de bandorên feodalî yên giran dijiyan, çi tişta ji serdema navîn mayî mohra xwe li pêwendiyên wan dida hewl dihat dayîn bê derbaskirin, bi pîvanên durûtiya burjuva ya bê esil –ya rastî bêpîvanî- nêzîkbûn derketin û xwe negihandina hêza sepana şoreşgeriya sosyalist, neçar hiştiye ku vê pirsgirêkê bi baldarî bigirin dest.

Me ji vê pirsgirêkê re jî çareseriyên bingehîn dît, ji nîqaşê re vekir û weke hûn jî dizanin bandora van hinekê çêbû. Ji ber hinek hêzên ku xwestin nêzî pirsgirêkê jî bibin ji van nêrînên me bandor bûn, me pêwîstî dît em pirsgirêkê hîn kûrtir bigirin dest. Bêguman di vê mijarê de perwerde sînordare. Feraseta di vê

mijarê de rûniştandinê de hewldan, wêrekî û hêz tê xwestin. Ev bi serê xwe pirsgirêka têkoşînê ye. Di nava refên me de wekheviya jin û zilam û şoreşgerbûna pêwendiyan hêjî girînge. Pirsgirêka jinê girtina dest de, peywirên ku tên xwestin hêjî nayên bicîhanîn. Ya rastî di pêşketina şoreşa me de misoger rola herî girîng ku pêwîste tevgera vê girseyê pêşxistine. Çawa ku tê gotin; "şoreş eserên girseyane", di heman demê de em dikarin bêjin meseleyek tevlîbûna girseya jinê ya ji şoreşê re ye jî. Bêguman dê ev ne tevlîbûnek jixweber be. Dê li hember paşverûtiya dijî, li ser bingeha şerkirinê be. Bi qasî tevlîbûn û yekbûna xwe ya cewherî bi azadiya civakê ve girê bide, di hingê watedar be.

Hêjî di xebatên me yên qadrobûnê de em nikarin behsa hebûna ferasetek rast a azadiyê bikin. Nexasim em nikarin bêjin nûnertiya vê ya bijare pêş ketiye. Ev ne tenê ji bo jin wisa ye, herî kêm bi qasî wê bi gelemperî civaka çînayetî û taybet jî bi şêweyên darez ên feodalî bandorên xwe berdewam dikin û ev jî weke xisletek xwezayî ne têgihiştinek heye. Pêşdarezînên zilam bihêzin. Di vê mijarê de pir zehmet aresteyî veguhertina kesayeta xwe dibe. Zêdetirîn jî ji têkîliya hestewar wirdetir ti caran ji boxwe napejirîne. Hêza wî têrê nake ku pêwendiya kesayetên wekhev û azad pêş bixe. Aresteyî aliyê hêsan dibe. Ev hemû jî, şoreşgerbûnê ji aliyê neyênî ve zêde bandor dike.

Ev rewşên ku hêjî, di refên me de bi bandorin, xalên ku pêwîste em di nava xebatên xwe yên perwerdeya şoreşgerî û têkoşîna pratîkî de derbas bikine. Pir vekiriye ku, pêwîste em vê qadê bi jiyana xwe ya rojane ve bi şoreşger bikin. Nirxandinên di vê mijarê de hatine kirin, asta pirsgirêkê ya dîrokî, aborî, civakî û siyasî daniye holê. Çarçoveyek nîqaşê ya pêş bikev e xêz dike, di pirsgirêkên takekesî de sepana wê ji her kesî bi xwe re dihişt. Lê ev, ji bo pêkana vê û xwe gihandina hinek çareseriyan hatiye kirin. Yeqîn dikim nêrîna gavên ku di vê mijarê de hatine avêtin, zêde ne pêşketîne, ne şaşe. Di bin nêzîkbûna bertek û hestiyar ên

kesayeta we de, bandora vê pirsgirêkê yên nehatine çareserkirin heye. Ji ber ji malbatê jî qutbûnek baş nehatiye kirin, bi malbatê re li ser bingeha şêweza şoreşgerî yekbûnek nehatiye çêkirin, hinek nerehetî, gengeşe û di heman dem ê de lewazî ava dike. Lewma divê neyê hêvîkirin ku di nêvengên bi pirsgirêk de çareseriyên erzan bên pêşxistin. Divê em misoger serî li rêyên çareseriya burjuva nedin. Di nava nêzîkbûnek azadiya burjuva de, nexasim "azadiya cînseltî" raberkirin, bi awayek objektîf şoreşgeriya dijber pêkanîne.

Mijara ku faşîzma 12'ê Îlonê bi navê "azadiya cînseltî" di hemû torên çapemenî û weşanê de belav kirî, mijarek ku her kes pê ve mijûl bû. Em li hinek torên weşana burjuva dinêrin, ger tam neçin encamê weke ku her kes kêmasiyek herî mezin dijî rewşek dijiyan. Zikê zilam birçiye, mafeke wî ya herî biçûk nîne, bes xwe wisa kiriye nava bûyera cînseltî, tam serxweş bûye. Çawa ku demekê çînên serdest Ol weke afyonekê bikar anîn, di roja me de jî jin jî bi heman şêweyî weke afyonê tê bikaranîn. Berê Ol ev rol dilîst, îro jî jin vê rolê dilîze. Elbet di vir de, ya ku pêwîste nirxek pir cîdî jê re bê dayîn û weke pîvana civakî ya azad bê destgirtin ne azadiya jinê ya civakî ye, berovajî hîn zêdetir koletî tê pêşxistin. Tişta tê kirin saziya ku pêwîste bi temamî bê perwerdekirin di berdewamkirina mêtîngeriya faşîst de weke amûrek sazîbûnê tê bikaranîn. Ji bo hiş û eleqeyan ji pirsgirêkên şoreşê dûr bixin, mijar weke xwepêşandinê, amûrek reklamê ya herî pêşketî bikaranîn, hewldan û enerjiya ku pêwîste ber bi şoreşê ve biherike bi şêweyek bê esil weke heyberek jinê, ango ne ruh, çand, di fîzîka wê de dana der bi temamî bêbandor kirine.

Di nava pergala kapîtalîst û emperyalîst de, nexasim di sedsala 20. de bi tempoyek hûrûkûr bikaranîna jinê, veguhertina reklam û xwepêşandanê tê jiyîn. Li şûna bandora Ol a bê hişkirinê, di roja me ya îro de jin weke hêmanek bêhişkirinê tê bikaranîn. Ew rewş ber bi roja me ve bi şêweyên zêde pêş dikeve.

Di vê mijarê de sînema, roman û mûzîk weke amûra bêhişkirinê tên bikaranîn. Bi temamî wisa tên arestekirin, naveroka wan tê valakirin û weke amûrek bêhişkirinê derdixin pêş.

Burjuvaziya Tirkiyê vê mijarê hêj di salên 1870'î de di pêvajoya ku pêşketinên şoreşgerî xwe ferz dikir de girt dest. Ev jî ne jixweber bû. Nexasim nêzîkbûna 12'ê Îlonê ya bi plansaz û bi pergal ji pirsgirêkê re tê fêmkirin. Ev jî bi armanca şoreşa dijbere. Duruşmeya wan ev e! "Ma tu dixwazî civakê bixî, têkîliyên jin û zilam bixe, jinê bixe!" Di televîzyon, çapemenî, sînema û wêjeyê de rojane di hemû pêwendiyên mirov de ev mijar berovajî û kûr kirin, lewma hedê xwe derbas kir. Jixwe mirovê lewaz ne li ser hişê xwe ye. Heta ku devê wî li erdê bikeve wî dixe û rejîma ku dixwaze didomîne. Tişta ku dixwazin bikin û dikin jî ev xale. Radeya ketîbûna civakekê, herî zêde di ketîbûna jin û malbatê de şênber dibe. Çiqas nêzî pêvajoya şoreşê bibin, li wan qadan ewqas jî xirabûn tê kûrkirin. Em dizanin ku di merheleyên herî zêde azadî hewce ye, nexasim pêwîste herî zêde ji bo azadiyên siyasî, civakî û aborî têkoşîn bê meşandin de, ferasetên azadiya sexte gur dikin. Mijar û şêweyên sexte yên azadiyê dikevin meriyetê. Niha li Tirkiyê di têkîliyên jin û zilam ên burjuva de teqînek mijara gotinê ye! Di vê teqînê de hemû hêzên weke felsefî, wêjeyî, tibî û derûnî li ser van têkîliyên çewt ketine seferberiyê. Ji bo pirsgirêkên sexte û pisporiya bersivên sexte, gelek navendên vê hatine avakirin. Heta bûye beşek pîşesaziyê.

Weke ku hûn pir rehetî dikarin bibînin, encama ku pêwîste bê derxistin, dema em li hember faşîzma dagirker şer dimeşînin, pêwîste em bi rêgez nêzî vê mijarê bibin, weke pirsgirêkek têkoşîna şoreşgerî ya girîng bibînin, nekevin rêyên çareseriyên sexte û înkarê, van êrîşên şoreşa dijber paşguh nekin û pêwîste em li hember vê êrîşê çeka şoreşê hemêz bikin. Ev pir girînge.

Her çendî ji hêla şoreşa dijber ve wan dixe rewşek “azadiya cînseltî” ya sexte û berovajî dike û dixwazin her kesî jî têkil vê bikin, pirsgirêk misoger parçeyek pirsgirêka rizgariya netewî û azadiya civakî ye. Ji “azadiya cînseltî” jî wêdetir, encama newekheviya di nava jin û zilam de ye. Ev newekhevî di her asta weke aborî, siyasî, civakî û çandî de zêde bûye. Misoger weke ku şoreşa dijber jî dixwaze diyar bike, ne pirsgirêkek “azadiya cînseltî” ye. Heta ev ji bo bi temamî azadiyê binixwimîne, ji naveroka wê derbixe tê kirin. Ji bo burjuvaziya mêtînger her potansiyela ku pêwîste teqez di şoreşê de seferber bibe û dema beşdar jî bû serkeftinê misoger bike ji dest şoreşê derbixe, ji bo şoreşê ji vê çekê mehrûm bihêle, di nava hewldanek veşartî de ye. Pêwîste mirov baş bibîne ku li ser vê pirsgirêkê pir kar dike, ji bo vê jî naveroka pirsgirêkê vala dike û bi şêweyên sexte ve ferz dike. Nexasim ger em di nava binyata civaka me de feraseta di temenek biçûk de avakirina saziya malbatê jî bi serve bikin, çareseriya pirsgirêkê hîn girantir dibe. Jixwe ev feraset ne tenê neçariyek aborî û siyasî ye, di nava civakê de rêya sereke ya hêzbûn û rêzdarbûnê ye û her wiha weke darezek nirxên exlaqî hatiye bikaranîn. Li gorî vê ferasetê yên malbata wan xwedî kiflete û zarokên wan pirin xwedî hêz û rêzdariyê ne. Serê cîranên xwe ditewînin. Kurtasî berdewamiya feraseta qlana kevnar, pirsgirêkê hîn girantir dike. Çima? Ji ber ku di roja me ya niha dekapîtalîzma yekdestdar derfetê nade ku malbat bi şêweya berê bimîne, ew xistiye nava nakokiyek mezin. Li gorî ku malbata her kesê jî heye, her kesî dike hevbeşê vê nakokiyê û rewşek giran dide jiyîn. Çanda tolazî û çewt a li kolanan di nava malbatê de bi şêweya feraseta namûs û girêdana malbatê ya herî sexte ve derdikeve pêşiya me. Elbet ev jî dibe şêweya herî derewker û sexte. Ji ber, heta ku ev tîpa malbatê nekeve xizmeta şoreşê, ne gengaze ku serfiraz û bi namûs be. Dê teqez şoreşa dijber li ser bilîze. Em ji pêşketinên dawî jî fêm dikin ku, ger bi vê saziyê re

pir mijûl bibin û ji şoreşa dijber re bibe amûr, dê bikeve rewşek wisa ku hemû qadroyên partiyê bandor bike. Ger tu dixwazî şoreşgerekê bê bandor bikî, dest bavêje malbata wî, ji vir dest bi wî karî bike! Vê rewşê tam dixin rewşek siyasî. Ma tu dixwazî şoreşgerek lewaz bixî, yekser jinekê berve bişîne! Jixwe rêbazên herî zêde tên bikaranîn ev in. Zewacên di ne wextê de jî pêş dikevin rewşên giran ava dikin. Herî zêde jî ev derdikeve pêşiya me û li hember partîbûna me jî weke nêzîkbûnên astengiyan çêdikin. Ger em hinek din bi giştî şîrove bikin, li cem me têkîliyên jin û zilam mijarek siyasî ye. Yan siyasîbûnê asteng dike, yan jî ger bi şoreşgerî be tevlîbûna ji siyasetmedariyê re seknekê ava dike. Ev ji welatên din zêdetir di nava me de xwedî vê rastiyê ye. Heta em dikarin vê jî zelal bikin, cewher, şêwe û pêşketina pêwendiya şoreşgerekê ya bi jin û malbatê re, amajeya siyasîbûna şoreşvane. Ger ji hêla şoreşvanekê ve ji vê pirsgirêkê re çareseriyek şoreşgerane hatibe dîtin, dê ew şoreşger-milîtan bi gelemperî kesek hêzdar be. Ger şoreşgerek jî nûnertiya pirsgirêkê ya çewt bijî, ew “şoreşger-milîtan” jî bi gelemperî “şoreşgerek” çewte. Dema me xwest li gelek qadan nûnertiya partî pêş bixin, yekser jin û malbat weke amûrekê bi şêweyek balkêş dikeve meriyetê, paşê ew milîtanên me jî weke tiryak bikar aniye yekser ser hiş diçe. Hevalek me ku rewşek mîna vê jiyayî, hêjî hewl dide vebêje ku ev bûyer çawa jiyan kiriye. Berbiçave ku ev rewş çawa girêdayî polîs bê bandor hatiye hiştin, bi têkîliyên malbatê re çawa girêdayî daye meşandin. Ev rastî gelek tiştan fêrî me dike. Her çendî ev êrîş bi awayek sûbjektîf nehatibin plankirin jî, dîsa jî pêl vê zemînê dikin, heman weke çûkekê bixin xefkê ew jî tên xistin. Lewaziyek, bê tedbîriyek û serîtawandinek milîtan tine dike. Mirov dikare mînakan zêde bike. Ji ber li vir jî nêzîkbûnek bi tevdîr û pîvanên me yên li ser bingeha siyasî esas nehatin girtin, hûn jî dizanin bû sedem me ne di cîh de hevalek xwe winda kir.

Me di serî de ev mijar, bi tedbîrê re weke formasyonek siyasî, ji bo girîngiya wê ya di têkoşîna siyasî de derbixin pêş, esas girt û hewldanek mezin da. Çi pêwendiyên nav malbatê girtina dest dibe, çi jî têgihiştin û helwestek serwer pêşxistin dibe, çi jî weke kes mijara jinê girtina dest dibe û mijara pêşxistina pêwendiyê dibe, bi temamî em weke mijarek azadiya siyasî nêz bûn û ev alî derxist pêş. Me her tim hewl da vê xalê ji hestan, têkîliyên neçarî yên di navbera zayendan de dûr bixin, cewhera wê ya çînayetî û pêwendiya wê ya bi rizgariya netewî re berçav bigirin, xwe jî di vê mijarê de her tim perwerde bikin û têkoşer bin. Em di vê mijarê de gihan hinek encaman. Ger em li şûna vê rêbazê bi feraseta malbata Kurd a kevnar ve girêdayî biman, me feraseta namûsê ya bi zilam re esas girtiba, dê ji mêj ve PKK biqediya. Pêşketinên ku me di nefsa xwe û dahûrînan de jiyayî, her ku çû di nava hemû partiyê de belav bû. Her ku me çareseriyên rast derbasî vir jî kir, me karî em niyet û nêzîkbûnên dijmin jî derbixin holê. Bi rastî jî partî bi vî rengî bû hêza çareseriyê ya girîng. Ev ne pêşketinek wisa hêsan û çareseriyek hêsane. Di rastiyê de şoreşek mezine.

Gelo partî bi giştî di vê mijarê de çiqas çareseriyê dijî? Bêguman ev bi têkoşînê dibe. Me di vê mijarê de tiştek misoger negot, lê rêgez û çareseriya ku em dixwazin di vê mijarê de serwer bikin, çareserî û têkoşîna hatî bidestxistine. Elbet mijara weke şanaziya malbatê, şanaziya zilamtî, şanaziya jinê girtina dest, dê safbûn be. Tê bîra me, di binesaziya civaka kevin de –hêjî derbasdare- dema kesekê dûjîn ji malbata me re dikir, dibû sedema dozên xwînê yên mezin. Di civaka me de cihê ku herî zêde xwe weke serdest rave dike, serdestiya li ser jinê ye. Ango di vê mijarê de çiqas xwedî hêze. Bi rêya veguhertina serdestiyê ber bi serdestiyek sexte û ferasetek dîktatoriyê ve diçin. Ya rastî zilamê têkçûyî xwe li hember her cure rejîm û zextên civakê, di çarçoveya serdestiya jinê de xwe di rewşek serdestiya sexte de

diparêze. Me ev jî ji nêzîk ve dît. Di heman demê de me dît ku, ji ber vê serdestiya sexte dikeve nava têkîliyek malbatê ya çawa çewt de, êdî nikare rabe ser xwe û têkîliyek jin û zilam a nikare henase bigire re rê vedike. Lê bi rastî jî em bi tevdîr bûn. Ji ber dema ev têkîlî derdikevin pêşberî me, nefreta me çêdibû. Me ti carî ji xwe re nepejirand. Hêj wê demê em bi şêwazek nû nêzî pirsgirêkê bûn û her ku çû pêwîstî hat dîtin ku nêzîkbûnek şoreşgerî bê raberkirin. Mixabin bi we gelek kesan re nêzîkbûnên wisa rexne bike nîne. Hêjî bi bandorên giran ên feodalî re, pirsgirêkên hestiyarî jî tên jiyîn. Ger wisa berdewam bike, hûn nikarin xwe ji gelek darbeya rizgar bikin. Pêwîste berendamên qadrobûnê berî her tiştî xwe di vê mijarê de rêkûpêk bikin, ji wan dilketinan rizgar bikin, yan jî xwe bigihînin vînek şoreşgerî. Li şûna nêzîkbûnek hestiyar, xwe gihandina nêzîkbûnek zanistî, ew bi xwe re dana jiyîn, ango pêwîste êdî wekheviyê di hundurê xwe de bipejirîne. Lê belê vê jî ne ku di rewşek zehmet de ye, ji ber partiyê xwestiye –bêguman partî vê dixwaze- bike, pêwîste ji bo pirsgirêka wî ya bûna şoreşger heye lewma bipejirîne. Her wiha divê ne lewaz be. Em jî dizanin, salên şoreşê, salên ku mirov ji her cure derfetan dûr dimîne, nikare malbatê ava bike û malbat jî nikarin xwe ji xirabûnê rizgar bikin. Li gorî ku piraniya pêwendiyên civakî qut bûne, pir kêm pêwendî li ser lingan mane, ne gengaze ku pêwendiyên nû jî di nava ar û aş de pêk werin, divê şoreşger jî bizane ku dê di van mijaran de bi salan bê pêwendî û xizan bimîne. Ya girîng bi vê zanebûnê jiyîne. Bi feraseta; “Malbata min çû, dergistiya min çû, dê rewşa min çibe” nêzîkbûn, wê di bin bandora pirsgirêkê de xwe tinekirin be. Pêwîste bê gotin; “Salên şoreşê salên wisa ne. Salên qutbûna ji dayîk, bav, kur, keç, hevjîn, dost û hogirane. Di vê mijarê de fedekariyek mezin tê xwestin û ya girîng jî mirov vê fedekariyê bijî.” Di van deman de mirov ne tenê ji pêwendiyên kevin, dibe ku ji pêwendiyên xwe yên asayî û kesên pir hez jî dike qut bibe.

Milîtan ew kese ku bikare bêje; “Ev ne girînge, em ê di vê mijarê de fedekariyê bikin û em dikarin.” Her çendî derfet jî hebin, hûn ê bêjin; “Tişta ji bo me pêwîste sazûmankirina civaka nû ye û hêza nûnertiya vê raberkirine.” Ev jî bi serê xwe pirsgirêka têkoşînê ye. Hêz û hewldanê dixwaze. Wê tu vê mezinbûnê jî raber bikî. Ne di axaftinê de, bi nefsa bidî xwarin, di vê mijarê de qonaxên şoreşê gav bi gav bijî û bibî xwedî çareseriyê. Ev pêvajoyek zehmete. Lê ji bo avakirina zayîna nû, ji bilî vê jî ti rêyek din nîne. Ger em bêjin; “Deka em ya berê weke heyî bijîn, ji bo xwe gihandina ya nû pêwîstî bi ti hewldanan nîne”, ma dê bi vê nêzîkbûnê şoreş pêş bikeve? Divê em xwe nexapînin. Dema em destpêkê ji gundê xwe qut bûn, me jî çend rondik barandin. Elbet zehmete ku mirov ji gelek tiştên ku bi azwerî wan ve girêdayî ye qut bibe. Lê em dinêrin, ev hemû jî qet hewce nakin. Qutbûn, ji bojiyana seknek şoreşgerî hewcedariyeke. Ne ku ji ber em mirovên pir xirabin, ne ku me nirx ne dida dostanî, malbat û hemşeriyên xwe. Lê em di wê zanebûnê de ne, pêwîste em van şûn xwe bihêlin û derbas bikin. Ji ber pêwendiya partî, rizgariya netewî û serdemê xwe ferz dike, me got divê ji pêwendiyên kevin ti berhem nemînin. Hûn jî dizanin, dema pêwendiya kevin –pêwendiya asayî jî dibe- tê derbaskirin, tê wateya xwe gihandina pêwendiyên nû. Mirov nikare di heman demê de hem ya nû hem ya kevin bijî. Nexasim qet nikare domdar bijî. Nûnertiya bihêz a nû, girêdayî bihêz derbaskirina ya kevnare. Kesek ku dixwaze bi temamî ji pêwendiyên nû re vekirî be, pêwîste di astek girîng de hemû pêwendî û girêdanên xwe yên kevin derbas bike. Belê, di vê mijarê de jî wisa ye. Ji bo gelek we ji malbat, dost û hogiran, xizim, heta herêma kolanê jî qutbûn pir zehmete. Lê em çi bikin ji bilî vê em nikarin bi ser rizgariya netewî û pêwendiyên civakî yên nû de biçin û hêzek dernakeve holê. Me ev rastî heta hemû şaneyên xwe jiya. Hûn jî dizanin me di encama fedekariyê de xwe

gihand rêgeza partî, rêgeza rizgariya netewî û rêgeza rêhevaltiyê û hêza pêkanîna van.

Em di vê mijarê de pêwendiyên ku hewce dike di şoreşê de pêş bikevin paşguh nakin. Berovajî şoreşgerbûna malbatan weke peywira şoreşgerî ya herî cidî dibînin. Em dibêjin kesê ku malbata xwe neke şoreşger, şoreşgeriya wan jî kême. Kesên ku di pêwendiyên jin û zilam de şoreşgeriyê pêş nexe, şoreşgertiya wan jî kême. Em dibêjin milîtanê ku di şoreşgerbûna jinê de girîngiya pêwîst diyar neke, milîtanek kême. Milîtanên nexasim xwe di vir de wekhev û azad ava dike, di wekhevî û azadkirina civakê de pîvanek girîng ava kiriye. Esasên nêzîkbûnên me ev in. Divê hûn jî hêza pêkanê bi xwe re ava bikin. Dema pirsgirêkê digirin dest, pêwîste nêzîkbûnek objektîf serwer be. Pêwîste armanca siyasî di serî de be. Hewce dike pêşî em jina li pêşberî xwe, weke endamek şoreşger bibînin. Pêwîste em di vê mijarê de ne durû bin. Pir girînge. Camêrê di van mijaran de durûst be, camêrê hêzdare. Camêrê durû jî, dibe ku her kêlî lîstokan bilîze, xwe bixe. Jixwe mînakên tên diyarkirin jî me hişyar dikin.

Dikare sazûmaniyek pêwendiyên rêhevaltiyê bên pêşxistin. Xalên rêzgirtinê yên esasî bên bicîhkirin. Bila di vê mijarê de li şûna nêzîkbûna hestiyar, ferasetek sosyalîst a şoreşgerî bê rûniştandin. Ev bi serê xwe qadek avakirinê ye. Jinek kole girtina dest, rakirina ser piyan, dana meşandin, weke hûn dihizirin ne pirsgirêkek hêsane. Di mercên Kurdistanê de jinek ku ji dil û can bi hemû durûstbûna xwe ve li dijî jina kole şer dike ava bikin. Em ê jî hingê ji we re bêjin, hûn zilamê pêşketîne. Dîsa bila jinek ku encama şoreşgeriyê ye pirsgirêka xwe ya rizgariyê bi hemû pirsgirêkê azadî û rizgariyê ve têkilhev bigire dest, hewldanek têrkar raber bike û bila bêje di vê astê de ye, em ê jî bêjin ew şoreşgerek pir yemane. Deka bêjin! Di nava we de çend kes wisa ne? Tê dîtin, di vê mijarê de bûna xwedî seknek bihêz ne hêsane. Em hêjî hewl didin pirsgirêka azadiyê ji gelek aliyan ve

têbigihijin. Di feraseta gelek ji we ya beramberî hev de di mijarên weke jin çiye, zilam çiye, divê çawa bên destgirtin de, hêj hûn ji qalibên xwe yên yek alî rizgar nebûne. Ger hûn li pirtûkên Ol'î binêrin, hûn ê bibînin herî zêde weke qadek ku îblîs dike mijara gotinê hatiye bikaranîn.

Hejmarek zêde milîtanên me di nava gel de xebat dimeşînin. Gelo çiqas pêwendiyên şoreşgerî ava kirin? Çend jinên şoreşger derxistin holê? Bersiva van pirsan dendika hêjîrê jî danagrin. Heta em bipirsin gelo malbata xwe çiqasî kir bin bandora şoreşê de, dê bersiva ku bê dayîn "pir kêm" be. Pirgirêk ew e divê wêrekiyek hebe ku kincên hestiyar bên qetandin, asta dîrokî û civakî berçav bê girtin û wisa bigirin dest. Ji bilî vê jî pêwîste weke pirsgirêka têkoşînê esas bê girtin. Pêwîste misoger di vir de durûtî dernekeve. Pêwîste em bi rêyên çareseriyên di bin bandora feodalî û burjuva dekar nekin. Em ê ya zehmet hilbijêrin, lê divê em her tim a vî karî pêşve dibe hilbijêrin.

Nexasim dema em arestiyî pratîkê dibin, divê girîngî ji avakirina azadiya jinê û jina şoreşger re bê dayîn. Qet nebê ji bo rêgeza partî rast bê sepan her tim venêrînek hebe. Ger rast neyê meşandin, qetiyen divê kes çavên xwe jî ji pêkanên şaş re negire. Deka em bêjin ji ber pir zehmet bû lewma me dev ji pêkanîna rast berda, -elbet em dev jê bernadin- lê qet nebê, qîmeta partî bikar neyînin û destûrê nedin hewldanên xeternak. Nexasim malbat xirab nirxandin, bikaranîn, bêhêziya jinê xirab bikaranîn, misoger ne nêzîkbûnek sosyalîstî ye. Ger gengaz be, pêwendiyek şoreşgerî ava bikin. Hinek pêwendiyên ku hatine avakirin û îro di nêvenga me de xwe didin jiyîn, pêwendiyên xeterin. Elbet ev jî ne pêwendiyên şoreşgerî ne. Pêwîste em bi feraseta namûsek feodalî ya dibêje; "Wey te wisa çav berdayê, nizanim dijmin çi li malbata min kir" nêz nebin. Bêguman em ê van bikin mijarên pirsgirêkê, lê baş tê zanîn ku her tişt ji şoreşa dijber tê hêvîkirin. Dê şoreş jî li dijî vê çeka xwe bikar bîne. Nêzîkbûna siyasî ya di vir de mijara

gotinê ye, nêzîkbûna şoreşê ya pêngavê ye. Ji bo hem ji yên nêzî xwe destpê bikin heta hemû civakê çareseriyek rast serwer bikin, pêwîste em xwedî nêzîkbûnek şoreşgerî bin. Hewce dike em ji fikir û nêzîkbûnên wisa dûr bisekinin. Şoreşgerek dikare bi salan birçî, ji malbatê qut, ger zilam be ji jinê qut, jin be ji zilam qut li ber xwe bide. Lê nêzîkbûna ku bêje di vê mijarê de pirsgirêkên me hene û xwe bavêje erdê nayê pejirandin. Divê bê zanîn ev ketîbûne. Em cardin vedibêjin; Salên şoreşê, salên ku mirov ji gelek tiştan mehrûm dimîne. Em dûrî hewayê jî man. Hûn jî dizanin, ev deh sale em li serê çiyane, me nekarî gavekê jî bavêjin nava girseya gel. Lê di rastiyê de ji bo masiyekê derya çibe, ji bo şoreşgerekê jî girse heman tişte. Tevî vê jî tehemûla me heye. Em ê nekarin agahiya mirina gelek malbat û xizmên xwe jî bigirin. Çend ji wan kengê mirin, em ê nezanin. Dê ew dostên me yên em bi dilsoziyek mezin bi wan ve girêdayîne bimirin, dîsa em ê agahiya wan negirin. Di şoreşê de jiyan cewaze. Destpêkê min jî nedikariya gelek tiştan rakim. Nexasim dema hevalek şehîd diket, cîhana min hemû xirab dibû. Di nirxandina şehîdên me yên destpêkê de –ev nêzîkbûn pir girînge- pirsa em ê li ser esasê bîranîna wan bi kîjan hêz û henaseyê bicîh bînin mehan em mijûl kirin. Ger em şerê gelêrî hinek din pêşve bibin, em ê hezaran şehîd jî bidin. Ji ber ku, ji bilî vê rêyek din a avakirina ya nû nîne. Em ê xwe bigihînin cihekê, dê ev jî di nava şerê gelêrî de pêş bikeve. Em nikarin di nava şer de jî mirinê bihizirin. Dê di vê astê de fedekarî pêş bikeve. Ev rastî ne. Ev pêvajo rewşên miletê ku dest bi şoreşê dikin tev dijîne. Li pey gelek ji we dayîkên ku herdu çavên wan tije rondik hene û em jî nikarin wan paşguh bikin. Em baş dizanin ku çiqas li me digerin. Lê şoreş jî çavkaniya bûyer û girêdanek wisa ye, bersivê dide bandora van tevan. Te neçar dike tu ji wan tevan qut bibî û dike malê xwe. Qanûnên xwe bêrehim bikar tîne û encam digire. Xwezayek şoreşan jî heye. Belê niha jî em ketine bin bandora wê. Ev ji

qonaxên asayî temamî cewaztirin, qonaxek awarte ye. Lewra jiyana wê jî bi temamî awarte ye. Her wiha hûn ê jî wisa awarte nêzî jiyanê bibin. Gelek tiştên ku di pergalê de ji bo we asayî bûn û mafê we bûn dê li aliyekê bên hiştin. Ji ber ku wisa ye, hûn ê ji gelek xalên derdikevin holê re nebêjin “nayê fêmkirin, nayê pejirandin.” Îro xalên ku di nêvenga PKK’ê de di meriyetê de ne, quralên şoreşgerî ne, jiyana şoreşgerî ye. Temamî bi ya kevin re nakokiyê dijî û derbas dike. Em ê vê rastiyê û vê nêvengê ji xwe re bipejirînin. Hûn ê ji partiya me re, bêjin malbata me ya nû ye, nexasim dima gelê Kurdistanê dibe mijara gotinê, hûn ê bêjin malbata nû ya hewldana avakirina Gelê Kurdistanê ye. Ango malbata ku bingeha wê bi xwînê hatiye damezirandin! Em ê nirxek berz raber bikin. Ger dergeha malbata me ya nû di astek wisa bilind de şênber bibe, em ê derdên xwe jî di vir de çareser bikin. Dê hinek ji me hêrsên xwe çareser bike. Em ê li vir her tiştî bi rêhevaltî parve bikin. Dê çavkaniya hêza me evder be. Em ê bi hev re cîhana xwe ya nû li vir ava bikin. Ev ne nêzîkbûnek razbere, rastiyek ku em rojane dijîne. Em ê hemû malbatek wisa nû bixin şûna malbata kevin, li şûna têkîliyên malbata kevin, jiyana bilind a malbata xwe bixin meriyetê. Em ê li şûna têkîliyên kole, pir çewt, ne wekhev ên jin û zilam, pêwendiyek ku bingeha wekhevî û azadiyê saz dike, xwe tîne asta parçeyek jiyanê ya jênaqetê, nêzîkbûnek pêwendiyên wekhev û azad pêş bixin. Ev rêgeza me ya jiyanê ye. Em nikarin ji vê jêrtir bipejirînin. Em ê ti carî koletiyê û serî tewandinê nepejirînin û nexwazin. Em bi temamî qirkirinê re jî derbas bibin, em ê di pêwendiyên xwe yên berz de tawîzan nedin. Di jiyana partiyê de serwerbûna rêgeza azadiyê jî wisa dibe. Di van pêwendiyan de jî nirx dana rêgeza azadiyê ya berz, ew qirêjnekirin, bi wê nelîstin nêzîkbûna herî eslî ye. Şoreşgerbûn, pêwîstiyên vê rêgeza azadiyê jiyîn û dana jiyîne. Ev cîhana ku herî zêde koletî di meriyetê de ye wisa nirxandin, nêzîkbûna herî raste. Lewra ya herî rast li ser vî bingehî

serwextbûn, xwe birêxistinkirin û têkoşîn weke peywirek sereke li pêş partiyê danîne. Dîsa hewce dike hemû çêkera me ya milîtan peywirên xwe li ser vî bingehî têbigihije û hewcedariyên wê pêk bîne. Serkeftinên şoreşgerî yên li her qadê pêş bikevin, bêguman dê serkeftinên me jî yên li vê qadê diyar bikin. Serkeftinên ku em di peywirên xwe yên li vê qadê de jî pêş bixin, dê bandor li ser pêşketina têkoşîna giştî bike. Êdî em pêkana van mijarên ku berfirehî hatine nirxandin ji we re dihêlin. Dema hûn pêk neyînin, dê partî jî li ser vî bingehî hesab ji we bixwaze.

***1989***

### *Hemû Hewldana Me Ji Bo Avakirina Welatek Azad û Di Vî Welatî De Avakirina Mirovê Azade*

Pirsgirêka jinê weke mijarek civakî dixwiyê, lê belê li ser gelek têkoşîn û şerên siyasî bandor kiriye û weke mijarek siyasî ji wan jî bandor bûye. Me hewl da di dahûrînê de kêm jî be pirsgirêkê vebêjin. Pirsgirêka jinê jî weke pirsgirêka Ol'î mijarek pir tevlîheve. Dikare bê gotin, mijara jin û ol, di civakên sosyalîst de jî tam nehatiye çareserkirin. Lewma ne gengaze ku mirov vê pirsgirêkê bi nirxandinekê hemûyê dane holê. Lê dîsa jî çawa tevgerek şoreşgerî gotinên xwe di derbarê her mijarê de heye, di vê mijarê de jî tiştên ku bêjê hene. Teqez daxwiyaniyek xwe, perspektîfek xwe heye. Her wiha dê ev nêzîkbûna wî ya xweser ji mijarê re diyar bike.

Nêzîkbûnek dijmin û tevgerên burjuvaziya biçûk jî ji pirsgirêka ol û jinê re heye. Em ê bi qasî nêzîkbûnên dijmin, nêzîkbûnên oportînîst ên çavkaniya xwe ji tevgerên burjuvaziya biçûk digirin jî ronî bikin. Em dixwazin nêzîkbûna xwe ya partî zelal pêş bixin.

Mijara ol pêwîstiya xwe bi zanebûnek dîrokî heye. Di heman demê de di felsefe û sosyalîzma zanistî de jî pêwîstî bi nêzîkbûnek hêzdar heye. Ji ber ku mijarek serbeste, her kes dikare her tiştî bêje. Mijarek her kes dikare xwe zana bibîne, lê divê neyê ji bîrkirin ev mijar herî zêde di xizmeta şoreşa dijber de pir xeter tê bikaranîn. Şoreşgeran jî di vê mijarê de pir kêm tiştên rast gotine û pêk anîne. Em jî hewl didin ji ber berjewendiya şoreşê ya herî rast û têrkar bêjin û bikin. Ji bo wê, em ê di vê mijarê de pir berpirsyar tevbigerin. Çareseriyên amade esasgirtin, misoger dê pêşveçûnekê çêneke. Lewma em dibêjin divê em ji bo serkeftina şoreşa xwe herdu mijaran jî pir baldar bigirin dest. Bandora van pirsgirêkan hêjî li ser me heye. Lewma pêwîste em bi wêrekî, bi

şêwazek şoreşgerî van pirsgirêkan bigirin dest. Hewce dike dema em di xizmeta şoreşê de ne, bandor û serweriya van pirsgirêkan li ser me nebe. Berovajî em ê bibin hêza çareseriyê. Em ê weke xwediyê nêzîkbûnek afirîner û nû dike, ji bo sûdmendiya şoreşê xwe bigihînin encaman.

Şoreşger wêrek nêzî pirsgirêkan dibin. Zanistî nêz dibin. Em jî hewl didin wisa nêz bibin. Bandora van herdu mijaran a pir giran li ser civaka Kurd û civaka Rojhilata Navîn heye. Koletiya jinê, pir bihêz di xizmeta kedxwariya çîna Ol'î û çewsîneriya civakî de tê bikaranîn. Me hewl da di van her du mijaran de jî kurt û cewherî jiyana xwe vebêjin. Di van herdu diyardeyan de pirsgirêka em rûbirû hatin û rêyên çareseriyê yên me pêş xistin, di şoreşgerbûna me û pêşketina PKK'ê de bi bandor bû. Paşveketinek di bin bandora van herdu diyardeyan û çareseriya şoreşgerî ferzkirinê de helwestên me di pêşveçûn û xwe gihandina van rojan de rolek sereke lîstine.

Di şoreşên gelên Rojhilata Navîn de çareseriya rast a ji van herdu diyardeyan re pêş bikeve, dê li ser pêşketina şoreşê bandorek mezin çêbike. Lewra çareserî, ne tenê ji bo berjewendiya miletekê, xwedî xisletek giran a enternasyonalîste jî. Dema em nêzî van mijaran dibin, ji hêla rûmeta xwe ve pêwîste nêzîkbûnên weke; "Dê çi ji min were, xwedayên min, malbata min, jina min, jinên min" çênebe. Divê em berovajî bersiva pirsen; "Xweda çi bûn, kî bûn, çima derketin holê, çi anîn serê Ol'a me, malbat çibû, ew malbata ku xwe di hemû şaneyên me de bicîh kirî nûnertiya çi dike, em ji kur ber bi çi ve hatin" bê dayîn.

Ev pirsgirêk bi qasî dîroka mirovahî kevnare û bi wê re destpê kirine. Dema partiya me, hewl dide sazûmaniyek nû li welatê me ava bike, destgirtina van pirsgirêkên bi qasî dîroka mirovahî kevnare, dixwaze destpêkirinek nû bike. Bi pêngavek rast ve, em hewl didin mirovê bihêz, mirovê nû ava bikin. Me

beriya niha jî di mijara jinê de nirxandinên cur be cur kirin. Ji bo temamkirina wan nirxandinan em cardin hewce dibînin ku ji hinek aliyan ve mijarê bigirin dest. Dahûrînên jinê, hêjî li metrepolan û welatên sosyalîst weke xalek pêngava tevgerên siyasî ya girînge. Di tevgerên çepa nû, aştî û keskê de jî pirsgirêka jinê xwedî cihek girînge. Di heman demê de hêjî li welatên sosyalîst di vê yan jî wê astê de hebûna xwe diparêze. Welatek weke ya me hatî mêtîn, wê di civakên girêdayî û paşverû de bandora xwe zêdetir çêbike û wê bibe pirsgirêka şoreşê ya herî girîng. Ji ber vê ji hêla civaka Kurdistanê ve ev pirsgirêk zêdetir girêkek kore û bi qasî wê jî astên wê yên siyasî hene. Tevlîheviya pirsgirêkê û sergirtîbûna wê, tevî ku gelek hêz bi nêrîna sosyalîzmê ketine rê, hewl didin pirsgirêkê bi qalip û çewsîneriyan bigirin dest û hema sere derbas dibin. Ev misoger nêzîkbûnên şaşin. Em nikarin ne nêzîkbûnên vala yên lîberalîzma burjuva û ne jî nêzîkbûnên di bin bandora feodalî yên weke “qet dest nedin” bipejirînin. Tam di vê xalê de tişta dixwazim ji dil û can ji we re bêjim, bi rastî jî xwe xapandinên mezin hene û kesayet jî di astek girîng de çeloxwarî bûn. Dema min hewl da di pratîka xwe de nêzî vê pirsgirêkê bibim, yeqîn dikim li ser şoreşgerbûna min jî bandora vê zêde ye. Sedema ku gelek ji we xwe negihandiye dahûrînên bihêz, bi bêçaretiya li hember pirsgirêka malbat û jinê ve girê didim. Ya rastî di wir de têkçûn heye. Ji ber ku hûn têk diçin, hûn nikarin xwe bigihînin kesayeta siyasî. Sedema hûn nikarin xwe bigihînin milîtanek siyasî û kesayetek serkeftinê gengaz dibe jî ev xale.

Faşîzma 12’ê Îlonê ya li Tirkiyê, pirsgirêka jinê berovajî û bi şêweyek xizmetê ji faşîzmê re bike kir rojevê. Pirsgirêk tenê di xizmeta şoreşa dijber de pêşkêş nekirin, ji bo pêşxistina bandora şoreşa dijber çi hewce be ew kirin, di navtêdan û bikaranînê de pir bibandor bû. Nexasim ji bo valederxistina helwesta şoreşê ya pêşxistina çareseriya pirsgirêkê û seferberi

têkoşînê dike, rejîma 12'ê Îlonê ev bi zanebûn bikar anî. Bi vî rengî potansiyelek şoreşê ya herî girîng, li dijî şoreşê hat bikaranîn. Sedema ku faşîzma 12'ê Îlonê evqasî bihêz li ser lingan ma, para herî mezin a berovajîkirina pirsgirêka jin û malbatê ye. Heta dibe ku di rêzên sereke de cîh digire. Nexwe, pêwîste ji bo me girîngiya mijarê baş bê têgihiştin û hêj di destpêka kar de ye, nêzîkbûnek şoreşgerî ya rast jê re bê kirin. Ger min di çareseriya vê pirsgirêkê de şoreş esas negirtiba, wêrek nêz nebûma, di bin giraniya bandorên kevneşopiyê de tevbigeriyam, ji zû ve têk çûbûm. Ger em bi hinek pîvanên ji rêzê ve têr dîtiba, me nedikariya şoreşê wisa pêşve bibin û ji bo vê jî rêyek bi ewle çênedibû. Bi qasî me karî em reftarên şoreşgerî raber bikin, me bihêzbûn jî gengaz kir. Rewşa me ya niha, em hinek din di qabîliyet û çareseriya şoreşgerî de nêzî derfetên xizmeta şoreşê kirin. Dibe ku di nêzîkbûnên me de kêm û kurtî hebin, lê di rastiyê de cewher hatiye danîn.

Komara Tirk û provakatoran bi israrek mezin hewl dan vê pirsgirêkê weke astengî danin pêş me. Qaşo dihizirîn dê me bi vê lewaz bixin. Vê jî vêbêjim, bi gelemperî weke saziyek civakî, lê zêdetir jî encamê civaka me, ango weke kes, cihê jin û zilam a di nava saziya malbatê de di vê mijarê de pir xirabkare, ji şoreşê dûr dixe û ber bi serî tawandinê ve dibe. Çi dê û bav dibe, çi hevjîn dibe û çi jî zarok dibin, pêwendiyên beramberî hev heta dawî hevdu dikin bindest, kole, ji pirsgirêkên siyasî yên bingehîn dûr dixin, herî dawî jî dibe sedem ku serî ji dewletê re bitewînin. Ev jî dibe bîrek sar a hemû enerjiya we dadiqurtîne. Ji ber vê hêjî gelek ji we saziya malbat û zewacê derbas nekirine. Em niha bi temamî di rewşa şervanên milîtantiya avabûna civaka nû de ne. Lewma dibe zêde weke pirsgirêkek pratîkî dernekeve pêşberî me. Lê divê em ji bîr nekin, di qonaxek wisa de, ancex jiyana şoreşgerî dikare me bide jiyîn. Dîsa ger em dixwazin civakê û kesîmek civakê ya girîng ber bi şoreşê ve biherikînin, -jixwe ev nebe şoreş jî nabe-

tenê ne ji bo xwe, bi giştî ji bo binyata civakê pêwîste em çareseriyê di şêwazek rasteqîn de ferz bikin.

Ji bo parastina hebûna qadroyên PKK'ê, rewşek me ya şerê bi malbatê re heye. Dibe hûn rasterast vî şerî nameşînin, lê belê giraniya vê berpirsyariyê dijîm. Berpirsyarî çiye? Berpirsyarî jiyîn, redkirina feraseta dibêje; "Dev jê berdin ji xwe em hatine vir, ma kî hesabê malbatan dike" ye. Ger em malbatan li dijî xwe bigirin, dê gelek ji wan bi dijmin re hevkariyê bike. Divê mirov wan qane bike. Rêbertiya PKK'ê neçare ku vê di nava rêveberiyek tê pejirandin de bigire. Em ji bîr nekin malbat, li hember Rêbertiya PKK'ê nêzîkbûnek weke ku em zarokên wan direvînin raber dikin. Dijmin û her cure kesên burjuvaziya biçûk ên rast nabin, gotin; "Li zarokên xwe xwedî derbikevin." Belê, bi rastî jî me di nêvengek wisa de hûn ji wan revandin, ev hinekê wisa çêbû. Lewma ji bo me dibêjin; "Wisa kir, ev kir, wisa em xapandin." Ya rastî hinekê jî hêza wan têrê nekir û ji hêla siyasî û bîrdozî ve serwer nebûn. Heta li hember têkçûna ku saziya malbatê jiyayî, me rêyên pêşveçûnê danî pêşiya we. Hûn jî li ser vî bingehî rêketin û beşdarî partiyê bûn. Lê misoger ev hêsan çênebû. Çeperek malbatê şikandin, herî kêm bi qasî navendek dijmin belavkirinê zehmete. Min jî bi salan bandora malbatê re şer kir. Malbata ku jê hatîm qet ne malbatek burjuva yan jî feodal tevî ku malbatek zêde reben bû, pir bibandor bû. Bê ku kesayet zêde biperçiqe ji nêvenga malbatê ya çavkaniya gengeşe û pirsgirêkan bû derxistin, yek ji çalekiyên min ên şoreşgerî ya herî mezine. Bê ku mirov biperçiqe û serî bitewîne derketin pir girînge. Ji bilî vê axaftinên weke "malbata min wisa ne başe, xizane" yan jî "pêşerojek li gorî daxwaza min nade min" û pey re ji malê rev, ne derketinek raste. Ne raste ku di vê mijarê de nêzîkbûnek bê esil çêbe. Derketina ku em behs dikin, derketinek şoreşgerî û rexneyî ye. Ev jî bi serê xwe şoreşe.

Gelo derketina gelek ji we çawa ye? Gelo derketina we ya ji malbatê bi rexneyî bû? Ma derketinek bi macera bû? An jî derketinek heta dawî bi peyman bû? Ger bi peyman be, dibe di astek girîng de kesayetek we ya serîtawandî hebe. Ger derketinek macera be, di vir de jî dibe ku kesayetek aware derbikeve pêşberî me. Ger malbatê jî jixweber hûn terk kiribin, an jî we malbat terk kiribe, dîsa jî ne derketinek zêde xwedî nirxek şoreşgerî ye. Ger we xizmeta malbatê ya ji we re kirî bi temamî înkar kiribe û wisa derketibin, dê ev jî bibe sedem ku hûn aloziyan derbixin. Em dixwazin bêjin ku ev derketin hemû jî ne saxlemin. Ger di têkoşînê de derketinek we ya rexneyî, ya kevin derbas dike, nêzîkbûnek xwe gihandina armancek ji wê pêşketîtir esas digire çêbûye, dibe ku ev kesayeta we pêş bikeve. Derketinek li ser vî bingehî pêkanîn, paşeroj ber çavan re derbaskirin û xwe nûkirin girînge. Ger di vê diyardeyê de xwe xapandin û kêmasiyek cidî hebe, cardin biçin paşeroja xwe, salan ji nû ve ber çavan re derbas bikin, nêzîkbûna rast bipejirînin, wê esas bigirin. Ev pir girînge. Ji ber ku şaşiyên we yên paşê derdikevin, hinêkê jî çavkaniya xwe ji vir digirin. Ji ber vê min kurt û cewherî ezmûnên xwe parve kirin. Ya herî rast jî her tim derketinek têkoşerî, rexneyî û weke çareserî xwe gihandina sosyalîzmê ye. Vêca êdî ti caran qîmetê nedin rêyên ne baş en me behsa wan kirî. Ya em di vir de behsê dikin, ji malbata ku di bin serdestiya dê û bavê me de derketine. Bêguman ev gavek û qonaxek pirsgirêkê ye. Pirsgirêka qonaxa pey wê re, pirsgirêka gavek din nêzî pêwendiyên jin û zilam bûyîne. Me demek dirêj bê ku em di kêleka vê pirsgirêkê re derbas bibin û em xwe têkil pêwendiya di navbera zayendan de bikin, hewl da perwerdeya xwe temam bikin. Me got em di pêvajoya dibistanê de xwe pêş bixin. Ev nêzîkbûn jî hişt ku em di asta pîvanek girîng de bikarin li ser lingê xwe bimeşin. Dema me dest bi xebatên siyasî yên şoreşgerî kir, li Tirkiye salên 1970'î di vê mijarê de nêzîkbûnên şaş hebûn. Li Tirkiyê di xisleta çepgiran de

nêzîkbûnên zilam ên macera û li hember civakê biyanî hebûn. Ango macera yan jî çepgirî, li hember kevneşopiya civakê avabûna xwe weke tiştek baş dinirxand. Bertekek ji rêzê şoreşgertî fêm dikir. Bertekên li hember malbatê û bertekên li hember kevneşopiyên cur be cur ên bicîh bûne weke çepgirî dihat fêmkirin. Misoger di têkçûnên peyre de para vê nêzîkbûnê mezine. Bi nêzîkbûnek macera dûjîn ji Ol re kirin şoreş hesibandin, ne şoreşgerî ye. Rê ji têkîliyên herî çewt ên jin û zilam re vedike. Lê wer dizane ku, bi vê re têkîliya azad pêş xistiye. Berovajî nêzîkbûnek wisa dibe ku mirov ber bi bêberpirsyariyê û kes jî –ger bi navê şoreşê rêketibe- rewşên herî xeternak ve bibe. Jixwe nêzîkbûnên şaş bûn sedem ku, tevgerên olperest û faşîst serê şoreşê bibin bela. Sedema ku şoreşa Tirkiyê li hember faşîzmê têkçû, ev nêzîkbûne. Li hember pirsgirêka jinê jî heta dawî nêzîkbûnek macera, dervî civakê, badilhewa hat raberkirin. Ji ber ku rê ji pêwendiyek milîtanî û rêzbar re venekir, mirov nikare navê wê bike tevgera şoreşgerî û behsa pêşketina milîtanên wê bike. Şoreşgeriya ku hêsan di civakê de tecrîd bûyî û ji malbata ku bingeha civakê ye hêsan tecrîdbûn, bû sedem ku faşîzm jî van bûyeran pir baş bikar bîne. Faşîzm di vê mijarê de, jin û malbat desteser kiriye. Şoreşgerê me jî tazî û tenê hiştiye. Şoreşgeriyek ku ji malbbatê û rola jinê ya şoreşê hatiye dûrxistin, li hember faşîzmê têkçûyî ye. Di rastiya çepên Tirkiyê de ev hat jiyîn. Di têkçûna şoreşgeriyê de jî para herî mezin a van nêzîkbûn û helwestane.

Vê ferasetê hewl da xwe li ser me pir bi bandor bimeşîne. Ancex, em di vê mijarê de cewaz bûn. Nexasim ji ber em di bin bandora giran a Ol'î de bûn, me hewl da pisrgirêka malbatê jî hêsan negirin dest û her tim bi rexneyî nêzî mijarê bûn. Ne bi nêrîna ol yeksan paşverûtî ye ve me xwe wisa hêsan ji pirsgirêkan dûr xist, ne jî dema pirsgirêka jinê dihat gotin me got; "Dev jê berde, min eleqeder nake" yan jî "bi nêzîkbûna badilhewa ve em ê

di nava her cure bê berpirsyariyê de bijîn.” Me di van her du mijaran de jî nêzîkbûnek şaş nekir. Ji ber ku reftarên me ne wisa bûn, em jî neçarbûn rexneyî nêz bibin. Ger nêzîkbûna rexneyî jî li ser bingeha sosyalîstî be, dê teqez şoreşger be û xwe nû bike. Her çendî me zehmetî jî jiyan kirin, me her tim li ser vî bingehî ev helwest esas girt. Heta niha jî em vê helwestê berdewam dikin.

Hinek rastiyên ku em di vê mijarê de bi we re dijîn bi dahûrînên şoreşgerî re derbaskirin, yeqîn dikim dê sûdmend be. Dîsa yeqîn dikim pêwîste em bi hinek mînakan ve ronî bikin. Di civaka me de bandora mêtîngerî û civaka feodal li ser pêwendiyan zêde ye û daneyên wê ne. Dema hûn van xalên weke “dergeha malbatê ye, derdora civakî ye û pergala dewletê ye, em li wir kar û bar peyda dikin, lewma em di wan saziyan de dijîn, têkîliyên amade ne” re nêzîkbûnek ji rêzê raber bikin û bijîn, hûn ê di bin bandora şaşiyên giran de bimînin. Bi rastî jî hûn ê pêşî xwe di rewşek kolebûyî de weke mîkrop girtî destpêkê xwe nexweş bixin û di vê mijarê de jî paşverûtiyê bijîn. Ev di heman demê de tê wateya ku hûn ê heta dawî bandorên pergalê bijîn. Dema bandorên malbatê jî tên jiyîn, dê kesayeta yek xetê û kesayeta pergalê, kesayeta di bin bandora kevneşopiya giran de derbikeve holê. Di encamê de wê kesayeta di destê mêtîngerî û hevkarên feodal de mezin bibe. Ev kesayet jî, dev jê berdin şoreşgeriyê bike, dê bi serê xwe pirsgirêkek mezin be. Hêmana xetimandina şoreşgeriyê be. Li hember pêşketina şoreşgerî zêde li ber xwe dide. Ger gavek ji rêzê ber bi şoreşgerî ve avêtibe jî, dê her tim di nava tevgera şoreşgerî de nêzîkbûnên oportonîzmî pêş bixe, kar û bar giran bike û bibe çavkaniya her cure bêxîretî û xirabûnê. Dê her ku biçe ber bi teslîmiyetê ve biçe, bibe amûrê xebatên provakatîf. Elbet dê ev rewş jî bibe sedem ku tevgera şoreşgerî darbe bixwe. Bi kurtasî bandor wisa pêş dikeve û encamê jî heta vir tîne. Madem hûn her tim biryara şoreşgeriyê didin, wê demê di mijara xwe şoreşgerî pêkanînê de wêrek bin.

Tê zanîn, dema me hewl da em PKK'ê bikin hêzek madî, nexasim me hewl da em hêzek rêxistinê ya şênber ava bikin, di destpêkê de ya di cewher de heyî lê xwe ne dayî der, gelek bandorên mêtîngerî û feodalî weke marên ji kuna xwe derketin, hewl dan pêşketina me asteng bikin. Çi bi zanebûn, çi jî bê zanebûn dibe, bandorên ku em behsa wan dikin xwe bi vî şêweyî derdixin holê. Hêjî xala ku em hewl didin di dahûrînên rêbertiyê de rave bikin evin. Ger hêjî ketîbûna hezarî salan, rewşa pevçûnê, hemû nakokiyên malbat û binemaliyan, xerîzeyên hatine çewsandin û berjewendî di rojevê de bin, wexta derfetek herî biçûk derket holê dê ew jî xwe ferz bikin. Me ev xal hêj di sala 1983'an de, di broşura "**Di Pkk'ê De Pirsgirêkên Pêşketinê Û Erkên Me**" de nirxandibûn. Me gotibû, PKK bi taybet bandorên mêtîngeriyê sînordar kir, bandora feodalî ya kolekirin û ji mirovahî dûrxistinê şikand, hinekê jî nûnertiya ax û tovê ku bikare diyardeya azadiyê pêş bixe dike û em jî dixwazin li ser vî bingehî baş mezin bikin. Lê belê me dît ku, her cure nebatên cuda hewl didin liba genimê me ya herî biçûk ji çar aliyan ve bixeniqîne. Em yek-duyan ji holê radikin, cardin derdikevin. Tovên xirabiyê ji tovên başiyê deh qetî zêdetir bejin dane. Belê ev tovên cuda û têkoşîna me ya li dijî wan, di nirxandinên di derbarê provakasyonan de hatin şîrovekirin. Me jî nêzîkbûnek wisa domand. Em jî li ser vî bingehî ji roja destpêkê heta niha bi tovên xirabiyê re şer dikin. Em çiqasî ji hal dixin, cardin xwe nû dikin. Herî zêde jî me ji kesên ku li hin qadên pratîkê di asta pêş de erk girtîn re ev got; "Em hewl didin dara azadiyê xwedî bikin û wê mezin bikin." Hûn bi nêzîkbûna "ev saxleme" her tim li koka wê didin. Ango hûn dixwazin di navenda me ya azadiyê de bi şêweya helwestên feodal an jî kemalîstî teşe bidin û wê xwedî bikin. Na! Em jî dixwazin dara serxwebûnê xwedî bikin û mezin bikin. Vê di hişê xwe de bigirin û dev ji vê helwesta xwe berdin. Belê me di nirxandinên berê de daxwiyaniyên wisa dan. Niha jî em dixwazin

vê şênber bikin. Ji ber ku dixwazin hesabên kevin ji nû ve zindî bikin. Ji malbatan terbiya "keça min an jî kurê min" ya herî başe hatiye girtin. Ger em şêwaza mezinkirinê ya malbatan berçav bigirin, mirov dikare bêje di her malbatê de feraseta "zaroka min ji her kesî baştire" pêş ketiye. Di vê mijarê de malbata herî belengaz kesekê na ecibîne. Bi rastî jî feqîriya di nava civaka me de berovajî weke ji rêderketî tê jiyîn. Sedema ketîbûna zêde ya mirovê Kurd û naxin dewsa mirovan de jî ev rastiye.

Dahûrînên me yên di derbarê van diyardeyan de ev rastî derxistin holê. Belê pêşketina rêbertiyê ku di gelek hêmanan de derxistî holê, ev nexweşiyên dijwar ên hatîn jiyîn bûn. Me jî di vê mijarê de hewl da em bi sebir bin, her roj, her saet xwe ber çavan re derbas bikin û xwe bigihînin a herî saxlem. Em dibêjin çi ji van hevalên me hat. Hinekan jî berdêla vê bi jiyana xwe dan. Ji bo rojekê jî be, hewl didin PKK'ê weke dîn û haran bikar bînin. Ango çi tişta ku ji malbata xwe ya kevin xwestibin ser ne xistibin, niha jî dixwazin ji malbata PKK'ê bidest bixin. Çiqas hest, dilketin û fikrên ku ji ber çewsîneriya mêtîngerî û hevkariya feodal ku encamê çînekê ye xerîze hebin, wana gur dike. Rêbertî di vê mijarê de çiqas kamil be bila be, dîsa jî zehmetiyan dijî. Vaye cewhera dahûrînên Rêbertiyê ev mijarin. Nexwe nikare bibe Rêber. Rêbertiya rast jî jiyanî ye.

Dahûrînên Rêbertiyê yên di nava PKK'ê de esasî bi vî rengî hatine pêşxistin. Rêbertî, li ser zemîna civakî miletek ku mîrateyên serdema navîn dijwar dijî û mêtîngehkiriye, tiştên ku pêwîste bên rûxandin hilweşandiye, di avakirina ya nû de jî heta ku derfetê xwe gihandina hêmana dewletek serbixwe pêş bikeve, pêwîste avabûnek rast bike. Pêwîste Rêbertî di teorî û pêkanînê de jî yeksan pêş bikeve. Di vê mijarê de xwe berçav bigirin, ji bo vê diyardeya ku berzbûnê dixwaze hemû hêza xwe seferber bikin. Lê mixabin me çiqasî xwestibe di vê mijarê dekar bikin û rexne bikin, di nava me de kesayeta ji rêzê hewl da cewhera pirsgirêkê

xirab bike. Tê zanîn di dahûrînan de Rêbertî piranî li ser bingeha pirsgirêkan sekinî. Ji boya rast derbixe holê, heta em xwe biteqînin ji vî karî re amade kir. Êdî her ku çû me derfetên pêşketina PKK ya Rêbertî pêk anî. Elbet we ji her alî ve dijwariya vê pirsgirêkê jiyan nekir. Ji ber vê, me ew dijwariya pêşketina jiyana xwe ji we re vegot. Dema me gava yekê avêt, -sala 1976 bû- digotin; “Kesek eslê wî nediyar derketiye qaşo dê siyasetê saz bike, lê em xwediyê silalek wisa ne, nav û dengê me diyare.” Nêzîkbûnek wisa badilhewa ji dervî me hat meşandin. Jixwe ev jî silala Barzanî, silala Bedirxaniyan, silala Şêx Seîdan an jî terîqata filan kesî, xwedî eşîretek û derdorek wisa bûn. Wan jî xwe li gorî mercên derketina me pir bi îdîa didît. Di wê dem ê de pêwendî, hêz û derfet zêdetir bi kesên ji nav bermahiyên hevkarên serdest derdiketin re hebû. Jixwe endamên ku ji nav wan hatin jî me pir dît. Hêj wê demê me fêm kir ku rêya me ji hev cuda ye. Paşê jî di zemînên (DDKO) Ocaxên Çanda Şoreşgerên Rojhilat û pey re jî (DDKD) Komaleya Çanda Şoreşgerên Rojhilat de kom bûn. Bi şêweyek pir sexte hewl dan xwe bi navê netewperest û sosyalîst bidin diyarkirin. Wan berjewendiya malbatên xwe li ser berjewendiya gelê me ferz dikir û bi qasî misqalekê jî ji vê aciz nedibûn. Ber bi roja me ve jî tê dîtin ku, bi qasî ji bo berjewendiya malbata xwe bikarin netew ekê tine bikin ketiyên berjewendiyane. Ji serkêşê wan heta herî biçûkên wan wisa ne. Ev bandorek ji derveyî me bû. Her wiha di van mijaran de gef li me dixwarin. Digotin; “Hûn nikarin vê nêzîkbûna çînayetî ve bikevin Kurdistanê, dê ketina we belayek mezinbe. Hûn ê li Kurdistanê weke şûrê Demokles bîn hejandin.” Pir vekirî dihat dîtin ku dê li hember derketina partiya me jî ne rêzdar bin. Bi nêzîkbûnek dij demokratîk derfet nedaban pêşketina koma me û derfet jî dîtiban dê tasfiye kiriban.

Kesên ku berjewendiyên malbat û xanedanê esas digirtin, saziyên ol’î jî bi serve zêde dikir. Li hember derketina koma me

ya biçûk jî rêzdar nebûn û tehemûl nekirin. Berovajî ji bo bifetisînin, çi ji destê wan hat kirin. Paşê jî bi pêngavên provakatîf ên nû ve rêxistin saz kirin. Stêrka Sor jî li ser vî bingehî derket. Em di pêvajoya koma bîrdozî de hinekê bi wan re têkoşiyan. Me bi wêrekî ji wan re got li şûna malbatên qaşo bi şerefin, nav û dengê wan heyî, malbata gelê Kurdistanê û nasnameya wê ya netewî girîngtire, em ê dev jê bernedin, em têkîliyên wisa silaleyan ên paşverû li pêş rizgariya netewî asteng dibînin. Weke tê zanîn, her çendî sînordar jî be, me di pêvajoya têkoşîna komê dekarî xwe bigihînin koma gel.

Me di salên 1978’an de bi vî şêweyî partî saz kir û li ser vî bingehî rêya rast dîtibû. Me ji gelê Kurdistanê re nêzîkbûna rast esas girt. Di vê wateyê de zêde rola bandora derve nebû. Heman şêwe di nava şovenên civakî, ango komên bi bandorên kemalîst de jî hebû. Me nêzîkbûnên wan jî bi têkoşînek bîrdozî ya bi bandor ve paşve xist. Me bandor û zexta wan a li ser xwe vale derxist. Bi vî rengî her çendî sînordar jî be me şansê rêyek serbixwe bidest xist. Me li ser vî bingehî partî îlan kir û bi wêrekî dest bi hewldana rêxistinkirinê kir. Ancex wê demê qonaxek aloziya rêxistinî, ya rastî, rast nêzî rêxistinbûnê nebûyîn derket holê. Me nekarî erka rêxistinbûnê bi çareseriyek serkeftî ve pêk bînin. Paşê jî ev rastî pir vekirî derket holê. Ev rewş li dervî welat jî berdewam kir.

Me naveroka pirsgirêkên heyî li ser bingeha dahûrînên Konferansa 1. û Kongreya 2. hinek din vekirin. Xet rast tê dîtin, em li ser bingeha xetê biryar digirin û her kes jî vê “erê” dike. Lê mixabin dema em dixwazin bixin meriyetê kes xwedî lê dernakeve. Lewra em jî zêde li ser pirsa çima wisa dibe rawestiyan. Wê demê jî me dît, hewl didin xisletên ku ji malbat û civakê hatine girtin, di nava partiyê de jî bidin jiyîn. Nexasim ger kesayet li dervî welat hinekê jî derfeta jiyanek rehet dîtibe, zêdetir hewl dide van xisletan bide jiyîn. Van meylan ne dikariya xwe di

nava qonaxa koma bîrdozî de bide der. Wê dem ê ne gengaz bû. Dema ku pêwendiya fermî ya rêxistinî pêş ket dikarin xisletên xwe bidin ferzkirin. Provakasyona sala 1983'an, heta derketina di sala 1982'an ji girtîgehê û paşê li Ewrûpayê xwe da der, xwest bandorên xwe diyar bike, me hewce dît ku em çêkera xwe ji nû ve ber bi şoreşgeriyê ve bimeşînin. Dema me di nava partiyê de ji nû ve şoreşgerbûn pêş xist, em li bendê bûn ku kesên me rêheval dizaniyan xwe ji vê re baş amade kiribin û di rojên zehmet de, baş xwedî li erkên xwe derbikevin. Mixabin me dît ku xizmeta ku me ji kesên derkevin dervî welat re kirî û ji bo vê jî me ti dudilî ne jiyayî, bi çoşek mezin xizmeta wan kirî, ji hêla wan ve pir xirab hatiye bikaranîn. Hesabên wisa erzan li ser kiribûn, li hember xeta PKK'ê pir biçûk diman. Me dît ku nermik nermik bin kayê re lîstokan amade dikin, temamî paşeroj gur dikin, navenda me ya partî asteng dikin û ber bi nêzîkbûnên tesfiyekarî ve çûn.

Hûn ê niha bêjin çi eleqeya van xalan bi pêwendiya malbatê re heye? Pêwendiya ev e. Ji ber zilam tam pêşmînaka vê ye û çi ji malbatê girtibe wê derdixe pêşberî me. Hinekê derfetê pêşketina PKK'yîbûnê heye. Lê belê, bi navê pêkanîna pêngavek Rêbertî dibêjin; "Ma ji me baştir rêber dibin" û derdikevin pêşberî me. Ya rastî hêj di wê demê de, di cewhera Rêbertiya PKK'ê de xizmetek mezin hebû. Rêbertiya PKK'ê bi şehîd û kedkarên xwe ve tevgerek xizmetê ye. Lê me dît, ev li şûna xizmetê, hewl didin sûd ji kariyer, nav û şan werbigirin û dizîve hinek quncikên sereke ji xwe re bigirin. Bi ji hin hesabên zirav ên dijwar parastina têkîliyekê bigirin, heta serweriya partiyê helwestên cur be cur raber kirin. Di çarçoveya van helwestan de xwe li gorî min sazûman kirin. Di nêzîkbûnên xwe yên ji Rêbertî re, hewl didan bikevin çav û bixapînin wisa encam bigirin. Elbet sexte bûn. Ev jî diyar dikir ku ne xwedî nêzîkbûnek rêhevalin. Xisletên pir cuda yên çînayetî hebûn, nêzîkbûnên pir cuda hebûn. Bes di axaftinê de xwe ji me hemûyan baştir PKK'yî didan diyarkirin! Lê belê

dema berpirsyariya PKK'ê û rêbertiya wê ya fermî pêş ket, rêxistin jî ket nava sazûmaniyek rast û fermî, êdî van digot; "Hûn nikarin gavekê ji me pêşdetir biçin" an jî "heta em erê nekin ti kar nayê kirin." Heta provakasyona dawî jî rêbazên hemûyan jî wisa ye. Provakatorê dawiyê digot; "Ma kesek ji me baştir xwedî lê derdikeve heye? Herî baş em ji siyaset, sosyalîzm û rizgariya netewî fêm dikin." Lê mixabin van ketiya di gava xwe ya destpêkê de jî berê xwe dan hêzên emperyalîst. Qaşo li herêmên emperyalîst ên ewle de xwe vedişêrin. Qaşo hêjî li cihê veşartî li pey hinek karên dine! Em ê hemû çîroka jiyana van jî vebêjin.

Li Kurdistanê bûna hêz, di nava civakê de bi bandorbûn, her tim bi xêra dewletê çêbûye. Lê divê hemû jî vê rastiyê baş rave bikin. Em ê ne bihêzbûna di xêra malbatê de, ne jî bihêzbûna di xêra dewletê de ti caran nepejirînin. Ger we pêşketinek bi bandora malbata xwe ya feodal û sipartina dewletê ve jiya be û ev di dil û mejiyê xwe de pejirandibe, misoger otorîteya şoreşgerî ya proleter bi we re bihêz nabe. Me ev rastî di pratîka jiyana xwe de baş dît. Ya rastî pevçûn an jî xala tolhildanê di vir de derdikeve holê. PKK'bûna jixweber, ne PKK'bûnek aqilmende. Ji ber ku hûn hêzbûna xwe ne bi bertekên li hember dewlet an jî mîrateyên feodalî çêdikin, li ser bingeha pejirandina van saz dikin ev pevçûn tên jiyîn. Ev pir girînge. Ger hûn hêza xwe ji çîna bindest û xeta şoreşgerî û otorîteya proleterya bikar bînin, li ser vî bingehî hewl bidin, wê demê mirov dikare behsa şoreşgerî û otorîteya proleterî bike. Mirov ji kesên wisa pêş dikeve qet natirse. Lê belê em ji fikir bigirin heta hunera axaftinê û rêvebirina mirov, ger hûn bi reftarên ku malbatê fêrî we kirî ve tevbigerin, an jî we di saziyên dewletê de ev xislet bidest xistibin, dê ev jî kesayeta we yan ber bi ferasetek karmendek bîrokratîk ve bibe, yan jî ferasetek feodal-burjuvaziya biçûk ve bibe. Di encamê de jî hûn ê bi partiyê re rûbirû bimînin.

Qaşo PKK'bûna derketî holê bi temamî wisa ye. Lewra dahûrînên PKK'ê dîrokî ne. Ango rastiyek pir zelal derdixe holê. Ji ber vê hûn ê bizanin zirav lêbikolin. Min ev tenê weke teorîk şîrove nekirin. Min her tişt di hemû şaneyên xwe de jiya, li ser nirxên mirovahiyê pir rawestiyam, wisa biryar daku misoger divê di derbarê diyardeya azadbûna mirov de hilbijartinekê bikim. Hinek derketin, gotin bandorên kemalîzmê dijîn. Tişta em dibêjin bandora kemalîzmê ye, bandora Komara Tirke. Burjuvabûna kapîtalîzma Tirk, çand û civakbûna wê, siyasîbûna wê û nirxên wê yên exlaqî jî ji bo xwe weke amûra bihêzbûnê bikar tîne. Lewma li gorî wî jî pîvanên civaka me her tim paşverû ne. Mirovê Kurd her tim xwe dixe dewsa hemalan de. Ew jî her tim xwe dixe dewsa mirovên bijare de. Elbet dema mezin jî dibe, otorîteya partî jî qet napejirîne. Ev di rexnedana hinek hevalên ku eslê xwe Tirkin de baştir derket holê. Ne weke şoreşgerek proleter, ger weke burjuvaya biçûk hatibin, van xwe pir zêde bi şovenîzma netewa serdest ve girê dane. Bûne xwediyê ferasetek xwe her tim yê herî baş û jor de dibîne, lê li hember xwe jî mirovê Kurd her tim paşketî dibîne. Li gorî van hevalan mirovên Kurd nikarin bibin xwedî ferasetên bijare yên pêşketî. Qaşo ev bi xwe jî hêj dema dayîk bûyî rêvebere, lewma divê di nava PKK'ê de her kes li gorî reveberî û rêbertiya wî tevbigere.

Me di dahûrînên dawî de jî ev şîrove kirin û di rexnedayînan de jî li xwe mukir hatin. Bêguman ev ji malbata Tirk –malbata kemalîst- bandor bûne. Van partî zêde mijûl kir. Hinek heta mirina xwe bi van bandoran ve girêdayî bûn. Me jî di vê mijarê de got; "Hûn nûnertiya şovenîzma civakî ya hundur dikin. Hûn naxwazin dev ji feraseta Tirkbûna mezin berdin. Dixwazin mezinbûna netewa serwer di nava partiyê de jî bi rengên cur be cur hîn ziravtir bidin berdewamkirin." Li ser vî bingehî em bi ser wan de çûn. Bi rastî jî xwediyên van ferasetan zerarên mezin dan partiyê. Xebat birêxistin nekirin, xeta taktîkî

bikar ne anîn û her tişt bi kesayetên xwe ve girê dan. Di vê mijarê de hewl dan min jî bikar bînin. Tevî ku ne dikariyan zikê xwe têr bikin, pir bisteh hewl dan me jî bikar bînin. Me jî bi rexneyên hûn dizanin ên weke; "Nekin, ev rewşa we ne rasteqînî ye, rewşa we dest nade. Kedên mezin ên partiya me tertûbela nekin" li wan kir. Hûn jî dizanin hinek encam hatin girtin. Îro encamên nêzîkbûna me ya rast baştir derdikevin holê. Ji hêla din ve jî kesên ku ji malbatên hevkarên feodal hatîn û nexasim hinekê jî silaleya xwe ya hevkar û feodal pêş xistîn, hîn zêdetir xeternak bûn. Bi me re ketin nava hesaban. Hêj di destpêka rê de hinek ji wan got; "Ma filankes kiye, li Kurdistanê siyasetek wisa ava dike." Paşê di nava partî de jî gotin; "Em dikarin rêbertiyê bikin, hûn ê bi me ve girêdayî bin, em bimirin jî dev ji evîndariya rêbertî bernadin." Bi vî rengî weke dîn û haran nêvengek provakatîf amade kirin, her cure kêmasî û xirabûn pêş xistin. Di vê mijarê de har dibûn. Ronakbîrî, zelalbûn û hêza rêxistinê ya nava partî derxistina holê de, me ji ber van gelek zehmetî jiyan kir. Me astengiyên wan dît. Em bi hevalbendî nêzî hemûyan bûn. Me her tim ji xwe pirsî gelo dibe ku evqas nêzîkbûnên bi nakok derbixin, berhem ên wan ên kevin hene, ma dibe ku wisa bikin? Mixabin zilaman ji mêj ve xwe ji van karan re amade kirine. Ne xwediyê xebat û hewldanek başin. Hemû amadekariyên xwe li gorî hesabên rêbertiya burjuvaziya biçûk çêdikin.

Me hêj di wan salan de ev got, ji bo em ji xwe re nasnameyekê peyda bikin, ji xwe re cihek bi qasî gorekê peyda bikin, kevirek ku me serê xwe lê nedayî nema. Elbet em van rêyan vedikin. Tenê tişta ji begê me re jî dimîne bikeve ser wê rêyê û bimeşe. Hem jî bi şêweyek herî rehet. Hinekê jî xwe li gorî rewşa heyî rêkûpêk dike û helwesta xwe ya jiyanê wisa dihilbijêre. Qet ne di ferqa zanebûna keda pêşeng çiye, keda şoreşgerê pêşeng çiye, serkeftin çawa çêdibe, dê bi vê re çawa hevaltî bê kirin de ye. Ji ber her tişt amade ye. Berê pêşî rê hatiye

diyarkirin. Ji her kesî re tê gotin, fermo werin, her cure pişgiriya me amade ye. Wisa nêzîkî me, rastiya nav-neteweyî û rastiya civakî dibin. Lê di rastiyê de li herdu qadan de jî hinekê rê vekirin, hewldanek awarte dixwaze. Yek ji wan jî ne ketiye ferqa van û qaşo hemû jî di bin navê hevaltiyê de bi me re meşiyane. Bê siûdiya me jî di vê mijarê de derdikeve holê. Qaşo ev hemû jî hevalên me yên herî kevinin. Em rê vedikin, wan rehet dikin, ji bo zehmetiyan nejîn em her cure zehmetiyê jî razî dibin. Vêca ji bo çiye? Pir vekiriye, pêdiviyek hevalbendiyê ye. Em her tim hewl didin wisa ava bikin. Lê mixabin ew jî cuda şîrove dikin. Vaye şoreşgeriya xwezayî û PKK'bûna xwezayî nêzîkbûna me ye. Di vir de zehmetiyek wisa zêde jî nîne û heta dikare di asta herî jor de jî bimîne. Em ji bo vê rewşê dibêjin; "Hûn zarokên nesekinîne. Temenê we 35 salî ye, weke zarokên mezin –zarokên cuce-dixwazin xwe li ser milê me bidin gerandin." Nexasim di diyardeya Rêbertiyê de ev rewş dijwartir tê jiyîn. Ya herî xirab jî her tim paşve dikişînin û ber bi jêr ve dikişînin. Em hewl didin PKK bilind û mezin bikin, ew jî her tim dibêjin; "Na, serê ben di destê me de ye." Gelo ev ben çine? Piraniya van benan ji hezarê salan ve benên ku me bi êl û binemaliyên feodal ve girê didin ên paşverû ne. Me ji mêj ve hewl daye van benan qut bikin. Ev ben, benê kemalîzmê ye, dê me ber bi darvekirinê ve bibe. Em hewl didin bi qutkirina van benan ve pêşve biçin. Ev dilketinên wan û bandorên wan ên bi xwe re digerînin. Ev şêwaza pêşketina wan a virde û wirde ye. Nêzîkbûnên dogmatîk ên bûne qalibin. Heta dawî bi israrin. Bi rastî jî hevkarên di rastiya Kurdistanê de heyî û hinekê jî çiqas bandorên ji hêla Komara Tirk ve hatîn xwedîkirin hebin, di kesayeta wan de derket holê. Bi vî rengî hewldan hesab ji me bipirsin, xwe giran bikin, navendbûna partî asteng bikin, pêşiya êrîşên li ser dijmin girtin. Dema di navendbûnê dekarên me giran kirin, li ser qadroyan jî ferasetek weke; "Hûn gundiyên duh ên paşketî ne, belengazin, misoger li gorî me tevbigerin, heta

em erê nekin hûn ê nebin xwediyê ti reftar, bilindbûn û kariyerê. Ger em nebin camêr, em ê nehêlin hûn jî bibin camêr" an jî "ger hûn gavekê jî ji me pêştir bavêjin, em ê ruhê we bistînin" dan meşandin û ev ferz kirin. Piştî demekê şûnde me dît ku, li ser gelek endamên me yên qadro texrîbatên pir mezin çêkirine. Van qadroyên me jî hinekê serî ji bandorên Komara Tirk û feodalî re tewandine, ji ber ku wisa hatine fêrkirin, ji feraseta rêbertî û rêveberî jî wisa fêm kirine wan jî digot; "Navend mafê vane." Şûna xwe ji van biparêzin, bûn amûr. Ji boem van qadroyên xwe bidin jiyîn, gelek hewldanên ku neyê bîra kesî me meşandin, lê ew di bin bandora wan de dimînin. Ji ber xisletên gundî yên kole, kesayeta di nava malbatê de weke koleyan jiyan kiriye û serî tewandiye, di nava partiyê de jî bûn evd û koleyên kesên xwediyê van bandoran. Em ji aliyekê ve dibêjin xizmeta ji qadroyan re wisa tê kirin, şoreşgeriya proleter û rêbertiya sosyalîst wisa ye, ew dibêjin; "Ez ji mezinê xwe wisa fêr bûme, vê bijîm." Elbet van nêzîkbûnan em pir tengav kirin. Li hember van pirsgirêkan jî zanebûna konferas û kongreyê zêde derneket holê. Li vir her tişt hinekê jî sergirtî ma. Weke tê zanîn em di sala 1983'an de li beramberî pir cidî aciz bûn. Me di broşura bi navê "**Pirsgirêkên Me Yên Pêşketinê Û Erkên Me Yên Şoreşgerî**" de ev rewş berfirehî vekir. Her wiha me hewl da li ser bingeha pirtûka bi navê "**Pirsgirêkên Kesayetî Û Xisletên Milîtanên Şoreşger**" çareseriyekê ava bikin. Me jî got, li dijî her cure xirabiyan em têkoşîn û ala partî bilind bikin. Tevî van hemûyan, me nekarî pêşî lê bigirin û heta partîbûnê me nekarî hewldanên van ên dîn û har asteng bikin. Dema ku li Ewrûpayê hêviyek ji emperyalîzmê girtin, yekser hewldanek ku pêşketina partiyê hedef digire meşandin. Pêşketin û rêbertiya dîroka PKK'ê ya bi hewldanên mezin hatiye avakirin, van an bi hev re, yan jî di bin navê şerê beramberî hev de, hewl dan ji çil hêlan ve vale derbixin. Em bi gelek ji wan re axivîn û tika ji wan kir û me got; "Nekin, hûn

evqasî li hember kedê ne biyanî ne, li ser me kiryarên îmhayê hene, ev sal, salên mirin û mayînê ne, ger hûn nikarin tiştekê bikin, qet nebê hinekê rêzdar bin.” Tevî ku me li ser vê mijarê hewl da wan qane bikin, xeta partiyê li aliyekê, ferzkirinên wan jî li aliyekê man. Weke tê zanîn paşê jî, em neçar man hinekan di asta fîzîkî de jî tasfiye bikin. Hinek jî vekirî radestî dijmin bûn. Bi rastî jî her yek ji wan ji bo PKK tine bikin, xwe endam dibîne, her kesê dijberî tevgerê tevdigeriya digot; “Ez ê tine bikim.” Rewşa wan li zindanê, çiyan û dervî welat jî heman tişt bû. Her yekê xwe ejderhayek dît. Weke tê zanîn me jî li dijî van xeta partî ferz kir û hewl da hinek encaman bigirin.

Van kesan heta ber bi pêvajoya Kongreya 3. ve bê dil bûn. Gava me xwest rêyek çareseriyê pêş bixin, me ev got; “Me PKK li ser milkê we yê tabûkirî ava nekir. Em li welatê gel, bi tevkariya gel, keda pêşengên wê re avahiya partî saz dikin. Ev girînge û pêwîste hûn nêzîkbûnek baldar raber bikin.” Lê mixabin encam ji ya beriya wê ne cudatir bû û nêzîkbûnek weke “milk jî ya me ye, avahî jî ya me ye, tişta dixwazî bêje” raber kirin. Weke tê zanîn me, di vê mijarê de hinek xistin tecrîdê. Mixabin tecrîd, girtin û darezandin jî feyde nekir. Zilam dîsa jî xwediyê îdîaya xwe bû. Diyar bû bandor pir bi rik bûn. Dema em li ser vî bingehî bi malbata PKK’ê re mijûl dibin, em hewl didin malbatek gel ava bikin. Em dixwazin, hemû bêriyên gelê Kurdistanê, berjewendiyên jiyanî û pêşveçûyî, di xwe gihandina azadî û welat de çi hewce dike, di nava malbatê de nûnertiya wê bikin, avahiyek dikare xwe li hember biparêze ava bikin. Mixabin li şûna vê bandorên ku berjewendiyên malbat, silale, reîs ên her cure kevnar esas digire derketin holê. Me got dê malbata wan li aliyekê dihele, hevbeşiyê esas digire li ser vî bingehî ava bibe. Di vê mijarê de şerê min û te yê li ser vî bingehî, şerê PKK’ya te û ya min nabe. PKK’yek ku her kes li gorî xwe fêm dike nîne. Lê wan got; “Her kes dikare li gorî xwe PKK şîrove bike û bijî.” Ev

jî keda hevbeş dikuje. Tevgera proleter, tevgerek hevbeşe. Misoger destûrek ji rêzê jî ji van ferasetan re nayê dayîn. Ji ber dê pêwendiyan xirab bike û lez ber bi parçebûnê ve bibe. Ev jî di nava me de yeksan tasfiye ye.

Vaye nêzîkbûnên wan ên wisa xwe didin pêş hene. Hêjî hûn nirxandinên weke; "Di rastiyê de Kurdistan di bin venêrîna me de bû, çawa çêbû vî zilamî ji me dizî" dixwînin. Dipirsin; "Gel çawa xapand? Bi rastî jî wisa ye? Di vê mijarê de hewldanên mezin tên kirin. Berhem û pişgirî tev li holê ne. Îdîayek wan jî wisa bû, digotin; "Ma çawa dibe qadro, kedkar û navdarên weke me bê bandor dimînin?" Mixabin berovajî vê derbasdare. Bi salane weke putekî li hember me disekinin û her cure durûtiyê dikin. Paşve jî her cure fitne û fesadî dikirin û bi çarçavî îmhabûna me dihat payîn. Dê niha jî bê gotin; "Çi eleqeya van bi mijara malbat û jinê re heye?"

Eleqeya xwe ev e; wisa bi bandorên zemîna civakî ve xwe di nava partiya me de didin der. Dema em îdîayên vê şêweya rêbertiyê rexne dikin, me her tim got; xwe weke rêberekê derxistina holê zêdetir, xisletên teorîk û pratîk ên vî karî di milîtantiya xwe de ava bikin. Hewldana vê raber bikin û sextekarên di vê mijarê de teşîr bikin, naverastê ji van re nehêlin û pêwîste ji rêbertiyên rasteqîn re derfetê berfirehkirina qadê bê dayîn. Hêjî rewş wisa ye. Rewşa min, ne di şêwazek avakirina rêbertiyek yekpare de ye. Zêdetirîn mercên derketina rêbertiyek saxlem amade dike. Karên ku tên meşandin tên zanîn. Dahûrînên teorîk jî pêşiya van vedike, dihêle ku hewldanên pratîkî pêşve biçin, sextekaran derdixe holê, teşîr û tecrîd dike, kesên ku dixwazin pêşketinek rasteqîn jî raber bikin re derfetê pêşketinê dide.

Dema em ji nêz ve rewşa gelek ji we dinêrin, em dibînin ku, we berê nedikariya du gotinan bikin, lê niha ji hêla hunera rêbertiyê ve her çendî sînordar jî be jêhatiyên we derketine holê.

Ev jî wisa jixweber çênabin. Ji bovê ji dil û can rêya we hatiye vekirin. Ked û hewldana we ye, lê weke tê zanîn tîpê Kurd tenê weke hemalan kar dike. Her tim birçiye, feqîre, di diyardeya rêbertî û siyasetê de sifire. Bi gelemperî tevî evqas xanedan û hevkaran PKK di rewşek rêbertiyê de pêşxistin ne hêsane. Bi serê xwe bûyerek mezine. Hem ji hêla hunerî, hem wêrekî û hem jî fedekariyê ve pêwîste mirov cidî li ser raweste. Hûn jî dizanin tevî we gelek ji we dîsa jî tê pêşxistin. Nabe ku hûn di vê mijarê de bêjin em vê napejirînin. Em gelek ji we re dibêjin; “Ha ji we re çek û heta dawî bi wêrekî şer bikin.” Lê belê bersiva vê jî li gorî tê xwestin nayê dayîn. Ev jî ne hêjayî me ye. Bi nêzîkbûnên weke ez mirovek ji rêzê me, ev kar wisa nayên meşandin. Bes rewşa gelek hevalan wisa ye. An dibe serkêşê zîrevanekî, yan çawîşê cendirmeyekî, yan jî pêşnûmeyên axayan. Yek ji van jî nayê pejirandin. Ez jî ji bo xwe nabêjim fermandarek başim. Lê belê hewl didim wisa karên xirab jî nekim. Xwe bi şêweyek çewt jî ferz nakim, navendê ji rêberên sexte re jî nahêlim. Feraseta gelek ji we ya egîdiya gundîtî derbedere. Hûn jî dibînin em di vê mijarê de zehmetiyê dijîn. Di vê mijarê de çi tiştê bê kirin hatin bicîhanîn. Avakirina bawerî, avakirina nirxên madî, çek û egîdî hwd tev xizmetê ji derketinên rêberî re dike. Lê ma em dikarin her tiştî jî bikin? Ma em dikarin dilek egîdî û mejiyek jîr bi we ve bikin? Elbet na! Divê ev xislet bi kesayeta we bi xwe re hebin û jidil bi we re pêş bikeve. Niha li vir jî em hewl didin xîtabê van xisletên ku pêwîste bi we re hebin bikin, van pêş bixin û bikin hêza çareseriyê. Rêxistinên din di vê mijarê de ne ti tiştin. Deka hinekê jî hesabê hêza PKK’ê bikin. Hinekê jî pevçûnên me yên bi dewletê re raçav bikin. Hinekê jî rewşa wan rêxistinên din, hûn ê bibînin ku ew hemû jî bên cem hev, nikarin nîv demjimêrî li ber xwe bidin. Ev pir vekiriye, PKK wisa jixweber li ber xwe nade.

Deka em rewşa gelek hevalan berçav bigirin û vê bipirsin. Gelo bandor û otorîteya PKK nebe, dê xizmeta we, ji hêla

rêxistinbûna plansazî û zanebûnê ve têra rizgarkirina rewşa heyî bike? Jixwe hesabê vê nayê kirin. Kesên nekarin hesaba vê ya herî jêr de jî bike, dev ji fermandariyê berdin, nikarin xwe rizgar bikin. Em ê dema pêş hinek ji we di dahûrînan de bigirin dest û bipirsin tu çawa li ser lingan mayî ji me re rave bike. Em dizanin ku dê hûn di ravekirinê de zehmetiyan bijîn. Ji ber jixweber li ser lingan nemane. Hinek hevalan digot; "Xêra çiyan em mane." Mirov çawa dikare bipejirîne xêra çiyan li ser lingan bimîne? Divê mirov bi dil û mejiyê xwe li ser lingan bimîne û vê esas bigire. Gel em hemêz kirin, ev nebûya me nedikariya 24 demjimêran jî sax biman. Wê tu gel li ser lingan bigirî, rakî serhildanê, biparêzî û xwe jî weke zarokekî nevêjî hemaza wê. Ma berovajî vê hêjayî rêberane? Mixabin ev derketiye holê. Dema diçin cem hezekî yekser dikevin bin bandora wî. Vêca dema wisa jî dibe, rêbertî jî pêş nakeve. Ev xislet bi we tevan re hene. Em jî hewl didin van derbas bikin.

Gelo em ji vê hêlê ve karbidestin? Na, lê em di xalekê de jî baldarin. Ti mafê me nîne ku em ji esasên pêşketinê dûr bisekinin, pîvanên esasî winda bikin, pir bi dilnizmî be jî xwe winda bikin, hêza fikir-gotin-dil heta dawî bikar neyînin. Lê hûn qet van hewce jî nabînin. Ya hûn dibêjin "ez paşa me" yan jî "ez koleyê kevnarê me, destê xwe li min nede." Ev ne rêya derketin û çareserî ye.

Me beriya niha behsa xisletên ku ji malbatê hatine girtin kir. Me behsa bandorên ji civak û dewlet hatine girtin, ferasetên namûs û şanasî, xisletên li ser vî bingehî ava bûne kiribû. Wexta hinekê bi ser de diçî, yekser dibêjin em evqasin û dest bi girî dikin. Ev jî rewşa heyî rizgar nake. Ger li Kurdistanê rewşa rêbertiya gel ava nabe, rêberên gel berfireh pêş nakevin neyê derbaskirin, rêbertî ava nebe, ne rizgariya netewî, tenê nefsa kes jî nayê parastin. Kûçikek faşîst dikare bikeve nava we û hemûyan tine bike. Dê hingê çi bibe, hûn ê xwe li hemberî kî biparêzin?

Em rewşê mezin nakin. Hûn tev di qonaxên herî bi êş û zehmet de hatin. Hêjî zehmetî pirin. Lê weke ku me hêviya xwe winda nekiriye, em pir li ser rêyên pêşketinan jî rawestiyan. Heval jî neçarin serê xwe li ser van mijaran bêşînin û hewldanek hûrûkûr bikin. Pêwîste misoger bi armancên dijber û di heman demê de bi şêwaza xebatek hemalî nêzîkbûn ji hunera rêbertiyê re neyê kirin. Ji ber bi vê nêzîkbûnê mirov nikare di şoreşê de di karê rêbertiyê de gavekê jî pêşve bavêje. Dê her tişt hilweşe. Ma rewşa yên din çima wisa ye? Ji ber ku wan nezanî gava xwe ya destpêkê rast bavêjin lewma wisa bû. Niha jî em hewl didin van bandoran bişkînin. Bandor û çewsîneriyek giran a van kevneşopiyan li ser we heye. Ger binesaziyek ku em baştir bîn fêmkirin û qadroyên wêrek û baştir fêm dikin hebûna, me dikariya hîn kûrtir bi ser pirsgirêkan de biçin. Lê gelek ji we weke girêka vê kevneşopiyê ye. We têkîliyên wisa ava kirine, em çend ji we parçe bikin dê hemû birûxwin erdê. Her roj dibêjin; “Ez nayêm dahûrandin, xetimandinên min hene, nizanim girêka kor ez wisa girê dame” û şev û rojên xwe tenê bi van derbas dikin. Min ev gotibû; “Li cem we kêr heye, netirsin, wan jêkin û bavêjin!” Gelo beşên ku bên jêkirin çine? Ew xisletên ku we sed salan paşve bixin û bi dijmin ve girê didine. Mixabin hûn di vê xalê de ne wêrekin. Em hewl didin van xisletan ji tevahî gel û çêkerê re vebêjin û bikin malê herkesî. Me ev jî bi hostatî û bi qasî li ser we bandor bike jîndar kir. Bes di vê mijarê de dijmin dest davêje we û bi navê “zarokên malbatên me” bangî we dike. Bangên ku digihijin her malbatekê hene. Malbat jî bandor dibin, qaşo hewl didin we ji Rêbertiya PKK’ê rizgar bikin. Ji bo me jî di van hemû xalan de çareseriyên rast pêş xistin, me karî em di PKK’ê de pêşveçûnê bikin. Divê li ser bandora jinê baş bê hizirîn. Çi di nava malbatê, çi jî civakê de dibe, ji hêla erênî ve sûd wergirtin û nirxandin, li ser bingeha derbaskirina neyêniyan jî nêzîkbûnek hewce dike. Me di nirxandinên beriya niha de diyar kiribû, lewma ez ê cardin

venekim. Tenê weke cînsê beramber nêzî rastiya jinê nebin, rastiyê ji cewaziyek cînseltî wêdetir weke xalek dîrokî, em ê weke zemînek ku li ser hemû qirêj û zenga civakê, hemû durûtî, veşartin û vekirîbûna mêtîngeriyê û hwd lê kom dibe bigirin dest û yekser li pey wê jî derbasî ferasetên şaş ên li ser me serwerin bibin û li ser wan rawestin.

Ji bo em şoreşgerin, pêwîst dibînim bi wêrekî bêjim; bi rastî jî ferasetên pir çewt û şaş hene. Ger nêzîkbûnek herî biçûk a şaş ji hevjîn an jî malbata we re bê kirin, hûn ê yekser kêrekê bigirin destê xwe û êrîş bikin ne wisa? Gelo kesê ku vê neke heye? Misoger tine ye! Dê bê gotin nizanim ev tişt ji dayîk, xwîşk, hevjîn, dergistî yan jî dosta min re gotin, min jî dest avêt çeka xwe. Ev jî piranî di nava civaka me de bi kuştinê encam dibe. Bal bidinê, diyardeyek ku li Ewrûpa pê dikenin, li cem me misoger bi çek tê çareserkirin. Ev cewazî ji kur derdikeve? Ev cewaziyek girînge. Di rastiya jin û zilam de bandorbûnek we ya herî biçûk we dixe û dibe ku we dixe rewşek wisa êdî hûn nekarin rabin ser xwe. Vaye rewşa jin û zilamê di civaka me de wisa ye.

Niha jî ez ê ji we re behsa encamên pratîka xwe bikim. Têkîliyên min jî ên wisa çêbûn. Tevî ku em di têgihiştin û pêşxistina hinek têkîliyan de ne kûr bûn, dîsa em pir siyasî nêz bûn û me dizaniya ku ji hêla rêxistinî ve bikaranîna cînseltî xetere. Zilam wisa pê ve hatiye girêdan, di vê wateyê de tam koleyeke û di nava malbatê de jî rewşa wî wisa ye. Zilam wisa bi malbat, zar û zêçên xwe ve hatiye girêdan, dikare ji bo rehetiya van çil welatan bifiroşe û mirovan bikuje. Niha dê di vê xalê de bê gotin, ma em tiştekê nekin? Na, ez vê xalê nîqaş nakim. Xala girîng ev e; em bi diyardeyek wisa ve hatine girêdan, em tenezil nakin ji bo berjewendiyên jiyanî gotinekê jî bikin. Lê ji bo têkîlî û saziyek herî kevin û şaş em dikarin xwe bi zincîran jî bidin girêdan. Ev feraseta namûsê wisa hatiye rûniştandin, dikare çil hukmên mêtîngeriyê li ser ava bike. Dema em dibêjin “stargeha

dewleta Komara Tirk a herî saxlem malbate" ne vala ye. Li Kurdistanê jî kûrkirina vê ne ji rêzê ye.

Îdîaya serdestiyê ya dê û bavê me li ser me ewqas mezine ku, li gorî wan ji ber ku em welidandine pêwîste em sermaya wan bin. Ev misoger ferasetek feodalî ye. Zarok teqez di bin venêrîn û teserûfa dê û bav de ye. Heta bimire jî wisa ye. Jixwe dijberiya me ya destpêkê di vê xalê de pêş ket û yeqîn dikim şoreşgerbûna destpêkê jî hinekê wisa bi van bertekan xwe dida der. Berteka min a li hember pirsgirêkê pir ecêb bû. Dibe ku hinekê bêrêzî bû, lê di cîh de bû. Min ji wan re got; "ka binêrin hûn van çîçikên vê mirîşkê dibînin? Ew çawa tiştek xwezayî be, rewşa min a li hember we jî wisa ye. Min ji we re negot min biwelidînin." Nêzîkbûnek wisa bertekê bilêv dike û hinekê jî acizbûnê rave dike. Yeqîn dikim hinekê jî dijberiya li hember feraseta sermayebûnê rave dike. Mirov wisa xwedî li ewladê xwe dernakev e, pêwîste ewlad bi şêwazek rast bên mezinkirin. Lewra divê pêşeroj bi şêwazek zanebûn û berpirsyar bê diyarkirin. Li gorî ku ev nîne, ne raste wisa zêde îdîaya mafê li ser zarokan ferz bikin. Min ev got û rexneyên cidî bûn. Elbet ji bertekên ewladên wisa re jî dibêjin; "Ewladên bêxêr." Dema mirov hinek din li dijî pêwendiyên feodalî derdikeve, yekser lenet dikin. Di vê xalê de mirov pir tengav dikin, tine dikin û malbat serdestiya xwe li ser zarokan ferz dike. Fiqîrî heye. Mane li derdora civakî saziyên stargehên zarokan nînin, daku bikare li wan deran derfeta jiyanê bibîne. Derfetek dewletê ya din jî ku binase nîne. Di vê rewşê de tenê girêdana bi malbatê ve dimîne. Jixwe ger ew jî teqez têkîliyên feodalî li ser te ferz bike, zarok tine dibe.

Ma çima zarok li cem me nikarin bibin şoreşger? Çima kesayet wisa li cem me çewtin? Ji ber hêj wexta dergûşê ve wisa tên mezinkirin lewma. Piştre jî em diyardeya we ya têkîliya bi jinekê re yan jî zewaca we bihizirin. Li hemû têkîliyên ku tên pêşxistin binêrin. Sedî sed di bingeha hemûyan de bûna hemal

heye. Zilam zêdetir kole ye, jin ji wî kembaxtire! Qaşo dizewicin, lê di cewherê wê de hemaltî heye. Her çendî bi êş jî be, di vê mijarê de rewşa gelek ji we heman tişte. Gelo di vê mijarê de kîjan rêgeza şoreşgerî esas hatiye girtin? Mixabin rêgeza şoreşgerî esas nehatiye girtin. Ev hemû jî bi rêgeza xanedan, rêgeza malbat, bandorên derdor û kevneşopiya civakî hatine pêşxistin. Li Kurdistanê jin û zilam bê zimanin. Dev jê berdin zilamê Kurd nûnertiya azadiyê bike, ji bilî endamek feodal ê zirzop wêdetir ti halê wî nîne. Zilam di vê xalê de zêde feodale, jin jî bêçare ye. Jin nikare bi ti halî têkîliyek azad diyar bike, kêleka vê re jî derbas nabe. Ger derbas bibe jî dê çawa be? Ger di van mijaran de bi romantîzm jî nêzî bibe, dikare nêzîkbûnên me esas bên girtin û gelek çîrok û roman bên nivîsandin. Ez van pirsgirêkan hêjî weke mijarên pir zehmetiyan dijîm dinirxînim. Bi rastî jî weke qadaku mirovên me dixe dinirxînim. Sedema vê ya tê fêmkirin heye. Marks dibêje; “Asta azadiya malbatê, asta azadiya civakê diyar dike.” Em jî vê wisa vedibêjin; “Ji ber di civaka me de her tişt di malbatê de bûye girêkek kor, di diyarkirina hemû têkîliyên azadiyê de ev sazî esase û eleqedere.” Lewma me evqasî nirx dayê. Di civakê de bikaranîna çek û kêran tenê ji bo vê bû. Her tişt di vir de kom bûye, sedema hebûn û tinebûnê di vir de ye, ji bilî vê ti saziyên netewî û civakî nîne. Her tişt di vê xalê de xetimiye, di vir de kor bûye. Sedema nepêşketin û paşverûtiya di civaka me de ya herî manîdar û tê fêmkirin yek jê ev e.

Kesê van pêwendiyan pêş dixe misoger xwe xwediyê hinek mafan dibîne. Mînak di malbatê de pêwendiyên serdest dixwazin xwe bidomînin û teqez jî zilam serdeste. Zilam di her tiştî de heta dawî bê sînor xwedî lêdan û dûjîna ye. Vêca wê jina ku pêwîste kesayetek be çawa nêzî vî bibe? Nêzîkbûna wî heta dawî durû û koletî ye. Beriya ku bigihe asta vê kesayetê, heta bêjî kesayeta xwe paş ketiye, di bin her cure ferasetên çewt de ye. Me jî ev weke, li hember serdestiya zilamtiya ku bi temamî xwe

winda kirî û şênber bûyî, ya heyî windakirin pênase kir. Vêca têkîliya azad li kur ma? Kanî têkîliya malbatê ya azadiya civakê diyar dike? Kanî rizgarvaniya netewî?

Ez, hewl didim pirsgirêkê ji her alî ve derbixim holê. Wexta hûn di dem ên pêş de hewl bidin di van mijaran de bibin hêza çareseriyê, ji bo hûn cewhera pirsgirêkê winda nekin van dibêjim. Bêguman em ê malbatên hatine sazkirin rexne bikin. Em ê malbata xwe û yên cuda jî rexne bikin. Rexne, ne înkara malbatê ye. Rexne, ji bo têkîliya rast a xweser derxistina holê ye. Hûn jî di vê mijarê de nebêjin me têkîliya azad pêş xistiye û xwe nexapînin. Heta vî temenê xwe hêjî ji botêkîliyên azad derbikevin holê bi pirsgirêkên wê yên teorîk ve mijûl dibim. Pratîka me wisa ye. Civaka me pir giran vediguhere şoreşgerî. Di vê mijarê de ti kes nikare bêje min mijar çareser kiriye û dahûrandiye. Hinek heval dibêjin ku li hinek qadan têkîliyên azad pêş xistine. Lê mixabin em lê dinêrin, ev bûne çavkaniya têkîliyên bi pirsgirêk û mehfa partiyê anîne. Di zemînên nîv kapîtalîst de, bandorên burjuvaziya biçûk em pir tengav kirin. Ger em binêrin faşîzma 12'ê Îlonê vê mijarê çawa digire dest û rewşa yên me binêrin, em ê bibînin ku, nêzîkbûnên dijmin û nêzîkbûna azadîxwazên me têkilhev bûne, lewma rewşek wisa derdikeve holê zehmete ku cewaziya çiqas a me û çiqas a dijmine derbikeve holê. Em dikarin van ji bo malbatan jî bêjin. Gelo malbat çiqas xizmetê ji şoreşê re dike, çiqas têkil dijmin bûye ne diyare. Ji ber vê em ê jî bi rexne, baldar û hişyar nêz bibin. Nexasim em ê feraseta namûsa feodal ber çavan re derbas bikin. Dema em nêzî diyardeya jin û zilam dibin, nêzîkbûna mal û milk baştir tê fêmkirin.

Em jî hewl didin di nava partiya me de di van mijaran de pîvanan pêş bixin. Hevalên me yên jin di hemû xebatên me de cîh digirin. Lê hêjî, em di têkîliyan de ji xwe gihandina xeleka azadiyê dûrin. Hinekan ev pir erzan nirxand. Weke hûn dizanin, paşê jî pir ketî ji tasfiyekarî û dijmin re xizmet kirin. Ew têkîliyên

bi şêweyên kevnar ên tên zanîn ku durû, bi temamî vale û rizî, gelek zerar dan partiyê. Bêguman em feraseta mezinbûna kevneşop a zilam re, feraseta ku jin kirin hebûnek hewceyî serdestiyê napejirînin. Pêwîste em kêfxweş nêzî zemîna jinê bibin. Her çendî ev zemîn ji ber çînayetî û zexta netewî xizmet ji paşverûtiyê re bike jî, divê em bihêvî bin. Paşê jî pêwîste em vê zemînê bi zanebûn rêkûpêk bikin û em bawer bikin ku dê encaman jî ava bike. Ji ber vê pêwîste em dûrî feraseta sermaye û namûsê bisekinin. Divê hûn xwe di nava nêzîkbûnek koleya malbat û jinê de nehêlin. Pêwîste jin jî wisa be. Dema jin jî nêzî diyardeya malbat û zilam bû, nikare ji bo xwe li kesek ku xwedî lê derbikeve, rake û rizgar bike bigere û hewce jî nake. Wexta nêzîkbûn wisa be, kar ji destpêkê ve xirab dibe û azadî winda dibe. Mixabin ev nêzîkbûn hêjî hene. Niha jî dema behsa kesek ji rêzê tê kirin, tê gotin ku ji filan malbatê bi filankes re wisa kir. Di vê mînakê de kesayetên behsa wan tê kirin ne cuda ne. Jixwe di çarçoveya wê saziyê de têkîliyek ku wateya wê heye lê tê nêrîn. Ev misoger nêzîkbûnek dervî sosyalîzmê ye. Nêzîkbûnek ku hêj şoreşger û sosyalîst nebûye. Hêjî gelek ji we di rewşa mal û milk de ne. Hêjî ji bogelek ji we tê gotin keça filankese, kurê filankese. Gelo çend kesên ku xwe ji vê rewşê rizgar kirî heye? Ev jî ancex bi têkoşînê dibe û pêwîste li her qadê pêk were.

Gelo tê gotin; “Ez malê xwe me, ez di derheqê xwe de xwedî biryarim?” Niha hûn li vir di bin otorîteya PKK’ê de ne. Bêguman kes nikare we ji vir bigire û bibe. Dê siyaseta PKK’ê we biherikîne. Ez bi şêwazek cuda dixwazim bêjim. Ji aliyê wateyê ve di asta feraset û asta sazîbûnê de xwediyên we hene. Ger xwedîbûn li ser bingeha welatparêzî bûya, me tiştek nedigot. Ger gotiban, ewladên me ne, weke egîdan şer dikin, em çepka didin, dê me jî daniyan serserê xwe. Mixabin wisa nêz nabin. Her tim dibêjin; “Zarokên me birin, zaroyê me wisa mir, wisa lê hat.” Feraseta welat tine ye. Nêzîkbûna azadiyê nîne. Em ê vê hineke

din weke dersek hînbûnê bidin. Bi qasî pêwîste hûn nêzîkbûna xwe ji ferasetên namûsa kevneşop a di çarçoveya van têkîliyan de raber bikin, hewce dike hûn daneyên heyî jî derbas bikin. Pêwendiya amade nîne. Ango hûn ne dikarin li ser bingeha têkîliya amade bêjin; "Ez xwedî otorîteyekê me", ne jî dikarin bêjin; "Malbata min ez wisa mezin kirim, xwedî kirin û bihêz bûm." Dê ev bandor bi temamî we ber bi şêwaza nêzîkbûnek şaş ve bibe. Jixwe dema bi vê ferasetê beşdarî partiyê bibin, dê ti encam jî neyê girtin.

Nikarin bi daneyên jin û zilam jî rêbikevin. Bi nêzîkbûna "min keçek dît, min zilamek dît" ve jî têkîlî nayê pêşxistin. Jixwe peyva "min dît" pir xeternake. Daxwiyaniyên em didin ji ber xwe gihandina cewhera vê rastiyê ye. Lewra ronî dikim. Ger nêzîkbûnek bi şêwaza şoreşgerî ji bandorên malbatê re bê kirin û rexneyî be û weke tê zanîn pêwîste pêngava derketinê jî bi têkoşîna şoreşgerî be û pêdivî bi nêzîkbûnek wisa ji pêwendiyên jin û zilamên qadroyên şoreşger re heye. Misoger têkîliyek wisa ya erênî yan neyênî di nava têkoşînê de pêşxistin nayê pejirandin. Ez vê tenê di wateya avakirina malbatê de nabêjim. Nexasim di pêşxistina pêwendiyek civakî de ev pir girînge. Dîsa her çendî bi şêweyî jî be, em dikarin pêwendiyên bê dawî jî pêş bixin. Şoreşa ku derketî holê û nêzîkbûna çînayetî ya nûnertiya wê dike pir rehet dikare pêwendiyên serdest pêş bixe. Otorîte heye û derfet jî hene. Weke tê zanîn, di feodalîzmê de cihetiya silav û kelaman heye. Jixwe rewşa kapîtalîstan dizanim. Ev rewş ji hedê wê derbas kirine. Kêm jî be sosyalîzm hewl dide çareseriya vê bibîne, lê hêjî encam negirtiye. Civaka me ji vê hêlê ve di rewşek zehmet de ye. Civaka me jin tine kiriye, hema bêjin xwelî li ser barandine. Hûn ê bikolin û binêrin ka di bin xweliyê de tiştek heye yan na, daku hûn bikarin hinek tiştan derbixin holê. Ji mêj ve şewitiye, tefiyaye, bûye xwelî, dîsa jî em lêkolîn dikin. Em lê dinêrin bêka di bingeha wê de tiştek heye yan na. Hinekê jî em li

ser bingeha lêkolîn û lêgerînê nêzî vê diyardeyê dibin. Divê ev li ser esasê têkoşînê bê meşandin. Têkîliya amade ji vê hêlê ve xeternake. Di civaka me de nêzîkbûna her tim ji diyardeyê re tê kirin a weke “me revand” an jî “me xwest”, “nizanim min evqas qelen da” vê rewşê pir radixe ber çavan û elbet ev jî xirabûna herî mezine. Di vir de tê zanîn ku kesên xwedî otorîte û pereyan çawa bibandorin û encam digirin, ev jî çawa koletiyê pêş dixe. Di girtin û dayîna kesayetan de qural koletiye. Vêca girtin û dayîn çiye? Jixwe têkîliyên ku wisa pêş bikevin ji destpêkê ve têk çûne û şêwaza herî xirabkar jî ev e. Ma gengaze ku em bêjin, em ê van têkîliyan bi zorê bînin vê astê? Ev bi pere jî nabe û bi otorîte jî nabe. Jixwe di vê mijarê de koletiya otorîteyê hatiye pêşxistin. Pere bûye meta. Zordarî kar ber bi kirîn û firotina mirov ve biriye. Ango di vê mijarê de pêngavek nû hewce dike.

Dê derketin çawa bê kirin? Wisa bi ser hestan de çûyîn jî çênabe. Nabe ku bêje; “Min pir ji te hez kir.” Jixwe her kes pir bi van kêfxweş dibe. Misoger pêwîste rêyek vê ya derketinê bê pêşxistin. Ger di malbatê de pir hatibe hezkirin û rêzgirtin vêca têkîlî pir hêsan saz dibin û tên pêşxistin. Bes li gorî min qet ne wisa ye! Di van pîvanên tê diyarkirin de qet nabe. Hûn jî dizanin modeya civakê ya derbasdar, nêzîkbûnên ku 12’ê Îlonê gur dike ye. Di asta herî dijwar de çanda arabesk ev têkîlî xirab kirin. Dema me hewl da em têkîliyên di navbera jin û zilamên hinek herêman dahûrînin, me hewl da em bidin fêmkirin ku mijar di çi astê de hatiye xistin. Wê demê çareserî di kur de ye? Çareserî, di têkoşînê de ye, di pejirandina têkoşînê de ye. Di vir de jî nêzîkbûna; “Ez pir teorîsyenim, nizanim wisa bibandorim” nabe. Bi gotinên; “Ez wisa çelengim, ez wisa bedewim” pirsgirêk çareser nabin. Çareseriya pirsgirêkê zêdetir girêdayî pêşxistina tevdîr û têkoşîna siyasî ye. Bi quralan, kevneşopiyan û feraseta namûsê ve jî nayê çareserkirin. Lê ger hûn dîsa jî bêjin; “ma êdî çi ma”, wê demê em ê jî bi kesayeta xwe ya şoreşgerî ve bi israr ser

de biçin û em ê ser bikevin. Ev, ancex bi xebatek wisa ve tê bidestxistin. Ji bo vê xebatek milîtanî tê xwestin. Min pratîka xwe jî ji we re vegot. Min hinek mînak dan. Ev bi temamî hinekê jî xebatek di derbarê kesayeta min de ye. Teorîk nêz dibim û hewl didim di pratîkê de jî wisa nêz bibim. Ango misoger azadiya jinê înkar nakim.

Gelo pêşketina rast çawa dibe, maf û huquq di vê wateyê de dikare çawa bê destgirtin, li ser van radiwestim. Heta dawî hewl didim objektîf bim, ya li hemberî weke ev an jî ew kesayet nagirim dest, weke mijara rizgariya cinsê di asta çînek bindest de hatiye xistin digirim dest û ger pratîkên ku bên kirin hebin, hewl didim wan bikim. Ev nêzîkbûn weke çareseriyê, qet nebe hişt ku gurubek hevalên jin li vir bi şêweyek azad jiyana partiyê bijîn. Elbet em nabêjin pirsgirêk ji her hêlê ve hatiye çareserkirin. Lê di asta gelek rêxistin û civakan de zehmet bê dîtin derfeta azad xwe pêşxistin û çarenûsa xwe destgirtinê çêbûye. Dide gotin ku bêje; “Ez kîme, çime, dixwazim bibim çi”, em wê neçar dikin bê ku xwe bifiroşe, bide ecibandin, tenê li ser çarenûsa xwe teorîk û pratîk bihizire. Ev ne derfetek ji rêzê ye. Ma gengaze ku ev li cihek din bê dîtin? Na, derfetek wisa nayê dayîn. Deka pratîka hinek rêxistinên cuda biceribînin, malbatan biceribînin, hûn ê bibînin ku azadiya du gavan ber bi pêşve çûyînê jî nadin. Dema hûn di civakê de serbest bigerin, yekser dê nava li we bikin. Dê hûn zilam jî yekser gotinan ji wan re bikin, an jî teqez nêzîkbûn û reftarên ku tengav bikin, biçûk bixin û derbikin raber bikin. Anjî hûn ê weke mijara mal û milk xwedî lê derbikevin. Lê li vir ev tişt nîne. Dibe ku alî bêjin; “Di rastiyê de ne li gorî dozê ye” an jî “ne li gorî pîvanên civakî ye.” Raste, ne guncave. Em di vê mijarê de pir hesas nêz dibin. Em dibêjin ger cewhera wan a şoreşgerî hebe bila derbikevin holê. Lê şaşiyên girîng hene. Ger em destûrê bidin têkîliyên kevnar ên beramberî hev, gelo dê ev der du rojan de veguherê çi rewşê? Tenê dê şaşiya di van têkîliyan de wargeha

me serûbin bike. Ya rastî hewce dike mirov dîroka faşîzmê ya di vê mijarê de lêkolîn bike. Divê mirov di derbarê gelek civakan de heta derketina çînan û serdestiya wan lêkolîn bike, daku pirsgirêk baş bê fêmkirin.

Kêm jî be me hinek diyar kir. Lewra pêwîste encamên ku em dixwazin bigihijinê hêsan neyên dîtin. Dibe ku her kêlî dahûrînên hêsan bên girtin. Me beriya niha hinek rêyên çareseriyê diyar kirin. Ev hêsanin, lê nake şoreşger û jinê jî mezin nakin. Ez weke şoreşgerekê, nêzîkbûna ji PKK'ê re, hem di asta têgihiştinê hem jî pêkanê de, hewl didim serwer bikim. Ji neçarî gelek nêzîkbûnên we yên kevneşop û têkîliyên we yên erzan qut bikim. Nexasim hewl didim fêrbûnên we yên di asta azweriyan de sînordar bikim. Zêde bi pêşxistina têkîliyên malbatê re jî eleqeder nabim. Vêca niha ev hemû çine? Ev ji bo vê ne; heta ku kesayet xwe azad neke, her têkîliya ku bê pêşxistin ber bi koletiyê ve dibe. Lê têkîliyên we yên weke serdest xwe ferz dikin hene. Aliyê din jî têkîliyên ku dixwazin bikin amûrê serdestiyê hene. Hemû jî koletiyê pêş dixin. Li Dihê mînakek derket holê. Zilam ji ber têkîliyek ketî ya pêş xistî, gelek heval serberedayî man, bê rêveber hiştin û dibe sedem ku zû ji nava me derkevin û biçin. Dîsa di asta herî jor de berpirsyarî dane zilam. Ew jî li herêmê di xêra azweriyên xwe de ewqas şervanan ji çav derdixe û terkî îmhayê dike. Di xêra azweriyên xwe de ti kuştinên ku nekirîn nîne. Nexwe şoreşgerbûn nebe, dê xeterî jî evqasî mezin be û dê di zemînên herî girîng de bi şêwazek li partiya me bidin derbikevin holê. Ev ne tenê li cihekê, li gelek deveran pêş ketiye. Dev ji nûnertiya serdestiya koletiya kevneşop berdin, gefan li hebûna partiyê dikin. Kesayet li aliyekê, têkîliyên ku hatine sazkirin jî wisa ne, lê dîsa jî em dixwazin partiyê ava bikin. Nêzîkbûnên şaş ji provakatorên herî baş û artêşên Komara Tirk zêdetir zerarê didin. Nexwe divê bi hewldanek mezin nêzîkbûn ji pirsgirêkê re bê kirin.

Mînak em bêjin bila di nava refên me de qet jin nebin. Gelo ev dibe çareseriyek? Ma dibe ku em bêjin bila ew jî li aliyekê temaşe bike, kesê ku pêdiviya wî bi jinê heyî bila biçe bizewice, yek an jî deh jinan bigire? Serdest vê wisa çareser dikin. Ma dibe sosyalîst wisa çareser bikin? Serdest jî dema hewl didin pirsgirêkê çareser bikin, huquq û adetên wan ên li gorî wan heye. Li gorî wan tevdigerin. Şoreşa sosyalîst, şoreşa civakî ye. Şoreşa rizgariya netewî ya civakî ye. Nexasim ger di rêbertiyek proleterya de be ev bi temamî civakî ye. Ger em nîvê civakê -li nav civaka me ji nîvê civakê zêdetire- di asta herî giran de koletiyê dijî berdin, em van çavikan venekin, şoreş jî nayê serxistin. Dê misoger rêyek vê bê dîtin. Ango em bi temamî li aliyekê danin û weke mijarek mal û milk nêz bibin, em nikarin şoreşê pêk bînin. Pêşî em ê dawiya şoreşê bînin. Dewleta ku bi vê feraseta azadiyê ve bê sazkirin, dê ji Komara Tirk xirabtir be. Dê têkîliya ku tu pêş bixî, ji têkîliya malbatê ya kevin kembaxtir be. Vêca me çi ji vî şerê azadiyê fêm kir? Mane cewhera vî karî, peywira me mirovê azad derxistina holê ye? Mane erka me avakirina mirovê nû ye? Mixabin bi vê nêzîkbûnê tenê mirovên şeht derdikevin holê. Deka em li şêwaza netewperestên paşverû û malbatan binêrin. Dê koletiya ku dijîn, siberojê bi hemû Kurdistanê bidin jiyîn. Ger serdest bin, dê şaristaniyek ji Komara Tirk xirabtir -ne şaristanî jî talankerî- derbixin holê. Nexwe nabe çareserî. Ango em bi nêzîkbûnên feodalî jinê danin aliyekê, dema pêdivî pê çêbû jî li ser bingeha mal û milk nêz bibin û li ser tasarufek bêsînor saz bikin, em nikarin pirsgirêkê çareser bikin. Ev bi nêzîkbûnên hestiyar ên burjuvaziya biçûk ve jî nayê dahûrandin.

Dê azweriyên di asta dijwar de pirsgirêkê heta kur bibin? Têkîliyên ku di bin bandora pergalê de ava dibin û her cure koletiyê bi xwe re didin jiyîn, ti carî têkîliyek ku bi têkoşîna azadiyê hatî avakirin rave nake. Bi temamî di bin bandora

azweriyan de ava bûye. Di wir de hezkirin û rêzdarî tine ye. Ya rastî dê du rojan de ew têkilî bibe belaya serî. Ev jî ne derketineke. Nexwe madem koletî evqasî di vî zemîne de kûre, em ê jî di têgihiştina vê koletiyê û exlaq de bibin xwediyê helwestek milîtanî û beriya her tiştî vê weke şerek dijwar bigirin dest. Hem jî bê ku em ti berjewendiyan bihizirin, ne ji bo xwe bikin serdest, ne li ser xeta rizgarkirina kesayetan, em ê ji bo pêşxistina damezirandin û têkîliyek cidî û rast, milîtantiya vê bikin. Tişta em bikin jî ev e.

Em ê di serkeftina hijmarek zêde jin a xwe gihandina azadiyê de peywirek bi bandor bimeşînin. Her wiha dê jin jî ji bo pêwendiyên azad şerek dijwar bimeşîne. Pêşketinek ku bi van re bê avakirin, dê kesayet ber bi azadiyê ve bibe. Niha dema em bi awayek mafdar banga kesayetek azad dikin, em dixwazin di mijarek girîng de pêngavekê derbixin holê. Ev pir hewce ye. PKK tevgerek wisa ye, pêwîste ji serî heta binî tevgerek azadîxwaz be. Wê di vê pirsgirêkê de jî, bizane ku azadî bi şer tê bidestxistin û wisa hewl bide encamê bigire. Tiştek hêsan nayê bidestxistin. Em bi gelemperî gihiştin vê rastiyê. Min ji we re diyar kir ku, çiqasî bi zehmet tê bidestxistin. Malbata ku tê zanîn, dergeha koletiyê ye. Ger ev esas bê girtin, şoreşgertî jî nabe. Bi nêzîkbûna em jixweber bi pêwendiyên rêhevaltiyê re hatin cem hev, bûn dost, bûn rêheval ve jî ev kar nabe. Hûn ê wisa bibin ehpap-çawîş, bes ti rêgeza vê ya siyasî jî nîne. Dibe ku her kêlî belav bibe, jixwe dema berjewendî bibin mijara gotinê, dê parçe parçe bibe.

Rêhevaltiya PKK'ê di nava mercên êşkence yên dijwar û di nava şer de pêş ketiye. Ev pir girînge. Hûn ked û ezmûnên me dixwazin. Ji bo vê pêdivî bi rêhevaltiyê heye. Ev jî pir girînge. Me di xêra armancên mezin de ciwantiya xwe feda kir û jixwe hinekê jî dem û pratîkê ev selmand. Belê, ev jî pêwendiyên rêhevaltiyê ne. Pêwendiyek ji pola ye. Ev pêwendî, li hember her cure zext û giraniyê li ber xwe dide. Wê di pêwendiyên bi jinê re

jî de ev pêwendî esas bê girtin. Pêwîste mirov pêşî rêheval be. Ti pêwendiyek bi qasî pêwendiya rêhevaltî bi zor û zehmetî û kedê bê avakirin nîne. Pêwendiya bi pereyan hatiye sazkirin, bi pere ye. Pêwendiya bi otorîteyê hatiye sazkirin, bi zorê dibe. Pêwendiya bi xweziyan û kariyerê hatiye sazkirin, herî zêde jî ji hêla kesê xwedî kariyer ve tê rûxandin. Pêwendiyên ku bi hestan hatiye sazkirin, bi hestan dirûxe. Lê pêwendiyên ji bo armancên mezin û ji bo wan armancan jî di nava hewldanên mezin de hatiye sazkirin, ma hêsan dirûxin? Belê, vaye pêwendiyên PKK'ê, vaye pêwendiyên zindanê, vaye pêwendiya şervanên ku heta mirina xwe li ber xwe didin. Çawa li dijî êrîşên herî hovane li ser xwe ne. Bi temamî berjewendiya kesî ji holê radike. Her tişt ji bo azadiya welat, ji bo avakirina mirovek nû ye! Dildarî û hêvî li ser vî bingehî şîn dibin! Belê, pêşengên ber bi civaka nû ve diçin, weke pêwendî vê dihilbijêrin. Yeqîn dikim baş tê fêmkirin û hewce nake em zêde vekin. Pêwendiyên rêhevaltiyê baş hatin vekirin û xelekên pêwendiyên rêxistinî jî baş hatin diyarkirin. Lê dîsa jî em dubare dikin, dê ev tenê bi têkoşînê ve bên bidestxistin. Wisa pêwendiyên rêhevaltiyê yên amade tine ne. Ango ne wisa hema em du heval hatin cem hev û bûn rêheval, misoger ev jî ne raste. Ji bo her yek ji we pêwendiyên xwe bi PKK'ê re pêş bixe, werin zehmetiyên ku hatine jiyîn ji min bipirsin. Ger di vê mijarê de rapor ji min bê xwestin, ez ê bidim. Ji bo yek ji we tevlî pêwendiya rêhevaltiyê bibe, çi kar hatin kirin, çi hatin bicîhanîn? Milîtantiya PKK'ê, milîtaniyek bi gelek zehmetiyan derketî holê ye. Pêwîste pêwendiya bi wê re pir girîng, bi nirx û divê li hember rêzgirtî be û berz bê destgirtin. Heman diyarde ji bo pêwendiya bi jinê re jî derbasdare. Bi rastî jî ji bo em jina azad ava bikin, hewldanek pir hûrûkûr meşand. Me di nêvenga koletî û bênasnamebûna jinê de, bi têkoşînê pêwendî ava kir û ev jî pir girînge. Li vir hinek nirxên manewî yên weke mirov nêzî diyardeyên pîroz dibe bigire dest hene. Nêzîkbûnek heta dawî

hişyar, baldar, tevgerek bi şêwaza zirav a girîng tê meşandin. Ango pêwîste em bi vê ferasetê nêz nebin; “Em zilamên serdest dikarin wisa biçewsînin, dikarin wisa daleqînin û jê bikin, an jî li gorî xwe nêz bibin.” Ne raste, ev uslup bi temamî şaşe. Hûn nikarin bi vê tiştekî bikin. Ji ber ew hêj kesek divê bê rizgarkirine. Divê neyê ji bîrkirin, dê ew bi xwe li ser lingê xwe bisekine, bi hewldana xwe hêz bigire, bi hewldana xwe, xwe bigihîne kesayetek siyasî û bi rastî jî bibe xwediya xebatekî. Belê, hingê em dikarin behsa nirxa azadîxwaz a pêwendiya ku em bi kesayetek wisa re pêş bixin bikin. Ji bilî vê destûr ji rêkurtkan re nîne. Nêzîkbûnên nizanim ez wisa bi bandor bûm, wisa bi ezmûn bûm, otorîteya min wisa hebû, kariyera min hebû ne rastin. Di vir de ez bi xwe jî kêm derfeta pêşketinê saz dikim. Hêjî ji bo xwe ji bandorên zemîna diyar a xirab rizgar bikim, bandorên ku çavkaniya xwe ji min û dervî min, ji partî û dervî partî digire sînordar bikim, rojane bi xwe re şer dikim.

Vêca kanî ew pêwendiyên amade ku we di rojekê de pêş xistîn? Yên ji welat tên dizanin. Ji bobûyerek zewacê pêş bixin, milyonan pere hewce dike. Ev jî di destê we de nîne. Kanî derfetê avakirina têkîliyek wisa ya kevneşop? Dê peyre çi bibe? Dê rêhevaltiyê xirab bikar bîne. Ev jî ne hedê me ye. Divê em li vir baş li ser mijara rêhevaltiyê rawestin. Hewce nake hûn xisletên feodal û otorîteya serdest bidin pêş. Hewce nake jin jî xisletên xwe yên durûtiya kevneşop, fitne û fesad û koletî ferz bike. Hemû naveroka perwerdeya me xala ku esas digire, mehkumkirina van nêzîkbûna ne. Em heta dawî ji pêwendiyên azad re dibêjin erê! Hûn jî dibînin em li serê çiyane, heta dawî jî ji xwe bawerin. Qetiyen rê ji dîn û harbûnê re nîne, rê ji bêrêzî û newekheviyê re nîne. Em çi bikin parve dikin. Çeka xwe, perwerdeya xwe û nanê xwe parve dikin. Ev nêzîkbûnên wekhevî yên girîngin. Bes ev tenê ji hêla şêweyê ve ye. Lê di heman demê de ji bo cewher jî wisa ava bibe, ev hemû tên kirin.

Niha li gelek qadan gelo dahûrînerên me çi dikin? Di roja duyan der hêza xwe xirab bikar tînin. Jin hinekê mafê axaftinê bidest dixe, lê dema hinekê azadiya tevgerê bidest dixe, gelek jin cardin xisletên xwe yên jinwarî û koletî esas digirin û van jîndar dikin. Ev di mînaka me de jî wisa ye. Berovajî vê li ser me hat ferzkirin. Di bin navê "lêhûrbûna PKK'ê, pêşxistina derfetên PKK'ê" de nêzî me bûn û wisa hesab kirin dê di kesayeta min de partiyê desteser bikin. Wateya vê wisa ye; ma tu dixwazî Kurdistanê venêrînî, Rêbertiya PKK'ê venêrîne. Ma tu dixwazî di navenda PKK'ê de serdest bî, dîsa Rêbertiya PKK'ê baş venêrîne. Ma tu dixwazî di navenda PKK'ê de serdestiyê ava bikî, dîsa bibe venêrînek baş a Rêbertiya PKK'ê; ma tu dixwazî du navbera du kesan de têkîliyek taybet bikar bînî, xwe bike serdestê herî jor! Nêzîkbûn ev bû. Ev hesabên hezar salî bi şêweyek herî ketî derketin holê. Ez di van mijaran de bi sebrim. Rêbaza me, nakokiyek û xisletek derxistina holê de, nexasim ger taybet di derbarê kesayeta me de be, em reftarek bi sebir esas digirin, yekser ceza nakin, nêzîkbûnek kevnar raber nakin, destûrê didin kesayet heta dawî bikare xwe rave bike û em wan dişopînin. Em vê rêbazê di nava partiyê de jî dimeşînin. Di vir de sûd heye û heta dawî jî xwe didin axaftin. Ango derdixin holê. Bêrîkirin û azweriyên xwe bidin axaftin, ev der qadek azade û em wisa yekser jî naçewsînin. Lê divê hesabê vê jî bê kirin; xeta PKK'ê ya bingehîn heye. Ger hûn zû-dereng xwe bigihînin wê, ez jî dibêjim di vir de azadî heye. Lê dema hûn PKK'ê biçewsînin, PKK'ê ji PKK'bûnê derbixin, hûn ê têk biçin û tine bibin. Êdî hûn hilbijêrin. Divê meşa we li ser xeta partî be. Bila kes dînamîtê nexe bin PKK'ê. Quralên wê jî hene. Ji ber rêxistin wisa hatiye avakirin, dê zû-dereng hesabê bipirse. Lewra bi zaroktî nêzî partiyê nebin û nebêjin ev firsende. Em li vir tenê mijara jinê nagirin dest. Diyardeya zilam jî wisa ye. Qaşo di rastiya Rêbertiyê de min li pêş armancên xwe asteng dîtine. Qaşo dê

dînya-alem li ser Kurdistanê serdest be, ez jî bûme asteng! Qaşo dê li ser PKK'ê serdest be, min asteng kiriye! Qaşo navendê bi temamî kontrol dike, lê min asteng kiriye! Qaşo kêm maye bibe rêber, herî dawî ez li pêş asteng mame! Nêzîkbûn evqasî vekirî û zelale. Nikarin zikê xwe têr bikin. Jixwe paşê me rewşên wan vekir û tawanên wan derxist holê. Hinekan jî fîşek li serê xwe da. Hinek jî dibêjin; "cezayê me darvekirine." Ma dibe mirov evqasî xeter nêzî Rêbertiyê bibe? Tawanên mezin dikin û elbet di vir de entrîka jî hene. Entrîkaya jinê jî xwe derxist holê û bi durûtî weke têkîliya taybet hat ferzkirin. Rewşa cînseltiya jinê xirab hat nirxandin û di xêra armancên siyasî de xwestin weke qesrên Osmaniyan bikar bînin. Xwestin bandora jinê ya di nava malbatên feodal de, di nava PKK'ê de jî bidin jiyîn. Xwestin feraseta namûsa kevneşop a zilamê Kurd bikar bînin. Di mijara jinê de xisletên zilamê Kurd ên tên zanîn hene, dê heta dawî jî bi wan ve girêdayî bimîne. Hesabên xwe jî li gorî vê kirin.

Min mînaka vê jiya û dahûrand. Ya rastî li ber çavan tenê têkîliyek jin û zilame. Lê di cewher de pevçûna ferasetên pir dijware. Pevçûna di navbera feraseta hevkarên serdest ên bermahiya serdema navîn û kemalîst re, têkîliya bi kedek mezin hatî bidestxistin dihat jiyîn. Yek ji van nûnertiya hevkariyê dikir, ya din jî pêşketina rêxistinî û rêbertiyê rave dikir. Deka em ê li her du rêbazan binêrin. Yekê qet kar nedikir, tenê çavdêr bû, venêrîn dikir, aliyên lewaz dihilbijart, dema firsend didît serî li komployan dida û xwe dikir serdest. Jixwe vê jî ji sedî salan ve bandor li ser Kurdistanê kiriye, kar nekiriye, tenê xwe sipartiye hevkaran wisa xwe bibandor kiriye û li ser vî bingehî bûye xwediyê otorîte, mal û milk û mezin bûye. Qaşo ev jî nêrînek cîhanê û şêwaza jiyanê ye. Yê din jî, ji bilî nêzîkbûna ku heta hewldanê nede derfeta ti pêşketinê nabîne, yek bi yek pêwendî, yek bi yek axaftin, ji xwarin û vexwarinê bigire heta avakirina hêza fikrî, xwedî hewldanek mezine. Encamên van jî di nava

partiya me de zêde rûbirû hatine. Di pêşketin, navendbûn, qadrobûn û girsebûna rêbertiya PKK'ê de, ev her tim derketin holê. Lewma dersên baş ji van mînakan bigirin. Ji bîr nekin pêşketin bi şêwazek tevlîhev çêdibe. Terbiya ku we ji malbatê girtî, bandora ji dewletê û bandora ji têkîliyên jin û zilam, divê misoger we ji xeta partî dûr nexe, nêzîkbûnên erzan, rizgariyên erzan û ferasetên serdestiyek erzan bi we re nede jiyîn. Hûn dibin PKK, hûn daxwazkarên pêşketina rêbertiya PKK'ê ne. Yên ku her roj ji min zêdetir sond dixwe hûnin. Li hemû raporên we dinêrim. Tê gotin ku; "Soz didim partiyê, Rêbertiya Partiyê, Şehîdan, Berxwedanvanên Zindanan ez ê girêdayî bimînim." Belê ev jî, wesiyeta şehîdane, ev dema berxwedanvanên zindanan ber bi darvekirinê ve çûne banga wan a bêhempa ye, ev hewldana rêbertiya PKK'ê ya bi qasî çiyane! Belê, PKK li ser vî bingehî mezin bûye! Ger hûn di sonda xwe de ji dil bin, durist bin, hûn ê pêk bînin. Ez wisa behsa rêzdariyek çors nakim. Hûn hemû ji min jî zêdetir rêzdarin, lê raveya rêzdariya li cem me, nêzîkbûna cewherî ye, li gorî cewhera pêşketinê tevlîbûne, heta mirina xwe nûnertiya wê kirine, ji bo bibe xwediyê karê xwe li ser rawestîne, heta dawî jênevegere. Cewhera girêdanê wisa ye.

Me behsa pêwendiyên mêtîngerî, bermahiyên feodalî, têkîliyên şaş, pêwendiyên rêhevaltiya PKK'ê û têkîliyên jin û zilam kir. Kesê ji xwe bawer dê were vê meydanê. Mînak heta niha hemû hewldana min, bi gelemperî PKK û bi qasî gelê Kurdistanê, kêm jî be azadkirina kesayeta xwe ye. Dema me ev kar kir, gelo me çima evqas hewl da? Çima me evqasî li hember zext û zorê û xirabiyan li ber xwe da? Çima em hatin heta vir? Pir vekiriye, me ev hemû ji ber dildariya xwe ya li hember azadiyê pêk anî. Ji bilî vê ti vebijêrkek din nîne. Em pere weke barekê dibînin, xwe sipartina qedir jî ti carî ne vebijêrka me ye. Vebijêrka me, azadkirin, pêşxistin û bihêzkirina pêwendiyane. Em li ser vî bingehî dixwazin her tim xwe nû û bi hêz bikim. Em

vê jî weke pêşketina mirovî ya herî bingehîn dibînin. Tiştên hatine vegotin ji bo dahûrîna xwe ji xwe re weke dersekê bibînin. Diyardeya azadbûnê ne bi şêwe ye. Feraseta weke “ez wisa xwediyê kariyerim, teoriya min wisa heye û navê min heye” bi feraseta azadiyê re nakoke. Ger hûn di van diyardeyan de nirxekê dibînin, em ê hemûyan bidin we, lê hûn bi van nikarin tiştekê bidest bixin. Nêzîkbûna li ser vî bingehî bi temamî feodalî ye, burjuva ye û misoger destûrê nade hûn rojekê jî barê PKK’ê rakin. Ji ber ku barê PKK’ê ji serî heta binî azadiye, lewra tê rakirin. Em dikarin di vir de berxwedanvanên zindanê mînak bidin. Kesên ku berxwedaniya mezin raber dikin vê dibêjin; “Em serfiraziya mirovahiyê ne.” Raste. Gotina; “Me serfiraziya mirovahî bin pê nekir û nehêlin bê binpêkirin” mijarek dersek baş a ku PKK’ê fêr kiriye û watedare. Di rastiya berxwedana PKK’ê de, girîngiya ne binpêkirina mirovahî tiştek ne kême û pir binirxe.

Berxwedaniya me ya heyî, şehîdên berxwedaniyê li ser vî bingehî nûnertiya serfiraziya mirovahiyê dikin. Ma em ji bilî vê çawa li ser lingan disekinin? Ne bi tiştên li ber çavan, ji bo şanek serfiraz çêbe ev bi çi gengaze? Ev, bi hewldanên azadiyê ve gengaze. Ger hûn azadîxwazên mezin bûna, kesî nedikariya we. Şervanên azadiyê nûnertiya serfiraziyê dikin. Ne bi zextê tên bêdengkirin, ne bi pereyan tên kirîn, berovajî hevalên me dibêjin ku jiyana me di bin îşkenceyê de pêkanîna nûnertiya PKK’ê ye. PKK wisa ye. Ger şehîdên PKK’ê bên lêkolînkirin û dahûrandin dê bê dîtin, ew bi temamî şehîdên li ser vî bingehîne û di vê wateyê de ji bo wan “mirîne” nayê gotin. Divê ew weke raveya nirxên pîroz bên nirxandin û PKK jî wisa ye. PKK, ne ez û tu ne. Jixwe ne diyare dê çi bi me bê, lê ew nirxên pîrozin. Lewra em ê wan esas bigirin. Axaftinek bi ser wan re nîne. Hewldanek ku wan derbas jî bike nîne. Şehîdê ku gotina dawî kir, fermandarê esasî ye. Di berxwedana zindana bi îşkence de, kesên ku heta dawî li ser piyan man û têk neçûn, fermandarên esasî ne. Kesê ku

heta dawî bi çeka xwe ve girêdayî û ew di asta herî baş de bi kar anî, di radeya duyemîn de fermandarê başe. Kesên weke we jî dikare di radeya herî dawî de fermandarên baş bin. Hûn li vir di perwerdeyê de ne. Hêj hûn neçûne qada pratîkek dijwar. Ji bo we girîngiya rast têgihiştin û jiyana rastiya PKK'ê pir mezine.

Girêdayî dahûrîna giştî jî, axaftinên ku em ê li ser pirsgirêka jinê ya di nava PKK'ê de bikin bi vî rengî ne. Em ê pêşxistina pêwendiyên rêhevaltiya rast berdewam bikin. Mînakên şehîdên berxwedaniya zindanê hene. Pêwîste di nava jinê de jî nirxek mezin ji hevaltiya têkoşînê ya li ser bingeha rêhevaltiya bi me re bê dayîn. Nêzîkbûnên şaş xeterin, qîmetê nedinê. Heta ku têkoşîna me hebe dê nêzîkbûnên rast bidomin. Ji bo azadkirina mijarê em ê rêbaza têkoşînê esas bigirin. Em ê di têkoşîna bi nêzîkbûnên şaş û ji rêderketinan re her tim hewl bidin a rast derbixin holê û ji bo vê hewl bidin. Em bi vê bawerin. Ger nêzîkbûna bi şêwaza şoreşgerî ji rastiya jinê re bê kirin, dê hêviyê bide û zemînek ku bikaribe xizmetê ji şoreşê re bike. Pêwîste nêzîkbûnek durû çênebe. Pêwîste nêzîkbûnek ji nêzîkbûnên koletî ya kevnar ku serdeste dûr hebe. Divê nêzîkbûnek ya kevin esas digire çênebe. Pêwîste milîtantiyek ku zanebûna azad, bawerî û kesayetê bi hewldana xwe dest dixe, ser dikeve, dimeşe û siyasî dibe esas bê girtin. Jixwe pêwîste bê zanîn ev pêwendî di rojekê de nayê avakirin.

Di destpêkê de rewş çi dibe bila be, ya girîng, piştî ket nav xeta me ya siyasî rewşa ku derbikeve holê ye. Dibe ku jin û zilamên me girtîn nav refên xwe ji destpêkê ve kembax bin. Jixwe piraniya wan çewt bûne û di şaşiyê de ne. Lewra di nêzîkbûn de pêwîstî bi tedbîr heye, pêşî bê zanîn şaşî hene, bê ku bêje çima di carekê de mirovê saxlem derneketin û bêhêviyê bijîn nêzîkbûnek baldar hewce dike. Pêwîste em bizanin ku em ê nekarin ketîbûna salan di carekê de çareser bikin. Di vê mijarê de ne zêde bi xwe bawer bin, ne jî bê bawer bin. Nexasim pêwîste xeta partî ya

bîrdozî û siyasî esas bê girtin, xweseriya pirsgirêkê jî red nekin, lê nehêlin xebatên giştî jî di xeta duyemîn de bimînin, di çarçoveya berjewendiya pêşketina şoreşê de bizanin bi girse bin, di tevgera vê girseyê de rol bigirin. Divê em bizanin dê azadiya eslî di nava xebatên berfireh ên girseya jinê de derbikevin holê, bi hewldanên takekesî ve encam nayê girtin, her çendî di vê mijarê de qadro derbikevin holê jî, heta ku şerek siyasî ya mezin neyê meşandin, em nikarin behsa azadbûna kesîma jinê bikin. Lewra divê beşdarî hemû xebatên siyasî, heta xebatên şerê çekdarî bibe û bi şêweyek guncav tevlî seferberiyê bibe. Lê girînge ku ev jî li gorî rewşa jinê guncav bê kirin. Ango ne nêzîkbûnek çep a hişk dibe, ne jî ferasetên weke cînsek narîne, zehmetiyan ranake dibe. Nêzîkbûna herî rast jinê gav bi gav ji şoreşê re amade dike û dikişîne nav şoreşê ye. Ya girîng diyarde di astek takekesî de neyê destgirtine. Ango divê neyê gotin; “Çima di vê mijarê de pirsgirêkên me hene, nayê çareserkirin.” Di çareserkirina pirsgirêkên rêhevalên me de tiştek ji hev veşêrin nîne, lê şert û mercên me yên cuda hene. Em li vir bi zorê derfetên perwerdeyê peyda dikin. Ger em siberojê li ser axa xwe hîn zêdetir derfetên têkoşînek hîn azadtir bibînin, bêguman em dikarin li wir şêwaza jiyanek wisa ya rêhevaltiyek hîn pêşketîtir ava bikin. Herî zêde jî girînge ku her kes vê rêgezê baş bijî, girêdan û dildariya we di cewher de hezkirina li hember welat û azadiyane û ev jî rêgeze. Her ku pêdiviyên wê werin bicîhanîn dê baştir bê fêmkirin. Ti nirxa dildariyek ku bi rizgariya welat û azadiya gel ve neyê girêdan nîne. Em dikarin vê rastiyê bi gelek mînakên cur be cur bidin diyarkirin.

Ger dildariya welat û azadiya mezin nebe, hûn ê teqez xwe bi dildariyên jin û malbatê ve paşve bixin. Nexasim ger hûn dildariyên ku şer dane aliyekê bijîn, hûn ê bibin kesên xeternak. Formîlek wisa hem rast û di cîh de ye; di arestebûna azadiya mezin û rizgarbûna welat de, di pêwendiyên jin û zilam de

mînakên herî eslî û hêja jî derketin holê. Lê mixabin ketiyên ku ev di asta duyem de hiştin, paşve xistin, heta xwestin têkoşîna azadiya mezin di xêra dilketinên xwe de tine bikin jî derketin holê. Lewra hewce dike em vê rêgeza jiyanî û hêja bi dil û can bisepînin. Her tiştê me ji destê me hatiye girtin. Nêzîkbûnên weke; "min malbatek wisa ava kir, malbat û zarokên min hebûn" û xwe bi wan ve girêdan tev teretûre. Ez yeqîn nakim dê malbatên me ji bo zarokên xwe bi qasî misqalekê jî derfetê pêşerojekê amade bikin. Wê tu şerim bikî behsa nasnameya xwe bikî, paşê jî behsa malbata bi şeref bikî! Ev xwe xapandine. Heta ku rêgez esas neyê girtin, behsa malbata bi namûs kirin, bênamûsiya herî mezine. Malbata ku bi welatparêziya mezin ve neyê girêdan vale ye. Ti nirxa têkîliya jin û zilam a ku bi şerê rojane ve xwe mezin neke nîne. Ger çewtiyên wisa hebin, divê hûn teqez derbaskirina vê weke erka şoreşgerbûnê bigirin deste.

Pêwîste azweriyên we yên mezin û hezkirinên we yên mezin fedayî rizgariya welat bin. Divê hûn weke Hezkiriyê rasteqîn ji xwe re welat bibînin. Dema me behsa welatparêziyê kir, me ev şîrove kir. Kesek ku vê esas negire, her çendî hezkirina jinê jî be, pir ketî û vale ye. Ez hem ji ber rewşa vî mirovî xemgîn dibim, hem jî vî mirovî pir ketî dibînim. Feraseta Rêbertiya PKK'ê wisa ye. Ger welat û gelê ku di vî welatî de dijî di cîhanê de yên herî paşketî bin û navê wan jî ji dîrokê hatibe derxistin, hûn dikarin behsa kîjan namûsê bikin? Ger rêgeza esasî ya namûsê hatibe binpêkirin, bi ziraviyên wê re mijûlbûn çiqas dibe namûs? Qijik jî dê kena xwe bi vê bikin. Ma dema behsa van tiştan dikim, bangî we dikim daku hûn bibin derwêşek razber? Qetiyen na! Banga me welatê azad û gelê azade. Gelê me hewceyî azadiyê ye. Li her çar aliyê cîhanê ber ba bikeve û paşê jî heta dawî bi înkarê bijî! Ma di vê cîhanê de civakên herî paşketî jî rewşek wisa dipejirînin? Li Efrîkayê herî dawî Namîbya jî welatê xwe bi dest xist. Ma ji bilî me çend gelê ku dibêje welatê min

nîne û ez bê welatim heye? Hem em ê xwe mirov bihesibînin, hem jî em ê di hemû şaneyên xwe de bêwelatiyê bijîn, ma tê qebûlkirin. Ger nasnameya gelê me evqasî ji dîrokê hatibe derxistin, evqasî koletiyê dijî, ma em dikarin bêjin em kesayetên bi namûs û serfirazin. Ev nakokî ye. Dê ev jî bibe sedem ku mirov xwe ketî bigire dest û ti carî xwe rast neke. Hûn ciwanin, li hember azweriyên jiyanê yên we tevan rêzdarim, lê jiyana herî bi nirx, jiyana azade. Rêhevalê Muzaffer AYATA gotinek rêheval Kemal PÎR bi bîra me tîne; “Hinde em jiyanê hez dikin, bi qasî jê hez dikin em di berdêla wê de dimirin.” Belê raste. Ji bo jiyana azade. PKK ev rastiye. Berxwedaniyek mezin û xwe fedakirinek mezin heye, divê neyê paşguhkirin. Ev rêgeza me ya esasî ye. Ev jî me ber bi rêgeza welatparêziyek pêşveçûyî ve dibe. Pêwîste li ber baya dervî welat ketin bê mehkumkirin, em şerê ji bo welat weke dozek mezin rojev bikin, şerê azadiyê li pêş hemû jiyanê bigirin dest. Ger dê xwarin û vexwarinek, mezinkirina zarokan û sazkirina malbatê hebe jî, pêwîste ji bo şerê azadiyê be. Ji bilî vê qetiyen ji ti tiştî re destûr nîne. Hezkirin, dilketin û her tişt ji bo welate! Ev mercên fermana şerê azadiya dîroka wê demê ne. Ne tenê daxwazin, mercên di asta pîvan de ku pêwîste werin fêmkirinin. Ez nikarim li vir wek kesek lîberal tevbigerim. Xwe naxim şûna fermandarekî de jî û dîsa neçarim rastiyê bi dilnimziyek mezin vebêjim. Ev deh salin em li vir hewl didin gavekê jî paşde ne avêjin û şervanên ku ji bo welat xwîna xwe birijînin bi qasî misqalekê jî guman nejîn amade bikin. Ji bilî vê bi ti hêcetê mafê min ê li vir jiyînê nîne. Ji bo welat û avakirina nirxên azadiyê kêm jî be tevkariyek baş bikim, neçarim li vir bijîm. Mirov tenê dikare li ser vî bingehî behsa li derve jiyînê bike. Ji bilî vê nabe ku mirov bi ti hêcetî dev ji welat berde. Ger mirov dev ji welat berde, dibe îxanet û ketîbûn.

Pêwîste em ji bo vê têgehê û sepandina wê di astek bêhempa de bin. Ji ber pêdiviya herî mezin ev xale. Em ê li gel

nenêrin, wan ji sedî salan ve ji Cihuyan, Ermeniyan û kêmnetewên din zêdetir pratîka bê welatiyê jiyan kirine. Lewra pêkana rêgezê, tişta hatî jibîrkirin, lê pêwîste dev jê neyê berdan û bi şêweyek bêhempa li ser hemûyan sepandin, nêzîkbûna "êdî bese ji jyana sexte re, êdî bese ji jiyana erzan re, êdî bese serberedayîbûnê re" raberkirin û gotina; "hûn ê çavên xwe berdin welat, ji bo şer bikin, ji bo şer jî hewce bike derkevin serê çiyan, birçî bimînin, bê av bimînin û li ber xwe bidin û namûsê jî li vir bigerin" jî para me ye ku em bêjin. Ma dibe tu li hember Komara Tirk her tiştê xwe û malbata xwe bifiroşî, paşê jî birevî û her cure xirabûnê bikî? Ev mantiqê xwe rizgarkirinê û bênamûsiya herî mezine. Li ser vî bingehî karê bidestxistina mal û milk û avakirina malbatê nayê pejirandin. Em ê van tevan yek bi yek derbixin holê û dê ew jî bersiva xwe bibînin. Ev mirovên ku ji rê derketine. Di derketina Îslamiyetê de ji kesên wisa re komên kafir û kefere tê gotin. Ger neyên îmanê jî, qetla wan wacibe. Ango diyarde evqasî zelal û vekirî ne. Di cewher de bi temamî rastin û bangek siyasî ya di cih de ye. Dilketinên kesên ku evqasî ketine ser rêya îxanetê di asta herî ketî de ne. Xayînin û divê bên tasfiyekirin.

Gelek caran hûn ji van re dibin amûr jî. Bûna xwediyê ferman û fermande li aliyekê danin, hûn dikevin rewşên wisa zilamek bi namûs qet van tiştan nepejirîne. Fermandar, kesên ku nakevin van rewşan, dizane nêzîkbûna partiyê bisepîne û xeleka ferman û fermandariyê baş bi kar tînê ye. Jixwe cewhera şêwaza lêdanê jî wisa ye. Belê, di vir de pêdivî bi propagandeyek qanekirinê heye. Di serdema me de elbet rêbaza qanekirinê weke di derketina Îslamiyetê de nabe, ango bi yek-du kelamên xweda ve çareser nabe. Di roja me de bi van tiştan PKK'yîbûn jî çênabe. Me da diyarkirin ku dê çawa bibe. Ya girîng ketina ser rêya welat û ji bo wê şerkirine. Ev bang, deh qetî ji banga ol'î zêdetir pêşveçûyî ye. Ji ber ger tu pêk neyînî mafê te mirine. Jixwe di

rastiya Tirk de jî ev wisa ye. Dadgehên îstîklalê hatine damezirandin. Zagona leşkertiya zorê hatiye derxistin. Di pirtûkên dîrokê de jî tê nivîsandin ku kesên ev ferman pêk ne anîne, 5000 kes ji wan hatine darvekirin. Jixwe tişta ku li vir mijara gotinê ye, rizgarvaniyek netewî ne bi qasî radîqaliya di wateya burjuva de ye. Dewleta kemalîst li ser vî bingehî bi ser ketiye. Em ê bêjin em evqasî radîqalin, lê dê nêzîkbûna me ji kesên ku di rêya îxanetê de dijîn re jî, nêzîkbûnek reben be. Ev nabe! Pêwîste li vir nûnertiya xisleta fermandarê ku fermanê dide û pêk tîne pêş bikeve. Pêwîste her tişt çavkaniya xwe ji girêdana welat bigire. Me hema jixweber negot em bi welat ve werin girêdan û xêra wê şer bikin. Di encama fikirandinek, nîqaşek û lêkolîna dîroka mirovahî ya demdirêj de me lê nêrî, ji bilî vê cuda rêyek din a derketinê nîne. Dibe ku hinek ji bo me bêjin; “Xwe winda kiriye, kesek dîne.” Me tenê xwest em hinekê durist bimînin. Me hinekê hewl da bi namûs bin. Ji ber bûna walî, karmend û xwediyê pere û sermaye ve mirov bi namûs nabe. Dibe pir kêm kes gavên ku davêjim çil carî bipîve û bavêje, lê em her roj vê dijîn. Ji bo em rêyek din a derketinê nabînin, me biryara şerê welat da. Jixwe PKK bi hêza vê ava bû û heta roja îro hat. Ji ber xîtabê hestên baş û fikrên baş kir, karî bê heta van rojan. Her tim propagandeya vê kir û hêz derket holê. Çiqas aliyên we yên tekûz û hêza we heye tev di PKK’ê de derketin holê. Aliyê we yê herî baş, li ser xeta pêşxistina PKK’ê ye. Ev di cewherê xwe de nirxên welatparêzî û azadiya gel’e û bi armanca sosyalîzmê ye. Ev heta dawî wekheviyê esas digire. Ji bo rizgariya welat, ji hêla bîrdozî ve cihê me sosyalîzma zanistî ye. Berendamê derbaskirina zext û zora civakî ya gelemperî ye. Em van di van rojan de jî dimeşînin, ji ber ku rêgezek jî ya me wisa ye. Şêwaza PKK’ê ya avakirinê wisa ye. Van jî li gorî serê xwe nenirxînin û nebêjin; “raweste.” Di destpêkê de çawa be, dê encamê jî wisa saz bike. Qet nebê heta ku berpirsyariya me berdewam bike, dê wisa be.

Hûn çil salan jî dûrî me bijîn, heta ku em hebin, divê hûn bawer bin dê ev wisa be û PKK'ya ku pêş dikeve û bi sazî dibe dê heta sedî salan hêza wê têra meşandina vî karî bike. Lewra pêwîste hewldanên we bi nêzîkbûnên zaroktî û nezan ve vale dernekevin. Pêwîste hûn xwediyê hewldan û rêgezên mezin bin.

Bi vê re tişta dixwazim bêjim; pêwîste hûn her cure bindestî û girêdanên xwe yên weke zarok û malbat bi temamî veguherînin welat û azadî. Nabêjim bila bên înkarkirin, lê divê di bingeha van de têgehên welat û azadî hebin. Paşê jî li ser bingeha xizmeta vê û nexasim ger hûn rêber bin, bi temamî weke ku hûn hesreta vê ne, pêwendiyên xwe yên rêhevaltî pêş bixin. Her mirovê ku bandora we li ser heye bikin şoreşger. Pêwîste di hemû pêwendiyên we de mirovê azad derbikeve holê. Divê mirovê şanaziya wan hatiye şikandin, bin ketiye û durû dernekevin. Dema ev çêbe, xwe tawanbar bihesibînin. Kesên bi we re pêwendî pêş bixe pêwîste bêje; "Çi mirovek bêhempa ye ku mirovan azad dike û banga wan çiqasî bi hêze." Belê, ronîkirina derdora milîtanê PKK'ê wisa ye. Em diyardeya jinê ya ku herî zêde pêwîste bê azadkirin jî, li ser vî bingehî digirin dest. Rêhevaltiyê jî wisa ferz dikin. Bi vî rengî bi têkoşîna xwe ve cihê xwe di nava civakê de çêdikin. Ev pêkanîna rêgezek me ye. Divê mirov ji vê regezê dernekeve. Pêwîste mirov destûrê nede ji rêderketinên vê regezê û mafê jiyanê jî nede. Divê bi rêzgirtinek mezin nirx bide rêgezan. Elbet pêwendiyên hîn zêdetir kamil, vedigere welat û li ser şerê li wir lêhûr dibe, her ku welat azad dibe pêwendiyên hîn zêdetir bi malbatên azad, jina azad, zilamê azad û mirovên azad ser dikeve. Bêguman em ê bi têkoşînên mezin ber bi van serkeftinan ve biçin. Hemû serkeftinên girîng ên şoreşan, bi şerên mezin ve hatine bidestxistin. Her çendî em li vir bixwazin bi dahûrînên teorîk ve encamê bigirin, dê ev zêde rêya me pêş nexe. Em wisa yeqîn dikin, heta ku şerên mezin neyên meşandin, dê zêde nirxa van dahûrînan jî ewqas nemîne. Em hewldanên xwe

yên li vir, weke hewldanên sînordar ên azadkirinê dinirxînin. Em hewl didin bi van hewldanan ve milîtanên ku ber bi azadiyê ve gav bavêjin derbixin holê.

Weke di hemû pêwendiyên me yên rêhevaltiyê de heyî, ev di pêwendiya bi rêhevaltiya jinê re jî destpêkeke. Bi mebesta ku xwe ji pêwendiyên wekhev û azad re vekirî bihêle, em dikarin misoger jinê di nava şerek siyasî de kûr bikin. Bi vê re jî li ser bingeha şer bi serkeftinê ve girê bidin, israr bikin. Li ser vî esasî her kes fedekariya ku jê tê raber bike, bi rastî jî dê bikarin tevkariyek mezin ji doza me re bikin. Em li ser vî bingehî ji hemû hevalên jin û zilam hêvî dikin ku tevkariya xwe bikin û di şerê xwe yê şoreşgerî de nêzîkbûna herî azad pêş bixin. Bendewariya me bersivê bidin van hemû bangan.

***Nîsan 1989***

***Azadbûna Jina Kurdistanî***
***Wê Kurdistana Azad Be***

Bi mebesta Newroza sala 1990'î li Akademiyê hevdîtina bi we re watedare.

Pêngava azadiya giştî em dijîn di azadiya jina Kurdistanî re tevkariyek girîng çêbike. Wisa yeqîn dikim, em ê di milîtanbûnê de qonaxek girîng jî di tevgera jinê de çêbikin. Dibe ku em ê zehmetiyan bijîn, bes dê encam bihêzbûnê ava bike. Jixwe pêşketinek hêja ye ku di berdêla wê de fedekarî bê kirin.

Di xebatên jinê yên şoreşgerî, partîbûnê de em di qonaxa herî bi îdîa û encamgir de ne. Me kom bi çek kirin û niha jî sê yekîneyên me yên jin çekdarin. Yeqîn dikim li hinek qadên cuda jî di asta taxim de xebatên rêxistinbûnê tên meşandin. Lewma divê hûn jî ji hêla çekdarî û rêxistinî ve bi şêweyek rast beşdarî vê pêşketina milîtanî bibin, di mercên cidî, wekhev û azad de bimeşin.

Me di sala 1982'an de li vir komek jin perwerde kir. Lê belê ew ji xwe bêbawer û xeyalî nêzî xwe bûne. Wisa tê fêmkirin ku ji ber ew di wê demê de weke girêkek korbûn me encam negirt. Ji ber nexweşiyên di wê demê de nehatine derbaskirin, hem xwe hem jî em tengav kirin. Lê niha di mijara xwe bawerkirinê û kesayet dîtinê de îdîa zêdetire. Bi qasî em ê nekarin bi a kevin re muqayese bikin em xwedî derfetên pêşketinê ne.

Li her derî tevlîbûn zêde ye. Ji hêla jinê ve rûpelek ku bi kesayeta xwe ya serbixwe bawer dike tê vekirin. Her ku yekbûnê bi rizgariya netewî re çêke, dê zêdetir li ser bingeha azadbûnê û wekheviyê ber bi peresanê ve biçe. Ev jî wê ji her alî ve naverokek demokratbûyî lezgîn bike.

Dibe ku ceribandinên PKK'ê pirsgirêkê bi temamî çareser nake, lê cewherî digire dest. Jixwe ne gengaze ku li vê qadê ji

pirsgirêkên hezar salî re di carekê de bersiv bên dîtin. Her roja derbas dibe hûn ê bibînin ku, pirsgirêkên we di asta dîrokî de ne, bi mercên civakî yên giran re rûbirû ne. Lewra, pêdivî heye ku mirov bi nêzîkbûnên xweser ve bi ser de biçe û li hember vê baldar be. Di vê pêngava me de cih ji jina Kurdistanî re dayîn, pêngavek biryardar û çalekgerî dana pêkanîn nêzîkbûna herî raste. Hûn jî dikarin pêşengiya vê bikin. Wêrekî û fedekariya we heye û hûn di pêwajoya li ser vî bingehî komkirina kesayeta xwe, mezinkirin û pêkanînê de ne. Ev jî pêşketinek erênî ye. Yekîneyên jin ên serbixwe dikare kesayetên balkêş derbixe holê. Ger ji rê neyê derxistin û pê neyê lîstin, dê egîdiya jinê pêş bikeve. Divê em di vê de bi israr bin û derfetê bidinê. Jixwe egîdiya her tim di bin serdestî û girêdana zilam de qet nayê têgihiştin û kesayeta wê jî pêş nakeve. Lewra divê em însfiyatîfa ku tevgera jin kesayeta xwe bibîne-têkoşîna çekdarî jî di nav de-û cewhera xwe bi teşe bikin bidin wan. Hûn jî dikarin li ser vî bingehî wêrekî û fedekariya xwe pêş bixin, heta di afirîneriyê de encamgir bin, di çalekiyên serbixwe de xwe selmandinê de bi israr bin. Bila neyê jibîrkirin di bingeha nepêşketina kesayeta we de, di civaka serdestiya zilam de fikra girêdayî û reftarên girêdayî rol dilîzin. Em jî hewl didin vê derbas bikin. Her li ser van mijaran lêhûrbûn çêbe, hûn ê jî bibînin pêdiviya we jî bi vê heye û pêwîste hûn hewl bidin li ser vî bingehî kesayetekê ava bikin. Hûn ê jî nexweşî û nêzîkbûnên kevnar ên jinê û ev bi nêzîkbûnên ne asayî yên cur bi cur bilêvkirinê çiqas reftarên ketîne binirxînin û vê rewşek ne hêjayî xwe bibînin. Kesayetek kamilbûyî, rola rêbertî jî di nav de kesayetek zêdetir ji xwe bawer, kesayetek wisa hêjayî xwe dibîne û berdêla wê çi dibe bila be dibîne ku tevgera herî rast ev e, xwe gihandina astek wisa dê we di jiyanê de hîn zêdetir bi îdîa bike. Fikir û reftarên azad, di çareserkirina gelek nakokiyan de dê hêza ku pêdiviya we pê heye ava bike. Polîtîkaya me jî di vê çarçoveyê de pêş dikeve.

Em naxwazin we weke kesayetên pir lewaz û pêdiviya wan bi eleqederbûnê heyî bibînin. Ne hûn neçarin wisa bin û ne jî kesayeta we ya rasteqîn wisa ye. Ev rewş hinekê ji hêla bandorkirina civakê ve derdikeve holê û hinekê jî tê ferzkirin. Hûn anîne rewşek wisa nikare henase bigirin. Elbet sedemên vê hene û diyare ku beşdarbûnek biyolojîk jî tineye. Di rojên nêz de 8’ê Adar’ê Roja Jinê hat pîrozkirin û niha jî 21’ê Adar’ê di nava Ereb’an de weke roja dayîkê, li cem me jî weke Newroz tê pîrozkirin. Di vê mijarê de gelek tişt hatin nivîsandin. Sond û çalekiya me, gava pêşî rê dayîna kesayeta jinê ya serbixwe û çalekiya çekdarî jî di navê de di xebatên şoreşgerî de beşdarbûna wê ya karbidestî avakirine.

Wisa tê fêmkirin ku mînakên di ezmûnên gelek şoreşan de hatine jiyîn, em ê zêde nejîn. Ji ber di mijara jinê de mercên Kurdistanê hinek din hişkin, zêde ji pêşxistina pêwendiyan re dest nade. Ev merc nêzîkbûna herî biçûk a di navbera zayendan de vediguherîne dijbertiyê. Elbet em jî naxwazin derî ji pergalê re vekin. Her çendî em yeqîn dikin ne başe û jê aciz jî bin, ji bo paşverûtî di vê mijarê de ji xwe re amûran nebîne, em jî neçarin di astekê de hişkbûnê bimeşînin. Ne ku em ji pêşketin, nerimbûn û zêdebûna pêwendiyan ditirsin an jî jê dûrin wisa dikin. Ji ber hûn jî, civak jî vê baş ranakin lewma wisa hewce dike.

Nêzîkbûnek me ya pir serbixwe û wêrek ji mijara jinê re heye. Ger hûn bikarin xwe çareser bikin, partî jî dikare di vê mijarê de hinek pêşketinan derbixe holê. Lewra em nikarin sivikbûna we weke rebenên ku tim pêwîstiya we bi eleqederbûnê heyî bibinin raber bikin. Ne hûn wisa ne, ne jî li bendê bin wisa bin. Berovajî hûn ê jî ji bo şoreş û gelê me bi serfiraziya xwe ve hêza jiyînê raber bikin.

Ev mijar heya bêjî hêjayî baldarbûnê ye. Ji ber ku pirsgirêka jinê, welatên Ewrûpa û sosyalîst jî di nav de, hêjî li gelek welatan nehatiye çareserkirin û weke pirsgirêkek girîngiya

xwe diparêze. Êdî rewşek bi her awayî çareseriya xwe ferz dike tê jiyîn. Eşkereye ku ji ber dema borî pir xirab û nebes nêz bûne, pirsgirêk heta niha jî hebûna xwe didomîne. Pir vekiriye ku heta niha ji bingeh ve nêzî pirsgirêkê nebûne. Em jî van berçav digirin û wisa nêzîkbûnek baldar dikin. Xelata herî bi nirx a ji we re bê pêşkêşkirin jî ev e. Çawa ku, em bi mebesta vê roja nû peyama xwe gihandina jiyanek nû didin gelê Kurdistanê, ji bo hûn xwe bigihînin azadiyê em rê li pêşiya we vedikin. Ji bo hûn rasteqînî, kamil û bi bawer bin em hîn zêde we bi pêdiviya çareserkirina çarenûsa xwe re rûbirû dihêlin. Ger em jî mînaka têkîliyên herî xirab ên li ser jinê tên barkirin û helwestên herî zêde hûn jî jê re dibin amûr, em bidin, dê bibe nirxandinek herî xirab.

Bawer dikim ku ji bo we jî, ev xeleka têkoşînê me xwe gihandiyê, pêwîste vebijêrka we jî be. Ev di xwe pêgihandina bawerî, difikire, di heman demê de dikare xwe tevlî jiyana rojane bike jî dibe gavek. Em jî di vê çarçoveyê de ji we tevlîbûnek bi hêz dixwazin. Vebûna ziman û fikir, li ser vî bingehî pêşketina reftarên kamil, tê wateya mezinbûna di nava xwe de. Divê neyê ji bîrkirin, hûn ê xwe bigihînin mînaka kesayeta nû, xwe mezin bikin û bînin rewşa hezkirin û rêzdariyê. Gelek reftar hêrsê ava dikin û jixwe ev jî ne hêjayî we ye. Nexwe hûn ê bizanin berzbûn û rakêşweriya jinê saz bikin û vê narînbûnê raber bikin. Jin di civak û şoreşê de tê wateya berzbûn, balkêşbûn, helwesta adîlane, di asta herî pêş de fedekarî û wêrektiyê. Nexwe hûn ê wateyek pir mezin bidin wêrekî, fedekarî, hezkirin û rêzgirtina ku pêdiviya çêkerê pê heye û tevkariyê jê re bikin. Harbûn, weke sitiriyan bi her kesî re çûyîn, şûna xetimandina pirsgirêkê, balûpaliya ku rêheval pir pê hewce ne, fedekarî raberkirin û dikarin bibin hêceta jiyanê ya herî bingehîn. Ev ji bo me tevan hewce dike. Bi rastî jî jiyana bê jin nayê hizirîn. Lê jiyanek bi jinê re jî, dikare mirov hem ber bi rewşek lanetî hem jî pîroz ve bibe. Hûn jî weke parçeyek vê jiyanê ya ji venaqetê, di mijara berzbûnê de bi israr

bin. Qetiyen ne raste ku hûn ferz bikin û bixin rewşa barbûnê de. Di vê mijarê de berzbûnek ji we hêvîkirin weke ku mafek me ye, ya herî zêde hêjayî we jî ev e. Divê misoger hûn xwe bigihînin rêzdarbûna têkoşîna bi xwe re. Rêzdariya piranî li hember jinê bê raberkirin, girêdayî rêzdariya li hember civak an jî hawirdore. Xirabe ku hûn xwe di rewşa tinebûnê de bihêlin. Ne mafê we heye ku wisa bikin, nê jî mafê me heye em wisa nêzî we bibin.

Di wateya feodal de jin meselek namûsê ye. Jixwe narînbûna burjuva ya di vê mijarê de tê zanîn. Bes em van têr nabin û heta şaş dibînin. Tişta em dixwazin pêş bixin hîn watedare. Di vê mijarê de peywirên nehatine kirin, pêk nehatine û nêzîkbûnên bêwate hene. Elbet ev ne başin û we jî biçûk dixe. Di nava partî de biçûkxistina we, qîmeta me jî ava nake. Em ê pêwendiyek kûrtir û rêhevaltiyek watedartir pêş bixin. Lê divê em bizanin hêjayî vê bin. Nêzîkbûnek wisa pir girînge. Em hewl didin li ser vî bengehî we di nava pêwendiyên rêhevaltiyê de bigirin û bihêz bikin. Em zêde bi rojaneyan neyên xapandin, cewherê binêrin. Em ê di vê mijarê de misoger sivikbûnê nekin û we hêsan jî nebînin. Em ê we di nava jiyanek sivik de negirin. Dê teqez tîpa jina xatira wê heyî, rêzdarî nirx dibîne û çavkaniya hezkirinê ye pêş bikeve.

Dê jin jî di nava têkoşîna azadiya Kurdistanê ya pêş dikevê de vebûnek mezin bike. Wê ev jî bibe têkoşînek ku jin jêhatiyên xwe pêş dixe û kesayeta xwe ya rasteqînî dide mezinkirin. Em ê di vê mijarê de misoger bi israr û rêgez bin. Em ê hişyar bin ku we di têkîliyên sivik de nedin xwarin û nebin amûra sivikbûnên we jî. Dema hûn jî bibin şahidên pêşketinên wisa hûn ê mat nebin. Nêzîkbûnên me nayên wateya têkîliyên cînseltî yên sivik. Jixwe burjuva di vê mijarê de ya herî ketî û xizmetê ji mêtîngeriyê re dike dide kirin. Ne pêdiviya we bi vê heye, ne jî em ê di vê mijarê de ketî bin. Tişta ku pêwîste ya we be ji bo kesayeta we nebe jî, divê hûn bikarin ji bo cînsê xwe ava

bikin. Li gorî xweseriya Kurdistanê ya herî nêzî cewhera netewî ye girseya jinê ye, lewra divê di azadiyê de jî xwe ji nû ve avakirinê de di asta herî pêş de beşdarbûnekê bike. Pêdiviya jina Kurdistanî bi rêberiyek weke PKK'ê heye. Ger hêj niha ve beşdarbûnek wisa berz dike, ji ber di ferqa vê rastiyê de ye. Ger di nava PKK'ê de hinek nirx bi dest xistine, ji ber ku kêm jî be di ferqa hewldanên me yên di vê mijarê de ye. Têkoşîna azadiya me ya ku pêş dikeve, dê bibe azadbûna jina Kurdistanî. Azadbûna jina Kurdistanî jî, dê Kurdistana azad be.

***Adar 1990***

## Di Pirsgirêka Jinê De Çareseriya Azadîxwaz Em ê Ji Xwe Dest pê Bikin Wisa Di Civakê De Berfireh û Serwer Bikin!

Di pêvajoya rizgariya netewî de ji destpêkê ve pirsgirêka herî cidî derdikeve pêşberî me, her çendî weke civakî bê dîtin, lê di arestebûna siyasîbûn an jî çalekgeriyê de, di rastiyê de astengdare, muhafezekar û heta ji yek rolên şoreşa dijber dilîze. Neçar dike ku mirov bi fikrek afirîner û şoreşgerî bihizire. Mijara têkîliyên malbat, jin û zilam her çendî qadek ku hem di asta civakî hem jî di asta pêwendiyên ji rêzê de herî zêde hest xwe didin axaftin jî be, ya rastî pêwîste piranî bi fikir bersiva wê bê dayîn. Misoger ne serdestiya hestan, di bin serdestiya fikra siyasî de, bi vê pênaseya xwe ve pirsgirêkek wisa cidî ye ji bo çareseriyê hewldanek mezin hewce dike.

Ev pirsgirêka civakî ya ku gelek tişt li ser hatiye gotin û di xêra wê de gelek tişt hatiye kirin, mirov dikare bêje dibe ku di bin hişê we de û bingeha cîhana azweriyên we de bicîh bûye. Rastiyek reftarên we ya diyarkere, dibe sedema ji rêderketinên pir xeternak û heta ji aliyê gelek zanyaran ve dibe mijara felsefe û exlaqê. Ji bo ji her alî ve jiyanê bi hêz bike û bigihîne asta nirxek jiyînê, hewce dike bê dahûrandin û sazûmankirin. Bi rewşa şênber a ku di nava me de tê jiyîn re, ne tenê xelekek bingehîn a koletiya me ye, di heman demê de di hewldanên me yên partîbûnê û heta xebatên me yên arestebûna çalakiyan de jî, ji ber rê ji astengiyên mezin re vedike, me jî neçarî nêzîkbûnên şênber dike.

Misoger hewce dike ev mijar di nava rastiya dîrokî û civakî de bi rasteqînî bê destgirtin û ya herî girîng jî li gorî rastiya Kurdistanê bê destgirtine. Ev diyardeya ku bêçaretiya vê mijara xeternak kûr dike û ji binyatek bûhrana mezin re rê vedike, ger bi neştera şoreşê ve nekeve li ser mêzeya emeliyatê û li ser

operasyonek neyê kirin, ger em bi bandorên giran ên kevnar û heta di bin zexta wê de bi hestên vê demê nêz bibin, em ê bi serê xwe yek ji rolên şoreşa dijber a herî mezin bijîn. Di vê rewşê de jî, bê ku pêwîstiya eniya şerê gerim hebe, em ê di vê eniyê de şer winda bikin. Jixwe tê zanîn ku bi gelemperî jî ev rewş tê jiyîn. Ev mijar ne bi şêwaza derketina derwêştî û keşîştî çareser dibe, ne jî bi aresteya hest û kevneşopiyan. Bi nêzîkbûnên kor, sînornenas û hestên qet nehatine perwerdekirin ve çawa derdikeve pêşber wisa dipejirîne, bi nêzîkbûnek hema hat û qediya ve jî pirsgirêk çareser nabe.

Ger em dixwazin vê pirsgirêka ku her qada jiyana civakê bandor dike û bandor dibe, heman bandorê di jiyana siyasî de jî dide der, di têkoşîna azadiya civakî–di rizgariya çînayetî û civakî de-ya em dimeşînin de xwe her tim ferz dike, ne tenê di wateya çors de weke pirsgirêkek siyasî û civakî nebînin. Heta asta hûnerî jî bigirin dest û weke hêmana bingehîn a xweşikbûna jiyanê pirsgirêkên mirov jî di nava me de ji rastiya mijarek xirab derxistin, ev weke pirsgirêka jiyanê dîtin, bi qasî asta wê ya Ol'î û felsefî, asta wê ya siyasî, hunerî û exlaqî jî hesabkirin û wisa girtina dest, weke şêweyek jiyanê dahûrînin û ji nû ve vesaz bikin. Nêzîkbûnek wisa dê rê ji pêngav û çareseriyek rasteqîn a bingehîn re veke.

Di roja me ya niha de di nava netewên ku di mercên netewî û civakî yên herî pêşketî dijîn de, em dizanin û dibînin ku çareserî di astên cuda de tên jiyîn. Dîsa weke sazî, em dizanin ku di asta pêwendiyên rojane yên ji jiyana me pir cewaz, gelek nêzîkbûnên cur be cur hene. Di nava civaka me ya şoreşgerî de jî, em dizanin û dibînin ku gelek çareseriyên rast an jî şaş ku em newêrin bijîn, tên jiyîn. Jina ku weke kesîma bindest tê nirxandin, ji hêla madî-manewî û fîzîkî ve hinek din pêşve diçe, lê em nikarin bêjin ku tam gihiştiye çareseriyekê. Ev pirsgirêk hêjî weke pirsgirêkek girîng, li her welatî hebûna xwe bi bandorek

mezin didomîne. Dibe zemînê nîqaş, rêxistinbûn û çalekiya tevgerên civakî yên bingehîn. Ji ber ku em weke tevgera partî ya şoreşger ji pirsgirêkê re nêzîkbûnek bingehîn a rastiya netewî û civakî pêş dixe esas digirin û wisa nêz dibin, di vir de jî nêzîkbûnek bi rêgez hewce dike. Em çareseriyên takekesî–çi çareseriyên bi navê lîberal ên dûrî rastiya civaka me, çi jî nêzîkbûnên muhafezekar û kevnar ên encamên wan qet nayên hizirandin-napejirînin. Ger em van bipejirînin, dê mezinbûna partiya me bixe, berovajî bike. Ger baş li ser neyê rawestandin, ji ber ku dê neyê ferqkirin bi demê re wê ji rê derbikeve, jiyana nava partiyê birizîne, bê rêgez bihêle, xirab bike û di encamê de ber bi rev û îxanetê ve bibe. Jixwe di demek nêz de me mînakên vê dîtin. Em vê pirsgirêkê ji destpêkê ve mijareke bi hesasiyet nêz dibin. Heta weke gelek caran hatî gotin, bi qasî girêka kor a mêtîngeriyê, weke girêkek kor, mijara têkîliyek xeternak, weke xeleka şoreşa dijber, her tim diyardeyek xeternak li pêş me ye.

Gelek caran tê gotin, civaka Kurdistanê di rewşek sîxurtiya objektîf de hatiye xistin. Lê belê amûra herî bingehîn yek jê ya sîxurtiya objektîf jî, saziya malbatê û heyberên vê saziyê ne. Lewma divê mirov bizane di rastiya wê de jî vê bide rûniştandin. Saziya malbatê û têkîliya jin û zilam a di nava vê saziyê de teşe digire, xwedî sekna herî xeternak a sîxurtiya objektîfin. Amûrek wisa ye gelek diyardeyên şoreşa dijber û cîhana serdest-ger ev mêtîngerî be dibe ya wê, ger malbatek be dibe ya wê, ger kesayetek be dibe ya wê, saziyek wê ya aborî û siyasî jî dibe-gelek rehet dikarin bikar bînin. Di destê yekem de ya ku ev saziyên jorîn pêş dixin û zêdetirîn bi sîxurtî nêz dibin, ev têkîlî û diyarde ye.

Em danin aliyekê ku di nava me de çend sîxurên dijmin ên bi zanebûn hatine û xebat dimeşînin hene. Dibe ku bandora van a di nava me de pir kêm be. Lê mixabin sîxurtiya objektîf a li derdora vê têkîliyê pêş dikeve, bi serê xwe her tiştî dide dest û

têra tinekirinê dike. Di dîrokê û roja me de, gelek caran li derdora vê saziyê peymanên siyasî û pişgiriya civakî hatine pêşxistin, ne vale bûn. Ev saziya ku weke raveya nêzî hevbûnê ya vebijêrka destpêkê hatiye ravekirin, we jî ji nêz ve bandor dike û gelek caran ji ber ku we xafil digire, hûn neçar dibin berdêla vê jî bi jiyanek qehra wê giranbiha bidin. Tê gotin ku; "Radeya ketîbûna civakê, girêdayî radeya ketîbûna malbatê û jina di nava wê de ye." Ev ji hêla asta pêşketina malbatê ya netewî û siyasî ve jî wisa ye. Ji hêla rastiya netewî û siyasî ve weke sazî ketîbûn di çi astê de be, weke sazî ketîbûna malbat û jinê jî, kolebûna wê jî di wê astê de ye. Elbet zilam jî di heman astê de ketiye û em dibînin ku tine dibe. Nexwe divê em yekser li ser vê xalê rawestin: Asta me ya siyasî ya ku heyî, çi asta wê ya leşkertî, çi jî ya rêxistinkirinê de dibe, sedema evqas paşketiye, asta ketîbûna ji ber vê têkîliyê tê jiyîne. Korbûn, tarîtî, bê teşeyî, kirêtî, çewtbûna asta siyasî ya xwe bi gelek şêweyan ve dide der, sedema nepêşketina hişê we ya çalekiyan û nerêxistinbûna ku hûn dijîn jî ev e. Em ji kîjan aliyê ve lê binêrin bila be, ne gengaze ku em we wisa nenirxînin. Rewşa gel danin aliyekê, em li vir behsa civaka partiyê dikin. Min gelek caran ceribandinên xwe ji we re mînak dan. Dema em bi pergalên netewî û civakî, mantiq û sepanan, raveyên şênber û teorîk ve rûberûyê hev tên, yek ji mijarên herî zêde em zehmetiyê dijîn, dikarim bêjim rewşên ku em li derdora vê mijarê dijîn ve rûbirû dimînine. Saziya malbatê ku cînsên beramberî me li ser dihizire, kevneşopî, qanûn, ev rewşa ku di nava jiyanê de dida der, nexasim di demên me dixwest tevgera civakî û ramana wê ya pêşengî pêş bixin de, me dît ku siyaset û rêxistinê çiqasî ji nêz ve bandor dike. Lewra me hewl da hîn kûrtir têbigihijin, em hizirîn çiqas dikarin bibin hêza çareseriyê, nexasim dema em bandora şoreşa dijber bişkînin em çawa dikarin bixin xizmeta şoreşê de û hewl da dahûrînek hûrûkûr pêş bixin. Me helwestek qet nebe em bikarin zerara wê sînordar bikin, li gorî xizmeta şoreşê bi rêkûpêk

bikin, ger tiştek hebe ji bo şoreşê bê bidestxistin esas girt. Me ev jî di asta rêgez de esas girt û wisa hewl da çareseriyan pêş bixin.

Di vê manê de hewce nake em dahûrînên ku me kirine dubare bikin. Ji ber ramana têkoşîna me ya şênber heye, hewce dike bi baldarî bê lêkolînkirin û ramanên ji nîqaşê re vekirîne. Em nikarin bêjin wisa qet şaşiyên wê nînin û ne hêmanên ku pêwîstin bên kûrkirine. Ev nirxandin, di asta pêşnûme de û hîn zêdetir jî ji bo rê ji nîqaşên erênî re veke hatine pêşxistin. Ger gengaz be dikarin hîn ziravtir û di derbarê aliyên wê yên pêkanê de nîqaş bên pêşxistin û herî zêde bi armanca rê ji helwesta sepanê re veke hatine bilêvkirin. Ev xebat, nirxandin û dahûrîn, ji bo encamên partiyê û hêzên rizgariya netewî her ku biçe rê ji pêşketina jiyanek nû re vekin tên pêşxistin û qet nebe dide diyarkirin ku pêwîste di nav me de jiyana bi rêgez çawa were pêşxistin. Dema em encamên hinek dahûrînan ber çav digirin, xalên ku hewce dike bên gotin, jixwe tên gotin. Niha jî tişta ez hinekê dikim wisa ye, her tim li serve zêde dikim, pêwîste ev jî weke tevkariyekê bê dîtin. Hewl didim berhemên pêşketina pratîkî ber çavan re derbas bikim, dahûrînim û vê jî bi armanca rê ji encamên erênî re veke dikim. Derketina Rêbertîbûnê, bêguman hewce dike xwe di vê mijarê de jî lêpirsîne û darezîne. Ger xwe bike mehkumê nêzîkbûnên teng, asteng û seresere yên dîrokî û rojaneyî, tê wê wateyê ku birînek xedar a wî rêberî heye. Lewma derketina rêbertiya me jî, di derbarê vê pirsgirêkê de mînakên dîrokî çiqasî balkêş dibin bila bin, çareseriyên rojane jî çiqas xwe ferz bikin bila be, ger nekare weke di her astê de heyî afirîner nêzî xwe jî bibe, xwe mehkumî teqlîda dîrokê û tengbûna rojaneyî bike, dê pêngavek vebûnê ya şoreşê ku pir girînge seqet bike. Nexwe wê rêbertî pir baş bizane ev çarenûsa netewekî pir xirab bandor dike, dê dervî armancên jiyana ku tê bêrîkirin û di xêra wê de şer tên meşandin bê hiştin. Zerarên di vê mijarê de tenê bi kesayetekê ve sînordar namîne, bi qasî kêliya tê jiyîn dê pêşerojê jî xirab bandor

bike û li gorî vê rêya pêngava derketinê bi cewherî bigire dest. Ji bo afirîner û azad bike jî, dê hemû hêza xwe bi kar bîne. Bêguman ne li bendê me asta we jî heman weke asta min bê destgirtin. Em ê rê diyar bikin, rêgez diyar bikin, dibe ku hewl bidin bibin mînak, lê em nikarin ji bo heman ast bê girtin ferz bikin, weke polîtîkayek û nexasim fermanekê bidin pêş. Lê pir vekiriye divê hûn jî vê esas bigirin. Pêngava Rêbertî, ji bo pêşeng jî şêwaza pêngava pêşvebirinê ye. Her çendî bi heman tempo û hûrûkûrbûnê neyê jiyîn jî, misoger divê nêzîkbûnek baldar hebe û bi qasî hêz têrê dike hewldana sepanê pêş bikeve û weke pîvan tevkariyek bê kirin.

Em vê qadê, weke qadek ku şerek pir cidî tê kirin dinirxînin. Pêwîste hûn jî vê di vê pênaseyê de têbigihijin. Di civaka Kurdistanê de mijara ku herî zêde di xêra wê de şer pêş dikevin û xala debarê ye, ji bo vê we dost û dijminê we daniye aliyekê. We şerim nekir welat û azadiyê di carekê de bin pê bikin. We xwe pir bê rû da dest, di bin navê zilamtî û jinbûnê de hemû şaneyên xwe herimand. Ez jî li gorî keyfa xwe, teng û yek xetê nêz bibûma, an jî ji gelek aliyan ve bi lêkolîn û lêpirsîn nêz nebûma, yeqîn dikim îro zehmet bû me behsa pêşketina PKK'ê kiriba. Ger min jî hemû xirabiyên derdikevin pêşberî me weke gelek ji we ji xwe re pejirandî bijiya, misoger me ne dikariya xwe bigihînin dahûrandinên li ser mêtîngeriyê. Lewra ne me dikariya şerek li dijî mêtîngeriyê bidin destpêkirin û ne jî bidin pêşxistin. Dîsa ger me bandorên ol'î yên giran, bandorên giran ên lîberal ên burjuva–li gorî min ne lîberal jî, ji ber ku lîberalîzm bi me re nîne, zaravayê kemalîstî yên feraseta burjuva- weke şêweyek jiyanê bipejiranda, dev jê berdin em xwe bigihînin rastiya PKK'ê, me ne dikariya em bibin karmendek jî. Di vê manê de weke kesek xwe ji rastiya netewî û civakî re girtiye, me dikariya dawiya xwe diyar kiriba.

Encamên hinek diyarde û xirabûn bê rexne weke heyî pejirandin wisa ye. Belê ger em ji vê mijarê re jî weke ji me re hatî pêşkêşkirin nêz bibûna, bêguman dê rastiya me bijiya ev mînaka xirab derbas nekiriba. Sedema herî bingehîn hûn pêş nakevin xwe pir alî perwerde nakin û li ser vî bingehî xwe ber çavan re derbas nakin. Ji ber hûn hesab ji bermahiyên serdema navîn, kapîtalîst û rêbazên kemalîst ên pêşketina burjuva naxwazin, her wiha ya ku hewce dike hûn erênî têbigihijin hesabxwestinek bi demokratîk-serxwebûner, demokratîk-sosyalîst û bi wê re yekbûnek cidî pêş naxin, dibe sedem hûn bi binyata xwe îro pir tê rexnekirin re rûbirû bimînin. Misoger ev hêmanin asta we bandor dikin. Tê zanîn hûn ji ber van hêmanan çiqasî li dervî taktîk tevdigerin, we jiyan çiqas xirab kiriye û çiqas zehmetiyê dijîn ku bibin hêza çareseriyê. Di nav çarçoveya dîrokî ya mercên şênber de, hûn jî dibînin ku ji ber hûn ji civakbûnê bandor nabin, xistine çi rewşê. Ji ber hûn hewldanên xwe yên şoreşgerî jî teng dikin û zêde ne bi îdîa ne, nêzîkbûnên we yên pir reformîst we li hember pêşketina şoreşî lewaz dihêlin. Bi rastî jî tişta em ecêb dimînin hûn nikarin xwe ji rewşên herî hêsan jî rizgar bikin. Hûn bi vî halê xwe ve li pêş şoreşa ku îro gelê me pir baş dibîne astengin. Ji ber perwerde di wextê de nayê kirin û ji ezmûnan dersên hewce dikin nayên derxistin, ji hêla objektîf ve we di nava helwestek ku xizmeta şoreşa dijber dike de dihêle.

Hûn rewşek ji vê saziya civakî ya cidî bandor dibin, pêngavek şoreşgerî ya baş ser nexistiye, bandorên çewt bi koranî dijîn, qet rexne nakin, rexne bikin jî seknek rast diyar nake dijîn. Heta ji ber ku hinek ji we nêzî pirsgirêkê jî nabe, hîn zêdetir xelekek cûcetî bi ser cûcetiyê ve û muhafezekariyê bi ser muhafezekariyê ve dike dijîn. Di vê wateyê de em mînaka xwe dinirxînin.

Dizanim, dibîhîsim û bi ser de diçim ku pêwîste hebûna pirsgirêkê bê pejirandin û weke pirsgirêka şoreşê bibînim, xwe ji

dervî vê nebînim, pir bihizirim û şêweyên afirîner bibînim an jî erkdarim ku rê ji pêwendiyên wisa re vekim û hewl bidim van erkan diyar bikim. Weke şêwaza min a destgirtina hemû pirsgirêkan, bêguman dibe ku di vê pirsgirêkê de jî jan, şaşî û şermî hebin. Bal bidinê, têkoşîna girêdayî Rêbertiya PKK'ê pir zehmet pêş dikeve. Rê ji êşên mezin re vedike. Jixwe dema em di şoreşa Kurdistanê de zehmetiyê berçav digirin, tê payîn ku dê zayînek bi tenduristî bi êş û jan be. Heta li cem me her tişt hinekê jî bi xwîn û xwêdanê û birînan pêş dikeve. Şansê tenduristî, nexasim pêşketina aştiyek peresanê nehatiye dayîn. Ji ber rastiyên me ji nêz ve tên zanîn, mirov dikare bi rehetî bibîne ku ev çiqasî rasteqîne. Lewra bi qasî hewce ye pêngava Rêbertî bê nîqaşkirin pêwîste ewqas jî bi qasî hebûna pirsan çareseriyên wan jî bikevin meriyetê.

Çareseriya hêsan–çareseriya teng û seresere-dibe sedem ku pirsgirêk rast neyê dîtin û ev jî ji bo şoreşê windabûnek cidî ye. Kesên ku ji bo malbatê direvin, an jî bi dilketinek xwe ya hêsan îxanetê li nirxên herî mezin dikin û bê dudilî dijîn û dibêjin ez bûhranê dijîm, dibe ku ji sedî nod çavkaniya bûhranê ne û em vê rewşa wan berçav bigirin. Divê em ti caran xwe ber bi van xeyalan ve bernedin. Lewma divê em bizanin em bi rewşên pir cidî re rûbirû ne. Yek ji xala ku mirov nikare bêje "min kir û qetiya" jî ev xale. Di vê wateyê de carina jî wisa dihizirim: Gelo hûn di vê mijarê de gihiştine asta pênasekirinê? Gelo hûn dikarin bi pênaseyek şoreşgerî ve hevnasînek şoreşgerî pêş bixin? Hûn dibêjin ez hewl didim rewşa çareseriya PKK'ê ya di vê mijarê de têbigihijim. Pêwîste mirov çi ji vê re bêje? Pirsgirêkek mezin a partiyê ancex dikare bê pênasekirin û nîqaşkirin. Elbet sedemên vê jî yên bên fêmkirin hene. Hevnasînek baş, ji bo rêhevaltiyê gavek girînge. Ji ber bê ku binase yekser bi kesên ne diyare çiye re hevaltî tê kirin.

Lewra pêwendiyek cidî hêsan girtina dest û li ser vî bingehî çareserkirin ma ji bo me dibe rêyek rast? Ger em hinek din zelal bikin, nikarim bêjim em gihiştine rastiyên çar bi çar. Lê ji bo zemînek nîqaşê ya baş girînge. Em hewl didin nêzîkbûna azadîxwaz bi teşe bikin, rastiya PKK'ê vekirî bihêlin. Hewldana me ya herî şênber jî, saziyek azad û ketina nava vê saziyê de helwesta aliyan a girêdayî diyardeyên weke azad, dilxwaz, wekhev û esasî serbixwe–azadiya civakî-,vê weke rêgezek ku ger nebe nabe berçav digire, hemû pêkanan bi wir ve girê dide, di vê wateyê de dibe antî-teza hemû sazîbûnên li Kurdistanê, wan derbas dike û bi têkoşînek girîng ve wan pêk tîne rave dike. Gelo em di kîjan asta vê pêwendî û sazîbûnê de ne? Em ji bo çareseriyê çi dikin? Vekiriye, em di nav hewldana vekirina rêya vê de ne. Em ji aliyê perwerdekirin û ezmûnan ve vê dikin. Di vê wateyê de ceribandinek û her çendî weke dubare jî bê dîtin, her tim di ber çavan re derbaskirin pir girînge.

Çawa ku di labûratuwarekî de hejmarek zêde ceribandin ber bi selmandin û çareseriyê ve diçin, di vê qadê de jî hinekê pêwîste mirov wisa bigire dest. Pir zehmete ku mirov fermanek xwedayî ya rast di pêşî de bide. Jixwe di civakê de pêşketinên bi vî rengî jî tine ne. Pêşketinên wisa ji destpêkê ve hatî hizirandin ku bêje "çêbe" jî ne gengazin. Pêdivî di bin bandora wan a xwe ferz dikê de afirînerî derdikeve holê. Rastî wisa ye. Di qonaxên ku ev pêdivî xwe ferz dikin de, diyardeya ku em dibêjin rêgeze derdikeve holê. Ango esasên sepanê yên qenc, ên di radeya exlaq û zanistî de derdikevin pêş û weke saziya binyata jorîn fikir û saziyên ku bersivê didin derdikevin holê. Belê saziya malbatê û kevneşopiyên wê, li ser vî bingehî derdikevin holê. Lê ger êdî ev bi azadiya heyî re, bi pêngavek azadî ya mezin re di nava nakokiyê de be, bêguman dê ev bi tundî bê rexnekirin, dahûrandin û derbaskirina vê jî esas bê girtin. Di vê qonaxê de pêdivî ji her demê zêdetir pêş dikeve. Lewra rêgez û exlaqê nû xwe dide pêş.

Di şerê Hz. Muhammed ên bi putan re eleqeya wî û encama ku di vê mijarê de girtî pir ecêbin. Di roja me de her çendî weke mijarek laîk li ser pir tê nîqaşkirin û hinek kiryarên bi xwîn jî pêş ketin, dîsa jî ji aliyekê ve parazvanên laîktî, aliyê din ve jî kesîmên dijberên laîktiyê ger hêjî hebûna xwe didomînin û di roja me de rê ji pirsgirêkek siyasî ya cidî re vedikin, ev jî dide diyarkirin ku hewce dike em pir cidî li ser vê pirsgirêkê rawestin. Îro li Tirkiyê yek ji mijarên herî zêde li ser tê nîqaşkirin, mijara poşî û turbanê ye. Ji ber ku jinekê di vê mijarê de li gorî xwe di bin navê laîktiyê de helwest girtiye, bi narîncokekê hat parçekirin. Kesek ku got; “Ez dadikevim çavkaniya Quranê û rastiya dibêjim” jî hat kuştin. Ango hêjî weke mijarek pirsgirêkek pevçûnê di rojevê de tê girtin.

Vêca, çareseriya Hz. Muhammed çiye? Di Îslamiyet û pêvajoya saltanata wî de pêşketinên xweser çêbûn. Dîrok dibêje ku, di destpêkê de zarokên keç zindî dihatin binaxkirin. Di vir de zewaca Hz. Muhammed a pir jinan re û pir cariyan re jiyana wî, gelo dema em îro saziya malbatê ya berçav digirin pir xirabtire? Gelo dibe rewşek dervî exlaq? Na! Dema di nava xwe de berçav digirin, di pêşketina civakî ya wê demê de gavek pêşveçûyî ava dike. Li gorî xwe çareseriyek peyxamberî ye, lê dîsa jî çareserî ye. Her çendî ev paşê hatibe berovajîkirin jî, veguherandibe saziya haremtî jî, ew weke hatî serê her şoreşê çewtbûnek çepgirî ye û berovajîkirine. Quran dibêje di destpêkê de, nexasim zindî binaxkirin weke tawanek mirovahî hatiye dîtin û hewl hatiye dayîn pêşî lê bê girtin. Weke rûyê jinekê hewldana nasên xwe, zewceyên xwe bilindkirinê, heta îro jî navê Hz. Fatma, Hz. Eyşê û Hz. Zeynep ku li we tê kirin, berhema serdemekê ye. Belê paşê, di qesrên Emewî, Abbasî û Osmaniyan de jin hatin girtin û heta roja me nexasim ev pîvanên feodalî li dijî jinê pir xirab hat bikaranîn. Îro Îslamiyet vê dibêje–di bin navê rêgez wisa ye de- di civaka me ya niha de jî jin li hember azadiya zayendî tê girtin, bi vîna yek alî

ve girêdan û weke endamên hûn hemû ji nava wê çandê derketine bandora wê ya giran dijîn. Bandora çandek wisa dîrokî ya di jiyana we de ji ber ku şênbere û em jî vê rastiyê berçav bigirin, em ê baştir rewşa pevçûna heyî û hinek xisletên wê bi bîr bînin. Ji aliyek din ve kapîtalîzma ku li dijî civaka feodalî pêş dikeve, jin û malbata di civaka feodal de ji kur digirin û dibin kur, dîrokek vê jî ya pir dirêj heye. Ber bi roja me ve jî em dizanin jin û malbat û bi wê re jî zilam ber bi helwestek cuda ve diherike, ji ber pergalek di civakê de vê saziyê ji metabûnê re vekirî dihêle. Ji ber ku yê herî zêde mohra xwe li sermayê dide zilame û ew bi xwe hêjî lewaze, ya dibe mijara sermaye jine, weke mijarek metayê ya girîng tê karanîn. Di jiyana civakî de di gelek amûrên reklamê yên cur be cur de weke amûrek pêşkêşkirinê ya bingehîn xizmetê dike.

Ev nêzîkbûna kapîtalîst û emperyalîst di nava civaka Tirkiyê û hêdî hêdî di nav me de jî diyar dibe. Dibe ku ji mijara bûna sermaya serdema feodalî zêdetir durû û kirêt bûna mijara sûkê li vir tê pêşxistin. Pêşkêşkirina jinê û xwe di bin dîmenên cur be cur de radixe ber çavan, azadiya li ser vî bingehî fêm dike, her çendî em bêjin lîberaltiya burjuva ye, weke amûrek firotinê ya kevinbûyî didin karkirin û di bingeha nêzîkbûnan de jî bandorek wisa xwe dide diyarkirin. Mirov dikare rehetî bêje danûstandinên têkîliyek girêdayî pere û hêza çors serdeste. Her çendî çareseriya sosyalîzma pêkhatî di asta pêşveçûyî de be, lê em dikarin bêjin di encam de xwe di rêgezê de rizgar nekiriye û tam ne gihiştiye çareseriyê. Bêguman di sosyalîzma pêkhatî de hewl hatiye dayîn ku çareseriyên çors ên kapîtalîzm û emperyalîzmê bên derbaskirin û bandorên feodalî jî zêde hatine sînordarkirin. Lê dîsa jî îro kapîtalîzm bi şêweyek lezgîn weke rêbazê rizgarî vedigere sûkê û dema em vê jî berçav digirin, di kesayeta jinê de diyarbûna vê, hewldana wê ya bûna sûka baş, ger em mînak bidin û binirxînin, em ê bibînin ku sosyalîzma pêkhatî jî xwe ji vê rêgezê rizgar nekiriye. Heta weke cureyek kapîtalîzmê ya cuda derdikeve holê.

Ger em jî rastiya xwe di ronahiya van pêşketinên dîrokî û rojane de bigirin dest, dê bê fêmkirin ku pêwîste nêzîkbûnên me yên azadiyê çi bipejirîne, çi red bike û rasteqînî binirxîne. Em ê li vir carek din rêgeza xwe vebêjin. Yekemîn, divê bi çarçoveya paşeroj û rojaneya aliyan vedibêje re, rexneyek tund, bi têkoşînê ve bê girêdan. Ya duyem, divê li şûna vê ya ku bê avakirin di nav pîvanên hewce yên wekheviyê de bên esasgirtin, nêzîkbûna xwe naspêre hêza çors–jidilbûn-bihewîne. Nexwe dê bingeha wê azad be, xwe nespêre zora çors û jidil be û em dibînin ku pêwîste di nav nêzîkbûnek nû de ev pêwendî pêş bikeve. Nêzîkbûna ku PKK hewl dide rê jê re veke, xwe wisa derxistina holê û hewldana xwe di asta rêgez de ravekirinê ye. Bal bidinê di bin vê de ji bo çareseriyê çi heye! Pêşî pêwîste nêzîkbûnên dîrokî yên hatine berovajîkirin bên redkirin. Dibe ku ev ji hinek we re rehetir bin, lê me jî bi qasî bandorên dîrokî û kevneşopî ber bi xirabûnan ve dibe, nêzîkbûnên weke pîvanên fermî yên pergalê pêş dikevin, em nabêjin lîberal jî bi şêweya xistinê ne û tên rexnekirin û redkirin. Vêca pey vê re çi dimîne? Di nava malbata PKK'ê de têkîliya ku pêş bikeve, xwe naspêre hêza çors û yetkiyê. Bêguman ger kesayet yetkiyên xwe bi heq bi kar tîne, bi heq xwe gihandibe vê hêzê, dê di vir de xisletên erênî derbikevin holê. Bes kesên ku vê berovajî bikin–ev xalek di civakê de gelek caran hatiye berovajîkirin û çewtkirin-fermanan belav dike, xwe dispêre yetkiyên xwe û jiyana rehet birêxistin dike, di vê mijarê de bi temamî dibe karîkatûrê serdestan di nav me de jî pir bi bandorin. Hewl tê dayîn yetkî û hêzê ne di wateya bûna karîkatûra serdestan, di wateya tevkariyek erênî de bi kar bînin. Xwe tam bigihînin jêhatiyên kesayeta azad, bandora kesên beramberî xwe jî berçav bigirin. Ji bilî hemû xisletên xwezayî yên jiyanê li ser esasê ku qada civakê eleqeder dike wekheviyê di her astê de berçav digire, weke encama vê xwezayî bal dikişîne li ser qabîliyeta ecibandin û jidilbûnê, pêwendiyek vê esas digire û

sazîbûnê pêş bixin. Pênase wisa ye. Bêguman dahûrandina vê pênaseyê, veguhertina pêkanînê têkoşînek û hewldanek mezin dixwaze. Çareseriyên bi îdîa jî li ser bingeha pejirandina van rastiyan pêş dikeve. Divê pêşengên di asta pêş de yên partiyê ji endamên ji rêzê û sempatîzanan zêdetir bi cewheriyek mezin çareseriyan li ser van bingehan pêş bixin û neçar bikin. Nexwe dê çewtbûn û berovajîbûn derbikeve holê. Bandora vê ya weke xelekê wê bibe sedem ku hemû rêgezên din bên berovajîkirin. Mînak mirov dikare bêje ku dê bandor li ser rêxistinbûn, siyasîbûn û şer jî bike. Em hinek mînakan û encamên ku pêwîste ji mînakan bên derxistin wisa bi dawî dikin.

Hûn nizanin fikrê xwe pêş bixin. Em ê carek din vê xalê li vir rexne bikin. Ji van nêzîkbûnan zêde encam derxistin, di asta fikir û reftar de dê rê ji pêşketinên mezin re veke. Ev jî ne pirsgirêke. Lê mixabin em we di nav muhafezekarî û bi vê muhafezekariyê re di nav nîqaşek durû, veşartî û heta digihîne sîxurtiyek objektîf, meyil û azweriyekê de dibînin. Ma çi heqê we ji vê re heye? Nexasim weke endamek partî hûn çawa dikarin tiştek wisa bikin? Ev pîvana hûn çiqas bûne endamê partî destnîşan dike. Hûn ê ya ku hewl tê dayîn bê pêşxistin, hem tênegihijin, fêm nekin, lê pir jî fesadiya wê bikin! Ev bi yek gotinî suce, ji hêla objektîf ve sîxurtiye û carina jî ji sîxurtiya dijmin xetertire. Rêgeza azadiyê û çarçoveya nêzîkbûna ji mijarê re yekpare diyare. Heta xalên pêkanê jî hatine destnîşankirin. Hinekê xwe di vê mijarê de ber çavan re derbas bikin, weke ku di nav me de gelek caran derketî holê, berovajî weke dibe sedema rev, îxanet û bûhranê, misoger dê rêhevaltiyek bi hêz û nirxên têkoşînê derbixe holê. Ma çima hûn ji bo vê wêrek nabin? Çima, hûn hewl nadin daku bikarin bi ser cîhana azweriyên xwe yên çewt de biçin? Belê, ger heta niha hewldanên me yên perwerdekirinê weke nirx bihatan dîtin, dê we di astek pêşveçûyî de xwe bigihanda van xalan. Nexwe ji ber sedemên em hewl

didin vekin, ne pêkanîna polîtîkayên partiyê, di vê mijarê de sînorên xwe, şêweya jiyana xwe esasgirtin, dide diyarkirin we ti carî weke endamek partiyê ne dahûrandiye. Ev jî dibe zemîna gelek çewtiyan. Bêguman em ê ti carî çareseriyê weke serdema Hz. Muhammed nekin. Ji ber ku binesaziya jêr û jor a civakê bi qasî mirov nekare bi ya wê demê re berhev bike guhertin jiyaye. Bes ger em hesasiyeta mezin û ziraviya mezin a wê serdemê jî nejîn, dê bibe sedem ku em ji rewşa wê demê xirabtir bijîn. Pêwîste em bizanin azweriyên kor û nêzîkbûnên bêrêz zindî binaxkirinê zêdetir xirab encamekê ava dike. Lewra pêwîste em bi roja me neyîn xapandin, xwe rast bigirin dest, weke di her şoreşa mezin de dibe, ev rêgeza şoreşa me jî ya mezinbûnê ye. Mixabin rewşa we di pêwendiyan de nayên nasîn. Di pêwendiyan de ketîbûn û ketîna tê jiyîn, muhafezekarî û sergirtin, înkar û desteserkirine. Gelo hûn jiyanê çiqasî ji bo hevdu balkêş dikin? Ger em hinek din zelal bikin, gelo hûn nêzîkbûn û xisletên pêwîste bi we re xwe bispêrin jidilbûn û ecibandinê çiqasî digerin û pêş dixin? Di vê wateyê de bûna endamek şoreşê, ma di kesayeta we de pêşketina van encaman neçar nake? Ger neçar dike, hûn çiqasî pêş dixin?

Yekser vê bêjim; partiya me–partiya di bin berpirsyariya min de-weke gelek ji we dihizire, ne hebûna jinê, ne jî ya zilam dipejirîne û rewa dike. Em behsa pêşxistina malbata PKK’ê dikin. Qet nebe bi qasî malbata civakî ya derbasdar, malbata mezin a PKK’ê jî pêş ketiye. Malbat, berhema pêdiviyek pir cidî ye, hem dîrokî, hem civakî, hem jî binesaziya jêr û jor ve tengezariya ku civak dijî weke amûrekê jêvenagere, lewra pêwîste rêgez û pêkanên wê pir cidî bên destgirtin. Çawa ku malbatên we di navê de jiyan kiriye dibêjin; “Pêwîste keç û xortên me wisa mezin bibin, wisa bibin xwedî kar, wisa bizewicin û bên zewicandin”, hinek rêgezên me jî yên malbata me ya mezin û pîroz hene û em ê van jî di teşeya cewherî de pêş bixin. Nexwe weke me pênaseya

wê kirî, di van pêwendiyan de ne xwe sipartina zext û zora di cîhana van serdestan, ne hêza zilamê çors, ne fêlbaziya jinê–jixwe ev jî ji sedî salan ve teşe girtiye-ve, ne jî nêzîkbûnên bûhranên erzan ên di qonaxên zehmet ên xwe firotinê ve dikare encam bigirin. Nexasim ne gengaze ku bi van nêzîkbûna di nav malbata PKK'ê de nirxekê bibînin. Ez tenê behsa rêgez ên ji bo vê saziyê derbas dibe û esasên rêgez û pêkanên ku pêwîste li ser van pêwendiyan serwer bin nakim. Ya herî girîng jî, di van rêgez û pêkanan de xala ku teqez pêwîste esas bê girtin, di xêra malbata we de evqas şehîd hatin dayîn-rêgeza ku hemû netewên nûjen û heta civatên êl û binemalî jî pê ve girêdayî ne-bersivê nade rêgeza serxwebûn û jiyana azad, bi wê re ne di nava ahengê de ye, têkîliyek misoger wê bi hêz nake û asta sazîbûnê em qetiyen napejirînin. Em neyên xapandin û ne xapînin! Ev ne nêzîkbûna me ya erzan û hêsan a rojane ye, ne jî kevneşopiyên korin. Hûn çiqasî bi bandor bin, em ê dîsa jî derfeta pêkan û jiyana van nedin we. Berdêla vê çi dibe bila be, em ê bi rêgeza şoreşê ve girêdayî bimînin.

Di encamê de divê em ya rizgar bike esas bigirin. Jixwe girêdana bi şehîdan ve nêzîkbûnek wisa esas girtinê ve gengaze. Vaye ji we re mijarek şer a din ku pir girînge! Her ku hûn firsendê bibînin, divê bi têkoşînê bi dest bixin. Hûn ji bilî vê di nava PKK'ê de ji jiyan û pêwendiyên erzan re cih nabînin. Her çendî hûn hatibin xapandin, li gorî we çiqas hêcet hebin bila be, dixwazin pirsgirêkê piştguh bikin, dixwazin çareseriyên erzan bibînin, em ê van nêzîkbûnan tevan mehkum bikin. Di vê mijarê de rêgezên asta jiyana partiyê zelalkirin, erka rêxistina pêşenge û di asta pêngavê de ye. Ji bo we û heta gelê me nû çav li jiyanê tê vekirin. Dema wisa jî dibe, ronîkirina rêgezan pir girînge. Pir vekiriye pêwendiyên di nav koranî û tarîtiyê de hatine sazkirin dê pir xeter bin. Hinek mînak hene, em nizanin bêka çiqasî sîxurên sûbjektîfin, lê misoger diyare ku sîxurên objektîfin û gelek ji wan

jî sezayê mirinê girtin. Elbet em naxwazin van rewşan bijîn. Ji bo rizgarkirina kêliyek ku tengaviyê de ye, ev mînakên xwe naspêrin rêgezan û bi lez rewşên dijberiya şoreşê dijîn nayên pejirandin. Ger kesayet xwe dispêre serdestiya rêvebertiya xwe û lewaziyên xwe dide axaftin, qet ne girînge ku pêwendiya xwe bi dijmin re heye yan na. Ango ger em bi dudiliyek an ez, an jî şoreş re rûbirû hiştibin, ev jî dide diyarkirin ku em pir xirab bi şoreşek dijber re bû bi rû hiştine. Her wiha ger dê helwestek bê raberkirin jî, helwesta ku li hemberî şoreşa dijber çibe, tişta di vir de jî bê ferzkirin heman tişte. Belê şoreşa dijber rev e, teslîmbûne û êrîşî şoreşê kirine. Derketina mînakên xirab ên em dizanîne. Vêca ma qey çareseriya rast pir zehmete, ma bi qasî hûn ê nekarin serbikevin ewqasî xirabin? Ma hûn nikarin weke endamên ji xwe bawer kêrhatî tevbigerin?

Li ser bingeha rexneyên pîvanên kapîtalîzma pêşketî û sosyalîzma pêkhatî, em hewl didin çareseriyên ku pêş dixin esas bigirin. Li cem me hinek din çareseriyek radîkal, weke girêdayî bingeha armanc û şerê rizgarî pêş dikeve. Bes li wir di nava naverastek aştiyane de pêş dikeve û lewma dibe ku encamên wê zêde ne bandorker bin. Di nav me de zêdetir balkêş û bi bandore. Hûn nikarin vê bi malbatparêziyê ve dahûrînin. Bi jîndarkirina malbatparêziya kevnar ve ancex hûn dikarin bibin dijberê partiyê. Erkên sîxurtiya objektîf ku civaka hûn jê hatine dane we jî, hûn nikarin pirsgirêkê çareser bikin. Bi şêweyên zêde dildar, takekes, di serê xwe de xeyalan çêdike ve jî çareserî zehmete. Vêca çareseriya têkoşerî û azadîxwazî çiye? Li gorî pêwîstiya pênaseyê, girêdayî lêgerîn, têkoşîn û şerê bidestxistina welat, girêdanbûna wekheviya azadkirin û keda civakê ya di her astê de ye. Weke din jî aliyên pirsgirêkê yên xweser jî hene û em dikarin di rastiya Kurdistanê de van bigirin dest. Tişta ji we re jî dimîne çareserkirina pirsgirêkê ye.

Gelo hûn dikarin bibin milîtanên wisa? Pir vekiriye ku em ê bersiva vê pirsê weke “şerme” yan jî “dema me firsendek ferdî dît em ê çareser bikin” nedin. Berî her tiştî li vir nirx ji kes re tê dayîn û bi qasî wê jî divê kes jî jidil nêzî xwe bibe û tê xwestin di nêzîkbûna kesê beramber xwe de jî jidil be, biecibîne û wekhev girêdayî nirxên bingehîn be. Elbet nirxên me yên şer ku em qet dev jê bernedin hene. Hûn ê wan bixin navenda dilê xwe, xala sereke ya mijûlkirina hişê xwe, bi wan tije bibin û li ser vî bingehî nêz bibin. Ger wisa be, yeqîn dikim dê pêwendî û sazîbûnên ku beramberî we mezin bibin rêzdar bin, weke helwestên pêwîste rewa bên dîtin xwe bidin der û diyar bibin.

Gelo hûn çiqas amade ne ku xwe wisa ava bikin, malbatê wisa bi dest bixin û li ser vî bingehî xwe mezin bikin? Hêzdana xeta partî, çareseriyên demdirêj û demkin ji polîtîkayên partiyê re pêşxistin li ser vî bingehî çêdibin. Ger hûn bikarin xwe hinek din bi hewldanê pêşve bibin, dê ji we tevan camêr û xanimên ku hinekê jî hûn hemû biecibînin derbikevin holê. Em nikarin we bi şêweya xwazginî bi hevdu ve bidin girêdan. Em nikarin dayîn û girtinên herî bê esil ên îro pir erzan û di sûkan de weke rêbazê şoreşa dijber tê ferzkirin, nêzîkbûnên li ser vî bingehî derdikevin holê, ne erê bikin û ne jî bipejirînin. Ez bi giştî pirsgirêkê bi xetên giştî û rêyên çareseriya wê wisa datînim holê. Kesê ji xwe bawer dê vê polîtîkaya partî esas bigire. Nikarim yek bi yek diyar bikim paşerojê hûn çi bûn, çiqas di rewşa rexnedayînê de ne, tawanên we çi bûn, lê pey vê re çareseriya partîbûnê wisa bi israr diyar dikim.

Em ji rexneyê re vekirî dihêlin. Di nava partiyê de tengavkirin qetiyen nîne. Di vê mijarê de heta ku em bi şaşiyên xwe ve xizmeta şoreşa dijber nekin, seza û zextek jî nîne. Di nava nîqaşek azad de dewlemend bihizirin û xwe di nava helwestek azad a pir cidî de rave bikin û bibin xwediyê hewldanekê. Sekna xweşik û baş wisa ye. Weke ku em rêgeza xwe ya wekhevî û

jidilbûnê di asta netewî de didin jiyîn, hewl didin di navbera zayendan de jî pêş bixin. Her ku we firsend dît dikarin nîqaş bikin. Kûr bihizirin û nîqaş bikin. Hevdu nexapînin û nekişînin nava fesadiyan. Di vê mijarê de min jî li pêş azweriyên xwe ne weke asteng bibînin û ne jî weke amûrek bikaranînê bibînin. Ez di vê mijarê de ji xwe re gelek pirsan derdixim û di nava platformek dewlemendiyek çareseriyan diafirînê de digirim. Hewl didim muhafezekar nêz nebim, rêyên çareseriyên erzan pêş nexim, xwe zindî digirim û amade dihêlim. Ev jî hewcedariyek feraseta min a azadiyê ye. Yeqîn dikim pir vekiriye. Li hember yek ji we zextên ku we tengav bike nîne. Wisa bikaranîna derfetên xwe yên rêbertiyê ve jî çareseriyan pêş naxim. Berpirsyartiya rêbertiyê ji we zêdetir min tengav dike. Ger berpirsyariya rêbertî û kes evqas nebûya, dibe ku ez jî evqasî tengav nebûma. Heta dikarim bêjim tevî ku hinekê xweser bû û nêzîkbûnek azadiya takekesî jî dida pêş, min ev şansê xwe jî bi kar ne anî. Ji ber pêşketina rêbertî di nava civakê de bingeha xwe ava dike, me jî xwe di vê mijarê de mehkumî pêngavên rêbertiyê kir. Ev ji hêla azadiya kesekî ve ne helwestek raste, em di zanebûna vê de bûn, lewma vê fedekariyê raber dikim. Dizanim ku hinek heval jî vê fedekariyê dikin. Asta vê fedekariya PKK'ê, herî kêm bi qasî şahadetan girînge. Dev ji azadiya xwe ya takekesî û jiyana xwe ya şexsî berdan, di vê mijarê de fedekarî kirin, jiyana xwe fedayî partiyê kirin, her çendî bi nakokî jî be, asta xwe gihandina fedekariyê dide diyarkirin.

Çavkaniya qalibên ku gelek ji we bi wan ve girêdayî ye, ji serdem ên kevin û pêşketina kapîtalîzmê ye û şêweya wê ya çewt tê. Tişta herî girîng mirov nekeve şaşiya esasgirtina wan.

Di rastiya Tirkiyê de qonaxek komarê heye. Hinekê qonaxa wê ya rizgariyê û rewşa rêbertiya wê vekirin, dê sazûmaniya wê ya heta roja me baştir bide fêmkirin. Di vê mijarê de mînaka bi nexweşî ya M. Kemal, yek ji sedema bingehîn a bûhranên malbatên di roja me de di civaka Tirkiyê de tê jiyîne.

Rêbertiya M. Kemal di vê mijarê de tiştên ku pêk anîne li ser gelek ji me jî daye jiyîn. Di pêwendiyên jin û malbatê de, teqlîda Rojavayîyan kiriye, bi teşe ve mijûl bûye. Çareseriya wî tenê gotiye; "Serê jinê veke û bihêle li eywanan bireqise." Ji bilî vê tiştek din nîne. Rêgeza vê çareseriyê ya cidî û gihandina çandek vê jî tineye. Hêjî xalên ku weke çareserî derdixin pêşberî me û bûhranên giran ên malbat dijîn çavkaniya xwe hinekê jî ji vir digire. Ev jî durûtî, îxanet û bêrêzî ye.

Xwe pêşkêşkirina ku îro di asta herî jor de tê jiyîn û weke amûrek pêşkêşkirinê dîtin jî girêdayî derketina rêbertiya heyî ye. Tenê bi avêtina rûpoşiyê, teqlîda reqsa Rojavayîyan re ev pirsgirêk bihata çareserkirin, hewce nebû mirov evqasî li ser bihizire, evqasî nîqaş bike û evqasî têbikoşe. Reftarên ku di nava malbatên xwe de girtine zêde ne watedarin, evqasî bi êşin. Hûn jî baş dizanin ku, biryara her tiştî dervede tê girtin, qada jidilbûna herî bingehîn bi destwerdanek herî çors ve serê we tê girêdan. Hûn jî dizanin ku encamên vê çiqasî darbeyê mirinê ne. Pêwîste hûn bi nêzîkbûnên ku di demên nêz de û hêjî bi bandorin di asta rêbertiyê de û di asta reîstiya malbatê de derbas bikin û bi bandorên wan re şer bikin.

Em van rêgezan weke fermanekê nadin, weke pêdiviya şoreşê ya girîng digirin dest, di nava xweseriya wê de hewl didin wate bidinê û hûn jî dizanin em naxwazin bi nêzîkbûnek, ferasetên girêdayî zext û zorê ya girêdayî civaka çînayetî nêz bibin. Ne ku ev hêza min nîne, berovajî ji bo weke rêgez wisa dipejirînim. Nêzîkbûna me xwesere. Ger nêzîkbûn wisa be, nexwe hûn ê bizanin vê têbigihijin, nîqaş bikin û bi vê re xwe û partiyê pêş bixin. Ji bo çareseriyê hewceyî nîqaşek baş heye. Heta erka sereke ye. Xapînokiyên azweriyan, çareseriyên kêliyên lewaziyên xwe dispêrin raye û bandoran jiyîn ne rêbazên rastin. Divê hûn jî van bibînin. Xwe bînin asta kesên hêja, ji bo vê hevdu bidest bixin û zêdetir pêş bixin. Ango weke ku hûn ji kevirekî

peykerekê ava bikin kesayet pêş bixin û bi dest bixin. Têkîliya ku ez jî pir ecêb dibînim, wisa çors bi zilam an jî jinekê re dana zewicandine. Di cîhanê de diyardeya ku ez ê herî zêde jê berivim jî ev xale. Yeqîn dikim gelek ji we vê asayî dibîne. Ger vê diyardeya ku pêwîste mirov jê bireve hinekê bixemilînim û pêşkêşî we bikim, ez jî dikarim li ser vî bingehî we bixapînim. Ji bo hûn bibînin di ruhê we de çiqas valehî heye vê dibêjim. Bi yek gotinê rewşek pir xetere! Gelo hûn çiqasî dikarin cewherî hevdu biecibînin? Gelo hûn dikarin ji min re bêjin hezkirina we xwe dispêre çi? Yek gotina hûn bêjin tineye. Ev jî dide diyarkirin ku hûn çiqasî lewazin, di têkoşîn û avakirinê de ne xwedî îdîa ne. Bi tenê teşeyê ve girêdan misoger ti encamî nade. Girêdayî azwerî û hêzê xwe dana axaftin hîn zêdetir bê wate ye. Weke din xwe bi xemilandin û şemlandinê ve jî pêşkêşkirin bê wate ye. Pêwîste mînaka me ya di vê mijarê de ji hêla hemû civakê ve rewa bê dîtin, ji hêla hemû endamên partiyê ve rewa bê dîtin û bikare hêz bide. Ger ez bipirsim gelo pêşketinên wisa hene, dîsa hûn ê bêjin ji pêşketinê pir dûrin û feqîrin. Vêca şoreşgerî li kur dimîne?

Misoger şerê bi xwe re dikim pir dijware. Hûn jî dizanin li ser vê mijarê pir mijûl dibim. Min weke zilamekî jin derbasî tevgerê kir. Min bi şerkirinê ew kêşan. Îro gelek jinên zewicî û ne zewîcî yên bi min ve girêdayî hene. Gelek ji wan heta mirina xwe girêdayî ne. Ger bixwazim dikarim hîn zêdetir bê sînor girê bidim. Hûn ê sedema vê bihizirin. Hûn nikarin ji bo vê mijarê bêjin ku ez bi tenê deyndarê sekna xwe ya rêbertiyê me. Na! Bi şerê salan ve vê rewşê dijîm. Her wiha ev çavkaniya xwe ji pêdiviya xweser nagire. Pêngava derketina jinan, gihiştiye astek tevgera civakî. Bêguman, ev rewş bi meylên min jî yên azadiyê ve girêdayî ye. Pêwîstiya fikir û hewldanek hûrûkûr heye. Ger min di xêra jinan de hinek xebatên girîng ne meşandiba, yek ji van jinan jî ne dihat cem me, ne dikariyan gavekê dervî deriyê malbata xwe bavêtan. Niha di civakê de gelek jinên zewicî rehetî

dev ji hevserên xwe diberdin û tên. Ji ber êdî encamên zewacê yên sexte û rûxîner dibînin. Ji ber ku dixwaze azad bibe, ji koletiya malbatê rizgar bibe û xwe ji zincîrên xwe rizgar bike, bi partî û rêbertiyê re rêya pêngavek derketinê dibîne. Ger em hinek din bang bikin, dibe ku zincîr parçe parçe bibin. Ev jî dide diyarkirin ku em rêgeza azadiyê baş bi kar tînin. Me da diyarkirin ku çareserî hêjî çiqas zehmete, ji hêla xwe ve jî û di partiyê de jî hewldanek mezin hatiye kirin.

Ji ber ku zayenda bindest jine, em piranî li ser wan rawestiyan. Bes zayendên zilam jî herî kêm bi qasî jinê hewceyî rizgarbûnê ne. Hûn jî dizanin dahûrînên me di vê pêwendiyê de radeyek mezin dahûrînên zilam jî dihewîne, bi qasî em tîpên jinê dahûrîn dikin, em tîpên zilam jî di seriyek din ê pirsgirêkê de dahûrîn dikin. Heta em dizanin di koletiya netewî û ketîbûna civakî de para zilam ji ya jinê pirtire, zêdetir tawanbare û divê berpirsyar bê dîtin. Em van jî weke encama dahûrînan dibêjin. Jin bi qasî xwe berpirsyar nebîne bêkar û bêhêz hatiye hiştin û bê îrade kirine. Ango li cihekê tam di rewşa têkçûn û teslîmiyetê de ye. Lewma dema koletî bû mijara gotinê em ê danin aliyekê. Yên serwer, bi saziyên mêtîngeriyê re pêwendiyê pêş dixe, xwezayî yê herî zêde bi kolebûna me ve girêdayî zilame. Ew têkîlî saz dike, ew dibe sîxur, ew xwe tine dike û difiroşe mûçeyekê. Yên pêşketinên rû bidin yekser digire dest ew e, ber bi partiyên mêtîngerî û artêşên mêtîngeriyê ve baz dide zilame. Ma derew e? Na! Lewra hêmana ku pêwîste herî zêde berpirsyar bê dîtin zilame.

Heta niha em baldar nêzî vî alî nebûn. Me her tim got jin û jin. Niha jî em ê her tim bêjin zilam û zilam. Em ê zilaman berpirsyar bibînin. Zilam, jin bin xistiye, yan jî di rewşek pirsgirêk de hiştiye. Madem berpirsyariya civakî ya zilame, hemû pêwendî di bin berpirsyartiya zilam de tên arastekirin, yê ku rêbertiyê dike zilame, nexwe dê berpirsyariya xwe jî bigire. Çima

ji dijmin re leşkertiyek erzan dike? Çima li ser bingeha sîxurtiyê kar dike? Çima erzan dev ji welat berdide? Çima direve? Welhasil çima zilam di nava hemû karên civakî de têkil karên tawanbariyê dibe? Divê mirov di vir de misoger berpirsyariyê bibîne û bizane hesab jî bide. Madem tu reîsê malbatê yî, madem tu bi navê malbatê jê dikî û dikujî, nexwe em ê jî te bi pirsgirêka netewî û civakî de weke hêmana herî zêde pêwîste hesab jê bê xwestin bigirin dest. Lewra wê giranî şerê me bi zilaman re be.

Yek ji xisleta herî zêde li Kurdistanê heyî û jê ditirsim feraseta zilamtiya erzane. Dema min xeteriya vê baştir derxist holê, min dît. Min dît ku sekna zilam zêde ne erênî ye yan jî dê watedar nebe û bi xeteriyan re rûbirû ye. Min dida diyarkirin ku zilamtiya tê pêşxistin mirov pê dilşad nabe. Jinan nizanim, lê weke zilam min ev rastî didît. Bi xisleta zilamtiyê ve xwepêşandanên hêzê dikir, qîrewîr dikir, lêdan pêş dixist û bi bandor bû. Wan cemaet ava dikir. Ev yek alî bû û ji min re jî ecêb dihat. Min ji ber vê digot di vir de nehevsengiyek heye. Dihizirîm ku divê berpirsyarî ya wan be. Lê hûn nêzîkbûnek rexneyî danin aliyekê, xwe weke zilamek çar bi çar dibînin. Hêjî gelek ji we wisa dihizire. Dibe ku hûn gotinekê jî li ser xwe napejirînin. Ev jî xwe xapandinek pir cidî ye. Jinan nizanim, lê ez ji tîpên van zilaman qet bandor nabim. Zêde zilamtiyê dikin. Ya rastî dihizirim ku di wateya egîdiyê de jî ewqas ne zilamin. Li gorî min pir çorsin. Pêwîste mirov di vê mijarê de jinan baş bide pêş. Ji ber ku rewşên şênber ên jiyayîn hene. Ev kesayet ji bo wan zext û kirêtiyê derdixin holê. Lewra pêwîste bi hêz beşdarî sererastkirina zilaman bibin. Ez hêj fêm nakim bêka gelek ji we çiqas tên hezkirin û hesibandin. Carina dihizirim ku gelo dê hinek heval çiqas bên hezkirin û hesibandin. Pir kêm şaneya hêviyê dibînim. Li gorî ku ez zehmet van rewşa dibînim, gelo dê keç çawa we bibînin? Ger di refên me de hûn tên xapandin–jixwe rewşa gelek ji we ji xapandinê re guncave-dê çawa be? Bes yeqîn nakim kesek

ku xwe hinekê winda nekirî wisa hêsan zilamekî biecibîne. Çima? Ji ber ku pîvanên we pir xeterin, pir kêm cih didin rêzdariyê, pir kêm didin wekheviyê, pir kêm didin dilxwaziyê. Hûn naverastê pir kêm ji azadiyê re vekirî dihêlin. Gelo we li ser vî bingehî qet ber çavan re derbas kiriye? Gelo hûn çiqas tên ecibandin, pêwendiyên we çiqas ji dilin, di wateya siyasî, aborî û fîzîkî de hûn çiqas ji hêmana zext û zorê paqij bûne, gelo we girêdayî rêgez ên bingehîn xwe çiqas amade kiriye? Belê hûn hatine fêrkirin. Bi giştî jin xwe pêşkêş dike –deka em ji vê re bêjin xwe dide ecibandin- bes hûn çiqas xwe pêşkêş dikin û xwe didin ecibandin? Ger di têkîliyan de azadî û jidilbûna pêwendiya hebe, divê hûn bersivê bidin van têkîliyan.

Hûn di berpirsyariya me de ne. Hinek dibêjin ku, em ê zewaca şoreşgerî bikin! Dema dibêjin zewaca şoreşgerî ez ecêb dimînim. Belê camêr û xanimên me çiqas vekirîne! Hûn jî dibînin ku mijar wisa nayê destgirtin. Gelek ji we ji ber ku hûn zilamin azadiya ecibandinê ya xwe dibînin. Ma hûn jî qet rewşa ecibandina xwe ber çavan nagirin? Li gorî min ev xal girîngtire. Pîvanên ecibandinê yên zilam ku heta roja me hatiye –ne tenê di nava me de- hêz dide, dixapîne, xwe mezin dike, xisleta şoventiya zilam a em behs dikin dide axaftin. Bersiva ku jin jî dide vê ne pêşketî ye, zêdetirîn xisleta xwe ya pêşkêşkirinê dide pêş. Hinek din xwe biha difiroşe û ev jî fêlbazî ye. Ango wisa “Ji seriyek wisa re, belayek wisa” an jî ji ber ku zilam xwe bi vî şêweyî pêşkêş dike, rê ji xwepêşandana jinê ya beramber re jî vedike. Belê hêjî pir xetere û di roja me de rê ji helwestên rûxandina exlaqê re vedike. Di vê mijarê de xisleta huner ji rêderxistinê hîn girantire. Hunera ku pêwîste weke amûrek sazûmankirinê bê pêşxistin, mixabin ji rê derdixe. Lewra, pêwîst dike em aliyê têkîliyê ya din baldartir bigirin dest.

Di rastiya Kurdistanê de dahûrandina pirsgirêk û çareseriyê bi xetên giştî ve hatine kirin. Rêgeza partiyê jî li ser vî

esasî bikaranîn, ji bo kesên ku di rêhevaltiyê de bi israrin gengaze. Pêwîste hûn min jî di vê mijarê de zêde tengav nekin. Ji ber bikaranîna rêgeza partiyê ve rûbirû me, bi qasî eniya vê ya siyasî û rêxistinî girînge û weke eniyek ku vê eniyê jî bikar tîne erka me ya rêvebirinê heye. Dibe ku şaşî jî çêbin. Lê em ê di xetê de bi israr bin. Em ê di şopandinê de xwe nedin axaftin, lê ji azadiya xwe jî tawîzan nadin, ji bo çareseriyek azadîxwaz di nava partiyê de mezin bibe û di civakê de belav bibe pir şiyar tevbigerin. Her çendî kevneşopiyên li hemberî me muhafezekar bin, azweriyên we yên muhafezekar û sekna we ya sîxurtiya objektîf giran dibe bila be, em ê hesab ji hev bixwazin. Ez ê ji xwe destpê bikim û ji bo we tevan pêwendiyê rast bigirim dest, li ser vî bingehî tişta ji destê min tê bikim û jixwe dikim jî. Pêşî em ê hevdu rast fêm bikin. Li gorî min di vê mijarê de ew hest, hezkirin û heta diyardeya evînê ku pir tê behskirin, ger dê pêş bikevin, divê girêdayî feraset û fikrek li ser vî bingehî rast çêbe. Jixwe zanistê jî selmandiye ku, ger tiştek bi navê eşqê hebe, ev girêdayî fikre. Çewtbûn û xirabûna vê çavkaniya xwe ji rewşa me jî ya şêweya kar nake digire. Dema mirov dev ji aliyê fikir berde, tiştek ji hebûna mirov namîne. Ev jî li cem me girêdayî pirsgirêkên rizgariyê ye. Em ê li ser rizgariyê bihizirin, hewl bidin rizgariyê bi şer re bijîn. Ev jî bê fikir û teorî nabe. Girêdana mezin bi nirxên me yên rizgariyê ve ye. Ji ber vê divê zewac pêşî xizmetê ji nirxên me yên rizgariyê re bike. Ger em hîn zelaltir bikin, li hinek cihan hewl didin behsa girêdanên weke “ ez bi çeka xwe re zewicîme, bi partiyê re zewicîme, bi gelê xwe re zewicîme” bikin, bêguman di vê qonaxê de pêwîste girêdanên me bi van nirxan ve be. Nîqaş li ser vê nabe. Hûn ê evîna xwe pêşî li hember partiyê, gelê ku pêşengtiya wê dike, armancên wê yên bingehîn –serxwebûn û azadî-, amûra wê çekê re pêş bixin. Her ku evîn û girêdan di vê radeyê de pêş bikev e, dê baldarî, xwestek û girêdana di navbera zayendan de jî watedar bike. Pêwîste em di

van mijaran de çewtiyê nejîn. Em ê pir bihêz û pîvan tevbigerin. Divê em ji bîr nekin pêwendiyek li ser vî esasî bidestxistin, girêdayî bidestxistina welat û azadiyê ye. Di naveroka vê de jî bidestxistina rêxistinê, bidestxistina çek, bidestxistina şer heye. Kesên ku şer bidest nexin, rêxistinê bidest nexin, ji şer û rêxistinê direvin, yeqîn nakim ku weke zayend jî hevdu bidest bixin û li dijî vê me. Berovajî, kesên ku hevdu bidestxistinê bi reva ji partî û armancên wê, dev ji çekê berdanê ve girê didin, divê bizanin helwestek pir ketî dijîn. Her çendî dilketinên wan pêş ketibin dixwazim bêjim ku ew dilketin pir ketî û kirêtin. Ger dê ew evîna Kurd a pir tê behskirin pêş bikeve, li hember vê jî rêz bê girtin, divê misoger bi temamî di nava vê pênaseyê de bê ravekirin. Lê ev bi axaftin û xwe xapandinê ve çênabe.

Ez ê ji jiyana xwe mînak bidim we. Di vê mijarê de xwedî hewldanên mezinim. Ez jî pir nirx didim diyardeya jinê. Weke tê hizirîn nêzîkbûnek min a bê eleqe nîne. Ji destpêkê ve mijarek ku fikir û baldariya min mijûl dike. Lewra weke her mirovî rewşên me jî yên ku girêdanên bi dilketinên herî jêr heta girêdanên hêza fikrî ava dikin ên herî pêşketî derbixin holê re rûbirû mayînek çêbû. Ger em jî vê weke pîvanên muhafezekar, me dervî mirovatiyê dihêle, ji dervî exlaqê xwe bigirin dest, ji pîvanên sextekar dûr bixin, em ê bibînin ku rastiyek çawa ye, ji hêla zelaliya rewşê û çewtbûna wê ve xwe ferz dike. Weke bi her kesî re tê jiyîn, bi me re jî her çendî xwestek û baldarî pêş ketibe, aliyên me yên xweşik girêdana partiya me, şerê me û armancên ku pêwîste em esas bigirin em bi xwe ve girê dan. Ev jî rewşek şere. Elbet ji ber ku me rêgeza azadiyê ferz kir, ev hîn zêdetir mezin bû.

Rewşa xwe zêde baş nebînin. Di vê mijarê de nizanim hûn çiqas giraniyê didin fikir. Lê diyare ku hûn di her kêliyê de zêdetirîn di bin serdestiya hestên xwe de ne. Hestên ku hatine çewsandin hene. Dema ev hestên we derfeta jiyînê dibînin, weke

cinawirekî derdikeve pêşberî min. Min ji bo xwe jî got, ev ne şerme. Lê min şer kir, cinawir çewsand û perçiqand. Mixabin ên ji nava we derdikevin we dadiqurtînin. Ma çiqas îxanet derket holê? Çiqas li dilê me xistin û li nirxên me yên herî pîroz xistin? Belê cinawirtiya herî mezin wisa ye. Ev di bin navê dilketinan de hatin kirin. Ev ne bidestxistina fikir, bidestxistina bûnewerên pêş neketine û serdestiya xerîzeyên korin. Di heman demê de ev bi qasî dîroka mirovahiyê rêgezek pevçûnê ya kevne. Kesên her tim giraniyê didin serweriya fikra pêşveçûyî û rênasiyê ne. Kesên her tim paş dikevin jî, dibin dîlên dilketin û xerîzeyên xwe yên kor. Ferdperestiya xwe li ser mezinbûn û mezinkirina civakê ferz dikin. Ger em di civakbûnê de kor bin, sedema vê em bi hestên kor nêzî vê têkîliyê dibin û kevneşopiyên muhafezekar serdest dikin. Ji bo saziya malbatê ya hêsan, gelo nirxek welat û azadiyê ya ku malbatên me nefiroşin heye? Heta dema em yek ji we tevlî nava refên azadiyê dikin, mane ji dijmin zêdetir şerê herî giran bi malbatan re nehat meşandin? Mane em hêjî ji bo we tevan, bigihînin ne azwerî, asta mejiyê xwe esas digire, helwestek pêşî bide vê gavê şerek watedar nameşînin? Ger ev rasteqîn bin, ger em ê bi ser bixin, girêdana vê bi vê helwestê re heye. Divê em vê rastiyê bibînin.

Mejiyê xwe veke, mantiq esas bigire, fikir serwer bike û ger azweriyên te yên rêzbar hebin wan li ser bingeha xizmeta van bilin bike! Ji bo me, ji bo girêdanên mirin û mayînê bikar bîne! Bila hêrs, rik û hezkirinên te ji bo xwedawenda bi navê welat û azadiyê kar bikin, wê desteser bikin. Jixwe ew keça bedew û xortê bedew a ku weke xwedawend bi nav kirî, li cem min kêrî quruşekê nayên, kena xwe pê dikim. Hûn ê çavên xwe berdin xweda û xwedawendên mezin. Ya rastî di bin têgehên xweda û xwedawendiyê de mezinkirin û azadkirina civakan heye. Divê hûn wan têgehan wisa binirxînin. Karîkatoriya vê jî dê we bike xweda yan jî putên biçûk. Li gorî min divê şerê evîna Kurd jî

wisa bê destgirtin. Em ê bi xwe re dest bi şer bikin. Di vê wateyê de rêzdariyek mezin bidin şehîdên vî şerî û girêdana me jî wisa ye. Wan di xêra xweda û xwedawendên mezin de şer kirin û zanîn putan bişkînin.

Hûn jî dibînin eniya şerê me wisa vekirin baştire. Em gelek caran dibêjin bingeha teoriya me girêdayî zanistiyê ye. Bi vî rengî em dixwazin nêzîkbûnan jî bi raveyek zanistî ve girê bidin. Ger rastiya netewî û civakî ronî dike, pêşveçûnê gengaz dike raste. Hewldana her kesê, hilberîne. Jana vê hewldanê ya herî zanist jî, keda ji bo şoreşê tê dayîne. Diyare dê ev ked pir zehmet bê dayîn. Di bin keda şoreşê de, dê aborî, zanistî û hunerê weke tov hilberîne, wê ji nû ve û hîn zêdetir li ser bingehek azad, bike şitil û ji bo vê jî hewldan û cewher heye. Lewra keda herî mezin, keda şoreşê ye. Vêca ger em bi kedek wisa şoreşgerî ve hewl bidin, dê ewqasî hest, hezkirin û evînên ku hûn bêriyê dikin, xeyalên wê çêdikin ên rêzdar pêş bikevin.

Weke em her carê dibêjin, xwe gihandina xweda û xwedawend zehmete. Em kedkarin, divê bizanin kar bikin û sextekariyan nejîn. Yeqîn dikim û dizanim, hewldanên me yên li ser vî bingehî rastin. We jî di nava vê hewldanê de girtin, rêzdariya herî watedar a li hember mirove. Di vê wateyê de dema em dibêjin welatparêzî enternasyonalîzme, em behsa hewldana azadiya ku em bikarin bidin her civaka mirovan, civatên her gelî û gelê xwe dikin. Ji bilî vê ti rûyê me nîne ku em li mirovahiyê binêrin. Welatparêziya me di vê wateyê de enternasyonalîzm û hûmanîzma herî watedare. Eslê miletek ku pir hatiye xistin, cînseltiyek ku bi wî re jî pir hatiye xistin, di vê wateyê de çareserkirin, azadkirin, girêdayî cewhera enternasyonalîzmek kûr, hezkirina mirovahî ye. Çareseriya me jî wisa ye. Ferasetên bi dilketî, bê fikir, kevneşopiya muhafezekar, heta dawî ferdî esas digire, dê me ji mirovahî, rastiya gel û rêzdariya wê qut bike, weke ku heta niha çêbûye em ê di nava mirovahiyê de tine bibin.

Lewra rêgez pir girînge. Her çendî pêkana wê zehmet be, hêjayî hewldanê ye. Min bi vî şêweyî têrkar babet danî holê. Ez her tim alîgirê nîqaşa azad û vekirî me. Em hewl didin di vê mijarê de jî nîqaşa azad û vekirî di her astê de esas bigirin. Pêwîste hûn xalên girêdayî min, ji min re vebêjin. Ger hûn şerim bikin, wê bê fêmkirin ku hûn seknek neheq dijîn. Em weke rêheval nîqaş dikin. Hûn jî dibînin, babetek wisa ye bi fikaran mirov nikare ser bigire. Nêzîkbûna em her tim dipejirînin xwe nûkirin û aliyên xwe yên şaş hebin bi pişgiriya me derbaskirine. Em hemû di wê astê de ne ku dikarin vê rakin. Her çendî hûn di nava helwestên şaş de fetisîbin jî, yeqîn dikim derfeta çareserkirina vê heye. Di xalên ku me piştguh kirîn de rexneyên we yên ku çêbin, dê hêz bide me. Dîsa li şûna ku em we mehkum bikin, weke kes, em hewl didin şaşiyên we mehkum bikin, li şûna we bikin tirsonek, hewl didin we wêrek bikin. Li şûna ku babet girtî û veşartî bê hiştin, yeqîn dikim pêwîste bê ronîkirin. Heta her çendî xeteriyên wê hebin jî gelekî hewl didim xwe di vê mijarê de xurt bikim. Ji ber ku her ku diçe ji bo şoreşê çareserî xwe ferz dike. Di demên dawiyê de rêgezek din ku min li vir derxistî zanebûnê heye. Ev qad bi pêngava rêbertiyê ve girêdan, ji girêdanê jî wêdetir dihizirim wê bigihînim asta herî jor. Ji ber hûn weke kes erkên xwe pêk nayînin, tê zanîn ku windahiyên me çiqas mezinin. Ger pêngavên rêbertiyê nebin û bi vê re jî rastiya rêbertiyê neyê temamkirin, dê ji her cure rûxandin, windakirin, xistin û heta sîxurtiyê re jî rê veke. Lewma vê bi israr pêş dixim. Ger îro ez weke sazî nûnertiya rêbertiyekê dikim, ev nûnertiya girêdana gelê Kurdistanê, -girêdana jin û zilam- di asta herî bilind de ya bi rêbertiyê ve ye. Ji ber vê divê hezkirina we ya herî mezin ji rêbertiyê re be. Girîng dibînim ku bêjim; ez weke kes ji girêdana zêde hez nakim. Lê ji bo tevgerê ji xeternakiyan rizgar bikim, di serî de we qadroyan neçarim ku bi mirina xwe rastiya rêbertiyê ve girê bidim. Ango divê hûn bê ku çavê xwe bineqînin

bi hemû berfirehiya xwe ve ji bo rastiya rêbertiya PKK'ê bijîn. Yekser vê jî bêjim, sedema li ber çavan nûner ez im, ji bo Kurd û Kurdistanê hewce dike. Ji bo hêzek mirovên ku dixwazin azad bibin, ji bo xwe gihandina rêbertiya rast hewce dike. Divê rêgeza rêbertiyê bê ferzkirin û bi temamî weke lutkeyekê bê pêkanîn.

Bi rastî jî Rêbertî lutke ye. Li rêberên îro li Tirkiyê fîgûranin nenêrin, ew hemû jî sexte ne. Rêbertiya rasteqîn di nav Tirkan de heye. Çawaniya leşkerî ya rêbertî, çawaniya hevbeşî, çawaniya kesayetî diyare û pir zelale. Li gorî mercên wan ên şênber, teşegirtinek şênber heye. Di civakên din de cewaztire û qonaxên pêşketinên wan cewaze. Li cem me jî, ji gelek aliyan ve nû ava dibe û bingehê wê nû tê avêtin. Hema mirov dikare bêje gihiştiye qonaxa ku paşerojê biqetîne. Êdî dikare ji her alî ve pêşerojê ava bike. Li ser vî bingehî, di vê qonaxa dîrokê de derketina holê û rêbertiya ku hewce derbikeve, her çendî di yek kesayetî de jî teşe bigire, pêşdetir di partiyekê de jî mezin bibe, ji vê qonaxê ber bi qonaxek diyarker ve jî biçe –heta ku vîna serbixwe, azad, yekbûna wekhev û azad derbikeve holê-watedare.

Min xwest vê hevbeşiyê pêk bînim, lê mixabin qadroyên me zêde ev hevbeşî nepejirandin. Mînak weke gelek caran hûn dibêjin; "Em di vê mijarê de jî partîbûnê saz nakin." Nexwe pêwîste ez vê xeternakiyê berteraf bikim. Ger nekarim partiyê tam tevlî xeta Rêbertiyê bikim, divê bi ser xwe de biçim. Ger nikarim navendbûnê bigihînim asta ku tê xwestin, divê xwe di vê mijarê de bi qasî valahiya heyî bikarim dagirim mezin bikim. Ji ber valehî efû nake. Ger tu danegirî wê dijmin dagire, oportonîzm dagire, çewtiyek ji rêzê dagire. Lewra ev pir vekiriye: Di şerê rêbertiyê û şerê mezinbûna gelê Kurdistanê de, neçare ku lutke bêhempa be, zêdekarbidest be, bi bandor be û berfirehî pêk were. Aliyek wê bi qasî misqalekê jî vekirî bimîne, dê her tiştê kevnar li

wir kom bibe, dijmin dagir bike, aliyek riziyayî hebe dê ew xwe bide jiyîn.

Di vir de xala girîng ne rewşa min a kesî ye. Ger di kesayeta min de rêbertî bi sazî dibe, hûn ê çiqas xalên bi navê erênî yên weke hest, azwerî, fikir, mezinbûn, xebat, ezamet, vîn hebin hemûyê bi xwe ve girê bidin. Ez çiqasî ji vê birevim, hûn ê jî ewqasî pê ve bên girêdan. Ya rastî ez hem nûnertiya wê dikim, hem jî jê direvim. Rewş wisa ye; ji hêla sazî ve pêş dixim, lê weke kes neçarim jê birevim. Divê hûn diyalektîka di vê mijarê de heyî baş bibînin. Ji ber dîktatoriya kesî tam jî di vê qonaxê de destpê dike. Ger zêde hezkiriyê xwe bim û bêjim ev girêdan tenê ji bo kesayeta mine, ez ê ber bi dîktatoriyê ve biçim û weke li gelek welatên sosyalîst jî derketî holê rê ji pirsgirêkê giran re vekim. Bes avakirina asta lutkeya bilind pir hewce ye. Vêca divê mirov di kurde xwe bigihîne bilindbûnê? Li kur hewce dike heta wir bilindbûn dana jiyîn, li ku derê bilindbûn weke pêdiviyek kesayetê derxistin û veguhertina amûrek zexta li ser gel hebe, girînge ku mirov wê di vê qonaxê de nedê jiyîn. Rêbertiyek heta kur jênevegere? Hûn ê bi kîjan hewldanî xwe bigihînin vê? Aliyek vî karî heye, her ku hûn xwe digihînin vê rastiyê hûn vediguherînin teserûfek li ser bîrîman û gel. Ev cudabûn pir girînge û ji bo we jî tişta giranî tê jiyîn jî wisa ye. Firsendek rêbertiyê ji we re tê dayîn, pişgirî û hêza wê tê dayîn. Hûn di roja duyem de vê hêza partiyê ji bo berjewendiyên xwe yên kesî bikar tînin, ferz dikin, lihev dixin, dikin ferman û belav dikin. Lewra mijara rêbertiyê, wisa karesatên mezin tîne serê we û partiyê. Vaye hûn dibînin ku li welatên sosyalîst ketiye çi rewşê. Ger min her tim di vê mijarê de xwe ber çavan re derbas nekiriba û ne guhertiba, me ne dikariya PKK'ê wisa pêş bixin, mezin bikin, ne di wateya hejmar, ne jî asta çawanî de wateyek derbixista holê. Sazûmaniyek pir xweşik dikim. Partî û gel ber bi lutkeyê ve dikişînim û hinekê jî didim karkirin. Ev gaveke, asta sazîbûnê ye.

Bes ev xal di nava xwe de nakokiyekê jî dide jiyîn. Her kes her tiştî ji min hêvî dike. Di vê ferasetê de jî nêzîkbûnên seqet, ferasetên xwedayî, ol û siyasetê tevlîhev dike, hemû lewaziyên xwe veşartin, ji xebatên hundur qutbûn û heta bi navê rêbertiyê desteserkirina nirxan destpê dike. Ez jî pir dijwar bi vê re şer dikim. Ya rastî serkeftinek min jî di vir de ye. Li şûna bûna kesayetek gelek ji we dihizire û bûna qurbanê gelek şaşiyan, kedê esas digirim, demokrasî û rêbertiya xwe dispêre vê û şêweya wê jî li ser pêvajoyê ferz dikim û em wisa hewl didin gavek din rê ji pêşveçûnê re vekin. Bi gelemperî dema em behsa girêdana bi rêbertiyê re dikin, em di rastiyê de girêdana we ya bi we re pêş dixin. Girêdana bi rêbertiyê ve di her astê de heta mirina xwe şerkirin û girêdayî vê jî bi fermanek mezin gel tevlî serhildana kirine. Bihizirin, hezkirina rêbertiya mezin rê ji çi re vedike. Ger ev tam hatibe rûniştandin, di şêwe û cewher de tam hatibe bidestxistin, dê hemû gel jî hezkirin û rêzgirtina xwe ji me bigire. Tê zanîn berê du kesan ne dikariya bên cem hev. Weke dijminan bûn. Ti rêzdariyek wan li hember hevdu nebû. Sekna bira li hember xwîşk, hevser li hember hevjîn wisa bû. Bes niha di vê mijarê de hinekê wêrekî heye. Hûn şer nakin, hêza meşa bi hev re bi xwe re dibînin. Elbet girêdana vê ji nêz ve bi hewldanên me ve heye. Nehizirin ku ev jixweber çêbûye, weke PKK'yîbûnek xwezayî pêş ketiye, hûn ê xwe bixapînin. Jixwe yek ji şaşiya we ya herî mezin jî ev xale. Pêşketin weke berhema hewldana mezin derdikevin holê. Mirov ancex wisa dikare mezinbûna lutkeyê jî amade bike. Her wiha rêberên din jî hene. Yeqîn dikim hewce nake em navê wan bidin. Ev ne rastin. Ne çavkaniya hezkirin û rêzdariyê ne. Ji ber vê bandora wan li ser girseyan û gel tine ye. Yên di bin bandora xwe de jî, her cure durûtiyê li hember hev raber dikin, pêşxistina her cure kelemê jî ji xwe re siyaset dibînin. Elbet kesên wisa jî bi hêsanî serî ji dijmin re ditewînin. Cem me ev tişt nîne. Gotinên şehîdan ên dawî di derbarê vê mijarê de

kirine, -girêdayî rêbertiyê- pir girîngin. Dîsa vîna we ya şer diyarkirinê de, asta fedekariya we derxistina holê de, ev xal pir girînge. Niha em jî vê xalê hîn zêdetir pêş dixin, partîbûnê çêdikin, netewbûnê saz dikin û hewl didin bikin malbatek mirovahî ya baş. Dema mînaka xwe didahûrînim, di vir de peyamek girîng didim. Divê dema pêş li dijî her cure, di her astê de, dûr an jî nêz, herî zêde jî pêşerojê de çewtiyên ku bi navê me bên kirin, li dijî çewtiyên rêberan weke gel û partî seknek rast çêbe. Pêwîste bi qasî hewcedariya wê, xalên ne hewce jî zû bên zelalkirin, bi qasî dikare bersiva pêdiviyan bide esas bê girtin û pişgirî pêş bikeve. Dema ji rewşa esasbûnê derket, xwe li ser vî bingehî ferz kir, bi pêşketina rêbertiya ku saz kiriye û rê jê re vekirî re nakokî jiya, hewl da desteser bike, bû zext û zorî, hûn ê wê binpê bikin. Misoger divê nêzîkbûna we ya ji dîktatorî û demokrasiyê re wisa û pêşketî be.

Îro çi hatibe serê sosyalîzma pêkhatî, ji ber nekariye cewaziya di vê xalê ava bike ye. Gotin dîktatoriya proleterya, di dîktatoriya proleterya de jî dîktatoriya kes û pîvan hat tinekirin. Encam jî, rûxandina sosyalîzma îro ye. Ya rastî dîktatoriya proleterya ne ku ne hewce ye, berovajî hewce ye. Bi heman şêweyî di dîktatoriya proleterya de dîktatoriya kes jî ne têgehek ne hewce ye û di wextê wê de hewce ye. Bes heta ku derê û bi kîjan şêweyan. Belê ev nehat zelalkirin. Zilam nikare henase bigire, gav bavêje û serve jî heta mirina xwe weke rêberek xwezayî ye. Ma ev hewce bû, yan jî neçar bû? Qet yeqîn nakim. Belê, xirabûna dîktatoriyê jî wisa destpê kir. Erka sosyalîzmê mirov ji kapîtalîzmê zêdetir azadkirine. Lê ger wisa neke û ji kapîtalîzmê zêdetir rê ji giraniya dewletê re veke, zêdetir bi çewsîner serde biçe, diyare ku dê ew dîktatorî jî xirab bibe. Encam jî, hemû xalên rûxandinê di nava xwe de avakirine. Ev şaşiya dîrokî, îro bi rûxandinê û tasfiyê re encam bû. Her şaşî,

bingeha rûxandinekê ye. Ev şaşiya sosyalîzma pêkhatî jî, îro rûxandina wê derdixe holê.

Em şaşiya di sosyalîzma pêkhatî de di xalên bingehîn de dibînin û pêşî lê digirin. Vê şaşiyê bi rastiyê re sererast dikin. Tevgerek weke PKK'ê ku xwe derfetên mezinbûnê yên kême di astek bêhempa de mezinkirin, bi qasî di demokrasiyê de, di sosyalîzmê de jî mînakek girînge. Dahûrînên ku niha pêş dikevin ezmûnên sosyalîzma beriya û dîtina pirsgirêkên ku nexwestine bibînin û bi ser wan de çûnê ve pêş dikevin. Pirsgirêkên ku em digirin dest, çi di pêvajoya Şoreşa Cotmeh'ê de û çi jî di qonaxên dijwar ên sosyalîzma pêkhatî de pirsgirêkên qet nehatine destgirtinin. Em di vê zanebûnê de ne. Em pêkanên sosyalîzmê biçûk nabînin. Lê divê ji encamên wê ders bên derxistin û weke wê kopya pêş nekevin. Yek ji xala sereke ya serkeftina me ev xale. Ger em bixwazin vê pêş bixin û rê ji pêşketinên girîng re vekin, divê nêzîkbûna ku tê diyarkirin baş pêş bikeve, ji ber ku pêşketin girêdayî vê ye.

Di vê mijarê de rêgeza bingehîn, gerêdana bi gel ve û hezkirina gel'e. Dema ev di pergalekê de qut bû, ew pergal tine dibe. Jixwe, wê pergalê dawiya xwe amade kiriye. Tişta tê jiyîn jî wisa ye. Îro li cem me jî ev rêgez pêş dikeve. Nexwe, bersiva rast tê dayîn. Me soza alîkariya madî ne daye ti kesî. Bi temamî radeya wêrekî û fedekariyê tê xwestin û hemû jî bicîh tên. Xeta rast a bîrdozî bêhempa û xweşik pêş dikeve, lewma rê ji vê re vedike. Ti derfeta me ya ku em mirovan di vê mijarê de bi pereyan û jiyana rehet ve têr bikin nîne. Nexwe em bi çi têr dikin? Em bi rêgezên bilind ên azadiyê ve têr dikin. Ji wan re didin diyarkirin ku nirxên me yên ku bikarin her tiştê xwe di xêra wê de feda bikin hene û dikarin rêbertiya wê bikin nîşa wan dikin, wisa derdixin holê. Tê dîtin ku, di bin girêdana ku pêwîste bi rêbertiyê ve mezin bibe de, gel bi xwe heye. Weke kes hûn bi xwe hene. Di rastiya rêbertiyê ya mezin dibe de, hûn ê cihê xwe rast çêkin. Ev

bi qasî hûn dihizirin zêdetir mijarek mezinbûnê ye. Mînak, ger ez ê di xala rêbertiyê de têr bibim, nexwe hemû derfetên têrbûnê hene. Lê ev jî min pir aciz û tengav dike. Ji bo bikarim bersiva bendewariyên gel bidim û bêrêziyê nekim, pêwîste asta fedekariya xwe pêş bixim. Jixwe girêdanên we, piranî li ser esasê bêrîkirinên we ne. Hûn di rewşek zehmet de ne, hinekê jî azadiyê dixwazin û di vê mijarê de neheq bi ser min de tên. Neheqî û nebesiya di vir de ji vir tê; hûn nikarin yekbûnek rêbertibûnê, pêşketina rêbertîbûnê di wext û cihê xwe de bikin. Ev xala nebesiyê ye û elbet zehmetiyan ava dike. Îro gel hewl dide vê nebesiyê derbas bike, lê em dibînin ku baldariya qadroyan bi qasî ya gel pêş neketiye. Jixwe ev zehmetiyan zêdetir kûr dike. Têgihiştina pêşketina rêbertîbûnê, ji bo çêkera qadro û pêşeng zêdetir girînge. Ev jî rast têgihiştin û nexasim ji helwestên berjewendî yên seqet ku kes dijîn dûr rawestîn xwedî girîngiyek mezintirîne. Bermahiyên heyî we ber bi berjewendiyên kesî ve û ev jî ber bi pêşxistina meylên dîktatoriyê ve dibe. Ji ber ku dijmin jî vî aliyê lewaz dizane, weke qadek herî zêde bikare sîxuran lê pêş bixe dinirxîne, an jî sîxurtiya objektîf herî zêde jî hewl dide di vê qadê de encam bigire.

Nexwe divê hûn tev rêbertiyê weke lutkeyekê bibînin, bi hemû hebûna xwe ve xwe bigihînin vê bikarin xêra wê her cure şerê ji agir bikin, azwerî, hezkirin û rêzdariya xwe pêş bixin, girêdanên din ne danin pêşiya vê bi xwe re mezinbûnekê bibînin û neçarin ku ser bixin. Hûn ê misoger li ser vî bingehî ji sazîbûna rêbertiya rasteqîn re tevkariyê bikin û xêra wî hewldanê bikin. Dema em jî di vê qonaxê de hewl didin raveyek şênber saz bikin, em dizanin ku pêdiviyek dîrokî pêşwazî dikin. Dibe ku îro ev bi yek kesî bê îdarekirin, lê dê siberojê bi hevbeşiyek mezin, meclîs, hukumet û dewlet ava bibe. Dibe ku bi pîvanên ji jêr ve demokrasî, jor ve jî navendparêzî re xwe bigihîne raveyekê. Bes tişta ku niha divê em bê ku piştguh bikin nûnertiya wê bikin

helwesta rêbertiyê ye. Hûn ê jî bizanin li gorî xisletên vê qonaxê teşe bidin xwe. Şêweyên vê qonaxê bi qasî ji yê berê, ewqas jî ji yê pêşerojê jî cewaztirin. Em ji rola xwe narevin. Berovajî hîn zêdetir hewl didin mezin bersivê bidin. Li gorî xweseriya mijarê jî, em hinekê bi ser we de jî hatin. Me got; jin bi tevgerê ve tên girêdan û sedema bingehîn a girêdana jinan jî, ji ber di nava jiyana ku nayên jiyîn de tên girtine. Lewma îxanet li vê nekirin, an jî çîna serdest û bi zaravaya zilamê serdest ve bersiv nedayîn, tê wateya sererastkirina zilam û li ser vî bingehî encamgirtina rêbertiyê. Ger li gelek welatan sosyalîzm di vê mijarê de ser neketibe, ji ber giranî ne daye rola xwe ya di vê mijarê de. Her wiha em hewl didin ji vê hêlê ve jî sosyalîzmê dewlemend bikin. Em ê çiqas ser bixin, an jî ser nexin, hinekê jî dê di pêşerojê de bê dîtin. Ya girîng ji bo çareseriya pirsgirêkê hewldane. Nexwe ez xwe ji hêla kesayet ve weke şêweya ruhî hezkirina ji xwe re, çi jî di nava partiyê de hezkirina ji kesan re napejirînim. Vê cureya girêdanê di asta çînayetî û netewî de weke evîndariyek çavkor a bingeha çîna burjuvaziya biçûk ve girê didim. Diyar dikim ku dema ev tengav dibe yekser dibe hevkar û rexne dikim.

Hat diyarkirin ku xeterî, nepartîbûna endamên partiyê di vê mijarê de bi xwe re pêş nexistine. Rastiya vê heye. Ji ber ku hûn partîbûnê bi xwe re pêş naxin, dibe sedem gelek hewldanên me vale derbikevin. Nexwe îro pirsgirêka we ya herî bingehîn, partîbûne. Jiyana partiyê li ser vî bingehî dewlemendkirin, li gorî asta pêdiviyên rêberiyê veguhertin, weke erka partiyê ya herî cidî li pêş me ye.

Çareseriyên me pêş xistine, ji jinê re firsendên dîrokî ava dikin. Lê ya herî watedar, em tenê bangî jinê nakin, cewhera wê jî pir dewlemend dikin. Ger hinekê encam derbixin, dê hevalên me yên jin hîn zêdetir bikarin xwe bikin hêmanên rakêşwer. Pêşbazî jî li ser vî bingehî tê pêşxistin. Hûn ê jî bi temamî rêya koletiya jinê û ketîbûna jinê bibînin. Her ku hûn xwe li ser vî esasî sererast

û xurt bikin, dê girseya jinê jî zêdetir tevlî vê xetê bibe, jin xwe rêkûpêk bike û weke sermayekê pêşkêş neke. Jixwe êdî ev derfet jî nîne. Dema em hinek peywiran didin zilaman, em didin jinan jî. Partiyê derfetên ku rêbazên jinê xwe gelek caran ceribandiye pir teng kirine. Ger zilam jî xwe ferz neke, jin jî nikare li hember zilamê PKK'ê yê beramber lewaziyên xwe ferz bike. Di vê wateyê de hinek derî hatine girtin, hinek derî jî vekirîne. Deriyên kevnare, rê ji ketîbûnê re vedikin tev ku carek din neyên vekirin hatine girtin. Di vê manê de têkîliyek jixweber nayê dîtin.

Trajediya ku me di ezmûna têkoşîna xwe de jiyayî, ya rastî çavkaniya xwe ji şêwaza pêwendiya hêsan û seqet digirt. Hûn dibêjin; "Fermandarê me bê ku zêde lêkolîn û lêgerînê bike têkîlî pêş xistiye." Encam, dev ji şoreşê diberde, dev ji çeka xwe diberde û bi çargavî ber bi pergalê ve dibeze û xwe radest dike! Şêwaza têkîliya kevnar rewşên wisa dide jiyîn. Weke ezmûnekê dibêjim. Em ê bêmafiyê nekin, a girîng wisa bû ne wisa bû? Malbata PKK'ê ne zilamên hêsan amade dike, ne jî jinên hêsan amade dike. Ango ev ji bo keçan, ji bo jin û zilamên zewicî jî wisa ye. Her ku hûn di nava PKK'ê de kûr bibin, hûn ê baştir bibînin. Hema yekser bi evîna PKK'ê têkîlî nayên pêşxistin. Bihizirin, kesek PKK'yî her kêlî di nava şerê mirin û mayînê de ye. Nexasim ger fermandar be, dijmin jî ji bo serê wî milyonan dide, amûrek biçûk a pêşkêşkirina vê jî jine. Jixwe hûn dibêjin, mînakên wisa pêş dikevin. Vêca ev rewş çavkaniya xwe ji kur digirin? Kesek ku ne diyare çiyê kesekê ye, te çawa karî di demek kin de hez bikî, ewqasî pê re gerim bûyî? Bila te pêşî nas kiriba, hinekê bi hev re hewl bida, ma ya rast ne wisa ye? Hinekê jî hewldana şer hewce dikir. Çima ev nehat ceribandin? Lê ev ji îxanetê xirabtire û di bingeha wê de şêwaza têkîliyek erzan heye.

Belê vaye, feraseta hezkirin û dilketina burjuvaziya biçûk! Ecêb nabînim. Dema min xwe jî nirxand, min got ji zaroktiya xwe ve dildarim. Lê min ti carî di vê mijarê de li

hember jiyanê bêrêzî nekir. Elbet bila kes xwe weke ewliya, weke firîşte, weke rahîp û rahîbe –ya rastî xerîzeyên herî bê esil û xirab jî ji van deran derdikeve holê- nebîne. Lê bila xapandinek erzan, xapandinek weke xanima camêr, an jî camêrê xanimê jî çênebe. Ji ber ku encama vê jî rev-dana revandin û mirine. Ma çend fermandarên me revîn û bi rastî jî zerarek ku artêşên dijmin nekarî bide wan da me. Çiye, qaşo hez kirine, hevdu girtine birine! Deka tişta hatî serê me binêrin! Tişta ku dijmin nekarî bîne serê me, van rewşan anî serê me. Hûn jî dibînin, kesayetên ku bi şer û hemû şaneyên xwe ve nirxên bingehîn ve nehatine girêdan, di vê mijarê de hêsan tên neçîrkirin. Hêsan bi têkîliyan ve tên girêdan. Hûn ê dilketinên xwe yên xwe dispêrin durûtî û xapandinê bikujin. Ev rêgezek pir girînge. Dilketinên xwe nespêrin mantiq û berjewendiyên têkoşînê, di PKK’ê de tên mehkumkirin. Jixwe ev dilketin li gorî civatên paşketî ne. Ev xerîze ber bi her cure serîtewandinê ve dibin û misoger xerîzeyên li pêş azadiyê astengin. Di nava partiyê de mînakên wisa rê ji zerarên pir mezin re vedikin. Em ê vî aliyê xwe baş bibînin. Weke diyardeyek di nava gel û partiyê de dijî, çareya me di vir de ye. Çawa ku şoreş bi zehmetî tê serxistin, welat, azadî û partî çawa bi zehmetî tên bidestxistin, dê ev pêwendî jî wisa bên bidestxistin. Ev hem ji bo jin hem jî zilam derbasdare. Wê tu bi hêza xwe ya çors ve ser nexî, girêdayî wan dilketinên xwe yên erzan ser nexî. Dê ne çav bi çav û ne jî serî bi serî be. Êdî têkoşîn heye. Weke din jî divê ev bê selmandin, êdî ev pêwendî bi xweda û xwedawendên mezin ve hatine girêdan. Ger em weke partî û gel bikarin azweriyên kor ên di rola afyonê de mirovan ser hiş dibe asteng bikin, tê wateya êdî em azadin û rizgarbûyî ne. Hingê em dikarin bêjin pêwendiyên girêdayî van rewa ne. Pêwendiyên ku em di xêra wan de şer dikin hene. Bi rastî jî di pêkanîna wan de hewldanek mezin tê xwestin. Bila jin zilam bidest bixe, zilam jî jinê bi dest bixe!

Lê belê tevî van hewldanên me tê dîtin ku, karê bidestxistinê pir paşde ye. Min hinekê vekir. Ya din jî dikare bi nîqaşê bê kûrkirin. Dikarin mijarê ji durûtî û xapînokên cur be cur bê derxistin. Her ku di rêya wê de evqas hewldan bê kirin, dê bi rastî jî mirov bihêz bike, bibe çavkaniya baweriya cewherî, ecibandina cewherî û xweşikbûna cewherî. Carina hûn giraniyê didin hêza fîzîkî, di asta peresteyî de nêz dibin, ez jî vê pir xeter dibînim. Çi bi hêza siyasî, çi jî ya fîzîkî di vê pêwendiyê de encam girtin xetere. Ev bi hewldanek li gorî xweseriya xwe tê bidestxistin.

Diyardeya xweşikbûnê berhemek şoreşê ya kêlekê ye. Pêwîste teqez şoreş tiştina ji wê bigire û tiştin tevlî bike. Tam jî di vê diyardeyê de pêdivî tevgerek hunerî heye. Ancex li ser vî bingehî dikare hestê xweşikbûnê bilind bibe, wate bide û bê hezkirin. Ev diyardeyek girînge û pêwîste teqez di şoreşê de pêş bikeve. Ji ber ku, di çavkaniya wê de nêzîkbûn û têkoşînek wisa heye. Em ji bîr nekin, nabe ku mirov destê xwe dirêjî xweşikbûnên erzan û erzan jî nêzî xweşikbûna bike. Ev tê wateya desteserkirinê û mafê yek ji me jî ji vê re nîne. Ev di nava partiyê de binpêkirina rêgezekê ye. Ger rêgez bê binpêkirin, dê tawanbarî çêbe û tawanbarî jî neçarî cezayê bike. Qet nebe di partiyê de tasfiyebûnê û di rewşa êrîşê de jî şerkirinê neçar dike. Her çendî heta niha di vê mijarê de tengbûn, kêmbûn û nêzîkbûnên şaş hatîn jiyîn hebin jî, dahûrînên ku demek dirêje em pêş dixin, îro hîn baştir çarçoveya wê derket holê û di astek bilind de encam bû. Ev dahûrîn, ji gelek aliyên kombûnê ve hem nêzîkbûnên ku giraniyê didin çareseriyê rave dikin, hem jî ya herî girîng partîbûna me ya di vê mijarê de pêş dixe.

Em partîbûnê tenê bi vê re jî sînordar nakin. Heta serxwebûna welat û azadiya civakî gihandinê ve girêdayî ye. Tenê di wateya teng de partîbûn, xwe xurtkirina asta pêşeng, ev xurtbûn li ser jiyanê jî serwerkirin û wateya bidestxistina jêhatî û

taybetmendiyane. Ev dihêle ku kes pêwendiyek nû, jiyanek nû pêş bixe û bi hewldanên xwe ve bibe pêşengê quralan. Di vê manê de wateya partîbûnê bi awayek neyê taloqkirin derdikev e pêşberî we. Di pirsgirêkên me yên partîbûnê de û nexasim pêkanîna taktîk de, yan perwerde, yan çalekî, yan jî rêxistinbûn tê piştguhkirin. Heta yek tê kirin, ya din tê paşguhkirin. Tê zanîn ku ev nêzîkbûnek şaşe. Perwerde, çalekî û rêxistinbûn têkilhev pêş dikeve. Heman pênase ji bo vê mijarê jî derbasdare. Dema hûn şer dikin, hûn ê vê diyardeyê jî çareser bikin. Çareseriya rasteqîn, çareseriya dema şerkirinê de tê pêşxistin. Lê ger hûn nêzîkbûna xwe ya di vê pirsgirêkê de şer paşguh bikin, an jî ji şer birevin, bi helwestek wisa bimeşin, misoger hûn di rêya şaş de ne. Mane pêwîste gerîla, bi perwerde û rêxistinbûne re têkilhev û hûrûkûr bimeşe? Ev di pirsgirêkê de jî bi heman şêweyî ye. Şer çiqas dijwar dibe, pêwîste azadî jî di wê astê de bê bidestxistin. Mînak, pêwîste li Botanê azadbûna jin û jiyanê di pêşî de be, pêkve bê jiyîn. Jixwe ger li wir jin wisa bi mirina xwe şer dikin jî ne bê sedeme. Azadiyê di şer de bidest dixin. Em ê jî li hember vê daxwaza jinan a şerkirinê rêzdar bin. Bes hinek jî bersiva rast nadin vê. Li wir çewsandin û teserûfek feodalî heye. Bi qasî me fêm kiriye, li wir hejmarek zêde jin bi fedekariyek mezin şer dikin. Ev jî bersivdana rêgeza partiyê ye. Erka te jî ne çewsandina vê ye, teqez zemînek kêrhatin, birêxistinkirin û bikare kar bike pêşkêşkirine. Mixabin, tu tam berovajî dikî. Ev bi rêgeza partiyê re bi nakoke. Helwestên bi şêwazên; “Tu nikarî şer bikî, zehmete, tu jinî”, helwestên kevnarin û nexasim a ku rola texrîpkar dilîze jî ev helweste. Helwesta rast, ew tevlî şer kirin, şer bi girseyek berfireh a wisa jinê re xurtkirin û pêwendiyê li vir jî sazûmankirine. Jiyan jî vê neçar dike. Lê belê kesên ku vê nabînin, an jî dibînin lê pêwîstiyên wê pêk nayînin hene.

Ya rastî ji hêla me ve pêşî li ketîbûna mezin a cinsê jinê, çewtbûna wê, weke heyberek civakî tinebûna vîna wê girtin,

ancex bi vî şerî dibe. Lewma bi nêzîkbûnên kevnare yên weke “hûn nêz nebin, ma hûn kîne, statûya we wisa ye” ve nêz bûn, koletiya mezin, hem jî koletiya herî kevnar di asta herî pêş de sepandinê zêdetir ne tiştek dine. Ev jî partî, li dijî partî sepandinê wêdetir ne tiştek dine.

Hinek duruşmeyên wisa erzan tên pêşxistin dibêjin; “Şer neke, pevşabin.” Ev duruşmeyek şoreşa dijbere. Li dijî şoreşa Vîetnamê duruşmeyek ku emperyalîzmê pêş xistiye. Îro jî Komara Tirk, vê rêgez ê li dijî me bi kar tîne. Li ser ciwanên me yên hêj 15 salî zewacê ferz dike û hinek lîstokên pevşadbûnê yên sexte pêş xistin. Min di derbarê van de hinek mînak dabûn. Mînak di navenda Amed’ê de keçên ciwan, di nava rondikên xwe yên giran de ji ber pevşadbûnên sexte ji ser hişê xwe çûne. Bi Emrah’an û Îbo’yan re arabesk di asta herî bilind de pêş xistin. Misoger ev jî girêdayî plansaziya şerê taybet bû. Li şûna ku rondikên dijwar li derdora zindana Amed’ê bihatan barandin, ji bohelhela bê eslekî barandin. Mijarek ku pêwîste mirov li ser raweste. Nexasim wî ketî lêvên xwe şir dikir û digot; “Gelo ev ermenî ne, çine?” Belê maskot û ropêşiyek hunerî ya bi xwe ve girêdayî, bi vî rengê pevşadbûnê bersivê didin ciwanên me û tevlîkirina şoreşê. Bêguman tê zanîn ku hezkirin jî bi şer pêş dikev e. Ev bi hevdu ve girêdayî ne. Di nava me de jî di bin navê hevdu “hezkirinê” de kesên ku hevdu girtin û revîn çêbûn. Divê mirov ji van re bêje ketîne. Ew ne hezkirine, xerîzeyên xwe dana axaftine. Jixwe li cihê ku çûnê jî ji hezkirin û rêzgirtinê zêdetir, weke lawiran jiyan kirine. Em niha vê rastiyê di çarçoveya têkîliya malbat, jin û zilam a ku faşîzma 12’ê Îlonê bi awayek ketî pêş xistî binirxînin, em ê bibînin ku, azwerî hatine korkirin, ji mantiq û qonaxên dîrokî dûr û bê agahî, heta weke hêmanek şerê taybet xwe dide ferzkirin. Encam jî, bi rastî jî qutbûna deh hezaran ciwana ye û bihêşkirina wane. Mirov dikare werzîş û ol jî tevlî vê rastiyê bike. Di vir de jin û saziya malbatê jî rolek girîng

dilîze. Bi vî rengî dixwazin li dijî şerê me bendavek mezin ava bikin. Tê dîtin, bandora di bin vê duruşmeyê de tên pêşxistin, hêjî li ser gelek ji we heye. Ev xeternake û divê bê binpêkirin. Li şûna vê duruşmeya ku pêwîste bê bilindkirin rêgeza "bi qasî tu dikarî di xêra nirxên bingehîn de şer bikî, ewqas mafê hezkirinê jî bidest dixî" ye. Ya din jî, ketina nava qelîştekên rêgez ên şoreşa dijbere û li wir herikîne. Di encamê de bûna dilopek ji pîsiya şoreşa dijbere.

Ji bo em gavek din nêzî partîbûnê bibin, me ev pirsgirêk hinek din zelal kir. Bêguman hewce dike nêzîkbûnek azad ji pirsgirêkê re bê kirin. Pêwîste em di vê mijarê de çeka partiyê misoger xirab bikar neyînin. Berovajî, durist, rêzgirtinek beramber hevdu, wekhevî, dilxwazî û hîn zêdetir pêngavên têkoşînê kûrkirin tê xwestin. Heta ku hûn hevdu di pirsgirêkên şoreşê yên girîng de ne ceribînin, qetiyen nêzî vê xalê nebin. Pêwîste pîvanên we di vê mijarê de girêdayî rêgezan pêş bikevin. Nexwe, di encamê de hûn ê pir xirab winda bikin. Li gorî min li şûna mirov wisa xirab winda bike, em şoreşa xwe di rêya rast de ava bikin, saziya civaka me ya herî girîng ku hatiye xistin û li şûna têkîliyên li vir jî nikarin henase bigirin, pêwendiyên azad di nava partî û gel de pêş bixin. Ji bo vê jî rêyek derketinê bigerin, di asta hewldana xwe de jî tevkariya çareseriyê bikin û serkeftina vê jî erka me ya herî girînge. Hûn tev jî, li ser vî bingehî bi erkên xwe ve girêdayî bin, baş têbigihijin û hewcedariyên wê pêk bînin. Di nava partiyê de ne tenê çareseriya xwe ya takekesî, -ev her tim di asta duyem de ye- çav li çareseriya giştî bin, guh bidin wê, li dijî ji rêderketinên di vê mijarê de jî têkoşînek baş bimeşînin. Pêşiya rastiyan vekin, pir nerim bin û heta yên para wan di vê xalê de heyî jî bila bi rexnedayînek jidil ve bikare derbas bike.

Em bi şêwazek dixetimîne û diçewsîne bi ser pirsgirêkê de naçin, her tim pêşiyê vedikin, ku em dizanin dê dema pêş me jî mijûl bike, tevî wê em her tim firsenda nûkirinê didin. Di vê

mijarê de pirsgirêkê di çarçoveya nêzîkbûnên kevnar de negirin dest, hîn wêrektir pişgirî bidin û rola xwe ya pêşeng bi israr pêk bînin. Ji ber hinek şaşiyên biçûk nebin mînakên xirab. Neheqiyê nekin. Nebin mînakên xirab ên darezên nirxên kevneşopiya civakî, her tim li ser peywirên şoreşgerî yên rast ezmûnan bidest bixin. Hestên xwe bi nirxên bingehîn ve girêdayî bihêlin, hevdu nas bikin û bihêz bikin. Girîngiyê bidin vê. Pêwîste hûn hewl bidin vî erkî li her qadê ser bixin. Di nava partiyê de û di refên rizgariya netewî ya rêbertiyê jê re dike de, ger serkeftina we li ser vî bingehî pêş bikeve, dê misoger rizgariya me ya netewî û tevkariya me ya ji enternasyonalîzmê re di asta pêş de pêk were. Weke hûn nêzî hemû peywirên şoreşgerî dibin, rast û têrkar nêzî erkên xwe yên li ser vî bingehî jî bibin. Dîsa ji bo serkeftina vê jî, her tiştê xwe fedekarin hilbijartina me ya sereke ye.

Cardin li ser vî bingehî hêvîdarim hûn ê rast xwedî li peywirên xwe derbikevin û ji bo serkeftina wê hemû hêza xwe di cîh de bikar bînin. Vê helwesta bi rêgez li her cihê ku hûn diçinê bi israr pêk bînin û bi vî rengî girîngiya serkeftinê rave dikim.

***Adar 1990***

***Em ê Bi Zanebûna Cîhana Mezin A***
***Em Dixwazin Ava Bikin***
***Şer Bikin Û Teqez Encamê Bigirin!***

Şoreşa civakî çiqas kûr be, di heman radeyê de pirsgirêka jin û malbatê jî xwe ewqasî derdixe holê. Teşeya civakî, qonaxa amajeyên yekemîn ên pêşketina çînayetî ye. Malbata esasî ya di navê de hestên milkiyetê ya destpêkê pêş ketiye. Malbat têkîliyek ku hêmanek, tiştek, gelek tiştên weke çînayetî, desteserkirina sermaye, bilindbûna hêza otorîte lê kom dibin rave dike. Bi qasî destpêka dîrokê, di roja me de jî pirsgirêkek ku xwe girîng derdixe holê. Weke Nazim Hîkmet dibêje; “Cihê wê ya li ser mêzeya me, piştî ga ye.” Jin, ketiye vê rewşê û li Kurdistanê jî di bin navê namûsê de jî bênamûsiya herî mezin bi navê wê tê meşandin, dibe mijara mal, milk û têkîliyan.

Ger hûn ji min bipirsin, weke min ji we hevalên xwe yên hêja û hezkirî re gotî, yek ji hêcetên şoreşgeriya xwe ya herî girîng, deyndarê sekna xwe ya vê rewşa ecêbim. Ol vê xalê weke mijarek îblîs destnîşan dikin. Ev mijar nebî jî ji nêz ve eleqeder dikir. Dibêje; “Bi qasî ji îblîs dûr disekinim, ji jinê jî dûr disekinim, ji ber ku mijara herî zêde min tevgav dike ye” û daku wî biparêze ji xwedê jî alîkarî daxwaz dike.

Di mijara Kurd de jî, ji destpêkê heta roja me diyardeyek weke şelaxekê li ser serê me diheje. Em heta niha li hember vê xalê teslîm nebûn. Lê ji bo berxwedanê jî, tevgerek mezin a rêbertî tenê têrê nake, zêdetir tê xwestin. Ez ê lewaziyek we bêjim: Dema tê gotin; “Me serê kurê xwe, keça xwe girê da”, ez di vir de bi temamî teslîmiyeta ji koletiyê re dibînim. Mixabin çi bi êşe ku, yeqîn dikim gelek ji we ji mêj ve radest bûne. Di vir de yekser bersiv ji pirsa em çima azad nabin re tê dayîn. Ger te hêj di 15 saliya xwe de, xwe bi xwe teslîm kiribe, wê tu çawa azad bibî?

Yek ji tevdîrên herî mezin a 12'ê Îlonê jî, serê hemû keç û xortên hêj 15 salî girêdan bû. Yeqîn dikim di vê mijarê de gavên girîng hatine avêtin. Yek ji rêbazên şerê taybet a herî bibandor 12'ê Îlonê karî ciwanan teslîm bigire, ev xal bû. Xalek wisa ye, ne çareseriyek keşîştî dibe –jixwe ev jî rê ji pêşketina şêweyek herî xeternak a pirsgirêkê re vedike-, ne jî çareseriyek ku îro lîberalîzma burjuva bi rastî jî tîne rewşek ku êdî neyê nasîn, nêzîkbûnek rasteqîn rave dike. Lê dîsa jî di sînorên diyar de –weke wext û zemîna guncav- şêwazek nêzîkbûnê hewce dike.

Kesên ku zewacê dixwazin an jî zewicîne, rastiya eşq û evîndarî jiyane, divê baldar guhdar bikin! Ger hûn ezmûnên min bipirsin û zelalbûna me ji xwe re bikin bingeh, ez ê bêjim ku, ev hem di şerê şoreşgerî, hem jî şerê taybet de di encamgirtinê de pirsgirêkek divê weke gurekê be. Reva di Başûrê Kurdistanê de piştî Şerê Kendavê bûyerek herî mezin a hêzê ku hatî jiyîne. Di encamê de ma hûn dizanin girêdayî çiye? Girêdayî stargeha ketî, teslîmbûna di têkîliyên jin û mêr a di stargeha malbatê de ye. Tinebûna neteweke jî girêdayî vê ye. Yên din jî li ser vê mezin dibin. Madem, neteweke jî tine dike û herî dawî bermahiyên xwe yên dawî jî ber bi tinebûnê ve dibe, nexwe divê yekser bersiva wê bê dayîn. Ev bersiv, çeka herî mezin a di destê şoreşa dijber de girtin û kirina çeka herî mezin a şoreşê ye û me jî ev pêk anî.

Hevalên ku hewl didin rastiya xwe dahûrînin, yeqîn dikim wêrekin ku hest û fikrên xwe yên di vê mijarê de vekin. Di vê mijarê de hinekê hatine rexnekirin. Li gorî min hewce dike bi şêwazek guncavtir bi ser babetê de biçin, lê belê ji ber bê ezmûntiya hevalên me nêzîkbûnek bihêz nayê raberkirin. Gelo hûn dizanin îro dixwazin di kesayeta hevalekê de çi li ser me ferz bikin? Taktîkek min tê berovajîkirin û li hember me tê bikaranîn! Çawa ku em hewl didin malbata ku Komara Tirk li dijî Kurdistanê bikar aniye cardin weke çekekê li dijî wî bikar bînin, ew jî niha bi mînakek din dixwaze heman polîtîkayê li dijî me

bikar bîne. Nêzîkbûna me pir heqîqî, pir Kurdistanî, pir azadîxwaz û pir jî hevalbendî bû. Ji ber vê jî birîna dijmin pir giran bû, êşa wê jî kêşa. Niha jî hewl didin heman çekê weke me pêk anî li dijî me bikar bînin.

Em li vir nîqaşa fikir dikin û her kes jî dikare nêrînên xwe bêje. Ev hevala me di nava partiya me de kesayetek ku gelê me bi berxwedaniya wê nas kiriye û bi sempatiyek mezin pêşwazî dike. Ango nirxek PKK'ê ye. Hêj ne li gorî daneyên heyî, lê li gorî tiştên berçav ên girîng dixwazim bêjim: Sîxurê Şener ji gelek aliyan ve nêzî vê hevala me bûye. Li ser pir hiziriye, gelek hesab kirine û li ser kar kiriye. Ji nîqaşên li vir jî derdikeve holê ku, tevî hemû kesayeta xwe ya berxwedêr, bê ku di ferqê de be, bersiva van nêzîkbûnan daye. Dibe ku di nava salên dirêj de wateya vê baştir têbigihije û weke rave bike, li hember partiya ku her tiştê xwe ji bo wê feda kiriye, hem jî di kêliya dibêje endamê partî ya herî baş ezim de, ev rastî jiyane. Li gorî gelek raporan û heta bi qasî min ji nêzîkbûnên hemû çêkerê jî fêm kirî, bi partiyê re rûbirû hatiye. Ev jî rastiyeke! Hûn dibêjin hemû çêker di vê mijarê de pir bi hêrse. Lê vê hevala me jî wisa gotiye: "Hewce bike, ez bi tena serê xwe jî bimînim, ez ê dîsa bi we re şer bikim!" Diyardeyek mezine! Ev jî her çendî ne yekser be asta bandora dijmin diyar dike û ev jî bi navê hezkirinê çêdibe. Hem jî bi navê hezkirinek mezin! Elbet dibe ku ev rewş bê serê her kesî û mirov vê rewşê ecêb jî nabîne. Pirsgirêkên wisa yên mirovên mezin çêdibin. Lê du encam ji vir derdikevin. An encamek hêjayî mezinbûnê ye, yan jî şêweyek pir ketî ye. Ev xeterî heye. Ji bopirsgirêk pir balkêş bê têgihiştin, gelo we karî serê xwe yekser baş bişixulînin? Bûyerek mînake, lê babetek sereke ye. Hemû dane baş didin diyarkirin ku, taktîkek hebûna PKK'ê saz kiriye, bi şêweya PKK bi navê PKK'ê tinekirinê derdikeve pêş. Vê jî ecêb nabînim. Misoger divê heval jî ecêb nebînin.

Em li ser rastiya zindanê rawestiyan. Elbet divê hûn nehizirin wê dijmin kesên di zindanê de û bi navê PKK'ê berxwedaniya herî mezin dijîn rehet berde. Berxwedaniya zindana Amed'ê, di wateyekê û dîrokê de, berxwedaniya hebûn û tinebûna Kurdistanê ye. Berxwedaniyek wisa ye darbe li çarenûsa mirinê dixe, qonaxa jiyanê ya herî girîng misoger dike. Ji nava wê rastiyê tên. Me hemû wate û girîngiya berxwedaniya Tîrmehê ya rêber danî holê. Berxwedaniyek bi çarenûsa Kurdistanê ve eleqedere. Rêberên vê berxwedaniyê hene. Hêzek pir hêja di berxwedaniya dîrokî ya herî girîng de şehîd ketine. Paş wan qadroyên destê duyan man û hevala me yan jî hevalên me çend ji van kesane. Lewma teqez dê şerê taybet bixwaze encamê bigire. Tê zanîn ku şêweya rêvebirina bingehîn a Kurdistanê û arestekirina şer di destê şerê taybet de ye. Zindana Amed'ê jî, weke qada berxwedanê ya herî bingehîn, yek ji qadên şere. Piştî şahadetan, radeya şerê taybet zêde tê pêşxistin. Encama herî girîng a ji vir bê derxistin, dê van hevalan an îmha bikin, an jî bidin jiyîn, lê di nava nêzîkbûnên şerê taybet de bigirin. Ev ji hêla teorî ve misoger wisa ye. Jixwe daneyên niha derdikevin holê yên teorîk na, em dibînin ku ev rastî di pratîkê de gav bi gav hatine pêşxistin.

Niha jî em li hemberî xwe weke jin kesayetek pir bi hêrs, xwe ferz dike, dihizire, hestiyar, di cihê xwe de nasekine dibînin. Hundurê xwe dixwe. Ez bûm şahid. Dema xayînek, ketiyek dixwaze PKK'ê tine bike û dema ez agahiya vê didim, sedemên wê çi dibin bila be, bû xwediyê helwestek pir şaş û xwe negirt. Cîhanek li gorî xwe ava kiriye, dibeje ku çawa dibe ev wisa derketiye û di wateyekê de jî hesab ji partî dixwaze. Dibe ku niha hevala me ji hêla mantiq ve dahûrandina vê pirsgirêkê de nû bihêz dibe. Lê di destpêkê de heta dawî hestiyar û bi bertek bû. Dema ez jî bi rastiyek wisa re rûbirû hatim min yeqîn nekir. Lê dema niha hemû daneyên heyî ber çavan re derbas dikim, nû fêm dikim ku, zindan piştî dîrokekê, nexasim piştî siyaseta tinekirinê bi

rêbaza rehabilîtasyonê gav bi gav venêrîne. Li ser vî bingehî berxwedanî jî bi kar anîne, xwestine hemû taktîkan wisa vale derbixin, heval anîne rewşek wisa ku bi çeka xwe li xwe bidin û bikujin. Berxwedaniya zindanê ya herî dawî hatî cem partî, weke di vê pirsgirêkê de jî tê dîtin, xwe wisa bi partiyê re di nava ahengê de nabîne. Vêca ew têkîliya civakî, têkîliya azadî û têkîliya zewacê xwe ferz dike wisa derdikeve pêşberî me. Ger em baldar nêz nebin, dê ev bi serê xwe bibe sedema cudabûn û parçebûnê, an jî dê şerek be. Jixwe, dê di encama vê de hevdu tinekirin derbikeve holê. Li cem me zehmete ku pirsgirêk cuda bê çareserkirin. Kesên ku hinekê dîroka PKK'ê dizanin, dikarin di vê mijarê de hinek encaman bigirin.

Ez ê xalek din bi bîr bînim: Her çendî sembolîk jî be heval bi dergistî bûye û ev mijar jî li vir hinekê bêwext û berovajî hatiye nîqaşkirin. Yeqîn dikim ev tam jî bihevrebûna sembolîk a ku provakator xwestî li ser rastiya kongreya me ferz bike rave dike. Hevala X... di rapora xwe de dibêje; "Ez ê çend rojan biçûma dê min ewder dîtiba, paşê jî vegeriyam." Niha dikare wateya vê ya siyasî şîrove bike. Em yekser nirxandinan nakin. Dema ev helwest pêş dikevin, dibe ku ne di zanebûna van şîroveyan de be. Lê siyaset diyardeyek cuda ye. Ji bobaş bê fêmkirin babeta jinê, yan jî babeta hezkirinê, yan jî babeta azadiyê, têkîliya jiyana civakî çawa rê ji encamên karasetên siyasî re vedike, bi israr li ser van xalan disekinim û dixwazim li ser baş bê hizirîn. Hevala X... di rapora xwe ya peyre de destnîşan dike ku, beriya bê vir di derbarê rewşa heyî de nehatiye agahdarkirin û bi têgehek ne di cîh de jî dibêje ku; "Hema bêje ez avêtim vir" û rewşê wisa rave dike. Yeqîn dikim dê dema pêş bibîne ku, rizgariya herî mezin jî di vê têgehê de veşartiye. Ger wê demê ev ji rewşek sembolîk derketa û veguheriya bi hevrebûnek fermî, partiyê jî di vê mijarê de tevdîr girtiba û destûr nedaba vê bûyerê, gelo dê veguheriya çi rewşê ma hûn dizanin? Zilam weke saetek

hatî sazkirine. Wisa yeqîn dikim, amadekariyek şerê taybet a mezine. Ez her tim bi şêweyek tevdîr hinek şîroveyan pêş dixim.

Li gorî min, piştî îmhaya sala 1982'an li hember rêbertî û girseya berxwedanvan a partiyê di zindanê de, di sala 1984'an de teslîmîyet û hevkarî hatiye ferzkirin. Jiyana civakî ya di girtîgehan de bi taktîkên di bin navê "başkirinê" de hatîn pêşxistin re xistine bin kontrolê, li hember pêşengên berxwedanvaniyê jî rêbazên taybet hatine sepandin. Nexasim di berxwedaniya Çile'ya 1984'an de, kesê ku navê wî derbas dibe bi hevkariyek pir vekirî ve bi plansaziyek jiyana civakî ya pir veşartî û xayîntî ve derfetê pêşxistina vê hêdî hêdî tê dayîn û pêşxistin. Heta salên 1988'an pêvajoyek wisa çar salan derbas dibe. Bi vê taktîkê çêkerê kontrol dikin û heta sala 88'an mijarek weke rêbertiyê pêş dikeve. Yeqîn dikim beriya niha jî têkîliyek hevala X... ya hestiyar pêş dikeve. Her çendî hevalê din hinek aliyên wî yên çors hebin jî, bawer dikim teslîmî dijmin nabe û berxwedanvaneke. Her çendî hinek nebesiyên wî hebin û em jî zêde tengav kiribin jî, neteslîmbûna wî, nexasim di rastiya Dêrsimê û nava guruba Elazixê de mijarek bi nirxe. Bi hevalek wisa re di çarçoveya pêwendiyek hezkirinê de nêz bûn ne tiştek xirabe. Yek hilbijartin heye, nabêjim herî baş wan kiriye, lê dîsa jî watedare. Di vê mijarê de mantiq û nirxa li gorî xwe pêşxistina pêwendî û hêz dana hevdu heye. Lê mixabin tam ber bi sala 1988'an ve -li gorî min ev dîrok pir girînge- ev têkîlî tê xurtkirin. Mirov dikare çîroka vê hîn berfirehtir binirxîne. Di vir de ev têkîlî tê provekekirin û di rastiyê de pêwendiya berxwedanê tê teqandin. Ji wê pêwendiyê qutbûn û têkîliyek nû hilbijartin, ne yekser jî be ji berxwedanvaniyê dûr dixe.

Di wê dîrokê de xwe bi temamî ji rêbertiya zindanê re amade dikir. Vî kesî gotina; "Têkîliya bi min re, têkîliya bi Kurdistanê re ye" bikar aniye. Ev axaftinek pir watedare. Têkîliya bi Kurdistanê re hatî sazkirin pir watedare û her çendî sembolîk jî be têkîliyek pir mezine. Bes ji hêla vî kesî ve ev têkîlî hatiye

teqandin û tam jî di wê salê de li zindanê bi dîktatorî û fêlbazî rêbertiyek ferz kiriye. Di vê rastiyê de bi kevirekî du çûkan digire. Vêca piştî ev têkîliya berxwedanê tê teqandin, hevalek me ya berxwedêr bi şêweyek pir xeternak bi rêbertiya xwe ve girê dide. Berxwedanvaniya salan û hezkirinek bi wê ve pêş ketî bi îxanetê encam dibe. Hem jî bê ku ferq bike, pir fêlbazî, weke rûviyan çêdibe. Nûnertiya berxwedaniyê ji aliyê rêbertiya hevkar ve bi şêweyek pir xeternak bikaranînê re rûbirû û bê bandor dimîne. Di vê mijarê de kes li dijî dernakeve. Di kesayeta wî de darbeya mirinê li berxwedaniyê dikeve. Ya duyem jî di bin navê hezkirinê de kesayeta berxwedêr dikeve bin bandora meyil û dorpêçiyek mezin. Sala 1988'an bû, şeş meh pêş an jî paş ne girînge. Ev rastiyeke ku rêbertiya berxwedaniya zindanê bi şêweyek pir xirab hatiye bikaranîn û teslîmgirtin. Hem jî hezkirinên herî mezin hatine bikaranîn û rê ji hêrsên pir mezin re vekirine.

Di dawiya sala 1988'an de berovajiyek rêbertiyê hatiye jiyîn. Di sala 1988'an de li Ewrûpa provakasyona Fatma û Parêzer derket holê. Dîroka ku gotibûn; "dê APO biçe" yan jî "me PKK desteser kir" bû. Di pratîka welat de jî ketiyên Hogir û Metîn rêbertiyên xwe ferz kirin. Li Ewrûpa jî ji aliyekê ve hevalên me dihatin girtin, aliyê din ve jî komek darbekar di wê dîrokê de digotin; "Me desteser kirine." Di nîvê salê ya duyemîn de jî, ji bo min her tim nirxandinên weke "dê biçe" dihatin kirin. Rojnamevanek hatibû cem me, digot; "Êdî tiştek ku tu bikarî bikî nemaye." Tevî Parêzer zilamek pir tirsonek bû, her tim daxwiyanî li ser daxwiyaniyê dida û digot; "Ewê biçe." Niha em lê dinêrin, hinek rastî di bin gotinên wan de veşartîne, ji bo wê vale nabejin.

Li sê qadên me yên têkoşînê yên bingehîn dijmin pir bi ser de diçe û di astek girîng a polîtîk de sîxur tevlî me kirine. Herî zêde xefleta çekara me ya li Botanê, Ewrûpa û zindanê em tengav kirin. Lewma digotin; "Tenê APO ma." Hûn jî dizanin ez şibandim her tiştî, ti nav nema li min nekirin.

Me kêlî bi kêlî têkoşîn meşand. Hêj em negihiştin dawiya salê, ber bi sala 89'an ve me ev nêzîkbûnên xwe ferz dikin serûbin kirin. Em bi ser Botanê de çûn. Dahûrînan bixwînin. Têkoşîna me ya li vir ev hemû vale derxistin. Hûn çîroka bûyerên li vir baş dizanin. Hêsan nebînin. Pir bingehîn bi me ve mijûl bûn, rêbazên ku mirov nikare bilêv bike bikaranîn. Kesên li Ewrûpa dijiyan, bi polîsên Ewrûpa re hevkarî pêş xistin û tê zanîn rewşên çawa derketin holê. Tê gotin ku, di dîroka Almanya de bûyerek wisa nîne. Deka li zindanê jî binêrin, ji kur ber bi ku ve hatin? Wê demê hinek komên li vir jî dixwestin yekser bi komployan encam bigirin. Me nêzî bîst-sih mînakên wan dîtin. Me jî li ser bingeha berpirsyarî û tevdîrên şoreşgerî jiyan kir û ew vale derxistin.

Çeka provakasyonekî ya herî bihêz, nepeniya wane. Jixwe piştî derdikevin holê, diqedin. Wan xistibû serê xwe di salvegera 4. a 15'ê Tebaxê de partiyê biqedînin. Îlana xwe jî di vê dîrokê de pêk anîn, lê çawa xwe îlan jî kirin xwe tine kirin. Derxistina holê ne hêsan bû. Peyre jî tişta dihat xwestin pêkan bû. Bi rastî jî rêbazên ku ferz dikirin ne dihat bîra kesî. Gelek rêbazên weke hinek hevalan ez vexwendim Ewrûpa û heta gefên weke "dê di demek nêz de belayên mezin bên serê te", gelek rêbazên cur be cur ên provakatîf li hember min bikar anîn. Ev jî rojnamevanek ku hatî vir digot û gef jî pir vekirî bûn. Ev provakasyon baskek xwe yekser ji nav Komara Tirk, baskek ji Ewrûpa û baskek jî ji nav me derdiket û xwe ferz dikir. Ev xeternakiyek pir cidî bû. Ya herî girîng jî, li welat şerê taybet tam terorek dida meşandin. Li gorî hesabên wan, sala 1988'an, sala tinekirina partiyê bû. Ev jî dihat wê wateyê, bê ku em bigihijin 15'ê Tebaxa sala 1988'an, dixwestin PKK'ê tine bikin.

Niha em ber bi sala 1992'an ve diçin. Ev pêngav vale derket. Li gorî pêngava nû pêdivî bi rêberên nû û lîstokvanên nû heye. Em jî di nava plansaziyek li gorî sala 1992'an de ne. Şerê taybet li zindanê, Ewrûpa û li çiyan vale nasekine. Îsyana Şêx

Seîd û Rêbertiya Seyît Riza binirxînin. Ji destpêkê ve du “gur” danîne kêleka wan, hem areste dikin, hem jî her tiştê wan dikin rapor. Îsyanên din jî wisa ne. Dê PKK bibe xwedî berxwedaniyek evqasî mezin û dê yekser û ne yekser aresteyên şerê taybet çênebe! Deka em ê xisleta şerê beramberî xwe û heta xisleta dîroka serdestiya Tirk bînin bîra xwe, em ji Îdrîs-î Bîtlîsî bigirin heta van rojan dîrokê hinekê fêm bikin.

Dema em berxwedanê pêşve dibin, bêguman dê ew jî her tim tinekirinê bixin rojevê. Rewşa heyî, ber bi dawiya sala 1988’an ve hedefa wan a tasfiyekirinê dida diyarkirin. Nexwe dê êdî kî tevbigere? Dijmin tenê di eniyê de şer nake. Ger tenê di eniyê de şer bike, dizane ku nikare pêşketina me asteng bike. Heta ku şerê taybet eniya hundur desteser neke bela xwe jê venake. Ne di dîrokê de, ne jî di roja me de pêşketina evqasî rêbazên ketina nav û bandorkirinê çênebûne. Rêbertiya PKK’ê, yek ji rêbertiyên siyasî yê herî pêşketî yê cîhanê ye. Di Rêxistina Rizgariya Filîstînê (FKÖ) de Ebû Îyad û Ebû Cîhad çawa hatin kuştin! Ji sêyan yek rêberên rêxistinê bûn qurban, hatin kuştin. Tenê Arafat ma, wî jî bi zanebûn nakujin. Ev jî şerê taybet a ku Enstûtiya Operasyonên Îstîxbaratî û Taybet MOSSAD dide meşandin û rêbertiya Rêxistina Rizgariya Filîstînê jî weke pêlîstoka zarokan destê xwe de digire. Jixwe tê zanîn Teşkîlata Îstîxbarata Mîllî MÎT’ên Tirk jî me serbest bernadin. Dibe zêdetir jî bi me ve mijûl bûne. Dibe ku hûn zarok bin, lê belê rewş cuda ye. Dîrokek ku min jiyan kirî heye. Min pir dixwest rojekê arşîvên MÎT’ê bên vekirin. Gelo tiştên li ser me dihatin ferzkirin û makanîzmayên me yên parastinê çine? Gelo MÎT’ê çawa nirxandine? Baş dizanim ku MÎT ji sala 1975’an ve li pey mine. Çavderiyek wisa hebû ku dihat gotin, bi navê Kurdistanê qaşo artêşek rizgariya netewî ava kiriye. Pir vekirî bû dê me taybet xistiban bin venêrînê. Ez xwe naxim şûna Mahîr. Lê weke kesayet jî pir cewaz ava bûme. Van zilaman ji sala 1975’an ve em bi tenê ne hiştin.

Lewaziyên me jî hene. Lewaziyên weke rewşa ruhî, lewaziya kesayet, lewaziya siyasî û lewaziya civakî! Baş tê bîra min, di sala dawî ya dibistana amadeyî de serdarek paya bilind dersa me dida hebû. Ti zilamek bi qasî wî min re eleqeder bibe û mezin bike tine bû. Li dibistana Herbê mamosteyê wêjeyê bû. Ji min re digot; “Ez darêjnivîsên te dibim ji profesoran re, weke mînak didim wan û li ser nîqaş didim meşandin.” Sedema eleqederbûna wî jî, min weke kesayetek ku pêwîste bi tenê nemînim dinirxand û dibe ku dixwest xwedî li min derbikev e. Mamosteyek din hebû digot; “Tu ji kurî, divê em vê ji te re bikin.” Ev jî nêzîkbûnek bû. Yek sivîl, yek jî leşker bû. Awirek wî wisa hebû, hêjî di bîra min de ye. Weke ku ez ê belayekê bînim serê wan, lê dê ew jî min bixwe!

Jixwe nêzîkbûnên pey wê re jî pir ecêb bûn. Ji bo ji we re mînak be vedibêjim. Ji malbata xwe qut dibûm. Çûm serdanê, min dît ku rewşa malbatê xirabe. Ez sê rojan li cem wan dimam, heta qirika xwe tijî dibûm. Piştre jî vedigeriyam Enqerê û min sosyalîzm hem êz dikir. Careke din diçûm. Min çend caran ev hatin-çûn dubare kir, paşê jî ketim ser rêya welat, hem jî bi meş. Tişta min di malbatê de dîtî ev bû! Lê belê hûn dibêjin, ger hinek fermandarên me neçin cem malbatên xwe, heta nezewicin, an jî pêşmerge neçin cem hevjînên xwe, rehet nabin. Ez jî ji van direviyam. Dema min dît, wisa bi ser min de jî tên, ez reviyam. Tevî ku em ciwan bûn, me ev kir û ev jî xisletek wê demê ya ecêb bû. Encama yekemîn min ji vê derxistî; ne li derdora malbatê, dervî malbatê min pêwendiyên civakî yên nû esas girt. Cewhera nêzîkbûna min a ji malbatê re wisa bû. Heta nîvê sala 1976’an êdî çavên min bi wan neket û min nameyek jî ne nivîsand. Ev jî girêdayî ferasetê ye.

Piştî wê dîrokê êdî min berê xwe neda malbatek din. Vê malbatê di îsyanên qonaxa Komara Kurdistanê de di hevkariyê de rolek bibandor lîstiye. Bi keça vê malbatê re pêwendiyek me

çêbû. Hinekê jî çepgirî pêş ketibû, lê belê di nava kevneşopiya Partiya Gel a Komarê CHP de kemalîzm serwer bû. Çawa ku CHP di çepê de serwer bû, ew jî kesayetek serdest bû. Di wê pêvajoyê de kesayeta me ber bi pirsgirêka netewî ve herikî û hinekê jî rêyên wê yên çareseriyê pêş xist. Yeqîn nakim sîxurek zanebûn bû, lê nêzîkbûnek wê ya venêrînê ku çavkaniya xwe ji feraseta "Kurdistan di bin berpirsyariya me de ye" digirt hebû. Her çendî destpêkê ne zanebûn jî be, nêzîkbûna wê wisa bû digot; "Gundiyê xwedê berstûka wî nayê hev, çawa dikare bi qada di bin venêrîna me re mijûl dibe!" Jixwe paşê ev pir vekirî gotin. Her ku çû baldariya min jî zêde bû. Di vir de şêwaza baldarî hebû. Hûn jî bi cerdevanan re pêwendî pêş dixin, ez jî pêş dixim. Bala min a hestiyar pêş ket, hem jî tevî hemû xirabiyan zêdetir bû. Niha baştir tê fêmkirin ku di vê têkîliyê de xala giran ne aliyê hestiyar, aliyê siyasî bû. Bes vê jî vekirî bêjim, di vê mijarê de qetiyen nêzîkbûnek min a bikar bînim tine bû. Heval X... dibêje ku pir hestiyare. Lê nêzîkbûnên min pir bihêz bû. Ez bi qinyata her çendî ji malbatek hevkar jî be dibe ku bibe şoreşger tevgeriyam, bi fikra ku pêwîste mirov alîkar be, baldar nêz bûm. Ya herî girîng ji malbatek hevkar şoreşgerek derxistine. Mijarek mînake û pêwîste di vê mijarê de hewldanek taybet bê kirin. Ango nêzîkbûna min wisa bû. Ev jî nêzîkbûnek rast bû. Lê her çendî ez hinekê hestiyar bûm, nêzîkbûna beramberî min bi temamî siyasî bû.

Ji bo ji hinek hevalan re çareseriyek baştir be, lewma behsa têkîliya jinekê dikim. Ji ber min bi kesek ji malbata hevkar re têkîlî pêş xist gelek kesan jî em rexne kirin. Niha dibe hûn jî bêjin te çima tiştek wisa kir. Ya rastî têkîliyek pir xeternak bû. Reseniya têkîliya beramberî me wisa bû, xwezayî dê bihata rexnekirin. Bes ji boti caran niyetek xirab nebû, yek ji çalekiyên min a herî mezin bû. Min li dijî şûnek Komara Tirk dest lê nedihat kirin, êrîşek hesas pêş dixist. Ango li hember cihek ku her

tiştê wê bi rêkûpêke hewldanek veşartî ya şoreşî bû. Tişta ecêb di vir de bû; nêzîkbûna min hewldanek pir kesî bû, ya beramberî min jî dewletek pir sazûmankirî bû. Carek din jî bêjim, misoger niyeta min pir baş bû û bi hestên pak nêz dibûm. Dema dibêjim sizma şaş fêm nekin. Ji ber hûn nikarin hevokan binirxînin, xwe di vê mijarê de sererast bikin. Navenda hemû tiştê ku vedibêjim didim we, daku hûn nirxandinên şaş nekin.

Beriya niha min ji we re behsa provakasyona sala 1977'an kiribû. Darbeya Namik Kemal Ersûn hebû. Naveroka wê darbeyê, îmhaya PKK'ê bû. Dîsa di wê demê de provakatorê bi navê Pîlot ji ber serê me ranedibû û me dizaniya ku kontrol dike. Em gurubek biçûk bûn. Em hêj di sala 1977'an de bûn. Ejderhayek li ber serê me bû. Sibeha darbeyê dê bibûya sibeha girtina me û dê wisa jî em tasfiye kiriban. Jixwe Kemal PÎR û Karasû jî di encama komploya provakator de hatin girtin. Ger min jî tevdîr ne girtiba û rênasek pêşde ne şandiba cihê civînê, wê di havîna sala 1977'an de tevger bi temamî tine bibûya. Bêguman dê me di hundur de jî li ber xwe bida, ji ber çekên li cem me hatin girtin dibiya ku em deh salan girtî biman. Ev provakator bi rastî jî endamek şerê taybet bû. Malbata ku têkîliya me jî pê re heyî, malbata Komara Tirk a herî sazûmankirî bû. Em dihizirîn gelo em ê çawa vê dorpêçê rizgar bibin?

Vêca em ê pirsgirêkên we keç û mêrxasên me rave bikin. Hûn behsa hestan dikin, behsa girêdanan dikin, behsa eleqeya wê bi polîtîkayê re dikin. Ha ji we re mînakek herî baş. Siyasetek mezin li holê heye, ew jî Siyaseta Rizgariya Kurdistanê. Malbatek dewletê ya karbidest heye, em ketine navê. Provakator rojê sê caran serdana me dikir. Pey vê xeternakiya darbe û kuştinê hebû. Nekarîn îmha bikin lê, em bi girtinê re rûbirû man. Kesê ku di hemû şaneyên xwe de van nehese nikare bibe rêber. Ger çermê min weke yê gamêşê bûya elbet min ne dikariya rêbertiya siyasî bikim û ji bo pêşxistina xetekê ne dikariya rol bilîzim. Kesên

nûnertiya tiştek girîng dikin, neçarin ku di her astê de pê bihesin. Êdî aliyê beramber jî şiyar bibû. Teqez dixwest min girê bide. Digot; "Madem tu di zewac û hestên xwe de jidilî, nexwe biselmîne. Selmandin jî teslîmgirtin bû. Hûn teslîmgirtina di nava malbata Kurd de dizanin. Dema jinek radestî zilam, an jî zilam radestî jinekê dibe, weke sermaye ne, hevdu radikin. Ya beramberî me rêbertiyek serdestî baş dizaniya, firsend ne didaku serbixwe bimînim. Di wateya teqez de girêdanbûn ferz dikir.

Li gorî we siyaset û zewac hêsan çêbûne. Vê jî bêjim, ceribandina me jiyan kirî di rastiyê de ne zewac bû, di bin navê zewacê de şerek bêhempa ya bi Komara Tirk re bû. Ez behsa niyetên xirab û sîxurên bi zanebûn ketîn nava me nakim. Dibe ku aliyê beramberî me wisa bû. Lê wê zêdetir digot; "Ez rêberekim, tu jî gundiyekî." Li Kurdistanê mijara zewacê ji têkîliyek civakî wêdetir, diyardeyek siyasî ye. Mirov di van çeperan de teslîm tên girtin û teslîmkirin. Ger teslîmê vê saziyê bibûma, di PKK'ê de tiştek bi navê siyasetê ne dihişt. Hûn ê bêjin hest hebûn. Deka bihizirin. Bi Kurdan re nexweşiyek bêmirêziyê heye. Girêdana jin bi zilam, a zilam jî bi jinê ve li ser dilketinên çavkor hatine rûniştandin. Ger em vê mijarê çareser nekin, em nikarin polîtîkayê bikin. Ger em nekarin we li hember vê pirsgirêkê bikin weke hesin, hûn nikarin ti karî bikin. Ne şerme, min jî xwe vekir. Ger rêzgirtinek we hebe ji xwe re dersan derbixin.

Mijara jinê ji we re vedikim. Hinek hevalên me dibêjin ku, dixwazin bizewicin. Ev mijar weke hûn dizihirin nehêsane. Bi rastî jî dixwazim qet nebe kêmekî li dilê we bixim, darbe li bendewariyên we bidim, daku wisa bi alîkarî bidim derbaskirin. Em dixwazin ji çîroka Kurd a namûsê –an jî xala bênamûsiya herî mezin- we weke binamûs derbixin. Di wê sala dijwar de ez di Tîrmeha sala 1979'an de derbasî vir bûm. Ji ber ku daneyên derketîn holê ji bo min dan hesandin ku pêwîste bawerî bi kesî neyînim, min jî agahî ne da. Lê bê ku vê bikim xalek takekesî min

ev kir û polîtîk nêz bûm. Min hestên xwe zêde veşartin. Me bang kir daku bê vê qadê. Me şand Ewrûpa. Me çar-pênc salan bi gelek ceribandin û ezmûnan re derbas kir. Di Kongreya 2. de bû xalek bingehîn a provakasyonê. Seriyek wê, seriyê din jî ketiyê Baqî dimeşand. Her wiha provakatorên Semîr û Dawut jî hebûn. Min wê demê got; “Du seriyên xeternak dixwazin partiyê parçe bikin.” Min di nameyan de jî ev gotibû. Di kongreya 2. de yek ji çepê ve yek ji rastê ve dixwiya. Lê di astek pir dijwar de xîtabî hev dikirin. Baqî digot; “Ez birayê Heqî me”, yê din jî digot; “Ma ez çime?” Herduyan jî dixwest kongreyê bêxêr û bêkar bihêlin û pêngava vegera welat a di sala 1982’an de pêk were vale derbixin. Jixwe Semîr jî digot; “Em ê yek kesî jî neşînin Colem êrgê.”

Hûn jî dizanin wê demê dixwestin zindanan jî tine bikin. Sala 1982’an, pêvajoya îmhayê bû. Di Tebaxê de kongre bi encam bû. Di Îlonê de şahadet hatin jiyîn. Hêj derbasbûna welat çênebibû. Li Ewrûpayê xebatek provakasyonê dihat pêşxistin. Em jî bi sebrek mezin tevgeriyan. Dema em ber bi sala 1986’an ve hatin, em bi heman çîrokê re rûbirû man. Dîsa çîroka jinê bû. Ew çek êdî cara dawî bû dihat bikaranîn. Di rojnameyên burjuva yên Tirk de nûçeyên weke “zilamên XY APO kuştin” derdiketin û bi rastî jî hewldanek wisa hebû. Tasfiyekarî xwe zêde ferz dikir. Têkîliya jinê zêde bikar danîn, dixistin hêcet û wisa heta komployê meşandin. Hûn dikarin di derbarê sala 1986’an de ji belgeyên lêpirsîn û darizandinan lêkolîn bikin. Di sala 1988’an de jî firsendên xwe yên dawî lîstin. Ya rastî me ew derxistin holê, zelal kirin û jixwe revîn.

Encama ku pêwîste ji vir bê derxistin heye. Nexwe gelek têkîliyên civakî yên pir paqij dixwiyên, di rastiyê de têkîliyek şerê taybet a objektîf an jî sûbjektîf û têkîliyek Komara Tirke. Zilam her tiştê xwe ji bo valederxistina Kongreya 1., 2. ve 3. û elbet pêvajoyên pey wan re feda kiriye. Ger me gavek şaş bavêta, dê zilam jî encam girtiba. Qaşo hinek tengezarî û acizbûnên hinek

hevalên me yên di derbarê zewacê de hene! Wê demê me çawa 10 salan şerek dijwar li derdora vê saziyê da meşandin? Vê jî bêjim, ger hûn weke sermayekê nagirin dest, eleqederbûna bi jinekê re fedekariyek mezine. Hûn wisa dihesibînin ku, têkîliyên hezkirin û hestan ên di navbera jin û zilam de tiştek xweserî ye pêş dikeve. Na! Encama ku hûn ê ji vir derbixin, kar wisa hêsan nameşin. Dibe ku we di filmên Tirkan de çawa evîndar dibin dîtibe. Dibe ku we rêze filmên televîzyonan temaşe kiribin, hinek romanên li ser evînê xwendibe û di van mijaran tevan de bi mafdarî hinek bendewariyên we hebin. Heta dibe ku evîna Kurd jî dilê we şewitandibe. Hemû jî asayî, guncav û mirovî ne. Bes li kêleka vê çîroka tinebûna Kurd heye. We herî dawî li Başûrê Kurdistanê dît, tam qiyametek sor bû. Rojê hezar zarokên pitik dimiriyan. Girêdana têkîliya jinê ya bi siyasetê re pir şênbere. Dibe ku hûn bêjin; “Ma mirov evqasî bi ser zewaca pêşmergeyekê de diçe?” Ger hûn hinekê siyasî bin, hêza we hebe bûyeran jî siyasî bigirin dest, hûn ê dahûrînê hinek din berfireh bikin. Ger zilamê Kurd pir ketî be û hêza şerkirinê winda kiribe û di heman demê de ji bo jina Kurd jî heman tişt bên gotin, rastiya wê di vir de ye.

Di nava we de kesên zewicî, evîndar û gelekî hez dikin hene. Bila ev hevalên me rabin baxivin. Dikarin lêkolîn bikin bêka van têkîliyan ew çiqasî bêxêr kirine. Ji ber ku şoreşger di çareserkirina pirsgirêkên xwe de bihêzin, bê ku veşêrin gotinên xwe dikin. Divê hevala X... jî bikare hestên xwe pir vekirî û wêrek rave bike. Ger di vê bûyerê de aliyê têkçûyî ez bûma, ne ev civata hevalan xoşewîstî yan jî ev PKK, bi hemû kêm û kurtiyên xwe ve ev berxwedanî dima, ne jî bi rastî jî me dikariya li ser lingê xwe bisekiniyan. Dibe ku em weke kesên rûxiyayî derketan holê. Pir mezin nêzî vê têkîliyê bûm. Min hemû hest û fikrên xwe navtêdan. Min ji xwe re got; “Fêm bike, sebir bike, teslîm nebe, siyasî be, di bin bandora hestiyarî de neperçiqe, tehemûl bike!” Belê, parolayên ku min hêjayî xwe dîtin ev bûn. Min şaşiyek

weke ger ev nebin, tiştek din dibe jî nekir. Encama ku min derxistî, netewî, civakî û mirovî bû. Jixwe ya herî girîng jî di vir de ye.

Ger mirov ji bûyerekê ders derbixe, wê tu derbixî holê ku aqilmendî. Yek ji pêngavên herî girîng min kir jî wisa bû. Hêj di wê demê de jî hewldanên min ên çewt çênebûn. Min negot, bi kuştin û lêdanê bûme rêber, navê min heye û xwe radestî têkîliyên hestiyar ên erzan nekir, bûyer bi hemû kûraniya wê ve girt dest. Dizanim ku, tişta dixwestin di kesayeta min de tine bikin, siyaseta rizgariyê bû. Li hemberî min belayek dihat sazûmankirin. Nexwe ez ê jî bi ser vê saziyê de biçûma. Dahûrînên malbatê yên min pêşxistîn jî wisa çêbûn. Elbet sedema vê bi temamî jî bi vê ve girê nadim, çavdêriyên min ên din jî hebûn. Yek ji çavdêriyên min ên herî mezin jî, lêkolînkirina zilamê Kurd bû. Dema bi simbêlên xwe dilîst, min digot ev aware çi dike, egîdiya çiye, zilamtiya çiye nîşa me dide. Ev çavdêriya min ji zû ve hebû. Min tinebûn û dilxweşiya jina Kurd jî dît. Ev jî pir dijwar bandor li min dikir.

Hûn nikarin zaroktiya xwe jî şîrove bikin. Dema em zarok bûn, bi keçan re şêwazek me ya hevaltiyê hebû. Dema ew hevaltî dihat derbaskirin, hêjî tê bîra min, gelekî tengav dibûm. Lîstok hebûn, lîstokên zarokên biçûk. Teqez min dixwest wê hevala keç re bilîzim. Piştî ku em hinekê mezin bûn vê pergala civakî ew derfeta lîstokê jî ji destê me derxist. Nizanim ew şêweya lîstok lîstinê dê heta kur biçûya, lê pêwîst bû em bilîzin.

Îslamê ji bo jinê digot; “Îblîse, nêz nebin.” Ev jî em didan hizirandin. Min ji meleyên gund dipirsî; “Gelo gunehe ku mirov ji dûr ve li jinên ku di dawetê de direqisin binêre?” Ger gotiba, “gunehe”, ez ê ji wir bireviyam. Mele dikeniya, digot; “Tiştek nabe.” Meleyê gund ê herî Misilman bû û wî bi xwe jî li wan temaşe dikir. Min ji nêzîkbûnên mele hê girt û min di dawetê de li jinên direqisîn temaşe kir.

Van tevan ji bo vê dibêjim: Ne tenê weke kesayetek siyasî, beriya niha jî li hember van baldar bûm. Bi qasî xwe dinasim hemû mijarên xwe yên baldarbûm pir şiyar dinirxand û heta hinek encam jî digirt. Dema hewce dikir weke misilmanekî, dema hewce jî dikir weke dildarek azadiyê yê mezin nêz dibûm. Min hêj wê demê dît ku zilam jî, zilamê sexte ye. Hem jî min ji simbilê wî nas kir. Di encamê de hêjî bi vî karî ve mijûl dibim. Çi ji hêla di nêzîkbûnên we tevan de pîvanekê ava bikim, çi jî ji borewşên girîng we dîtine û di raporên xwe de bi min re parve kirine re bibim bersiv, van xalan dibêjim. Ger hevalên me yên ji zindanê hatîn bi vî halê xwe ve bi navê partiyê tevbigeriyan û hinekê jî berpirsyariya wan hebûya, ji ber van têkîliyên wan dibiya ku, bi partiyê re di nava şerekê de bûna. Ger ev ezmûna min jî ya mezin nebûya, hûn ê bi pevçûnekê re rûbirû biman. Wek hûn jî dibînin, bûyer ne hêsanin û em jî PKK'ê hêsan nameşînin. Ya rastî çareseriyek jî pêş dikeve. Pêwîste hûn dahûrînan dûbare bixwînin û hîn zêdetir baldar nêzî van xalan bibin. Em ne xerîbê van mijarane. Li vir bi qasî di civaka Kurd û civakên Rojhilata Navîn de nîne mercên wekheviyê, bi qasî misqalekê jî siya kevneşopoyan nîne, hûn weke keç û mêrxas di vê rewşê de dijîn. Ev bi serê xwe encama hewldanek mezine. Diyare dixwazin li vir çareseriyekê ava bikin. Bi qasî di vî karî de mantiq heye, ewqas jî dil heye. Min aliyên ku çavkaniya xwe ji kesayeta min digire, pir vekirî vegot. Em nikarin li vir nêzîkbûnek înkarê ji pêwendiyên civakî yan jî pêwendiyên civakî tine dihesibînê re raber bikin. Tişta di bîra min de ye, ya beramberî min bi qasî zaroktiya min tê bîra min û herî zêde jî ji xwe re esas girtî hêmana lîstokê ye. Dîrokek dirêj a helwestên min di derbarê mijara jinê de heye. Lê min ti carî xwe winda nekir.

Ger em di civaka me ya Kurd de bi çîroka ketinek hezarî salî û tinebûna malbata Kurd re rûbirû ne, em ê zêde bihizirin. Misoger em li ser esasê pêdiviyek civakî nêz nebin. Hevalekê anî

bîra me; kesê provakator, li Ewrûpayê di telefonê de ji hevalekê dipirse; “Ma te hevjîna xwe jî bi xwe re aniye?” Dema bersiva “na” digire, dibêje; “Elbet ewder Ewrûpa ye, ma hewce nake tu hevjîna xwe bigirî cem xwe.” Vêca nêzîkbûna wî ya ji pirsgirêkê re binêrin. Ango dibêje; “Li Ewrûpayê her cure jin hene, elbet tu pêwîstî nabînî hevjîna xwe bibî!” Nêrîna zilam ji bo hevala X... di nirxandinek wisa de bese! Tenê hevokek têrê dike. Ma evîna zindanê wisa ye? Ma ev hezkirine? Ev ne lîberalîzme jî –em vê peyvê jî qirêj nekin, ji ber ku têgeha lîberte “azadiye”- mane bi hestan lîstine? Li ser hevalê me yê herî hêja ev feraset hatiye ferzkirin. Em xwe bi erdê re bikin yek jî, em evqasî ketî nabin. Min beriya niha ji bo çareseriyê mînakek da we. Kesên vê pêdiviya xwe wisa dihizirin, li welat bostek cîh vekin, hingê bi qasî hûn dikarin evînê bijîn. Ev wisa li Ewrûpa nabe, lê li vir jî nabe. Bostek cihê ku xizmetê ji azadiya we re bike vekin, hingê hûn dikarin evînên herî mezin bijîn. Ev şêwaza herî raste.

Evqas keç û xort tev xwedî vîna azadin. Hinekê di derbarê pêwendiyên di navbera we de weke normek bingehîn dihizirim. Bila weke teslîm girtin û teslîmbûnê nebe. Bila neyê gotin, hezkiriyek min hebû, ger bimîne ez nikarim çalekiyê pêş bixim. Pêwîste hûn nebêjin pirsgirêka min a malbatê heye, serê min gêj dibe, di bûhranê de me. Ger hûn van pîvanan esas bigirin, kes nikare li pêş karên ku hûn bikin bibe asteng. Şertê me jî wisa ye. Ev ne xwestekek bêmafî ye. Me hemû jinên Kurdistanê rakirin serhildanê. Cizîr, Nisêbîn, Amed û her der şahidê vê ye. Jin bi wêrekiyek mezin dimeşe. Herî zêde li Cizîr û Nisêbînê hukmên feodalî tên meşandin. Lê belê mînakên herî bihêz jî ji van deran derdikevin. Vekirî bêjim, hezkirin êdî dikare bi Cizîr û Nisêbînê ve bê girêdan. Ji ber li wan deran di berxwedaniyê de xwe selmandin, li wan deran ji bo azadiyê raperîn, li wan deran nêvengek ji bo hezkirinê vekirî heye. Bes divê em qirêj nekin û cardin feodalîzmê ferz nekin. Jin niha bi me ve pir girêdayî ne,

dixwazin bi Rêbertiyê re bimeşin. Ez neçarim ku erkên xwe yên di mijarê de pêk bînim. Nêzî sih hevalên keç ên ciwan di vê rêyê de şehîd ketin. Tiştek wisa di dîroka gelên Rojhilata Navîn de nîne. Hêj me pêwîstiya bîranînên wan bicîh ne anîne. Şahadeta keça 15-20 salî ya li dijî şerê taybet, pir girînge. Yeqîn dikim dê hinekê hestên we pêş bikevin, hûn ê hewl bidin hinekê wan fêm bikin û di çend mijaran de binirxînin. Jin hêjî baskê meşê yê herî girîngin. Niha tişta me eleqeder dike ev xale û em ê li ser vê bihizirin.

Em ê li ser vî bingehî rê ji hezkirinê re vekin. Ma em dikarin kesê ku direve û çep û rast davêje hez bikin? Na! Çi hevjîna me ya berê dibe, çi hezkiriya me dibe, kesê ku wisa bike dê winda bike. Kesên ku ji bo azadiyê serî hildidin tên hezkirin. Min gotinek wisa jî bikar anîbû, “Di rastiyê de Kurd nayê hezkirin!” Ya dibêjim zêde ne fişale. Rastiye. Têkîliyek ku evqasî serdestî di navê de heyî, ne hezkirine. Dilketinên we çêbûne, xerîzeyên we rabûne, ji vê re nebêjin hezkirine. Dilketinên min jî yên wisa hebûn, lê baş dizanim ku min hez nekir. Ji rabûna xerîzeyan re nebêjin têkîliya civakî. Ev zirave, lê nakokî ye. Di nava refên me de xerîzeyên hinekan radibe, ji bo vê jî azadiyê dixwazin. Ma azadiya xerîzeyan dibe, mirov ber bi heywantî ve dibe. Ev tiştek cuda ye, hezkirina azadî û ew bilindkirin jî tiştek cuda ye. Pêwîste misoger em vê cewaziyê bizanin. Ger ev şitil neyê xepartin, têkîliyên hezkirinê yên hûn di xewnên xwe de û romanan de jî nebînin zemîna xwe çêdike û bihêz dibe. Ev jî misoger bi şerê şoreşgerî ve eleqedere.

Ez bi gelek hevalên keç ve eleqeder bûm. Keça ku me şandî Cizîrê jî, demek dirêj li cem me mabû. Xwendin û nivîsandina vê keçê jî nebû. Lê bi rastî jî zanî bibe kesek welatparêz. Bi Rêbertiyê ve hat girêdan, bi welatparêziyê ve hat girêdan. Bi gelê Cizîrê ve hat girêdan. Biçin ji gelê Cizîrê bipirsin, hûn ê bibînin ku ew jî bi wê ve hatine girêdan. Ew yek ji

rastiyên bingehîn a Cizîr, kirî Cizîre. Niha jî jina li Cizîrê li pêşe. Ev jî şêwazek pêwendiyê ye, lê şêwazek pêwendiya ku bi hewldanên mezin derketî holê ye. Dilek mezin û hewldanek mezin dixwaze ku mirov keçekê bişîne Cizîrê. Min ev pir baş dît, ji bo hezkirin pêş bikeve, Kurdistan hewce ye, ji bo vê jî jina Kurd a serî hildayî hewce ye. Ji bo vê jî xizmet û hewldan hewce ye. Wê tu bi sedan keç û jin re xizmetê bikî, wan rakî serhildanê, daku tu hez bikî û bî hezkirin. Ev destpêkirinek biçûke, lê çareseriyek şoreşgerî jî wisa ye.

Ravekirina azweriyên zilamê Kurd, rizgarbûna malbata Kurd, ancex wisa gengaze. Em hezar carî hizirîn, yek pêk anî. Çareserî di berxwedanê de ye. Lê hêjî milîtanên me pratîkên ku wan jî tine dike dimeşînin. Di bûyera li Cudî ya dawî de, me şeş heval şehîd dan. Hemû jî çavkaniya xwe ji pratîkekê digirin. Li Qilebanê jî 12 şehîdên me hene. Qaşo fermandar di heftiyekê de çend caran diçe serdana malbata xwe. Ev jî dibe rêbaza têkçûnê. Nabe ku bêje, hevjîna mine, ma ez ê qet neçim. Fermandar nikarin wisa biçin, heta gerîla jî nikarin wisa biçin. Ger biçe dê encam jî wisa be. Em jî destê xwe dirêj dikin, lê encam çiqas diguhere? Ev du salin Cizîr li ser linga ye. Hêz dide hemû Botanê. Hem jî bi hemû jinên xwe ve. Kesên ku xwe li ser vî zemînî jî ferz dikin û hezar carî dixwazin paşve bikişînin jî hene. Jinek bi hemû hunera xwe ya jinwarî bikar tîne û destdirêjî şervanekî dike û dixwaze hemû Cizîrê paşve bikişîne. Qaşo têkîliyek asayî ya civakî ye. Hûn jî dibînin şerek dijwar heye. Em di refên gerîla de, li zindanan û vir nirxan ancex dikarin bi şer dest bixin. Aliyê beramber jî tenê dikare şer ji me qut bike. nêzîkbûnên xeta navîn û lîberal nayên pejirandin. Ger hûn şer bikin dikarin rêhevalan qezenc bikin, jina azadbûyî bidest bixin. Qanunek din a PKK'ê pir girîng wisa ye. Rê ji pêwendiyên erzan re nîne. Hûn jî dibînin, tenê ne siyasî, tam pêwendiyek şer heye.

Hûn ê niha bêjin, te pêwendiya ku pêwîste herî zirav û narîn bijî têkil xwînê kiriye! Ez jî dibêjim, evder Kurdistane. Çi xirabiyên di bin navê vê têkîliyê de ne hatîn kirin, kuştin û ketîbûn nemaye! Ji bo vê şer hewce ye, di têkîliyê de şer esase. Behsa pêwediyên civakî û rêhevaltî dikin, bes şerek mirin û mayînê heye. Deka lêkolîn bikin, rewşa gelek pêwendiyan wisa ye. Madem Kurd her tiştê xwe di vir de winda dike, wê demê em ê jî di vir de şer bikin û her tiştî bidest bixin. Evîndariyên ku hûn dihizirin, zewacên ku hûn dihizirin pêk nayên û yeqîn dikim dê piraniya wan jî xirab bibe. Em xortan di vê xalê de hişyar dikin. Ger îro jin li cem me ne, sedema xwe heye. Hûn bi rêbazên kevin li gorî xwe girêdayî jinê ne. Yek ji wan jî di bin ala azadiyê ya me rakirî de tenezilî we nake û dê tifî rûyê we bikin. Şiyar bin, jin ji cem we direvin. Elbet min got bila ji cem we birevin û ger em niha fermanê bidin dê nîv bi nîv jin birevin. Jin zilam tengav dike, lewma niha zilam hêdî hêdî tevlî vîna partiyê dibe. Gelek zilamên zewicî dinasim. Bes girêdana me bi jina li malê re daye avakirin, wê ji rewşa zerardayînê rizgar dike. Vê gefê dibîne, ger ew bi partî bilîze, dê jin jî bi wî bilîze! Lewma neçare ku jin bi me ve girêdayî bin. Ji ber ku girêdana bi jinê ve, di şerê me yê rizgarî de veşartiye.

Di vê mijarê de çareseriya PKK’ê ji çareseriyek ji rêzê ye. Ez hewldana xwe ya di vê mijarê de, weke hewldanek milîtanî dinirxînim. Weke nêzîkbûnek nebî jî diyar nakim. Hewl didim pirsgirêkê li ser bingeha zanistî bigirim dest. Di vê mijarê de ji nêzîkbûnek siyasî raberkirin, di esasê têkîliyê de siyaset bicîhkirin û di nava partiyê de jî rêhevaltî dana rûniştandin zêdetir ti hilbijartinek din nîne. Bi rastî jî hest di asta duyem-sêyem de cîh digirin. Divê hûn vê mezinbûnê diyar bikin. Armanca me ne ew e ku, wê pêwendiya civakî ya pêwîste hûn di wateya kes de alîkar bin asteng bikin. Ya girîng bi rastî jî berdewamkirina şerekî ye. Ez nirxek mezin didim yekbûna jin û zilam a xizmetê ji şer re

dike. Di vê mijarê de ne tenê ji bo şerê ku li dijî dijmin dimeşîne, di heman dem ê de li dijî paşverûtiyên hezar salî jî di navbera xwe de şer bikin û encam bigirin. Hûn jin, ne dikarin di Rêbertiya PKK'ê û nexasim milîtantiya PKK'ê de bi fêlbaziyên xwe zilamtiya ku bixapînin heye û zilam, ne jî hûn dikarin bi rêbazên zilamtiya kevnar ve jin peyda bikin. Ev çîrok di PKK'ê de qediya. Êdî egîdî hewce dike. Ger hûn welat neparêzin, ne jin heye, ne jî zilam. Ji bo serkeftina welat, serkeftina şer pêwîste. Ger hûn şer ser nexin, dê hemû jî tine bibin. Şer û têkîliya ku şer ser bixe bidestxistin, çarenûsek li ser eniya we hatî nivîsandine.

Di vê qonaxê de dîrok ji bo me vê dibêje; weke keç û xort, ger hûn bi pêwendiyek şer, pêwendiyek rêxistinî ve bi lehengî şer ser nexin, gerîla û şerê gel ava nekin û bidest nexin, welat nîne, ji bo welat jî nîne, hêlîn jî tine ye. Çûk jî her sal li cihên cuda hêlînên xwe çêdikin. Hûn ê li kur çêkin? Ji bo vê welat, ji bo welat şer, ji bo şer rêxistin, ji bo rêxistin jî milîtantiya hevalbendî hewce dike. Divê em xwe ne xapînin.

Di van têkîliyan de zexta giran ku şerê derûnî yê takekesî de tê meşandin û hezar rêyên ku hevdu dixapînin û direvin hene. Sedî heştî sedema bûhranê wisa ye. Dixwaze vekişe eniya paş. Ji ber malbatê xwe tevlî şer nake. Bi vê mebestê, hêja dibînim ku nirxandinên dayîkekê ji bo lawê xwe kirî ji we re vebêjim. Dayîkek şehîdek ji berxwedaniya Erxanî, li ser gora lawê xwe hine çêdike û tilîlî dikişîne. Dibêje; "Ez lawê xwe dizewicînim." Dibeje ku lawê xwe bi Kurdistanê re dizewicîne. Seknek pir watedare û di nêzîkbûna vê dayîkê de bi rastî jî hêza çareseriyek pir mezin heye. Yek xala ku xemgîn dibe heye, ew jî dema lawê wê çûye xatir jê ne xwestiye. Lê ji aliyê din ve jî lawê xwe wisa bi Kurdistanê re dizewicîne. Divê em ji vê dayîkê pir tiştan fêr bibin.

Dema van tevan vedibêjim, dixwazim çareseriya mezin a di nava PKK'ê de, hêza pêwendiya mezin a di nava PKK'ê de û

milîtantiya mezin a di nava PKK'ê de bibîr bînim. Misoger dê ev têkoşîna me bibe encama ku herî zêde bê hezkirin. Hezkirin, bi azadiya mezin ve girêdayî ye. Azadiya mezin jî, bi şerê mezin ve girêdayî ye. Sedema ku em evqasî hesasin, ji borê ji hezkirina mezin re vekine. Ji bo mirov vê di nava PKK'ê de nebîne divê mirov kor be. Ger neyê dîtin çareserî di PKK'ê de wisa pêş dikeve, wê demê dil vala ne. Rêya yekemîn û yekane ya hêzbûn û hezkirinê wisa ye. Ji bilî vê hezkirin miriye. Ji bilî vê her tiştê bi navê hezkirinê tê kirin kirêtî ye. Lewra, di rêya çûna hezkirina mezin de, me firsendên mezin bidest xistine. Ev jî firsendek bêhempa ye. Weke keç û xortên gel, piştî ku me şerê azadiyê anî rewşa şêweya jiyanek şênber, yeqîn dikim kes bi qasî we dilşad jî nîne.

Yek ji dilşadiyên herî mezin min dide jiyîn jî ev e. Dibe em di zarokatiya xwe de bi keçan re ne lîstin. Lê niha bi keçan re şerek mezin dimeşînim. Ger hûn dilşadiya vê najîn, bersiva ku hewce dike nadin, nexwe hûn dîlê kevneşopiya kevnar û paşverû ne. Dê di vê mijarê de ya winda bike, ev paşverûtî be. Dema careke din çareseriya di nava PKK'ê de dinirxînim yeqîn dikim, di rêya rast a hezkirina ku mafê me de, me tişta herî rast pêk aniye. Ji warê ku herî zêde ji hezkirinê bê par maye, rêya ber bi hezkirina mezin ve çûnê vedikim. Dibe ku zehmet be. Lê di wexta berbanga mirovahiyê de, hezkirina eslê mirov, li ser axên ku yekemîn hestên jin û zilam jiyan kiriye, bi rastî jî hîn azadtir, hîn bi zanebûn, dibe ku di ti rastiya civakî û netewî ya cîhanê de çênebûye. Azadiya pêwendiyên jin û zilam radigre, hem li dijî dijmin, hem jî li hember hevdu ji bo derbaskirina bê kesayetiya heyî, em ê bi encamek ku şer dike û di encama vî şerî de tişta bi qasî dîroka mirovahî kevin winda kirî, cardin bidest bixin. Ger girêdanek bi şehîdên PKK'ê û nexasim şehîdên keç û xortên ciwan ve hebe, ancex dema em bikarin li welatek wisa, ji bo ji nû ve şînbûna mirovahî bi şerkirinê dikarin heta dawî bi wan ve

girêdayî bin û vê jî biselmînin. Di vê qonaxê de, tevî hemû nebesiyên me, asta çareseriya em gihiştinê wisa ye. Yeqîn dikim dê hemû endamên partiyê ji van pirsgirêkên wisa yên weke kesî tê dîtin re, nêzîkbûnek rast a zanistî raber bikin, a herî girîng jî rêhevaltiya jin û zilam bi ked û hewldanek mezin ve ava bikin. Dê ti carî rê nedin pêwendiyên paşerojê yên durû û bûne meta. Dê pir durist û cewherî bimîne, ger hewce kir dê bizane lewaziya jinê jî rastiyeke û li gorî vê alîkariya xwe ya hevalbendî jî kêm neke. Bi zanebûna cîhana ku dixwazin ava bikin li ser vî bingehî dibe, çoşek mezin tevbigerin, weke di şoreşa mezin de dibe, her çendî dilketinên mezin nejîn jî, dê bizanin bibin şervanên dilketinên mezin. Dê vê jî li gorî xwe mezin bibîne, şer bike û teqez di encamê de şer ser bixin.

***Tîrmeh 1991***

### *Wê Şoreşa Kurdistanê Girêdayî Serweriya Hevbeş A Jin û Zilam Pêş Bikeve*

Kovarek tê nasîn a xîtabî jinên cîhanê yên ewrûpa dike, ji bo bi me re li ser jinê hevpeyvînê bike li vire. Em ê jî hewl bidin peyamên hewce bidin, rastî û nêrînên xwe yên di vê mijarê de diyar bikin.

Hewce dike mijar ji nû ve bê destgirtin. Qada herî zêde divê mirov baldar be û ez jî ji vê re dibêjim qada mayînkirî. Qadek mayinkirî, stirî û her kesî xwe di nav de herimandî! Qada têkîliyên her kesî her tiştê xwe winda kirî! Li gorî min hûn şer di vê qada têkîliyan de winda dikin. Kesên li van têkîliyan biser naxin, nikarin li cihek din şer ser bixin. Lewma em evqasî li ser radiwestin. Giraniya dahûrînan ji vê mijarê re hatiye veqetandin. Ji bohinek tişt derbikevin holê, dihizirim ku cuda weke dersekê jî bidim. Qada têkîliyên herî birîndar, qada têkîliyên herî mijûl dike; qada têkîliyên girêdan û îxanetên wê jî mezin! Em hewl didin vê qadê bigirin dest û serî bigirin. Em herî zêde jî li ser xala çiqas tê fêmkirin û rastiya vê esas tê girtin radiwestin.

Bi rastî jî, yan jina azad an jî di nava wan de tinebûna jiyanê! Yan têkîliyên azad û kesayeta jina azad an jî mirin! Tiştek din jî ji vê qadê hêvî nekin. Divê mirov vê qadê di serî de ji nû ve saz bike. Mijara têkîliyên jin û zilam, têkîliya koletiyek mezine. Xwe terkî mirinê kirine. Dema min jî xwest di vê mijarê de xwe bispêrim hinek têkîliyan, min dît ku çiqas xafilim. Weke gelek caran hatî gotin, jin weke mal û milk tê dîtin û dema tê pêşkêşkirin jî berdêla wê de hinek tişt tên xwestin. Divê hûn bizanin ev mal û milkek çawa ye û di berdêla wê de çi tê xwestin. Nirxê vê sermaya madî pir bilinde û ger hûn baldar nêz nebin hûn ê berdêla wê zêde biha bidin.

Bila qusurê nenêrin lê belê, ez ji nêzîkbûna ku jinê weke sermaye destnîşan dikin pir ditirsim. Qet em nebêjin dilketin û hezkirinên me ne û neyîn xapandin. Pêşkêş nekin û nedin pêşkêşkirin. Li pey daneyên vê qada mayinkirî de kevnareyên hezar salî, di bersiva metaya herî zirav de şibandina xwe, ango kolekirina wê heye.

Ez di derbarê vê qadê de şêweyek şerê xweser diceribînim. Têkîlî û nakokî pir berfirehin. Divê hûn di vê mijarê de baş perwerde bibînin. Di nava pergal û PKK'ê de têkîliyên paşverû yên heyî pir xeterin. Ez hinekê jî şoreşgeriya xwe ya di vê mijarê de deyndarê tevdîrên xwe me. Li hember vê di bersiva her têkîliya hatî pêşkêşkirin de, gavek din nêzî pergalê bûyîn û gavek din ji şoreşê dûrketin tê xwestin. Gavek din dûrbûna ji egîdî û berzbûnê ferz dike. Ez behsa têkîliyên heyî dikim. Em şûna vê dixwazin bigihin encamên berovajî yên bi nakok dike û dide şerkirin. Tişta em dixwazin ava bikin, têkîliyek şer a li hember azadî, şer, dijberiya pergalê, tevizî û tembeltiyê tam tehrîk dikeye. Hemû tiştên tên kirin nîqaş û şidandin, bi vî rengî ji hinek tiştan hesap pirsin û dayîn, venêrîna têkîliyê, çareserkirina dîrokê, çareserkirina têkîliya paşverû yên heyî û li şûna vê têkîliya azad, wekhevî, nîqaş û demokrasî bicîhkirine.

Belê ev mijarên girîngin. Bes hûn di van mijaran de pir lewazin û dixwazin vê lewaziyê jî hêsan bi radestbûna hev re derbas bikin. Ez jî ji bo radestî jinê nebim li ber xwe didim. Lê em nêvengê hinekê ji we re vekirî bihêlin, radestbûna di vê qadê de di wextek kin de têra windakirina radeya şerê me dike û zêde ye jî.

Ger hûn bal bidinê, di vê mijarê de di vesazkirina nêvenga navxweyî ya PKK'ê de li dijî teslîmiyetê şerek heye. Bila kesên di vê mijarê de têkîliyên wan ên pê ve hatine girêdan û dilketinên wan heyî aciz nebin. Em şer sazûman dikin. Li vir jin jî zilam jî di bin cilên leşkerî de ne. Ger hûn van cilan weke

xwepêşandanê nebînin, leşkerbûn bûyerek pir cidî ye. Gelo em dikarin bêjin li nav PKK'ê ji bo xwepêşandanê cilên leşkerî li ber jinan dikin? Na! Em li vir wekhev didin jiyîn. Naveroka van hîn berfirehtire û ancex bi şer tê bidestxistin. Şerek wisa heye. Dîsa jî dikarim van bêjim: misoger divê em şiyar û baldar bin, wate, girîngî û berfirehiya vî şerî her tim bihizirin. Kesayetên ku ji şer qut bûne, misoger dilketinên wan ji cewher qut bûne; em nêzîk nebin. Ger em vê bi ser bixin bizanin ku, em ê tevkariya herî mezin ji şoreşa cîhanê re bikin. Heta niha ti şoreş wisa nêzîk nebû. Hema hema di hemû şoreşan de em, jin kirina malê xwe dibînin. Yek ji şoreşên herî cidî jî, şoreşa dawî li berzbûna jinê aniye. Çalekiya yekemîn a ji pergala civaka komînal a seretayî ber bi pergala koletî herikînê de hatiye lidarxistin, jin kirina sermaye ye. Jinwarî di vê dîrokê de destpê kir. Di şoreşa nebiyê Îslamê Hz. Muhammed de li dijî koletiyê yek ji karên kirî ya sereke, di bin navê rizgarkirina jinê de li gorî xwe bi niyetek baş gelek jin bi tora zewacê û saziya cariyan ve girê daye. Jiyana Muhamed pir zindî ye û li gorî xwe jî şoreşe. Tiştên ku di bin navê rizgarkirina jinê de dike jî pê bawere. Di şoreşa feodal de, li gorî statûya jina ketî statûyek jina pêşveçûyî tê avakirin. Di şoreşên Fransa û Rûs de, hinek din azadbûn heye. Lê mixabin dîsa jî jin xemla şoreşa ye. Hinek deng û reng derdikevin, bes zêde ne bibandorin. Ev dîsa jî, şoreşên zilamên serdestin. PKK, van nêzîkbûnên şoreşî yên dîrokî bi qasî jê tê, dixwaze ji bûna serdestiya zilam derbixe. Ev girînge. Dibe ku zilam bihêz bin û vê hêza xwe ji dîrokê digirin. Lê belê, ya me jî weke şêwaza şoreşekê dawî li serdestiya zilam anîn, dij statû û nêzîkbûnên zilam derketin feraseta PKK'ê ye û mezinbûna feraseta azadiya PKK'ê ye. Em dibêjin bila şoreşa me ne şoreşek zilamê serdest be. Divê şoreşa me, şoreşek ku jin wekhev, azad, zana, bi vîn, bi kesayet beşdar dibe. Hêja ye ku şoreşa me di vê xisletê de pêş bikeve, ango weke ceribandinekê ji serdestiya zilam derbikeve,

derbasî serweriyek hevbeş a jin û zilam bibe. Ev jî pêwîstî bi serweriyek hevbeş, hewldan û têkîliyek hevbeş heye. Ev jî, derbaskirina statûya sedî salan a heyî û têkîliyane. Serweriya zilam a di şoreşên cîhanê de bi encamên wê yên kêlekê re, di kapîtalîzmê de jî, di sosyalîzmê de jî diyar dibe. Jixwe feodalîzm serdestiya zilame. Di vir de balkêş diyar dibe. Ger şoreşa me van tevan derbas bike, bi rastî jî wê bibe şoreşek aliyê wê yê azadîxwaz pir pêşketî. Belê, hûn ê şiyar nêzîk vê bibin. Şoreşa me, ne şoreşek zilamê serdeste. Şoreşek baldar nêzî serweriya jin û zilam a hevbeş dibe û di vê mijarê de hesase. Êdî divê hêza we têra vê bike. Gelek bar dide jin jî, zilam jî. Pêdiviya ji nû ve sazûmankirina têkîliyan derdixe holê. Formûl hatiye dayîn, pêkanîna wê jî karê we ye.

Ez jî di vê mijarê de bi qasî dibe li serweriya hevbeş digerim. Encama ku em evqas hewldan di ber kesayeta jinê de didin ku bigihijinê, serweriya hevbeşe. Em jinê dikin şirîka rêxistinbûn, artêşbûn û perwerdeyê. Em dibêjin her cihê ku em lê ne, divê nîv bi nîv a jinê be. Bes ev jî, karê xisleta kûr a şoreşa me jîndarkirinê ye. Divê hûn vê fêm bikin. Fêmkirin girînge. Lewra, bi têkîliyên heyî yên kevneşop ve nêzîkbûn, bi feraseta partî re pevçûne. Barên zilamê serdest, nêzîkbûnên li ser jinê serdest, ketîbûna jinê esas digire, bi rastiya PKK'ê re di pevçûnê de ye. Divê ji vir jî encamên girîng bên derxistin, neyên xapandin û bizanin ku dema hûn bên xapandin çawa bikevin rewşên pir xeternak. Êdî hûn ê ji vir û şûnde weke jin û zilam têkîliyên heyî li hemberî xwe nebînin. Ez li hember radiwestim. Di vê mijarê de şoreş li ser bingeha nûbûn û wekheviyê dewlemendkirin, mijara herî zêde bi hesasiyet li ser radiwestime. Yeqîn dikim û hewl didim bikim. Yeqîn nakim bi tiştek din ve mijûl dibim.

Em ê jina ku pêwîste bê pêkanîn derbixin holê. Bes, ev ne ew jina ku hûn hêvî dikin û li bendê ne. Di vê mijarê de şer heye. Diyare hûn ê di gelek mijaran de lihev bikevin, an jî pala xwe

bidin têkîliya pergalê ya heyî. Keç û xortên wisa zêdê ne. Di pêşxistina têkîliyên jinê de ji nû ve avabûn pir girînge. Ev, şoreşek cidî ye. Ger hûn hêsan bigirin dest, hûn ê xwe bixapînin. Ger hûn di nava PKK'ê de van nêzîkbûnan esas negirin, dê xeyalên we vala derbikevin û misoger lihev bikevin. Ev ne meseleyek jiyana civakî ye, meseleyek rêgez, meseleyek şerê siyasî ye. Em yeqîn dikin ku, ev ne têkîliyek civakî ye, têkîliyek siyasî ya li gorî meylên serdestan hatî sazkirine. Lewra, em ê jî li ser vî bingehî şerê siyasî bimeşînin. Rastiya PKK'ê ev e. Bihêzbûna zilam, serdestbûna wî, nayê wê wateyê ku dê di nava PKK'ê de jî wisa be. Di nava refên me de yek jin jî hebe, dê pitrast be ku di nêvenga têkîliyên wekhev û azad de ye. Ev ê di PKK'ê de esas bê girtin. Ne raste ku nêzîkbûnek weke bi tenê ye, bêhêze, tişta em dixwazin pê bidin kirin pêş bikeve. Di heman şêweyî de xanimek jî derbikeve bêje; "Divê ez vê derfeta xwe baş bikar bînim, xeml û şemala xwe baş çêkim û xwe bifiroşim", ew jî xwe pir dixapîne. Gelo hûn di ferqa vê pêşketina di nav PKK'ê de ne? Kî di ferqa vê de ye? Gelo hûn dijî sazûmankirinek li ser vî bingehî ne?

**K.:** Rêberê min, têkîliya ku îro di nava PKK'ê de tê pêşxistin ji hêla cîhanê ve jî mînake. Di vê mijarê de ji nêzîkbûnek xapînok zêdetir, em şopên nêzîkbûnên kevin dibînin.

**R.P.:** Lewaziya jinê ji lewaziya fîzîkî wêdetir, lewaziyek zanebûnê ye. Ji ber ev rewş têra xwe nayê dîtin, di têkîliyan de ev lewazî derdikeve holê. Gelo tu şêweya ku vedibêjim baş fêm dikî?

**K.:** Belê Rêberê min!

**R.P.:** Hûn jî weke hevalek ku pir serê xwe dêşînin, gelo hûn jî hinek tiştan dibînin?

**S.:** Serokê min, mijar pir vekiriye û tê fêmkirin. Ji destpêka waneya me ve pirsgirêka ne avakirina kesayeta rêxistinî

di rojevê de bû. Ya rastî weke jin ew kesayeta rêxistinî bê avakirin, ti pirsgirêk namîne.

**R.P.:** Kesayeta şerker!

**S.:** Kesayeta rêxistinî, di heman demê de kesayeta şerker û kesayeta siyasî ye.

**R.P.:** Gelo niyeta we ya bûna jinek wisa heye?

**S.:** Serokê min, jixwe hewldan û xwestek ji bo vê ye.

**R.P.:** Li gorî min divê bûna jinek wisa pêşî bê girtin. Hûn çêkerê çawa dibînin, gelo zilam li ser vê çêkerê serdeste?

**S.:** Serokê min, ango bergeh...

**R.P.:** Bes zilam li vê qadê giraniyê ava nake, lê wer yeqîn dikim dê li qadên din giraniyê çêke.

**S.:** Belê, nêvenga Akademiyê hinek din cuda ye. Ji ber hebûna Rêbertiya Partî...

**R.P.:** Ma ne navendek azade?

**S.:** Belê!

**R.P.:** Gelo tu hinekê razî yî?

**S.:** Belê! Têkîliyên xirab ku çav bikevin tine ne, lê feraset...

**R.P.:** Tê fêmkirin. Ne hizirin ku jixweber çêdibe. Ne jixwebere.

**S.:** Na, bi pêşketina vê têkoşînê û polîtîkaya me ve eleqedere.

**R.P.:** Bi şêwaza rêvebirinê ve eleqedere.

**S.:** Belê, bi şêwaza rêvebirinê ve eleqedere. Ev pir vekiriye: Heta ku jin li her qadên têkoşînê xwe xurt neke, dê her tim feraseta zilamê serdest xwe bide der. Jixwe ev, bi zilam re jî wisa ye. Ango bi qasî zilam jî demokrat û azad bû, dê nirxa vê bizane. Ango ev di heman demê de pirsgirêka zilame jî, ne tenê pirsgirêka jinê ye.

**R.P.:** Jixwe ew pir vekiriye. Ango di maneyekê de jin hatiye qedandin û êdî dora qedandina zilame.

**S.:** Avakirina hewldan û rêxistinek hevbeş a miqabilî hev, avakirina şerek hevbeş, hewldanek hevbeş; beramberî hev baweriyê jî ava dike.

**R.P.:** Xwe ji sextekariya hestan jî paqijkirin pir girînge, ne wisa?

**S.:** Piştî evqas pêvajo...

**R.P.:** Yeqîn dikim hûn tiştê ku dibêjim fêm dikin. Dibe niha baştir fêm bikin. Bes, ên din fêm dikin gelo? Ez di jiyana xwe de her tim dûrî tiştekê sekinîm, heta kerba min çêbû. Êdî dê yek ji we romana hestan binivisîne. Di têkîliyên Kurd de hest, rewşek herî giran a kerbê ava dike heye. Hestê dayîkê, hestê zarok, hestê jinê, bi kurtî hema bêje di hemû hestewariyan de wisa ye. Min ev her tim xeter dîtin û bi kerbek mezin nêzîk bûm. Yek jê têkîliyên herî zêde paşverû dibînim jî, zilamê ku ji bo vê têkîliyê li ser bingeha îxanetê hemû egîdiya xwe ber bi mirinê ve dibe. Vê hinekê jî hestewarî dihesim. Mane dibêjin ku serê wî girê bidin. Di wê qinyatê de me, girêdana zilam xefke û jixwe me paşê piştî em serwext bûn dît ku ev wisa ye. Ev vediguhere amûrek têrkirinê ya ku divê qet nebe. Ango ji bo derbaskirina lewaziyên dijwar ên keçek û mêrxasek dijîn, -jixwe girêdana van bi mêtîngeriyê ve heye-, rêyek wisa tê esasgirtin. Di vê mijarê de filmên Tirkan binavûdengin. Her tim bi çîrokên ku digihin miradê xwe ve bi encam dibin û jixwe şêwaza têkîliya serdest jî ev e.

**S.:** Jiyanê afirîner nake.

**R.P.:** Misoger dikuje. Hinekê jî tişta ez dikim fêm bikin. We got, jiyanê afirîner nake. Bi rastî jî dema hêj di bîst saliya xwe de dikişînin nav van têkîliyan, her tişt dimire. Evînê dikuje, hezkirinê dikuje û azadiyê dikuje. Êdî dikeve rewşa koleyekê de. Deka têkîliya gihayî mirada xwe binêrin. Di bîst-bîst û pênc saliya xwe de mirî ye. Li Kurdistanê gelek berhemên vê yên kêlekê hene. Min dixwest ku, di vê mijarê de kesek bikare romanekê binivisîne. Encamên van têkîliyan gelekî dikujin. Berî

her tiştî, dîktatoriya mêtîngeriya ku azweriya serdest li gorî xwe çareser kirî tê sepandin. Pergal çi ji zilam bike, ew jî li jinê dike. Her wiha dibêje; "Min çareser kir." Hûn jî bi destûr dana vê re xirabiya herî mezin li xwe dikin. Mêrxasek an jî keçek, hêj di pandez saliya xwe de dixwaze di cîhana xwe ya hest û fikir de bibe tapû. Lê rêbaza min jî, berovajî vê pêkanîne. Em girêdanên seriyan parçe parçe dikin. Dibe ku hûn li hember vî karî şaş dimînin û hestek ku li malê mane jî xwe bihesin. Bes yeqîn dikim dê zilam zêdetir li malê bimînin! Ev bi vê ve eleqedere; em dixwazin li hember xistina mirovên xwe bendê ava bikin. Bi şerek ku hişê zilamê Kurd bîne serê wî ve em hemû xapandin, sextekarî û xeyalên li vê qada têkîliyan dişkînin. Li cem me hemû hest, xeyal û ew hezkirin tev di vê têkîliyê de hatine fetisandin. Dilketinek biçûk ku mirov nikare jê re bêje hezkirine jî dijî û ew dilketin jî bi têkîliyek cînseltiyek çors ve dimire. Li gorî min jiyan piştî wê rawestiya ye.

Hevalek lêkolînvanek baş, divê vê hinekê bibîne û bikare diyar bike ku tişta dimire çawa dimire, kesek hêj nû ketiye panzdeh saliya xwe, bê ku dilketin veguhere hezkirinê, bigihe zanebûnê li ser bingeha girêdana serî çawa dimire.

Gelo di malbata Kurd de nêvengek hezkirin û rêzgirtinek mezin heye? Na! Jin malek qet ne teze ye, zilam jî camêrek yeknesake. Ecêb dimînim ku hûn çawa ji vê têkîliyê natirsin û bi rehetî dipejirînin.

Binêrin, dema ez jî hewl didim cîhana xwe saz bikim bi rastî jî di nava têkoşînek mezin de me. Min jî dikariya aresteyî van têkîliyan bibim, jixwe areste jî bûm. Bes ji bo min şerê herî zehmet derbaskirin bû. Min di dahûrînan de hinekê vekir. Hêjî hûn nikarin encam derbixin. Şerê ku ez herî zêde zehmet, diwestîne û heta xeter dibînim, ev şere. Hûn ne di ferqa vî şerî de ne. Metodên vî şerî, taktîkên taybet girêdayî vî şerî û kesayeta ev şer dixwaze pir girînge. Hêmana beramber, têkîliyek girtîbûna

hezarî salan li ser te ferz dike, ger xwe li gorî têkîliyên zilamê Kurd a ji koletiyê re vekirî sazûman bike, ev xefkek mezine û neketina vê xefkê jî ne karê her egîdî ye. Têkîlî yan bi serî tawandinek pir xirab ve encam dibe, yan jî vediguhere pevçûnekê û di demek kin de ber bi qetilbûnê ve dibe. Me wisa negirt dest. Lê mixabin hevalên milîtan ên herî baş jî, di demek kin de dixwestin bi cezayek pir giran ve bi ecnam bikin. Lê me bi şer çareser kir. Em van karan wisa hêsan nagirin dest. Wisa bi şêwaza bû û qediya li têkîliyan nanêrin. Em li ser bingeha siyasî têkîliyan digirin dest.

Encama ku ez gihiştimê ev e: Her çendî jê re bê gotin têkîliya civakî, malbatî û hestewarî ye, ya herî xeter têkîliya pergalê ya zagonî ye. Ev ê di dema pêş de baştir bê fêmkirin. Ez hêjî dixwazim mijarê li ser bingehek siyasî çareser bikim. Ne li ser bingeha hestewarî yan jî civakî. Ji ber ger li hember min cîhanek mezin, pergalek têkîliya jin û zilam a mezin heye û vê em tine kirine. Em kirine amûrek herî ketî ya mêtîngerî, têrkirin û kirêtiyê, dîsa jî li dijî şer nekim û di vê rêya Rêbertiyê de dimeşim, xirabiya herî mezin ez ê bikim. Ji bo şerê di vê mijarê de bi pergal, pêşketî, bihêz bikim û bin nekevin, hinek serbendan didim we. Dev ji jiyana erzan berdin. Wer dizanim ku, cîhanek we ya azweriyan heye û dem bi dem xwe dide der, lê diyare piraniya wan jî veşartî ye. Hevalek me wêjevan, bikare vê cîhana hestên milîtanên me yên veşartî bide der, dê pir baş bike. Heta li gorî min, gelek jî tevdîrên vê digirin. Tu çi dibêjî, rewşek wisa heye?

**C.:** Belê, yeqîn dikim berfireh heye!

**R.P.:** Gelo bihêze? Dibe ku min rêjeya wê baş texmîn nekiribe.

**C.:** Belê bihêze.

**R.P.:** Nexwe bihêze ne! Çawa?

**S.:** Serokê min, niha rewşek wisa heye; dilketinên cuda yên ku bi têkoşînê re yeksan nabin û bi dilketinên têkoşînê re yeksan nabin hene.

**R.P.:** Hene na!

**S.:** Ev her çendî ji hêla teorîk ve bi şêweya wekhevî û hezkirina jin û zilam tê bilêvkirin jî, bi giştî nabêjim, lê bi her kesî re heye. Ji ber asta me ya têkoşînê û asta me ya xwe gihandina xeta partî jî diyare.

**R.P.:** Di potansiyela vê xeteriyê de dem bi dem pirsa "divê em çawa bijîn?" jî giran dike. Ango bersiva me ya pratîkî divê em çawa bikin asteng dike û li gorî min divê rewşek wisa jî bê protestokirin. Lê mixabin berovajî vê yeqîn dikim hevalên min zêdetir min protesto dikin û dibêjim di vê mijarê de jî boykot heye.

**S.:** Ango, li naverastê pirsgirêkek hatî çareserkirin heye. Rêbertiya Partî her tim dixe rojevê. Yeqîn dikim li ti cihên cîhanê di vê mijarê de heta ziraviyan dahûrîn çênebûye.

**R.P.:** Lê, ji ber ez sazûmaniya wan dixetimînim min boykot dikin. Li gorî yek ji sedemên herî girîng ên tenêhiştina Rêbertiyê jî têkîliyên li vê qadê ne. Gelo ez şaşim? Deka em ji hinek hevalên din bipirsin. Kî serê xwe bi van têkîliyan dêşîne?

**Z.:** Serokê min, ez ê behsa bûyerekê bikim. Ji vir du heval weke erkdar şandibûn qadekê, lê çawa çûne karê destpêkê kirîn, zewicîne û revîne.

**R.P.:** Hene, ew mînak hene. Gelek mînakên wisa yên revê hene.

**Z.:** Ev bûyer dibe çîrok.

**R.P.:** Belê dibe. Ger pênûsên xurt ên wêjeyî hebûna dikariyan gelek daneyan derbixin.

**S.:** Bi gelemperî di nava me de, yên tên birevebirin li hember rêveberan bertekek ku ji binyata civakî ve tê û rêveber jî rêbazek nekêrhatî raber dike. Hêza rêveberiya Rêbertiya Partî, bi

her awayî çareserî û li dijî kevnare şêwaza şerek di astek herî bilind de ye. Ji ber li hember van hestan jî şerek tê meşandin, kesayeta kevin tê parçekirin û belavkirin. Lewma, dema kesayet durist nêzî xwe nabe, bertek û protesto pêş dikevin. Mirov dikare vê di mijara têkîliyan de wisa bigire dest.

**R.P.:** Protestokirin meylek xurte. Deka em di vê mijarê de çi bikin?

**S.:** Hinek tiştên em bikarin di vê mijarê de bikin hene Serokê min. Xala ku hevalan destnîşan kirî bi rastî jî girînge. Feraseta serdestiya zilam a di têkîliyên jin û zilam de heyî, ne ferasetek proletere. Heta ku jin xwe neyîne rewşa xwe rêvebirinê, dê di bin bandora feraseta zilamê birêve dibe de bimîne. Ev di têkîliya şoreşgerî de jî wisa ye. Divê em hem weke jin hem jî weke zilam, bikarin hêza rêvebirina şer, têkoşîn û jiyanê diyar bikin.

**R.P.:** Bes, ew aliyê wî karî yê siyasî û fermî ye. Weke din jî di bin vê de cîhanek civakî, hestewarî û çandî ku em nikarin înkar bikin heye.

**S.:** Di nava vê ferasetê de...

**R.P.:** Pirsgirêk tenê bi fermiyetê çareserkirin zehmete. Bes ew cîhan jî bi halê ku pergalê daye ve tenê kargeriyek ketîbûnê bicîh tîne. Bal bidinê, em niha hewl didin xerîzeyên ku ne siyasî ne biçewsînin. Jixwe di vê mijarê de pir bi ser min de hatin, - hûn dizanin hêjî bi ser min de tên- ya rastî dikariyan van bikin roman. Êrîşa 12'ê Îlonê, êrîşkariyek ne hêsan bû. Êrîşkariyek şerê taybet û malbatê bû. Li Mêrdînê qiyametek zewacên hêj negihiştîn panzdeh saliya xwe tê jiyîn. Ne ji ber ku Mêrdîn bû, li tevahî Kurdistanê ji bo nekevin nava têkîliyên şoreşê û bên astengkirin, hesabên wisa kirin, gotin; "Em serê vî girê bidin, berî bikeve bîst saliya xwe sê-pênc zarok jî çêbin, dê ev kar xilas bibe." Di wateyekê de ev jî rastiyeke. Ji ber asta gerîla û şer pir zêde dixe. 12'ê Îlonê ev tehrîk kir, pir bi bandor

sepand û hêviyek mezin bi vê saziya malbatê ve gire da. Di vir de tişta derdikeve holê bi şêweyek pir paşverû bikaranîna malbatê û hewldana bi zorê li ser piya girtinê.

**S.:** Serokê min, ez dixwazim mînakekê bidim.

**R.P.:** Belê...

**S.:** Em vê qadê mînak didin. Hebûna Rêbertiya Partî ya li vê qadê ferasetên şaş didahûrîne û asteng dike, di demek kin de bi rastî jî dixe nava xetekê de. Bes li qadên din di rêvebirin û nêzîkbûnên ji van têkîliyan de kêm û kurtî tên jiyîn. Binyatên nexweş beşdarî nav partî dibin, li wir xwe didin jiyîn. Hevalên ku tên behsa wan qadan dikin, bi şêweyek gelekî çewsîner heye.

**R.P.:** Belê, pir çorse.

**S.:** Ango ser û por tên rapêçan...

**R.P.:** Belê, zêde çewsînere. Lê belê, dema firsendê jî dibîne, reftarên herî ketî jî raber dike.

**S.:** Ev feraset dibe heta wir jî.

**R.P.:** Misoger dibe wir. Me ev pir vekirî di pratîka Botanê de dît. Li ber çav heta dawî axa ye, lê belê dema firsendê jî dibîne, xwesteka herî ketî jî ferz dike.

**S.:** Divê em şêwaza nêzîkbûn û têkîliya li vê qadê esas bigirin û derbasî qadên din bikin.

**R.P.:** Ev jî, bi şer dibe. Me gelek jin şandin çiyê. Lê em hîn dibin ku, hinek sezakirin çêbûne. Mînakek din; gundiyek reben, li gorî agahiyên dawî hatine otorîteya xwe bikar anîye keçek panzdeh salî bi gefan revandiye. Yeqîn dikim, hinek pereyan jî didize, qaşo malbatê jî hinekê dewlemend dike û dema rêxistin jî hesab dixwaze direve. Weke din jî gef dixwe dibêje; "Ger hûn bi ser min de werin, li cem min demance û narincok heye, ez dikarim biçim cem dijmin jî." Her wiha jixwe camêr zewicî ye. Ger em pêşî lê negirin, yek keç nikare bi tenduristî bijî. Camêr karbideste, jin ji xwe bêhêz û bê zanebûne. Dikarin xwe

bispêrin hêza rêxistinê û rewşên herî ketî bijîn, piştî wê jî dibin bela serî.

Tişta dixwazim bêjim ev e; ger ev kar rêbertiya xwe nebîne, bi rastî jî dê rewşên gelekî neyênî û trajîk derbikevin holê. Mantiqê têkîliyek feodal a pir çors sepandin çiqas xeternak be, berovajîbûna vê mantiqê weke sermayê bikaranîna vê jî ewqasî xeternake. Jin jixwe xwedî serîtawandinek kevneşope. Xwe ji bingeha azadiyê dûr dihêle, hewl dide pêşkêş bike. Zilam jî, dixwaze serdestiya xwe wisa bide qebûlkirin. Weke tê dîtin, hewl didin hemû hewldanên me yên azadiyê vale derbixin. Lê belê, bi rastî jî em dixwazin cîhanek nû ava bikin. Misoger azadiya civakî bi azadiya vê qadê ve girêdayî ye. Şerê bi mêtîngeriyê re, azadiya netewî li cem me weke goşt û neynoke û bi azadkirina vê qadê ve girêdayî ye. Lewma ez dibêjim, têkîlî pir siyasî ye, têkîlî jiyanî ye û gelek kedê dixwaze. Tu rojane li hember dijmin şer çawa baldarî dimeşînî, divê li qada vê têkîliyê jî baldarî û cidiyet hebe. Nêzîkbûnek ku bikare carina têkîliyê qut bike, carina jî saz bike, li gorî vê jiyana civakî û jiyana çandî dewlemend bike û veguherîne şêweyek jiyana ku jiyana kevin derbas bike. Hinekê jî pêşveçûna şerê di nava me de pêş dikeve jî wisa ye. Tişta dixwazim bêjim, bila heval şiyar bin; ger hûn milîtanin li ser xwe serwer bin û afirîner bin.

Min, hinekê xwest behsa cîhana hezkirinê bikim; yeqîn dikim hûn fêm dikin. Ev girêdayî siyasetê ne. Bi sipartina yetkiya xwe ve bi pêşketina kes a xweser ve nelîzin. Hûn dizanin camêr bi sipartina pereyên xwe keçan digirin. Camêrek şêst salî keçek danzdeh salî digire. Her wiha hûn pergala burjuva jî dizanin, xwe dispêre yetkî xwe û wisa jin digire difiroşe. Di vir de jinê jî çav berdaye yetkî û pereyan. Êdî ew amûrek reklamê ye. Ev, di nava PKK'ê de jî diyarkirin xetere. Ji ber di PKK'ê de şêwaza girtina dest li ser bingeha wekhevî û azadî ye. Şêwaza axa û bûrokratan, şêwaza feodal an jî burjuva di PKK'ê de nayê jiyîn.

Îro li Tirkiyê bi durûtiyek mezin ve orispîtiyek sehmkar tê jiyîn. Cînseltî bi şêweya têkîliyek pir çors û ji bo rizgarkirina pergalê tê pêşkêşkirin. Ecêb! Rojane çapemenî, televîzyon û heta wêje hewl dide civakê bi vê ve şeht bike. Weke amûrek ecêb a xistinê tê bikaranîn û yeqîn dikim, herî zêde jî bi vê amûrê ve ramanê civakê tê berovajîkirin û azweriyên wan ên jiyanê bi yên herî xirb ve girê didin. Li naverastê jiyanek bi qîmet tine ye, dema dibe orispî heye, têrkirinek cînseltî ya çors heye û jixwe diyare ku ev jî ne çareseriye. Em hêjî bi dahûrandina vî karî û qet nebe tevdîra wê ya li ser bingeha siyasî ve mijûl dibin. Rizgarî ne hêsane, pêşengî dixwaze. Pêşengên jin û zilam ên vî karî dixwaze. Belê, em jî bi avakirina van pêşengan ve mijûl dibin.

Hinekê jî di nava PKK'ê de pêşxistina evînê zehmete. Hûn jî dizanin her ku pêş dixe diyare rê ji çi re vedike. Ne şerme, bila hinek hevalên mêrxas ceribandinên xwe veneşêrin. Bila misoger nekevin nava helwestên feodal ên weke bêje ma hêjayî egîdê weke mine, çawa tiştek wisa dibe?

**S.:** Serokê min, rêyên ku ew têkîlî li ser bingehên têkûz pêş bikevin jî hene. Lê ya zehmet xwe gihandina wê ye. Hewldan dixwaze.

**R.P.:** Ez bi hinek hevalên me re dibînim ku, dema forsa wan a feodalî ji dest diçe dihizirin ku namûs ji dest çûye û dikevin rewşek wêran de. Rêbertiya PKK'ê di vê mijarê de bi hêze. Divê hûn di bin navê "evîna min çû, keça min çû, dergistiya min çû" de xwe nehilavêjin. Heta ger hevjîna we jî hebe di bin navê "jina min çû" de qiyametê ranekin. Ez pir kevnar dibînim. Bila biçe baştire. Diçe ku derê bila biçe. Wê jî di vê mijarê de ez hinekê rexne dikirim û heta dayîka min jî ez rexne dikirim. Qet cidî nagirim.

**M.S.:** Serokê min, dema hinek têkîlî qut dibin, hinek têkîliyên ji vê xirabtir derdikevin holê.

**R.P.:** Ma tu bawer nakî? Gelo tu dibêjî ger ev xirab biçe, em ê ber bi ya xirabtir ve biçin? Hûn jî dibînin, gumanên wî hene. Dibe jî, nêrînên te ne. Tu jî hewl bide ya heyî biparêze!

**Z.:** Hêjî bi heval re ew nêzîkbûnên dema kevin heye.

**R.P.:** Vekiriye! Te baş tespît kiriye.

**S.:** Serokê min, ger têkîliyên tên hilweşandin têkîliyên jîndarkirina yên kevin, jîndarkirina neyêniyan û benda li pêş siberojan bin...

**R.P.:** Jixwe ew rizgarî ye.

**S.:** Ev pêş dixe.

**R.P.:** Rizgariyeke.

**S.:** Jixwe, di PKK'ê de têkîliyên erênî pêş dikevin.

**R.P.:** Deka ez bêjim karê hilweşandinê gelekî erênî ye. Belê karê çêkirinê jî heye! Yeqîn dikim heval hinekê muhafazakare. Bilanê! Ango tu dibêjî ger dê ya pir xirab ava bike, hema ez ê muhafazakar bim baştire, ne wisa? Ew watedare, fêm dikim.

**M.S.:** Ez dibêjim, ger mal bê hilweşandin û li şûna wê gov bê çêkirin dê xirabtir be.

**R.P.:** Elbet wisa ye! Heta weke konê qereçiyan ne wisa! Raste. Ez te fêm dikim. Lê dîsa jî ez ê vê bêjim: bila em jî ne konê qereçiyan pêş bixin, ne jî govan pêş bixin. Ev pir girîngin. Destpêkek din diyar bikim: Îro li Kurdistanê filmek tê çêkirin, bi qasî di rojnameyan de diyar dibe ji bo me ye. Navê wê çibû? Temam Xecê û Siyabend! Kesek çîroka wan xwendî heye? Gelo tu dikarî bi kurtasî bêjî?

**M.S.:** Çîrokek di derbarê serdema feodal a Kurdan de ye. Xecê xanimek xwedî heft bira ye. Dil dikeve Siyamend.

**R.P.:** Em dikarin vê çawa şîrove bikin? Bûyerek wisa rû daye, yan jî efsaneyeke, sazûmaniyeke û yan jî badeke?

**N.:** Badek jî be, hinek beşên jiyana miletekê hatiye diyarkirin.

**S.:** Serokê min, dilketine, lê dilketinek çavkore. Ev girêdana bi Kurdan re, fedekariya jinê ye, lê zêde hatiye hêsankirin.

**R.P.:** Xezal çima di navê de ye, divê em wê fêm bikin. Xezal nûnertiya çi dike?

**S.:** Xezal hinekê jî nûnertiya azadiyê dike. Jiyanek azad a li çiyê.

**R.P.:** Ew, dibêje azadî, tu çi dibêjî?

**M.S.:** Xecê, xezal dişibîne Siyamend. Gakuvî tiştek kin û hejare.

**R.P.:** Bila kurt be.

**M.S.:** Di navbera herduyan de vegotinên dirêj hene. Li wir, di serdema feodal de girêdana di navbera jin û zilam de dirêj vedibêje. Ya din jî girêdana zilam a bi jinê ve ye. Li gorî min xezal wisa dişibe, ango dibêje ez dikarim ji bo te xwe jî bikujim. Qinyata min ev e.

**R.P.:** Xezal dişibe Siyamend dibêje; "Hewce bike dikarim xwe feda bikim." Ne wisa?

**Z.:** Li gorî min, di vê serdem ê de Kurd li pey hêz û yetkî digerin û bidest nexistina vê hêz û serdestiyê rave dike.

**R.P.:** Siyamend, ji birayên Xecê ditirse ne wisa? Ji ber birayên wê li dijî wî ne.

**M.S.:** Belê Serokê min.

**R.P.:** Wê demê ev, ji pergala komînal a destpêkê ber bi serdema fedodal ve çûnê vedibêje û Siyamend, hewl dide xwe bigihîne Xecêya ku dixwazin bikişînin nava qadên têkîliyên feodal. Lê di wê çîrokê de tê vegotin. Ger ew bi xwe xezal be û heftên din jî serkêşiya hêzê dikin. Ger xezalê li cem xwe bigire dê çi bidest bixe. Lê ger xezal li wê bide ew ê çi bi ser bixe?

**X.:** Heft biyaran vedixwîne cengê.

**R.P.:** Vedixwîne cengê ne wisa? Gelo dibe ku li hember civaka feodal qada cengê pêş dixe?

**M.S.:** Ger wisa bûya, hewce nedikir bikuje, jixwe hukum dike.

**R.P.:** Gelo dema xezal wî dikuje, weke birayekî dikuje?

**M.S.:** Na! Di nava wan xezalan de ya herî biçûk dişebe Siyamend û li ser wan hukum dike. Dema Xecê vê vedibêje, ev diçe xezal dikuje û...

**R.P.:** Wê demê, tişta Siyamend li pey dibeze ev e; dixwaze li ser civaka feodal serdest be. Bes ewqas qelse, di rastiyê de ne di rewşek rêvebirinê de ye, rebene. Xecê jî, dibîne ku ne di rewşa rêvebirinê de ye, dê nekare di civaka feodal de li hember xeternakiyan serwer be. Siyamend jî vê ranake û xwe dikuje. Weke ku bixwaze ji xwe tolê rake, tinebûn û bêhêziya xwe wisa bi xwe kuştinekê ve pêk tîne. Xecê jî, bi xwe kuştinê ve diselmîne ku dê têkîliyek azad neyê sazkirin û neyê serxistin.

Ji bo vê min xwest bêjim: Divê mirov bi rasteqînî nêzî van mijaran jî bibe. Ev çîrokek an jî efsaneyeke. Lê dema şêwaza têkîliya nû pêş dixe, di berdêla vê de jiyana xwe dane. Li qadek mêtîngerî evqasî lê serdeste, komek têkîliyên kevnare serdest tên jiyîn de heta ku şer neyê meşandin, pergala koletiya heyî neyê şikandin weke di vê çîrokê de jî diyar dibe, hûn ê nekarin derfetê xwe kuştinê jî bibînin. Hûn nikarin navê evînek wisa jî pêş bixin. Dê şêweya herî rezîl derbikeve holê. Niha, ev rastiya me ya civakî dîtin gelekî girînge. Wê demê xisletên netewî yên civaka Kurd hebûn, ji ber serdestiya biyanî evqasî ne bihêz bû azadî hebû. Lê niha ji serdestiya biyanî heta koletiya civakî ya navxweyî, her cure koletî heta qirikê hatiye. Lewma evîn û hezkirina hûn behs dikin dijmin esas digire. Ez nabêjim moralê xwe xirab bikin. Lê ev jî rastiyeke. Divê hûn nebêjin me evîna erzan jiyan kir û min jî bi vê mijûl nekin.

Kêm zêde ez van karan dizanim. Ez jî ji we tevan zêdetir mêrxasim. Min di dahûrînan de ji we re vegot. Ne kesek hişk û girtî me. Min hêj di temenê xwe yê zaroktî de di her astê de

tevgera bi keçan re bawer dikir. Ji azweriya wan a lîstokan bigirin heta azweriyên têkoşînê min keç tevlî hemûyan dikir û her tim jî ev esas girt. Lê belê tiştên min gava din gotin jî rastî ne. Tiştên ku em niha dijîn jî ma hewceyî têkîliyên xwe kuştinê heye? Ma pêwîstî bi têkîliyên rezîl hene. Têkîliya ku salan divê bi şer û têkoşînek mezin ve bê bidestxistin, derfet heye ku bi dizî û diziya rêxistinê ve bê sazkirin? Heta ku jin malê hinek din be, li wir evin û hezkirin nîne. Dev ji evînê berdin, ger hûn dixwazin bi pêwendiyek ku mirov li beramber hêrs nabe ve bijîn jî, bi rastî jî hûn ê bizanin ku gelek tiştên ku divê bên kirin hehe.

Dema em rêgezekê bi partî didin sepandin, a ku em her tim lê digerin tîpên azadin. Heta ku tîpên azad dernekevin holê, em ê behsa kîjan têkîliyên azadbûyî bikin? Ger me rewşa kesên ji we yên herî yeman jî binêrin, bese ku bi tena serê xwe rêxistinê biqedîne. Bese ku darbeya herî mezin li rêxistina herî azad a Kurdistanê bixe. Mînakên vê yên vekirî hene. Hêja ye ku baldarî bên nirxandin. Guh bidinê ez di van mijaran de qet qedexeyan danaynim. Dibe ku hinek hevalên me jî di nava nêzîkbûnên dînî de bin, li gorî min ev jî nêzîkbûnek ecêbe. Hinek jî di nav nêzîkbûnên axatiyê de ne. Ev ne nêzîkbûnên minin. Hinek jî nêzîkbûnên gelekî ketûber dikin. Xwe dispêrin têkîliyên pergalê yên heyî. Ev jî ne şêweyên minin. Min navenda partî heta dawî ji nîqaşên azad re vekirî hiştiye û girîngiyê didim vê. Divê ev neyê sabotekirin. Ji bîr nekin, nexasim bila keç ji bîr nekin, li qadên zilamê serdest jiyîna wekhev mijarek wisa hêsan nîne. Ev di nava PKK'ê de jî be wê rê ji têkîliyên serdestî, çewsîner, kirina malê xwe û xistinê re veke. Di encamê de dibe ku hûn jî evînê bi dilşewat winda bikin. Em jî ji bo pêşî li vê bigirin hewl didin van karan îdare bikin.

Wisa tê fêmkirin ku, perwerdeya têkûz a qadroyên me ji bo jin û zilam, divê bi rastî jî bi qasî asta bikare fermandariya PKK'ê bike be. Ez dibêjim divê rêbertiya wisa hevbeş a

hevbeşbûna jin û zilamê bihêz bê pêşxistin. Ya rastî aliyek herî girîng a hewldanên min ji vê hêlê ve ye. Pêwîstî bi protesto û boykotê nîne. Hûn jî dibînin çîrokeke, hem jî di nava mercên xwe yên xweser de çîrokek evînê ku divê pêk werê ye. Bes pir dilşewat bi encam dibe. Ez di wateya şervantiya azadiyê de, behsa bihêzbûnê dikim. Ev jî bi siyasîbûn, rêxistinbûn û heta leşkerbûnê pêk tê. Çareseriyek pir hêja ye û hatiye selmandin.

Hezkirin, karê zanebûnê ye. Ji bo zanebûn jî wateyekê rave bike, divê xwe bispêre rêxistinbûnê. Van misoger berçav bigirin. Camêrê ku zanebûna wî nebe û di rêjeya zanebûnê de rêxistinê pêş nexe, zehmete ku hez bike. Ancex dikare têkîliyek pir kole bijî, ew jî ji bo me nabe. Elbet ez van ji bo nêvenga partî dibêjim. Ev ji wêjebûnê zêdetir, tespîtên zanistî ne. Deka em afirîner bin, şer pêş bixin, hevdu baş binasin, bila dîrok bê dahûrandin û civak bê dahûrandin! Em jî bi serbilindiyek durist û vekirî vê bikin. Wext pir serfiraze û em dikarin pergala rewa, têkîliyên exlaqî û civakî ya ku kes nikare dij derbikeve saz bikin. Li gorî serpêhatiya xwe dibêjim, lewma dibêjim ev raste. Tişta divê em bikin jî, em bizanin li ser vî bingehî rêzdar nêz bibin, em pala xwe nedin serdestiya zilam, jin jî ketîbûnek wisa ku xwe weke sermaye pêşkêş dike raber neke. Divê jina azad zilamê ketî rake, jina ketî jî zilamê ku nêzî wekhevî azadiyê rake. Divê ji bo rizgariya wê alîkar be. Ev erkek beramberî heve. Misoger divê alî xwe ji ber vê erkê nedin kêlekê. Bila ne jin derfetên xwe li ser esasê beramberî xwe xirab bandor bike bikar bîne, ne jî bila zilam asta serdestiya xwe bi jinê hêsan bide pejirandin. Ez dilketinan rast nabînim. Ya rast heye, ew jî bi şer tê bidestxistin. Di vê mijarê de wêrek bin. Em ê ne durû bin, hêza rêxistinê û girêdana bi rêxistinê ve wisa ji bo xirabiyê bikar neyînin. Vê qet ji bîr nekin. Hişyar dikim; jina ku tevlî refên me bûye, ji bodi PKK'ê de pêwendiyekê pêş bixe gavek pir girîng avêtiye. Despêkirinek pir girîng kiriye. Divê li ser vî bingehî nêzîkbûn bê kirin. Ger hûn

wêrekin gav bavêjin. Hevalên jin û xort dikarin hevbeş rêxistinê birêve bibin, şer birêve bibin û heta dikarin bigihin biryardariya jiyanê û hêza vê. Bes ev jî, kesayetek mezin a zana, rêzdar û jêhatî dixwaze. Dibe ku ev îdeal. Lê ger îdealbûn jî nebin pêkhatin ancex tenê di astek diyar de pêk tê.

Ji vegotinê zêdetir mirov dikare mînakan bide. Pêşveçûna we, ancex li ser rawestandin, lêhûrbûn û azadî esas girtinê ve gengaze. Ji bo xwe û partiyê xeyalan binpê nekin. Hêjayî navûdengê PKK tevbigerin û bi dildarî nêzî serkeftinê bibin. Em vê civîna xwe wisa bi encam dikin. Me ji gelek aliyan ve mijar girtin dest. Di serî de jî pirsa min kirî: Çawa Bijîn? Baweriya min bi civata me tê. Hûn têra xwe ji şoreşê re vekirîne. Erk jî du qetî girantir bûne. Hûn ê di demek kin de derbasî qadên erkan bibin û li van deran bi hezaran pêwendî pêş bixin. Dibe ku ev pêwendî ji pola bin, rizî bin û têkîliyên bên kirin an jî bên rûxandin bin. Qet ne hêsane. Ez jî hewl didim hinekê ji vê re bibim hêza çareserî.

Têkîliya gerîla û têkîliya serhildan niha bi serê xwe kategoriyeke. Milyonan di bin rêveberiya we de şer dike. Têkîliya PKK’ê ya rêxistinê, têkîliya qadro ya partî, di encamê de têkîliya ku her tiştî diyar dike. Lê niha tînin wê astê ku nayê nasîn. Ev ne tenê meseleyên minin. Divê hûn jî serê xwe bêşînin û pirsgirêkên ku divê hûn çareseriya wê serbixine. Divê em kamil bin. Ez ê dîsa erkên xwe bicîh bînim, lê erkên ku divê teqez hûn jî bikin hene. Divê em neguhdarbûnê nekin, ji gelek aliyan ve tevbigerin. Bi rastî jî êdî em dev ji xapandin û nebesiyan berdin. Nexwe weke din ez jî nikarim kar bimeşînim. Tenê li ser milê min serkeftin nayê bidestxistin. Divê teqez rola min hebê, dê hebe jî, lê ger hûn teqez rola xwe bilîzin dê ev kar ser bikeve. Yeqîn dikim her roja ku derbas dibe bi zanebûn û berpirsyariya vê ya ku zêde dibe ve partî jî pêş dikeve. Yeqîn dikim qadrobûna me jî pêş dikeve. Lê dikarim bêjim ku hêjî ne di asta tê xwestin de ye. Di dema pêş me de erkên pir berfireh hene. Ne tenê gelê me, gelê Tirk jî bi

lezgîniya pêvajoyek şoreşî ya girîng re rûbirû ye. Şerte ku qadroyên bikarin vê pêşwazî bikin hebin. Belê, zemîna li vir jî ji bo vê firsetek pir girînge. Divê em jî vê bi berpirsyariyek mezin binirxînin. Em ê destûrê nedin têkîliyên ku me ji hêz dixe û formasyonên nebes. Wext pir girînge. Dibe ku heman kêliyê belayek bê serê me û ji bo şoreşa me jî bêxêriyên herî mezin jî rû bidin. Rêya pêşî li van girtinê jî, ji hêla we tevan ve kêm-zêde hunera Rêbertiyê jîndarkirine. Ji vê hêlê ve jî bi pîvan tevgerîn, karbidestbûn, xwe gihandina pêwîstiyên ku ji partî re hewce ne û qet ji xirabiyan nebandorbûn tê xwestin. Bendewariya esasî xebatek ji bilî serkeftinê firsendê nade ti nêzîkbûnek din. Yeqîn dikim hûn her roj bi zanebûna vê tevdigerin. Divê hûn jî vê kamilbûn û berpirsyarî raber bikin. Divê ti hêcetên di derbarê rabirdo û rojane de nekarin we ji berpirsyariyek wisa pêwîste heta mirinê bê ragirtin vegerîne. Em neçarin ser bixin. Ji bo hûn serkeftinê bi qasî hebûna xwe serwer bikin, divê hûn her tiştê xwe seferber bikin û jiyanê bidest bixin.

Meş wisa çêdibe. Misoger ev, meşek ku tevgera me û me bilind dike ye. Dê we bibe çareseriyê. Nêzîkbûnek ku we gav bi gav nêzî “ya çawa” dike. Min ji bo vê hewl da vekim. Dibe ku kêm be, lê her roj hewl didim hinek din li ser rawestim. Divê hûn jî li ser vî bingehî fêm bikin. Pêşketinên heyî jî diyar dikin ku tevgerek ku nikare beramberî pêşveçûna we raweste heye. Wê demê, êdî divê ev xetimandin û kêmasiyên heyî bên derbaskirin. Bendewariya me ya mafdar jî û ya bê serxistin jî ev e.

***Ekim 1991***

***Partî, Banga Pêwendiya Azad Dike!***

Weke hûn dibînin, em çiqlên sitirî dibirin, di wateyekê de dikesixînin. Ger aliyek din jî a paqijkirinê hebe, em destwerdana wê jî dikin û baş dikin. Em tevdîr digirin ku ji nû ve li ser koka xwe çênebe. Pêwendî jî li ser vî bingehî tê avakirin. Ne zehmete ku ev bê dîtin.

Ez jî berê hinekê weke we dihizirîm, lê min derbas kir. Çavên xwe berdin azweriyên azadiyê yên mezin. Ev hem razber, hem jî di şerê azadiyê yê mezin de bilêvkirin pir girînge. Hûn jî dizanin ku ez pir nirx didim jinê. Em pêngavek mezin bi tevgera azadî didin pêşxistin. Hûn jî dibînin mirovên cur be cur mil didin têkoşîna me. Lê ez vê jî bes nabînim, divê hîn zêdetir pêngavan pêş bixin. Deka em lê binêrin a herî baş, lihevhatî û bedew kiye? Ji bo em hêza ecibandinê pêş bixin, ev hewce dike. Divê hûn li vir bedewbûna çalekiya mezin, rêxistinbûna mezin û şerê mezin bidest bixin. Ger hûn dil û mejiyê xwe wisa bi hestek teng û tor ve girê bidin, ez ê ji bo we pir xemgîn bibim. Ev tê wê wateyê ku we jin û zilamên şerê azadiyê tam fêm nekiriye. Ma êdî ev kar bi nameyan dibe? Ez nabêjim hez neke, bila têkîlî hebin. Niha tu name binivisîne bide, ez ê bibim!

**X.:** Na! Niha...

**R.P.:** Qet ne şerme, misoger ne şerme. Weke biçûkbûn jî nabînim.

**X.:** Nizanim hevalan çawa fêm kirine. Ne ku min pirsgirêk dît lewma vegot. Ji ber Rêbertî ev mijar ronî dikirin lewma min jî vegot. Min jî ji hêlekê ve nerehetî jiyan kir.

**R.P:** Ji ber ku min jî dizaniya ji hêla te ve ne pirsgirêke, min pêwîst ne dît ku ji te bipirsim.

**N.:** Serokê min me jî nepirsî.

**R.P.:** Ez we dibihîsim, lê pêwîstiya pirskirinê nabînim. Ez ancex dibêjim ev ast pir paşketî ye, PKK di astek pir pêş de ye, divê hûn jî xwe bigihînin vê. We berê çi kiriye û çi jiyan kiriye, me eleqedar nake. Tenê girîngiyê didim vê; divê hinek bingeh bên girtin û hinek pîvanên rast bên rûniştandin. Weke tê zanîn li vir hinek hevpeyvîn hatin pêşxistin. Ji bilî vê min ecêb nedît. Bes li gorî min ger hûn bana, dê we bi mehkumkirinek mezin ve bi encam kiriba. Divê ez di vê mijarê de hesas bim. Divê em we di vê mijarê de nexetimînin. Lê belê, bi şêwazê perestî “ez bê te, tu jî bê vê nikarî” nabe. Na, ev têgehên pir paşverû ne.

**N.:** Serokê min, aliyên dixe hene. Têkîliyên wisa misoger kesayet ji jiyana rêxistinê qut dike. Ango li şûna li vir sê-pênc demjimêran ji civata hevalan re hinek tişt vebêje, hewl bide bi hevalan bide fêmkirin, dikare xwe bide quncikekê û bi saetan van tiştê hêsan bihizire.

**R.P.:** Jixwe wisa ye! Ez vê dibêjim we; tişta ku di nava PKK’ê de tê jiyîn, ji hêla têkoşînê ve nirxa wê heye. Me ji mêj ve ev şer meşandiye. Feraseta PKK’ê ya di vê mijarê de niha bi rastî jî veguheriye şerê azadiyê. Dema bi gelemperî ji şer re vekirî bûyîn an jî ji şerê azadiya jinê re vekirîbûn dibe mijara gotinê, di pêwendiyan de azadî esas girtin girînge. Ez ê vekirî ji we re bêjim; ger hûn nekarin şer berfireh pêş bixin, hûn nekarin di nava şer de şerê azadiya jinê pêş bixin, ti pêwendiya we bi jinê re nabe. Jixwe dema PKK dibe mijara gotinê, rastî ev e. Lê dema bê PKK be, gelek rewşên cur be cur derdikevin holê. Îro keçek me ya din bû mînakek. Em dixwazin wê ber bi şerê azadiyê ve bikişînin, em dibêjinê di pêwendiyan de azadiyê esas bigire, di azadiyê de heval û hevalên xwe pêşve bibe, ew tam berovajî dike. Gelek rewşên wisa derdikevin holê.

Ji bo ez di vê mijarê de pîvanê winda nekim, girîngiyê didim vê: Divê em berî her tiştî rastiya azadiyê bi we re saxlem

bikin. Divê azadî di wateya razber û şênber de bê saxlemkirin. Divê hejmarek zêde hêza qadro û jinê bê avakirin. Divê pêşeng û rêxistina vê bê avakirin, daku em bikarin van karan hinek din pêşve bibin. Ji bilî vê ti rêyek din a pêşvebirinê nabînim. Mînak beriya niha di bin navê "têkîliya herî mezin, têkîliya herî îlahî ye" de têkîliyek ferz kirin. Ev, ne şêwaza min bû. Têkîliyek ku min jiyan kirî jî hebû. Ne dixwest yek têkîliya jina azad derbikeve holê. Hişk bû, lê feodalîzmek kirêt bû! Elbet ê îxanet kirî ne ez bûm. Zehmete ku di cîhanê de mirovek bi qasî min bi têkîliyan ve girêdayî heyî bê destnîşankirin. Bes têkîliyek wisa bû, ger dixwaze rastiya jinek pir mezin bike qurbana karyera xwe, li wir gelek karên ku tu bikî hene. Ger roniya çavên te jî be, wê tu derxî û bavêjî. Qaşo dê min di nava wê xetimandinê de bi zîncîr bike! Bi taybet xwe dispêriya feraseta namûsa kevnare ya zilamê Kurd. Dema feraset ev be û şana te jî hebe, ji bo navê xwe xilas bike her çendî ji bo dîtbarî jî be, wê tu bi namûsê ve girêdayî bimînî. Tişta ji me re jî dihat ferzkirin ev bû; "ji bo tu binamûs bê zanîn tu nikarî min paşguh bikî, wê tu min esas bigirî û her tiştê min jî bipejirînî." Di nava cîhana jinek bêhndayî de çi bixwazî hebû. Destê xwe ji ava gerim ne dixist ava sar û dê her der kêf û seyran bûya. Teqez dê xwediyê te ba. Yek sitargeha wê hebû, ev jî feraseta namûsa kevnare ya zilamê Kurd bû. Rêberên ciwan dipîva. Di derbarê ku dê zilamê Kurd çawa bi derdora jinê ve girêdayî bimînê de gelek rapirsî pêş xistibû. Tişta ji min dihat hêvîkirin jî, ez jî bişibim vî tîpê zilaman. Ji bo me jî rewşek ku em di pîvanên kevnare de nayên kontrol dabû diyarkirin, me paşverûtiyek pir mezin binxist. Ya ser xistî dîsa azadiya jinê bû. Îro bandora vê hûn jî dibînin. Li meydanan rêberên jin derdikevin holê. Ev, misoger girêdayî şêwaza pêwendiyê ye. Ger min jî gotiba; namûsa mine, nikarim dev jê berdim, wisa û weke din dibe", dê min gelek tişt winda kiriba. Lê belê niha, evqas jinên azad û têkîliyên azad derketin holê. Ya ku winda kirî jî,

paşverûtiya feodal a kevine, ya ser xistî jî mirovên azad bi xwe ne. Ev di dîroka PKK'ê de pir vekirîne. Ji bo zincîr hatine qetandin, hewce nake kes tengav û xemgîn bibe. Berovajî divê hûn kêfxweş bibin. Lê mixabin ji bo serhişkên dibêjin; "Ger ez li quncikekê, aliyekê koleyekê nebînim ez ê dîn bibim" rewş hinekê cudatire. Dibeje ku; "Ger ez bi koleyekê ve neyêm girêdan an jî koleyekê bi xwe ve girê nedim ez ê bimirim." Ez jî ji vê nefret dikim. Jinek koletî bi xwe ve girêdan, ji bo min pirsgirêkek jê nefret bikim û ti caran tenezil jî nakim. Binêrin, ez dikarim bi qasî dixwazim mirovan bi xwe ve girê bidim, lê ti nirxî nadim têkîliya ku bingeha wê ya azad tine ye. Di vê mijarê de şerê PKK'ê û ya min a pir mezin heye. Divê hûn vî şerî cidî bigirin. Em di vê mijarê de şervanê soza xwe ne. Ango di navbera sond û namûsê de pêwendiyek heye. Di navbera sond û çalekiyê de pêwendî heye û em didin sepandin.

Jinên ku her tiştên xwe dane şoreş û şoreşvaniyê hene. Zilam jî radibe, hewl dide vê jinê bixe. Ev tiştek ketî ye, bê exlaqî ye. Wê demê em ê jî vê jê re bêjin; "Ey zilamê ketî ma te çi da, tu çiqas eleqeder bûyî û te çiqas azad kir? Divê keç jî me baş binasin. Di nav PKK'ê de rêgeza azadiyê misoger tê sepan. Ger wisa bê gotin; "ez ê xwe bispêrim otorîteya xwe, rêzdarî û derfetên PKK'ê û wisa ji xwe re koleyan ava bikim", em ê jî her tiştê kesên ku vê dibêje ji dest bigirin. Min ev gotin li cem hevjîna wan ji gelek zilamî re gotiye. Her wiha min jin jî şiyar kirin û got wan, li cem min bin, ji bo em van bigirin. Di nava PKK'ê de otorîteya sexte meşandin, gelekî xeternake. Me ji keçan re jî got; "Hûn nikarin ji bo xerîzeyên xwe yên hêsan bi me ve mijûl bibin an jî li ser vî bingehî me bixapînin." Ji bo em feraseta "em çawa dikarin weke amûrek cînseltî bikar bînin" bişkînin, me şer da destpêkirin. Ma hûn dihizirin kesayeta Rêbertî hema ji xweber derket holê. Niha Ewrûpî jî hewl didin rastiya şerê me ya di vê mijarê de fêm bikin. Yek ji pirsên herî zêde ji min dipirsin ev e;

“tu vî karî çawa dimeşînî?” Şerê azadiyê ev e. Şer, jiyîna têkîliya herî zêde kombûn ava kiriye. Dema te têkîlî di asta ar û pêt de jiyan kir, tê wê wateyê ku tu şer dikî. Pêwendiya siyasî kûr dibe, dibe pêwendiya leşkerî. Hîn zêdetir kûr dibe, dibe ar û şerek dijwar. Ev têkîlî jî wisanin. Dema pir dijwar dibin, tê wateya şerekî. Têgihiştina xwe jî wisa pêş bixin. Nexwe dê ew hezkirinên kevin jî ji dest biçin. Dê ew destanên me yên kevin jî ji dest biçin. Jixwe gelek ji wan ne rastîne jî. Tenê nirxa wan a destanî heye. Pêwendiyên ku em li qada PKK’ê pêş dixin, ne di şêwaza kevnare de ne, ne jî şêwaza dema borî de em fêrbûne. Ne gengaze ku ev bên meşandin. Ger wisa berdewam bike jî, hûn çareser nabin. Ev ji bo keçan jî, ji bo zilaman jî wisa ye. Ger hûn bikarin asta heyî bigirin, hûn dikarin bimeşin. Nexwe, mijara azadiyê gelekî zehmete. Em nikarin ji bilî vê têkîliyên azad derbixin holê. Niha her kes pêwendiyên di nava PKK’ê de hez dike û lewma bi bazdan tevlî dibin. Ma çima evqas keç û jin beşdarî têkoşîna me dibin? Ji ber hezkirinê dibînin, rêzdariya beramber kesayeta xwe dibîne. Tevî ku dizane mirin jî heye, wisa jî tê. Ji ber ti cihek din mirovbûn tine ye, rêzdarî tine, hezkirin qet tine ye. Çiqas di nava PKK’ê de hezkirinek şênber peyda neke jî, tenê bêhna vê digire lewma yekser baz dide tê. Hûn ê jî baldar nêzî vê bibin û bi cewherek mezin bersivê bidin vê. Lê ger hûn weke axayê gundekî nêz bibin, em ê jî rihê we bistînin. Hûn ê di vê mijarê de binamûs û durist bin, pîvanên me esas bigirin. Ev ne mijarên hêsanin. Me got wan mejiyên xwe yên paşverû biguherin. Ez nabêjim bila nameyên eşqê neyên nivîsandin, bila têkîliyên we pêş nekevin. Lê ger hûn bêjin; “Em nikarin biçin Botanê, nikarin biçin şer, dixwazim bibim endamek eniyê ya ji rêzê”, ev heqareta herî mezine. Ma ev eşqek çawa ye, van axaftinan bi te dide gotin? Ma ev girêdanek çawa ye, te di astek pir xirab de paşve dikişîne? Ma ev eşqek çawa ye, te ketûm dike? Ev çawa dibe, wê tu vê çawa ronî bikî?

**X.:** Min texmîn kiribû...

**R.P.:** Belê li gorî wî sucek mezine. Lê ev ne sucin. Ev şêweyên eşqê yên paşverû ne. Şêweyên eşqê yên paşve dikişînin.

**Z.:** Heval ev got; “Ez dixwazim di vê mijarê de xwe ji Rêbertî re vebêjim.” Min jî got; “Tu dikarî di wextek guncav de vebêjî. Hele pêşî xwe zelal bike.”

**R.P.:** Ji min re tiştên hîn kûrtir vekin. Bila hinekê jî balkêş bin.

**Z.:** Bawerim ji ber ku heval wê pir girîng dibîne lewma vekir.

**X.:** Ya rastî Serokê min, ne ji bo girîng didît.

**R.P.:** Kî?

**X.:** Ew hevala jin. Berê jî şêweyek têkîliya wisa jiyan kiriye. Paşê ew bi dawî kir. Ji ber vê ez ê ranekim, divê fermiyeta vê ya sînordar...

**R.P.:** Ji bo bikare vê rabike, divê pêşî xwe bigihîne feraseta PKK’ê.

**X.:** Bes, Rêberê min...

**R.P.:** Ez jî dizanim, cureyek din pir zehmete. Hûn nikarin rabikin.

**X.:** Di bingeh de têkoşîn heye. Destpêka her tiştî têkoşîne. Ez wisa nêz bûm. Dîsa jî wisa nêz dibim. Tiştek hatî guhertin tine ye. Ew heval jî wisa bû. Ango têkîlî li ser partî ferzkirin û ji partî re kirina pirsgirêk ne raste.

**R.P.:** Lê ferz kir, ma we ne dît?

**X.:** Hinekê li ser bingehek cuda pêş ket. Ez jî wê dizanim.

**R.P.:** Di nava PKK'ê de evîndarî nabe!

**X.:** Ne di vê wateyê de.

**R.P.:** Di nava PKK'ê de bi zilamekî yan jî keçekê ve girêdana zêde nabe. Çi zilam çi jî jin dibe, di mijara girêdanê de tişta ez digerim ev e: Pir hez dikim, ji bo hez jî dikim evqas mirov li pey min tên. Ji bo hez dikim evqas mirov bi min re pêwendî pêş

dixin. Gelo mirov çawa dikare li pey hest û fikrên rasteqîn biçe? Yek ji van welatparêzî, yek demokratbûn, yek jî girêdana rêxistinê ye. Her ku mirov van esas bigire, bi xwe re jî şênber bike, wê demê hezkirin pêş dikeve. Ev jî di nava me de hevaltiya têkoşînê ye, rêhevaltî ye. Jixwe pêşî we ev qet jiyan nekiriye. Girêdanên ku hûn bi rêbazên ji dûrve areste dikin, kêrî tiştekê nayên. Rêbazên kevin bûne, êdî kevnare ne kêr nayên. Gelo di vê mijarê de hêza kî ya wêjeyî heye? Hûn dikarin binivîsin? Hêvîdarim em ê di vê mijarê de bi yekdestî hinek nivîsan derbixin holê. Divê em têkîliyan li ser bingeha kûrbûnekê ava bikin.

Em di van mijarên têkîliyê jinê, têkîliyên zewacê û têkîliyên malbatî de dema dibin mijara gotinê hezar salin hatine tinekirin. Me xwe hezar salin di vê dergehê de winda kiriye. Hûn di vê têkîliyê de ji bênamûsiya herî mezin re, heta mirina xwe dibêjin girêdane. Me sistbûna herî mezin, bê bingehbûna herî mezin û bê rêxistinbûna herî mezin jiyan kiriye. Lewma me her tişt perçe perçe kiriye. Bi sipartina têkîliyek biçûk ve nirxên mirovî yên herî bingehîn, nirxên demokratîk û her tişt hatine binpêkirin. Êdî divê bê fêmkirin ku em çima evqasî li dijî disekinin. Em ne li dijî têkîliyên we yên mehsûm û hestên we yên eslî ne. Em li vir li dijî tinebûn û ketîbûna hezarî salî ne. Her wiha em naxwazin vê bi we bidin jiyîn. Ev pir girîng û zanistî ye. Ez vê ne tenê weke hêjayî we dibînim dibêjim. Ger bê lêkolînkirin hûn ê bibînin çiqasî zanistî ye. Yeqîn dikim mamoste Beşîkçî jî ketiye ferqa vê. Ew tiştê ez dibêjim kêm jî dibîne. Dibêje; “Li gorî zanistî divê hîn zêdetir bê gotin.” Em zanistiyê pêş dixin, ne mecnûntiyê. Pêşî zanistî esas bigirin, paşê hewl bidin hevdu bidest bixin. Kesên hêj nikarin bi hev re baş baxivin, pirsgirêka bingehîn a netewî, pirsgirêkek rêxistinî, pirsgirêkên meşandina şer bi hev re nîqaş bikin, -behsa demogojî nakim- nikarin vê di pratîka xwe de peyitînin, dê çawa li rûyê hev binêrin? Çawa dikarin bêjin me bi kîjan rûyî ji hev hez kir û em evîndar bûn? Ma

gengaze? Ma ev ne bênamûsî û bêrûtî ye? Ger em destûrê bidin vê ma ne li rêgeza azadiyê îxanete? Mane em ê we wisa terkî her cure kirêtî û bêrûtiyê bikine? Yeqîn dikim wisa nêzîkbûn hîn rasteqînî ye. Gelo ji ber wisa dibêjim pir zora we diçe? Ma ev rastî we venakin?

Li cem me tengavkirin nîne. Tiştên em vedibêjin û rexneyên dikin ne di derbarê hestên we de ne. Ez behsa hinek heqîqetan dikim.

**X.:** Rêberê min, ev mijar di nava dahûrînên pêşiya salê 1980'î û heta niha ya herî dewlemende.

**R.P.:** Bes ger hûn bizanin lêkolîn bikin wisa ye. Em pir didin we.

**X.:** Feyda wê çêbû.

**R.P.:** Divê hûn bizanin lêkolîn bikin.

**M.:** Rêberê min, têkîliyên bi vî rengî di rastiyê de ji naveroka şoreşgerî û şerkirinê dûrin. Ti aliyê vê yê bê parastin nîne. Dibe ku ji yek alî ve baş be, lê aliyê din ji şer dûr dixe û xetere.

**R.P.:** Dema mirov nîqaş dike divê pêşî vê pirsê bike: Divê kîjan têkîlî, têkîliya hezkirinê be? Ger misoger şênberkirina kesayetekê tê xwestin, divê herî zêde kîjan keç bê hezkirin, kîjan zilam bê hezkirin? Di vê mijarê de pêşbaziyê de bin, semîneran bidin, broşûr û pirtûkan binivîsin û mînak bigirin. Yeqîn dikim xalên ku hûn ê yekemîn derbixin holê dê ev bin. Bidesxistina xweşikbûnê! ( jixwe erka huner û wêje jî ev e.) Ma em dikarin ji kesek ku te ji xwe re kiriye kole û evdalek re bêjin xweşike? Têkîliyek di bin kêfkariya zilam an jî jinê de fetisiye, ma dibe têkîliyek xweşik? Elbet nabe! Di naveroka xweşikbûnê de civakbûn heye, hevbeşî heye. Ango divê gel giştî biecibîne. Ji bo giştî gel jî biecibîne, divê azadiya gel pêk bîne. Yên ku azadiya gel pêk bîne jî, şere. Lewma pêwendiya milîtanî, pêwendiya ku şer hinekê pêşve dibe. Ger we ev bidest xistibe, pêwendiyên we

xweşikin, tên hezkirin. Ev pîvanên girîngin. Lê divê her kes vê pîvanê di kesayeta xwe de pêk bîne. Weke ku berê dihat gotin; ”Paşa destûr daye”, îro jî gotina “ez bûm otorîte, min hez kir û hatim hezkirin, min girt û firot” nabe. Ev şaşin.

**M.:** Rêbertiya Partî di vê mijarê de dibêje; “***Ya şer dike azad dibe, ya azad dibe xweşik dibe, ya xweşik jî dibe tê hezkirin.***”

**R.P.:** Belê, formîlek raste. Kesên ku pêwîstiyên vê formîlê bicîh bîne dê ser bikeve. Karên di nava PKK’ê de bêhempa ne. Pir vekirî ji we re dibêjim. Ger dilê we dixwaze bi min re bimeşin, lê ger naxwaze diçin kur biçin. Meşa bi me re ne hêsane. Di PKK’ê de hezkirin ne hêsane. Min ne xwendiye, lê yên xwendî hene. Hinek heval dibêjin ku, mîna nirxandinên me di pirtûka bi navê “Çawa Bikin?” de hene. Kî ev pirtûk baş xwendiye.

**X.:** Ya Çernişevskî ye!

**R.P.:** Belê ya Çernişevskî ye. Kî ew xwendiye? Gelo girêdana wê bi vê vegotina me re heye. Ger we dahûrînên me yên din jî xwendibin hûn ê bizanin.

**U.:** Di rastiyê de tiştên li wir hatine vegotin tev razberin.

**R.P.:** Ma yên me hîn şênber û rakêşwerin?

**L. J.:** Yên di wê pirtûkê de evqasî ne şênberin. Ango dema mirov bi formîla gava din heval vegotî ve tîne raberî hev, ne gihaye vê radeyê. Hinek giştî û xeyalî ye.

**R.P.:** Wisa yeqîn dikim hinekê jî pratîka me vedibêje.

**N.:** Mirov dikare Çernişevskî mînak bigire.

**R.P.:** An jî tişta em dikin dişibe wê. Divê hûn hinekê wê rûber bikin. Di vê mijarê de di serê gelekî hevalan de pirs hene. Dibe ku hevalên bi îdîa hebin, ji bo mijûlbûnê dibêjim. PKK, ti caran têkîliya bêhempa û têkîliya bedew naqewitîne. Ev zilam jî be, jin jî be wisa ye. Ya egîde, bedewe, wêreke û fedekare, li nav PKK’ê heye. Ha ji we re xweşikbûna mezin. Hunera siberojê jî li

ser vê tê sazkirin. Kesayetên şoreşê dibin civak. Ev li nav PKK'ê heye. Bê ku ev bê dîtin wisa bi rewş û qelşên erzan ve asê mayîn, tê wateya qet nefêmkirina PKK'ê. Di asta ketî de nemînin. Ya ku hûn nikarin bigihijinê jî xirab nedin diyarkirin. Mane gotinek heye dibêjin; "Mafê Sezar bidin Sezar." Li nava PKK'ê girêdanên xurt hene. Divê mirov li hember wan rêzdar be. Ji hêlek din ve jî ji bo me dilketinên we yên takekesî pêk ne anîne, li hember me jî rik û hêrs raber nekin. Ez dizanim ku hinek hebûna min rûberî çi tîne. Dixwazin bila ev rêxistin, partî, jin û zilam bin jî, ji bo ez li pêş bêrîkirinên wan disekinim, li hember min pir hêrs dibin. Weke ku ger ez nebim, dê cîhanê bigirin! Di nava partiya me de jî kesên wisa pir hêrs dibin hene! Deka van rewşên dawî diqewimin binêrin. Her ku dizivire aliyek li min, aliyek li partî dinêre. Li gorî wan ger ez nebim dê bibin yekemîn, dê deledizî be! Zilam li pey dilketinên bûna yekemîn de ye. Li cem me dema Rêbertî vê sekna xwe didomîne, di rastiyê de di vê mijarê de beramber gelek êrîşan radiweste. Gelo hûn dihizirin ger bi şaşî jî ve jinek têkil artêşa Tirk bibe, dê encamên çawa rû bidin? Dema hevala Rûken şehîd ket ji bo fêm bikin "keçe yan na" kontrol kirine. Dema hatiye fêmkirin hêj keçe, serdarek dibêje; "Ev 8 salin kariye di nava wan de wisa bimîne. Di nava leşkerên me de ne 8 sal, dê me di navbera 8 rojan, heta heşt demjimêran, yek demjimêrî de baniya çi halî." Ne gengaze ku di nava artêşa Tirk de jinek wisa azad bidin jiyîn. Di nava her artêşê de jî wisa ye. Bawerim ev li Emerîkayê jî ceribandine. Rûyên wan li erdê ketine. Lewma ceribandina me xwedî nirxek mezine. Jixwe ger em bêjin jin nikare bi me re şer bike, jin nikare bi me re bijî û bimeşe, em ê heqaretek mezin lê bikin. Tê wateya li ber feraseta serdestî serê xwe tewandine. Divê em di vê mijarê de fedekarî û berxwedaniyek mezin raber bikin. Diviya têkîliyên li nav PKK'ê wisa bihatan fêmkirin. Şaşe ku hinek zilam an jî hinek jin tam berovajî vê dilketinên xwe esas digirin û li hember partî şer pêş

dixin. Ji ber li vir misoger pêwendiyên azadiyê tên rizgarkirin. Têkîliyên taybet ên hinekan nayên rizgarkirin, ên tên rizgarkirin têkîliyên azadin û hewce dike em nirx bidin. Ji bo em deriyên nû vedikin. Nirxên ku îro li vir tên bidestxistin, pergala ku li vir tê bidestxistin, milyonan jinan radike ser piyan. Ev jî namûsa sereke ye. Wan bilêv dike, wan wêrek dike û wan di meydanan de dide şerkirin. Xweşikbûn jî li vir derdikeve holê. Cihek din li xweşikbûnê negerin.

Min di jiyana xwe de hêj di temenê herî biçûk de ferq kir ku ya azad nebe nayê hezkirin. Her wiha ditirsiyam. Dema hewl hat dayîn min bixin nav têkîliyên girêdanê ez reviyam. Min xeterî didît. Hêjî ev şer berdewam dike. Belê, ev şerê azadiyê ye. Ger hûn dihizirin jin ji xweber beşdarî şer bûne, hûn xwe dixapînin. Li Kurdistanê ne keç ne jî jinek bê destûra malbata xwe, nikare gavekê jî bavêje, nikare du gotinan jî azad baxive. Pêşî divê hûn vê fêm bikin. Di bin navê şerê mezin ê azadiyê de hinek gav tên avêtin. Ev jî hinek ji rastiyên PKK'ê ne. Dema em hinek rewşên ku we berê jiyan kirine bi van rastiyan re raberî dikin, li gorî min hûn baştir dikarin xwe bigihînin çareseriyê. Cuda kesek di vê rewşê de heye? Yeqîn dikim, zêde pirsgirêkek we nema.

**X.:** Jixwe ne pirsgirêk bû.

**R.P.:** Kesek serî tevlîhev heye? Me X. Duh da axaftin. Ew li kure? Ma hat fêmkirin? Ma di vê mijarê de ti pirsgirêk heye?

**X.:** Nîne Rêberê min.

**R.P.:** Bawer dikim tu dikarî pêngavek rasteqîn pêk bînî. Ew feraseta feodal a namûsê derbas bû. Bila biçe û bimire! Bila dîsa xala serfirazî hebe, lê hûn çav berdin azadiyê. Em ê li Kurdistanê jinê azad bikin. Hûn ê jî hewl bidin ji wê hêlê ve hez bikin. Wê tu xwe berdî nav cewhera şerê azadiyê. Hewldanek mezin bikî û hêza xwe gihandina hezkirinek nû raber bikî. Yeqîn dikim tu di pêkana vê de bibiryarî. Bawerim, niha baştir tê

fêmkirin ku partî mafdare. Te xwe biçûk kiriye, mejiyê xwe jî bi hestek pir biçûk ve girê daye. Lê belê, mirov dikare bi nirxên gelek mezin re bizewice, hûn ê zewacên gelekî mezin pêk bînin. Hûn ê pêşî bi nirxên welat, nirxên dîrok, nirxên azadî û nirxên partî yên pir mezin re bizewicin. Divê zewacên din jî paşê hêdî hêdî bikevin rojevê. Ti zewacen ku van derbike nabe. PKK di vê mijarê de hem pir cidî hem jî pir bihêze. Li gorî min hûn ê vê serfiraziyê bi dest bixin. Mezinbûnê bidest bixin. Kesayeta xwe ya rasteqîn bidest bixin. Vêca dema têkîliyek jinekê çêbû, dê bibe têkîliyek şanaz. Ger jin serfiraz be, dê hûn jî serfiraz bin. Misoger ne ew dikare we biçûk bibîne, ne jî hûn wê biçûk bibînin. Ne ew ji malê direve, ne jî tu. Ev tê wateya pergala têkîliya biryar bidest xistiye. Dibe ku di vê mijarê de acizbûnên hinek hevalan hebin. Ji bo wan ronî bikim van dibêjim.

Gelo ji nav keçan jî yên pirsgirêkên wisa dijîn hene? Qinyata min ew e, dê jin hîn zêdetir xwedî helwestek pêşketî bin. Hûn çi dibêjin? Hûn berpirsê taximê ne, ma pirsgirêkên wisa hene? Rewşa jinan baştire, ne wisa? Ma evîndarên wisa hene? Bawerim kesek ku helwestên biçûk dixe raber bike tine ne. Li gorî zilaman rewşa we baştire.

**S.:** Belê, baştire.

**R.P.:** Gelo ji bo vê nêvenga me rexneyên cidî û gazinc hene?

**S.:** Na, Rêberê min.

**R.P.:** We got ev heval tengav bibû.

**N.:** Ji dewreya kevin ve nas dikim.

**R.P.:** Ez jî bawerim. Dibe ku pevçûnek kesayeta kevin û ya nû hebû. Weke kesayeta Anatolya yan jî Jina Anatolya! Vêca tu jî vebe û pêş bikeve. Hewceyî bêhêviyê nake. Niha tu me fêm dikî ne wisa? Çawa? Ma di derbarê mijarên em vedibêjin de rexneyên te yên pir cidî hene?

**M.:** Na, Rêberê min.

**R.P.:** Ma tu van mijarên min vegotine çawa dinirxînî?

**S.:** Li vir şerek bi ferasetan re heye.

**R.P.:** Şer bikin û ferasetên rast derbixin holê. Ma ne baştire? Ma ji bilî vê rêyek din a derketinê heye? Tine!

Ger em ji bo azadiyê şerekê ne meşînin, ma em dikarin yek ji van hevalan saxlem derbixin? Gelo ne zehmete? Dema hûn ezmûnên xwe berçav digirin, texmîn dikin çiqas zehmete. Başiya herî mezin hûn bikin, ev hinekê li ser bingeha azadiyê dana şerkirine. Li gorî min bila şer bikin. Em ê naverastê vekirî bihêlin. Êrîşî hev nekin. Ango nebêjin "jin lewazin" û neçewsînin. Divê esasên têkîliyan demokat bin. Bi hêza çors û desthilatiya otorîte ve nêzî jinê nebin, ev şaşe. Ev di PKK'ê de zerarê çêdike. Ji ber mijarek hesase nazik nêz bibin, rêzdar û binirx nêz bibin. Her wiha li ser bingeha alîkarî nêz bibin. Yekser ferdî û li ser bingeha desteserkirina sûbjektîf nêz nebin. Nirxa jina di nava PKK'ê de hevbeşe. Ango, hevalek keç a li vir, beriya her tiştî nirxa azadiya mezin a partî ye. Wisa hêsan nabe malê ti kesî. Ez jî nikarim wisa hêsan vînek hevbeş bikim malê xwe. Weke raveyek azadiyê ji bo saxlem li ser piyan bisekine, gelekî hewl bidin. Ev girînge. Ji bo ez sînorên têkîliyên we yên takekesî diyar bikim vê dibêjim. Hûn dikarin zewacek ketûber çêbikin. Hûn dikarin li nêvengek ketûber de têkîliyekê çêbikin, lê di nava PKK'ê de nexasim di têkîliyên qadroyan de hewl tê dayîn raveyek hevbeş a azadiyê hebe. Ez nabêjim zewacên kevnare jî zêde bi tawanbarî ne. Ger zewacên kevnare jî li ser bingeha rast ji nû ve bên destgirtin, em ê rêzdar bin û hêja bibînin. Ger rê ji paşketin û muhafezekariyê re veneke, em nakin pirsgirêk. Lê di nava partî de ferzkirina takekesî û bi israr serde çûn xetere. Ev dide şerkirin. Nirxên azadiyê ne bê xwedî ne. Şûna di vê mijarê de takekesî û ferdperestî bê ferzkirin, bûna raveya azadiya hevbeş esas bigirin an jî girîng bibînin xwedî mijûlbûnekê bin.

**S.:** Serokê min, ji bo mînak dixwazim tiştekê bêjim. Min ne dixwest vê mijarê vekim. Lê hevalek dibêje; “Ez nefret ji jinan dikim.”

**R.P.:** Kî ev gotiye?

**S.:** Nav ne girînge, ez weke feraset vê dibêjim. Jin biçûk dîtin heye.

**R.P.:** Ma te gotiye?

**S.:** Na ne ew hevale. Hevalek gihaye encamek wisa. Dahûrînên Rêbertî ji mêj ve tên çêkirin. Dahûrînên ku ji salên 1985, 87-88''an ve tên pêşxistin hene. Axaftinên hêj dema em nû dibûn şoreşvan hene. Tişta em lê digeriyan û me dixwest bigihinê, polîtîka û ferasetên bi rastî jî hêz didan me û dihişt em hîn zêdetir beşdarî têkoşînê bibin bûn. Me bawerî bi wê polîtîkayê anî. Lê dîsa jî dibe ku ferasetên neyênî û erênî derbikevin. Ango yên yek alî. Dîsa jî ne raste bi şêwazek tawanbarkirin an jî biçûk xistin, lenetkirin bên destgirtin.

**R.P.:** Bawer nakim.

**S.:** Tê destnîşankirin ku li vir hezkirin xwe dispêre çi. Bi rastî jî ger jinek tenê weke sermayek cînseltî tê dîtin û wisa tê hezkirin, ango dihizire tê hezkirin, ew jin jina herî ketî û jina herî bi lenete.

**R.P.:** Ev ji bo her aliyan jî derbasdare.

**S.:** Ev ji bo zilam jî derbasdare. Ti eleqeya vê bi hezkirinê re nîne.

**R.P.:** Divê em di wir de cihetiyek pir zirav bikin.

**S.:** Ev pir girînge. Ango kevnare...

**R.P.:** Dema mirov pir çors di wateya cînseltî ve nêz bû, ev dibe şêwaza nêzîkbûna herî hov, herî ketûber û herî ketî. Lê dema mirov bi hezkirinek girêdayî siyaset, şer û rêxistinê ve nêz bû, ev jî dibe nêzîkbûnek pir xweşik.

**S.:** Ev bi rastî jî pir girîngin.

**R.P.:** Elbet wisa ye. Me di vê mijarê de şerek mezin meşandiye. Ango me ji şerê ku li dijî Komara Tirk daye meşandin deh qetî zêdetir di vê mijarê de meşandiye. Ger ên fêm nekirî hebin, ez dikarim hêjî vebêjim.

**M.S.:** Serokê min, min ew axaftin kir. Sedema wê jî ev e. Dema ez bi heval re axivîm min got; Rêbertî her tim li dijî mirovê kole ye. Vê bûyerê jî ew derxist holê. Bi rastî jî dema min ev têkîlî bihîst, ji duh ve gelekî aciz bûme.

**R.P.:** Kîjan têkîlî?

**M.S.:** Têkîliya heval. Ev heval beriya niha dildarê yeke din bû. Di zindanê de jî pêncî caran xwe ferz kir got min bike dergistiyê filan hevalî. Di wê demê de di hevdîtinek vekirî de rûniştina du mirovan li cem hev, axaftin û gustîlik kirina tiliya xwe meseleyek mezin bû. Min gustîlîk kir tiliya wê. Niha jî evîndarek din derket holê.

**R.P.:** Çi?

**M.S.:** Belê nûye!

**R.P.:** Çi nûye?

**M.S.:** Nizanim, têkîliya nû a bi wî hevalî re derket holê.

**R.P.:** Ma pir girînge? Belê, li gorî hevalên me yên zindanê xirabkirina rêgezek herî mezine. Wisa ne?

**M.S.:** Nexwe tiştek bi navê hezkirinê tine ye.

**R.P.:** Jixwe wisa ye.

**M.S.:** Min jî got; “Li welatê me mînekek wisa nîne.”

**R.P.:** Tişta tu dibêjî di vê manê de raste. Formîlek min wisa heye. Min digot; “Di bin vê statûya heyî de qinyata min bi hezkirinê nayê. Hezkirin tine ye û ketîye.” Bawerim min ev di hevpeyvînekê de gotibû. Me gotibû kole naye hezkirin û ya azad nebe jî naye hezkirin. Heman rewş, ji bo zilam jî derbasdare. Ev herî zêde jî ji bo zilam raste. Ti zilam nayê hezkirin. Dibe ku ji bo hinek jinan rewşek newekhev hatibe avakirin, lê her tim bi rik nêz bûm. Zilam çawa tê hezkirin? Ev keç çawa dikarin hinek zilaman

hez bikin? Hêjî ecêb dibînim. Her wiha dixwazim bipirsim, ger bikare vê ji min re ronî bike ez ê kêfxweş bim.

**X.:** Nexasim di çapemeniya burjuva de hewl didin bidin diyarkirin weke ku di vê evîn an jî têkîliya jin û zilam de razek heye.

**R.P.:** Ji bo meşandina pergala mêtîngeriya tund, jin zêde xirab tê bikaranîn. Ti eleqeya vê bi hezkirin û evînê ve nîne. Propagandeya bûyerek hêsan, rewşek şerê derûnî tê meşandin. Li Tirkiyê bûyera sermayekirina jinê pêş xistin û xwestin pergala faşîzma 12'ê Îlonê wisa bi zextê civakê bidin pejirandin. Mînak ji ber rewşek ku herî zêde Ozal zehmetî jiyayî ev bû. Gelek rojname hene, ev pir dinivîsin. Laş û evîna jinê di sernivîsan de pêşkêş dikin û armanca wan ew e ku kesîmek civakê pê bidin meşandin. Ew wisa dinirxînin.

Dema rastiya Kurd dibe mijara gotinê, ji hevdu hezkirin pir zehmete. Min rexneyek ji bo we jî kiribû. Di derbarê ew têkîliya ku hûn dibêjin herî qayîme de tiştek pêş neketiye. Yeqîn dikim hûn jî vê dibînin. Li gorî min divê mirov xwe nexapîne. Ez jî bandor bûm û min jiya. Min xwe dispart xapandinek û nebesiyekê. Heta şert û mercên li gorî xwe neyên avakirin, têkîliyek birêz û hêja nayê avakirin. Divê êdî ev heval jî fêm bike. Ez di vê mijarê de ne zilamek evdal û ne jî bê qabîliyetim. Ma ez çima heta vî temenê xwe ji bo azadiyê şer dimeşînim? Min jî dikariya bi aqilekî nêz bibim, di wateya burjuvaziya biçûk de hêlînek biçûk an jî du kesên bi hev re pir şadin bidim diyarkirin. Ma çima min nedikariya? Ma li gorî we derfetên min kêm bûn, an jî ji bo hestên cur be cur yên rêbertibûnê bidim diyarkirin vê dikim? Na! Dîsa bûyerek girêdayî azadiyê ye. Nirxek min a girêdana bi azadiyê ve heye. Ez neçarim bi vê ve girêdayî bim. Ez ji we zêdetir rêya feraseta hezkirina netewî diyar dikim. Heta di vê mijarê de zêde enternasyonalîzm heye. Divê mirov hişyar be. Em ê pir baldar bin. Em ê ne bi kes û hinek xisletên kesan ve

girêdayî bin, em ê hewl bidin xwe bigihînin têkîliyên exlaqî û hezkirinên girêdana wê bi nirxên eslî û bingehîn ve heye. Ger Rêberim, dê di vê mijarê de tevkariyek min jî hebe. Hûn nikarin bi qasî min xwedî hewldan bin. Lê belê, hinek mijarên ku we jî eleqedar dike hene. Lewma ji nû ve pêwendiyan binêrin, lê wêrek binêrin. Hêza xwe ya nûbûnê diyar bikin. Yeqîn dikim hûn vê jî wisa nakin meseleyek xururê ya ji rêzê. Ne wisa?

**M.S.:** Rêberê min, gelo dikarim tiştekê bêjim?

**X.:** Heval mînakek da. Ez tevlî heman nêrînê nabim. Şoreşvan jî hez dikin, lê şoreşvan bi nirxên şoreşgerî ve girêdayî dimînin. Ez vê yeqîn dikim. Ger nameşe jî, divê ji her du aliyan ve...

**R.P.:** Temam min fêm kir.

**X.:** Ji ber aliyek ne jidile lewma nameşe.

**R.P.:** Ne nameşe bes...

**X.:** Cewhera nêrîna heval seqete. Cidî nabîne û nanirxîne.

**R.P.:** Dikare bimeşe, ger bi wê re nebû, dikare bi te re bimeşe.

**X.:** Belê, li gorî min dikare bimeşe.

**R.P.:** Ez ji vê re jî tiştekê nabêjim. Dixwazim vê bêjim. Tê bîra min, min jî pêvajoyek jiyan kir. Ger bi we re evîndariyek mêrxasî hebe, li gorî min wê bişkînin. Hinekê jî wê tîne bîra min. Ev evîndariyek ku dema berê we tevan xeyal kiriye. Bi min re jî hat jiyîn. Hinekê jî ezmûnên me cidî bigirin û sûd werbigirin. Ev ji bo we başiya herî mezine. Rewşa feraseta şanaziya X. nejîn. Li ber şapeya hezkirinê nekevin. Hûn qadroyên PKK’ê ne. Xwe bispêrin me û ezmûnên me û derbas bikin. Divê ferasetên we yên evîndariyên hêsan nebin. Bila dilketinên we yên hêsan nebin. Dê hûn ê berz bibin. Em ne weke jin ne jî weke zilam rê nadin nêzîkbûnên hêsan ên weke “dil ketimê, evîndarî bandor li min kir, şewitîm” û napejirînin. Tişta ku divê hûn di vê mijarê de bikin,

xwe gihandina asta şerê PKK'ê ye. Asta şerê PKK'ê bi rastî jî di asta bêhempa de bihêz dike.

Heta ku jina azad û zilamê azad dernekeve holê, hûn ne dikarin jin ne jî zilam peyda bikin. Bi milyonan jin bê xwedî ne, di rewşa mirinê de ne, bi hezaran xelekên koletiyê ve girêdayî ne. Wan xelekan parçe parçe bikin, jinê azad bikin, bila jin weke deryayan biherike, bila weke sûlavê bi çoşe. Li welatê me jin hatiye kuştin. Yek ji karê yekemîn hûn bikin jî, herêmek ku ketin navê, wan xelekên ku jinê girê dide bibînin û qut bikin. Bila jin weke sûlavê beşdar bibe. Bila jin ji bo xwe li xwediyekê negere. Bila bizane zilamê Kurd çiqasî xetere, xwe dîl neke, bi erdê nekê yek. Ez encamên ezmûnên xwe ji we re dibêjim. Gelo tê fêmkirin?

Dema te xwe jidil da her tiştê ku şer amade dike, li kesayeta xwe nêrî, kesek ku gotinekê bike tine ye? Wê dem ê tu dikarî bêjî; "Min xwe gihandiye payeya herî bilind." Ez ji bilî vê jiyînê nabînim. Dema vê jî dibêjim, tenê rastiyekê bilêv dikim. Azadiya jinê di bin xerîzeyên civakê de tê çeloxwarîkirin. Bi qasî dixwazin pêwendî pêş bixin, ez li dijî dernakevim. Lê bi partî re şer nekin. Ger hûn dixwazin hevdu bigirin birevînin jî, jixwe digirin û direvin. Lê wateyek vê ya cuda heye. Evê misoger ji partî û mirovahî qut bike. Divê em di vê mijarê de pêngavekê bikin. Misoger pêdivî bi vê heye. Girêdana pirsgirêka jinê bi despotî, koletî, kirêtî, bê exlaqî û mêtîngeriyê ve heye. Kirêtiya van tiştê ez dibêjim tevê heye. Lewma em bi wan re şerek mezin dimeşînin. Ma paqijkirina wê hêsane? Ma ji kirêtbûnê derketin hêsane? Em hewl didin jiyanê rizgar bikin. Lê dema jiyan tê rizgarkirin, divê ev têkîlî jî bê rizgarkirin. Heta ku hûn vê têkîliyê rizgar nekin, nikarin jiyanê jî rizgar bikin. Ma dînim vî şerî dimeşînim? Elbet na! Hilbijartinek din nîne lewma. Tiştê ku dibêjim pir vekirîne. Ma em dikarin bêrûtî, beredayîtî û harbûnek

kesî bikin? Gelo mane divê em rihê yê ku vê tiştê dike jî jê bistînin?

Weke encam em ê vê bêjin: Yên ku rêgeza azadiya mezin kirêt dike, dê her tiştî kirêt bike. Dema we vedixwîne têkîliya azadiyê ya berz, tişta herî baş dike.

***Cotmeh 1991***

***Yên Di Cîhana Sermayê De Çi Bi Şêwaza Serdest Çi Jî Kole Dijîn,***
***Nikarin Di Mijara Rizgariya Jinê De Rê Ji Fikrek Afirîner Û Reftarên Azad Re Vekin!***

Hewl didin weke kevneşop rojek a jinê wate bidin 8'ê Adarê. Bi zanebûna vê mebestê ve ji bo jinê wateya rojek wisa çawa dikare bê ronîkirin? Mirov dikare tiştek nû bêje? Gelo mirov dikare di wateya azadî de, bike rojek tevkariyê? Di vê mijarê de hêza me çiqase? Qet nebe, weke tevgerek ku hewl dide rastiya miletek bi taybet hatiye jinwarkirin ji bingeh ve biguhere û azadiyê li ser vî bingehî bidest bixe, em dikarin hîn zêdetir hinek tiştan bêjin û helwestan pêş bixin.

Wisa tê fêmkirin, kesên herî zêde dikarin xwe azad bikin, bi qasî dikarin di vê mijarê de axaftinên rast bikin, ewqas jî dikarin ji hêla rizgariya jinê ve gavên cewherî bavêjin. Kesên cîhana milkiyet û cîhana serdestiyê çi bi şêwaza koletî çi jî ya serdest dijîn, di mijara rizgariya jinê de nikarin rê ji fikrek afirîner û reftarên azad re vekin. Dema ez xebatên xwe jî ji vê hêlê ve dinirxînim, pirsa ku "bi qasî hêza axaftina rast, hêza helwestan çiqasî dikarim pêş bixim" jî, bi asta xwe ya azadiya giştî re berçav digirim û her tim ji xwe dipirsim. Hêjî bê ku muhafezekariyê bikim, ji hêla ber bi pêşketinan vebûnê de nêzîkbûna xwe ya bûna xwediyê gotin û helwestên guncav berdewam dikim.

Mirov dikare bi mebesta vê rojê hinek tiştan bêje. Ger rojek lêhûrbûnê ye, ger weke rojek rizgariyê tê nirxandin –jixwe ev ji hêla me ve jî wisa ye- wê demê partiya me çi got û çi kir? Ger ev tevgerek ku ji bo rizgariya Kurdistanê tê hizirîn, divê carek din pirsên weke "çi got, çi kir û hîn zêdetir dikare çi bê kirin" bên ronîkirin. Di vê mijara xelekên di xêra wê de şer tên dayîn, van xelekên ku dem bi dem kesayetên me pir xirab xistine

û hêj kesayetên me ciwantiya xwe ne jiyayî dawiya wê tîne qutkirinê de gelek tiştên bên kirin hene. Lewma heta ku ev ronî nebin, zincîrên heyî neyên qetandin, em dihizirin ku ne şoreşa me ti wateyê rave dike, ne jî azadiya takekesî dikare bê jiyîn. Weke tevgerek ku em ji her hêlê ve şer dijîn, em jiyanek awarte jî her roj bi helwestek hûrûkûr dipejirînin. Di derbarê pirsgirêkek li ber çavan weke pirsgirêkek civakî tê dîtin û dîsa divê yekser girêdanan wê bi azadiyê re bê destgirtin de, em ji pirsa "ger derxistina pêş û zelalkirinek di cîh de ye" dikarin bi gotinên "belê, di cîh de ye" bibersivînin.

Bawer dikim divê em bi mebesta vê rojê kurte pratîka xwe vebêjin. Gelo em di vê mijarê de dikarin daneyên berfireh bigihînin encamek çawa? Yeqîn dikim nîqaşek di vê derbarê de guncave. Divê hêz û wêrekiya me ji vê re hebe. Nexasim di mijara Rêbertiyê de tiştên tên gotin û tên kirin, divê rê ji nîqaşên girîng re veke. Hewce dike valahiya heyî ya di vê qadê de bi şoreşgerbûna me bê dagirtin.

Hêjî dema em bi ser de diçin, dihizirin ku mijarek wisa ye mirov fikaran jê bike û gumanan bijî. Mijara ku bi qasî tabû tê nirxandine, mirov dide hizirandin ewqas jî bê pîvane. Nêzîkbûnek bê pîvan û nêzîkbûnek tabû di vê qadê de pir bibandore. Pir zêde bi şêweyên milkiyet, despotîzm û koletiyê ve girêdayî ye. Di heman demê de bi qasî xwedî girîngiyek jiyanî ye. Heta ku şêwaza cîhan û têkîliya li derdora pirsgirêka jinê ku qada pêwîste di cewhera jiyanê de bê rûniştandin dagir kiriye neyê fêmkirin, ger tişta tê behskirin azadî ye, helwesta ku ber bi vê azadiyê ve diçe neyê raberkirin, mirov nikare bêje şoreş gihiştiye armanca xwe. Di vê çarçovê de şoreş jî nikare ji koletiyê û pergala milkiyetê rizgar bibe. Ango heta ev pirsgirêk ronî nebe, li vir azadî û wekhevî neyê jiyîn, mirov nikare bêje dê civak li ser bingehek wekhev û azad pêş bikeve û veguhere. Ne zehmete ku asta pirsgirêka jinê ya heyî were vegotin. Nêzîkbûna kevneşop,

nêzîkbûna nûjen a qaşo kapîtalîzma Tirk hewl dide çareser bike yan jî pêş bixe, bi xetên giştî ve tên zanîn. Em pir li ser rawestiyan û di nava PKK'ê de zêde hat rexnekirin. Dema em li asta pirsgirêkên heyî dinêrin, tê dîtin ku ji ber ku Kemalîzm di vê mijarê de teqlîda Rojavayîyan dike, ne ji rastiya azadiya me re, ne jî ji pirsgirêkên me re nabe bersiv. Mirov dikare bêje weke saziya koletiyê ya herî bingehîn a nêzîkbûnên têkîlî, helwest û exlaqê kevneşop û şêweya jiyanê, aniye rewşek wisa ku mirov nikare nefes bigire. Heta nirxandina herî rast a di derbarê Kurdistan û pêwendiyên Kurd de bên kirin yek jê jî, şêwaza girtina vê qada pêwendiyê ye, şêwaza sergirtina wê ye. Bi kurtasî bi temamî şêwaza sazbûna wê ye. Jixwe ev li pêş hemû hewldanên azadbûnê astengiyek cidî ye. Heta ku ev xal neyê çareserkirin û rexnekirin, dê çareseriya xalên din jî pir kêm bimîne.

Weke ku pratîka PKK'ê pir hûrûkûr tê jiyîn, elbet ne dibû ku em bi van rastiyan re rûbirû neyên an jî ser bigirin û paşçav bikin. Bi vê re jî, destavêtina pirsgirêkê re xwe xeniqandin –jixwe gelek wisa dikin- û bi înkarek çors ve dijberî esasên şoreşê ketin jî nedibû. Ji ber vê helwesta me, îro tevlîbûna jinan pir zêde ji tevgera PKK'ê re çêdibe. Jin bi şêwazek ku ji gelekan re ecêb dihat di astek ne dihat payîn de beşdarî serhildanan û qadên xebatê yên cur be cur bû. Her çendî li ber çavan ecêb dihat dîtin jî, feraseta di nava me de serwer, helwest û reftarên me diyar dikir derfetên mezin dan pêngavên jinêbû. Her çendî li ber çavan ecêb dihat dîtin jî, feraseta di nava me de serwer, helwest û reftarên me diyar dikir derfetên mezin dan pêngavên jinê û ew kêşa nava têkoşînê. Ev jixweber pêş neket, encama helwestek pir bi zanebûn û plansazkirî bû. Hêjî tişta gelek ji we fêm nekirî, plansaziya rizgariya jinê ya di cewher de tê kirin, helwest û reftarên wê yên di cîh de bên raberkirine.

Wisa tê fêmkirin ku, helwesta herî rast pêwîste ev diyar de li ser mêzeya emeliyatê bê razandin, em weke sazûmaniyek

pêwendiyan bibînin û operasyona heyî bidomînin. Nexasim ev nêzîkbûna li ser vî bingehî di kesayeta Rêbertiyê de heyî, yeqîn dikim hûn jî li ser nîqaş bikin û rawestin, hûn ê jî fêm bikin. Şoreşa ku em dimeşînin, divê bi qasî qaşo ti şervanên azadiyê yên rojavayî newêrîne bikin bihêz be. Em nikarin bi nêrîna "civakên Rojhilata Navîn bermahiyên pir feodal dijîn" ve, dûrî ji helwesta azadîxwaz bisekinin. Jixwe dîroka Rojhilata Navîn, dîrokek ji rojavayiyan pêşketîtir û xwedî naverokek pir dewlemende. Lewra nêzîkbûna azadîxwaz, ger Rojavayîyan derbas bike pêwîste mirov şaşwaz nemîne. Ferdperestiya Rojava û azadiya di pîvanên kapîtalîzmê de ji mêj ve li ser vê mijarê girtiye û bi şêweyên nû yên koletiyê ve bûye sedema paşverûtiyê. Di mijara azadiyê de ji pêşketinê wêdetir, paşketinê dijî. Bêguman hin pêşketin derxistin holê, lê texrîbatên wê zêdetire. Lewma bê ku em çavên xwe berdin van nirxên azadiya Rojava, pêwîste em li dîroka xwe binêrin û bibînin ku gelek tiştên em bikin hene. Derketina gelan, di asta nasnameya netewî de xwe ravekirina azadiya civakî hewce ye. Bi qasî vê di mijarên nasnameya jinê û asta malbatî de jî pêdivî bi nûbûnek mezin heye. PKK hewl dide rêbertiya vê bike, di vê mijarê de bi qasî sondên azadiyê, hewl dide sazûmaniya çalekiyan jî pêş bixe.

Me di vê mijarê de dahûrînên berfireh çêkirin. Ez amade me ku di vê mijarê de tiştên nû vebêjim. Di fikir û vê mijarê de ji bo pêşxistina helwest ast hinekê xurte. Ger tengasiyên we hebin, bê ku şermiyê bijîn divê hûn rave bikin, wêrek bin ku xwe bigihînin a herî berz û jiyanê gengaz dike. Dema em roja xwe berçav digirin, em dikarin bêjin ku em tevgera azadiyê ya herî şoreşgerin. Lewra hêza me ya nîqaş û helwestan bilinde. Tevî evqas zehmetiyên bêrehm, me tehemûla gelek îşkenceyan kir, dikare nêzîkbûnek wêrek jî ji hemû pirsgirêkên girîng raber bike. Jixwe aliyê me ya herî xweser jî ev xale. Madem em evqasî balkêşin, madem evqas zehmetiyan dijîn û li ber xwe didin,

nexwe em ê jî ji bo her tiştî ya herî baş bêjin û xwe bigihînin helwesta herî azad. Bersiva ku em bidin evqas fedekariyan, şahadetên dîrokî –jin jî tevlî vê bûye- xwe gihandina raveya herî azad û şêwaza pêkanîna wê ye. Ev jî pêwîstiya rêzdariya li hember jiyana ku em dixwazin pêş bixine. Di vê mijarê de ya ji bo me jî herî hêja bûna xwediyê helwesta herî cidî ye. Pêwîste em bikarin wê cîhana ku feodalan û burjuvayên dawî çêbûyî ku girtine cardin vekin, tam weke rastiya şerekê nêzîkbûnên wan bi erdê re bikin yek û ber bi veguhertinê ve bibin. Di wê qinyatê de me wan cîhan di vê mijarê de ji bo me kirine jehir û derfetê jiyanê ne dane me. Wisa bi rêbazên mêtîngerî yên cuda ve bi rêbazên zext û zorê ve bi gelemperî li ser nirxan serdestiya xwe ava kirin, ev qad jî tam weke malê xwe nirxandin. Yên pere û hêza wan heyî ev qad desteser kirin û li gorî dilê xwe bikaranîn. Her çîna serdest a bilind bûyî, pêşî ev qad ji xwe re kir sermaye û deriyê wê girt.

Mînak ger hûn niha binêrin ew pergala mêtîngeriya Komara Tirk a em pê re şer dikin çawa jinê dagir dike û hewl dide desteser bike, hûn ê pirsgirêkê baştir fêm bikin. Begên Tirkan dema destpêkê hatine Rojhilata Navîn û civaka çînî pêş xistin – ew jî feodalbûne- em dibînin ku, axên hinek din dagir kirine, mirovên wan deran û jinên wan ji xwe re kirine kole. Di rewşa heyî de ew cîhana ku hûn jê bandor dibin û kesayeta ava dibe encama vê ye. Di metabûna jinê de rola Tirkan a piştî belavbûna wan a di nava Rojholata Navîn de pir heye. Heta dikare bê gotin, feodalên Tirkan, ji Ereban zêdetir koletî pêş xistine. Gelê Rojhilata Navîn ku îro koletiyê evqasî bi kûranî dijîn, neçarin di vir de para dagirkerî û desteserkirina Tirkan pir baş binirxînin. Di dîroka miletek evqasî hatiye xistin û jina evqasî hatiye xistin de, her wiha şênberiya di roja me de tê jiyîn de, têkîliya pergala serdestiya Tirk û pergala jiyanê xwedî bandorek diyarkere. Bêguman Ereban jî jin dîl girtin. Ez di mijara feraseta rasteqîn û

pêkanên Hz. Muhemmed de pir bi îdîa naxivim. Lê yeqîn dikim weke helwestekê, nexasim heta roja me ya îro weke kesayetek ku bandor li Rojhilata Navîn kiriye gelek aliyên ku mirov binirxîne hene. Bêguman şoreşa Îslamê rê ji pêşketina şaristaniyek feodalî re vekiriye. Lê belê şoreşa Îslamê jî bi temamî weke şoreşa feodalî nirxandin, nêrîna ku qet bandora wê ya azadiyê tine ye gotin, ne rasteqînî ye. Ev ji bo jinê jî wisa ye. Îro jina di bin kevneşopiya Îslamê de dijî, hêjî bi mebesta dozên serî pêçanê dikeve rojevê. Îslama ku bilind dibe, di wateyekê de hewl dide jinek nû jî ava bike. Di jiyana Hz. Muhammed de di mijara têkîliyên bi jinê re gelek aliyên ku mirov bal bidiyê hene. Li gorî min jî kêm kesan ev alî ferq kiriye. Nêzîkbûnên sofîkên di roja me de, divê baş bên fêmkirin çiqas girêdayî nêzîkbûnên Hz. Muhamede, yan jî hewce dibîne li gorî wî guncav be û çiqas dûrî wî ne. Ji bo vê dibêjim; pîvanên exlaqa Îslamî li ser pêwendiyan zêdetir serdestin. Nexasim jî di rewşa heyî de gel jî vê esas digire. Ji bo pêngavek pêş bikeve, pêwîste nêzîkbûnên Hz. Muhammed çawa bûn bên dîtin. Mijarek hêjayî lêkolînê ye. Bi qasî em dibînin, nêzîkbûna wî ya azadiyê cuda ye. Behsa 13 hevjîn û hejmarek zêde cariyeyên Hz. Muhammed tê kirin. Min nekarî lêkolîn bikim. Lê dema vê dike bi qasî daxwaza wî ya bilindkirina jinê tê kirin, tê gotin ku sedema ku ji eşîrên cur be cur girtinan jinan re xwestiye rê ji bandorên siyasî re veke. Ango jinê hem weke amûra bihêzbûna siyasî, hem jî weke amûra bilindbûnê digire dest. Bêguman di hemû kevneşopiyên siltanan ên pey re û nexasim di rejîmên siltanê yên Emewiyan, Osmaniyan, Selçûkiyan û Rojhilata Navîn de, sedema pêşketina statûya jinê ya cuda xwe dispêre vê helwestê. Saziya cariyan, zewaca pir hejmar, bûyera ji xwe re 4-5 jin girtin a ku hêjî berdewame, weke hukmê şerîatê di rojevê de ye. Ya rastî pêwîste mirov di destpêkê de weke helwestek siyasî û helwestek azadiyê bihizire. Keçek Hz. Muhammed a bi navê Fatma heye. Tê gotin ku kesayetek pir

hesas û şiyare. Dikare bê gotin bilindbûnekê dijî. Hêjî navê gelek ji we ji vir hatiye girtin. Navên weke Eyşê, Fatma û Zeynep, ji beyta Hz. Muhemmed'in. Ango hevjîn, keç û neviyên wî ne. Divê ev bên dîtin.

Jixwe dema mirov li Osmaniyan dinêre, mirov dibîne ku gelek ferman derxistine. Mînak, dema Fatîh Sitenbolê dagir dike, dibêje; "Hûn dikarin sê rojan jin jî di navê de her tiştî talan bikin û tertûbelav bikin." Weke tê zanîn kevneşopiyek Bîzansan a arîstokrat û pir malbatên arîstokrat hene. Ne weke Osmaniyane. Her cure talanê dikin, Yenîçerî dikevin her malê, çiqas jin, keç û kur hebin dibin malên xwe. Ya rastî ev merheleyek kolekirinê ya pir xirabe. Ev jî tenê li Sitenbolê pêş nakeve. Dema Osmanî li Anatolyê belav dibin, piştî ku zilamên şerker an jî zilamên serwer dikujin, bi temamî bermahiyên din desteser dikin. Hêjî nirxandinên ku Yewnanî tirsonekin ên weke "Yewnana Qehbik" nirxandin tên kirin. Lê di rastiyê de ev jî encama sepanekê ye. Elbet ev xistinek pir xirabe. Xistina zayendekê ye. Weke desteser bike, bibe malê û piştre jî bike kole! Piştî vê li dijî Yenîçeriyên Osmaniyan, ne gengaze ku bêjin "azadiya min heye" an jî " pêwîste li hemberî te hinekê xwe biparêzim." Prensan jî yekser dikin kole, bê ku tiştekê bipirsin di malan de tên girtin.

Ev kevneşopî her tim li ser civaka Kurd jî tê pêkanîn. Dibe ku hûn niha hinekê xwe azad, an jî xwe dî dildarî û îradeyê bibînin. Lê ev jî hinekê xwe xapandine. Dema hûn îmha û talan di asta netewî de berçav bigirin, hûn ê asta azadiya xwe jî baş bibînin. Di bin vê de ev pêkanîn hene. Bi rastî jî kesayetên me, kesayetên ku di dem ên Osmaniyan de hatîn pêşxistine. Ev kesayet mîrasa malbatê ye. Weke ku ne azade, pir bê xêr û kole ye. Kemalîzm jî misoger şopdarê domandina vê ya herî hovane ye. M. Kemal hemû feraset û sepana xwe, di domandina vê kevneşopiyê de raber kiriye. Di mijara jinê de jî wisa ye. Di vir de azadî tine ye. Kesayetan digirin û zimanê wan jê dikin. Dema em

dibêjin; “Em miletê me kirine jinik” em behsa vê dikin. Misoger divê hêsan neyê nirxandin. Ger miletek kirine jinik, bûna jinik çiye? Ev pir girînge.

Hewce dike em hinek din kevneşopiyên siltanên Osmaniyan bibîra we bînin. Ez ê yek-du mînakan ji Fatîh bidim. Ji ber ku damezrînerê împaratoriyê û kesayetek mohra xwe ya bingehîn lê daye. Fatîh li cihên ku dagir kiriye, ne tenê xwedî sepanên ku jin dîl girtiye, -jixwe ev hişmendiyek Osmaniyane- di heman demê de zarokên kur jî dîl digire. Heta Fatîh, prensek ku zarokê malmezinek herî pêş de ya xwedî kevneşopiyek arîstokratên bihêz ên Bîzansiyan di qesra xwe de dîl digire. Dibe ku ev bi fikra vê malbatê raqîbê xwe dibîne, yan jî dê ev kevneşopî dema pêş bibe belaya serê wî, yan jî bi hêrsa serdestî û deshilatiyê jî ev kiribe. Ev zêde ne girînge. Di encamê de prensek di qesra xwe de dîl girtin –jixwe hûn dizanin, prens pir zilamtiyê dijîn û pir bi xururin- wan xistina rewşek hevcînselê xwe ye. Ev girînge. Dîsa ji malmezinek Bîzansiyan du zarokên kur dixwaze. Dibêje; “Wê tu zarokên xwe ji min re bişînî.” Tevî ku malmezinê Bîzans dibêje; “Ez ê her tiştê xwe bidim, lê van her du zarokên xwe yên kur nadim”, bi zorê wan tîne. Yeqîn dikim serê zilam jî jê dike. Kiryarek pir wehşî ye! Elbet siltan wisa bike, dê paşayên siltan jî deh qetî zêdetir vê bikin. Belê weke hûn dizanin, gelên li Balkanan, nexasim xistina gelê Yewnan hinekê jî wisa pêk tînin. Şêweyek pir ecêb ya xistin û heqaretê ye! Her çendî niha ji bo we weke sembol jî bixwiyê, gelan wisa dikin jinik.

Ya rastî pêvajoya desthilatiya Osmaniyan zêde xirabe. Ji bo bê fêmkirin pêvajoya desthilatiya Osmaniyan çiqas wehşî ye, em dikarin bêjin siltan çawa 18 şehzadeyên ku berendamên textin xeniqandiye. Siltan desthilatiya xwe wisa saxlem dike. Şehzadeyan di qefesan de digirin, piştre dixeniqînin û peyre jî merasîm li dar dixin û binax dikin. Ev sepan jî pir berfireh tê

kirin. Ev jî sepanek hovane ye. Ger Siltan û Qesr wisa be kî dizane yên bin wî re çi dikin!

Qaşo em li Tirkiyê fêrî dîrokê dibin, lê em nû bi nû fêm dikin ku, rastî pir cuda ne. Ji bo mirovan ji şeref û heysiyeta wan dûr bixin, di asta herî ketî de bihêlin, rêbaza herî zêde bikar tînin wisa ye. Mirov zehmetiyê dijî ku fêm bike. Ev têkîlî û ev kevneşop heta ku şopa xwe nehêle di carekê de nayê derbaskirin. Weke din jî heta ku şoreşek azadiyê ya cidî li ser vê neyê ferzkirin, encam nayê girtin. Deka em M. Kemal bînin berçavên xwe; Ti ferqa wî ya padîşahekê Osmaniyan nîne. Dema desthilatiya xwe pêş dixe, -ev pir girînge, ji ber ku ev di pêvajoya desthilatiyê de derdikevin holê- em dibînin ku pêkanek zalimtir dimeşîne. Çi li şehzadeyan kiribin, li dijî hevkarên desthilatiyê yên nêzî xwe jî heman tişt sepandiye. Ji qadroyên Îttîhat-i Terakkî ditirse û bê sedem jî gelek ji wan tine dike. Dîsa komînîstan tine dike. Pîvana di vir de ne netewperestî ye, ji ber îttîhatparêz jî netewperestin. Hinekê jî van weke encama çanda siltanan û padîşahan dike. Weke din nêzîkbûnên wî yên ji jinê re jî hene. Çend roj berê hunermendek Macarî yê binavûdeng Zsa Zsa Gabor di çapemeniyê de daxwiyaniyek dabû. Di salên ku bi ji cebanên komînîstan Burhan Belge re zewicî de, dema bi M. Kemal re li ser mêzeyekê meyxoşa bi alkol vedixwe, M. Kemal ji mêrê jinê re dibêje; “Birêz Burhan, îşev ez ê hevjîna te bibim malê.” Qaşo birêz Burhan jî dibêje; “na.” Li gorî gotina jinê ev gotina M. Kemal fermaneke. Ango divê misoger bicîh bîne. Ferman bicîh hatiye yan na, ev zêde ne girînge. Lê di vir de diyar dibe kevneşopiyek ji dema Osmaniyan xirabtir di pêvajoya Komarê de û di qesra Çankaya bi xwe de tê pêşxistin. Li wir bi şêweyek sazûmankirî yê beramberî xwe xistin, darbekirin û pir xirab bikaranîn tê jiyîn. Di vê wateyê de, misoger M. Kemal jî şopdarek berdewamkirina kevneşopiya siltantiya Osmaniyane.

Heta ku şansê azadiyê ji azadiya jinê re neyê dayîn, divê neyê hizirîn ku dê şansê azadiyê ji civakê re bê dayîn. Di vê wateyê de em dizanin M. Kemal çawa komkujiyek dijwar li ser komînîstan ferz kiriye û komek komînîst anîne lîstokê û xeniqandine. Dîsa tê zanîn çawa gelek civatên Misilmanan qetil kiriye, ango yên kêmekî li hemberî xwe asteng dîtine bi wehşî çewsandine. Ev bûyer di dîroka Komarê de hatine jiyîn. Mînaka Şêx Seît li ber çavane. Jixwe ji ber hevrêyên xwe alternarîfa desthilatî dibîne, hemûyan tasfiye dike. Di nava wan de gelek paşa û îttîhatperwer jî hene. Encam çiye, Yek Siltan! Kesê ku teşe dide Komara Tirkiyê, civaka wê û jinê M. Kemale. Elbet paşayek Osmaniyan ê ku wî jî xwe dispartayê hebû. Ji siltan Vahdettîn destûr digirt. Ango ew jî kesayetek di nava vê kevneşopiyê de mezin bûyî, hez bidest xistibû. Niha jî tê gotin zarokek wî yê feqîr heye. Elbet bi şerkirin û têkoşînê nebû M. Kemal. Hêj di dibistana seretayî de wî digirin dibistana siltaniyê. Dibistana herbê dixwîne, di artêşa wan de mezin dibe û hêz bidest dixe. Şerên ku dane meşandin çine? Şerên feodal û emperyalîstin. Di vê navêndê de mezin dibe û dijî. Li ser vî bingehî tê Anatoliyê û qaşo her çendî bê gotin "tevgera rizgarî", "komare", di rastiyê de dibe damezrînerê dîktatoriyek ji ya kevin xirabtir.

Belê tê zanîn ku, di avabûna we de ya ku bandora herî bingehîn saz dike ev sazî ye. We hemûyan para xwe ji wir girtiye. Mînak dema li ser vê bingehê em Kurd dibin mijara gotinê, ma em ji rewşa jinê xirabtir nekirin? Deka li rêberên îsyanên Kurd ên berê binêrin, qet ji kiryarên siltanan ne cudatire. Heta dikarim hin mînakan bidim; Dema li Dêrsimê îsyan hat çewsandin an jî li gorî gotinên wan "wehşî" hatin çewsandin, nêzîkbûna serbazên Tirk ên jinê re tên zanîn. Di vê mijarê de gelek rastî hatine veşartin. Dema Yenîçeriyan Stenbol talan kirin, çawa bi zorê jin û keç desteser kirin, nêzîkbûnên serbazên Tirk jî bi heman şêwazî bû. Elbet li Dêrsimê ji sedî salan ve kevneşopiyek hem azadiya jinê,

hem jî azadiya eşîretan hêjî tê jiyîn. Ji ber ku xwedî kevneşopiyek Elewiyane radestî yek siltanên Osmaniyan nebûne, di astekê de serfiraziya azadiya xwe parastine. Ev serbazên Tirk –jixwe ew jî zilamên weke yenîçeriyan kevneşopiya Osmaniyan dijîne- bê pirs hewl dane jinan desteser bikin. Piştî zilam hatine tasfiyekirin, dixwazin weke keçên Bîzansiyan li jinan bikin û di encamê de hejmarek zêde jin xwe ji kendalan davêjin. Ev xalek girînge. Ev meseleya xwe ji kendalan avêtin, mirov dikare bi mijara di asta herî xirab de kolekirin û helwestên dervî mirovahî ve girê bide. Zilam têkîliyek wisa ferz dike, di wê kêliyê de ew jî neçar dimînin xwe di kendalan de davêjin. Ev girînge. Ji ber ku ne têkîliyek asayî ye. Di rastiyê de xwediyê desthilatiyê ye, xwediyê pereyane, ger hinek din nêzîkbûnek mirovbûn bike dikare bikişîne xwe. Jixwe niha jî baş dikişînin xwe. Lê mixabin ji ber ku di wê demê de bi şêwaza talankirin û desteserkirinê di asta herî ketî de nêz dibûn, bê ku cudabûna gelo mirove, yan jî lawire bikin, weke em dizanin çîrokên pir bi êş derketin holê. Ev şêweyeke. Ma piştî wê li Dêrsimê çi hat kirin? Ji pêvajoya derguşê ve cardin bi şêweyek pir zalîmane Yenîçerîbûn pêk anîn. Weke bi kêrekê girêdana wê ya bi dîrokê re qut bike û li ser vî bingehî li Kurdistanê hewldana avakirina cureyek nû dan destpêkirin. Vê ji bîr nekin. Hûn encamê sepanek wisa ne. Di jiyana we de, di teşegirtina kesayeta we ya nû de, bi qasî vê komkujiyê, ewqas jî bandora bûyera ku em dibêjin “terora spî” û “pêkana Tirk” pir diyarker dibe. Hûn dibin sepanek pir bi sazûmankirî de, ji serfirazî û azadiya mirov a bingehîn qut hatin mezinkirin. Tiştek bi navê şeref û heysiyetê nehiştin. Ji ber ku yên xwestin van biparêzin di kendalan de man. Niha jî hin hevalên me wêjevaniyê ji me re dikin. Heta hin hevalên ji Dêrsimê xwe pir helbestvan û wêjevan dibînin. Ez jî dixwazim vê ji wan bipirsim; Gelo ev rastiya kendalê ku sedan mînakê wê hene û hêjî di hişê gelek mirovan de zindî ye çawa derket holê? Ev kesên helbestvanin û

pir wêjevaniyê dikin, ma çima wêjeya vê pêş naxin? Gelek ji we zarokên wane. Ev jî nakokiyek mezine. Niha jî bi qasî min bihîstiye di rastiya Dêrsimê de, di têkîliyên jin û zilam de rewşa herî xirab tê jiyîn. Weke ku tiştên hatîn kirin li wan nekirine, kesên hêj duh xwe di wan kendalan de avêtîn ne dê, bav, dapîr û bapîrên wane, ji kemalîzmê xirabtir jiyanek ketî esas digirin. Dema em vê jiyanê jî rexne dikin, qaşo dibêjin; “Dê APO bingeha Dêrsimiyan rizgar bike.” Ya rastî kesê vê dibêje, tîpên kemalîzmê ava kirine. Di kêliya em li pey tola Dêrsimê dimeşîn de, ev tîpên hezar carî radestî kemalîzê bûne, ketî û xirab, van gotinan vedibêjin. Ev ne Dêrsimiyê eslî ne. Bejin û bala wan hinekê Dêrsimê tîne hişê mirov, lê di cewher de ketîne, tîpên di qesrên Fatîh Siltan Mehmed de ji nû ve hatine pêşxistinin. Divê mirov rojekê bi qirika wan re baş bigire.

Hûn jî dizanin, di qesrên Osmaniyan de begên xortên hundurîn ên xizmeta dewletê dikirin hebûn. Erka van tev ji nû ve xesandina xortan, ango dûrî desthilatdariyê hiştin bû. Elbet ev bi şêweya çors pêk danîn. Aliyek din jî bi temamî ji hêla çandî û kesayetî ve civakek dihat xesandin hebû. Herî zêde jî ev rewş li Dêrsimê pêş xistin. Niha yek dûjînekê ji we re bike, zilehekê li we bixe, hûn ranakin. Deka vê berçavan bigirin û radeya sepanên Dêrsimê kîjan giranin? Çawa dibe? Rewşek ji xefletê jî wêdetir îxanetek wisa tê jiyîn. Ji bo min ne asayî ye. Ango ez nabêjim di îsyanê de her tişt hat kirin û baş hat hizirîn. Lê yeqîn nakim nêzîkbûna ji bîrkirina vê rastiyê û li ser bingeha înkarê jiyanek rêzbar heye. Jixwe ji ber vê bertek raber dikim û helwest pêş dixim.

Ji hêla PKK’ê ve ketina nava Dêrsimê yan jî bi temamî ketina nava Kurdistanê, xwe dispêre ferasetek wisa dîrokî. Armanca me ew rûxandina kesayetî ya bi zorê li ser Dêrsimê dihat ferzkirin derxistina holê ye. Hêjî kesên di bin bandora vê xirabûna kesayetê de her kêlî derdikevin beramberî me. Kesên

herî zêde muxalefetê dikin û parçe dike evdere. Çima? Çima kesayeta Partî napejiranîn? Tişta ku dijmin bi te kirî diyare, hêjî komên hestiyan li qiraxên Munzurê û di wan şikeftan de hene. Vêca çi karê te li Enqere, Sitenbolê û Ewrûpa heye digerî? Min duh di çapemeniyê de xwend, weke din hûn dizanin di radyo de jî gotin, di nava SHP (Partiya Gel a Sosyalîst) de helwesta li dijî rewşa awarte ya ku PKK an jî rizgariya me ya netewî areste dike yek ji saziyên şerê taybet a herî girînge tê nîqaşkirin. Komek wekîl ji bo bê rakirin helwest raber dikin, du kesên ji Dêrsimê jî li dijî vê helwestê derdikevin. Dibêjin; "Divê rewşa awarte neyê rakirin." Ew jî Kamer Genç û Mehmet Moxultay ên zimandirêj û badilhewa ne. Qaşo endamên meclîsê yên herî demokratin. Ev rêbertiya rewşa awarte û şerê taybet çima pêwîste bimîne dikin. hewl didin komekê qane bikin û biçewsînin.

Hûn li ku derê bixwazin binêrin. Kesên li Ewrûpa herî zû têkil vê jiyana Ewrûpa dibin ev kesimin. Di refên me de hin kesayet hebûn. Tenê ji bo van têkîliyan, ango ji ber çanda kemalîst pir berfireh dijiyan, di hewldana tasfiyekirina rêxistinê de rola sereke lîstin. Meseleyek jinê kirin rojevê, meseleyek jiyanê kirin rojevê, ne nirxên exlaqî, ne nirxên rêxistinê û ne jî nirxê berxwedanê hiştin. Hêjî sedema ku Dêrsim nikare rola xwe bilîze ev kesayetin. Elbet dema kemalîzm li vê qadê dida û qetil dikir û paşê jî xist, elbet dê ji çêkera ku ji me re jî maye tîpên wisa derbikevin.

Di encamê de, li dijî gelek rêbazên wehşî, bi rastî jî azadiyek ku di nava sedî salan de nehatiye girtin heye, serfirazî heye, ev misogere. Dema em keç û mirovên xwe yên kêliya ku ewêrîş dike xwe terkî Munzuran û kendalan dikin tînin ber çavên xwe, pêwîste em ji nû ve li dîrokê binêrin, li pey wê helandina kesayet baş bibînin, baş bizanin xalên ku pêwîste bên pejirandin û bên redkirin çine. Ev di heman demê de gava yekem a bidestxistina azadî û serfiraziyê ye. Ez jî dibêjim ev berfireh bûye.

Niha jî Êlîh hat beramberî me. Pir ecêbe, ji ber provakasyonekê, me hewce dît hinek din mijûl bibin. Polîs li vê qadê keçên guncav dixe. Piştî ku bi her cure jiyana xirab re derbas dike dişîne nav refên me. Jixwe me îro jî agahî girt, bi vî şêweyî hinek kes hatine şandin. Kar û barê provakatorê Mehmet Şener jî li vir xebatên xistinê dana meşandin bû. Yên xefka provakasyona Dêrsimê jî, provakasyona Êlihê jî heman tişte. –MÎT, Daîra Şerê Taybete- li wir wisa meşandiye, li vir jî wisa dimeşîne. Gelek reben hatine xistin. Jixwe serê werîs di destê wan de ye. Van keç û xortan dixin û dixin nava her cure jiyana xirab. Peyre jî weke navendên belavkirina nexweşiyê, weke navendên belavkirinê li her alî û nava hemû bîrîmên me belav dikin. Em jî bi zorê hewl didin hewldanên wan ên rûxandinê rawestînin. Şandin vir jî. Hin provakator û hinek kesên din jî hatin vir. Hêza rûxandina di provakator re, hêza belavkirinê û êrîşa ku artêşa dijmin a herî baş nekarê pêş bixe jî min dît. Me nêzîkbûna ji jinê re û çawa nêzîkbûnên me jî hem êz dikin dît.

Elbet em weke we li pêwendiyan nanêrin. Bi qasî ji destê me tê hinek din kûr û di pîvanên hêza xwe de em hewl didin pêwendiyan pêş bixin. Tê zanîn hinek keçên ehmeq çawa ji nişkê ve dibe koleya hevalê xwe. Ez vêna ji bo bê zanîn kemalîzm neyekser di nava refên me de çawa texrîbatan ava dike, provakator di refên me de çawa xirabiyan pêş dixin weke mînak dibêjin. Elbet dikarin her tiştî bi kesek evqasî koranî hatiye girêdan û kûr çûye bikin. Despotek ji van helwestan re rê vedike. Keçên wisa piştî ku hest û kesayetên xwe dixin, êdî nikarin bilind bibin. Êdî ser xwe ve nayên. Nexasim hevalên ku di zindanê de mane vê baştir dizanin. Ji ber provakator li wir jî ev rewş ava kiriye. Jixwe hûn jî dizanin, çawa bênamûsî, durû, çewsîner –jin dibe zilam dibe- nirxên me li erdê daye. Ev di nirxandinan de jî heye. Kemalîzm wisa ji PKK'ê tolê digire. Ji PKK'ê û rêbaza

mezinkirina milîtanên şoreşger ên PKK’ê û mezinkirina jina azad tolê digire. Bi rastî jî ev plansaziyek pir bi zanebûne.

Niha hinek rastiyên ku min bi xwe jiyan kirîn hene. Çi di milîtanbûnê de, çi di azadbûna jinê de ji bo hêsan nekevim, bikarim bimeşim, şer bikim, min hewce dît ku ji eniya şer a gerim zêdetir hîn zêdetir bi taktîkî nêz bibim û helwestek wisa esas bigirim. Ango weke zilamekê, hêj di serdema dibistanê ve hesasiyetek min li hember van têkîliyan heye. Elbet ev di nava pêvajoyê de hîn zêdetir pêş ket. Ev têkîliyên feraseta şaristaniya “modernîzma” kemalîzmê hêdî hêdî pêş xistî, her ku dibistan hat xwestin hîn zêdetir xwe ferz dike. Hûn jî dizanin, gelemperî Kurdbûn biçûk tê dîtin. Mînak çavdêriya min a destpêkê wisa bû; “Xwedê bela xwe bide, ez di nav malbatek çawa de ji dayîk bûme.” Yeqîn dikim ji ber hêj mirov di dibistana seretayî de ye wisa pêş dikevê ye; “Ji ber mohra Kurdbûnê li min dane, pêşiya min jî hatiye girtin.” Nizanim, hestên we çawa pêş dikevin. Ango bi şêweyek “xweziya Kurdewarî nebûya, gelo di eslê min de Tirkbûn nîne, deka lêkolîn bikim” nêzîkbûnên heyî min dîtibû. Lewra hêj di destpêka dibistana seretayî de, Kurdbûn winda dike. Nexwe wê tu dil bertî Tirkbûnê, ji bo vê jî bibe duvik, bibe hemal, cil û her tiştên xwe biguhere, hingê dibe ku tu bibî karmend! Min ev bi çavên xwe dît. Ango ji bo bibe mamosteyek Tirk, çawa pir reng li xwe kirin û xwe firotin. Min ev bi hevalên xwe yên herî nêz û hevalên xwe yên zaroktî re dîtin.

Hûn jî dizanin em hêj wê demê li hember van xwedî helwest bûn. Ji hêlekê ve helwestên wisa bi me re pêş diket û bertek jî pêş diket. Ew sal tên bîra min. Elbet fantaziyên zaroktî ne. Nêzîkbûnek min bi şêweya “ez çawa dikarim bibim fermandarê artêşekê ku bikarim dijminek veşartî re şer bikim” hebûn. Azweriya min a bûna leşker hêj di wê demê de hebû. Min di hevpeyvînekê de jî vegotibû. Niyeta min a çûna dibistanên leşkerî, ji ji bo bûna serbazek Tirk ê baş bû. Yeqîn dikim di vir

de, dibe ku ji ber bandora hêzê di artêşe de kom dibû lewma ev bi min re pêş diket. Bêguman di wê demê de fikrek me weke “bi xebata bîrdozî û rêxistinî ve xwe gihandina hêza leşkerî tine bû.” Tenê li hemberî min rastiyek artêşê ya xwedî hêz û rastiyek leşkerî hebû. Ger tu dixwazî bikujî, bibî xwediyê hêzê, wê tu bibî leşker! Wê demê dibistanên wan hene, wê tu jî biçî dibistanên wan! Di vê armancê de jî ji fikrek “ez ê weke serbazê Tirk tevbigerim” zêdetir, di plansaziya hest de leşker, hêzê rave dike. lewma nêrîna nexwe ji botu hinek tiştan bikî divê tu bibî leşker hebû! Ya rastî ev jî amajeyek îsyanê ye. Heta ez pir xemgîn bûm ku “ez ê nekarim biçim van dibistanan.” Dikarim bêjim ku min rojên xwe yên herî bifikar di wê demê de jiyan.

Her yek ji we cîhanek dixwest. Me jî dixwest. Em di pêvajoyên gelekî bûhranê derbas bûn. Ji bohûn ji nû ve xwe şîrove bikin, cuda dibin leşker, dibin fermandar û behsa pêwendiyên azad dikin. Ji bo van ronî bikim vê dibêjim. Belê pêwendiya jinê jî di wê demê de xwe ferz kir û em ber bi pirsa “divê nêzîkbûn çawa be” ve birin. Me jina di nava kevneşopiyên feodal de li derdora xwe û di nava malbata xwe de dît. Min dem bi dem ev jî ji we re vegot. Min wê demê jî ev pêwendî ecêb dîtibûn. Ango di bin pergala qelenê de, ji qadên dûr, bê ku qet bibîne, binase, dihatin xizmên te yan jî xwîşka te weke metayekê digirtin, ji nişkê ve birina wan, tam ne helwestek azad jî be min ecêb didît û nedipejirand. Ango nêzîkbûnek min bi şêweya “ev kar çawa dibe, hêj keç nas nekirî di carekê de girt û bir” pêş diket. Her çendî sînordar jî be, hestewar jî be bertek pêş diket, gumanên weke “diviya ne wisa bûya” û çavdêriyên min hebûn.

Nêzîkbûna Kemalîst a "nûjen” cudatir diyar dibû. Li wir jin an jî keç xwe cuda pêşkêş dike. Berî her tiştî pîvanên dewlemendî serwere. Gelek ji we vê dizane. Hêjî wisa ye. Di vê mijarê de hêjî pîvanên çîna serdest, çîna dewlemend esas tên girtin. Me her tim ev vekirî dît. Ma qey gengaze ku di wan

mercan de li ser pêwendiya jinekê azadî bê ferzkirin! Hêza wê demê, rewşa karbidestiya me, pir sînordar bû û ya li ser asta pêwendiyan serwer jî teqez hêzên ku çanda kemalîst, dewlemendiya kemalîst di destê xwe de digirt bûn. Ev ji hêla her du cînsan ve –jin û mêr- qet ferq ne dikir û her ku diçû bi şêweyek zextê xwe li ser me ferz dikir. Wisa jî bi qasî li hember darezên nirxên feodal, li hember darezên nirxên kemalîzma nûjen jî bertek pêş diket. Hûn jî dizanin her ku di vê mijarê de pêşketin çêbû me jî xwe di nava şerekê de dît. Yeqîn dikim tiştên ku min di van mijaran de kirin, hinekê ji tiştên ku weke kirin û jiyan cuda ye. Êdî ev ji min re bû fêrbûnek, an jî xisletek çêbûna min, an jî şêwaza mezinbûna min e ez jî nizanim. Ez kar hema di carekê de naqedînim û ser nagirim, li ser kar fikarên min zêde û kûr dibin. Serkeftin hêsan çênabe, lê binkeftinê jî wisa hêsan ji bo xwe napejirînim. Vê jî weke şêweyek hesabxwestinek baş dinirxînim û ji bo min dibe şêwazek nêzîkbûnê. Bi qasî weke nêzîkbûnek siyasî û aborî nêzî hêza giştî dibim, ewqas jî hewl didim di mijara jinê vê helwestê wisa pêş bixim.

Min di vê pêvajoyê de ev dît; dema me destpêkê dest avêt xebatên guruba yekemîn, hêj em di nava pergalê de bûn, min fêm kir ku em ê nekarin li ser bingeha pîvanên Kemalîst nêzî jinê bibin. Li Stenbol û Enqereyê mam. Lê dîsa jî ne hêz, ne wêrektî û ne jî meyla min hebû ku nêz bibim. Li gorî min hûn xwe di vê mijarê de zêde ferz dikin û dixapînin. Ez di wan salan de ne wisa bûm. Tê bîra min wê demê hevalek min ji Amed’ê hebû. Hevalek pir bi bela bû. Nizanim saxe yan jî miriye. Wî li Siyasal’ê bûyerek derxist, yê nebihîstî nema. Her roj ji bo keçekê şer dikir, carina jî kêra xwe derdixist qiyamet radikir. Kurdê me jî her tim min dihedirand. Min hewl dida bihedirînim lê dîsa jî wî her roj xwe dixwar. Weke din bûyerek wî ya din hebû. Di cîhanê de helwesta Kurd a herî rezîlane derket holê. Lewma jê tirsiyam û qut bûm. Min got; “Bila din a wisa neyê” û xwe jê parast. Lê

nexasim dema em ketin pêvajoya şoreşê de, ji bo van hinek din çareserî hewce dike.

Nexasim ji bo van hevalên ciwan re tevkariyê bike, mijar seresere û hêsan neyê destgirtin pêwîste heye mirov mijarê hinek din veke. Di wê demê de hinek pêwendiyên ku me dixwest pêş bixin hebûn. Hinek ceribandinên me hene. Min di vê pêvajoyê de ev dît; Asta jina heyî, asta têkîliya jin û zilam a heyî û civakê – nexasim asta nîv kemalîst, nîv feodalî- bi qasî tê zanîn zêdetir di asta siyasî de ye. Ev bi gelemperî ye. Niha PKK'ê tevgera azadiyê daye destpêkirin û wisa gelek nêrînên feodalî û kemalîstî hilweşandiye. Ev mijarek dine. Ev encamek şer derxistî holê ye. Lê asta derxistî pêş, asta ku hêj PKK'ê ne hilweşandiye, ne girtiye beramberî xwe pir ketî ye. Lewra, ger kes rast nêzî vî karî nebe û dev ji xwe berde, yan dê bibe axayek kemalîst, an jî bibe hemalek. Yeqîn nakim ji bilî vê ti vebijêrk hebe. Ji we re behsa mînakan dikim. Ango ger hûn xwe weke Kurdek çors ferz bikin, hûn ê rezîl bibin. Pîvana Kemalîst a di vê mijarê de hinek din pêş de ye. Nûjentiya wî nêzîkbûna feodalî derbas dike. Ango huquqa wî heye, kevneşopiya wî heye, exlaqê wî heye. Şansê serkeftinê nade. Hêjaye ku mirov bandora wê ya li ser kesayeta Kurd lêkolîn bike. Nexasim ger kesayeta Kurd ji bandora kemalîzmê evqasî darbe xwaribe, dîsa di vê mijarê de çîna hevkar a feodal evqasî ber bi înkara netewî ve çûbe, di vir de nûjentiya kemalîzmê li ser jin û saziya malbatê xwedî bandorek mezine. Destê her axayek Kurd, an jî hevkarek Kurd li Enqerê ye. Yan jî li metrepolek dine û bi wir ve hatiye girêdan. Ev pir zêde pêş dikeve û jina Kurd jî darbeyek mezin ji vê xwariye. Axayê Kurd, mezinên Kurd, eşrafiyên Kurd, li ser bingeha îxanet û înkarê ber bi pîvanên kemalîstê ve hatine veguhertin, jin jî pehînek din xwariye. Lewma hîn zêdetir hatiye derkirin, bê ziman û bê çare hatiye hiştin. Piştî me ev weke babetekê diyar kir, di derbasbûna nêvenga partiyê de, divê bersivek ji pirsa “ma gengaze ku bi pîvanên pergala asayî ya

heyî ve derfeta gavavêtinê bê bidestxin” bê dîtin. Carina li pîvanên we dinêrim. An hûn bê zanebûn van pîvanên heyî li ser me ferz dikin, an jî hinekê jî bi zanebûn dikin. Hêjî hûn wê helwesta burjuvaziya biçûk a xwe tam tevlî partî nake, seresere yan jî hesaban dike pîvanên pergalê didin jiyîn. Jin û zilam ferq nake. Ango mirov dikare bêje pergala heyî hûn ji nû ve hilberandine, mezin kirine û berdane naverastê. Dibe ku ji bo we jiyanek asayî be, lê mixabin şêwaza hatine we ji serada polîtîkayên feodal, hevkar û kemalîstê re derbas bûne. Yan jor an jî jêra wî, bi şêweya yan bûna hemalê hevkar, an jî bûna begê wî de, an jî di seknek ku herduyan pêkve dijî heye. Feraseta dibêje; “Nekarî tevlê bibim, di bûhranê de me, nekarî bihizirim”, çavkaniya xwe misoger ji vê bingeha dîrokî ya şênber digire. Min ev hemû di pêvajoya xwe ya şoreşgerbûnê de dahûrandin. Li pêwendiyan dinêrim, keç û xort hemû jî şêwaza çêbûnên burjuvaziya biçûkin. Anjî ger hinekê xwe dispêre kesîma jorîn û pêve tê girêdan, xwe dispêre hevkaran, ev hîn cudatir derdikeve holê. Yek xame, haya xwe ji tiştekî nîne, rebena xweda ye, yê din jî weke çewsînerê kemalîzmê ye. Lê binêrin, şerê min ê herî mezin ê nav partî, li dijî van ferzkirinên we, helwest, reftar, çand û şêwaza jiyana we ye. Li hemberî vê kûrbûn, li ser vî bingehî bûna xwedî helwest xala herî girînge û ev jî bi me re pêş keriye.

Min di dahûrînan de pir vekiribû. Hêjî hewl didim vê astê pêş bixim. Em hewl didin rewşa jinê baş fêm bikin. Dibînim ku ji sedî salan ve pergal çawa jinê wisa kiriye amûrek metayê, şêweyek wê û di polîtîkayek çawa de hewl dide bifiroşe. Hêvîdarim em ê vê pirsgirêkê li ser bingeha azadiyê çareser bikin. Ez ji têkîliyên ku gelek ji we dijîn –elbet ji bowe biçûk dibînim nabêjim- xwe dûr dixim. Dema ez tiştên ku jin ji mêrê xwe re, mêr ji jina xwe re ferz dike berçav digirim, dibêjim serê min jî jê bikin nikarim rojekê jî wisa bijîm. Ev zilamek çawa ye, ev jinek çawa ye, wisa dikarin bi hev re bijîn? lewma ne di destê mirov de

ye ku metirsiyê nejî. Ev feraseteke. Ez nabêjim, “bila her kes wisa be.” Cirabandin a gelek rastiyan derdixe holê. Lê belê ev jî ne mijarek ceribandinê ye. Lewra mirov dikare dîlketin û reva gelekan a çûna îxanetê di çarçoveya xweseriya mijarê de baştir fêm bike. Niyeta min di vê mijarê de zêde başe. Ez nikarim ji ti jin an jî keçê re dervî îradeya wan tiştekî ferz bikim. Pêwendiyek bi çi şêwazî dibe bila be, me ew sekin di astek girîng de derbas kiriye. Ango min xwe ji wê rewşa di bin bandora ferasetên kevneşop de, helwesta Kurd a min behs kirî ya lê dixe-dişkîne, dike hemal dûr xistiye û derbas kiriye. Jixwe hêj di serî de jî di vê derbarê de têkoşînek hebû.

Hûn jî dizanin têkoşîna di plansaziya hestan de pir zehmet derbas dibe. Lê dîsa jî pêdivî bi têkoşînekê û têkoşîna azadiyê heye. Ger min gotiba nizanim hestên min, evînên min mezinin, nizanim têkîliyên min wisa pîrozin, feraseta min a namûsê wisa ye, min ne dikariya vê xetê heta vê qonaxê bînim. Ne tenê anîna vê qonaxê, min ne dikariya nav lê bikim. Ev girînge. Ango dema me destpê kir, me got em wate bidin azadiya jinê. Ger em ne xwedî vê helwestê bûna em digihan vê astê. Ger bi feraseta Kurd a namûsa erzan ve hatibam girêdan, dê min hêj di destpêkê de winda kiriba. Weke hûn tev girê dan, hewl dan min jî girê bidin. Malbata min pir lewaz bû, malbatek otorîteya dê û bav pir lewaz bû. Dikarim bêjim ku mirovek Kurd ê herî kêm di bin otorîteyê de mezin bûyî ez im. Ya rastî ev bi serê xwe bûyereke. Di encamê de em ji jiyîna bandora malbatê rizgar bûn. Ev jî gavek azadiyê bû. Em di wê mijarê de hinekê jî xwedî siûdin. Dibe ku em bê serî mezin bûn, lê paşê piştî ku me xwe komîhev kir, me zanî ku kêm jî be xwe bigihînin vîna cewherî. Têkîliya ku xwestin ferz bikin, ger hêj di wê demê de ser ketiba, min ne dikariya hêj ez di pêvajoya dibistana amadeyî de, li dibistana pîşeyî qedandî gav bavêjim. Azweriyên min, dildariyên min, armancên min, em ji tengezariyek mezin rizgar kirin. Yeqîn dikim tişta hûn nikarin ji

bo xwe bikin jî ev xale. Yeqîn dikim di vê tengezariyê de ji aliyekê ve tiştên ku pergalê pêşkêşî we kirine, hinekê jî serdestiya li ser otorîteya kevnar hûn ji rê derxistine. Dema dibêjim hûn ji rê derxistine, dixwazim bêjim ku hinek tişt bi we dane windakirin. Ev hêjayî lêkolînê ye, yan jî dema hûn tevlî partiyê dibin hewce dike hûn vê tengezariyê ji nû ve berçavan re derbas bikin. Ev dikare bê kirin, we gelek tişt winda kirine, yan jî hûn ne di ferqa gelek tiştan de ne. Lê her du jî seqetin, ne rastin, înkarkirin jî ne raste. Wateya vê jiyana bi bûhran û bahozê heye. Ev nehîskirin, pir vekirî weke koleyekê li hember sekinîn jî ne raste. Ev dem merheleyek bi bahoz û bûhranê ye. Ger we nekariye wê demê bikin, qet nebê ji nû ve berçavan re derbas bikin û niha pêk bînin. Naveroka perwerdeya şoreşgerî hinekê jî ev helweste. Min bi zorê xwe ji bin bandora otorîteya kevneşop rizgar kir. Weke din jî mirov dixapînin. Hêjî li pey me hene. Em bi ferzkirinên kemalîzmê ve rûbirû man. Beriya em pêngava partîbûnê bavêjin jî hebû. Lê ya girîng pêvajoya partîbûnê ye. Di PKK'ê de bûyera cudabûna çînayetî heye. Ya rastî li hember PKK'bûnê pir li ber xwe dan. Bi rastî me jî li hember pîvanên feodal û kemalîzmê pir li ber xwe da. Hinek du mehan bi me re meşiyan, hinek jî bi koletî meşiyan. Vaye weke hêjî derdikeve holê, ji ber ku bi şêwaza em dibêjin çima hêza wî têrê nake, çima nikare ava bike, çima nikare çêke, çima nikare birêve bibe, çima bê tedbîre wisa dimeşe lewma! Hinek jî çewsînerin, axa ne. Ew jî meşiyan. Lê me serê xwe yek ji wan re jî ne tewand. Hûn binêrin weke hêza rêbertî, di qadên leşkerî, siyasî û bîrdozî de hêz bi min re heye. Wisa yeqîn dikim îro em li Kurdistanê xwedî seknek herî bibandorin. Ev jî vê ji me re baştir dide hînkirin; Dema em li mînakên berê dinêrin, ger em li hember xwe ne baldar bin, em pir rehetî dikarin rewşek siltanbûnê jî bijîn.

Niha M. Kemal pir baş fêm dikim. Dil dixwest ku rûbirû werim, hemû fêlbazî, ketîbûnên wî di rûyê wî de bêjim. Bûye

desthilatdar lê xwe sipartiye çi? Hinek dibêjin “şoreşgere, rizgarvane.” Hinek hevalên me yên ji Tirkiyê hene, divê bizanin hêza otorîteya serdest a wan çawa ava bûye berçav bigirin. Demek dirêj em jî mijûl kirin. Elbet wan jî berdêla vê ya herî giran û xirab bi ne avakirina şoreşê ve dan. Em niha baştir fêm dikin ku, feraseta otorîteya kemalîst, feraseta otorîteya Osmaniyan, feraseta otorîteya axayên li welatê me, ji feraseta otorîteya me pir cuda ye. Li gel vê di nava partiyê de ev otorîteyên bi feraseta kevneşop an jî kemalîst kêm nehatin ferzkirin. Hinek bahoz, provakasyonû ferzkirinên di derbarê me de hatin derxistin ne kêmbûn. Bi sedan derketin holê. Hêjî ger em hinekê serbest berdin, dê çend ji we çi û çawa ferz bikin ne diyare. Ya rastî ev şerek civakî ye, lewma ecêb nabînim. Dibe ku mafê we be, nexwe madem hûn wisa mezin bûne, hûn ê wisa jî bixwazin. Lê hûn bê çare ne. Kemalîzm dirûxe, bermahiyên feodalî dirûxin. Hûn nikarin Atatûrkek nû derbixin holê, nikarin bibin axayek Kurd ê nû. Elbet em jî vala ne sekinîn.

Ez di heman demê de kedkarim. Dizanim di berdêla xwêdanê de wateya jiyanê çiye. Dîsa li gel hinek nirxên sosyalîst, em bi nirxên mafên demokratîk û kedê mezin bûn. Min ti carî feraseta burjuvaziya biçûk an jî feodalî, di birokrasiyê de bilindbûn an jî bûna xwedî sermayê ve hêz bidestxistin ne hilbijart. Min keda xwe esas girt, wisa jî bi qasî hêza madî û manewî, hêza bîrdozî, siyasî yan jî leşkerî ava kir. Ango hêj kesî ne dikariya darekê jî bigire destê xwe, me li ser xeta rizgariya netewî ji bo yek fîşekê bidest bixin her tiştê xwe danî holê. Elbet ev wisa hêsan nehatin bidestxistin. Ji avakirina bîrdozî heta pêşxistina pêwendiyên polîtîk û heta em bûn hêz, hewldanek hûrûkûr hat meşandin, wisa tempoya xebatê esas hat girtin. Ha ji we re encam asta me îro bidest xistiye.

Ji bo hûn me şaş fêm nekin van tevan vedibêjim. Şêwaza me ya avakirina hêzê pir girînge. Ger em îro li hember kemalîzmê

û feodalîzmê li ser piyane, divê girêdana vê ya bi kedê ve baş bê dîtin. Ev e, li hemberê we ye! Lewma kesên ku dibêjin; "Ez wisa azadiyê dixwazim, raye dixwazim û otorîte dixwazim." Kesên ku ji nişkê ve di nava me de bûn fermandar, kesên dibêjin; "Çi bêjim dê ew bê kirin, ji bilî vê nabe." Kesên fêlbaziyê dikin, kesên ku tevî ti maf û yetkiya wan tine her tiştî desteser dikin, divê li hember van rastiyan baldar bin. Me her tim ji we re got, pêwîste hûn di nava PKK'ê de rastiya rêbertiyê ji hemû aliyan ve baş fêm bikin û encaman derbixin. Lewma Rêbertî di mijara jinê de, neçare ku hinek din baştir teşe bide xwe. Ji ber vê hêjî, em îro li dijî pergala koletiyê şer pêş dixin, rastiya xistina jinê ber çavan digirin wisa dimeşînin. Dê jin xwe çawa bidest bixe, yan jî çawa hewl bide weke koleyekê bixe? Pêwîste ev baş bên fêmkirin. Dema em vê ji hêla jinê ve dibêjin, pêwîste ji zilam ve jî bi heman şêweyî bê destgirtin. Mînak, dê zilamek li hember jinekê xwe çawa rave bike? Nexasim ger ev zilam Kurd be, nexasim mal û milkê xwe winda kiribe, herî dawî jî jina wî tenê di dest de mabe, ji bo wî yek sermaye heye, ew jî jina wî ye. Pir vekiriye ku dê zilam li hember vê sermayê xwedî hişmendiyek sermaya çawa be. Ango dê bibe zilamek her tiştê xwe winda kiriye, ne namûs, ne şeref, ne ax û ne jî azadî, tiştek wî nemaye û zêde ketî. Elbet tişta ku xwedî lê derbikeve û êşa ketîbûna xwe ew yek sermaya wî li ser jina xwe bi avakirina serdestiya xwe ve bimeşîne. Her wiha zilam jî bi vî rengî, di carekê de qaşo dibe kesayetek xwedî "derfet!" Ne ku ji bo em van tevan biçûk bibînin dibêjim. Tenê hewl didim rastiyekê rave bikim. Hûn nizanin lêkolîn bikin. Li hember me rastiyek civakî ya wisa ji dîrokê qut bûyî, heta atomên xwe parçe bûyî heye. Aliyên vêyên dîrokî û rojaneyî hene. Bigirin û lêkolîn bikin!

Zilam betal, bê perwerde û dibistan nexwendiye. Tişta heyî jî dadiqurtîne. Kemalîzm di vê mijarê de serdestek teqeze. Polîtîkaya "biçe dibistanê were daqurtandin, kar bixwaze bibe

sîxur" ferz dike. Vêca dê ev zilam çi bike? Dê ev zilam dîn û har be. Belê rastiya dînê Kurd a em behs dikin wisa derdikeve holê û weke din jî sekna wî ya li hember jinê û ferasetek wî ya namûsê heye. Jixwe min ji destpêkê ve ev feraseta namûsê cidî negirt. Şûna ez xwedî namûsek wisa bim, bila bênamûs bim baştire. Seknek din jî wisa ye. Lewra rewşa zilamê Kurd jî qediya ye. Di vê wateyê de, lewma dibêjim têrê nake ku mirov tenê jinê bigire dest.

Dema asta jêr dibe mijara gotinê, jin ji hêla rastiya Kurd ve çi rave dike? Di nava civaka me de jin, di rewşek wisa de ye siûda wê ya di jiyana pergalê de meşînê nîne, bê hîse, bi darez ên feodalî ve hatiye mezinkirin. Hêj jiyan nas nekirî, di 14-15 saliya xwe de, bi zilamekî ve tê girêdan. Lewra keçek ku jiyanê nas nake, nizane têkîlî çiye çi dikare bike? Zehmete ku mirov di vê rewşê de behsa kesayeta jinê bike. Di nûçeyek ku min di rojnameyê de xwendî digot; dê jin bi duruşmeya bi navê "jin jî hene" meşekê sazûman bikin. Ez jî li vir dibêjim ku, jin tine ne. Dibe ku li Çankaya, yan jî li cihek weke parkê hebin, lê belê li vir jin tine ne. Jixwe di dîrokê de jî, di civakê de jî hatine windakirin. Weke heyberekê ye kî bigire dê di destê wî de bimîne. Ango dema ez vê tînim bîra we şervanên azadiyê, dixwazim vê bipirsim. Çawa çêdibe? Em ê çi navê li vê têkîliya ku kî pereyê wî hebe, hinekê jî xurte, dikare jinê weke heyberekê dikire bikin? Ji ber gelek ji we vê têkîliyê wisa dipejirîne. Pir xetere. Di şerek min de, tişta derket holê min ev têkîlî ti caran weke têkîliyek asayî nedît. Dibe ku gelek ji we gotibe, "irf û adetin" ev têkîlî wisa pejirandi be û dibe ku wisa jî jiya be. Lê mixabin ev têkîlî, ji bilî rewşa herî ketî zêdetir ne tiştek dine. Hinekê jî ji ber vê ji civakê qurbûn û kevneşopiyan qutbûn çêbû. Lewma me nêzîkbûnek weke "em hinek din di nava kesimên jor de bilind bibin, bişibin kesên nîv kemalîst, nîv burjuvaziya biçûk" ji xwe re nepejirand. Lê niha kesîmek mezin xwe tevlî vê rastiyê dike.

Mînak, me Êlîh girt dest. Ji ber petrolê dewlemendbûnek heye û kesên ku ev têkîliya behs dikim pêş dixin jî pirin. Hûn xwendevanin, hinekê jî derfeta we ya pêwendiya bi pergalê re jî heye, yeqîn dikim hûn tam pêvajoyek bûhranê û bahozê dijîn. Niha di vê mijarê de parastina we û hûn ber bi azadiyê ve kêşan hîn zehmetire. Dibe ku em bikarin dijminê vekirî bînin rê, lê hûn ji van rewşên çapraz û ketî rizgarkirin pir zehmete. Em dikarin behsa rewşek tam bûhranê bikin.

Dem bi dem di nava PKK’ê de ev pirsgirêk xwe çawa dide der? Hinek xisletên avabûna PKK’ê hene. Pêwîste hûn ecêb nebînin. Derdê me ne ew e em we ji pêwendiyan dûr bixin. Nexasim têkîliya cînseltî, hûn jî dizanin xerîzeyek pir bihêze. Heta nihek dibêjin ev ji bîrdozî û polîtîkayê jî bihêztire. Lê ger ev bi temamî ber bi ketîbûnê ve dibe, her tiştî bi temamî ji destê me derdixe, wê demê divê em bizanin ti wateya cînseltiyê jî zêde nîne. Cînseltiyek wisa her tiştî tine dike. Ji welat qut dike, azadiyê qut dike û serfirazî qut dike. Weke din ji bilî têrbûnek erzan ti nirxa vê têkîliyê ya civakî nîne. Ne tenê ketîbûnek siyasî, qutbûnek ji welatparêzî yan jî mîna vê nirxên esîl û berze, ji hêla civakî ve jî ger dixe nava tam bûhranekê de, pêwîste mirov pir li ser vê cînseltiyê raweste. Ger ev têkîliyek Kurd be, dahûrandina têkîliya Kurd be, hêj gelek tiştên ku mirov bêje hene. Ez bi ezmûnên xwe van tiştan dibêjim. Hûn jî dizanin kesek nikare bi qasî min dahûrandina Kurd û şêweya têkîliya wî berfireh û kûranî bike. Kesek bikare bi qasî belavkirinê, ji nû ve jî yek bike nîne. Divê hûn baldar nêz bibin. Ez hêjî bi emeliyatekê ve mijûl dibim. Derdê min, ne we tengav bikim. Yekser vê jî bêjim; Ez weke kes ji têkîliya jin û zilam re ne girtî me. Berovajî di mijara têkîliya jin û zilam de, kesayetek wisa me xwe berfireh didim vî karî. Kesek bi qasî me wêrekî li dijî nêzîkbûnên kevneşop derneket. Dîsa di dijberiya nêzîkbûnên kemalîzmê de jî kesekî bi qasî me hewl neda. Hêjî em mijûl dibin. Dibe ku bendewarî û helwestên we yên

pir cuda hebin, lê ez hêjî dahûrandin, rêkûpêkî û sazîbûna vî karî ve mijûl dibim. Ne bê sedeme. Di nava civaka heyî de di çarçoveya feraseta pere û hêza kî zêdeye de her tişt tê kirin. Mirov dikare bêje îro hemû malbat xwe difiroşin. Hûn jî dizanin ku di 12'ê Îlonê de civak di çi astê de xistin. Xalên weke fuhuş, sermaye girtin, her cure kirîn û firotina jinê tev herî zêde di 12'ê Îlonê de pêş ket. Lê dîsa jî em bêjin, ev dûrî me ne û zêde jî me eleqedar nakin. Lê belê di nava partiyê de peywirên me yên weke ji nû ve avabûnê û sazîbûnê hene. Her wiha hûn di nava terbiya partiyê de ne. Peywirek me ya sereke jî hûn di nava pîvanên kesayeta partiyê de avakirine. Hûn ketine nava bûyerek weke PKK'ê. Ev bi rastî jî beşdarbûnek ku hemû hebûna xwe –jixwe hebûna herî binirx jiyana we ye- feda kirî ve tevlîbûnek pêş ketiye. Lewma nêzîkbûna herî berz û berfireh ji vê tevlîbûnê re kirin jî erka min e. Binêrin, hûn bi şêwaza hatina xwe re her cure pêwendiyên berjewendî, pêwendiyên sermaye û pêwendiyên jiyanê li aliyekê dihêlin. Hûn dibêjin; "Nirxên bingehîn ên damezrîneriya PKK'ê hene, ez hatime xwe tevlî wê bikim" û jixwe li ser vê nîqaş jî nabe. Ji ber ku pîroze, berze divê esas bê girtin. Belê em jî hewl didin vê bikar bînin. Sonda destpêkê, tevlîbûna destpêkê û niyeta xwe diyarkirin têrê nake. Ji bo dahûrandina xeleka vê ya pêwendiyan û ji nû ve damezirandina vê karkirinê hostatî û afirînerî dixwaze.

Di derbarê me de hin rexne hene. Dibêjin; "Gelo PKK dixwaze têkîliyên jin û zilam ber bi çi ve bibe, nizanim PKK wisa li dijî zewacê ye." Ev nirxandinên ji derve de tên pêşxistine. Her çendî kin jî be dema em dîrokê vekin, em ê bibînin ku pêşketinên pir giranbiha rû dane. Dîsa dema em rewşa civakî ya heyî berçav digirin, em dibînin ku kar çiqasî di nava bûhranê de ne. Vêca di vir de çareseriya hêsan ferzkirin çiqas rasteqîne? Ez hêjî di wê qinyatê de me ku ev raste; Heta ku zilamê di nava partiyê de, rast nêzî rastiya jina li hemberî xwe nebe, rast ne dahûrîne, ji nû ve

azad neke, ti pêwendiyê pêş nexe baştire. Ev hezkirine, hestewarî ye, yan jî zewacin dê hemû jî serê wî bixin belayê. Heta ku keçek nezane bi bûyerek ku bi ser dil û mejiyê wê de bikeve re rûbirû ye, nikare nêzîkbûna azad û nêzîkbûna wekhev pêş bixe. Dev ji van berdin, heta ku nezane bi pergala têkîliya zilamê ku hest, fikir û mantiq tine dike re, -jixwe dema me dîrok vegot me behsa şêwaza teşegirtina zilam kiribû- rûbirû ye, ne dahûrîne û ger gengaz be bi wî re seknek wekhev û azad pêş nexe, dikare kîjan pêwendiyê pêş bixe? Ger vê pêwendiyê saz bike jî, ji encamên wê re amade ye gelo? Ev jî ger xwe tine neke, azadî û wekheviyê esas bigire dibe! Zilamê Osmaniyan, zilamê Kemalîst an jî axayê Kurd zilamên weke kevirin. Ne ji axaftinê fêm dikin, ne ji gotinan fêm dikin, ne ji mantiq, ne ji wekhevî û ne jî ji azadiyê fêm dikin. Ferasetek namûsê û ferasetek serdestî ya li gorî wî heye. Bê pirs û hesab dixwaze yên li hemberî xwe bike jinik. Ev rastî ye. Ne min ev ava kir. Dîrok wisa dibêje. Roja niha jî li ser vî bingehî hatiye avakirin. Ger hûn dixwazin biceribînin. Lê bi şertê hûn ji encaman re amade bin. Bê ku hûn partiyê mijûl bikin, me mijûl bikin têkîliya hûn dixwazin bijîn. Lê bi şertê divê şer vala dernexe, bila azadiyê heta kesayeta we bi xwe rezîl neke, wê demê ez ê her cure pêwendiyên we pîroz bikim. Ji bo we berzbûn û azadî xwestin ne tiştek xirabe. Em dibêjin bila zilam ji nû ve rast bibe û jin jî koletiyê derbas bike. Gelo ev çiqas pêk tê? Tenê bi nêzîkbûna "me çav berda hev û hişê xwe da ser" ve ev kar nabin. Belê, asta nêzîkbûnên kevneşop û yên heyî evqasî seresere ye. Ez vê bêjim; Weke şervanek azadiyê nabe ku ez bi jinê re eleqeder nebim. Helwesta me, helwestek azadiyaxwaziya mezine. Jina Kurd her tim ji me hêz girt û wesa derket li ser dika dîrokê. Zimanê wê vebûye. Dibe bi qasî di rastiya di tevger û ti gelê Rojhilata Navîn de neyî, di asteke mezin de xwe li çiyan girtiye. Dîsa hebûna we ya li vir, misoger bi helwesta me ve girêdayî ye. Ger hêza me nebûya, hûn jî baş dizanin we ne dikariya gava xwe

ji malê bavêjin. Dîsa jî vê dibêjim; Gelo gelek tişt çareser bûn? Lê mînakên ku derketin holê, dide diyarkirin ku divê em di vê mijarê de ne seresere bin, hestên wisa ne, bi têkîliyên pir seresere ve xwe îdarekirine, di nava xeta rizgarî û xeta azadiya PKK'ê de ti encamê nagire.

Dibe ku hin ji we aciz bibin an jî bêjin; "Ma evqasî li me tê kirin." Ez her roj xwe ji nîqaşê re vedikim. Têkîliyek wisa ye, ger baldar nêz nebim dibe ku bibe qada herî zêde dizî, durûtî û xapandin lê bê jiyîne. Ev qad jî wisa bikaranîn bi rastî jî gelekî xirabe. Ev qas bi rastî jî qadek wisa ye divê nêzîkbûna herî rast jê re bê kirin, ev hem di asta fikir, hem jî di asta hest de hewce dike. Pêwendiyek bê vê nabe, jiyan nabe. Lê mixabin jina amade ye ku xwe weke koleyekê pêşkêş bike û zilam jî amade ye ku xwe weke despotekî ferz bike. Vêca ez ê weke şervanek azadiyê çawa destûrê bidim van têkîliyan? Ango ma em dikarin weke Hz. Muhemmed bikin? Ma em dikarin weke Fatîh bikin? Ma em dikarin weke M. Kemal bikin? Ma em dikarin weke axayê Yenîçeriyên Osmaniyan bikin? Ma em dikarin weke axayên Kurd bikin? Ma em dikarin weke van tîpên bûhranê, Dêrsimê, Êlihê yan jî tîpên burjuvaziya biçûk bikin?

Azadî bi gelemperî mijarek zehmete. Behsa berzbûna azadî tê kirin. Girêdana berzbûnê jî pir ji nêz ve bi zorê ve heye. Ger xistinek wisa ya hezarî salî hebe, jiyanek ku bi her cureyî hatiye xistin li vê qadê hatiye jiyîn, ez ê çawa di rojekê de yan jî di dîroka PKK'ê de bê ku dest bidim av û sabûnê bikarim pergalek ku herkes bikare rehetî bijî saz bikim? Em dikarin weke yên din bikin! Ma raste? Ango mezinbûna vî karî di vir de ye; em hatine vî temenê xwe û hêzek pir mezin jî di destê me de heye, lê belê şêwaza me ya bikaranînê binêrin! Dema em li hinek desthilatdarên li nav revên me yên partî binêrin, bêka çi dikin? Hêzek di bin fermana xwe de û jinekê çawa bikar tîne? Dev jê ber

de divê çawa bikar bîne, jina Kurd çawa hewl dide xwe bikar bîne?

Min di rewşa xwe de ev bidest xist, ji hêla desthilatî ve arestebûnek hewce dike. Kesayeta ku muxateba min bû çi digot; “Gelo dikarim çawa rexne bikim?” Min jî digot; “Ev mijara desthilatiya ku bilind dibe ji bo gele. Ger pirsgirêk kesek be, îro heye, sibe tine ye.” Bes nêzîkbûn ew bû ku digot; “Em ê vî kesî bi têkîliyek taybet ve girê bidin, paşê jî mîrateya wî desteser bikin û bê ku pê bihese hemû nirxên wî desteser bikin.” Me sedî caran mînakê vê dîtin. Lewma hewl didim van karan pir hesas bimeşînim. Çavên camêr ber bi desthilatiyê ve dibiriqin. Hûn jî dizanin ti hêza ku pere û desthilatî nekare bikire nîne. Dema hêz hinekê bi me re zêde bû, yekser di derbarê me de hesab hatin kirin û komplo hatin zêdekirin. Gelek ji wan çi kir? Gelekan got; “Ez piştî Rêbertî me.” Xwe weke “zilamê duyek”, nizanim “zilamê di rêza çendê de” dan nasîn. Jixwe hêj van ne dizaniya desthilatdarî çiye û çawa ava dibe, xwe dixistin nav vî karî.

Raste, ev mijara desthilatî di nav me de jî pêş dikev e. Bes carê dibêjim; “xweziya Kurdek din kiriba û min xwe hezarî carî ji vî karî dûr bixista. Bila du roja duyem de xwe nefiroşe, bila vê desthilatiyê û otorîteyê nefiroşe, ez ê her roj xizmetê jê re bikim. Bila ne sosyalîst be, bila welatparêzek binamûs be, ez wê jî razî me.” Mixabin tine ye! Dema camêr bê wê du roja duyek de xirab bike, nizane çawa bifiroşe û çawa bikar bîne. Ango min xwe weke kes ewqasî dil bernedaye desthilatî. Ya rastî ji hêla rûhî ve jî zêde ji vê re ne amade me. Ez ji nêzîkbûna bûna desthilatiyek bêhempa û xwe wisa dana axaftinê pir acizim. Di vir de zehmetiyê dijîm. Lê tevî vê gava dinêrim, dîsa jî kes tine ye. Jixwe gel jî ji bo vê me bibîr tîne. Ango ne ez dibêjim; “Wisa bangî min bikin, biqîrin û bicivin.” Lê belê gelê me ji ber rastiya dîrokî û rewşa şênber a di navê de dijî ji xwe re seriyekê, rêberekê dixwaze. Dizane ku em hinek tiştan dikin. Girîngiya vê fêm kiriye

û li dijî her cure lîstokên dijmin jêveneger dibîne. Li virim. Derfetê me yê axaftina bi yek kesî re çênebû, lê em ji feraseta rêbertiya gel re dibin bersiv û ew jî dipejirîne. Lê desthilatiya bi gelemperî di nava rastiya partî û taybet di rastiya Rêbertiya partî de kom dibe, divê rê ji hinc, timahbûn, çavberdan, desteserkirinê re veneke. Cardin dibêjim; ger hûn dixwazin di nava PKK'ê de bi duristbûn bên pesindan, ev nirxa herî hêja ya we tevane. –hebûna can jî di navê de-, çeke, pêwendî ne, bandora partî ya madî û manewî ya her cure ye, şêwaza avabûnê ye, şêwaza rêvebirinê ye û şêwaza Rêbertiyê ye. Ev hemû jî xwedî naverokek watedar û hûn ê misoger vê wateyê fêm bikin, bi cewher bikin û esas bigirin. Girêdayî vê jî dema mijara azadî û pêwendiya jinê hat destgirtin, di vê mijarê de ji pir hesasbûnê zêdetir, hûn ê nêzîkbûna PKK'ê esas bigirin, li ser vî bingehî xwe veguherînin, nirxek mezin bidin xwe wekhev û azadkirinê. Dema hûn pêwendiyên xwe bi taybet û gelemperî pêş dixin, divê hûn di vê çarçoveyê de baldar bin. lewma di nava refên me de nêzîkbûna ji diyardeya jinê re, rewşa ku jin bûye meta fêmkirine. Ger çalekgeriya jinê ya di vir de bi fîzîk, fêlbazî, rewşa wê ya çînayetî û civakî ve xwe gihandibe kesayetekê, jixwe kesayeta di vê wateyê de ji bo min ti wateya wê nîne, ev hîn zêdetir xwe pêşkêşkirine û ev jî ne nêzîkbûnek raste. Hûn jî dizanin, nexasim di nava PKK'ê de pirsgirêka cînseltî û têkîliyên di navbera zayendan de ji nû ve tên sazûmankirin. Di vê mijarê de gelek pirsgirêk hene. Li gorî min xeternakiya herî mezin ev pirsgirêk pir erzan çareserkirin, azweriyên xwe pir xirab bikaranîne. Her çendî bê gotin; "pirgirêkên pir giranin" an jî "pirsgirêkên mirov nikare pêşî bigire ne" bila bê gotin, em hewl didin pêwendiya netewekî, miletekî, heta ji wê jî wêdetir, berfireh, civakî û demokratîk sazûman bikin. Ez ê mînakek din bidim: Dema Osmanî, Dergehên Yenîçerî'yan ava dikin, zewac qedexe ye. Zilam 20-30 salan şer dike, lê nazewice. Tê zanîn ku, yên artêşa Osmaniya dike artêş û

dewleta Osmaniyan dike dewlet jî Yenîçerî ne. Bêguman ez têkîliyek wisa ferz nakim. Bes ji bo hûn di artêşbûnê de hinek tiştan berçav bigirin van dibêjim. Weke din kolebûna herî ketiye. Lê rastiyekê rave dike. Tişta di nav me de tê xwestin ne ev e. Tevgera PKK'ê, tevgerek azadî ya netewî û civakî ye. Lewma li dijî paşverûtiya nav malbatî, têkîliyên jinê yan jî bi temamî paşverûtiya di diyardeya jin û zilam de dahûrîna teqez ferz dike. Heta ku têkîliya jin û zilam neyê dahûrandin a nû nayê avakirin.

Ev, di PKK'ê de wisa pêş dikeve. Ma ez çi bikim? Tişta ez jî dikim tenê Rêbertiya vê ye. Min jî xwe bi vê rewşê re rûbirû dît. Ji bilî vê jî ti derfetê cuda yên pêşxistinê peyda nekir. Ger yek hebe bêje; "Rê û rêbazek cuda heye", bes bila me du rojan de nefiroşe, têk nebe, em ê wî kesî rakin asîmanan. Hinek kesan gotibû; "Bila Rêbertiya Partî ji me re bihêle, em ê du rojan de van pirsgirêkan çareser bikin." Gelo dê çawa çareser bike? Yeqîn dikim ger pênc quruş pereyê me hebe, dê wê jî ji bo jiyana xwe kesî belav bike! Ango keç û xort hebin, dê du rojan de wan bide zewicandin! Dê paşê pêwîstî bi malê hebe –ji ber dervî welate-, pêwîstî bi zad heye, kurtasî dê serî heta binî her malê bi pereyan ve girê bide. Bi vî rengî wê qaşo di navbera du rojan de pirsgirêkê çareser bike!... Ger tişta PKK'liyek çar bi çar bixwaze û nekare bike, ew di bi navê partî, qaşo bi navê Rêbertî -jixwe Rêbertî jî na ecibîne- bike, ev nêzîkbûna xeter ne kême. Dema vê bike jî ne diyare wê li kur raweste û şer çawa biqedîne. Jixwe ma dê tiştek bi navê şer bimîne? Gelo niha ev helwesteke? Ma mirov dikare di nava PKK'ê de vê ferasetê bipejirîne? Desthilatî heye, otorîte heye, navdare, ma nabe hizirandinek weke "ma ez cihek wisa ji xwe re bigirim dê çibe?" Ji ber diyare ku wê du rojan de çawa dawiyê lê bîne.

Li welat hinek bûyer derketin holê. Me erkek mehellî dayê, di berpirsyariya wî de çend jin hene, li wan stargehan, hem jî di nava wî şerî de, bê ku bendên civakî berçav bigire, dikare her

cure têkîliyên ketî pêş bixe. Di encamê de heval tên girtin û şehîd çêdibin. Niha binêrin dijminê herî xurt vê nake, jixwe sîxurên ku dijmin dişîne nava refên me jî bi rêxistinkirina vê ve mijûl dibe. Ti kesê li hember xwe rêzdar vê napejirîne û heta efû nake. Gelo em bi kîjan şerî re rûbirû ne? Yê ku her tiştê xwe winda kirî kiye? Welat tine, azadî tine, kesayet tine, rêz û şeref tine, tiştek tine, elbet ên winda kirî em in. Ji ber vê niha hinek nirx kom bûne, lê bi feraseta “deka em vê jî li gor dilê xwe xerc bikin”, ne helwestek ku bê efûkirine. Jixwe helwesta ku gelek kes raber dike jî ev e. Ango helwestên “tiştên heyî besin, em jî xwe li ser bidin jiyîn” derdikevin holê. Vêca deka were ji min bipirse ev nirx çawa hatine avakirin? Gelo dijminê beramberî te kiye? Kiye dixwaze her tiştî di carekî de tine bike? Wê kî bi van re şer bike? Bi hinek nirxên şer ve şervan hatine avakirin, ma ew dikarin bi rojan û mehan te bidin jiyankirin? Weke din jî di pey avakirina van de hewldanên min ên bê navber berçav bigire! Gelo ev nebin tu dikarî li wan çiyan çend rojan li ber xwe bidî? Yek ji van nahizire. Belê xeflet di vir de tê jiyîn.

Dema di nava partî de dahûrîn tên pêşxistin, pir vekiriye ku pêwendî bi şer û siyasetê ve tên girêdan. Bes li gel van divê di vê pirsgirêkê de jin û zilam wekhev bên nirxandin. Bes divê bi şertê rêgeza azad mayînê ve girêdayî bimîne. Ji ber ku ev rêgez li her derî derbas dibe. Heta niha kesî newêriye evqasî rêzdar be û evqas keçên ciwan di nava hev de bide jiyîn. Di hewldana ti artêşê de mînakek wisa tine ye. Em ne tenê wêrek nêz bûn, di astek girîng de pêkanîna wê jî me ser xist.

Ti keç û xortên me yên li vir ne mal û milkin. Ev girînge. Dibe ku hinek azwerî têr nebûne, lê jinên di refên me de vê ji kûranî dihese dibêje; “Her ku pêşde diçe ez însiyatîf bidest dixim, hêza fikrî bidest dixim.” Nexasim a herî girîng jî vê bi tena serê xwe dike. Ango ne raste ku bibe pêveka kesekî. Loman nakim lê dema hinek ciwan tên vir, demekê ez jî wisa bûm, bê ku xwe

bispêre evîndara xwe, nizanim hezkirina xwe zehmete ku hêz bi xwe re bibîne. Jixwe bi gelemperî zilamê Kurd wisa ye. Heta xwe nespêre malbata xwe nikare bijî. Niha em vê jî derbas dikin. Çima? Ji ber kes nikare bi sitargehên pêvek ên sexte ve di nava şer de bimeşe. Beriya her tiştî weke min kêliyek berê gotibû di bingeha têkîliyan de sedem ên dîrokî û civakî hene. Piştre jî jixwe dema tên vir di roja duyem de têkîlî parçe dibin. Çima? Dibe ku dema bi nêvenga azadiyê, wekhevî û azad ve rûbirû dimîne, dibîne ku tişta kiriye şaşiyek pir mezine û yekser jê qut dibe. Ango hinekê jî rewşa dîrokî û civakî ew xapandiye. Lewra çawa azadiyê dibîne, ew jî qut dibe. Divê mirov ecêb nebîne. Tiştên ku ji sedê salan ve winda kiriye, qet nebe di asta feraset de dibîne. Ev jî girînge.

Jinekê bihizirin, keçekê bihizirin, hêjî nebûyî 15 salî bê ziman, bê qural, kurtasî bê her tişt bi zilamekî ve tê girêdan. Çiye, qaşo keça malbatek başe û bûye hevjîna malbatek baş! Ecêb ev çi şêweya bûna hevjîntiyê ye? Di rastiyê de kole ye. Bêjiyê bimire dê bimire, bêje rabe dê rabe. Ne dilketinek heye û ne jî hezkirinek heye. Heman weke mekîneya zarokanînê tê dîtin. Ma bi kesayetek wisa re jiyan dimeşe? Ma xistine herî mezin û heqareta herî mezin a li hember kesekê ne li ser vî bingehî ye? M têkîlî û jiyana di nava me de serwer ne wisa ye? Belê niha, li kêleka vê em hewl didin çi bidin jiyîn? Tiştên ku divê baldarî li ser bê rawestîn û encam jê bên derxistin çine?

Ya rastî nirxa herî mezin ji keçekê re bê dayîn ev e; Bila di nava refên me de weke dixwaze bijî, ger hebe bila hêza mantik û hêza hest mezin bibe. Bê ku ji tiştekê re bibe dar, bila hewl bide xwe binase, hewl bide xwe bibîhîse. Ango bê ku ji çar hêlan ve di bin dorpêça serdestiyê de bê girtin, bila bi jiyanê re hev binasin, zilaman binase, malbatê binase û siyasetê binase. Ma ev ne girînge? Mînak dema keçek di rewşek tengav de dimîne, çar aliyên wê bi serdestî tê dorpêçkirin, ji mal û milkê qut dimîne,

dema serbest tê hiştin mafdar yekser direve ne wisa? Direvin û di roja duyem de dikevin kolanan. Êdî otêlin, paviyonin û meyxane ne jixwe ne diyare. Jixwe hûn jî jiyana Tirkiyê ya di vê mijarê de baş dizanin. Vêca van rewşan ne jî, dê di roja duyan de yekser xwe bike koleya kesekî û bibe malê kesekî. Ango tişta di malê de bi serê wê tînin, dema ji malê jî direve tînên serê wê heman tişte.

Vêca zêde nirxa vê heye? Ma ev azadî ye? Yeqîn nakim. Gelo nêvenga partî di vê mijarê de çi esas digire. Di vê qonaxê de nêvenga partî jî li dijî derve, li dijî hundur şerek dijwar dimeşîne. Bi qasî koletiya dîrokî ve mijûl dibe, hem di asta hest de, hem jî li dijî zora dijmin a vekirî şerekê dimeşîne. Ev rastiyeke. Ev jî rastiya rêbertiya PKK'ê rave dike. Ji bo rêya vî karî bê vekirin, baldar nêzî nêvenga xwe jî dibe. Ango ez ji bo feraseta ji sedî salan weke " male, milke, bi hêz û xurtbûnê çareser dibe" re dibêjim li vir nabe û erê nakim.

Belê siltanên Osmaniyan, axayên Yenîçeriyan, burjuvaziya biçûk ên kemalîst bi gotinên cuda ve hewl didin van xalan çareser bikin. Lê belê, rêbertiyek weke rêbertiya PKK'ê derketiye holê ku, hinek tiştan dibêje. Dibêje; "wisa nabe." Nêzîkbûnên hem kevneşop, hem jî yên rojane rast nabîne. Hinek nêzîkbûn û dahûrînên ku pêş xistîn hene. Dixwaze ev bi baldarî bên nirxandin. Rêbertî ev e. Hêza wî heye, ev hinekê ava bûye. Dikare xetê bisepîne. Belê, heta ku bijî hêza wî heye. Vêca tişta ji we re dikeve fêmkirin, têgihiştin û bi hêza dahûrînan ve xwe gihandina hêza pêwendiyê ye.

Civakek nû tê avakirin. Hewl tê dayîn şêwaza pêwendiya bingehîn û sazîbûna wê bê avakirin. Bi rastî jî rewşa malbata Kurd tine bûye. Ketiye rewşek zibala mêtîngeriyê. Her cure sazûmaniya civakî bi qasî bê gotin tine ye kême. Mirov dixe. Wê demê em ê çi bipejirînin, esas bigirin? Em di wê hewldanê de ne di nava PKK'ê de bigirin, di nava PKK'ê de dahûrînin û xwe bigihînin şêwaza pêwendî û sazîbûnê. Em hêjî operasyonên vî

karî ve mijûl dibin. Ne şerme. Berovajiyê van jiyîna we pir şerme. Rola ku min di vê mijarê de taybet daye xwe bi şêweya “madem di dîrokê hinekan wisa bi kûranî desteser kiriye, xistiye, dîl girtiye, ez ê jî vê pirsgirêkê bi şêweyek pir cuda yan jî tam dijberî wê şêwazekî çareser bikim” de ye. Her wiha ez ê ji vê kêfxweş bim û dibim jî. Madem hêz û raye di destê min de ye, di vê mijarê de hewl didim azadî û serxwebûnê bi keda xwe bijîm, di asta hêza jor de me, xurtim, wê demê em ê li hember vê nêvenga dîrokî ya pêş dikeve û heyî bi rikek mezin helwesta rêbertiyê pêş bixin. Berpirsyariya civînek ji nû ve damezirandin û helwdana ji nû ve damezirandinê jî ya mine.

Elbet hewce dike Rêber bikare hinek tiştan ava bike û saz bike. Ger naxwaze bi şêweya xetek rasterast û lezgîn weke rêberekî bê ji bîrkirin, divê nêzîkbûnek saxlem ji hinek pirsgirêkên dîrokî re bike. Ger ev pirsgirêk zêde dixeniqînin, dibin sedem nayê jiyîn, nirxên bingehîn dide windakirin, pêwîste bizane çare be. Elbet ev jî wêrekî û fedekarî dixwaze. Di heman demê de ev ji bo her gava şoreşê û her qadê jî derbas dibe. Mane azadiya jinê di pirsgirêka jin û malbatê de li ser bingeha şeran û windakirinan pêk nehatiye ku, heta em jî hêsan bidest bixin. Min ji we re vegot, pêwendî çawanin, eleqeya wê bi milk, zor, dîrok û desthilatiyê re çawa ye? Ma di nava wê de bi qasî misqalekê jî dilxwazî heye? Ma bi qasî misqalekê jî hezkirin heye? Nîne! Kanî wekhevîxwaz û azadîxwazên rabûn serhildanê? Kanî yên behsa hezkirin û evînên mezin kirîn? Li ku derê ne? Ger quntarek biçûk a çiyan ku tu bikarî hêlînek xwe çêkî tine be, tu dikarî li kuderê evînê pêş bixî? Tu dikarî li ku derê bijî? Min berê jî ev vegotibûn. Tu bê welatî jî, cendirme tê, ger hebê hevjîna te, keça te ji destê te digire. Jixwe her roj digire. Weke din jî qirşikek te nîne. Belê dema ev rastî jî tên dîtin, bi mafê ku pêwîste bê bidestxistin ve bi azadiya pêwîste bê sazkirin ve, em ê pêwendiya di navbera azadî û kesayeta xwe de, pêwendiya di navbera evîna xwe de saz bikin.

Niha dema ez dibêjim; “Bila evînên we yên mezin hebin, hinek zewacên we yên mezin hebin”, vala nabêjim. Dema em vê ji bo Kurdan esas digirin û hewldanên xwe yên di vê mijarê de kûr dikin, ez ne li pey hewldanên bê wate û vala me. Berê digotin; “weke dînan kar dike.” Lê niha êdî her kes hêdî hêdî yeqîn dike. Ger eşqên mezin hewce dikin, dê welatparêzî jî wisa çêbe. Ji boazadiyê jî li çiyan wisa tê şerkirin. Belê me çawa li hember sir û seqema vê zivistanê li ber xwe da û kes jî ne revî. Ev jî bersiva azweriya azadiyê ya mezin bû. Ev ji bo Kurdan evînên nû û evînên rasteqînin. Ez nabêjim zêde bi min ve jî werin girêdan. Min got, ez ji hêla derûnî û ruhî ve zêde ne evîndarê rêbertiyê me. Lê di civakê de jî evînek rêbertiyê heye. Ez nabêjim, her roj navê min biqîrin. Ew jî evîneke. Wê jî bi vî rengî rave dike. Hem jî vê heta mirina xwe dike. Ango dema berê cendirme dihat hemû direviyan xwe dixistin bin erdê, herî dawî jî li wê Êliha ku me rexne kirî nêzî 50 hezar mirov tevî ku derdora wan bi sedan tanq û top hatî dorpêçkirin, bêtirs heta dawî bi girêdana evînek mezin ve meşiyan. Ev evînên hêja ne. Her wiha pêwîste teqez hûn kûraniya van evînan bibînin. Ger dê di nava jiyanê de evînek we biçûk bê jiyîn, divê hûn van rastiyan berçav bigirin.

Meşa jinê jî, rabûna wê jî, bi serê xwe azweriyek mezin rave dike. Mijara ku evîn jê re tê gotin, heyberek wê ya herî girîng jî wisa derdikeve holê. Ma hûn ê cuda çawa hez bikin? Ma kesê ku ji bo azadiyê nerabe dikare hez bike? Heta ku evînên mezin neyên bidestxistin, ma evînên biçûk dikare bê jiyîn? Heta ku hestên mezin neyên bidestxistin, ma hestên biçûk dibin? Ez halê we dibînim, ti berhemek ji hezkirinê û evînê tine ye! Ez hez nakim pesnê xwe bidim. Lê biyanî baştir dinirxînin. Yekê digot; “tu vî karî bi dilek eşqê dimeşînî.” Hûn jî dizanin ku ez çiqasî bi pîvanên zanistî tevdigerim. Lê aliyek vî karî ya evînê jî heye. Rewşa gelek ji we dinêrim, bi rastî jî hûn weke miriyane. Binêrin min xwe çawa bi vê parçeya çiya ya biçûk ve girê daye. Mixabin

hûn nikarin bi qadên herî xweşik, lutkeyên çiyan ên bêhempa û geliyan ve bîn girêdan. Bi rastî jî ew qadên ku em dixwazin bi welat bikin pir bêhempa ne. Ne ku ji bo objektîf welatê me ye vê dibêjim. Qadên wisa ne, mirov evîndarê wan deran dibe. Kesên ku baldariyek wan ji rêzê jî heyî, xwe nagirin li van çiyan di nava hewayek romanê de dibînin.

Têkîliyên mirov û daneyên dîrokî yên ji dîrokê beriya 4 hezar salî ve mayîn hene. Hûn jî behsa têkîliyên li Ewrûpa yan jî qadek cuda pêşve çûyî dikin. Ez nikarim di vir de tiştekê bibînim. Di van têkîliyên ku hûn dibêjin ên hezar salî û paşverû ne de, mirov di pêwendiyan de dewlemendî û mirovahiyek mezin dibîne. Ev jî girêdanên me yên bi gel û azadiyê ve ne. Ma hûn van dibînin? Gelo hûn dikarin evîndarê van bin? An jî ji van direvin? Tişta dixwiyê hûn direvin. Ger hûn bi evîndariyek wisa çiyan ve hatiban girêdan, ma niha li çiyan yek leşkerê dijmin cîh digirt? An jî pêwendiya gerîlayan a bi çiyan ve bi evînek mezin û bêhempa ve bihata hunandin, gelo dê gerîlayên weke keviran teqez ne serwerbûna? Di bibûna! Ger we bizaniya vî gelê me hez bikin, ma dê we nêzîkbûnên çewt raber kiriban? Ger we bikariya mirovê ji bo azadiyê rabûye bibînin kî dizane we çi dikir! Lê mixabin bi we re hêza îradê tine, hêza hezkirinê tine. Paşê jî hûn radibin, pirsgirêkan ava dikin. Ango hûn tîpê Kurdê kevin tînin bîra mirov. Weke dibêje; “Ez dîsa dixwazim weke dizanim evîndar bim, dixwazim ji çiyan birevim, ji gelê xwe nefret dikim.” Ji bilî vê ji hevjîna xwe direve vê carê jî çavên we li cihek din digere. Na, bênamûsiya herî mezin jî ev e.

Şiyar bin, tevgera Rêbertî, tevgera rawestandina vê ye. Ez zilamê wisa, jinên wisa nas nakim, hemûyan jî dixim bin erdê. Em nikarin jiyîna wisa erê bikin. Ger hûn bixwazin, cihê evînên herî mezin ev bingehe. Ger hûn dixwazin, xwe li ser vî bingehî mezin bikin, ji bo evînên xwe yên biçûk jî cîh saz bikin. Pêşketinek ku hûn bikarin ji hemû gelê xwe, jinên xwe, hevjînên

xwe, dostên xwe û hezkiriyên xwe re bi serfirazî bêjin; "ez heme, xwedî nasname me, şerefa min navê mine, navê min şerefa mine" raber bikin û li derdora xwe nirxên ku bên hezkirin ava bikin. Ez ji van rêberên me re dibêjim; Bila keç û xortên ku dildarên azadiya mezin û tên hezkirin li derdora we tije bin. Çima dernakevin? Roja duyek wan terkî îmhayê dikin û dixeniqînin. Li ser vî bingehî sepandin û têgihiştina Rêbertî, karê sereke yê dijmin pêk tînê ye. Ev jî hunera sed salî ya ketiyan û hevkarên di nava me de ne.

Hûn di vê çarçoveyê de dibînin ku, em nirx didin we. Yeqîn dikim di nava rastiyên me de, di refên me de, em cihek ku ti rêxistin newêre ji we re vedikin. Yeqîn dikim em dikarin baldariyek mezin raber bikin. Ne tenê ji bo rojek jinê, ji bohemû roj bibin rojên jinê û dîsa hemû civak û jinên hatine qewitandin biherikin, tişta pêwîst çiye ji hêla siyasî ve rêya wê vekirî tê hiştin û bi israrek mezin hewldanên vê jî kêm nabin.

Di tevahî dîroka şaristaniyê de çînayetiya pêş ketî, di heman demê de pêvajoya qutbûna ji hemû hêz, kesayet û xweşikbûna jinê ye. Ev misogere. Jixwe ev jî di nava civaka me de, gihandine asta herî ketî. Dema em şoreşek pir bihêz sazûman dikin, xeta di siyaseta PKK'ê de, bi qasî azadiya hatiye windakirin û tinekirin, em ji azadiya jinê re jî qeleyan vekirî dihêlin û hêdî hêdî meşa wan a ber bi qelayan ve pêk tînin. Bi vî rengî jî em rê vedikin ku civak ji nû ve dewlemendiyê bijî. Ango li şûna civakek bê jin, civakek bi serdestiya zilam, civakek jin zêde di navê de cîh digire, girêdayî wekhevî, azadî û kesayeta wê ya dev ji xwe bernade pêk tîne ya jin û zilamê azad ava bikin. Çavdêriya vê kirin, ji hewldanên xebatên perwerdeyê heta yên şer ev di hemû pêwendiyan de esasgirtin, dê weke helwestek me ya partî pêş bikeve. Dibe ku zehmet be, lê helwesta ku bingehîn bidest bixîn ev e.

Hemû gelên di bin serdestiya Osmaniyan û serdestiya Kemaslîzmê de kirine jinik û li ser esasê bîranîna yên dixwazin ji vê rizgar bibin û ji bo vê jiyana xwe jî feda dikin, tevgera şoreşa herî girîng ku em bikarin sazûman bikin, bi qasî li hember rewşên van ên dîrokî li dijî yên rojane jî, divê têkoşînek wisa dijwar bê meşandin. Ji vê rewşa ku bi zorê ketiye navê de, ancex dikare bi şerek dijwar ve bersivê bide, kesayet, pêwendî û xweşikbûnên ku hatine windakirin û jiyanên berbiçav bên bidestxistin. Ger min di vê civakê de bi qasî serê derziyê jî cihek jiyînê dîtiba, dê min bijiya. Lê yeqîn dikim kesekî bi qasî me nirz û rêz neda jiyanê û nebû xwedî hewldanek wisa mezin. Dîsa kesekî bi qasî me keç û jin bandor nekir û nekêşa nava têkoşînê. Belê, nêzîkbûna ku me ji rastiya jina ku her tim tine hatiye hesibandin, ji jiyanê hatiye qutkirin, bi navê jiyanê her tişt li ser hatiye ceribandin raber kirî wisa ye. Her wiha em yeqîn dikin, dê ev nêzîkbûn her ku biçe baştir bibîne ku berî her tiştî tişta hatî windakirin çiye û tişta pêwîste bê bidestxistin çiye. Dê van jî li ser bingeha siyasî û bîrdozî bidest bixe û hewldana vê ya rêxistinî û pratîkî raber bike. Partiya me hêj niha ve hêza ku li ser vî bingehî bidest xistiye rast bikar tîne vê qadaku gihandine têkîliyên durû, feodal û heta milkiyetê ku êdî nayê jiyîn, bi temamî veguherîne qadek vîna azad û hilbijartina azadiyek mezin a sazkirina vê pêwendiyê. Hêj niha ve nirxên bêhempa yên di nava PKK'ê de ava bûyîn hene. Her wiha hinek keç û jinan jî di vê rol lîstine. Li şûna ku radest bibe, keçên me yên bi xwedî helwestek lehengî mirin hilbijartîn – îsal jî hinek bi ser vê rastiyê de zêde bûn- hene. Yeqîn dikim xalek ku divê bê fêmkirine. Ev di heman demê de di nava PKK'ê de li dijî jiyana teslîmiyetê, ferzkirinên dijmin ên kevneşop, bersivdayîne. Di vê çarçoveyê de li şûna ku teslîm bibe, îmhabûnê digire berçav, di dîroka me de çi tiştê mirov li hember rêz bigire hebe xwedî li wê derketine. PKK'ê rastiya vê rave kir. Dê ya din jî bi şerek mezin bê bidestxistin. Ne tenê jin, zilamê ku

zêdetir tine bûye jî ji nû ve bê avakirin û bidestxistin. Li welatek ku di bin navê namûsê de bênamûsiya herî mezin tê meşandin de, di nava gelekê de, dê ferasetek namûsê ya rasteqîn bê bidestxistin.

Dîsa vedibêjim: Dibe ku ev şer zehmet be, lê şerek hêja ye ku mirov di xêra wê de şer bike. Pêwîste hemû endamên partî û dostên partî bi zanebûnek kûr a vê rastiyê ve baştir bi ser erkên xwe de biçin. Dîsa em ê li ser vî bingehî saxlem bi ser erkên rizgariya jinê de jî bimeşin. Her wiha em dibêjin, di dawiya vê meşê de jiyana serfiraz, jiyana xweşik, girêdayî welate. Dê jiyanek girêdayî xisleta miletekî bê bidestxistin. Dibe ku li ser vî bingehî jiyanek mînak bê bidestxistin. Li gel van em li ser vî bingehî wateyek mezin didin şerê xwe. Em hewldana vê ya mezin didin. Her ku baştir bê fêmkirin, em ê jî vî şerî baştir bimeşînin. Yeqîn dikim, her ku em vî şerî baştir bimeşînin, dê ev jiyana xweşik û azad jî tam hêjayî me, bi şêweyek em hêjayî wê ser bikevin. Vêca em ê bêjin, em ê ji bilî jiyanek wisa bi qasî misqalekê jî nirx nedin jiyanek din. Weke ku em ê ti nirxê nedin, ji bo serxistina jiyanek wisa jî, em ê her tiştê xwe feda bikin û ser bixin.

***Adar 1992***

### *Jin, Malbat û Hezkirin*

Me beriya niha di derbarê vê mijarê de hinek nirxandin kiribûn. Heta ev nirxandin li Tirkiyê weke pirtûk hatin çapkirin jî. Her çendî di demek kin de hatibin komkirin jî, di astek girîng de bala raya giştî kişand û rê ji nîqaşan re vekir.

Em ê hêjî hewl bidin di van mijaran de encaman bidest bixin. Weke tê zanîn ev mijar, yek ji mijarên herî zêde mijûl dike ye. Mijarek li ser lîstok tên lîstin, ber bi gelek aliyan ve dikişinin, lê ber bi çareseriyekê ve nebirine. Di rastiya Kurdistanê de jî mijarek di xêra wê de kuştin çêdibin û kilam tên gotine. Weke din jî di rastiya partiya me de, pirsgirêkek wisa ye ji darbeyên kuştinê yên dijmin xirabtir xwedî bandorekê ye.

Lewma em dixwazin pirsgirêkek wisa ronî bikin. Ya rastî di astek girîng de hatiye vekirin. Bes em dixwazin di astek zêdetir pêşketî de ronî bikin.

Tarî û ronî, sar û gerim, elektron û proton, pozîtîf û negatîf ji bo xwezayê çibin, jin û zilam jî ji bo xwezayê heman wate ne. Ango nêr û mêtî jî rastiyek xwezayê ye. Bes pirsgirêk ne bibîrxistina vê mijarê ye. Hewce nake mirov di derbarê rastiya xwezayê de jî zêde xwe bide axaftin. Ger mesele di vê astê de bûya!.. Deka ev kar, ev rastiya xwezayê ya xwerû li cem me çawa tê jiyîn, em wê lêbikolin:

Cureyên zextê bi gelemperî heyberekê, diyardeyekê, ji bûna heyber û diyardeyê derdixe. Ger nebatek di bin kevirek pir hişk de darbe bixwe, dê ew heyber ji nebatbûnê derbikeve. Nebat tiştek xweşike, lê ji ber kevir pir hişke wê perçiqîne û derbas bibe. Mirov di xwezayê de bûyerên wisa dibîne. Di nava civakê de jî zextên bi vî cureyî hene. Dikarin ên hewce dike bijîn bi zextek hişk ve ji holê rabikin. Hinekê rastiya gelê me jî wisa ye. Miletek lewaz, miletek ketiye vê rewşê -sedemên wê çi dibin bila bin- dê

tasfiye bibe. Masiyê mezin dikare masiyê biçûk bixwe. Mar gelek çêlikên xweşik dadiqurtîne. Tîmsah, heyberek zindî digire navbera wan diranên xwe yên har û di carekê de dadiqurtîne zikê xwe. Paşê rondikan dibarînin. Ev jî rastîne.

Ya rast hêj di xwezayê de pênaseyek wisa nehatiye kirin; gelo zilamtî di gerdûnê de çiqas derbasdare, mêbûn çiqas derbasdare, mirov dikare giraniyek çawa bide van? Yeqîn dikim mirov bi qasî xweseriya xwe ewqas ne tevlîhev û bi nakoke. Nexasim divê ne li gorî berjewendî ne jî dijberî zêde encamekê nede. Ji hêla zanistê ve jî hatiye selmandin ku, di civaka mirov de pêşketinên dijber ên li ser jinê hatine sepandin, di derbasbûna şaristanî û civaka çînayetî de, di merheleyên pêşketina zext, bêmafî û zorê de hêmana mêbûnê weke dijberiyekê hatiye bikaranîn. Ango mêbûn, bûye mijara zext û zorê. Yeqîn dikim ev tespîtek rast a zanistî ye. Nexwe mêbûn bi tena xwe ne mêtîngerî ne jî hatine mêtîn rave dike. Ne zexte ne jî sepandina zextê rave dike. Nirxandina herî rast rêxistinbûna civakî ya serdestan pêş xistiye, bi zext û zorê ve girêdane. Ger hin xisletên mêbûnê firsendan didin ev ne diyarkere. Mirov nikare lewaziya fîzîkiya jinê jî weke sedemek diyarker bide pêş. Jixwe di dîrokê de jî mînakên weke vê hene. Wê dem ê, zext, zor û çewsîneriya li ser zayend girêdayî pêşketina pergala ne.

Malbat jî, dibe şêweya gerdûnî ya civatên êl û binemalan. Weke peresan an jî şêweyek civatan derdikeve pêşberî me. Yeqîn dikim malbat, ji şêweya civatan ên destpêkê heta roja me, weke saziyek dixwaze xwe bide jiyîn tevlî kar bûye. Sedema kombûna nifşên mirovan li cem hev, rê ji saziyek weke malbatê re vekiriye. Malbat weke şêweya civatê ya destpêkê, zêde di navbera êl û binemalan de cudabûn nîne. Hemû jî heman tiştin. Şêweya rêxistinbûna her civakê çibe, malbat jî wisa ye. Piştî ku malbat di nava civakê de ji hev cuda bûn, bû saziyek cuda, zêdetir civaka çînayetî pêş xist û xisletên wê yên xweser ava kir. Nexwe em

dikarin vê jî bêjin; Malbat bi şêweyên dîrokê yên heyî ve bi pêşketina şaristanî yan jî pêvajoya pêşketina pergala zext û zorê ve her ku çû xwe weke saziyek taybet derxist holê.

Dema pergala koletî derket holê, xwediyên koleyan malbatên bêhempa derxistin holê. Bi rastî jî hinek berhem ên bêhempa yên pergala koletiyê hene. Di serdema koletiyê de ew gorên malbatan, di dewletên koledarî de derketin holê. Gorek malbatên wê demê, ji dergehên niha zêdetir binirx bûn. An jî ji eywanên konseran, cihên şahî û bêhnvedanê tevan zêdetir bêhempa bûn. Ji van goran ev derdikevin holê: Ji bo xwediyên koleyan malbat mijarek mezine. Dîsa yek ji xalên sereke ya zext û zorê jî, malbat çiqas xurt dibe bila be, silale çiqas xurt be bila be, bi vê dewletbûna yekem care dest dixin re, bi vê rewşa jorî civakê yekem care bidest dixin re, ber bi xwedabûnê ve diçin. Malbat jî dibe şêweya vê ya herî zelal. Di heman demê de mirov dixwazin bêmirin jî bin. Mînak, li gorên fîravunên Misrê binêrin, hêjî mumyayên wan hene. Malbata împarator, bi hemû silale, xanedan û jinên derdora xwe ve weke kevirekê cemidandine û di bin erdê de ne. Weke ku li pey bêmiriniyê ne, bi şêweyek ji xweza û civakê mezintirin xwe dikin xweda. Wisa jî vê heta roja me didin jiyîn. Wisa nêzî qesirbendiyan jî dibin. Lê dîsa jî mafê avakirina malbatê ya koleyan tine ye. Ev jî rastiyeke.

Weke tê zanîn xanedandî di serdema feodalî de zêdetir tê pêşxistin. Jixwe xanedaniyên mezin di serdema feodalî de hene. Xanedanên di Îslamiyetê de jî tên zanîn. Weke xanedana Emewî’yan, xanedana Abbasî’yan, xanedana Selçûk'iyan, xanedana Osmanî'yan hene... Her yek ji van dewletên malbatê yên bêhempa ne. Rêzên di vê serdemê de jî, hêdî hêdî mafê avakirina malbatê bidest dixin. Rewşa avakirina malbatê li gorî xweseriya serdema hişkbûnê ye. Ango ji hêla kesîmên jêr ve avakirina malbatê û pêşketina malbatparêziyê bi sazûmaniya feodalî û darvekirina koleyan ve çêdibe.

Dema kapîtalîzm weke pergal pêş dikeve jî vê carê, di astek bêhempa de malbatên burjuva derdikevin holê. Hêjî li Ewrûpa bandorên van pir zindî ne. Hêjî li Fransa, Îtalya û Almanya malbatên burjuva yên pir bihêz hene. Di vê mijarê de Îngîltere jî di heman rewşê de ye. Di pergala Kapîtalîst de li kesîmên jêr, proleterya malbat hinek din pêş ket. Girêdana wê ya bi mêtîngeriyê ve pir vekiriye. Jixwe malbat ji ber mêtîngeriyê pêş nakeve. Ev rewş di nava kole, serf û proleterya de jî wisa ye. Lê di nava çîna mêtîngerî û zextkar de jî, malbat pir baş pêş dikeve. Bes nav malbate!

Belê, divê em pênaseya malbatê çawa bikin? Mane di nava saziyek wisa girêdayî mêtîngerî, berdewamkirina ziriyet, zext û zorê de çi çênabin û lîstok pêş dikevin! Belê saziyek wisa ye, bi rastî jî saziyek ku divê herî zêde bê lêkolînkirine. Ya rastî lêkolîn nû tên kirin. Niha hewl didin naveroka malbatê, bingeha wê ya felsefî û pirsgirêkên ku ava dike bibînin. Nexasim di astek bilind de zêdebûna şêniyan heye. Ango di roja me de çi di nav gelên bindest de û çi jî li welatên kapîtalîst-emperyalîst de pirsgirêkên derdikevin holê gefan li mirovahiyê dixwe. Ger tedbîr neyên girtin, dê ev cîhan neyê jiyîn. Ev rastiyeke. Ger bi vê lezê berdewam bike, dê ev cîhan ji cîhanbûnê derbas bike. Rêxistinbûna malbatê ya heyî yan jî bi vê şêweya tê pejirandin ve malbat-malbatparêzî, dev jê berde weke saziya bingehîn a mirovahî bimîne, êdî mirovahiyê ber bi tinebûnê ve dibe.

Lewra dê malbat û şêweyên pêwendiyên bi wê ve girêdayî bên lêkolînkirin, nirxandin û rêyek derketinê bê dîtin. Ji ber sazûmaniya pêwendiyên di navbera her du zayendan de gefan li hemû mirovahiyê dixwe. Di nava gelên li Efrîka, Latîn Emerîka û Rojhilata Navîn de pêwendiya di navbera her du zayendan de, çavkaniya bûhranê ye. Ev tenê di zêdebûna şêniyan de nayê dîtin. Malbat di avakirina pirsgirêkên weke bêperwerdeyî, betalî û bûhranên ruhî de weke saziyek rûxandinê dijî. Di nava welatên

kapîtalîst ên pêşketî de jî, tê dîtin ku rewşek pêl ji pêlê xirabtir tê jiyîn. Têkîliya cînseltî û taybet jî şêwaza sazûmankirina wê, di vê manê de welatên kapîtalîst ên pêşketî ber bi rûxandinê ve biriye. Quralên ku hatine danîn, di bin navê exlaqê de heta lutkeyê bêexlaqiyê dijî. Li cihek weke Afrîka ku bandorên pergala êl û binemaliyan heye, cînseltî weke nexweşiyekê pêş dikeve. Xerizeyên cînseltî, jiyan aniye rewşek neyê jiyîn. Ev pir vekiriye, pêwîste şêwaza têkîliyên di navbera zayendan de ku leza xwe berdewam dike, taybet jî saziya malbatê bê lêpirsîn û pêdivî heye ji nû ve bê sazûmankirin. Ev têkîlî pir dijwar tên lêpirsîn û hewl tê dayîn li şûna wan ên nû bên pêşxistin. Lê mixabin hêjî ya nû nehatiye dîtin. Ol'an xwestin hinek şêweyan pêş bixin. Dîsa şêweyên civakî-aborî xwestin li gorî xwe hinek tiştan pêş bixin. Xwestin qanûnên exlaqî pêş bixin. Lê hemû jî têrê nekirin, encamên ku dihat xwestin ava nekirin. Gelo dê di derbarê vê pirsgirêkê de felsefeya nû, bingeha exlaqê nû, heta nêzîkbûna nû çibe? Zanist pir pêş ketiye û dikare di vê mijarê de çi bêje? Pêwîste pir baldarî bê nirxandin û lêkolînkirin gelo ev çima wisa çêbû?

Ev pirsgirêk bi temamî ji nêz ve girêdayî pirsgirêkên civakî ye. Di civaka mirovan de ev saziya ku weke saziya herî bingehîn tê binavkirin, di derbarê pirsgirêkên wê çiqas bi vir ve girêdayî ne, çareserî çiqas dikare bê pêşxistin de, hewce nake ku pir kûr bê hizirandin û felsefe bê kirin. Lê pir vekiriye weke pirsgirêkek pir mezin li pêş mirovahiyê rawestiyaye. Zanist dikare ber bi çareseriyekê ve biçe, dibe ku felsefe û exlaq jî bixwazin hinek tiştan pêş bixin. Dê li ser vî bingehî teqez ji şêweyên pêwendiyan re çare bê dîtin û şêweyên pêwendiyên nû derbikevin holê. Dê hingê jiyan jî di nava sînorên bê pejirandin de hinek din aliyê azadiyê pêş bixe û berdewam bike.

Niha jî em ê di çarçoveya giştî de li rastiya xwe binêrin. Rastiya miletek ku têk çûye, bandorên vê yên herî dijwar û

encamên wê weke yek sazî di nava saziya malbatê ya li ser linga mayî de raber dike. Mane tê gotin di dest de tenê malbat maye, gelo bi rastî jî li ser lingan maye? Piştî ku rastiya netewî bindest bû, hemû sazûmaniyên sazî û pêwendiyên civakî hilweşiyan, radest hat girtin, rûxiya, bi zext û zorê re rûbirû ma û bi bişaftinê ve hat tasfiyekirin, malbata di dest de mayî çi wateyê rave dike? Nexasim di xêra wê malbatê de her tişt berçav girtin çi wate ye? Her tişt ji bo malbatê xerckirin çi wate ye? Ji bilî malbatê ti armanc berçav negirtin çi wate ye? Nêrîna "her tişt ji bo malbatê" çi wate ye? Belê, pirsên bingehîn ku divê bên ronîkirin ev in.

Li gorî me kareseta rasteqîn rastiyek malbata me ya wisa heyî ye. Tevî jiyîna vê saziya ku her tiştê xwe tine bûye û winda kiriye bi şêweyek "stargeha min a dawî", "min bê wê nekarî", dîn û îmanê min", "hebûn û tinebûna min" hemêzkirina malbatê, ji rêderketinek mezine. Biyanîbûna li hember cewherê xwe ye, tinebûne, xwe ji dervî rastiyan hiştin û apolîtîkbûne, li dijî netewbûnê ye. Heta malbata li cem me, li hember saziyên civakê yên din, rewşên weke kesayet xeşîm dihêle, betal dihêle ava dike. Ew kesayetên di nava rastiya malbatê de mezin dibin jî em in.

Nexwe li welatek din nirxa muhafezekariya malbatekê li cem me di asta hezarî de ye. Nexasim ger ev jî ev xisletên serdema binemaliyek seretayî ve mabe, dema bi rêbazên dijmin ên şerê taybet re dibe yek û pêşkêşî me dikin, ev jî tê wê wateyê ku em bi karesatek rasteqîn re rûbirû ne. Jixwe zarokek hêj çavên xwe li jiyanê nû vedike ewleya wî tev şêweya malbatê ye. Dema hinekê jî mezin dibe yekser ewlebûnê di avakirina malbatê de dibîne. Yekser bi hemû hêza xwe ve dibêje; "Em pir hewceyî hevin, em ê bi her tiştê xwe ve xwe bidin jiyîn." Ciwan jî pîr jî heman tiştê dibêjin. Ev netewe, civake, nizanim pêşxistina sazî û dezgehên dine, ne di xema wan de ye. Van hewce nabîne.

Min ev rewşa malbatê di pêwendiyên xwe de zû ferq kir. Ango min ev jiyana mezin a di nava saziyek teng a weke malbatê

de hatiye fetisandin ferq kir. Ev tê çi wateyê? Van mirovan saziyek din ne pêşxistine û heta bûne xwediyê nêrînek weke “kesê malbatê yê herî kirêt, herî xweşik, bê mafî, herî rast, netebitî, herî baş.” Ev rewş jî bi mafdar ez di demek zû de xistim nava fikaran. Ev rastiyek wisa ne, xwe bi şêweya “her tiştê ji malbata min bêhempa ye û dev jê nayê berdan” rave dike. Ev jî malbatparêziyek pir dijware!

Tam jî di vê rewşê de malbatparêzî heye. Lê di civakên din de, malbat bê nirxe, heta ger hinekê jî pêşî lê bigire dê dijmin bibîne. Malbatparêziya li cem me, di vê wateyê de bi eşîrtî û binemaliyê re ber bi pevçûnek herî kûr a tinebûnê ve dibe. Ger ne hatiba gotin; “eşîreta min, berjewendiya eşîret û binemaliya min”, berendamtiyek pêşketinê de bûya, dê aliyê beramber jî ne bendewariya çewsîneriyê de bûya. Ya herî xirab jî muhafezekarî ye. Çavên wî ji bilî malbat, eşîret û binemaliyê tiştek din nabîne. Pêşveçûnek sazîbûnek netewî û civakî napejirîne. Ev hêjî li cem me serwere. Divê mirov vê hinek din veke.

Niha dema em plansaziyên xwe yên çalekiyan jî pêş dixin, divê em rastiya malbatparêziyê baş berçav bigirin. Ji ber ku hemû sazûmaniya zilam, sazûmaniya malbatê ye. Ji bo wê rizgar bike dibe sîxur, dibe cerdevan, dibe hemal, dibe zilamek herî xirab ê kêr naye. Çima? Ji bo sazûmaniya malbata xwe rizgar bike. Jixwe yên di refên me de jî, ango hûn, heta qirika xwe di nava pirsgirêkên malbatî de fetisîne.

Hêj dor nehatiye jinê, dor nehatiye zilam. Hûn di nava saziya malbatê de bûne koleyek, dîlek û muhafezekarek û derketine. Em dem bi dem dibêjin rastiya me ya netewî û civakî, lê zêde ne rasteqînî ye, qinyata min pê naye. Kîjan rastiya netewî, kîjan rastiya civakî! Ger hebe rastiya tîpê Kurd a malbatekê heye. Malbatparêzî, li dijî netewbûn û civakbûnê ye jî. Ketiye rewşek wisa bûye dijberê herduyan. Li şûna ku pêwîste hêmanek netewbûn û civakbûnê be, sedî salan bi destê dijmin rola paşverûtî

lîstiye û di seknek dijbertiya netewbûn û civakbûnê de ye. Divê ev baş bê dîtin. Aliyê herî xirab ên teşegirtina kesayetan de, di astek herî jor de li ser bingeha malbatparêziya pêkhatine. Sedemek girîng a mohra xwe li kesayetê dayî jî ev e. Mane dibêjin “gurê bavê xwe”, “keça malbatê!” Ji bilî vê pênaseyek din nîne! Asoyên we yên netewî, xisletên we yên netewî û heta rewşa pêşketina we ya civakî çiqas çewte! Mînak rapor tên, em lê dinêrin, zilam hêj gavekê jî sînorên malbatê derbas nekirine. Rêxistinê jî wisa dibîne. Li hevalê di asta herî jor de dinêrim, tişta didin axaftin malbatparêziyek herî hêsane. Partiyê jî weke malbata xwe dibînin. Hem jî ne di ferqa vê de ye! Camêr wisa mezin bûye! Me ev partî wisa ava nekir. Me li ser bingeha dijbertiya malbatparêziyên wisa ava kir. Lê mixabin zilamê di nava me de di navbera du rojan de partiyê vediguherîne malbata xwe. Ma hûn çima wisa ne? Ev e ji were, sedema vê malbatparêzî ye.

Min ev got: Ji heft saliya xwe ve gumanên min li hember vê saziya malbatparêziyê hebû. Min li hember wê şer kir û wisa xwe pêş xist. Lê hûn zarokên parazvanê malbatê ne. Kesên ku hemû nirxên malbatê pejirandine, nikarin xisletên bihêz ên netewî di kesayeta xwe de bihewînin û xisletên bihêz ên civakî pêş bixin. Li we dinêrim, hûn hêj negihiştine xisletên bihêz ên civakî û netewî. Sedema vê jî hûn pir bi kesayeta malbatî ya muhafezekar ve girêdayî dimînin. Mirov dikare herêmparêzî û çandên din jî ên paşverû bi ser ve zêde bike. Jixwe ev xislet bi we re zêde ne.

Nexwe di nava me de malbatparêzî rewşek nexweşiyê rave dike. Ev nexweşî heta dawî li ser kesayet bi bandore. Di heman demê de hem jêr hem jor bi bandore. Ango hem di malbatên feodal-hevkar û burjuvayên nû de hem jî di malbatên gundî û xwedî bingehek burjuvaziya biçûk bibandore. Di biwêja; “hebûn û tinebûna min, her tiştê min ji bo malbatê ye!” de, polîtîkaya esasî tê ravekirin, her tişt li derdora berjewendiya

malbatê hatiye destnîşankirin. Heta meseleya jiyanê jî bi vê ve girêdayî ye. Lê di rastiyê de şoreşgeriya me ji destpêkê ve baş dizane ku, heta ev mijar wisa neyê rexnekirin, gelek bandorên vê neyên şikandin şoreşgertî nabe û partîbûn jî pêş nakeve. PKK'yîbûn, di vê wateyê de li dijî bandorên malbatparêziyê navê şerek sazûmankirî ye. Bi qasî li dijî bandorên mêtîngeriyê ye, ewqas jî li dijî bandorên malbatê jî şer dike.

Zêde hewce nabînim van mijaran vebêjim. Jixwe têra xwe hatine vekirin. Lê dîsa jî rastiya malbatê li cem me wisa pêş dikeve. Tişta bi navê "berjewendiyê" ji hemû endamên civakê re hatiye diyarkirin, berjewendiya malbatê ye. Dema tê gotin "zilamê qenc be", ango hêjayî malbata xwe be. Ango hemû amûrên hedefan, hewldan, lêgerînên pêwendiyan, heta xwendin û hwd tiştên wisa hemû jî di nava sînorên malbatparêziyê de tên ravekirin. De em bêjin te ser xist, veca te çi bidest xist? Te malbat rizgar kir çi bû? Malbata te rizgar kirî çiye? Dema te malbat rizgar kir, netew ji dest çû, gel ji dest çû. Deka em li netewên din ên hemdem binêrin, tişta wan dike hebûn, sazî û dezgeh çi bin, te nekarî tu nêzî wan jî bibî. Te nekarî tu li kêleka sazî û dezgehên ji bo netewa te hewce re derbas bibî. Te cîhek pênc quruşan neda. Ev jî di berdêla malbata ku te rizgar kirî de, tiştên hatine windakirine. Nexwe ev rizgarkirina te ya malbatê xirabe! Dîsa gelek nirx di astek herî xirab de tên windakirin.

Gelo mijarên tên vegotin, tên fêmkirin? Em çima li dijî vê sazî û felsefeya malbatê şer dikin? Dema behsa kesayeta Kurd tê kirin, bê esle, li hember mirovahî, netewî û civakî girtiye. Ji bo tenê wan têkîliyên xwe yên malbatî rizgar bike, ti welat û berjewendiyên ku nefiroşe nîne. Tiştek ji bo malbata xwe nefiroşe nîne. Bes bila, ew malbata xwe rizgar bike!

Belê, me li dijî vê kesayetê şer daye despêkirin. Kesayeta alternatîf a PKK'ê, kesayetek pir radîqal û rizgarvanê netewî ye. Hûn vê di pratîkê de jî dibînin. Ji ber ku PKK baş dizane, ev

pirsgirêk bi derbaskirina malbatê ve girêdayî ye. PKK, dixwaze ji civakbûnek azad re rê veke. Lewma neçare vê saziya malbatê ya heta dawî muhafezekar û dijberê azadiyê hilweşîne. Jixwe di vê saziyê de îxanet pire. Ji ber dijberê rizgariya netewî ye, neçare em xelekên malbatê parçe bikin. Herî kêm mirovên li ser bingeha xayîntiyê ne parçe bike. Di nava mercên malbatê de biyanîbûn heye, êrîşî netewbûn û civakbûnê dike. Rastiya netewî û civakî înkar dike. Lewra bandora malbatparêziyê êrîşî netewbûn û civakbûnê dike. Bila ew têkîliyên nav malbatî û cîhana malbatê yên ji rastiyan re girtiye bê parçekirin, daku netewbûn û civakbûn pêş bikeve.

Ev hemû, jin û zilamê ku em di demên dawî de dixwazin derbixin holê tînin bîra me. Me di demên dawî de girîngî daye lêpirsîna jin û zilam. Gelo me çima girîngî da lêpirsînê?

Ji ber rewşa zilam a sexte û zêde zilamtî, rewşa jinê jî ya zêde jinwar me dide hizirandin. Zilamtî piranî bi gelemperî egîdî û cînseltiyê ve heman tê destgirtin. Weke “ev camêrê weke zilaman”, “ev jina weke zilaman” tê ravekirin. Ev jî weke avantajekê tê hizirandin. Tişta em jî destpêkê li hember vê bêjin, ger ev camêr zilame, çima erka xwe ya rizgarvaniyê pêk nayîne? Ango ger egîde û zilame, wê demê bila pêwîstiyên wê jî bicîh bîne. Vêca pêwîstiya dahûrandina zilam namîne. Em zêdetir hewl didin zilamtiya di kesayeta Kurd de têbigihijin.

Xisleta zilamtiya di kesayeta Kurd de, yek ji xisletên zilamtî ya hatî jirêderxistine. Xwe gihandina hestê zilamtiyê ve weke ku hemû nakokiyên xwe çareser kirine. Nexasim zilamtiya di mijara cînseltiyê de, weke ku di kesayeta xwe de mêtîngerî tine kiriye, dewlet saz kiriye hestekê ava dike. Ev biyanîbûnek mezin û xapandinek mezine. Ger hinek xisletên civaka Tirk û dewleta Tirk bînin bîra xwe, dê ev baştir bê fêmkirin. Dîsa li hember jinê sekna zilam a cînseltî, weke ku parek lehengiyê didiyê hestekê dijî. Tiştek ecêbe! Lê ev rastiyeke. Bes di civakên din de ne di vê

astê de ye. Dema em di vê mijarê de zilamê Kurd baş lêkolîn bikin, em ê bibînin di wê wateyê de tenê bi têrbûnekê li ser xwe ye. Hevjîna xwe kiriye jinik. Jin jî jixwe hîn zêdetir bûye jinik. Li ser vî bingehî ew bi xwe jî hîn zêdetir zilamtiyê dijî. Qaşo wisa jî hemû nakokiyên wî hatine çareserkirin!

Baldar bin, girêdana vê pir ji nêz ve bi nirxandina malbatparêziyê ve heye. Çawa ku, rizgarkirina malbatê, ji rizgarkirina welat girîngtire, ji bo zilam têkîliya cînseltî jî ewqas girînge. Ev jî bi zilamê ku şampiyon re çawa zelal dibe? Dîsa têkîliya zilam a bi jinê re çawa zelal dibe? Ya rastî zilamê Kurd di mijarên din de, li dijî dewletê, dijî netew, dijî nirxan û pêwendiyên civakî tine bûye. Vêca ew despotiya ku di nava malê de çalek pêk tîne çi pêwendiye? Ev pêwendiyek di derbarê jinê de ye. Ji cînseltiyê destpê dike, ber bi her cure çewsîneriyê ve diçe û didome. Jixwe ger mirov bal bidiyê, zilam bûyera cînseltî tam weke bûyerek serdestiyê digire dest. Her têkîliya cînseltî ku pêş dixe, weke ku şampiyone dinirxîne. Niha ev rewş ji rêderketinek pir cidî ya exlaqî ye. Divê mirov vê wisa binirxîne.

Di civakên cuda de, di merheleyên dîrokî yên cuda de, têkîliya pir xwezayî, çima di nava rastiya me ya civakî de naverokek din rave dike? Ev ji bo Tirkiye jî derbasdare, heta ji bo gelek civakên din jî derbasdare. Herî zêde jî em hewl didin di nava rastiya me ya civakî de vê hinekê çareser bikin. Nexasim em niha jî hewceyî vê ne. Ango ger miletekê di nava vesazbûna civakbûn û netewbûnê de her tiştê xwe winda kiribe, di her tiştê wî de windakirin hebe, divê endam qet nebêjin; "Ez pir mezinim." Hêjî ev rewş ji hêla endamên me ve dibe mijara pêkenokê. Qaşo zilamên Tirk, li hember zilamên Ewrûpa pesnên xwe didin! Ev çîroke! Li cem me jî ev hezar qetî zêdetir ecêbe. Ji ber hîn zêdetir rê ji bandorên civakî û encamên xirab re vedike. Yeqîn dikim xala ku pêwîste herî zêde em şerê wê bimeşînin ev

xale. Ciwanên ku di temenek evqas biçûk de fêrî cînseltiyê bûne gelo çi winda nakin?

Ger cînseltî yan jî evîn li ser bingeha azad –jixwe mijara nîqaşê ye ku wê li ser bingehek azadî ya çawa be- bê nirxandin, dê ev rê ji pêşketinan re veke. Dê ne ji biyanîbûnê re, dê rê jihevgihîn û jiyana watedar re veke. Ger di nava aloziya civakî an jî koma têkîliyan de cînseltî weke amûrek çareseriyê bê hizirîn, dê ev rê ji karesetê re veke. Gelek kes jî ji ber ku azweriyê wan ên cînseltî ser nakevin xwe dikujin. Ya rastî ev jî nexweşiyeke. Di rewşek wisa de jî xwe xilasbûyî dibîne. Kesên wisa, qurbanê xwe xapandinek mezinin. Dema cînseltiya zilam çalek be, xwe pir bihêz dibîne. Ji ber vê jî pesnê xwe dide. Bal bidinê, herî kêm bi qasî seriyê din, ango bi qasî ya herî lewaz xwe pir tengav kiriye. Ev hem hewce nake, hem jî xetere. Civak jî herî zêde ji vê rewşê bêzar bûye. Elbet ne tenê ji ber têrbûna xerîzeyên cînseltî, ji ber di asta civakî de encamên xirabtir derdikevin holê. Kesek ku ji hêla cînseltî ve pir birçî be, dê ne yek, du an jî sê jinan bigire, bi serve jî biçe kerxaneyan, ew jî têrê nake, sûkên vekirî li jinan digire. Jixwe di kêliyekê de jî baş tê fêmkirin ku ev rewş ji rûxandinên çawa re rê vedike. Vêca pergala di nav civaka me de binêrin, rewşa kesên ku xwe pir baş, pir bi namûs û parazvanê malbatê dibînin di mijara jinê de, di asta nexweşiya civakî de ne. Nexweşiya ku ev jî belav dikin, ji nexweşiya ku dijmin belav dike zêdetir xeternake.

Yek ji xalên ku min li hember isyan kirî jî ev bû: Dema digotin, “me tu anî dinê”, min jî digot, “ger we ez anîme dinê bê esliya herî mezin jî we kiriye. Ti derfetê we ya ku min weke zarokek baş mezin bike tine ye. Ji bo we ez anîme dinê her tim serê min dixwin. Madem hûn ê tiştekê nedin vî zarokî, hûn bi kîjan dilî vî zarokî tînin dinê” û wisa bersiva wan dida. Min di temenek biçûk de ev ferq kir. Madem zarok pir binirxe, wê tu jiyana wî jî amade bikî. Ma malbatên me van tiştan dihizirin? Ma

jin û zilam vê tiştê dihizirin? Gelo nexasim zilam vê tiştê dihizire? Na, herdu jî nahizirin. Di vê wateyê de bê exlaqên mezinin. Gelo tu ji bo zarokê xwe yê hêja çi dijî? Belê niha jî hemû li her çar aliyên cîhanê û metrepolan belav dibin. Lê jin û zilam ji mêj ve tawanbarin. Elbet ew jî bêçare ne. Di 15 saliya xwe de xwe tine kirine. Ma cuda çi dikarin bikin? Jixwe êdî noqî çiravê bûye, jin çi fêm dike û zilam çi fêm dike? Ji sedî salan ve vê rewşê dijîn. Lewra pêngava şoreşgerî ya mezin, li dijî van têkîliyane. Belê pêwîste mirov biyanîbûn û çewtiya bibîne.

Weke min gotî, zilam serkeftina xwe ya di cînseltiyê de, weke çareseriya hemû nakokiyan dinirxîne. Lê di rastiyê de pirsgirêkên herî mezin jî di vê kesayetê de rû didin. Heta çi ji ber nekêrhatina wî, çi jî ji ber zexta cînseltî dibe dema têr nabe, dîn û har dibe, êrîşkar dibe, kompleksan dijî, her cure tolazî û beredayîtiyê dike. Dibe çavkaniya pirsgirêkên bi qasî çiyan. Li şûna ku çareseriyê di mercên rast û xwezayî de bigere, hîn zêdetir biyanîbûnê dijî, diçewsîne, jin digire direve, bi zorê birçîbûna xwe ya cînseltî têr dike, her cure rêyên bê exlaqî diceribîne û wisa jî ji rêderketinên wî dikeve rojevê. Ger hêza wî têra vê jî neke vê carê helwestek keşeyan raber dike û dijî. Ev bi cureyek din a jirêderketinê pêş dixe.

Li ser vî bingehî kesayet di civaka me de hîn zêdetir hem parçe bûye, hem jî nexweşe. Niha qelen an jî pereyên ji bo avakirina malbatê ne kêmî 20-30 milyonane. Di demên berê yên tê bîra min de xortek deh salan kar dikir, tenê dikariya malbatekê saz bike, yan jî ne dikariya. Niha hîn zehmetire. Zilam tenê ji bo malbatekê ava bike, ji 15 saliya xwe heta 25 salî, neçar dimîne ku xwe di nava sûkên kar ên erzan de bifiroşe. Ev ne tenê ji bo rizgarkirina malbatê, di heman demê de ji bo domandina malbatê tê kirin. Dema zar û zêc jî zêde bûn, hingê zêdetir pêdivî bi pereyan çêdibe.

Mirovên me li ser vî bingehî mezin dibin. Mirov li hember vê saziyê metirsiyê dijî. Pratîka min tê bîra min. Dema min ev weke mijûlbûnên jiyanê yên bingehîn dinirxand, pirsên min ên destpêkê li ser vî bingehî pêş ketin. Ma dema malbat, dê û bav te tînin dinê her tiştî rave dike? Min pirsên wisa ji xwe kirin. Bertek jî li ser vî bingehî pêş xistin. Dema saziya malbatê xeterî û xwe li ser me ferz kir, me dîsa lêpirsîn li ser vî bingehî pêş xist. Her wiha baş tê bîra min, herî kêm bi qasî eniya dijmin, min lêpirsîna vê eniyê kir, heta gihiştim helwestek rast min şerek rasteqîn meşand. Pêşketina vê ya bi Rêbertiya PKK'ê re û cardin sedema hebûna vî şerî dîsa PKK ye. Bi qasî şerek zehmete, ger ev şer neyê meşandin jî, yeqîn dikim dê misqalek jî gav neyê avêtin.

Divê em li vir yekser vê bêjin; Ger îro kesayetên we di bin bandorên giran ên malbatparêzî û cînseltiyê de bin, hûn nikarin hêz û têkoşîna xwe gihandina çareseriyê raber bikin, ev dide diyarkirin ku hûn çima kesayetek wisa ne. Sedema bingehîn a we di wextê de çareserî ji van pirsgirêkan re pêş nexist, nexasim xwe tevlî têkoşînê nekir, lewazî, biçûkmayîn, ji gelek aliyan ve nepêşketina we û hûn nebûn şervanek mezine. Hûn muhafezekariyê û têrbûnê jî ji ber vê kesayeta çewtbûyî dijîn.

Ya rastî ev karê wêjevana ne. Ev mijar li vir wisa pir vekirin gelo ji bo rêxistinek şer çiqas bi rasteqînî ye? Lê dîsa jî hewce dike mirov mijarê bi xetên giştî ve şîrove bike. Ji ber li dibistanên Herbê yên li Tirkiyê jî ev mijar tên nirxandin. Binesaziya malbatên "saxlem" li ser serbazan ferz dikin. Ev jî şert û mercek pir girîng a serbaziyê ye. Serbazek divê nêzîkbûnek rast a malbata "saxlem" bijî! Dema ew vê weke bingeha muhafezekariyê dihizirin, elbet hûn jî weke bingeha şoreşê vê saziyê rexne dikin.

Qet nebê em van pirsan jî zelal bikin. Ji hêla cînseltî ve jirêderketinên mezin tên jiyîn. Ji du aliyan ve tê jiyîn. Lêgerîna zêde ya xwe têrkirinê, bi şêwaza dilketinên xwe yên cînseltî ji rê

derketî dide der. Nexasim zewaca zilamên temen mezin ên keçên temenê wan biçûk re mînaka vê ya sereke ye. Helwestek din berovajî vê jî, di bin navê Ol'î de tevdigerin, dest û lingê xwe ji her tiştî dikişînin, nêz nabin û vê tam weke gunehekê dihesibînin. Ev jî cureyek ji rê derketinê ye. Malbata ku li ser vî bingehî hatiye pêşxistin, tam di nava tengezariyê de ye. Weke ku nikare cînseltiya zêde têr bike, ji ber dogmayên ol'î yên li dijî malbat zehmetiyê jiyan dike. Jixwe sedema malbat bûne dergehek bûhranê bandora van helwestan pir mezine. Mirov dikare mijarê weke têkîliyên jin û zilam bigire dest. Lê encamên vê yên din jî hene. Me vegotin. Şaşiya herî mezin, dema dibêje; "Min malbat baş saz kir, jin kir jinek tam, tam serwerim", zilam hingê xwe zilam dihesibîne. Dibe qey zilam hemû karên cîhanê bicîh anîye! Ger têkîliya jin û zilam di nava malbatê de bi vî şêweyî saz bibe, dê ji muhafezekarî, paşverûtî, faşîzm û mêtîngeriyê re zemînek mezin bê amadekirin. Hêza beramberî me, hewce bike dê jinê bike polîs jî. Jixwe heta di nava refên me de jî ev dan jiyîn. Ango dê jinê baş bikar bîne. Çavbirçîtiya cînseltî, bi şêweyek xistinê dinirxîne. Dîsa ya ku di qadên sînema, televîzyon û kerxaneyan de tê pêşkêşkirin jî jine. Firotina jinan pir zêde belav bûye. Li Êlihê, Mêrdînê vir û wir pir zêde pêş ketiye. Vê çekê pir bi bandor bikar tîne. Civakê danin aliyekê, hewl didin me jî bixin. Êdî li hember hêzên ku cînseltiyê weke guneh dibînin, çeka ol'î bikar tînin. Jixwe têra xwe bikar aniye. Niha Hizbullah li her derî belav kiriye dibêje; "PKK malbatê azad dike, ev êrîşek li hember darez ên nirxên me ne" û wisa êrîşkariyek dijber dimeşîne. Ev her du tîpên ku ji rê derketinên cînseltî dijîn jî, li hember rizgariya netewî û şoreşgerbûnê rola dijbertiyê dilîzin. Ev jî çavkaniya xwe ji zemîna ku em dixwazin çareser bikin digire. Di bikaranîna vê zemînê de rola van rastiyan heye. Elbet yekser pêwendiya van zemînan bi dijmin re heye û heta dawî ji bandorên dijmin re vekirîne.

Encamên vê yên din jî, tenê ji bo xwarin û avê bidin zarokan û wan têr bikin, xwe li sûkan bi çil caran difiroşe. Xwendina dibistanan zehmete. Bê perwerdeyî û nezantî heta dawî heye! Tenê ji bo perwerdeya zarokekî dê û bavek neçare gelek fedekariyan bike, heta xwe xilas dike. Vêca malbatên ku deh-bîst zarokên wan heyî dê çawa ji bin vê rabin? Weke ku ev pirsgirêkek pir girane, sedemek rasteqînî ya kolebûnê ye jî. Ji bo mûçeyekê bigire, karekê peyda bike, çi namîne reîsê malbatê nake! Ger vê jî çareser neke, tê şer dike, zarok û jinê difiroşe. Jixwe dema zarok jî li malê aramiyê nabîne, xwe davêje kolanê, keç ji malê direve, zarokê kur dibe tolaz. Lewra sedema pir dijwar a awarebûnê malbate. Qaşo malbat awarebûnê naxwazin. Lê di rastiyê de çavkaniya awarebûnê jî malbate. Naxwazin keç ji malê birevin, lê dîsa çavkaniya reva ji malê feraseta malbata seqete. Tevî ku rastî wisa ye, malbat xwe weke nûnerên exlaq didin nasîn.

Dikare pirsgirêk wisa bê destgirtin. Em dixwazin yek-du aliyên wê yên cuda jî ronî bikin. Nexasim di ber bi çareseriya şoreşgeriya rast çûnê de, hewce dike mirov hinek rastiyan bibîr bîne. Hinek rexne hatin kirin. Pirsgirêkên ji ferasetên şaş re rê vedikin hatin diyarkirin. Em dikarin hêjî berfireh bikin. Nizanim gelo hewce dike? Lê dîsa jî pêwîstî bi nirxandinên ku li ser çareseriyê tam bi bandor bin heye. Dê dema pêş ev hîn baştir bidin der. Ne tenê di civakê de, nexasim di nava partiyê de em dikarin çareseriya pirsgirêkê hîn zêdetir bidin pêş. Xala ku divê bê fêmkirin û ronîkirin ev e; Çawa ku di civakê de saziya malbatê, weke saziyek ketîbûna têkîliyên jin û zilam, xwe du cureyan firotine, her cure ji rê derketinan, her cure biyanîbûnê tê nirxandin û ev nirxandin çiqas cidî ye, di nava partiyê de jî bi bandorên malbatê re jî têkoşîn ewqasî girînge. Ji ber divê ev bandor derbasî nava partiyê nebin.

Di nava partiyê de çareseriyek rast avakirin û rêya rast dîtin girînge. Vêca ev çiye? Ya rastî ev mijarek pir kûre. Lê hinde ev mijar hatiye berovajîkirin, di tevahiya dîrokê de ji hemû bêşerefiyê re zemîn amade kiriye, lewma ew di serî de çareserkirin, weke hûn dizanin ne hêsane. Ev ne bi zewacên şoreşgerî yên erzan ve ne înkarkirinê û ne jî bi rêbazên di dest de girtinê ve tên çareserkirin. Pirsgirêk hîn birfirehtire. Bi qasî dîrokî ye, ewqas jî pirsgirêkek divê di vê rêyê de têkoşîn bê meşandin. Dema otorîteya partî pêş dikeve, milîtaniya partî hêz bidest dixe, tişta yekemîn tê bîra mirovan, hukumkirina li ser mirovane. Şêwazek zext û zorê ya li ser mirovan hukumkirinê heye. Lê ji aliyek din ve jî otorîte weke şêwazek azadkirina mirovan jî dikare bê bikaranîn. Ger qadroyên me di nava têkîliyên malbatê yên kevneşop de bin, di bin otorîteya dewletê de mezin bûbe, dê vê otorîteya partî bi otorîteya dewlet û malbatê ve têkilhev bike. Lewma hinek qadro dema dibêjin; “Ez ê otorîteya xwe li ser endamên partî û gel bimeşînim”, nêzîkbûnek pir xeter raber dikin. Bi vî rengî jî ferasetên otorîteyên dervî xwe erê dike. Ger ev jî bi şêweya koletî diyar bibe, dê hîn xeternak be. Lê kêr nayê, tevnagere, ti agahiya xwe ji otorîte û rayeyê nîne. Kî ji koleyekê re çi bêje, dê wisa bixirike. Wisa bimeşe û biçe. Ev jî pir xetere. Dema ev jî bi pîvanên zilam ên kevneşop ve li ser jinê tên sepan, rewşek pir xeter derdikeve holê. Dê li hember azadî û wekheviyê teng be û xetere. Ger mirov di bin bandora giran a nêzîkbûnên kevneşop ên têkîliya di navbera herdu cînsan de bimîne û li ser bingeha înkarê bê destgirtin, -ev li herdu aliyan jî pir bibandore-dê pirsgirêkê giran bike û çareser neke. Ji ber asta çand û perspektîfa vê lewaze, ya herî girîng jî hewldan û têkoşîna vê lewaze. Pirsgirêk bi vê nêzîkbûnê çareser nabe. Berî her tiştî di asta feraset de xwe ne amadekirine. Gelo bi kîjan ferasetên bingehîn ve nêzîkbûn ji têkîliya di navbera cînsan re bê kirin? Di ferasetê de tişta destpêkê tê bîrê, bi şêweya, “diya min çi li bavê

min kiriye, yan jî bavê min çi li dayîka min kiriye, yan jî li kolanan, di televîzyonan de ev têkîlî çawa tê pêşxistin, ez ê jî wisa bikim" derdikeve holê. Asta vê ya dîrokî, azadî û şer tine ye. Di rêze filmên televîzyonê û filmên sînemayê de tiştên hatine fêrkirin dike. Nêzîkbûnên ji van deran girtiye, di malbatê de dîtiye û fêr bûye pêk tîne. Jixwe tê zanîn ku ev jî çiqasî bi nexweşî ne. Heta ev nexweşiyên ji hêla faşîzmê ve tên kûrkirine û nêzîkbûnên bermahiyên ji qonaxên despotîzmê ne.

Gelo dê ji bo rastiyê hêz bê raberkirin? Ev jî bi radeya azadiyê ve girêdayî ye. Ev her wiha endamên me çiqas azadin an jî milîtanên şoreşgerin ve girêdayî ye. Ger em gihiştine van encaman, ev jî bi şoreşgertiya me ve gengaze. Em çiqasî serê xwe li ser vê pirsgirêkê dêşînin, hebûna me ya şoreşgerî me neçarî vê dike. Jixwe em bi dîwarên malbat û cînseltiyê ve jî rûbirû hatin. Lewma her carê çareseriyê xwe ferz kir. Me ji xwe re got, tu Rêberê partiyêyî, neçarî hêza çareyê bî. Ji bilî vê tu nikarî ji bin vî karî derbikevî. Jixwe ne gengaze ku bi nêzîkbûnên erzan ên weke "nizanim zehmetiya dijîm, an jî otorîteya min bihêz bû, ez jî dikarim xanedanekê saz bikim, dikarim berovajî Rêbertiyê tevbigerim" ve rewşa heyî bê rizgarkirin. Dê ev nêzîkbûn te lewaz bixin. Lê nêzîkbûna ez dikarim "înkar jî bikim", dê te bixe nava pêvajoyek şoreş û jiyanê ya pir hişk girêdanek wan bi hevdu ve heyî. Ji ber vê wê tu çareser û ferasetek kûranî û hewce dike di pratîkê de vê pêk bînî. Em li ser vî bingehî nêz dibin. Divê bê fêmkirin ku pêwîste nêzîkbûna milîtanî wisa be.

Pêwîste di vê mijarê de feraseta me çibe?

***Ya yekemîn***: Divê mirov li dijî malbatperestiyê xwedî seknek be. Hûn ê taybetmendiyên malbatperestiyê derbas bikin. Hûn ê saziya malbatê, hest, hezkirin û bandorên xwe yên girêdayî malbatê teng bikin û derbas bikin. Hûn ê dev ji huquqa malbatî û huquqa sînordar berdin. Hûn ê dev ji ferasetên malbatperestî û ferasetên sînordar berdin. Hûn ê dev ji fêrbûn û bêrîkirinên

malbatî berdin. Reva ji malbatê jî weke rizgarbûnê nebînin. Derbaskirin cuda ye, jê rev cuda ye. Ji vê hêlê ve nêzî pirsgirêkê bibin. Vê jî ji bîr nekin, ev sazî ne bi serê xwe ye, saziyek taybet ku dijmin pir bi zanebûn digire dest li dijî te dihune û bikar tînê ye. Bingeha vê ya dîrokî pir bi hêze. Jixweber jî neketiye vê rewşê. Jixwe tenê ev sazî, li Kurdistanê li ser piyan maye. Lê mixabin saziya herî zêde bûye bela seriye jî. Li pêş pêşketina civakbûn, netewbûn û mirovbûnê ji aliyê huquqî ve astengiya herî mezine. Ev mijar dikare bi milîtanbûnek bi sazmûmanî ve bê derbaskirin. Ji bilî vê rêyek din nayê hizirîn.

***Ya duyem***: Hûn ê girêdayî ya yekemîn têkîliya jin û zilam, malbatperestiya ji derdor hatiye girtin û şêwaza têkîliya weke encama jiyana çanda dewletê ferz kiriye derbas bikin. Hûn ê di vê çarçoveyê de bi vî çavî li têkîliya di navbera cinsan de binêrin. Hûn ê nirxa ku ji têkîliya di navbera cinsan de pêş dikeve re tê dayîn ne bi çanda sînema, ne bi çanda televîzyonê, ne bi pîrozkirina dewletê û ne jî bi helwesta exlaqê malbatê ve yeksan bibînin. Hûn ê hewl bidin girêdana uslup û rêgezên têkîliya di navbera cinsan de ya bi mêtîngerî, dewlet, otorîteya paşverû û faşîzmê re bibînin. Nexasim hûn ê bibînin ku nêzîkbûna ji jinê re ya heyî xizmetê ji faşîzmê, zext û otorîteyê re dike, kesayet wisa çewt û biyanî dike. Ev ne tenê ji bo zilam wisa ye. Divê jin jî vê baş bibîne. Ango hûn ê bibînin rewşa heyî bi xirabiyan ve barkiriye, dixe, muhafezekar dike, bê tebat dike, ji hêla madî û manewî ve lewaz dike. Kesên ku her tim li pey cînseltî dibezin, dê ji hêla madî ve jî ji hêz bikevin û ji hêla manewî ve jî. Hûn ê vê wisa bibînin û helwest raber bikin. Bes divê bê zanîn nêzîkbûnên li gorî bawermendî guncav û înkar jî ne çareserî ne, berovajî dijberiya quralê jiyanê ne û dê ev jî rê jirêderketinek din re veke.

***Ya sêyem***: Hûn ê xwe mijarên weke; "Gelo ez ê bikarin nêzîkbûnek rast û durist ji vê têkîliyê re bikim?", "Ma ev hêza

min heye?", "Tevî ku sedî salane nexasim di çarçoveya pergala serdest a sazûmankirî de ber bi biyanîbûnê ve çûyînê de, têkîliyek çewtî bi ser çewtiyê ve, derew li ser derewê ve pêş ketî de ez ê rastiyê çawa bibînim?" de lêpirsîn bikin. Hûn ê bawer bikin ku çareserî jî ne hêsane. Hûn ê bizanin çareserî bi qasî çareserkirina problemek felsefî û siyasî zehmete. Çareseriya hêsan tine ye! Pirsgirêk ne pirsgirêka hevpeymana du kesî ye. Ev pirsgirêk di mercên şoreşê de hîn zehmetire. Ango ger em bi şêweyek "me hevdu eciband û hev dît" nêzî hev bibin, em ê rêya kareset hilbijêrin. Çareseriyek wisa ji rêzê, dê we herî kêm bi qasî yên din bi encamên xeternak re rûbirû bihêle. Ji ber ku mesele ne mijara sempatiyek ji rêzê, hevdu fêmkirin û têgihiştinê ye. Nexasim qet ne meseleyek du kesî ye! Berî her tiştî meseleyek pir cidî ya siyasî ye. Bi serê xwe meseleyek şere. Hema bêjin meseleyek bi qasî dêwekê ye. Dibe ku hinek bêjin "tu pir mezin dikî, du kesî lihev kiriye, pevşabûne, bi hev re bûne." Lê di nava me de jiyan dide diyarkirin ku ev rastî ne wisane. Çima? Ji ber ger çavkaniya wê kûre, di dîrokê de hatiye veşartin, her wiha xwe xapandin û xeflet zêde ye, ev encamek din nade. Ev jî tê wateya tu bûyî qurbanê sedî salan. Jixwe tiştên wisa di nava me de tên pêşxistin, bi şêweya bûna qurbanê niyetên xwe yên baş pêş dikevin.

***Ya çaremîn***: Divê li ser çareseriyek rasteqîn lêkolînên we hebin. Ji bo vê jî serwextbûn pêwîste. Hûn ê di derbarê mijarê de serwext bin. Hûn ê hebûna bingeha mijarê ya dîrokî, girêdana wê ya bi rojane re û her sê nêzîkbûnên xirab ên me behs kirî bizanin. Hûn ê bi temamî di ferqa van de bin. Piştî ku we ferq jî kir, hûn ê bi şêweyek "gelo teşeyên têkîliyên giştî û di navbera cinsan de divê girêdayî kîjan rêgez ên exlaqî, felsefî û sazûmaniya civakî be" nêzîkbûn raber bikin.

Gelo nêzîkbûna we ya felsefî ji van re çiye? Zilam jinê, jin jî zilam çawa dibîne? Hûn mêbûn û nêrbûnê çawa dibînin? Di vê mijarê de helwestek we çawa ya exlaqî heye? Nêzîkbûnên

weke pir hişke, an nerme, pir durû ye yên şêwazên nêzîkbûnên kesan ji hev re rave dikin, di çarçoveya xalên exlaqî de ne. Ji bo jin li hember zilam helwestek exlaqî raber bike dikeve nava halên pir ecêb. Dîsa zilam jî weke wê xwedî gelek helwestên exlaqî ye. Jixwe rexneyên van helwestan hatine kirin.

Belê, gelo divê helwesta exlaqî ya rast çibe? Rêzdarî di çarçoveya kîjan pîvanan de ye? Nêzîkbûn dikare çawa bên pêşxistin? Ji ber ku çareseriya şoreşgerî mijara gotinê ye, girêdana van bi azadiyê re çiye? Hezkirin di çarçoveya kîjan pîvanê de ye û girêdana vê bi azadiyê re çiqase? Divê bersiva van pirsan tevan bê dayîn.

Jixwe li cem me azadî ancex bi şer dikare bê bidestxistin. Ji ber em ne azadiyê, koletiyê dijîn. Li gorî ku di bin koletiyê de azad nayê hizirîn, têkîliya azad jî nayê hizirîn. Ev jî rastiyeke. Niha ev jî du alî ye. Hûn ê aliyek wê jî wisa bibînin; her çendî em xwe azad dihesin û bi vînek azad pêwendî pêş dixin, ev xwe xapandine. Ne tenê li vê qadê, xapandinek li hemû qadên jiyanê ye. Tu ne azadî. Tu ji netewbûnê derketî. Tu ji xisletên herî bingehîn ên civakê qut bûyî. Çawa dikarî bêjî; “Ez azadim”? Qaşo demokratin dibêjin; “Ez di nava mercên dijmin de azadim, li ser bingeha dijmin tesfiye dike de azadim”, li ser bingeha tasfiye û bişaftina dijmin dibin demokrat û xwe azad dibînin. Ev nêzîkbûnek pir xetere. Ti eleqeya wê bi azadiyê re nîne, demogojî ye. Weke ku ti eleqeya wê bi rastiya welat û civakê re nîne, bi dijmin re jî li ser bingeha xayîntî têkîlî heye. Ti eleqeya xayînan jî bi azadiyê re nîne. Lewma ev têkîlî bi azadiyê ve girêdayî ye. Azadî jî, bi derbaskirina koletiyê ve gengaze. Ev jî bi şer ve gengaze. Lewra ger hûn dixwazin di pêwendiyên jin û zilam de azadiyê bidest bixin, hûn ê ji mijarekê re azadiyê bidin serxistin.

Ev pir vekiriye: Ger hûn mijarê weke meseleyek hevdu xapandinê nabînin, tê wê wateyê ku we bawer kiriye pêwîste ev weke hevkariya azadiyê û şervantiya azadiyê bê dîtin. Wê demê

hûn ê vê ji xwe re bêjin; “Gelek karên ku divê ez bikim hene. Têkoşîna azadiyê ku divê ez ser bixim heye.” Ancex di vê çarçoveyê de jin dikare bigihe zilam, zilam dikare bigihe jinê û watedar be. Nexwe dê jirêderketin be, lîstok be, durûtî be. Weke din gotinên “me hev dît, lihev kir” hevdu xistine û nayê efûkirin. Jixwe hinek jî digirin û direvin. Di vê mijarê de îxanet li pêwendiya şer û pêwendiya azadiyê tê kirin. Belê, ti eleqeya vê bi avakirina pêwendiya azad re nîne. Ma te kîjan pirsgirêka azadiyê çareser kiriye, heta ku vê asayî dibînî?

Tişta dixwazim bêjim; nepêşxistina têkîliyek erzan, heta ku hewldanek eslî ya weke şerê azadiyê neyê meşandin, nexasim di nava partî de divê mirov bawer neke ku ti têkîliyek watedar a di navbera cinsan de bê pêkanîn. Ev ne tenê rêgezeke, di heman demê de ravekirina rastiyekê ye. Ger em şerê azadiyê bimeşînin, nemeşînin jî, rêgeza derbasdar ev e. Lê ji bo me rêgez jî têrê nake. Weke din rastiya heyî li holê ye. Ew çiye? Koletî ye! Hûn ê vê koletiyê bibînin, nikarin paşguh bikin. Pêşxistina têkîliyek dispêre rêgezan jî têrê nake. Jixwe xala ku gelek heval xwe dixapînin ev e. Xwe sipartina rêgez ve dikare pêwendî pêş bixe. Paşê dibêjin; “Em azadin.” Bi sipartina vê rêgez ê têkîlî pêş dixin, lê di rastiyê de şêwaza têkîliya du xafîlane.

Deka em li rewşê binêrin; gelo rêgeza azadiyê şênber tê jiyîn, an nayê jiyîn? Serkeftî ye, yan binkeftî ye? Gelek kes hesabê vî tiştî nakin. Di bingeha gelek têkîliyên çewt de ev heye. Wisa dihizirin şerê azadiyê nebe jî, dikarin têkîliya azadiyê; xalên weke evîn, zewac, dostanî hw bijîn. Ev xwe xapandine. Hem jî xapandinek di astek cidî de ye. Heta xapandinek herî hêsan tê jiyîne. Rewşek bi temamî li dijî rastiyê ye. Ji ber ku ji dervî rastiyê ye, ne têkîliyek têkûze. Girêdanên dilketinê yên rasteqîn û girêdanên hestan pir bihêzin. Ti şer nikare wan bixe. Nexwe tu derewkerî û rast nanirxînî. Ev rastiye jî. Ji ber ku em li kesên van ferasetan dijîn dinêrin, du rojan de ew têkîlî ziwa kirine. Piştre jî

dibin bela. Me ev got; çawa ku malbat li pêş azadiyê astengiye, heta em vê derbas nekin nikarin xwe bigihînin azadiyê, pergala têkîliyên du kesî yên di nava partî de jî bê ku bên derbaskirin bidomin, em nikarin di şerê azadiyê de pêşve biçin. Ger ku em malbat û malbatperestiyê derbas bikin, em dikarin di azadbûn, civakbûn û netewbûnê de pêşveçûnê saz bikin. Qasî me karî seresertî, tengbûn û sextekariya di têkîliyên du kesî yên heyî derbas bikin, dê ewqas jî hem şoreş û şerê azadiyê bihêz bibe, hem jî dê xêra şerê azadiyê wateya têkîliyên di navbera zayendan de zelal bibe û asayî be. Dê ji her cure rapêçan, derew, durûtiyê û xapînokê rizgar bibe.

Divê ev xal baş bê fêmkirin û sepandin. Di vê mijarê de erka me ya herî erênî jî di xala çaremîn de veşartîye. Rêgeza azadiyê başe, lê her tişt bi wê çareser nabe. Ev esase. Ango zextek di navbera zayendan de nîne. Nêzîkbûna; “Ez ê bi zextê û bi pereyan têkîliyê ferz bikim” li dijî rêgeza giştî ya azadiyê ye. Heta ku rewşa koletiya heyî neyê derbaskirin, asta milîtanek serkeftî neyê sazkirin, bandora azadkirinê ya şer neyê sazkirin, kes nikare di vê jiyanê de rêgeza azadiyê jîndar bike.

Niha ger hem di rêgez hem jî di şênberbûnê de rewş wisa ye, divê ya kevnar neyê ferzkirin. Jixwe dawiya kesên dibêjin; “Ez ê dîsa ya xwe bikim, azweriyên min bihêzin, hest qural û rêgezan nas nakin” diyare. Di nava me de gelek kesan wisa kir, an sucên darvekirinê dikin, an jî direvin. An îxanet dikin, an jî dibin xirabkerek ku qet sererast nabin. Mane jixwe wisa ye? Gelek kesên hem li çiya û hem jî li vir xwe ferz dikin hene. Ti agahiya van ji rêgez û azadiyê nîne. Dîsa agahiya wan di derbarê bingeha dîrokî ya têkîliyên azad de nîne. Agahiya wan ji rewşa şênber a heyî jî nîne. Çiye, qaşo hev ecibandine, dê hevdu bigirin û birevînin! Hewar ev çi têkîlî ye? Ev têkîliya herî hovane, dizî û ketîbûnê ye. Lewma kesên ji bo vê ji refên me direvin jî hene. Hinek ji wan ji provakasyonan re bûn amûr, heta partî rexne kirin.

Di rastiyê de ev dijminê azadiyê ne. Mirov dikare van weke kujerên têkîliyên bêhempa binirxîne. Van partî jî pir xirabkirin, ji hêz xistin, pêşkêş kirin. Di xêra dilketinekê, xêra hestewariyekê de îxanet li nirxên herî bingehîn kirin. Hewl dan gelek eniyan birûxînin. Ev di nava partî de bûn û endamên partî yên demekê bûn. Lê dema rêgeza azadî û şênberbûna berçav negirtin, ketin vê rewşê. Destpêkê ne sîxur bûn. Li ser bingehek hestiyarî û dilketinek tund nêz bûn. Encam; rewşek ji îxanetê xirabtir derket holê. Ji vê hêlê ve jî kêm mînak derneketin. Wê demê em ê birîna di vê mijarê de baş fêm bikin.

Çawa ku kole nikarin bi hêsanî malbatê saz bikin, ên weke me koletiyek pir kûr dijîn jî divê fêm bikin nikarin hêsan têkîliyek azad saz bikin. Hûn di dibistan û saziyên çandê yên Tirkiyê de fêr bûne mirov çawa evîndar dibe. Dibe we ji nav kevnareyên cîhanê xwendibe. Gelek ceribandin li pêş çavên we ne. Lê belê, ger ev azadiya di nava PKK’ê de pêş dikeve, her cure raperîna di şoreşa Kurdistanê de û pirsgirêka şere, hûn ê bi vê rêgezê ve girêdayî bimînin û bizanin xweşik jî bisepînin. Jixwe ew kevnareyên cîhanê hûn behs dikin çine? Têkîliya bi zaravayê Kemalîzmê hatiye pêkanîn çiye? Têkîliyên di çarçoveya kapîtalîzma Tirkiyê de, di bin zexta saziyên çandê yên girêdayî burjuvaziya Tirkiyê –em dikarin bêjin saziyên feodal ên di bin zexta bîrdoziyan de- pêş ketine çine û di nava me de çawa çêdibin? Me ev hinekê vegotin. Di bin bandora van de bûyîn, bi van bandoran tevgerîn, hinek çareseriyên sexte avakirin, bi qasî li dijî xwezaya şerê me ye, ewqas jî zehmete. Pratîka me jî ev da der.

Koleyan, ji bo mafê sazkirina malbatê bidest bixin sedî salan şer kirin. Deka tu jî qet nebe çend salan şer bike, wisa mafê têkîliya azad bidest bixe! Niha agahiya gelek ji we ji vê nîne. Mafê bidestxistina têkîliya azad ne hêsane. Niha desteserkirina hinek têkîliyên partî yên amade gelekî xetere. Niha ez li gorî

ferman û emrên partî ji mirovan re bêjim bimirin, dê bimirin, çi bêjim dê bikin. Lê mixabin di nava astên rêveberiyê de hinek kes vê xirab bikar tînin. Nêzîkbûnên weke; "Jixwe ez desthilatim, çi bêjim dê wê bikin, ji şervan re bêjim bimire dê bimire, ji jinê re bêjim min bihebîne, dê dilberdê min", şêwaza nêzîkbûnên kevnar ên herî xeternakin. Di nava PKK'ê de têkîlî wisa bikaranîn, arestebûna ber bi şêweya herî xeternak ve ye. Ev jî wî kesayetî mehkum dike. Ji ber têkîliya xeternak çi dereng çi jî zû xwediyê xwe jî tine dike. Ya esasî ev rêgeza me rast bû: Divê pêwendî bi azadiyê ve bên girêdan, divê azadî bi şer ve bê girêdan û di encama vê de hezkirina rasteqîn çêdibe.

Gelo hezkirina rast bi çi ve hatiye girêdan? Em dikarin ji vê re bêjin xala **Pêncemîn**. Ger te di her çar xalên destpêkê de encam girt, tu dikarî di xala pêncemîn ango xala hezkirinê de jî encamê bigirî. Em wisa dikarin di mijara hezkirinê de nêzîkbûnek rast saz bikin. Binêrin; ger her çar xal bi we re pêkve negihabe serkeftinê, hûn nikarin bigihin hezkirinê. Hezkirin encameke. Weke ku darek fêkiyan bide ye. Wê tu şitlê mezin bikî, dar çiqil û şax bide, gul bide, bişkive û peyre jî fêkiyan bide. Belê, hezkirin ev e.

Niha piranî bi we re hezkirin bê dar û bê nebate. Tenê di şêweyek encamê de ye. Ez niha baştir dibînim. Jixwe ji destpêkê ve li hember hest û hezkirinan şikber bûm. Min digot ev çima hestek wisa dipejirînin. Hez dikirin, bes li ser kîjan bingehî? Welat wêrane, mal wêrane û pêşeroj tine ye. Çima wisa pêwîstiya bi hevdu ve girêdanê dibînin? Min dît û dilê min jê ma, hem jî pir û pir... Niha tê fêmkirin ku mafdarim. Li gorî min hezkirin, piştî ku pêwîstiyên her çar xalan bi mafdarî hat bicîhanîn dikare pêş bikeve. Hezkirin encameke. Gulbûn û fêkî ye. Mirov qusur û xirabûnê di hezkirinê de nagire. Dîsa hezkirin nayê rexnekirin. Bes ger bi van xalên bingehîn ve girêdayî bimînin wisa ye. Nexwe ji bilî vê xirab û kirête.

Hezkirin ne mijarek nêtare. Nexasim mêtîngerî û faşîzm dixwaze vê wisa ferz bike. Got; “Dilovan bin”, nizanim “ji hev hez bikin.” Belê herî zêde ev peyv bikar anîn. Berx û gur danîn cem hev û got; “Ji hev hez bikin.” Di astek bêhempa de ya xweşik û kirêt anîn cem hev û gotin; “Ji hev hez bikin.” Faşîst û şoreşger anîn cem hev gotin; “Lihev bikin.” Em baş dizanin ku pergal di vê mijarê de çiqas ên nabin hebin, dixwaze bîne rewşek dibe de. Niha qaşo dibêjin dê Tirk û Kurd bi hezkirinê bi hev ve girê bidin. Tûrkeş’ê faşîst jî, dixwaze xwe bispêre xalên ku nizanim 900 salin Tirk û Kurd pêkve kirine. Bangî hest û hezkirinan dikin, wisa jî dixwazin rewşa heyî li ser bingeha qutbûna ji rastiyan rizgar bikin.

Belê, ev feraseta hezkirinê, feraseta hezkirina faşîzm û mêtîngeriyê ye. Ya ku gelek ji we takekesî dijî, salane tê ferzkirin feraseta vê hezkirinê ye. Ev hezkirin ji naveroka dîrokî dûre, agahiya xwe ji pergala zext û mêtîngerî, her cure kirêtî û pirsgirêkên malbatê û kedê nîne. Bawer nakim hezkirinek evqasî li ser bingeha li dijî rastiyê pêş dikeve xwedî wateyekê be. Ger bibe tenê bi qasî hezkirina sexte ya jiyana ji rêderketî nirxê wê heye. Dê bi qasî têkîliyên di sûkên malên bê qîmet ên Ewrûpa û metrepolan de di navbera zayendan de pêş dikeve qîmeta wê hebe. Hezkirina ku berdevkên faşîzma Tirk dixwazin ferz bikin, evqas jî qîmeta wê nîne. Jixwe jiyan jî destnîşan dike ne wisa ye. Tirs, zext, kirêtiya mêtîngerî, bêhezkirin, kujerî û bêpîvanî civak qir kiriye. Di rastiyê de jî herî zêde di bin navê hezkirinê de hezkirin qir kirine. Hezkirin ji holê rakirine. Lê tevî vê jî herî zêde jî behsa hezkirinê dikin. Ev misoger wisa ye.

Ya herî rast feraseta hezkirina ku em dixwazin pêş bixine. Divê em di feraseta xwedî bingeha rasteqîn de bi israr bin. Belê, em neçarin rasteqîn bin. Heta ku em van xalan ser nexin, tu nikarî di hezkirinê de serkeftinê saz bikî, nikarî hez bikî û bî hezkirin! Nêzîkbûnên; “Min hez kir, dilê min ketê, çav pê ket, avir da û me

lihev kir" nabe hezkirin. Çima? Ji ber ti agahiya te ji xeteriyên mezin û dê çi bi xwe re bîne nîne. Wê tu di roja duyem de bibî xayîn û ji bo rizgarkirina vê têkîliyê jî xwe bispêrî dijmin.

Nexwe ev ne raste. Misoger ne mijarek dilketinê ye jî. Ev mijarek şere. Ma çima koleyan sedî salan nehizirîn ku malbatê saz bikin? Ma çima wisa hêsan karê dildariyê nayê hişê jin û zilamê kole, jin û zilamê beg û jin û zilamê karker? Ji ber ew wisa hêsan karên dildariyê nakin. Jiyan ji bo wan tiştek pir cuda ye. Sedemên vê hene. Nexwe ya din jirêderketinê rave dike. Ev hêsanî dike qurbana taktîkên xapandina gel û hêsan birêvebirina civakê ya faşîzm, mêtîngerî û emperyalîzmê.

Wê demê hûn ê li vir bibin xwedî helwestek exlaqî. Di mijara hezkirinê de helwesta exlaqî, wisa hêsan nebûna dîlê têkîliyên hest û dilketinek erzane. Hûn ê di vir de pir dijwar bin. Bi xwe re şerek rasteqîn bimeşînin. Bi qasî şerê hûn dijmin re dimeşînin, li dijî şêweya têkîliya wê ya zêde dixe jî hûn ê şer bikin. Hûn ê li dijî şêweyên sîxurtiya objektîf û sûbjektîf dijmin li ser vî bingehî pêş dixe jî şer bikin. Her ku hûn şer bikin, dê diyardeya hezkirinê jî bi bingeh be. Hezkirin ji rêderxistin, herî kêm bi qasî bê hezkirinê xeternake. Hezkirinek ji rê derketî û xwe sipartiye bingehên seqet, şêweyek din a kuştina jiyanê ye. Ango bêhezkirin, kuştina jiyanê ye. Bes şêweya vê ya ji rêderketî jî, herî kêm bi qasî wê xeternake. Xwe gihandina hezkirinê, xwe gihandina jiyanê ye. Ger zanebûna xwe gihandina hezkirinê nebe, tê wateya nefêmkirina şoreşê. Lê xwe gihandina hezkirina erzan, bêşerbûne, bê hewldanî û heta bêhişî ye. Ev jî pir girînge. Ev xalên bingehîn ên min hejmartine bi hiş ve girêdayî ne. Ev pir vekiriye. Em dîrokê ji bingeh ve bigirin heta rojane, hûn ê heta felsefîk û zanistî bihizirin.

Nexwe girêdana hezkirinê bi fikir, zanistî û felsefê re heye. Divê hinek xisletên we yên felsefîk hebin. Dê agahiya we hinekê di derheqê zanistê de hebe, daku hûn bikarin pêngavekê

ber bi hezkirinê ve bavêjin. Weke me gotî girêdana wê bi şer re jî heye. Jixwe li cem me pêwendiya azad tenê bi şer tê bidestxistin. Wê demê hûn ê girêdana hezkirinê bi şerê ku serkeftî tê meşandin ve baş bizanin. Di rêya hezkirinê de xefik hene, hezar hest û girêdanên ku bi navê wê ji rê derdixe hene. Hûn ê nekevin van lîstokan. Ango hûn ê li dijî her cure ji rêderxistin û xapandina hezkirinê di seknek têkûz de bin. Di heman demê de hûn ê li dijî bêhezkirinê jî xwedî seknek têkûz bin. Hûn ê bizanin bêhezkirin li dijî şoreşgerî û jiyanê ye. Divê teqez hebûnek we ya hezkirinê hebe. Divê hûn xwe bigihînin vê hebûna hezkirinê. Hûn ê bêjin; "Divê ez xwe bigihînim rewşa hez bikim û bêm hezkirin." Gelo di rewşa hezkirinê de bûyîn tê çi wateyê? Tê wateya serkeftina di çar xalên min destnîşan kirî de. Çar xalên bingehînin û ger hûn weke encama wan di xala pêncemîn de jî serkeftî bin, hûn ê xwe bigihînin rewşa ku bîn hezkirin. Ev di heman demê de tê wateya ku tu jî hatî qonaxa bikarî hez bikî. Wê demê, tê wateya ku me di vê hezkirinê de xwe gihandiye kesayeta ku hem hez dike hem jî tê hezkirin. Nexwe wê tu neyî hezkirin û ne jî hez bikî! Hinek jî dibêjin; "Dilê min xwest, belê hez dikim, tu çawa dikarî asteng bikî; ew jî hez dike, tu nikarî asteng bikî." Derewe! Wisa hezkirin û hatina hezkirin nabe. Bingehîn zanistî dane holê, nexapîne! Nexwe wê tu rojekê bî hezkirin û di roja duyem de jî bî avêtin. Wê tu bersiva hezkirina xwe nebînî û li erdê bikevî. Ji bo vê jî xwe nexapîne û nekeve nava xefka hezkirin û hatina hezkirinek li ser bingehê şaş pêş dikeve! Ya rast, divê mirov di xalên hatî destnîşankirin de serkeftî be.

Niha bihizirin; ma ne raste? Gelo çima kesayeta Kurd nayê hezkirin? Li gorî min kesên ku divê di cîhanê de herî zêde bên hezkirin, çima di vê mijarê de di rizgariya welat de binkeftî ne? Çima di azadiyê, şerkirin û hemû pirsgirêkên rêxistinkirinê de evqas binketî ye? Dê kesayetek evqas binkeftî çawa bê hezkirin? Jixwe kirête jî.

*"Dîsa girêdana kirêtî û xweşikbûnê bi van xalên hatîn hejmartin ve heye. Misoger diyardeyek civakî ye. Ger tu bikarî di van xalan de serkeftinê bidest bixî, tu bedewî, ji bilî vê kirêtî!"*

*"Belê, aliyê vê yê fîzîkî jî heye. Bes aliyê kirêt û xweşikbûnê ya fîzîkî ne diyarkere. Ya diyarker, serkeftin an jî binkeftina di xalên hatî destnîşankirin de ye."*

Nexwe, bi qasî mercên hezkirin û hatina hezkirinê, divê hûn bawerî bi pêdiviyên wê jî bînin. Nêzîkbûnên weke; "Ez bin dikevim, zehmete ku di van xalan de serkeftî bim, nexwe ez ê hêviya xwe ji hezkirinê qut bikim, bila ne kes ji min hez bike, ne jî ez ê ji kesî hez bikim" jî ne raste. Ev pejirandin, hêviya xwe ji şer û şoreşê qutkirine. Hêviya xwe ji partî, gel û jiyanê qutkirine. Bes şoreşger, mirovên hêviya xwe ji jiyanê qut nakin. Her tiştê xwe fedayî jiyana azad kirine. Wê demê hûn ê hezkirinê weke azweriyek pir mezin her tim bi xwe re zindî bihêlin. Lê belê divê mirov rê nede tiştên nabin û xefkan, şansê serkeftin û pêkhatinê bide rastiyê. Belê ger ev milîtantî di kesayeta we de gul vede, dê bi serkeftina egîdiyê tacîdar bibe.

Tê dîtin, rêya diçe hezkirinê, bi qasî gelek zehmetiyên cur be cur dihewîne, ewqas jî girîfte ye. Lewma egîdî tê xwestin. Ger nêzîkbûna rast bê raberkirin, dê bêhezkirin, harbûn û bêrêziya ku li welatê me, gelê me di nava mercên civakî de dijî bê derbaskirin. Me şoreşa xwe bi qasî li dijî rewşa ku welatê me bûye xirbe û nayê hezkirin, di heman demê de li dijî bêhezkirina mezin a di nava hinava gelê me de şîn bûyî pêş xist. Şoreşa me, ji hêlekê ve şoreşa hezkirinê ye. Şoreşa hezkirina welat û hezkirina gel'e. Bes di heman demê de şoreş ku bi qasî li dijî kirêtî, xirabûn û hovîtiyê şer bike, şoreşek hezkirinê ya dikare pêk were ye.

Nêzîkbûna faşîzmê ya dibêje; "Hezkirin her tiştî çareser dike" bawerkirin û yeqînkirin, ketina nava lîstoka herî mezin de ye. Mixabin, dema hezkirin dibe mijara gotinê hûn ketine nava lîstoka mezin de. Ya rastî em hinekê hewl didin we ji nava vê

lîstokê derbixin. Lê ger em we bi tena serê we bihêlin kî dizane wê hîn zêdetir çi bê serê we! Em dibînin bê ku hûn hewldanê bikin çawa ji hev hez dikin. Ma heta duh jî qinyata we bi vê ne dihat? Dibe ku hûn qet ne di ferqê de we ji mar hez kiribe, li şûna dildarekî we ew kiribe hem êza xwe. Ma ev ne hûnin an jî ne embûn? Hûn heta qirika xwe di hemêza xwe de kirêtiyê dijîn. Şêwaza jiyana xwe li ser vî bingehî venêrînin. Gelo çiqas di xeta feraseta hezkirina dijmin de ye? Kesên feraseta hezkirina dijmin dijîn, ma nesîbê xwe ji hezkirina rasteqîn girtine? Jiyana ku hûn dijîn, çiqas dikare weke jiyanek berz bê pejirandin? Ji ber bi rewşa heyî re nakoke. Ji bo we bitirsînim nabêjim. Bes divê misoger jiyana we berçavan re bê derbaskirin. Bi taybet hewl didim di asta feraset de hinek tiştan ronî bikim. Lê gav bi gav jîndarkirina vê dibe ku sedî salan bidome. Ji bo mirov bikare têkîliyekê bîne asta tê hezkirin û jiyînê, min evqas salên xwe da. Li gorî min tevî vê jî me tenê çend gav pêşve bir. Lê hûn dixwazin her tiştî di carekê de çareser bikin.

Nexwe, sedemek milîtantiya we ya ne rasteqîne jî ev e. Her tim behsa kesayetên xapîner û xapînok dikim. Sedema vê ya herî bingehîn yek jê jî, di çarçoveya xeta min diyar kirî de ye. Yan we xwe mehkumê bêhezkirinê kiriye, yan jî hezkirina sexte... Dilê we çawa vê radike? Mejiyê we pêwîst nabîne bihizire jî. Ev çîroka we ye. Hûn çiqas di mîlîtantiyê de bi îdîa ne?  Hûn di egîdî, hestên mezin û hezkirina mezin de çiqas bi îdîa ne? Binêrin, bi gelek ji we re hezkirina zaroktî heye. Hinek heval, ji bo bidin diyarkirin çiqas ji zarokan hez dikin, bi zarokan re henekan dikin. Deka em bikenin û derbas bikin! Çima? Ji ber ku jiyana zarokên me belengaz kirine. Ne hiştine bi yek henaseyê jî hez bikin. Mixabin gelek ji we vê asayî dibîne. Dibêje; “Xweziya zarokek min hebûya ku min wisa jê hez kiriba.” Dînya wî tarî bûye. Feraset evqase. Dema wisa jî dibe, deh salan jî bijî, wê di encamê de dijberê partî û revokek be. Di hewaya mêrxasek ciwan

an jî keçekê de tenê bêhna azweriyê tê. Dibe ku hewce nake mirov tiştekê bêje, lê ger mirov bi wê azweriyê re rûbirû bihêle, wê di roja duyem de pevçûnek mezin rû bide. Azweriyên mezin, hestên mezin di nava mercên xwe de watedarin. Derfetê zarokek baş mezinkirinê, tenê di mercên welatek azad û serbixwe de heye. Azweriyên mezin, tenê di qadên xwe de derfetê jiyînê dibînin.

Weke tê zanîn, ciwan bi hev re direvin û paşê dawet tê lidarxistin. Lê di roja duyem de biçin lê binêrin, hemû lihev ketine. Ti berhemek ji hezkirin û rêzgirtinê nemaye. Ma ti wateya dilketin û hezkirinên wisa heye? Jixwe jiyana pratîkî vê dide diyarkirin ku bê wate ye. Ev rexneyên ku ez li we û civakê dikim, tev rastin. Ma em ê çima ji niyaza pêk nayê re bêjin amîn? Ma em ê çima ji hezkirinek ku hûn ê nekarin pêş bixin re, bêjin hezkirinek başe? Ma em ê çima dilketinek xêrê ji welat û gel re nayîne re bêjin, dilketinek rêzdare? Mixabin a herî zehmet dimîne. Dîsa bêjim, em hinekê kole ne. Koleyan hezar salî nehizirîn malbat, zarok, jin û zilam çine, ne wisa? Lê em ne weke wan koleyane. Em bi hinek aliyên xwe ve di rewşek wisa de ne ji koleyan xirabtirin. Qutbûna ji welat û civakê wisa ye.

Lewma divê hinek din bi rasteqînî nêzî hinek hestên xwe û fêrbûnên xwe yên jiyanê bibin. Sedema ku ez van tiştan tevan dibêjim, ne ku em hezkirinê mehkum bikin, dê hezkirin li cem me çawa bê meşandin û girêdayî çibe ronîkirin. Welat jî şer dixwaze, gel jî şer dixwaze. Êdî şer bûye navê jiyanê. Ev jî zehmete! Jixwe zehmete. Ev di heman demê de dibe raveya ku em wateyê li şervantiya we bar dikin. Beşdarbûna we ji mijarek jiyanê evqas diafirîne re ma çima we berz dike? Belê, ji ber vê naverokê we bilind dike. Ma çima îro şer bûye azweriyek? Ji ber ku îro şer afirîner û rastiya her tiştî ye. Me ev hinekê bi civakê da fêmkirin. Em ê siberojê jî tam bidin fêmkirin. Ger bikarin îro bi we jî bidin fêmkirin, hûn ê bêhempa şer bikin. Ji ber ku naveroka şer, di encama vî şerî de veşartiye. Rizgarbûna we ya ji her cure kirêtî,

bêhezkirin û heqaretî, kêm-zêde bi meşandina we ya vî şerî ve girêdayî ye. Ger ev bi hemû kûraniya wê ve bê fêmkirin, hûn ê bibin şervanên bêhempa. Siya jiyanê heye, lê ew bi xwe tine. Navê jiyanê heye, lê ew bi xwe tine. Wê demê dê ew bi xwe çawa be? Belê, bi şerkirinek wisa ve dibe! Niha hûn ê li ser vî bingehî bigihin wan kesên ku pir jê hez dikin. Ger berî her tiştî hûn bikarin wisa şer bikin, dê her parçeyek welat ne weke xirbeyekê, weke bihuştekê bixwiye. Ew malbatên we yên hûn jê revîne, dayîk, bav, heval û hogirên we dê ji bo we bibin hebûnên herî binirx. Dê gelê we ne Miletek ku nav û dengê wê hatî ji bîrkirin, dê ji bo we bibe rastiyek ku bi qasî nan û avê pêwîstiya we pê heyî û pê re bijîn. Dema em vê rastiyê di çarçoveya têkîliyên jin û zilam de şîrove dikin, dê ne biyanî be, li gorî pênaseya du parçeyên xwezayê guncav, weke aliyên ku teqez divê hevdu temam bikin, derbikeve holê. Dê çawa û li kur xwe gihandina vê pêk were? Belê, niha hemû nîqaş, polîtîka, fikir, damezirandinên partî û pêşxistina şer ji bo avakirina jiyanek wisa ye.

Bi feraset bin. Dibe ku li vir dilketinên teng û nêzîkbûnên ji dervî rastiyan xwe bidin jiyîn, lê serkeftinê ava nakin. Lewma hûn pir rêkan de çûn, serê xwe li çep û rast da, lê dîsa jî encam tine ye. We nekarî malbatê, ne jî heval û hogiran rizgar bikin. We nekarî gotinek “xêr hatî” û “silav”ekê rizgar bikin. Wê demê me çi ji vê fêm kir! Ma em dikarin ji vê re bêjin jiyan, an jî bêjin azadî? Çi eleqeya wê heye! Ya herî baş a em dikine. Baş lêhûrbin, di mijara jiyanê de plansaziyên baş çêkin, di asta bêhempa de çalekvan û rêxistinparêz bin. Dê ev rêya jiyanê nîşa we bike, firsenda hezkirinê bide, dikare derfetên xwe gihandina cîhana hezkirinê amade bike.

Belê, di gelek nameyan de “xoşewîsta wisa, xoşewîsta welê” tê nivîsandin. Ez ji peyvên wisa fihêt dikim. Yeqîn dikim niha tê fêmkirin ku mafdarim. Di nava me de xoşewîstiyek wisa nîne. Her wiha xwe gihandina vê astê pir zehmete. ***Bijî ji hemû***

***milet û rêhevalan re ji bo xwe dide gotin; “Hebûna me ya xoşewîstî.”*** Ji bo xwe gihandina sifatek wisa, di mercên me behs kirî de serkeftî bi şerkirinê, lehengbûnê û egîdiyê ve gengaze. Ev jî bi jêhatiya serwextbûn, polîtîkbûn û leşkerbûnê ve gengaze. Ger wisa bin, em ê çima ji we hez nekin? Çima em ê çepkan ji we re lênedin? Çima em ê nebêjin “cihek wan a ji bilindiyan bilindtir heye?” Çima ez ê xwe hêjayî tiştek erzan bibînim? Çima ez ê xwe hêjayî tiştek ku min maf nekirî bibînim? Ev ê sextekarî be, tê wateya xapandina xwe û hinek din. Ez vê nakim, lê ji bo rêya rast jî mijûlbûna min heye. Bê ku zêde şaşiyan bikim, xwehir bibim û bidin xwehirkirin hewldanê dikim.

Binêrin; helwesta min ev e. Mixabin gelek ji we dinêrim, weke zarokan ji me dixwazin ku em wan li ser destê xwe bigirin. Ger te xwe ne aniye rewşek ku tu cidî bê girtin, ez ê çawa ji te hez bikim? Niha ez kesekî wisa hêsan naecibînim. Ma ji ber ku xwe pir diecibînim lewma wisa nêz dibim? Na! Ji bo rastiyê derbixim holê ye. Ji bo ya tê ecibandin derxistina holê ye. Ma ji nişkê ve bê rexne hevdu ecibandin çi bidest xistin? Ma hûn dikarin du kesên herî baş bînin cem hev? Ez dikarim bînim cem hev. Mirov bi min re hatin cem hev û hêjî tên. Di nava partiya me de hezkirin û rêzgirtinê danin aliyekê, mirovên weke rêhevalek dilsoz hevdu pêşwazî bikin pir kême. Ji bo şerek aheng, yekbûn û hevbeşiyê, çend kes dikarin serê xwe bidin hev? Hûn nikarin bidin ber hev, wê demê ew hezkirin û rêzgirtin çiye? Hûn xwe dixapînin. Nesazkirina ahengek rast û durist, rewşa hevdu ne ecibandinê rave dike. Ev jî, di xeta şer de, meşa li gorî pêdiviyên têkoşîna di nava yekîneyên şer de çêdibe. Wê tu xwe nekî qadroyek baş û paşê jî bêjî; “Me hev ecibandiye!” Tu xwe dixapînî û şaşwazî! Tu ketî nava van qusur û şaşiyan tevan. Weke min gotî, sererastkirin jî bi şer dibe. Ez dixwazim vê mijarê hîn zêdetir di asta huner û estetîk de şîrove bikim. Jixwe divê ev jî bê destgirtin.

Hem di giştî şoreşan de, hem jî taybet di şoreşa me de divê mirov bal bide ser avabûna hunerekê. Divê çalekiya şoreşvanên milîtanê şoreşger weke hunerekê kêrhatî be. Şoreş hunerek herî berze, şoreşger jî hunerkarê herî berze. Dema em vê jî berçav digirin, hûn ê fikir, hest û çalekiyên xwe jî weke hunerkarekê pêş bixin. Heta hûn ê fîzîka xwe jî –ev hemû heta radeya dawî bi hev ve girêdayî ne- bi hunerkarî pêş bixin. Dema hewcedariyên vê pêk werin, dê ruhê jiyan û ruhê hezkirinê jî watedar be. Divê şoreşa me weke din neyê fêmkirin û neyê şîrovekirin. Dibe ku gelek ji wan weke tevgera rûxandinê bibine û tevgera hêrsê binirxîne. Lê hûn dibînin ku, tevgera me, tevgera ji nû ve avakirinê û nirxa herî mezin dide hezkirinê ye. Tevgera li ser bingeha herî rast xwe gihandina hest û hezkirinan û şêweya herî berze. Ev jî tê çi wateyê? Şêwaza têkoşîn û meşandina rêxistina li wir, şêwaza nêzî ya herî başe, kesayetên wê jî lehengin. Vesazbûn li ser vî bingehîne. Jixwe hewce nake ku em li ser PKK'ya ku di bin berpirsyariya me de pêş dikeve nîqaş bikin. Ji ber ku yên tên vegotin çîrokên rastiyê ne. Tê dîtin, weke di her şoreşê de dibe, di şoreşa me de jî divê li şûna saziyên ku bên rûxandin û derbaskirin, her cure ji rêderketinên têkîlî, feraset, azwerî, kirêtî, hejarî û exlaqî yên hene, saziyên ku divê bên avakirin û nirxên mezin hene. Fikra rast û nêzîkbûna rast, di asta felsefî de fêrbûnek exlaqî ye. Girêdana wê ya bi zanistê ve jî, herî girîng jî çalekiya vê, girêdanên van bi şêwaza rêxistinkirin û şer ve pir berfirehî hat destgirtin. Weke ku ev ji bo hemû şoreşan derbasdare, ji bo şoreşa me jî wisa ye. Nexasim ger evder welatê me Kurdistane û herêma ku ew di navê de cîh digire jî Rojhilata Navîne, ya herî girîng pirsgirêk wisa girtina deste. Niha em tenê dikarin pirsgirêkan derbixin holê. Em dikarin li ser rêyên çareseriyan jî nîqaş bikin. Ya herî girîng jî, em bi şêwaza milîtanî nêzî pirsgirêkê dibin û girêdana wê ya bi şer re pir baş çêdikin. Ji

bo encam girtinê jî pêdivî bi sebrek mezin û hewldanek hostane heye.

Nexasim em pir bawerin ku şehîdên me li ser vî bingehî girêdayî jiyanê bûn. Nexwe wisa xwe feda nedikirin. Qet nebe bi şoreşek wisa ve bersivek dana şehadet û wesiyetên wan, girêdana bi bîranîna wan jî wisa ye. Ji bo gelê me jî li ser vî bingehî derfeta jiyînê li cem me dibîne, her tiştê xwe feda dike û rastiya kûr jî wisa beşdarî şoreşê dibe. Jixwe ji ber ku hûn di nava PKK'ê de ketine ferqa jiyanek wisa, lewma hûn li virin û gelek zehmetiyan digirin berçav.

Em ê rastiya xwe ya şoreş, partî û şer ji her demê zêdetir bibînin. Dîsa em ê bibînin ji bo em bikarin ber bi cîhanek bê jiyîn ve biçin, lewma em beşdarî vê meşê bûne. Her ku em bibînin jî, em ê baştir bibin. Her ku em mezinbûna wê bihesin, fikra wê kûr bikin, çalekî û rêxistinbûna wê pir hewce bibînin û ser bixin, em ê bibînin ku em gihiştine cîhanek ku bê jiyîn û bê hezkirin.

Li welatek me ya ku şaheserek ji hezkirin û jiyanê ne hatiye hiştin, ancex mirov dikare bi vî şêweyî şer bike wisa xwe bigihîne welatek bê jiyîn û rastiya miletek bê hezkirin. Şoreş ji bo vê hewce ne. Şoreşvan jî ji bo armancên wisa eslî fedekarî, wêrekî û hewldanek mezin raber dikin. Ti astengî nikarin wan ji armancên wisa pîroz û avakirina cîhanek ku dixwazin dûr bixe. Dîsa her çendî destpêkê lewaz dibin bila be, derfetên wan çiqas sînordar bin bila be, dizanin ev cîhan cîhanek avakirinê ye û li ser vî bingehî her cure afirînerî û ji bo vê hewldana pêwîst raber dikin. Xwe digihînin jiyanek wisa û hezkirinek wisa. Dê bigihin jî...

***Tîrmeh 1992***

***Em ê Rastiya Jinê Ji Her Hêlê Ve Binirxînin û Xwe Bigihînin Şêwaza Çareseriya Rast A Partî!***

Ez vê nirxandinê ji bo di refên me de hinek xalan baştir ronî bikin û nexasim di dahûrînên jinê de xwe bigihînin encamên sûdmend dikim. Me dît ku şêwaza lêkolîna heta niha hatiye kirin pir kêm maye, her çendî dubare jî be yeqîn dikim hinek pirsgirêk cardin girtina dest dê sûdek baştir bide.

Bi gelemperî rewşa gelê Kurdistanê –rewşa li Tirkî bi şêweyek dine- û taybet jî rastiya me ya jinê gelekî dişebe hev. Tevî hemû hewldanên me ji herikbûna şoreşê û raperîna azadiyê re beşdarbûnek sînordar heye. Pêşketin hene, mirov lê binêre, ger em rojane hewl nedin, dê dijmin bi şerê taybet bixeniqîne. Ez jî li rewşa we dinêrim; divê azadî ji bo we çi rave bike? Hûn ê bikarin azadiyê bidomînin? Hêjî dide hizirandin. Tam ne li gorî daxwaza me jî be, me gel xiste bin bandora xetê. Pêşengiya partî her çendî ne li gorî daxwaza me jî be, êdî dizane ku kêm-zêde ji bilî li ser erk girtinê ti çareyek din nîne. Di rastiya jinê de jî tevî hemû lîstok û ketîbûnên sedî salan, kêm jî be me ew ber bi asoyên azadiyê ve kêşa. Li gorî dema berê hem hejmarî hem jî çawanî de niha baştir nêzî dahûrînê ye.

Di axaftinên min bi we re kerî de, me giranî da aliyên we yên bibin şoreşger. Pirsgirêkên din kêm-zêde di dahûrînan de hatine destgirtin. Ziraviyên şênber û di derbarê sepandina rêgezên şênber de jî em dixwazin bi mînakan dahûrînan pêş bixin. Lê ji ber hinek rewşên derdikevin holê, diyar dikin ku hûn hêj ne amade ne. Dîsa jî rêbazên me raperîna azadiyê ya gelemperî pêş dixe. Tevî ku bi muhafezekarî û heta provakasyonan re di nav hev de dimeşe, dîsa jî gav davêje. Vê ecêb nabînim. Hem hêza çavderî, hem jî ezmûna veguhertina pratîkî ya li ser rastiya

Kurdistanê, ku weke kesek herî bêhnfireh kar dikim, bi qasî vê rewşê ecêb nabînim, di heman demê de dê ev pirsgirêk bi hewldana min jî çareser nebe. Belê, niyeta baş jî têrê nake. Şoreş; tê wateya hêrs, ezamet, nêzîkbûna dijwar, hewldana têrkar, bi serûbinbûnê re sazûmanî û hostane bikare yekparê bersivê bide van tevan. Azwerî, cîhana we ya baldarî û asta we ya azadiyê ji bo min zêde nayê zanîn. Ev xwezayî ye, derfetê yek bi yek lêkolînê tine ye, jixwe nayê lêkolînkirin jî.

Dîsa jî nirxek mezin dana dahûrîna kesî, nexasim di ceribandinên PKK'ê de xwedî girîngiyek mezine. Di kesekî de dahûrandina civakê, li gorî min rêbazek divê neyê paşguhkirine. Dahûrandina civakê jî, mirov ber bi fêmkirina kes ve dibe. Kevnetoreyên heta niha, zêdetirîn lêkolîna asta civakî û netewî dikin. Asta kesî jî ji wêjeyê re dihêlin. Em nikarin xwe bi tenê wêjeyê ve girê bidin. Dahûrandina civakî re, dahûrandina kes, ger di asta siyasî de bibe rêbaza partiyekê ya bingehîn, yeqîn dikim ev ê zêdetir encam bigire. Taybetmendiyek PKK'ê ya wisa pêşde heye. Heta mirov dikare di vê mijarê de weke partiyek herî pêşveçûyî jî binirxîne. Ev, di asta nav-netewî de jî wisa ye. Lewra divê em dahûrandina kes ecêb nebînin. Niha herî zêde hûn hewceyî dahûrînê ne. Mijara jinbûnê, yek ji mijarên herî girêka kore. Tişta dixwazim fêr bibim; gelo divê em binesaziya we ya heyî çiqasî bipejirînin, çiqas jî vekin. Bêguman, girekek kesî ya di bin bandora tund a civakî de ava bûyî heye. Em çiqas dikarin vê mezinbûnê bawer bikin? Heta ku em fêm nekin ji bo kî mezinbûn, ji bo kî jiyan, ji bo kî avabûna kesayet hewce dike, li gorî min di şêwazek şoreşgerî de cîh dana jiyanê xwe xapandinek, nebesî û şaşiyek mezine. Jixwe mînakên ku derdikevin jî vê rastiyê didin diyarkirin ku ev ne bûyerek wisa hêsane. Ger mirov we di nava têkîliyên heyî de bihêle, bawer nakim feydeyek we ji şoreşê re çêbe. Heta ger hûn li gorî cîhana we ya xwestek, ger hebe azwerî, hest û fikir hinekê azad bêne hiştin, yeqîn nakim ev jî zêde

encamê bigire. Hûn jî dizanin ku, hûn nizanin di jiyanê de zêde bibandor bin. Heta hûn nikarin henase jî bigirin. Jixwe newêrekî û bêçaretiya di kesayeta jinê de di astek pêş de ye. Hûn kesîma ne ji bo xwe, ji bo hinek din bijîn rewşekê de ne. Tişta hûn dikin, karê li gorî hinek dine. Hûn li gorî ferasetên daxwaz, azwerî, serdestî û despot a civaka heyî –jixwe ev jî civaka zilamê serdeste- hatine mezinkirin. Seriyê vê yê dijber jî ev e; dema hûn bertek dijîn, an jî li dijî derdikevin, tê gotin; “Ji malê revî, ketiye kolanan, benê xwe qetandiye”, di radeyek zêde de ji dervî quralan derketin çêdibe. Cîhanek wisa di navbera herduyan de girtî mayî; weke ku ya rastî tine ye pêş dikeve. Ya ku şêwe dide reftarên gelek ji we ev her du rêgezin. Ne rêgeza azadiyê ye.

Hinek têkîlî diyar dibin, mixabin tevî hemû hewldanên me, em pir vekirî dibînin ku gelekî şûn bendewariyên me ne. Peyama ku em dixwazin bidin tam fêm nakin. Mînak bi hevalekê re hinek xalên ber çavên me ketîn hene. Dîsa min hinek gotinên hevalan ên ji ber tengbûnê kirîn bihîstin. Li hember nêzîkbûnên me behsa “azadiya cins” kirine. Ji bo hinekan pir xirab, ji bo hinekan jî weke hevbeşiya feraset fêm kirine. Hewl hatiye dayîn ku hem di nava hevalên jin, hem jî di nava hevalên xort de dualî ava bikin. Bes ev bi şêwaza gotûbêjiyê nirxandin nêzîkbûnek erzan esasgirtine. Lêgerîna rastiya jina sedî salan hatiye windakirin, a herî raste. Divê mirov rewşa sîxurtiya objektîf a di vê rastiyê de pir baş binirxîne. Heta ku bi gelemperî rewşa sîxurtiya objektîf a gelê me tê de dijî, bi taybet jî rewşa ku jin xistine vê rewşê neyê fêmkirin, ne gengaze ku em dahûrînên bihêz pêş bixin. Yekser bêjim; xala ku di vê mijarê de min dide fikirandin, şêwaza we ya lêkolînê gelekî kêm û şaşe. Ji ber hûn şêwaza lêkolînê ya dahûrandina rast pêş naxin, sedema herî bingehîn a xwe negihandina encamên têrkar û girîngin. Pir vekiriye heta ku dahûrîn nebin, mirov nikare li Kurdistanê gav bavêje, şer nayê pêşxistin û azadî nayê bidestxistin.

Hûn jî dizanin, tişta di Akadamiya Mehsûm Korkmaz de hatîn dahûrandin ne tenê hinek rastî bûn, a li wir hatî dahûrandin çarenûsek ku bûyî girêka kor, hemû xelekên em girê dabûn. Heta ne tenê komek endamên Akademiyê jî bûn, hemû dîrok û civak bû. Pêngavên pêk hatîn jî, ewqas rojane û pêşeroj bûn ku, berfireh û encamgir bûn. Mixabin em di derbarê rastiya şerê dawî de raporan digirin. Hêjî dibêjin; "Me fermanên Rêbertî baş fêm nekirine. Rastiya ku di şer de em dikevin nava rewşên herî xeter de jî vê destnîşan dike. Lewma ji nû ve pêwîstî bi lêkolînkirina ferman û perspektîfan heye." Piştî evqas windahî û hema bêjin rêxistinê ber bi tasfiyê ve rûbirû tîne, ger gihiştine vê encamê gelo çi wateya wê heye? Divê pêşî fêmkirin û têgihiştin hebe. Rêbertî pêşbîniya rewşên ku rû bidin û pêşxistina tevdîrane. Bes ên me piştî serê wan li kevir dikeve, ango piştî çend çalekiyên şokbûnê dijîn, nû tên ser hişê xwe. Ev jî dide diyarkirin ku paşketî û ne şiyarin. Ji ber vê weke hûn dibînin, ji bo cardin rewşek wisa neyê jiyîn, ez pir bi ser de çûm.

Bê ku pirsgirêkên we bi giştî bên destgirtin û dahûrandin, nexasim gavên we yên azadbûnê pêşxistin girînge. Li hember vê jî eleqeyek mezin heye. Bes hûn çiqas cidî ne? Dema dibêjin çiqas cidî ne, di wateya ku hûn teoriya şoreşgerî û pratîka şoreşgerî çiqasî bi berpirsyariyek bilind ve digirin dest de dibêjim. Nexwe ne di wateya zilamên bêxêr de dibêjim. Hêza we ya girêdana bi rêgezan çiqas dibe? Hûn ji veguhertinê re çiqas amade ne? Hûn çiqas dikarin binirxînin ku temenek û jiyanekê sax bidin vê? Gelo hûn di vê wateyê de amade ne yan jî dixwazin li ser vî bingehî gav bavêjin û teşe bidin xwe? Ev hinekê min dide fikirandin. Ji ber ne jiyînek ji bo sereserî, badilhewa û temen jî, nêzîkbûnek rojane heye. Ev jî mirov nagihîne qadrobûnek bingehîn û mirovê xetê. Mixabin gelek heval tevî hemû hewldanan, guman, rojane, hêsanbûnên xwe jiyînê nikarin xwe rizgar bikin. Ma niha li vir ez kêm dimînim an jî şaş disepînim,

nizanim. Ya rastî hewldanên min bêsînorin û berfirehin. Ango hûn jî xwedî gavên azadiyê ne. Gelo ji bo we azadî çiye? Yeqîn dikim, hûn kesayetên wisa ne divê li ser van baş bihizirin û bi encamekê ve girê bidin. Dîsa yeqîn dikim, a herî guncav jî hûn dikarin di vê nêvengê de bihizirin. Di filmên herî pêşketî de jî platformek wisa nikarin sazûman bikin. Ger pir baldarî binirxînin, hûn ê bikarin hem hestên xwe hem jî fikra xwe bilind bikin, hem jî ji bo ji nû ve şêwe bidinê bipejirînin ku ya herî guncav jî ev e.

Bi qasî ji min re hatiye ragihandin, xala herî zêde hûn pê ve asê dimînin, weke cins pirsgirêkên ku çavkaniya xwe ji rastiyên hûn dijîn digire. Ez dikarim vê pir vekirî danim holê û nîqaş bikim. Dîsa em dikarin vê di asta rêgez de jî vebêjin. Ti wateya wê nîne ku hûn ji vê teng bibin û weke mijarek exlaqî bigirin dest. Di rastiyê de ya ku hûn exlaqî dihesibînin, exlaqê feodalî ye. Di nava wê de qirêjî, berjewendî, mal û milkbûn heye. Di vir de jî herî zêde hûn winda dikin. Dîsa ya dibe bi we dibe. Bi gelemperî ya ku di bin pîvanên exlaqî de winda dike, gelên bindestin, cînsa bindeste. Niha piştî hemû jiyana xwe êş û jana vê jiyayî, hişê te hatibe serê te, lê belê te tiştek nekiribe, jixwe ev jî kêrî tiştekê naye. Pirsgirêk ew e ku em çawa bi şêwazek rizgarîxwaz nêz dibin, -jixwe ne tenê ji bo xwe vê dikin- û çawa gavek rizgarbûnê di civakê de bi cins jî didin pêkanîn. Bêguman girêdana azadiya cinsî bi çînayetî, civakbûn û siyasetmedariyê ve baş hatiye sazkirin. Dema di rastiya Kurdistanê de dibe mijara gotinê, herî zêde me di asta cîhanî de têkîliya malbat û civak, malbat û siyasetê baş û bihêz derxist holê. Disa di nava malbatê de rewşa jinê baş derketiye holê. Mijara jin tê gotin çiye, divê nêzîkbûnek çawa jê re bê kirin, pir bi zanistî hatiye nirxandin. Di vê mijarê de dostê me yê hêja Îsmaîl Beşîkçî dibêje; “Divê mirov aliyê APO yê civaknasî jî bibîne û binirxîne.” Ango dibêje; “Civaknasî zanisteke, divê mirov tevkariyên wî yên di vê mijarê de jî bibîne.” Niyetek min wisa nîne, lê di berfirehiya dahûrînên

me kirin de vê dibîne. Di rastiyê de malbat-civak û jin-malbat bûyerên civaknasiyê ne. Lê dema rastiya Kurdistanê dibe mijara gotinê, aliyê vê ya siyasî ya pir girîng jî heye. Divê mirov vê jî derbixe holê.

Lê binêrin, ger me malbat ne dahûrandiba, ne gengaz bû em xwe bigihînin azadiyê, dibe ku hêj negihiştî 14 saliya xwe de ez di nav şerê malbatî de tine bibûma. Ez ê di vê mijarê de zaroktiya xwe ji bo ji we re bibe mînak bibîra we bînim; hedefên bi qasî çiyan datînan pêşiya min. Digotin; "Bila ev zarok mezin bibe, ji bo şeref û serfiraziya malbata me tola me rake, bila wisa zilaman bikuje." Hêjî di bîra min de ye; dem bi dem ji bo vê rewşê nejîm min digot; "Ez naxwazim mezin bibim." Min ji xwe re digot; "Ez ê vî dijminî çawa bikujim, kanî ew hêza min û ger wisa be ez ê zû bimirim." Tam wê demê min dest bi siyasetmedarî kir. Pîrka min hebû digot; "Çavên vî hinekê yên bênamûsane, xeternake dibe ku ji bo malbatê şer neke." Di rastiyê de dikare bi şêweyek zarokek pir bi aqilbûm jî bê şîrovekirin. Ger ez weke ewladê malbatê yê esîl mezin bibûma, bi rastî jî min nedikariya gavekê bavêjim dervî gund. Hûn jî pir baş dizanin ku, di nava hemû malbatên Kurd de zarok bi taybet wisa bi "zilamê malbatê yê eslî, keça malbatê ya eslî" tên mezinkirin û li ser vî bingehî hêj kamil nebûyîn di nava şerên malbatê yên xwîndar, şerên malbatê, şerên mal û milk, dozên dendikek hêjîrê danagre yên mirîşk û kuçikan de tên kuştin û tinekirin.

Belê, ji ber van sedeman min biryar daku ez ê nekevim hewldanek mirinê. Min li hember malbatê bertek raber kir. Rakêşiya min a bi malbatê re wisa destpê kir û paşê jî berdewam kir. Weke hûn dizanin nakokiyên min ên bi dayîk-bav, gund-civak, mêtîngeriya Tirk û ol-felsefê re wisa pêş ket û dirêj bû. Taybetmendiyek min heye; ez nikarim xwe bixapînim. Dema bi nakokiyekê re liqay hev têm, heta bûhranê bijîm hewl didim çareser bikim. Heta dawî bi ser de diçim, serê xwe diteqînim.

Teqez dikarim encamekê bidest bixim. Fikra xweda ez anîbûm rewşa mirinê. Tê bîra min; li ser vî bingehî ji bo çareserî nêzî sosyalîzmê bûm. Hûn jî dizanin em hêjî, hem teorîk hem jî pratîk berfirehî li ser sosyalîzmê radiwestin. Ji bo azadiya cins jî rewş wisa bû. Berê min ji têkîliya jinê pir şerim dikir. Heta hinekê rika min hebû. Min nêzîkbûna dayîka xwe ya jinbûnê baş nedidît. Ji ber li gorî min zêde ne bi tenduristî bû. Ango her kêlî îdîayên maf û huquq ên girêdayî vê û zêde bi ser zarokan de çûyîna wê, bi min re hestek wisa ava kir ku dayîkek divê ne wisa be. Ji ber vê min helwest raber kir. Dayîk nikarin zarokên xwe wisa biwelidînin û mezin bikin. Min di jiyana xwe de di asta rêgez de nirx da vê mijarê. Bes hûn nizanin. Lê binêrin; ez hêjî bi rêgez dijîm.

Niha li zarokan binêrin, hemû bêçare ne. Dibe ku hûn jî ji zarokan hez dikin an jî dilê we bi wan bişewite, lê ez yeqîn nakim ku hûn di vê mijarê de pir bi rêgez û cidî ne. Dayîk û bav jî di navê de kesên ku di vê mijarê de jidilin, ji bo rizgarkirina cîhana zarokan dê hinekê durist bin. Binerin, ti tişt û pêşeroja zarokan nîne. Zarokên Kurd in. Pir xirab ji zarokan hez dikin. Min hêj wê dem ê ji vê nêzîkbûnê nefret kir. Min digot; tevî ku tiştek van zarokan nîne û ti plansazî û çareyek di derbarê pêşeroja wan de nîne, çima van zarokan hemêz dikin? Ji ber vê hemêzkirina wan jî ji min re weke rondikên tîmsahan dihat. Lewma min nefret kir û hezkirin nexwest. Weke min gotî, şûna ku mirov zarokek wisa be, bila qet nebe baştire.

Baldar bin, ez girêdayî rêgezekê dijîm. Îro zarok pir ji min hez dikin. Biçim ku derê li wir artêşek zarokan heye. Cîhana zarokan jî min fêm kirine. Dibînin ku qet nebe ji bo wan cîhanek hêviyê hatiye avakirin. Ji bo vê dibêjim; baldariya min ji gelek aliyan ve bû.

Mîna vê bala min li hember rastiya jinê jî hebû. Min ji rastiya jinê şerim dikir. Ji cîhan û valahiya wê ditirsiyam. Ji bêçaretiya jinê şerim dikim. Ji ber qet zimanê wê nîne yek-du

gotina bêje, destê wê nîne dest dirêj bike. Di ferqa vê de bûm. Ev jî hêj di temenê biçûk de bandor li min kir. Weke din min di têkîliyên jinê de xistina mirov didît. Min pir zû dît di têkîliya ku bi jinê re pêş bixim de berpirsyartiya giran dê mirov bibe heta kuderê. Ango min digot şûna ku têkîlî pêş bixim, qet nekim baştire. Ez di vê mijarê de pir bi rêgez tevgeriyam. Ne ji ber ku min hez nedikir, berovajî hêj ez zarok bûm qinyata min hebû ku divê bibim hevalek baş. Ji bo min xwe di nava ferasetên feodal de girê neda vê dibêjim. Di vê mijarê de jî meyla min a rêgezek wekhev hebû, lewma rehetî rave dikim. Min digot divê mirov di jiyanê de hevbeşiya bi jinê re, pergala jiyana hevbeş a bi jinê re saz bike. Çi di lîstokê de, çi di hilberînê de, çi jî di dibistanê de dibe hêj di temenê biçûk de meyla min ev bû. Lê piştre her ku mezin bûm, mîn dît ku derfetê vê zêde nîne, jin pir zû winda dibe û dê hevaltiyek wisa wekhevî û azad pêş nekeve. Min dît ku di vê mijarê de jî tişta herî zêde tê ferzkirin pir cuda ye. Jinekê tavêjin ser serê te, şêweya têkîliyek ku ji bilî bûhranê tiştek din nîne ava dibe. Fikarên min bi vî şêweyî li ser mijara zewacê çêbûn. Ne tenê ji bo min, hemû zewac bi min re fikar ava dikir. Hestek wisa bi min re ava kir ku, em bi vê zewacê ve hem jin û hem jî zilaman winda dikin.

Ceribandinek min di vê mijarê de jiyî hebû; îro hêjî tê nîqaşkirin. Nizanim hûn ji van nîqaşan çi encaman derdixin? Li hinek rojnameyan dinêrim hêjî spekulasyonên cur be cur hene. Dibe ku MÎT dixwaze nîqaşên weke “xwezûrê APO kiye?”, “çi karê wî li cem sîxurê çil sale li gel MÎT’ê kar dike heye?”, nizanim “têkîliya wî bi filan jinê re ji ber çi bû?” pêş bixe. Niha min ev hinekê di dahûrînan de vekiribû. Dê dema pêş ev bûyer bi serê xwe ji gelek xisletan ve bê bikaranîn. Dê zêdetir li ser bê nîqaşkirin. Ji xwe bawerim. Bawer dikim di vê mijarê de rast nêzîk bûme û ji bo gel, ji bo dîrokê encama herî baş derxistiye. Misoger durist nêzî bûme. Ji bo armanc helwesta wekhevî û azadî

misoger bû. Lê dîsa jî bi tevdîr bûm. Her tim pirsa “gelo” jî di quncikek serê min de hebû. Ne tenê ji bo endama malbatek wisa bû, ji ber rastiya jinê; navê wê heyî lê ew bi xwe nebû! Dihizirîm dibe ku çiqas durist be, çiqas girêdayî be, çiqas jidil be, çiqas dikare nûnertiya bi hev re jiyînê bike?

Bawer dikim vê têkîliyê ez ewqasî westandim. Bi gelemperî jin ji malê tên avêtin an jî direvin, lê belê min hewl da ji malê birevim. Ma we qet dîtiye zilaman dev ji malê berdayî û revîn? Hûn dixwazin bêjin sîxurtiyek objektîf an jî sûbjektîf, çi bê gotin bila be, hêj di sala 1978’an de ev têkîlî anî rewşek neyê jiyîn de. Bes em bi hevalên kevin re jî pir caran li ser vê têkîliyê radiwestîn. Nêrînek heval Kemal Pîr û hevalek me hêj sax hebû. Vî hevalî nêzîkbûnên hevalê Kemal ji bo me vedigot: Kemal hinek nirxandinên weke; “Wê heval xapand. Dê me bikuşta, ekît tiştek heval dizane heye” dike. Kemal pir bi me ve girêdayî bû. Bi vê girêdanê ve ne tenê di vê mijarê de, di mijarên din de jî bû xwediyê berxwedaniyek lehengî. Ne Kurd jî bû. Lê berxwedaniya herî mezin raber kir û mirovê herî zêde girêdayî Rêbertiya Partî bû.

Dixwazim vê bêjim; şerek mezin destpê kir. Dikarim bêjim ger me ev şer ne meşandiba, dê ev PKK nebûya. Gerilayên niha jî nebûn û serhildan jî nedibûn. Lê belê, gelek ji we nizane, hûn ê niha bêjin; “Çawa dibe ku têkîliyek wisa ji avabûna PKK’ê, serhildanekê û gerîlayekê re rê vekiriye.” Bes hûn dahûrîna Rêbertî rast têbigihijin, hûn ê fêm bikin ev wisa ye. Ev pir zelal derket holê ku, (ji bo hinek têkîliyan zelal bikim dibêjim): Xwe di wateyek “di mijara jinê ya tevî niyeta te ya baş, tevî hestewarî û hemû bêrîkirinên te tê ferzkirin, -weke min gotî çi sîxurtiya objektîf dibe çi jî sîxurtiya sûbjektîf dibe- ger tu bi min re têkîliyek saxlem dixwazî, divê tu pêşî ji rastiya min a çînayetî, rastiya min a civakî re serî bitewînî yan jî gelekî bê maf bibî amûrek. Ji wê jî wêdetir wê tu bi Komara Tirk ve girêdayî bî”

vedibêje. Bes ez pir bi rêgez tevdigerîm. Ya rastî ev pir vekirî jî nedigot. Berovajî pir şêlo, neyekser û bi rûyek jehir û tûj, bi şêwazek nêzîkbûnên weke sitiriyan ve rûdanek reş, ne her roj, weke her kêlî tolê rake nêzîkbûn raber dikir û wisa digot.

Niha vê fişal nakim; asta bûyer û têkîliyan hatiye selimandin. Divê ev weke bûyerek kesî jî neyê fêmkirin. Weke min vegotî, dahûrînên kesayet û nexasim jî ya Rêbertî pir ji nêz ve girêdayî giştî ye. Ji ber vê Kemal Pîr dibêje; “Êdî têkîliyek wisa nayê efûkirin; ev ferzkirinek pir xirabe.” Jixwe muxataba me jî her tim ev digot; “Zilamê Kurd ê herî baş jî be, heydedanê dijî. Qet nebe ger ferzkirinek wisa yek-du rojan çêbe, yan wê kêrê derbixe, yan jî dê çeka xwe derbixe bikuje, yan jî biqewitîne. Lê ji ber girêdana we ya bi sosyalîzmê ve ez jî dizanim ku hûn vê nakin û di heman demê de dizanim ku hûn li benda wextê ne.” Tespîtek rast kiriye. Bes ez têkîliyan hêsan û biçûk nagirim dest. Ji bo têkîliyên hêsan dahûrînên hêsan nakim. Ger min wisa kiriba, jixwe ne digihiştim fonksiyona Rêbertiyê. Ger zilamek ji rêzê bûya, dê bi zileh û lêdanê çareser kiriba. Ne ku ji ber bêhêz bûm, di rastiyê de ji ber bihêz bûm min nêzîkbûnek bi sebir raber kir. Weke din jî ger bibûma amûrek dilketinên xwe, dê encamên xirab rû bidan.

Niha jî hinek ji vê re dibêjin bêçaretî. Hêjî li hinek dostan dinêrim, di nava wan de kesên ku min bêçare û reben dibînin jî hene. Lê belê, kesên wisa dibêjin bi xwe ne ti tiştin. Ne xwediyê ti çareserî û pêşketinê ne. Jixwe pêşketin bi min re destpê dikin, bi min re dimeşe. Ev ne ji ber bêçaretî û hewcedariyê ye. Ji ber ketîbûnek min a cînseltî tine bû. Ev jî bo min ne şerim bû. Di nav fikarên min de cîhgirtina vê jî ne diyarker bû. Gelekan tinazê xwe jî bi min dikirin. Dayîka min jî tinazê xwe bi gotinên weke; “Nikare gotinekê ji jinê re bike” dikir, an jî dizanim ku gotinên weke; “Nizanim hevjîna wî çi bir û revî; ma zilamek wisa dikare bibe rêber?” dikir. Lê min berjewendiyên gel û partiyê esas girtin.

Ew jî ji ber vê bû: Bi rastî jî malbatê li Dêrsimê ji serhildana 1925'an heta 1940'î hevkariya Kemalîzmê kiriye û malbatek ji Înonû belge û name girtine. Di wateya malbata "baş" an jî "ji dewletê re xizmet kiriye" de hatiye pîrozkirin. Min ev dizaniya. Qinyata min hebû ku dê wisa jî berdewam bikin, weke hevkarên dewletê jî rolê xwe berdewam bikin. Di wê demê de CHP (Partiya Gel a Komarê) xwe pêşverû diyar dikir. Bes dewlet çiqas pêşverû be, ew jî ewqasî pêşverû ye. Min yeqîn dikir ku dê ev jin welatparêz bibe. lê belê, qinyata min hebû ku nûnertiya çîna xwe ya hevkar jî bike. Diyare ku dewletê jî rastiya vê têkîliyê dizaniya. Ji ber hêj di wê demê de ji nava vê malbatê hinek diçûn emniyetê û Pîlot jî rewşa min hêj di sala 1977, heta 1976'an de dizaniya. Jixwe diçû cem malbatê jî. Bawerim dijmin dihizirî ku girêdayî vê malbatê min kontrol bike. Gelo min ev kontrol bi zanebûn kir? Na!

Uğur Mumcu bi taybet dinivîse; "Gelo MÎT'ê APO parast?" Ji bo ronî bikim dibêjim: Na! Dê MÎT çima biparêze? Ez, rojane 1 trîlyon zerar didim. Rojnameyên burjuva jî vê dinivîsin. Ma MÎT zilamê ku rojane 1 trîlyon zerar dide diparêze? Min bi vê dewletê, xapandina herî mezin a dîrokî da jiyîn, darbeya herî mezin li wan da. Hûn jî vê dizanin.

Hevalek me li Akademiyê digot; "Di sala 1979'an de dema endamek MÎT'ê ez danîm beramber xwe li serê xwe dida digot 'me çawa ev zilam ji dest derxist." Cûneyt Arcayûrek jî di rêzenivîsa xwe ya bi sernivîsa "çawa heta 12'ê Îlonê hatin?" de dibêje; "Ev bostek mar bû, yek leşkerê me lingê xwe rakira dikariya biperçiqîne, lê me xefletek mezin jiyan kir." Bawerim dixwazin van rewşan bikin mijara nîqaşan.

Armanca van, bi rêya vê têkîliyê kontrol kirina min bû. Ma min ev taktîk pir bi zanebûn meşand? Min digot, ger pir hevkar jî be dikare ji malbatek wisa şoreşgerek derbikeve. Baweriya vê misoger bû. Min digot, ev hevala me jî dikare bibe

rêhevalek hêja. Bes ji hêla din ve jî tevdîra min her tim hebû. Gelo tedbîr girtin çibû? Bi şêwaza tu dikarî ji vî alî ve kontrol bikî, îdare bike û bikar bîne! Me Pîlot jî hinekê wisa bikar anî. Uğur Mumcu jî di vê mijarê de dibêje; “APO gotiye, Pîlot roniya çavên me ye, divê em wî biparêzin.” Min rasterast ev gotin nekirine, lê nêzîkbûnek wisa pêş xist. Ji ber ger me Pîlot bikuşta, dê wê demê hêj PKK’ê nav li xwe nekirî tine bûba. Dîsa ger min ev têkîlî ne domandiba, dê ji bo me derketina dervî welat zehmet bûya.

Ji ber dijmin di sala 1975’an de digot; “Ev, aresteyî damezirandina artêşa netewî ya Kurdistanê bûye. Divê bê kontrolkirin.” Hêj di sala 1975’an de ji me re ev agahî hat. Girtiyek endamê DDKD (Komaleya Çanda Şoreşgerên Rojhilat) ev agahî dabû me. Wê dem ê hêj navê Dev-Yol’ê derneketibû pêş. Ez jî di nava Dev-Genç’ê (Ciwanên Şoreşger) de tevdigeriyam. Vêca min pirsên weke; “ev Kurdperwere, an jî alîgirê Dev-Genç’ê ye?” ava kiribû. Me salek jî wisa derbas kir. Paşê jî digotin; “Di bin kontrolê de ye, em dikarin heman kêliyê de bigirin.” Min jî ji vê têkîliyê neyekser sûd wergirt û weke hûn dizanin jî em derketin. Di pêvajoya derketina me de jî ev şer hat jiyîn.

Fatma provakasyonên mezin kir. Semîr jî hêj di sala 1982’an de xwest partiya me bixeniqîne. Di sala 1982 û piştî wê pevçûnên sexte ava kirin. Xwestin partiyê bikin du şeq û parçe bikin. Me jî ev vala derxist. Di sala 1986’an de jî xwestin heman lîstokê bikin. Wê dem ê jî em li dijî derketin. Di hemûyan de jî xwestin mijara jinê pir xirab bikar bînin. Xafilin! Di vê mijarê de hêza çareseriyê nebû. Me jî bi vî şêweyî di tarîtiyê de meşa xwe didomand. Min bi sebrek mezin pêşî lê girt. Ango ez ji hêlekê ve dihizirîm mirov çawa dikare azadiya jinê sazûman bike, ji aliyê din ve jî dihizirîm dê ev jiyana bi dojeh çawa bê jiyîn û wisa bi hemû hêza xwe hewl da vî barî rakim.

Dibe ku gelek heval vê pêvajoyê nezane. Ji ber rewşên hestewarî yên tên jiyîn bi gotinan nayê vegotin. Hêza li ber xwe dayîn û sebrê, nêzîkbûna rika di rastiyê de, di belgeyan de nehatine nivîsandin. Me zêdetir encamên siyasî di belgeyan de destnîşan kirine. Lê têkîlî pir şênberin. Wê demê MÎT'ê di rojnameyan de ev mijar diweşand: "Zilamê girêdayî Fatma, APO kuşt; nizanim PKK parçe bû!" Di rojnameyan de wisa derdiket. Ya rastî keftûleftek mîna vê hebû. Lê belê, ji ber ku em bi sebir, fikar û tevdîr bûn, me firsenda serxistinê ne da van.

Ev di Kongreya 2. û Kongreya 3. de, her wiha di her salê de jî hat jiyîn. Herî dawî jî weke hûn dizanin vê xwe gihand provakasyona sala 1988'an. Li pişt wan Fatma hebû, Parêzer, (Yildirim Merkît) lîstokvan bû. Herî zêde hewl da wê salê partî ji hêz bixe. Bawerim heta provakasyonên ku li Başûr berdewam kirî, wisa dihizirim ku di wan de jî mantiqê Fatma serwer bû. Li gorî min di bingeha hewldanên wê de Komara Tirk plansaziyên provakasyonê pêş dixist û disepand. Ango ew jî hêzek bû. 40 salan bi Kurdan ve mijûl bûye, dibe ku dixwaze wê berdewam bike. Pirsgirêka hevkariya Kurd! Bes min jî bi vê re şer kir. Hêjî bi tena serê xwe şer dikim. Lê hêjî bi nêrînên weke "çi karê wî bi keça filankesê sîxur re heye" fikar hebûn. Ji hêlekê ve hevalên me digot; "Ev têkîlî bi çi şêweyî ye; her roj ew bi xwe zilaman dixe; divê em mirovan nedin windakirin." Hinek hevalên jin yekser fetisand, hinek daxist asta herî jêr, hinek jî pêşkêş kir. Ji bo ku ji nava jinan yek heval dernekeve çi hewce dikir, ew kir. Tîpên ku ava kirine heta niha jî bela serê minin, bihêrsin. Bi pirsgirêkin. Zilamê ku destê xwe dirêjî wan kirî jî, bela serê minin. Naxwazim navê wan jî bêjim.

Niha dixwazim dîrokê hinek din vebêjim. Pêvajoyek tam 10 salan şerek pir dijwar, me yekser ji eniyê ve meşand. Bes, gelo ev şer tenê di mijara têkîliyek taybet de bû? Na! Ev pir zelale: Şerek siyasî ye; şerek bi mêtîngeriya herî bi xeter û astengiya wê

ya neyekser re bû. Şerê hest, fikir û rêxistinkirinê bû. Şerek rasterast li hember astengiya herî mezin a li dijî xwe gihandina gêrîla bû. Li pêş qadrobûnê astengiya herî mezin bû, lewma şerê bi wê re bû. Ev şer li ber çavan li dijî yek kesê bû, lê di rastiyê de li dijî Komara Tirk bû. Şerek li dijî yekîneya wê ya herî xeternak, kuştinê, kontragerîla, şerê taybet û MÎT-Îstixbaratê bû. Vê pênaseya giştî ji bo vê dikim: Dixwazim hûn fêm bikin, di kîjan çarçoveya siyasî de nêzî têkîliyan dibim, ango bingeha dîrokî çawa digirim dest dibêjim. Ji bo hûn nebêjin mijarek “têkîliya cînseltî ye” û ne danin aliyekê û pir seresere nehizirin bal dikişînim ser. Bi rastî jî di zilamê Kurd de ketîbûna cînseltî –bi jinê re jî wisa ye, tenê ji bo zilam nebêjim- di asta herî pêş de ye. Felsefeya gundî de cînseltiyek kûr a şev û roj heye. Li ber çavan pir binamûse, nimêjkare, lê mixabin jiyana wî tev cînseltiyek kûre. Rastiyek wisa ye cînseltiyek ji malbata serdema destpêkê paşketîtire. Çi bi êşe, navê paşverûtiyê jî kirine namûs. Dema ev jî derbasî nava malbatê dibe, tê dîtin ku rastiya Kurd bi temamî di nava têkîliya cînseltî de hatiye fetisandin. Di vê mijarê de jî nasnameya welat û netewî jî hatiye windakirin. Niha jî tengezariya herî mezin ev e. Ne zilam dikare henase bigire, ne jî jin. Niha mirov dikare ancex bi nirxandinên wêjeyî û siyasî yên berfireh ve vê baş vebêje.

Lewra ez dibêjim we dahûrîn baş lêkolîn nekirine. Bes pir girîng bû. Em tam fetisî bûn. Çima ji gundîtî camêrek qenç dernakeve? Ma çima hêjî fermandarek leşkerî û siyasî ya bihêz dernakeve? Çima tevî van hewldanan hemûyan pêşmergeyên Başûr ji bo malbata xwe çil caran xwe difiroşe? Çima zilamê Kurd evqasî xwe firot Ewrûpa? Elbet ji bo malbata xwe. Ji bo kar çil caran li ber deriyê mêtîngeriyê parsekiyê dike. Qaso vê jî di bin navê rizgarkirina namûs û malbatê de dike. Li hemû têkîliyên wan binêrin; hemû jî ji bo jiyana xwe ya hêsan rizgar bikin, di

berdêla mûçeyekê de tiştek ku nefiroşe nîne. Ma serfirazî û namûs maye? Exlaq di ku dera vê de heye?

Lê ji bo vê jî rizgar bike diçe heta dojeha cîhanê, her êşkenceyê dibîne, diçe serê cîhanê yê din, ji çolên Erebîstan heta Siwêdê diçe. Ev di heman demê de drameke. Şoreşger jî hinekî ne bi şêwaza sergirtin, dizanin bi şêwaza afirîner û rizgarvan nêz dibe.

Belê, hûn ê çawa nêzî van pirsgirêkan bibin? Hem ji ber min evqasî bi ferdî jiyan kir, hem jî ji bo çavderiya min a giştî heye ji ber wê vedibêjim. Li gorî min divê berî her tiştî, tişta bê kirin azadiya zayendan sazkirine. Divê em cînseltî ji bûna amûra xapandin, xistinê, ketin, mal-milk û çêkirina malbatê derbixin. Ji ber ev her tim weke mijarek bêşermiyê tê nirxandin. Têkîliya di navbera cînsan de û têkîliya cinsîltî pir şerim tê nirxandin. Gelo ev nêzîkbûn rastin? Dema em çi li zanista giştî, çi jî zanista azadiyê dinêrin, em ê bibînin ku girêdana vê bi paşverûtî, muhafezekarî û heta pêşketina civaka çînayetî ya mezin re derbikeve holê. Dê girêdana wê ya bi mal û milk ve û heta weke dîtbariyek wê ya pir hêsan derbikeve holê. Li vir derdikeve holê ku, suca herî mezin li mirovahiyê tê kirin, bingeha bê exlaqiya di bin navê exlaqê de tê kirine. Rûyê din ê namûsek wisa jî, bênamûsî ye. Yan jî rûyê girêdana zêde ya bi mêrekî ve ya din jî dêhliktî ye. Her du jî gelekî dijwar bi heve girêdayî ne. Belê, li Kurdistanê van hemûyan civaka me fitisandiye û cîhana me ya fikrî xeniqandiye. Ango ji ti pêşketinek weke taybetmendiya netewî û rastiya siyasî re firset ne hiştiye. Hûn dikarin vê fikrê zêdetir jî pêş bixin. Ya herî girîng jî dikarin di kesayeta xwe de bisepînin.

Mînak ez weke zayend xwe hinekê azad dihesim. Jixwe ji yek şerê min ê herî mezin jî, xwe di rewşa azad de hiştine. Min bi vê çi bidest xist? Gel azad nêzî min dibe, jin hinek din bi wêrek nêzî min dibin. Ma min ji gel re got bêjin, “Bîjî APO?” Na! Ji

nişkê ve li her cihî ev duruşme hat qêrîn. Ez jinê çawa dikişînim nava refên me? Hûn baş lê binêrin, baldarbûnek mezin bi we re pêş dikev e. Di xêra vê baldariyê de di dîroka Rojhilata Navîn de yekem care jin evqasî bêtirs li serê çiyan çek digire destê xwe. Ger ez nebûma dikariya ev gav bê avêtin? Na! Niha girêdana vê, misoger bi sazûmankirina jiyana min ve heye. Ji ber min weke kes dev ji hebûna azadiyê berneda, bi giştî civak taybet jî jin ber bi azadiyê ve dibeze.

Divê hûn bizanin vê lêkolîn bikin. Rewşa azad çiye? Jin çima baz dide? Niha em lê binêrin, herî zêde jî hezkirin pêş dikeve. Hûn ê hinek din xwe bigihînin çavkaniya vê. Ev çawa pêş dikeve? Weke din jî hinek eleqeyên min hene, baldar bin. Ango ji bo gel bêserûbin dihizirim, bi rastî jî bi sebir û rikek mezin li ser karê xwe disekinim, cihekê didim we jinan jî û ji bo van jî şer dikim. Di xêra statûya azad û têkîliya azad de şerek bêsînor tê meşandin. Divê ev bê dîtin. Yekser min destê xwe dirêj kir. Pir zelale ku ez hêzek bilind a kêşane diyar dikim. Pêşketinên ku ji hinek encaman re rê vedikin derketin holê. Bi rastî jî êdî bibînin ku, ez di rewşa karkirinê de me. Ez nabêjim ekît tişta ku dibêjim raste, lewma yekser bipejirînin. Lê hinekê jî bizanin lêkolîn bikin. Qet nebê ger hûn bikarin pêwendî pêş bixin, hûn ê bikarin mifteya efsûnî ya xwe gihandina rewşa azadî bidest bixin. Li gorî min mifteya herî binirx jî ev e. Ev, ji nîqaşê re vekiriye. Ez di vê mijarê de pir hewl didim ku, wêrek bim. Her kesî gotiye jine û bi ser de çûye. Nazim Hîkmet jî, gotiye; “Jina me ye, gayê me yê zere, nizanim çiya me ye” û wisa bi ser de çûye. Weke bûkek xemlê bigirin, heta gelek teswîrên din diçe. Ango wêjeya wê pir hatiye kirin. Di encamê de tîpek heta dawî xirab, di bin lingan de dizivire derketiye holê. Hûn jî dizanin jin, her tim di serfirazî û şerefê de xeta duyem de hatiye girtin. Gotina wê zêde nayê guhdarkirin, cidî nayê girtin û di pêvajoyên biryarên civakî û siyasî de rê nayê dayîn. Jixwe di qada leşkerî de qet cihê wê tine

ye. Weke cihê wê di nav malbatê de jî hatiye diyarkirin, “cihê wê piştî gayê zere.” Di vir de eziyeta herî mezin û mineta wê tê kirin.

Niha ev statû bi ecêba wê ve pejirandin û ev serfirazî dîtin, li gorî min heqareta herî mezin li mirovekê bê kirine. Lewma li dijî vê derketina min, li dijî her cure têkîlî, zewac û çandên ber bi encamên wisa ve dibin derdikevim. Binêrin, sebra min mezine û zilamê rêgezê me. Yeqîn nakim kesek din bi qasî min hêza sebra girêdanek tebat a bi hinek rêgezan ve raber bike. Jixwe yên dinasin, dibêjin; “Yekem care em te weke mirovek hemû jiyana xwe li gorî rêgezan sazûman dike dibînin.” Pêdiviya min nîne ku kesekî wisa hêsan bi xwe ve bidim girêdan. Lê belê, ji bo ideala civakî ya mezin û xwe gihandina vê hevalbendiyê jî, jiyana min bi xwe ye. Me ji kesayeta civaka Kurd a bê ziman ku hezarî carî tine bûye ev leheng ava kirin. Hinek vê dibêjin; “Ew bi xwe lehengin, ji te re çiye?” Niha ev jî nirxandinek pir erzane. Hûn jî dizanin, ev hemû, mirovên ku ji siya xwe ditirsine. Ne zehmete ku mirov binirxîne gav bi gav çawa xwe gihandine xeta lehengiyê. Belê, ez nabêjim her tişt bi min destpê dike, lê bi rastî jî divê ev hewldan baş bê fêmkirin. Ango hûn dijminê min jî bin, rast binirxînin. Jixwe Ser Fermandarê Giştî jî me baş dinirxîne. Dijmine, lê rast dinirxîne, rastiyê diyar dike.

Belê, ji tîpên ku henase nagire û siya xwe ditirse rewşên wisa avakirin girînge. Pir pir girînge. Ev tê çi wateyê? Tê wateya her tişte. Jiyan bi xwe ye. Bes divê mirov rêgez ên vê bizane. Di rastiyê de rizgariya we bi xwe bala min kêşaye. Binêrin, pergala têkîliya zilamek ji rêzê bigirin dest, wisa xwe nade van karan û dê pir çewt bibîne. Jixwe demek dirêje çêkera me acêb dibîne. Dibêje; “Gelo, dixwaze partî bi van jinan re çawa bimeşîne?” Ev nêzîkbûn demek dirêj li ser pişta min weke qovekê bû. Belê her kes di derbarê, çi têkîliya taybet a min pêş xistî, çi jî pey re hemû têkîliyên pêş dixim de, weke ceribandinek xwe kuştinê dinirxîne, yan jî weke min karê herî xeternak kiriye dinirxîne. Ji ber jinê û ji

ber we vê dibêjin. Lê mixabin ger em ji zilaman re bihêlin karê yekem bikin û tişta hûn bipejirînin; hûn ê bibin mal û milkê kesê yekem ê nêzîkbûna hestewar raber kiriye. Dê ew jî bêje; “Sedî sed malê mine”, hûn ê jî bêjin; “Raste ez wisa me.” Niha ji bo ez vê napejirînim, gelo xirabiyê dikim? Tişta ez dixwazim bikim, dahûrandina jin û zilame. Nexwe kî çawa liqay kî were, nêzîkbûnên weke quralên malbatî, quralên mal û milk, li gorî dewlemendî, karbidestî û hêza xwe raber bike, dê encam çi be?

Vaye, jin bi zar û zêçan ve girêdane û her ku dikarin çewsandina wan jî wisa ye. Divê mirov binirxîne gelo ev çiqas exlaqî ye yan jî çiqas xizmetê ji azadiyê re dike. Binêrin; rexneyên di vê mijarê de zêde ne û dahûrîn jî gelekî hatine pêşxistin. Nizanim, gelo ji ber em vê dikin gelekî zehmetî tê jiyîn an jî pergala hinekan serûbin dibe? Dibe ku wisa be. Rewşên ku derdikevin holê dinêrim, tê fêmkirin ku hemû hestên we dirûxin û ev jî rê ji bertekên mezin re vedike. Niha min di vê mijarê de hinek rewşên kesî yên rû didin nirxandin. Ez li gorî van kesayetan zilamek xeternakim. Jixwe bi gotinên weke “bêhempa ye, ma nayê hizirîn, an jî nizanim çi nikare bê kirin” ve nirxandin tên kirin. Hinek nêzîkbûnên weke “gelo ev gel rêberê xwe nas dike? Ma dizanin serok wisa ye?” û hwd tên raberkirin. Her çendî li hember van gotinan tevan fikar hebin jî, di vê mijarê de serfirazim. Dibêjim; “Ji bo tu dibêjî bila wisa be her bijî ji te re.” Dihizirim ku; “Te ji dîrok û rastiya koletî tol hilgirtiye.” Ya rastî zû bi zû xwe na ecibînim. Lê dîsa jî di van mijaran de dibêjim; “Te di van mijaran de hinekê encamên temam girtine.” Hûn ê di mijarên kî û kîjan hest çawa rûxand de, hinekê jîr û jidil bin. Hûn ê hinekê ji xwe bawer bin û xwe jî binasin.

Ew rastiya we jiyan kirî çibû? Li jina Kurd binêrin, we bi çavên xwe dît, we cihê wê ya di nav civakê de jî dît. Keçên ciwan hêj di temenê 10-12 salî de didin wan zilamên mezin, dizewicinîn û tînin çi halî. Ma di rastiyê de wan ti carî ji wan hez kir? Ma

rêzbariyek dîtin? Çiqas di zanebûna vê de ne? Gelo di vê mijarê de ti vebijêrkên wan çêbûne? Gelo ti raveyên wan ên hezkirinê çêbûne? Gelo hêjayî ti rêzdariyê hatine dîtin? Hûn jî pir baş dizanin ku yek ji van jî tine ye. Dest û dilê wan vala ye. Zimanê wan hatiye girêdan, çavên wan hatiye korkirin û wisa li şûnekê dane rûniştandin.

Ma niha şerê min ne li dijî vê ye? Dibe ku vê bêjin; "Mafê her kesî heye ku bibe xwedî cîhanek erzan a hestan." Heta ev jî gotin; "Ma tu PKK'ê di nava nêvengek çawa de digirî, evqas jin û zilam bê ku bizewicin çawa dikarin bên rawestandin?" Hevalekê di derbarê vê mijarê de digot; "Weke agir û barûdê ye. Tu çawa dikarî wisa bigirî?" Provakatorekî jî digot; "Em ê biçin di nava 48 demjimêran de vê meseleyê çareser bikin. Em ê biryarê bidin ku kî bi kê re bizewice û pirsgirêkê ji bingeh ve çareser bikin." Hemû provakatoran di vê mijarê de soz û bext dan hev. Ji hev re gotin; "Ger em partî desteser bikin, em ê bikarin li malên ku dixwazin û têkîliyên ku hûn dixwazin de dikarin bidin jiyîn." Bi sedan, heta bi hezarî xebatkar wisa bêbandor kirin. Lê binêrin, heman çîroka kevine. Çi zilamê li gund wisa li têkîliyê nêriye û malbat ava kiriye, hirmetek ji xwe re girtiye, camêrek ji xwe re girtiye, dema xwestiye li nav refên me jî wisa kiriye, binêrin ti ferq di navberê de nîne. Gelo me serbest bihiştan dê çibûya? Li gorî gotinên wan, yek kesî nedikariya biçe Botanê. Dê li Ewrûpayê bijiyan! Niha hûn pir baş dizanin, ma em mirovê li Ewrûpa dijî bikujin jî, serê wî jî jê bikin, tu bêjî were tu bûyî dewlet, serxwebûn bidest xistiye jî, kes dikare cardin vegerîne welatê wî? Gelo dikarin yek kesî jî ber bi şerek wisa zehmet ve bikişînî? Ger mirov li ser vê bihizire; ne gengaze. Parsekê Ewrûpayê ye, jixwe ew jî meseleyek dine. Ger niha her cure heqaret li wan tê kirin, dibe ku dema pêş bi komkujiyê re jî rûbirû bimîne. Lê wan bi xwe ev çarenûs ji xwe re destnîşan kirine. Ev cuda ye, ez behsa ferzkirinan dikim. Gelo kî çi li ser kê ferz dike?

Ferzkirinên min jî ev bûn; pêşî rastiya xwe binasin. Ji bo vê PKK'ê, her ku biçe jî sosyalîzma di nav PKK'ê de binasin. Herî dawî xwe weke cîns binasin.

Me got divê em vê platformê ji we re vekirî bihêlin. Tê bîra min ku me ev gotin pir vekirî gotibû. Nûbûna herî girîng em ji bo we bikin, platformek ku hûn bikarin xwe azad binirxînin vekirî hiştine. Ango me got em pêşî firsendek ku ji fikrên kêfkarî û dilketinan dûr a bi tenduristî bidin wan. Bi vê rêyê ve hewl bidin bi hev re nîqaş bikin, ferzkirinên rast bikin. Çarenûsa xwe nîqaş bikin. Lewra bila kes ji kesî re nebe asteng. An jî bila kes di ferzkirinên neyênî yên beramberî hev raberkirinê de zêde sînoran derbas neke. Gelo sînor derbaskirin çiye? Bi azwerî şêweya; "tu bûyî ya min, ez bûm ê te" hevdu korkirine. Bi hezkirin, rêzdarî û hêjabûnê ve dagirtî bin. Bes bila kesek nêzîkbûnên ku nexweşiyên fîzîkî derbixe holê, rewşên weke destavêtinan neke. Ev herî zêde ji bo we hewce dike. Ji ber hinekê pêwîstiya we bi fikirandin û xwe komkirinê heye. Jixwe ev ji bo dîrokekê dihat kirin, ne ji bo komekê bû. Ji bo di serdemek dîrokê de pêngavek azadiyê bê pêşxistin dihat kirin.

Xebatên provakatoran a dijber di çapemeniyê de jî hat weşan. Heman weke partiyek dervî partî bû! Min di vê mijarê de behsa çalekiya MÎT'ê kir. Niha jî bextan li we dixwin. Ev azweriyên we, şêwaza hatina we, heta dawî we bihêrs dike. Ya rastî min li hember vê pir li ber xwe da. Ji bo vê min hinek nêzîkbûn pêşve birin. Min got, ev çi azwerî ye. Binêrin, min got em vê azweriyê veguherînin welatparêziyê. Min got, em veguherînên fêmkirina gel, girêdanbûna bi gel ve. Min got, em veguherînin têgihiştina mijara PKK'ê. Min got, em veguherînin têgihiştina mijara Rêbertî –ev jî hewce dikir-. Jixwe me di demê dawî de ev mijar pir nîqaş kirin û me xwest em ferz jî bikin. Ev ferzkirinek raste. Ji ber ji bo berjewendiya we ye. Beriya her tiştî derfetê nêvengek nîqaşa wekhev û azad çêbû, bi qasî vê jî ez hêza

mafê vebijêrka xwe kirinê didim. Dibe ku hûn nekarin li gorî dixwazin azweriyên xwe bijîn, bes ma ya girîng ev bû, yan jî xwe rizgarkirin bû? Belê, ya girîng fêmkirina dîrokê, xwe gihandina rêgeza rizgariya giştî û bi vê re jî pêkanîna rizgariya kesî ye. Belê, têkîliyên bi we re jî di vê çarçoveya giran de hatin sazûmankirin.

Niha tevî evqas şîrovekirinên giştî, çima hêjî di pratîkê de hinek cebanî yan jî di asta objektîf de rewşên mirov jê re bêje sîxurtî derdikevin holê? Ji ber nefêmkirina rêgeza azadiyê ye. Ji ber ji xerîzeyan re sînorek tam nayê dayîne. Yan jî ji ber hêza girêdana wê bi siyasetê re nikare raber bike ye. Siyaset xeteke. Xet jî her ku pêşde diçe, di xetê de rêxistinbûn û çalekî ye. Ji bo girêdan bi wê re nayê çêkirin, dixwazin dilketinên bê rêgez bidin axaftin. Em hinekê asteng dikin, rastiyê ferz dikin, yekser bertek tên raberkirin. Di encamê de entrîka û fesadî derdikeve holê. Jixwe ev jî pêşketinên ku rû bidin jehir dike. Niha ez ê li vir nirxandinek mamoste Yalçin bibîr bînim. Di nivîsandinek xwe de dibêje ku; “APO bi bildozerê ser mejiyan de diçe –ez dikarim dilan jî li ser vê zêde bikim- û baxçeyên gula diçîne.” Belê, me lêkolîn dike, wisa digihe van encaman. Bi rastî jî zeviya Kurdan ancex dikare bi bildozerê bê kolan û ger hinek tov bên reşandin dikare hinek tişt derbikevin holê. Mixabin di baxçeyê Kurd a heyî de ne gul û ne jî giya heye. Hatiye şewitandin, xirbe ye, çirave, mirov ji bêhna û xezebê nikare têre derbas bibe. Kesên ku hinekê xwedî hêza nêzîkbûna civakî ne dikarin vê rastiyê bibînin.

Niha dibe ku hinek we bên hezkirin. Lê ez bi rewşa heyî ve hinekê loman ji jinan û keçan jî dikim. Ez ne pir tolhildêrim. Bes rewşên ku qet nayê efûkirin dijîn. Tişt nabe dîsa jî em efû bikin. Hinekê tên asta ku dikarin baxivin. Hinekê digihin rewşa hêza fikrî, lê belê ji ber ku xwe ji her alî ve pêş naxin, rewşên çewt û xeternak dijîn. Ez dipirsim; te çi kir û çi dixwazî? Ma te kîjan şer meşandiye ku heta dixwazî hinek tiştan fêm bikî? Te hewldanên me heta kîjan radeyê fêm kir? Bawer nakim, derdê van

ên weke fêmkirina Kurd, Kurdistanê bikin cihê jiyînê hebê. Baweriyek saf, ev an jî ew! Em dixwazin mijarek pir girîng bidin derbaskirin. Bi hemû provakatîf û oportonîstan re bendewariyek wisa heye: Di qonaxên wisa pir dijwar de dixwazin darbe lê bidin! Min sedan mînakên vê dîtin. Ne tenê di vê mijarê de, di gelek mijarên cur be cur de jî wisa bû. Şer di qonaxek nazik de ye, ger nêzîkbûnek rast bê kirin dikare gavên pir mezin bê avêtin. Lê mixabin kesek derdikeve yekser ji "nişkê" ve oportonîstiyek wisa ferz dike, derfetên di asta zêrîn de hêja ji dest diçin. Belê, min sedan kesên wisa nas kirin. Bingeha vê ya çînayetî heye. Xwezaya mirovên ku ne duristin, her tim xwe di qonaxên wisa de bi vî rengî tavêjin erdê û diyar dikin hene. Ji bo vê jî her rêkê diceribînin. Komek lîstok û tevlîheviyan di bin navê teoriyê de ava dikin. Di bin navê pratîkê de jî çi tê ber devê wan dibêjin. Dibin zimandirêj û fesadên bêhempa. Nexasim xirabkarî dibe hunera wan. Rêbaza wan a sereke jî gef xwarine.

Niha bibînin ez bi çi re rûbirû me. Ger ez tenê xwe bifikiriyam, bi qasî serokê dewletekê hêza min heye û min dikariya li gor dilê xwe bijîm. Lê hûn jî dibînin, ez xwe ji we zêdetir di nava mercên zehmet de digirim. Ev ji her hêlê ve wisa ye. Ma ez bê derfetim û bê hêzim? Hinek evdal min wisa dibînin. Gelo ez pir ketî yan jî kirêtim? Ne wisa ye. Kesayet pir şahwer dikarin bi min re bimeşin. Lê hûn jî dizanin ku gelekî bi astengiyan re şer dikim. Weke din jî tê zanîn ez hewl didim xwe nexapînim. Dema dibêjim xwe naxapînim, aliyê vê yê civakî û pîvanê wê yê edaletê pir girînge. Bi gelemperî nûnertiya sosyalîzmê dikim. Ango ji têkîliya serdest û bindest re çareserî dîtin pir girînge. Bi qasî teorî ji pratîkê re jî çareserî dîtin pir girînge. Kes hesaba vê nake yan jî naxwaze fêm bike. Bêzirav no!

Dibe ku dema em rê şanî we dikin, nêzîkbûna rast diyar dikin ji we re ecêb were. Dibe ku hûn bêjin; "Ev mesele ji bo heta radeya dawî şeyda ye." Hûn têkîliyên her roj li derdora we pêş

dikevin dibînin. Biserûber naxivin. Tam karbidest jî bin, yeqîn nakim rewşek wan wisa ya azad rave bikin. Tişta min kirî çibû? Nepejirandina van bû! Me bi serê xwe li dijî van muhafezekariyan şer kir. Niha dibe ku hûn jî bêjin; "Em ji bo azadiyê şer dikin û dijîn." Bes ka lê binêrin bi hewldanên me ve çiqas hevgirtî û çiqas bi me ve girêdayî ne? Tengezariyek we biçûk a hundurîn çêdibe, hûn vê yekser vediguherînin bertek û nerihetiyê.

Min vekirî ji we re got; ne li pey meqamê me, di rewşa xizmetkarekî de me. Xizmeta we dikim. Yeqîn dikim hezkirî û mêrên we jî eleqeyek wisa raber nedikir. Deka hinekê jî xwedî wijdan bin. Hezkiriyek we heba, gelo dê wisa bihata dert û kulên we guhdar kiriba, giyana we ya hundurîn evqasî dahûranda? Dê wisa li hember pirsgirêkên we eleqe raber kiriba? Na! Dê weke mal û milkê xwe dîtiba û li gorî dixwest jî bikar baniya. Ev pir vekiriye. Ez jî herî kêm bi qasî we zilaman nas dikim. Azwerî û binyata we pir vekiriye. Hûn di nava lewaziyan de ne. Zilam jî wisa we bikar tînin û piştre jî hûn di tevahî jiyana xwe de bûhranê dijîn. Ma ev tiştek başe? Gelo di vir de windakirinek we ya mezin tine ye? Ma beriya her tiştî egîdiya we ji dest naçe? Ma hêj kesayeta we destpê nekirî ji dest naçe? Mane min ji we re got nîqaş bikin. Dibe ku zilam pir baş jî nêzî we bibe, dibe ku pir baş biparêze jî, dibe ku pir jî hez bike, lê bi rastî jî ev dibe dilşadî? Belê, rengê malbatek wisa dilşad diyar dikin. Lê gelo di rastiyê de wisa ye? Dema mirov li civakê dinêre pir baş dibîne ku ne wisa ye. Gelo siheta keçek ciwan çiqas tê parastin? Gelo çiqas rêzbendî tê raberkirin û nirx tê dayîn? Deka derdora xwe ya herî nêz binêrin. Li cem wan çiqas nirxa we heye? Niha ger fikra mirovek asayî ji rêgeza azadî û xeta siyasî qut be, her tişt ji wê tê payîn. Jixwe ger dilketin û xerîzeyên xwe pêşxistin kiribe serê xwe, her cure bela ji wê tê payîn. Navê vê jî kirine azadî. Azadiyê wisa fêm dikin. Mixabin nêzîkbûnek pir erzan hat kirin. Di encamê de ev nêzîkbûnek ku xwediyê wê nayê efûkirine.

Dîsa hûn ê vebijêrin. Tişta ku ez dixwazim li vir bikim, avakirina derfeta vebijêrk û ecibandinê û qabîliyeta hilbijartinê ye. Dixwazim vê bi we bidim hesandin; mirovek ku hûn rêber dipejirînin, divê ji bo jinê û azadiya wê ewqas xizmetê bike ku, hûn neyîn xapandin. Lê em dinêrin zilam serdest û bihêze. Wisa nêzî me dibe û em jî nêzîkbûna rast ferz dikin. Em dixwazin vê bi we re jî bikin xwestekek û vê xwestekê jî veguherînin têkoşînê. Ev jî şerê we ya azadiyê ye. Niha hûn dizanin ev jî nêzîkbûnek pir hostane ye. Ez artîstiyê nakim, lê kî ye min di vê rewşê de dihêle? Ger wisa nekim, dikarim misqalekê gav bavêjim? Gelo dibe ku ji nava we jî kesên wisa xwediyê nêzîkbûna azadiyê derbikevin? Ger hûn bêjin; “Ya rastî heta vir pêwîstiya me bi azadiyê nîne, me ya ku biecibînin, ecibandiye.”, wê demê ez ê jî vê ji we bipirsim; “Çima we şoreşgertiya xwe xurt nemeşand? We çima encam negirt? Çima hûn têkçûyî ne? Hûn çima bi rêkûpêk çareseriyekê ji xebatê re peyda nakin? Deka li jiyana xwe binêrin, hûn ê bibînin ku ev wisa ye. Weke din jî hûn nebes û di nav xwe xapandinê de ne. Misoger pêdiviya we bi veguhertinê heye. Hûn jî dizanin ku çiqas pêdivî bi nêzîkbûnek wisa heye. Herî zêde jî divê yên weke we ji nêzîkbûnek wisa encamên girîng derbixe. Ecêbe! Bi rastî jî me çima xwe anî vî halî? Ez çima di xizmeta we de me? Ma hewce ye? Ya rastî ji we dipirsim; divê hûn bersivê bidin. Destpêkê berî ku bikim pirsgirêk, ji bo şoreşger bûm, dubare li ser rawestiyam. Ji ber di fikir û reftaran de jî gelek kêmasî hebûn. Lewma bi ser we de hatim. Hinek evdalan ev weke ferzkirin fêm kirin. Na! Dem bi dem bi we û gelek hevalan re axivîm. Ez bi we re çi axivîm? Li gorî min niha keçek me, jinek dikare bibe parçeyek welatekî. Bal bidinê ev rastiyeke.

Rastiya me ya civakî û netewî di diyardeya jinê de zêdetir li ser piyane. Zilam, ji ber hevkarî, biyanîbûn û rojê ji bo dijmin çil teqleyan tavêje hatiye tinekirin. Zêde nikare nûnertiya nirxên netewî bike. Jin her çendî paşketî jî be, jina Botanê gura berî 4000

salî ye, ango zêde nehatiye bişaftin. Mirov dikare bêje li hemû qadan jinek, di asta nirxa netewekî de ye. Çavek baldar baş dikare vê bibîne. Lewma dibêjim divê wisa bê pêşwazîkirin. Ango weke parçeyek welat bê pêşwazîkirin. Elbet dibe ku hûn bêjin; "em bêhinketî ne, xilas bûne, kesayetên tine bûne, tu çima wisa li ser me helbestvanî dihizirî; ma çima xeyalên te wisa mezinin?" Bes kesê ku welatparêze neçare ku wisa bihizire û ev şêwaza hizirandinek baş û xeyalek başe.

Jin weke parçeyek Kurd hizirîn û wisa jî pêşwazîkirin, li gorî min mezinbûne. Ger hûn bi xwe jî ne hêjayî vê bin, divê em we hêja bikin. Ma ev ê çima xirab be! Nexwe qet taybetmendiyên wisa tine ne. Ya rastî jinên li cem me, "cihê wê piştî gayê zer tê." Çawa hatibe destgirtin dê wisa be. Gelo aliyê vê yê mirovahî li kure? Ji dîrok, welat û çandê evqasî qut bigire dest, piştre jî bêje; "canê mine, malê mine" û hema bi ser de biçe! Bêrêziya herî mezin û ferzkirinên herî kirêt jî di vir de ye. Ma çend quruş nirxa cînseltiya girêdayî vê heye? Ma çend quruş nirxa azadiya cînseltî ya girêdayî vê heye? Gelo çend quruş nirxa azadiya girêdayî vê heye? Dilketinên te har bûne û te hem êz kiriye. Şiyar bin, gelo ber bi rêgeza koletî, rêgeza lawirî, rêgeza biyanîbûn û rêgeza mêtîngeriyê ve dibe yan na, belê dibe. Gelo di vir de rêxistinbûn û çalekgerî heye? Qet tine ye. Belê, ev e feraseta gundîtî. Şev û roj tenê cînseltiyek xeniqî heye! Ma ev azadî ye, namûs jî ev e?

Ya rastî ez ji karkirinê aciz nabim. Min di zarokatiya xwe de çawa bi xiroşek hevalbendiyê ve tevgeriyabe, hêjî wisa me. Di hizir û jiyana min de kesayet jinwarkirin an jî zilamtiyek sexte tine ye. Ez ê di jiyana xwe de ti carî rê nedim vê. Ev ji bo min pir kirête. Hevjînbûn ne xirabe, lê belê hevjîntî çawa pêş dikeve. Ev hêjî ji bo min mijara şerek mezine. Şerê mezin a di vê rêyê de tê meşandin û ev mijûlbûn ji bo min pir girînge. Rêya ber bi hezkirinê ve diçe, ji bo hinekan weke vexwarina qurtek ave. Lê di rastiyê de pir zehmete. Weke din jî rêya ber bi hezkirinê ve diçe

vekirî hiştin jî, bi şerek dijwar ve gengaze. Dema ez vê dahûrîna Kurd dikim û dibînim nayê lêkolînkirin, ev dibe gunehek mezin. Niha hinekê dev vedibin, lê wê jî pir xirab bikar tînin. Wisa dihizirim ku dê piraniya van hewldanan bê înkarkirin û beriya bê fêmkirin vala derbikevin. Encam; tiştek baş jî çênabe. Kesê ku dîrokê înkar dike, hewldanê înkar dike, ne di rêya sosyalîstbûn û ne jî di rêya diçe rizgariyê de dikare bibe xwedî ceribandinekê. Tenê dê bibe înkargerî. Jixwe rewşên ku di sosyalîzma pêkhatî de rû dayîn jî mînaka vê ye. Xayîn derdikevin, welat difiroşin. Ez dikarim vê hîn berfirehtir vekim.

Baweriya we zêde bi we nîne. Hûn di pêwendiyan de pir tengav dibin. Divê mirov wêrek be. Ji vê hêlê ve jî dikarim xebatên jinê hinekê sînordar bikim. Lê yeqîn dikim hûn ê winda bikin. Ji ber bawer nakim ên zêde pişgiriyê bidin we hebin. Gelo wateya teorî û di pratîkê de rêxistiniya têkoşîna jinê çiye? Yeqîn dikim min ev hinekê fêm kiriye û dikarim pêk jî bînim. Lê mixabin ev tê wêrankirin. Di vê mijarê de hûn dikevin nav kêmasiyê. Bes ev jî min dide fikirandin û dihêle ku tevdîran bigirim. Binêrin, ev heta radeya dawî nêzîkbûnek zanistî ye. Vexwendinek azadiyê ye. Lê carina li vir hinek endamên me yên perwerdeyê, çi nîqaş kirine û dixwazin çi nîqaş bikin? Li ser gelek pêşketinan xwe çawa ferz dikin? Gelo ev raste? Qet bawer nakim. Gelo xwe li hemberî me diparêzin?

Ez nabêjim em ê we paşve vegerînin, lê weke min gotî jin ji nav têkoşînê qewitandin, li gorî min nêzîkbûna herî xirabe. Nabêjim em hewceyî vê ne jî. Dîsa jî divê mirov bawer bike. Qinyata jiyana bi we re xweştir dibe hewce dike, hem jî divê hewldana vê ya xweser jî bê dayîn. Hewce nake hûn jî xwe tengav bikin. Em zêde tiştekê jî ji we naxwazin. Ango em nabêjin îllahî divê wisa tevlî şer bibe, divê kleş wisa bê bikaranîn, wisa derbikeve serê çiyan an jî divê xwe wisa biselmîne. Hewce nake hûn bikevin nav hewldanên zorakî. Ne ez, ne jî ti kes û sazî

nikarin we ne li hember cinsa we ne jî cînseltî tengav bike. Heta dawî hûn dikarin azad tevbigerin. Divê qabîliyetek we ya hilbijartinê hebe. Divê hûn xweşikbûna rasteqînî bibînin.

Jixwe dema jin dibe mijara gotinê, em nikarin wê ji jiyanê qut bigirin dest. Li cem Kurdan “jin” hem jiyan, hem jî jine. Pênaseyek pir raste. Bes lê binêrin xistine çi halî? Jiyan xistine rewşa eynî û are, sitirî, nizanim kul û birîn, riziyayî, bûye belayek her cure bênamûsî bi navê wê tê kirin. Her wiha jin jî weke katalîzor hatiye bikaranîn. Hêjî bikaranîna wê berdewam dike. Weke min gotî armanca min ev hîn zêdetir anîna rewşa bê jiyîne. Me xwest em tabloyekê ava bikin. Me got bila ji nav jinê jî hinek rêber derbikevin. Demek dirêje em di vê mijarê de lêhûr dibin. Dihizirim dibe ku di vê mijarê de hinek pêşketin çêbin. Ev hewldan xweser û afirîner bûn. Gelek pêşketin jî çêbûn. Wê dema pêş bandora van pêşketinan hîn zêdetir bê dîtin.

Di pêngavên gel ên mezin de xebatên me yên li vir bandorek diyarker dikin. Me jinên ku mezin li ber xwe didin û ber bi şahadetên mezin ve diçin ava kirin. Ev berhema xebatên em dimeşînî ne. Hinek xayîn jî derketin, lê di rêjeyek mezin de lehengên hêja derketin. Bêrîvan'a (Binevş AGAL) ku li Cizîrê şehîd ketî tînim bîra xwe, dema behsa van mijarên ku dibêjin tên ferzkirin dihat kirin, divê ez wê hevalê bibîr bînim. Ji ber dibistana seretayî qedandibû û ji bo li zarokên malbatan binêre, xwedî bike biribûn Ewrûpayê. Bibû parçeyek ji azadiyê. Lê di pêvajoya dahûrînên min kirî de ev derket holê. Pêşî pir reben bû û koletî dijiya. Paşê nirxandinên li ser jinê û em çiqas nirx didin jinê dît. Sedan jinên wisa azadîxwaz hene. Ma xirabe ku em nirx didin wan û wisa tînin rewşa şerkerekê? Dibe ku azweriyên xwe yên kesî ne jiyan, lê belê li gorî min di dîroka gelê me de cihê xwe yê herî pîroz girtine.

Niha jî dixwazin van tevan şaş binirxînin. Bes di rastiyê de ev hemû jî pêşketinên avakirina hebûna netewekî ne. Ev

serfiraziya jinê ne jî. Hûn li ser vî bingehî pêş dikevin. Lê divê em vê bes nebînin, hîn zêdetir pêşveçûn hebe. Xizmeta min jî bi tena serê xwe têrê nake. Pêdivî bi hewldanên min û yên we jî heye. Jixwe pêşengê vê xalê yê sereke jî hûnin. Di mijara Kurdewariyê de xwedî li vî cihî derketin pir girînge. Lê mixabin weke min gotî, hêjî hûn newêrin, zêde jî ji xwe ne bawerin. Gelek caran behsa girêdana bi rêgez tê kirin, lê edep tine ye. Gelo hûn pir aciz dibin?

Carina hûn tên wê rewşê biteqin. Ev jî dide diyarkirin ku hûn di kamilbûnê de lewazin. Ji bo ne feyde ye ku hûn di jina lewaz de israr bikin. Yeqîn dikim di wextek wisa de bûna evdal û koleya kesekî jî dîsa jî ji bo we ne feyde ye. Qabîliyeta xwe ya hilbijartinê di asta bilinde de hiştin, qabîliyeta nirxandinê û sînorên pêwendiyên xwe berfirehkirin baştire. Lê hûn ê bizanin bi rêgez, terbiye bin û berendama azadiyê bin.

Şoreşvanî, hunera avakirinê ye. Lenîn jî vê dibêje; "Divê xeyalên me yên mezin hebin. Lê divê hinekê jî bi zanistî bin." Şoreşgerên bê xeyal nabe, lê divê xeyal girêdayî rastiyan bin. Bawerim bi vê re bendewariyek zêde çêbû. Ya herî rast niyeta mezin û xewna mezine. Şaşî û nebesî di vir de ye: Hêj hûn ne di wê rewşê de ne ku xwe weke faktora jiyanê ya eslî binirxînin. Em zêde we tengav jî nakin. Ez ji bo çi vê dibêjim? Ji ber hûn ne di wê rewşê de ne yekser ber bi jiyana malbatî ve biçin. Pêwîste di vê mijarê de hinekê azadiya we ya fikir û reftaran hebe. Li Ewrûpa jî wisa hêsan zewaca jêra temenê 30 salî napejirînin. Ango ez nabêjim em ê jî heman wisa bikin. Lê wan jî fêm kiriye ku zewac gelek tiştan ji azadiyê distîne. Jixwe şêweya zewaca heyî tine dike. Gelek tiştên ku divê em bi têkoşînê bidest bixin hene. Di vê qonaxê de cînseltî nirxek ku dikare weke mal û milk bê firotine. An jî divê weke nirxek; "eman ji destê min derket, her tiştê min xilas bû" û weke nirxek bê xilaskirin neyê fêmkirin. Cînseltî rewşek xwezayî rave dike. Lê mixabin civaka serdest û civaka çînayetî ew aniye rewşek neyê nasîn.

Girêdanek qayîm a cînseltî, civakbûn, malbat û siyasetê bi hev re heye. Nêzîkbûna herî rast jî ev e. Ger cînseltiya we ji destê we derbikeve, asta we ya civaktî bê korkirin, siyasetmedariya we qet nebe, hûn ê rewşek herî xirab bijîn. Em jî dixwazin van bi hev re komkirî di kesayeta we de bidin jiyîn. Divê hûn jî hêza fêmkirinê pêş bixin. Ger kesayetek we wisa ya yekpare pêş bikeve, bi rastî jî qabîliyeta we ya hilbijartin û nirxandinê pêş bikeve, hûn ê bikarin li dijî her cure paşverûtiyê têbikoşin. Yên ku bi hemû hêza xwe ve pişgiriyê dide vê emin. Li gorî pêwîstiyek azadiyê vê serwer bikin. Lêkolîn bikin, xwe ji xapandinê û nebesiyan rizgar bikin.

Bi qasî hûn bikarin vê pêk bînin wê hêza we ya hezkirin û ecibandinê çêbe. Ger wisa nebe, hûn nikarin hilbijartinek rast bikin. Hûn ê wê demê bêedaletî û bêmafiyê bikin. Hûn ê ya ku divê neyê hezkirin, hez bikin, a ku divê bê hezkirin jî hez nekin, dê ev jî bê edaletî be. Dê ji bo we jî bêmafiyek be. Divê mirov di pîvanek hêjayî de hez bike û hezkirinê pêş bixe. Ger em nekarin vê bikin, em nikarin sosyalîst bin. Nêvenga herî rast a di navbera cînsan de, bi avakirina şêwaza têkîliya rast ve gengaze. Ev jî hilweşandina kendal, newekhevî û dîwarên hezarî salî di navbera zayendan de hatî avakirine. Ango li ser bingeha têkîliyek azad û wekhev, nêzîkbûna zayendan a ji hev re ye.

Min hewl da di vê mijarê de hinek tiştan bikim. Her tişta hatî kirin jî ji nîqaşê re vekiriye. Lê weke min gotî hinek endam û hinek hevalan hêjî em fêm nekirine. Di vê mijarê de hêjî di nava partî de lewazî tên jiyîn. Nikarin pêwendiyek rast pêş bixin. Têkîliyên ku tên pêşxistin jî, pir çewtin. Nikarin xwe bigihînin hezkirina rast jî. Lewma dibin amûrê provakasyonan. Sîxurtiya objektîf bi şêweyek pir xeter tê kirin. Dijmin jî bi şerê taybet vê dike. Vê yekser dike mijara şerê taybet. Bi taybet têkîliyên jin û zilam pêş dixe. Di encamê de, zerara ku endamê dijmin jî nikare

bide, em di vê mijarê de ji ber bê perwerdehî û nêzîkbûnên ne rast dibînin.

Partî jî li ser vî bingehî hewl dide bi perwerde çêkerê ronak û xurt bike. Dixwaze rewşa heyî wisa çareser bike. Weke min gotî, pêwîstiya vê bi şerek hem di asta çînayetî, hem asta cînseltî û navbera cînsan de, hem jî dem bi dem di asta netewî de ku pîvanên gerdûnî esas bigire heye. Deka em jî wêrek nêzî vî şerî û encaman bibin. Em jî pêngavên pêşverû pêk bînin û nebesiyên heyî derbas bikin. Em hemû bi hev re xwe bigihînin şêwaza têkîliyên ku bi vîna azad ve hatine diyarkirin. Deka em di vê mijarê de ji dîroka paşverû û têkîliyên civaka paşverû tolê bigirin. Bizanin herî zêde pêwîstiya we di şerek wisa de ya tolhildanê heye. Ez tenê ne piştawanê vê me, di heman demê de rênas û şervanê vê me.

Bi hemû hêza xwe ve di fermana vê dozê de me. Hem min ev doz ava kir, hem jî dimeşînim. Her wiha yên dikevin ber fermana vê de jî divê hişyar nêzî vê bibin. Divê bikarin bibin rêhevalên dozê yên jinên bijare. Hinek sedemên vê yên objektîf û sûbjektîf ên ez destnîşan dikim hene. Hêvîdarim hûn rasteqînî û kûranî nêz dibin. Em hebin jî, nebin jî bibin şopdarên nêzîkbûna rast a bêhempa. Em bawerin ku, ji bo rizgariya we xebat kêm nehatine meşandin. Ev misogere. Pir bişopînin. Dibe ku hinek kêmasiyên me hebin, wan zêde mezin nekin, cewher girînge. Cewher; bi rastî jî ji hêla we ve di şêwazek serfiraz û mercên wekhev û azad de bûna xwediya jiyanek bi şeref û şahnaziyê ye. Ji bo serwerkirina vê jî, bibin milîtana şerê vê ya bîrdozî, siyasî û leşkerî. Her tişta ku li pêş vî şerî asteng dibe bi erdê re bikin yek. Ji her tişta ku vî şerî bilind dike û digihîne serkeftinê re jî bibin rêhevalek saxlem.

Ev nirxandina ku me bi we re kir jî, ji bo em bi bîranîna Mizgîn (Gurbet Aydın), Roza (Fatma Zeyno) û Berîvan (Binevş Agal) bikin parçeyek jiyana xwe ya jêneveger dikim. Em ê

bîranîna wan bi bilindkirinek her dayîm û misoger xwe gihandinê ve bersivê bidin. Em bîranîna şehîdên ku teslîm nebûne çiqasî bi bîr bînin têrê nake.

***Kanûn 1992***

*Bi Jina Kole Re Şoreş Pêk Naye*

Îro dema ez bi hevalekê re axivîm pirtûka “çawa bikin” di dest de bû. Min jî got divê romana me bi navê “Çawa Bijî” an jî bi navek din bê pêşxistin. Ger hûn bikarin rastiya têkoşînê ji her hêlê ve binirxînin, tiştên ku me di van rojên dawî de jiyane, hem dîrok, hem jî bi qasî romanek wêjeyî ya mezin herikbare. Jixwe dahûrandina we dahûrandina girêka kor a 4000 –herî kêm li gorî hejmara gelemperî– salî ye. Yên ji bo me zehmetiyan ava dikin, kesayetên hem ji dîrok hem jî ji rastiya hemdem qut bûne. Wê tu van hem bi dîrok hem jî bi hemdem ê re yeksan bikî û wisa bimeşînî! Em li vir zehmetiyan zêde dijîn. Wisa yeqîn dikim we jî ev bi mafdarî nenirxand. Hejmarek zêde hevalên me bi şêweyek giran kesayetên pir teng, pir înkarî, xapînok û seresere ferz kirin. Bawer nakim di nava we de hevalên ku zêde ez fêm kiribim hebin. Çi di nav jinan de çi jî zilaman de kesek derneket.

Her kes wisa dizane ku baş fêm kiriye û heta ji min baştir jî dizane. Lê paşê derdikeve holê ku, tiştên ku hîn bûye ne bi qasî dendika hêjîrê ye. Gelekî winda kirin û dan windakirin. Dîsa jî yê herî zêde ev kar meşandî ez bûm. Min dehî caran dahûrînên li ser jinê pêş xistin. Ez ê li vir carek din dûbare nekim. Lê dikarim weke berdewamiya wan hinek mijaran vebêjim.

Mirov dinêre bi gelemperî di nava nebesiyên bêbawerî de dijîn. Gelo şerê kesayetî çawa dimeşînin? Wê jî rast nakin, lê şoreşê dixwazin. Ji bo serkeftî bin, dê tişta ku me dayî weke “cewher” girtiban. Ne dîmen, dê we li cewher binêriya. Dê we girîngî ne daba şêwe, bida naverok. Niha jî hûn bûne girêk bi girêk. Ango civak qetekê kole be, hûn jin çend qet kole ne. Jixwe nêzîkbûnek azadiya sexte, nikare mirov gavekê jî pêşve bibe. Divê mirov bizane azad be. Ew nayê kirin. Pir teng fêmkirina partî û weke saziyek malbatê wêdetir nedîtin, dema bi lewaziyên

din re jî yeksan dibe, bi yek gotinê rewşek bûna bela derdikeve holê.

Me xwest em pêngavek azad ku kevneşopiyan bi erdê re yeksan dike bi jinê bidin pêkan. Ya rastî di zanebûna zehmetiyên wê de me. Bes heta ku li hember koletiya kûr têkoşînek pir alî pêş nekeve ti gav jî nayên avêtin. Zehmetî, dema lewaziyên kesayetan xwe didin der çêdibin. Ger hêj hûn nikarin devê xwe vekin, hûn ê çawa bikarin partiyekê –jixwe heke partiyek sosyalîst be-bimeşînin? Hele li ser Şoreşa Rus'an, li ser Şoreşa Fransa bihizirin; li van deran pêncî salî, sed salî ronakbîriya fikrî, tevgerên wêjeyî û jiyana mirovên tîp bi tîp ku salan berdewam kirî bi rengê netewî hat meşandin. Lê di nava me de her tişt bi dîroka partî re destpê dike. Ne kevneşopiyek fikrî, ne tevgerên wêjeyî û ne jî tîp hene: Hemû jî belayek weke qurmekê ne! Hemû weke petata ne. Ango xweserî jî nîne, nûnertiya çînayetî jî nîne. Lewma ev, di heman demê de xisletên civaka gundî ne. Mînak, herikbûnek mezin ber bi tevlîbûna partî ve heye. Lê belê, dema dor tê veguhertina wan muhafezekariyek mezin rû dide. Dê kî û çawa ji bin derbikeve? Tîpên pêşde werin dê hûn bin, bes hûn çiqas dikarin dahûrîner bin? Gelo hûn ê dahûrîner bin, an jî girêkan zêdetir kor dikin? Ji bo em di vê mijrê de ber bi çareseriyek diyar ve biçin, min mejiyê xwe teqand. Niha jî hûn weke zarokane. Gelek ji we tenê dizane gazincan bike û hinek dengên ecêb derbixe. Gelo jiyan bi azadî tengavkirin çawa çêdibe? Hêjî daxwazkarê vê tine ye. Bi giştî rewş wisa ye.

Tên, lê nikarin rasterast nîqaşekê bi me re pêş bixin. Dê çawa bê şîrovekirin? Paşê jî her kes çi tê ber devê dibêje. Ger şêwaza lêkolînê rast bûya, we dikariya hîn baştir pêş ketiban. Qet nebe, we dikariya xwe bigihînin hêza nîqaşê. Dê kesayet jî hinekê hêz bidest xistiba. Hûn ji van dahûrînan encam derxistinê de lewaz mane. We bi hêjayî zêde lêkolîn nekiriye. Bi gelemperî yek ji hemû dahûrînan rast hatiba lêkolînkirin, dê encamên mezin jê

bihatan derxistin. Heke em kesayeta Kurd çareser nekin, pêkhatina şoreşê jî xeyale. Deka li dîrokê binêrin, hûn nikarin serê xwe jî rizgar bikin. Heta nikarin henase bigirin. Ez lê dinêrim, dibînim hûn lêkolîn nakin ku pêşketin çawa derdikevin holê. Heta gelek heval di nava vê nêzîkbûna şaş de ne: "Ez jî beşdarî şoreşê bûm, dikarim şoreşvaniyek mezin jî bikim." Bes ev şaşe. Tu çawa "şoreşvaniyek mezin" dikî? Heke ev partî, nexasim dîroka Rêbertî bihata xwendin, dê hingê dîtiban ku kar bi nêzîkbûnên çawa yên bêhempa, henaseyên kêlî bi kêlî, firsendên kêliyan û xulek bi xulek hatine meşandin. Haya gelek hevalan ji vê nîne. Lewma di vê wateyê de kedxwariyek azadiyê derdikeve holê. Ango heke îro tiştek bi navê têkoşînê heye, lewaziya fêmkirin û hînbûna mercên derketina vê her ku diçe ber bi nêzîkbûnên hêsan, çep û rast dikeve ve rû didin. Ev berfireh bûye.

Niha ez ê çawa dîroka partî ji we re vebêjim an jî bidim hesandin? Em ê çawa rastiya Rêbertiyê bi we bidin hesandin? Ji ber hûn bi rikin, nêz nabin ku rastiyan ji her hêlê ve fêm bikin. Hûn nikarin bêjin ku "çanda me nîne." Ji ber aliyên we yên dilsoz lewazin nikarin bişopînin jî. Di kesayeta Kurd de girêdan lewazin. Bi qutbûnek hêsan ve rûbirû dihêle. Heta ev kesayet hevdu di şêwazek provakatîf de digirin dest. Li hember van jî rewşek me jî ya bûna hêza çareseriyê heye. Dîsa jî ev nayê şopandin. Tenê tiştên giştî yên heyî fêr dibin. Ew jî jixwe her kes digire û wisa jî xwe dixapînin. Heke hemû dahûrîn li gorî tên xwestin bihatan fêmkirin, dê pirsgirêkên kesek ji we zêde çênebûna.

Hejmarek zêde ya çêkerê, di serî de gerîla, dema xwe bi zorê ji rewşên îmhayê rizgar dikin, yekser dibêjin; "Me perspektîf fêm nekirine, divê em ji nû ve lêkolîn bikin." Îro her kesim vê tiştê dibêje. Fermanên me di wextê de baş nehatine fêmkirin. Ji bo dahûrînên jinê jî dibêjin; "Em teng nêz bûne, me têrkar negirtine dest." Nexasim nêzîkbûna seresere ya ji keda Rêbertiyê re, rewşên ku qet nayên efûkirin derdixin holê. Belê, min pêşî hesabê

wê kir û wisa axivîm; rê, xet, reftar hatin çareserkirin, xweşik bû, lê mixabin we fêm nekir û tênegihiştin. Paşê jî heta we karî we rastiya xwe ya paşverû ferz kir. Gelo Kemalîste? Bermahiyên serdema navîne? Bê ku qet hûn li ser van bihizirin, we xwe ferz kir.

Em ê vê îdîa xwe, tevî van hemûyan pêş bixin. Dê dahûrîna jinê jî pêşve biçe. Li dijî her cure nêzîkbûnên paşverû û muhafezekar jî, ji bilî bûna mirov ti çareyek din nîne. Yek rêya derketinê heye ew jî ev e. Min gava din mînakek da dibêje; "Nêzîkbûnên Rêbertiyê kêm-zêde wisa ne."

Lê di rastiyê de nêzîkbûnan na dahûrîne. Ji ber nadahûrîne jî hewl dide bi lîstok bide diyarkirin. Dema weke zaniye dilîze jî nikare bide bawerkirin. Paşê jî qaşo alîkarî dixwaze. Ev jî bûye mode. Dijminên min ên herî mezin jî, alîkarî ji min dixwaze. Jixwe naveroka alîkariyê diyare. Ji mêj ve ji her kesî re –ji xayînan re jî- hatiye diyarkirin. Bi rastî jî min pêşî ve pişgiriya herî mezin dabû provakatoran. Mixabin bi fêlbazî kar kirin. Di xêra keyfa xwe ya rojekî de nêzîkbûnên weke; "Kesî nekiriye, ma em ê şoreşê pêk bînin; tişta em bikin dê ji me re bimîne" raber kirin. Di encamê de çi bû? Elbet zerar dan me jî, lê rewşên wisa ava kirin êdî wan bi xwe jî nekarî nefes bigirin. Bal bidinê, ez dîsa li cihê xwe me û li ser karê xwe me. Mixabin ên bê bandor bûyîn, winda kirin, zerar dîtin ên din bûn. Bi mejiyek gundî yan jî burjuvaziya biçûk em nikarin karên ku we lewaz xistine danin aliyekê.

Di mijara jinê de jî wisa ye. Ez bi jina kole re, bi fêlbaziya burjuvaziya biçûk re jî şoreşê çênakim. Bi pîrejinekê re jî şoreş çênabe. Bi jina çeleng re şoreş çêdibe. Belê, ev xal pir girînge. Pirsgirêk ev e; jina çeleng kîye, pirsgirêk xwe çawa gihandina jina çelenge. Em di van mijaran de her roj bi ferasetên xeter û şaş re rûbirû ne. Dema ez hinek ferasetên bi we re dibînim şaşwaz dimînim. Çiqas jinên ku bi ferasetên kevneperest ve asê

mayîn hene? Ev hinekê jî dibe mijara nîqaşê. Jin, ji azadiya xwe çi fêm dike? Serweriya li ser cinsê xwe yan jî ji xwesertiya vê çi fêm dike? Jixwe ne di ferqê de ye jî. Hêj xwe ji bûna sermaye rizgar nekiriye. Dixwaze xwe pêşkêşî firotinê bike. Ne gengaze ku bi vê jinê re di şoreşê de gav bê avêtin. Qabîliyeta wê ya hilbijartinê nîne. Wer dihese ku dê bikare bi rêbazên entrîka encamê bigire. Jixwe ev jî ne gengaze. Van tevan hêj ji zaroktiya xwe ve min bi têkoşîna beramber dayîka xwe re derbas kirin. Qanûna axatiyê diaxivî. Ez jî qanûna zaroktiyê axivîm. Komek têkoşîna wisa hebû. Encam; hûn jî dizanin kêm-zêde ji hinek pêşketinan re rê vekir.

Şîreta min hûn hinek romanan bixwînin. Di destpêka vegotinê de behsa romana "Çawa Bikin" hat kirin. Di pirtûkê de behsa jinekê tê kirin. Nizanim kî ji we xwendiye? Gelo di xeta serbixwebûnê de dixwaze bimeşe? Yeqîn dikim ji bo kesayeta xwe serbixwe bike hewldanên pir mezin dide. Di rastiyê de kesayeta ez jî dixwazim pêş bixim heye. Bawer hinek xalên dişibin hev hene.

Hinekan jî xwendiye dibêjin; "Dahûrînên we kirine bi hinek ên di pirtûka "Çawa Bikin" re dişibin hev. Ji ber min nexwendiye nizanim. Lê tişta em dixwazin bisepînin, bi rastî jî di rêya serxwebûnê de xwe gihandina kesayeta pir li ber xwe dide. Yeqîn dikim di vir de jinbûna xwe serbixwekirin û azadkirinê heye. Her çendî pêşî çewt jî be, her ku diçe kûr dibe. Li gorî min divê hûn zêde li ser wê kesayetê rawestin. Tişta ez dikim ji vê hinek din berfirehtire. Ya me zêdetir rasteqînî ye. Lê belê, hinek din têkilhev û zehmete. Dema rastiya Kurd dibe mijara gotinê, wisa dixwiyê ku dê zehmet jî derbas bibe.

Em tevahiya rojê her tim li ser mijara dê jina serbixwe çawa be rawestiyan. Belê ev pirsgirêkeke. Yek ji me ne gengaze ku weke heyî bipejirîne. Ma jina ku bi rojane şerê azadiyê nemeşîne kêrî çi tê?

Bawer dikim xisletên jina wisa her tim serbixwe dibe û pêş dikeve hene. Wisa dihizirim hinek xisletên jina ku di pirtûka “Çawa Bikin” de jî di derbarê xweşikbûnê de ne. Ango yeqîn dikim xweşikbûnê ava dike. Mijara beden ava dike. Ruh û fîzîk jî dibe yekbûna wê. Ne wisa? Aliyê fikrî jî, nexasim serbixwebûna bîrdozî jî encama çandaku em dizanine. Ev tîpa milîtaniya Rusa ye, vaye jina Rusî ya niha. Ya rastî bi hêze, ev encama wan dahûrîna ne. Niha jî rewşa gelek ji we dinêrim; çavên we tevan rondikan dibarîne.

Dê niha çawa be? Em ê çi ji vê tîpê bikin? Ma em ê li serê xwe bidin? Mînak ji bo we her tim tiştekê dibêjim: Min got hûn ê serbixwebûnek bêhempa pêk bînin. Dê serbixwebûn we hinekê azad bike. Her ku azad jî bûn hinekê dikarin bên hezkirin. Ev qanûneke. Ne gotinek ji rêzê ye. Hûn çi dikin bikin, heta ku azad nebin, serbixwe nebin, hûn ê di refê de bimînin. Hûn ê di navenda partî û di civaka Kurdistanê de neyên hezkirin û bên derbaskirin. Ez neçarim di vê mijarê de cidî bim. Çima? Ji ber ku Rêbertiya şoreşê dikim. Şoreş ji bo xweşikbûnê ye, ji bo başiyê ye, ji bo rastiyê ye. Ma ez çawa dikarim tîpên ku bûne bela di şoreşê de bipejirînim? Ez ê çi ji kesên ku azweriya wan a azadiyê nîne û rojane şerê azadiyê nameşînin bikim? Yeqîn dikim jin zêdetir têkoşerin. Bawer dikim pir bi erkan ve jî girêdayî ne. Ji ber rojane jî pir jêhatî ne. Weke min gotî, ew netewekê ava dikin. Ya rastî dixwazim hûn jî nîqaşên xwe li ser vî bingehî kûr bikin.

Mirov dikare gelek tîpên din mînak bide. Tîpek Fransî yan jî di dîroka Îslamiyetê de Tîpa Hz. Fatma heye. Dibe ku hûn xweş nebînin, lê ez ê ji we re bêjim: Hz. Fatma meseleyek mezine, keça nebî ye. Di rastiyê de milîtane. Kesayetek wê ya pîroz heye. Pir baldare jî. Ango ji pêşengên Beyt’ê ye. Dema bavê wê wefat dike ji 6 mehan zêdetir nikare bijî. Ji vê binemaliyê heta roja me hatiye. Jixwe di dîroka gelek netawan de kesên wisa

şertin. Niha, em hatin dîroka Kurdan ne wisa, mixabin heta niha kesayetek saxlem a azad nehatiye dîtin. Hemû keçên me jî wisa.

Dema xwîşka min a mezin dan mêr, bi meşa du-sê rojan ji gundek din hatin û bi navê camêrên ne diyare çine girtin birin. Çend kîs genim û çend quruş dabûn me. Hawa'ya me çû û çû. Ji wê rojê ve tê bîra min. Min got di vî karî de tiştek veşartî heye. Ger wê demê nêzîkbûnek şoreşgerî hebûya, misoger Hawa dikariya bibe jinek baş. Ew çû, keçên wê çêbûn. Qaşo dê min yek rizgar kiriba. Min soz dabû. Ji ber ji welat qut bûm êdî nizanim çi bû. Yeqîn dikim ew jî çû. Ne karî fikra xwe rizgar bike, ew jî hat firotin. Niha hîn zêdetir paşketî mane. Ji ber vê dibêjim; ev kar ewqasî ne hêsanin. Heke hûn şerê azadiyê ya ku em hêj ji zaroktiya xwe ve dimeşînin fêm nekin, hûn ê wateya di nava refên me de mayînê jî nezanin.

Weke min gotî, siyaset lîstokek mezin a şetrencê ye. Ger hûn kêm-zêde vê fêm nekin nikarin bibin piyon jî. Ji bo hûn rol baş bilîzin divê hûn bizanin şetrencê baş bilîzin, ango siyasetê bizanin. Bawerim hûn dem bi dem nêzîkbûnên teng raber dikin. Taybet hinek heval wisa ne. Weke din jî hinek heval taybet takekesî xwe zêde serbixwe dikin. Zilam jî di nav de. Nikarin li gorî pêşketina azadî ya PKK gav bavêjin. Ji bo ji vê re hêza çareseriyê bê dayîn, em jî dem bi dem nirxandinan dikin. Lê ji ber hinek pirsgirêkên derdikevin holê, objektîf xizmeta sîxurtiyê dike. Ger bi kesayeta kevneşop û nav pergalî nêzîkbûn bê kirin, yek ji we nikare ji rewşa sîxurtiya objektîf û sûbjektîf rizgar bibe. Ji bo hûn bikarin ji vê jî rizgar bibin tişta divê bê kirin, ber bi kesayeta meşa azadiyê ya mezin ve çûyîne. Ji bilî wê ez di nav de em nikarin tiştek xwe bi yek kesî bidin hezkirin.

Ev pir vekiriye. Piştî ku pêşbaziya azadiyê ya mezin neyê jiyîn û di erkan de bi rojane serkeftin neyê bidestxistin dê ji mirinê xirabtir derbikeve holê. Ev qanûneke. Hûn nikarin bi hewayê keça gundî, keça burjuvaziya biçûk bijîn. Heta hûn

dixwazin xire cirê bikin, ne gengaze ku hûn ser bixin. Nexasim di nava PKK'ê de hinek tedbîr hatine girtin.

Ji bo zilaman jî heman tişte. Ger azadiya zilam negire dest û wisa nêz nebe, rast nabe. Deka lê binêrin, ma hûn wer dihizirin pêşketina van zilaman ji xweber çêdibe? Na, em bi hewldanên mezin ve hinekê ronî dikin. Ya rastî em dikarin bi çend romanan ve asta pêşketina heyî diyar bikin. Lewma ger we ev roman xwendiban hûn ê hinekê baştir ronak bibûna.

Em niha bi dahûrînên giştî ve xwe têr dibînin. Dîsa jî divê hûn têgihiştina xwe hinek din pêş bixin. Em ji keça gundî bigirin heta ya zanîngehê, gelek jin beşdarî refên me dibin. Hûn jî dizanin ku ji hemûyan re bûna hêza çareserî jêhatiyê dixwaze. Bêçaretiya di vê mijarê de pêşveçûnê çênake. Ez her tim dibêjim divê hûn bi xwe bawer bin, wêrek bin. Divê hûn ji nêzîkbûnên kevneperest dûr bisekinin, guman jê bikin. Şaş jî nêzî nûbûnan nebin. Divê em di hinek romanan de nexasim ber bi pêvajoya serbixwebûna dişebe yên hatine destgirtin de bi tempoyek xurt ve biçin. Ev ê dema pêş me hîn baştir ber bi têkîliyek baş ve bibe.

Dibe ku ev hemû ji we re weke giştî bixwiyên, lê em dixwazin di pratîkê de hinek tiştan bikin; ew jî encamên berovajî dide. Di têkîliyên pratîkî, têkîliyên jin û zilam de tîpê we zêde ne guncave. Hûn ne di wê rewşê de ne ku di pratîkê de ji têkîliyan re çareseriyê ava bikin. Hûn şaş fêm dikin, bê têkîlîbûn bêhna we teng dike. Di pêşxistina têkîliyan de hûn naveroka şoreşgerî ava nakin. Ma ez ê niha çi bikim? Deka em ê çawa çareser bikin? Lewma em dem bi dem pêwîst dibînin ku nêrînên we bigirin. Me got nîqaşan pêş bixin. Hinek rastiyan jî hûn bi xwe zelal bikin û weke nêrîn jî bi partiyê bidin pejirandin. Qet nebê nîqaşan li ser bingeha rast bikin, dê ev jî rê ji pêşketinên girîng re veke.

Vê bêjim; weke tabûyan li mijaran nenêrin. Tenê di asta tabû û şermê li hinek pirsgirêkan nêrîn, durûtiyek feodalî ye. Her pirsgirêka xwe azad nîqaşkirin, pêdiviyek sosyalîstbûna we ye.

Ger em vê ser nexin, jixwe em ê dijî bîrdoziya xwe bikevin. Hinek heval di nava partiya me de, rewşên têkîliyên jin û zilam ên jiyane yan pir sivik digirin dest, an jî bi tawanbariyek pir giran dinirxînin. Di vê mijarê de hinek çewtî hene. Yekser vê bêjim; heta ku rê ji îxanetê re veneke, zerar nede şoreşê, em alîgirê pêşxistina têkîliyên jin û zilamin. Mînak hinek jin û zilam hevdu digirin û direvin. Em li vir li dijî çi derketin? Ne ku ji ber bi hev re têkîlî pêş xistine, ji bo me got; bi hev re revîne û ev jî îxanete. Ne ji ber ku ji hev hez kirine, ji ber di bin navê hezkirinê de îxanet kirine me ne pejirand. Li gorî me hezkirin ti caran destûrê nade ku kesayet ji erk bireve, nexasim birevin cem dijmin. Hezkirin hîn zêdetir bihêz dike. Misoger a rastî jî ev e. Weke ku berovajiyê vê raste li gorî hinekan dema mirov têkîlî pêş bixe yekser dê birev e, bi erkan bilîze, pirsgirêkan derbixe û jiyana ferdî ferz bike.

Belê, ne gengaze ku em bi vê ferasetê ve lihev bikin. Em li dijî vê ne. Şêweyên têkîliyên ku mirovan bihêz dike vebijêrka me ye. Têkîliyên hezkirinê jî di nav vê de. Jixwe min di dahûrînên Tîrmeha sala 1992'an de qural û şertên vê baş danîbû holê. Naxwazim cardin dubara bibîr bînim. Li gorî min axaftinek pir girînge. Ew ji bo we xwedî girîngiyek zagonî ye, lewma divê hûn di asta feraset de bigirin dest. Ger wisa çêbe, hûn ê bizanin ku mijarên weke pirsgirêkên datînin holê ti wateya wan nîne, rêya wan a çareseriyê jî pir baş derdikevin holê. Gelo em ê bikarin bi hinek rastiyên bingehîn re pêwendiyê pêş bixin? Tiştên ku em dixwazin di derbarê we de bidin û hinek xalên ku dixwazin bigihijînin we hene. Her tim dibêjim, gelo hûn ê bikarin hêza xwe gihandinê raber bikin?

Belê, min di axaftinên xwe yên beriya niha de diyar kiribû. Min behsa şerê jiyanê ku ji kêliya xwe nas dikim ve meşandiye kir. Gelo we encamek jê derxist? Gelo hûn ê bikarin girêdanekê çêbikin? Hûn bi sondek xwe behsa girêdana heta

mirinê dikin, lê bi sondek xwe ya din re jî rewşên sîxurên dijmin ên herî baş nekarin bikin ava dikin. Hûn di kesayeta xwe de herduyan jî beramber hev dijîn. Kîjan rastiye? Yan jî ger her du jî rastî bin, em ê rastiya serdest li gorî kîjanê bidest bigirin ku rast bikin? Soz nûnertiya kîjan rastiyê dike? Ya xwezayî kîjane? Ma we berî her tiştî, xalên hat xwestin bên vegotin fêm kirin? Ger we fêm nekiribe, evqas ji rastiyan dûr bin, em ê çawa bi rastiyan re girêdanê ava bikin? Evê pir xeter be; hûn jî dizanin qutbûna mirov a ji cîhana rastî bi çend rêbazan dibe. Yek; mirovên civakên ku zêde hatine mêtîn wisa ne. Ji ber girêdana wan bi cîhana rastî re qut dibe, weke lawiran tên birêvebirin. Duyem; cîhanek xeyalî pêş dixe. Tîpek kesayeta nexweş a xeyal û derewan pêkve dijî derdikeve holê. Wê de girêdana cîhana rastî û van tîpan bi temamî ji hev qut dibe. Ya sêyem; yeqîn dikim tîpên ku dijmin bi mekîneyên derew û derûnî, robotan ava kirîn hene. Jixwe ew jî bi temamî ji rastiyan qut dibin.

Niha dibe ku ev hemû li Kurdistanê têkilhev bin. Ketîbûna beramber fêrbûn û xeyalan zêde ye. Kesayetên ku mêtîngerî gêj kirî, ango bi temamî ji rastiyan qut kirî zêde ne. Sîxurtiya objektîf pir berfirehe. Sîxurtî weke serkeftinekê tê dîtin. Pêşveçûna di civakê de bi pêşbaziya bi sîxurtûyê re tê pîvan.

Jin hinek din kembaxa kembaxan ji rastiyan qut bûye. Ew radeyek din paşve dişopîne û şerek destpê dike. Jixwe ji bo wê me ji we re hinek din vekir. Me bi dilê xwe yê zaroktî, di wan mercên herî zehmet de şerê ji rastiyan nequtbûnê meşand.

Min çi ji we re got? Destpêkirinek bi rastiya netewî, rastiya jinê û rastiya gel ve hevgihînek bi rastiya sosyalîst re em meşiyan pey wê re em jê qut nebûn, bi hewldanek mezin bi ser de çûn û heta vê rojê hatin. Di rastiyê de çîroka vê bû. Jixwe pêdiviya şerek çawa ya dijwar heye derket holê. Li Kurdistanê îro rasteqînî, di nêvenga PKK'ê de heye. Rastiya me ya xweser, ger hûn rast lê binêrin hinekê bi me re ava dibe. Ev çiye? girêdana

hinek ji we bi rastiyan re lewaz dikeve. Ev şêwe jî di rewşek berfireh de tê jiyîn. Her çendî bi hinek kesan re zêde xwe bide der jî, yan xwe pir fêlbaz û jêhatî dibînin lewma wisa dikin, an jî pir pak û evdalin. Dibe ku herdu jî bin. Ji ber ên xwe jêhatî dibînin dibe ku evdal jî bin.

Partî li dijî van tevan bi dahûrînan, di rêjeyek bêhempa de bi tevahî reftarên pratîkî ve xwest pêşveçûnê saz bike. Ji ber jin gavek din paşde bû me xwest di vê mijarê de hevgihîna wê ya bi rastiyan re, bi esasgirtina şêwaza şoreşgerî ve saz bikin. Di vê xalê de jidilbûn û xwesertî hebû. Dema min behsa pergala malbata xwe kir, dilê me bi çi razî nebû û me ev çawa veguherand siyasetê? Ji ber hûn ji hêla teorî ve fêm nakin. Dibe ku bîranîn hîn zêdetir bide hînkirin. Xeyalên ku di zaroktiyê de hêza me têrê nedikir, me paşê çawa xwest pêş bixin? Dibe ku hîn balkêştir be.

Belê, rastiya netewî û civakî ku em dixwazin xwe bigihîninê, bê ku îxanetê bikin, biyanîbûnê kûr nejîn tevlîbûn girînge. Jixwe armanca hunerê jî ev e, rê ji vê re vedike. Encama ku çalekiya şoreşgerî dixwaze bi rêya herî kurt –ku em şoreş binav dikin- bide gihandin ev e. Erkek wisa jî weke xalek sereke li pêş me disekine.

Bi sebat bin. Dema niha siyaset bû mijara gotinê, tiştek ne wisa weke qutiyek boyaxe ku; tu bixî nav de û reng bidî! Dema berê ferasetên min jî yên wisa hebûn. Lê min nêrî, zimanê siyasetê pir cuda ye. Niha jî bi nêzîkbûnên bi qasî dendika hêjîrê tije nake ve tên. Mijara hezkirinê jî wisa ye. Hêj nikare devê xwe lihev bide, hêj nizane rast lê binêre. Jixwe mirovek wisa nizane hez bike. Ez dikarim dersên xweşikbûnê jî bidim we. Jinek bedew ji têla serî heta lingê wê, bejin û bala wê, endama wê, ji fîzîka wê bigirin heta zanebûnê tev divê çawa be? Ger tiştên ez dibêjim yek hevala me ya jin esas bigire, dibe ku tîpek ji ya herî lêdanê be. Jixwe şoreşgerek, di heman demê de, hunerkare. Dikare bi van karan ve jî mijûl bibe. Şoreşgerek, xweşçêkerê jiyana herî

xweşike. Erkdare ku tîpên vê yên lêdanê derbixe holê. Bes ez nizanim, ger serê we dişixule hûn ê fêm bikin. Li gorî min şoreşvanek, di van mijaran de weke erkdare. Şervanê vane. Nirxa yekem ji jinê re bê dayîn, ger parçeyek jiyana wê ya jê venaqetê ye, bersiva pirsa “jinek çawa” û “zilamek çawa” dayîne.

Min dehî caran ev mijar vekirin. Hûn nikarin bêjin nehatin vekirin. Kesekî ev bi qasî min ronak nekirine. Ez ê niha di vê mijarê de vê jî vebêjim; ji sedî heftî qadroyên me, ji sedî heştî bila jin jî bin, zilam jî bin, dema ev têkîlî dibin mijara gotinê li bendê ne ku wê kî weke sermaye xwedî lê derbikeve. Ango ez hinekê, di van mijaran de jîrim. Ev rewş zêdetir bi jinan re derdikeve holê. Bendewariya wê ya “dê bala kîjan zilamî bikêşe, dê kî xwedî lê derbikeve” pir vekiriye. Min bi temamî lêkolîn û lêgerînek berfireh kir, rewşa wan a li çiyan jî berçav digirim, xwepêşandana çekê ya hinek dikin jî ji bo vê ye; “Bila keç bizanin çawa çek bikar tînin.” Di rastiyê de ne ku qinyata wî pê heye, lewma ne jidile jî. Pêdiviya xwe selmandê dibîne. Her kesê ji vir, ji wargehê jî diçe û yên ez herî zêde nirx didim wan jî vê tiştê dikin. Dihizirin ku dê kêliyek zûtir biçin wê derê, çawa şer dikin û wê wisa xwe bidin diyarkirin ku keçên çawa yemanin! Ya rast, ji ber vê rewşa wan pir xemgîn bûm. Ji ber bi tiştên berbiçav ve di şoreşê de çek bidest nabe. Ji bo selmandina xwe jî mirov naçe serê wan çiyan. Divê mirov ji bo vê dînek be. Hemû jî wisa çûn. Hewl didin xwe peyitînin. Kî çek digire destê xwe wisa dike.

Belê, ev nexweşiyek berfirehe. Hewce nake di vê mijarê de mirov kesekê tengav bike. Ango diçe bila biçe. Nexwe dibînin raperîn çiye. Dê zêdetir jî bibînin. Belê, li bendê me. Qaşo dê bi çek biselmînin, nizanim keçek çawa yemane, dê beramberî vê hinek wê biecibînin! Niha ez jî hewl didim nebesiya vê ferasetê biselmînim. Divê jinek xwe nexe vê rewşê û ji bo vê jî beşdarî gerîla nebe. Jixwe hinek ji wan jî şehîd dikevin. Ango fedaîtiyê dikin. Divê vê ferasetê ji kokê ve tine bikin. Ger neyê tinekirin,

dawiya vê ferasetê naye. Dê zû-dereng bi rewşek xetimî re rûbirû bimîne û di kendalê de gêr bibe.

Niha ez behsa vê taxima hêrsok jî dikim. Hinekê jî armanca hatina wan wisa ye. Civakê ew tengav kirine. Li dijî vê tengavkirinê jî weke bertek baz dane nav PKK'ê. Girêdana bi PKK'ê re jî li ser bingeha ferasetek azadiya çewt saz dikin. Şerê li dijî vê ferasetê jî wisa destpê kir, hêjî didome. Ma hûn dizanin niha em vê wisa bihêlin dê çi derbikeve holê? Dê pîvanên civaka feodal-burjuva ya kevnar derbikeve holê. Pêşî bîrokrasiya wê saz dibe, paşê jî ger em bi dewlet bibin dê dewlet çêbe, wê ev jî bibe şêweya civaka wê. Lê binêrin, di vir de bi ser erkên xwe ve çûyîn nîne! Pirsek weke dilketina welatparêziyek çawa, feraseta rêxistinek çawa, plansazkarek bêhempa yê çawa, şoreşvanek berpirsyar ê çawa kirin nîne! Min ji hineka dipirsiya ku dixwaze biçe ku derê, gelek ji wan digotin; "Başûrê Rojava (eyaleta Tolhildanê), Serhed." Di serê wan de bi qasî dendika hêjîrê aqil nîne. Ev bîst salin li pey van kara me, tevî vê jî nikarim wisa hêsan biryarê bidim. Ecêb! Gelo xwe dispêrin çi û kî wisa daxwaz dikin? Serhed li ku derê ye, Toros ku dere? Nexwe çûyînên wan sexte ne! Jixwe yên çûyîn jî hebûn, mixabin li ber xwe nedan. Her roj agahiya şahadetên wan tê. Li malên gundan tên kuştin. Duh yek li Sîwerekê hatiye kuştin. Heftiya beriya niha jî yek li Pazarcixê, heftiya beriya wê jî yek li Mêrdînê hat kuştin. Hevala jin a hatî kuştin ji vire. Reben tengav bûne. Li têkîliyên azad digeriyan, lê ji bo vê jî Mêrdîn nêzîk bû. Yek ji wan ewder xwest. Ji ber ku nêzîk bû, min jî got tu dikarî biçî. Yek jî nêzîkî vir bû, ew jî çû wê derê. Yek nêzî Ruha'yê bû, ew jî çû wir. Baş dizanim ku li cihê çûnê çawa dijîn. Nekarîn siûda xwe baş binirxînin.

Belê, zilam jî wisa ne. Tenê ji bo jinan nabêjim. Şêwaza têkîliya ku zilam jî dixwaze heman mîna vê ye. Bi rastî jî weke ku em vê şêwaza têkîliyê hêjayî nabînin, em nikarin bi vê pêşveçûnekê jî ava bikin. Ji gava din ve ezmûnên xwe dûr û dirêj

ji we re dûbare dikim. Dixwazin ku têkîliyan ber bi ku ve bibin û çawa bikar bînin? Me encamên ezmûnan jî çawa veguherandin siyasetê? Belê, ev pevçûn hêjî didome.

Bi we ve mijûlbûn, eleqederbûn, ne tiştek xirabe. Bi hemû pirsgirêkên dîrokî û sedsalî ve mijûlbûn, ne tiştek xirabe; ev pêwîste. Ji ber ku hûn, şervanên pêşengin. Hûn di kesayeta xwe de civakê çareser dikin. Hûn ê di kesayeta xwe de çarenûsa civakê diyar bikin. Ger em bi van cidî ne, xwezayî divê gelek nîqaşên me yên girîng bi we re hebin. Ango em ê prototîpa kesayeta azadbûyî li vir ava bikin. Ger hûn bihêz bin, jidil bin, êdî ev wisa ye. Heke hûn bikarin li her qadê vê astê bigirin, hûn ê bibin milîtanên çareser bûyî û tê wateya ku hûn biçin kuderê bikarin xwe pêş bixin. Armanc ev e, bes niha kî êrîşî vê dike, xebatên li dijî vê çawa tên pêşxistin? Divê mirov rûne li ser gotinên kesên ku dibêjin; "Kesên diçin cem Rêbertiya Partî wisa tê pêşwazîkirin, dibe ku derdora wan jî wisa bin" bihizire û li gotinên dijmin jî binêre. Dijmin çi dibêje? Hinek kesên me yên serî tevlîhev dikin çi dibêjin? Di rastiyê de her du jî lihev tên. Ango hem yên serê wan lihev dike û hem jî yên seriyan tevlîhev dikin! Êdî dikevin rewşek mîna ya dijmin de. Lewma ez jî dibêjim ger wisa ye, çi karê van kesan li vir heye? Ger ez dixwazim we mezin bikim, ma hûn ê çima mezin nebin? Zêdahiya we çiye, kêmbûna we çiye? Ger ez ê ji bo azadiyê heta dawî bi we re bimeşim, hûn ê çima nemeşin? Dixwazim li ser vî bingehî pêşbaziyekê çêkim. Hûn ê çima beşdarî vê pêşbaziyê nebin? Hûn ê çima di pêşxistina helwestek astengdar de israr bikin, bêjin; "Fêm nakim, tênagihijim, nameşim û nadim meşandin." Çima? Kî ji kî bawer nake? Kî erka xwe bicîh nayîne? Xwezayî divê em li ser van rawestin.

Niha ez ji kesên ku serî tevlîhev dikin an jî guman dikin dipirsim: Hûn çiqas ji şoreş, daketina nava gel û ya herî girîng jî ji erkên rêxistinî re amade ne? Hûn behsa kîjan cureya kar bikin bila

be; kîjan cureyê xebatên weke nivîs, çalekî dibe bila be, kî xwe nade van, kî xwe tevlî nake? Çima em ê vê nekin û dê çima kesayet ji vê re bibin asteng? Kîjan nîqaş û nêzîkbûnên min ji vê re astengin? Deka vebêjin. Hem yekser hem jî di pratîkî ve di kîjan mijarê de Rêbertî nehat kirin, ji kîjan asta têkîlî û pêşketinê re tevkariya ku dihat xwestin nehat kirin? Tê zanîn tevkarî ji hemûyan re çêbû.

Belê, ma pêwîstiya we bi van tevan nîne? Pirsgirên weke girekê kom bûyîn hene. Kîjan ji we ji van re çareserî dîtiye ku, hatiye astengkirin? Kî xwe di mijara çareserkirinê de paşde hiştiye? We jinan, bi zorê jî şerma ne dikariya du gavan bavêjin heta mala cîranan. Ma kî heta dawî deriyê mala xwe ji we re vekir? Hûn jî baş dizanin ku, ger hûn biçin malek din, cîranê mala we ve jî be, xizmên we jî bin, wê du rojan de cureyek têkîlî û zextek çawa li ser we ferz bikin. Hele bikevin nav qada têkîliyên min, tiştên ku hûn li vir dibînin bi tiştên we li mala dayîk û bavê xwe dîtî re muqayese bikin. Kîjan jidile, kîjan zana ye, kîjan zêdetir encamgire û ji şoreşê re vekiriye?

Mane min got, hûn ê hinekê bi rastiyan re xelekekê ava bikin û bersivên hevseng bidin. Nabe ku mirov bi aqilê selîm bilîze! Nabe ku mirov bi pîvanên rastiyê bilîze! Wê tu ji aliyekê ve van pîvanên rastiyê tevan bavêjî hêlekê, lê ji aliyê din ve kesekê bibînî pistepistê bikî û bêjî; “nizanim li ku derê xwestin çi ji min bikin!” Ev nayê pejirandin. Ev rûqayîm hem dixwazin pir tiştan bidin, hem jî ji piştê ve van tiştan pêş dixin. Di vê mijarê de behsa hinek tîpan tê kirin. Bila bext hebe, ew bi xwe dibêjin; “Pêdiviya me pir bi dahûrînan heye, dê pir baş be”, mixabin piştî ve jî van pistepistan dikin. Mirov hinekê dihizire dibêje; “Gelo girêdana min çiqas bi rastiyan ve heye?” Kî pîvanan derbas dike, bi tiştên din ve mijûl dibe? Nexasim ev di pişt ve kirin, çiqas li gorî aqilê selîm, wijdan û edaletê ye? Hêjî gelek wisa ne. Weke ku serê wan birçî bûye, min tevlîhev kiriye! Serê te, serê koleya

ne! Hezaran firçe lê ketiye, tevlîhev bûye. Qaşo di mijarên Rêbertiya Partî xwestiye bike de serê wî tevlîhev bûye!

Ji min re pir ecêbe, dema kesên wisa nû vê dibêjin, qaşo mejiyek te pir şiyar hebû, tu gihabû encamên pir zelal, ma Rêbertiya Partî tevlîhev kir? Ya rastî bi tevkariya me ve hiş hinekê vedibe. Hevrikên min ên herî mezin jî ji polîtîkayên min sûd werdigirin. Yên tên vir jî, hinek hevrikên me hene, ew jî li çiyê bi tiştên ku ji min girtine ve dijîn. Ango dilek wan cuda nîne, hişê wan tine ye. Hewl didin mirovan pêşkêş bikin. Mirov piçekê rêzdar dibe! Ango dema tu ji hinekan tiştina fêr dibî û digirî, divê bi edalet bî û ji xwe bipirse “gelo ev ji bo min çi rave dike û çi rave nake! Hevsengî û pîvana ez behs dikim di vir de ye. Kesê vê hevsengî û pîvanê saz nake kî dibe bila be, nikare xwe ji windakirina aqilê selîm û qutbûna bi girêdana rastiyan rizgar bike. Jixwe, ji kesê ku girêdana xwe ya bi rastiyan qut dike jî bela rû dide. Bila dîsa jî hemû bar li ser milê me be. Dîsa em ê xizmeta xwe ya ji wan re bidomînin. Bila bi tiştê dixwazin ve bijîn!

Hezkirin û hatina hezkirin tiştek xweşike, lê qanûnên vê jî hene. Em nikarin xwe di vê mijarê de bixapînin. Qanûnên vê yên ji hesin hişktir hene. Nexwe dê ketîbûn û sîxurtî çêbe. Divê hûn bizanin ku ez jî şopdarê hinek qanûna me. Lewma kesên ku hişê wan tevlîhev dibin an jî têkûz tevdigerin, tevnagerin kî ne? Ez ji heft saliya xwe ve naxwazim bi kesên bêxêr re bijîm. Min gotibû, dema xwîşkên me weke sermayekê hatin birin, me ev kir pirsgirêk. Dema camêr hevjîn, nizanim çiya me weke sermaye bikar anî, me ev jî kir sedema şer. Hûn ê bizanin em bi çi ve biramber hevin. Lewma hûn ê piştre jî her kêlî, li cem me cuda, li pişt me jî cuda nebin. Ne hêjayî we ye.

Di mijara jinê de ezmûnek me mezin a şer heye. Di raperîna jina Kurdistanê de di dîrokê de cara yekeme em kes derfetan amade dikin. Yekem care em rêzdarbûna jinê radestî wê dikin. Em bi serbilindî, li çiyan û kolanan çek dixin destê wê. Wê

demê ev çima rezîltiyê dikin? Çima vê nabînin? Mane bi çekên min çûn wê derê? Mane bi tevkariya min çûn wê derê? Mane di bin berpirsyariya min de diçin wê derê, dixwin û vedixwin? Wê demê, qet nebê bila mirov piçekê rêzdar be. Heta mane derfeta hezkirinê jî xêra me bidest dixin? Gotinek pêşiyan heye dibêje; “Çil salan xatirê qehweyekê heye”, wê demê, wê çima tu ya ku her roj ji te re tê dayîn re bêrêziyê bikî?

Dibe ku ji şoreşgerbûn û heta pîvana nêzîkbûna ji rastiyên bingehîn ên mirovî re sînordar bin. Gelek ferasetên jirêderketî, bêpîvan, bê edalet, şêwaza ji jiyana şoreşgerî qut û herî girîng jî li vir helwesta jiyana bi namûs û rêzdar hêjayî me nabînin, ango şêwaza têkîliyek ku dijmin li ser me ferz dike dikeve nîqaşê. Mixabin keç û xortên me nikarin daneyên ku feodalîzmê û mêtîngeriyê dane derbas bikin. Her wiha di vê xalê de jî bi min re şer dikin. Hinek vî şerî vekirî dimeşînin, hinek jî veşartî. Ez ê jî şer bikim. Ger mafê wan di şerkirinê de hebe, ya min jî heye. Dîsa pir vekirî dibêjim; ez şerkerek wisa me. Pir nirx didim jinan. Ji fîzîka wê bigirin heta ruh û fikir di astek bêhempa de hewl didim teşe bidimê. Mafê xwe dibînim ku vê erkê bikim. Ez xwe pir vekirî pênase dikim. Ger hûn xeter dibînin, nêzîk min nebin.

Gel ji min re got; “Rêber.” Nexwe, li gorî min divê Rêberek jî gelê xwe yê di bin mercên giran ên mêtîngeriyê de ye bigire û derbixe û neçare teşe bidiyê. Berovajî vê ez ê bibim Rêberek sexte. An jî dê Rêbertiya min jî weke Serokên din be. Belê serokên din pereyên wan pirin, desthilatiya wan zêde ye û li ser serê gel weke qiralan dijîn. Lê belê ez, seroktiyek wisa hêjayî xwe nabînim û yeqîn nakim ku ji serokên wisa me jî. Seroktiyek wisa qet napejirînim. Ji ber vê min bi xwe got vê “Dahûrîna Apo nîqaş” bikin. Min got; “Rastiya Apo nîqaş” bikin. Min qet negot; “Hûn pir tirsonekin” an jî “pir guncave hûn ê bipejirînin.” Ji bo di mijarên çiye, neçiye, divê çawa neyê meşandin de hişê we vebe min got. Baş derbixin zanebûnê, daku hûn neyîn xapandin. Lê

min ji we re got Apo ne kesayetek bê bikaranîne. Dema ez vê dibêjim jî, ez li hember hemû rastiyan wisa me. Ango ez hema hema di hemû mijaran de gernasek naxapim û naxapînim. Kî bi min ve mijûl dibe bila bibe! Ma dijmin karî me bixapîne? Na! Her kesî xwe xapand. Ma kesî karî min bixapîne? Ma min kesek xapand? Na; min hemû ber bi rastiyê ve kêşan.

Niha ev hemû rastiyên girîngin. Hûn ê hinekê fêm bikin ku ez ne gernasek ji rêzê me. Hûn ê fêm bikin ku ez hinek karên girîng ve mijûl dibim. Hûn ê fêm bikin ku ez bi hinek karên we re jî mijûl dibim. Min ji we re gotibû, ez ji heft saliya xwe ve li hember nêzîkbûnên kevneperest şer dikim. Min li dijî nêzîkbûnên kevneperest ên jinê û yên eşîrtî şer daye destpêkirin. Niha ji destê min bê, ez ê biçim hemûyan carek din xirab bikim. Di tirbê de jî be, dixwazim hesab bipirsim. Li gorî min tirb jî, warê binerdkirina hemû bêmafiyane. Warê binerdkirina hemû tiştên nayên pejirandine. Lewma ji min re weke tirbê diyar dibe, dixwazim biçim wir jî hesab bipirsim. Herî zêde hûn bêmafiyê re rûbirû mane û li hember rastiya xwe biyanî bûne, jinên li cem me jî wisa ne. Naxwazim we tengav bikim. Cardin bêjim; ne zarokim jî, çil caran radikim dipîvim, li gorî wê helwest raber dikim. Ango divê em hestewar nêzîk nebin. Ji ber em li hember we tevan têra xwe rasteqîn nêz dibin. Hest jî, ji rastiyan hêz digirin. Di vê wateyê de dibe ku nirxa wê hebe.

Ez ê dîsa bêjim, çi dixwazin bi kesên ez pir ecibandî re, çi jî bi kesên ti carî ez jîndar nekirîm re dibe, ez ê bi tevan ve mijûl bibim. Jixwe ferman û perspektîf her roj ji bo vê ne. Jixwe dev ji şer berdan, dev ji jiyanê berdane. Xweziya hinek din hêza min û wextê min hebûya, daku min tola xwe ya mezin zêdetir bigirta. Min bikariya hîn mezintir hesab bipirsim. Li hember wê kirêtî, bêesilbûn û sextekariyê; li hember kesên ti caran bi ser erkên xwe de neçûyîn... Em li hember kesên ji dijmin zêdetir bi ser erkên xwe de naçin pir bihêrsin. Xweziya firsenda min hebûya û bi ser

de biçûma! Min dixwest ên fesadiyê dikin li hemberî min bin. Bila ew bêrêziya xwe vekirî kiriban, me jî tevkariyek, xizmetek ji wan re kiriba. Tenê ji bo vê ne ji bo em seza bidin. Ji bo vegotina van rastiyên ku têra dagirtina dendikek hêjîrê jî nake, hinek bi wan bidin fêmkirin.

Ya rastî yên ku erzan bimirin jî ew bi xwe ne. Egîdiya feodalî dikin. Em ji dîroka xwe dizanin ku egîdiya feodalî kêrî çend quruşan dike. Qaşo dê hestên xwe bijîn. Hûn jî dizanin ew hest çend quruşin. Jiyana ku nikarin ji jiyana hovane, lawir yek gavî wêdetir biçin, li hember min diparêzin. Rêgeza vê jî weke namûs datîne holê yan jî li hember min dixe nîqaşê. Dîsa şerê me yê li hember vê jî vediguherînin fesadiyên weke "gelo Rêbertî bi me dilîze" yan jî "me diceribîne." Min dixwest ji van tîpên kevneperest re rastiyê hîn baştir bidim fêmkirin. Lê direvin. Hem jî qaşo xwe dispêrin çek wisa direvin. Ya rastî ev ne hêja ne ku çeka min rakin. Ne hêja ne ku wisa li ser keda min rûnin. Dîsa jî bila çek ji me bin, lê ne rêyek başe.

Ez tenê behsa we yan jî yên li vir nakim. Ev rewş li kur bê jiyîn bila be sextekarî ye. Pir vekiriye ku kesên vê dijîn jî dê encamê negirin. Ji ber vê her roj entrîka dikin. Dixwazin hizban ava bikin. Qaşo dê pirtûk binivîsin. MÎT her roj vê xebatê bi plansazî dimeşîne. Dibe ku ew jî pêvekek vê ya biçûk bin. Me xwe li hember van rewşan tevan birêxistin kiriye, ger paşê lê bikevim, ango şer bidim pêşxistin bila şaş nemînin. Quralên şer hene. Weke min gotî, dê bi min re çavên te vebe, çek ji min bigirî. Wê tu bi karbidestiya min roj bi roj bijî, lê beramberî me jî bikar bînî! Ev jî zêde dibe bê edaletî. Wê tu spasiyekê nekî, li pey me çi hat ser dev bêjî, dema firsendê jî bibînî lingê xwe bidî ber me! Ez jinên wisa û zilamên wisa jî napejirînim. Ger rêzdarbûna, diya min jî be, hevjîna min jî be, bila biçe ji xwe re mêrekê bibîne, min qebûle. Bila pîvanan bisepînin, lê dema mijar bû sextekarî ti caran qebûl nakim. Ev feraseta min a xweşikbûnê ye. Ev feraseta min a

namûsê ye. Ev feraseta min a şere. Ez ê wisa jî berdewam bikim. Hewl bidin kûrtir fêm bikin.

Ger hûn di hêza pêşveçûnê de ne, em ê li ser bingeha milîtanî bimeşin. Yeqîn dikim di dîroka têkoşînê de heta niha ez zêdetir hevalên milîtan hizirî me. Nexasim dema jin dibin mijara gotinê, bi qasî ku xeyalên wan re jî derbas nebe ji parastinê bigirin heta xurtkirinê yê herî zêde berz nêzî wan dibe ez im. Xemgîniya min ew e ev kesayet xwe bi xwe tengav dikin. Li çiyan, bajaran, qadên perwerdê jî xwe tengavkirin û nêzîkbûnên kedxwar, li gorî hesabên wan qet ne başe.

Tevî her tiştî kar li ser bingeha xetê dimeşe, aliyê pêşketinan jî li ser bingeha em esas digirin pêş dikeve. Xeta ku li ser we jî serwer ev e. Dibe ku bi êş derbas bibe, dibe ku hişê we hinekê tevlîhev bibe, lê her şoreş hinekê wisa ye. Ger hûn durist bin, baweriya we hebe, hinekê sebir bikin û li ber xwe bidin. Hinek rastiyên Kurdistanê yên hundurîn ji dijmin zêdetir bêrehme û bi rikek mezin pêwîstî bi berxwedaniyekê heye. Rastiya we jî kêm-zêde mîna vê pêwîstî bi sebir, birik di rêya rast de meşê heye. Li ser vî bingehî hîn zêdetir rizgarî gengaze yan jî dibe encama nêzîkbûna di rêya rizgarî de pêşve diçe.

Armanca hemû nêzîkbûnan ev e. Dîsa dibêjim; tiştên ku tên kirin ji bo her tim ya herî baş, herî rast û herî xweşik bê bidestxistine. Divê kes ji vê aciz nebe yan jî weke astengî li pêş me nesekine. Ger hêz têrê nake, qet nebe bila li pêş kar nesekine, ev jî bese. Rastiya Rêbertî wisa ye. Kesên di vê mijarê de misoger bi biryar dê bimeşin. Rastiyên ku heta niha derketine holê ev hinekê selmandine. Dê ji vir û şûn de jî her roj pêşketin bi vî rengî derbikevin holê û li ser vî bingehî saz bibin. Cara yekem li Kurdistanê hezkirin û rêzdariya li hember jina azad jî di vê rêyê de ye. Jixwe hêj niha ve mînakên heyî jî vê piştrast dikin.

Wê demê em ê hîn zêdetir bi ser de biçin û xeta partiya me bi ser civakê de serwer bikin. Ji her demê zêdetir li ser

bingehek pir alî kûranî têbigihijin. Em ê partî di hemû jiyana xwe de serwer bikin, li hember dijmin jî biçin serkeftina misoger. Rêbertiya Partî jî heta dawî bi kesên wisa dimeşê re ye. Armanca di bingeha hemû nêzîkbûnan de, ew hinek di rewşek bihêz de avakirine. Ji vê hêlê ve dilketiyê rola xwe de ye. Her gotina dike, her gava davêje û her reftarên ku raber dike ji bo hinek din bihêzkirin û serkeftina vê ye. Divê ji bilî vê bi ti şêweyî ne bê fêmkirin û têgihiştin, ne jî bê nirxandin. Em yeqîn dikin li Kurdistanê bi qasî xwediyê sonda herî rast, ewqas jî xwediyê çalekiya herî serkeftî jî emin. Ev pişgiriya mezin a gelê me jî, ev partiya ku, -cîhan jî jê mat bûye- partiya di rêya serkeftinê de dimeşe jî, raveya herî vekirî ya vê rastiyê ye.

***Kanûn 1992***

*“Li welatek me ya ku şaheserek ji hezkirin û jiyanê ne hatiye hiştin,*
*ancex mirov dikare bi vî şêweyî şer bike wisa xwe bigihîne welatek*
*bê jiyîn û rastiya miletek bê hezkirin.*
*Şoreş ji bo vê hewce ne. Şoreşvan jî ji bo armancên wisa eslî fedekarî,*
*wêrekî û hewldanek mezin raber dikin.*
*Ti astengî nikarin wan ji armancên wisa pîroz û avakirina cîhanek ku dixwazin dûr bixe.”*